BERGA 2

JIYANA MIN HER TIM ŞER BÛ

SAKÎNE CANSIZ

Weşanên Akademıya Jına Azad A Zeynep Kınacı

BERGA 2

JIYANA MIN HER TIM ŞER BÛ

SAKÎNE CANSIZ

Weşanên Akademıya Jına Azad

A

Zeynep Kınacı

Çapa Yekemîn:

Çapxaneya Azadî - Cotmehê 2015

Çapa Duyemîn:

Weşanxana Şilêr - Qamişlo 2017

Mîzanpaj û bergê pirtûkê:

Rêvan Mehmûd

weshanashiler@gmail.com

weje.vejin@gmail.com

Dijmin em gafîl girtin!

7’ê Gulana 79’an sibehê, her der bêdeng bû. Li cadeyên derdor wesayît pir kêm dişixwilin. Li ser rêya diçe 1800 Evler’an tenê em hebûn. Li derdor ji bilî wesayîtên polîsan ên serdegirtinê, ti maşîn nebûn.

1800 Evler, taxek li derveyî bajêr e. Di derketina bajêr de, li ser rêya Meletî, taxek xizan ji nişтecihên ku piraniya wan karker û kedkarên ji Dêrsim û navçeyên wê penaber bûne pêk tê. Di salên dawiyê de hatibû avakirin. Weke kolanek şevnişîniyê bû. Cihek di nava çarçoveya xebatên me de bû. Xebatên me yên weke perwerde, civîn, propaganda-ajîtasyon, belavkirina daxwiyaniyan, afîşkirin li vir jî pêk dihatin. Hinek komên me yên biçûk hatibûn avakirin. Ji aliyê civakî ve kêrhatî bûn. Carê em jî diçûn û dihatin. Baldariya keçên ciwan pêş diket. Di nava derdorên xwendevan de dilsoz û sempatîzanên me hebûn. Pêşketinên weke yên li Hîlwanê çêdibûn, berxwedaniyên li dijî çeteyên feodal, dîsa çalakiyên li Elezîzê hatin lidarxistin, êrîşên me yên li ser bingeha tundiya şoreşgerî li dijî navendên faşîstan çêdibûn, bi gelemperî di nava gel de, bi taybet jî di nava ciwanan de bi baldarî û sempatiyek mezin dihat pêşwazîkirin.

Lê mixabin, vê carê sedema çûna me ya li 1800 Evler’an cuda bû. Ez wer dihesim ku emê biçin cihek li nava heman taxê. Wesayîtên polîsan cadeya giştî lez derbas kirin. Hema li jorî rê, ber bi aliyê ku avahiya bi tîpên mezin li ser ‘Zirai Donanım Müdürlüğü’ nivîsandiye ve çûn. Tax li jortir dimîne. Ev avahî li çepê dikeve. Weke ti tişt û ti kes li vir nalîze. Ma ne divê kes wan qêrînên mirovan ên dîwaran jî derbas dikin, nebihîse!

Kêfa polîsên em girtine xweş e! Serdegirtinek bê pevçûn û bê xeterî pêk anîbûn. Her wiha ji ber mal hatibû îxbarkirin, karê wan jî hêsan pêk hatibû. Di destê wan de agahiyên ku îtîrafkaran dabûn hebûn. Ango pêngava operasyonê ya destpêkê serkeftî meşandibûn. Her ku ew girtinên bi çend kesan destpê kirî zêde dibûn, beşek girîng ên ku li qadê xebat dimeşandin jî girtibû nava xwe. Qadroyên 'biyanî' ji mêj ve di nava lîsteya polîsan a lêgerînê de bûn. Di nava lîsteyek ku di wan rojan de ketibû destê me de, navê me jî hebû. Nexwe ew demek bû polîs li pey vî karî bûn.

Demek ku hewce bû em zêde tevdîr bigirin, di rojên girtin li pey hev çêbûn de, heman mal weke cihê hevdîtinê bikaranîn, hêj li qadê mayîn, gelo li gorî kîjan mantiqî bû! Bi taybet girtina hinek kesan, ne nêzîkbûnek dijmin a jixweber bû. Pir vekirî bû, hinek kesayet hema ne jixweber hatin binçavkirin. Tevî ku me, ev mijar tim digot, me di meriyetê de tevdîr negirt û tevdîrên heyî jî berdewam nekir. Berdêla vê jî giran bû. Di demek ku xebat berfireh dibû û herî zêde pêdivî bi kesan heyî de, encamek wisa erzan nedihat pejirandin.

Ji kêliya ku polîsan bi ser malê de girtiye heta niha, ez vê bandorê dijîm. Şaşiyek bû. Sucek bû. Gafletek bû. Bi yek gotinê tirsnak bû! Bi rastî jî ev qasî hêsan û bê tevdîr ketina destê dijmin tirsnak bû. Me çiqasî lenet jî bi baranda dîsa tiştekê feyde nedikir. Di çavên me hersêyan de jî li hember vê hêrsek hebû. Bes em bi dijmin re rû bi rû bûn. Her çendî di hundirê me de bahoz jî rabin, diviya em moralê xwe nexin û bê ku kêmasiya heyî mezin bikin, xwe ji aliyê moral, vîn û asta zanebûnê ve, ji vî şerê zehmet re amade bikin. Erk û

hewcedariya vê ji her tiştî girîngtir bû. Em gav bi gav diketin nava vî şerî. Mirov bi awirên destpêkê, gotinên destpêkê, mîmîk, asta bilindbûna deng, sekin û bi her tiştî ve yekpare ye. Ji ber dijmin bal dida ser her tiştî. Ji kur lewaziyek bidîta, dê ji wir lê bixista.

Maşîn bi dengek qelebalix li hewşa pêşiya avahiyê, li ciyek nêzî derî rawestiya. Bi daketinê re bazdanên polîsan, helhelên ecêb, ji nişka ve her der kir nava liv û tevgerekê. Li gorî gotinên wan ‘şahî’ hebû. Di carekê de em her sê birin odeyekê. Li erdê çalên ku av lê kom bûyî hebûn. Zemîn nive. Şiv, tekelên maşînan, li çep û rast paçên qirêj û kursî hebûn. Diyar bû ku ne odeyek asayî ya cihê lê rawestînê bû. Beriya me êşkence hatibû kirin.

Amûrên ku li naverastê bûn, di falakayê de hatibûn bikaranîn. Paç jî li çavan girê dabûn. Di girêdana dest û lingan de hatibûn bikaranîn. Lê ez hêj nizanim ka tekel kêrî çi tên. Jixwe êdî em jî ne di wê rewşê de bûn ku bikaribin li ser wan bihizirin. Min yekser berîkên xwe kontrol kir. Hinek notên biçûk ên ku min nekarîn li malê tine bikim, hizirîbûm ger tiştek bibe ezê wan ‘bicûm û daqurtînim” derxistin. Min parçe parçe kirin û danîn ser paçekê baş eciqandin. Ji ber polîsên jin ne-anîbûn malê, li ser min ne geriyabûn. Lê dikariyan niha bînin cihek wisa. Lewma me herî dawî bi çavan ji hev re got; “em li ser xwe tiştekê ji bîr nekin.” Me hevûdû hişyar kir. Bêhna Hamilî pir teng bûye, ceynikê wî dilîzin.

Pirsî; “ma li malê tişteke cidî hebû? Tiştek ku ketî dest nebû, ne wisa?”

Min got; “na.”

Agahiya wan tine bû. Ji ber beriya ez derî vekim, min hinek tişt şewitandin û hinek tişt jî ji şibaka xwaringehê re avêtibûn. Tenê pirtûkek Dîroka Partiya Bolşevîk, mekîneya teksîrê, hinek alavên daktîloyê li malê hebûn. Tenê ew ketibûn dest. Qaxidên teksîrê, boyaxa teksîrê, qaxida karbon û hinek qaxidên asayî hebûn. Hemû jî alavên daktîloya me bûn! Tenê bi wan jî nedikariyan ispat bikin ku teksîr e. Li her malê jî daktîlo hebûn. Lewma ez dihizirîm ku nikarin tiştekê bidest bixin. Bes me ne dizaniya ku di nava qaxidan de hinek qaxidên bi çend hevokan sernivîsa 'ji bona Gelê me yê Egît" beşek daxuyaniyê heye. Lewma me girîngiya pirsgirêkê jî ne dizaniya. Pirsgirêk girantirtbû û cuda bû.

Dijmin yekser binyata me ya rêxistinî ya li qadê hedef girtibû. Her wiha Şahîn Donmez jî li qadê bû û îhtîmalek hebû ku ji derve de hinek hevalên din jî werin. Ji komîteya herêmê em sê kes di destê dijmin de bûn. Piştî Elî, ez û Hamilî bûn. Her wiha ji komîteya jêrîn jî gelek heval hebûn. Metînê Ker (saxir) û Hisên Topgûder li derve mabûn. Ya rastî Hisên çûbû aliyê Dîlokê. Bes ger tevdîr neyên girtin, dibe ku gelek qadroyên din jî werin girtin. Ew mala ku me digot kes nizane, dernaxe derketibû holê û em hatibûn girtin. Weke din jî hinekan îtîraf kiribû. Lewma dibe ku ev girtin berfireh bibin.

Tevî ku evqas bûyer diqewimîn, Şahîn zêde rehet bû. Piranî li mala hevalan dima. Her kesî ewder nas dikir. Yê ku mala rêxistinê şanî wan kiriye, dê pir hêsan wan jî bide dest. Nîqaşa me ya dawî me bi Riza Sarikaya re kirî hat bîra min. Çiqasî har bû. Yên dilîstin, êdî gelekî xirab dilîstin. Êdî wisa plan kiribûn ku li her cihê bi rêbazên cuda û kesên cuda ve

encam bigirin. Dixwestin li Dîlok, Dêrsim û paşê jî Elezîzê tevlîheviyê derbixin. Gelo dibe ku li Elezîzê ev lîstok cihê xwe bigire? Li gorî wan komîteya jorîn tev ji qadroyên ‘biyanî’ pêk dihat. Ango em ‘biyaniyên’ji derve hatibûn! Ne zehmet bû ku bala hinek kesên ji vê aciz in û pirsgirêkên wan hene bidin ser vê mijarê.

Riza, ji aliyê Ciwanên Şoreşger ve (Dev-Genç) derbasî aliyê me bû. Ji bilî hinek qadroyên xwecihî yên cuda bûne, ew jî weke qadroyek kevin dihat dîtin. Tevî vê jî ti caran hezim nekir ku di asta duyem de bimîne. Ji ber nêzîkbûnên wî yên teng û kariyerîst ew di qonaxek xirab de, ber bi pêşbaziyek şaş ve dibir. Me hewl dabû em van bi nîqaşan, şaşî û kêmasiyên wî rast binirxînin û wisa pirsgirêkê çareser bikin. Lê wî pirsgirêk ber bi zehmetiyan ve bir. Herî dawî dema hevalê Cemîl hat axivî, pirsgirêk ji hinek aliyan ve çareser kiribû. Lê diyar bû ku bihurdar bû. Ket rojevê ku li hinek qadên din pêdivî heye û ji ber vê dibe ku Riza biçe wan deran. Ji bona hinek din wext bidest xistin û ew jî baştir were nasîn, nêzîkbûnek erênî bû. Lê wî yekser bertek raber kiribû. Belê, Riza di pêvajoyek wisa de ji aliyê dijmin ve hatibû girtin. Dibe ku dijmin ev acizbûnên wî jî bi hinek rêyan ferq kiribe. Li Elezîzê gelek sîxûr û muxbir hebûn. Şêwazê kar û tevgera koman gelekî vekirîbû. Her tişt pir zû digiha dijmin. Her çendî em tam bi vê tiştê ne qane jî bin, şikên me hebûn. Dema Riza hate girtin şîroveyên me di vê derbarê de bûn.

Dema me her carê îfadeyên hev daniya bîra hev, hinekê jî gumanên me rave dikir. Ji ber tiştên ku rû didan ne baş bûn. Girtinên komî ne ji aliyekê ve, ji her alî ve xirab bûn. Dijî

mirov e. Şaşî û kêmasiya yek kesî cesaret dida dijmin. Ya herî girîng jî, dijmin di cihên wisa de her kesî bi tenê dihêle, hewl dide yek bi yek bixe û li dijî hev bide bikaranîn. Dema Hisên Taze beriya heftekê hat binçavkirin û berdan, di vê mijarê de hinek agahî dabûn. Her yek ji wan kirine cihên cuda û lêpirsîna wan jî cuda kirine. Li gel şerê derûnî, kesayetan li dijî hev didin bikaranîn, îfadeyan weke delîl bikar tînin. Ev rêbaz di nava pergala lêpirsîna dijmin de zêde dihat bikaranîn. Ji êşkenceyên çors zêdetir, ev bandora xwe didin diyarkirin.

"Mal aîdê min bû!"

Min di kêliya serdegirtina polîsan de pirsa destpêkê; "ev mala kî ye?" ji min kirîn re bersivek wisa dabû. Ango min yekser girtibû ser xwe. Min ji wan re gotibû; "ev mala min e. Carê xwîşk û birayên min tên. Malbata min tê û diçe. Jixwe ez jî nû hatime. Debara min malbata min dike. Ez jî xwe amade dikim kar bikim. Evder ne mala rêxistinê ye. Ti eleqeya min bi ti siyasetê re nîne. Ez mirovek ronakbîr û pêşverû me." Bes polîs jî ji ber vê axaftina min a rehet û ji xwe bawer şaş mabûn. Hinek ji wan jî serê xwe dihejandin. Weke ku bêjin; "de ka em biçin, emê şanî te bikin çiye" kena xwe dikirin. Ji nav wan yek serkomser bû, dê min navê wî paşê di lîsteyek pişta deriyê odeya ku em xistinê hatibû jibîrkirin de bidîta. Navê wî Zafer Karaosmanoxlu bû. Ez navê gelek êşkencekaran jî wisa hîn bûm.

Komîser zêde hedar bû. Ya rastî tişta ku lê digeriya nedîtibû. Wer dizaniya ku dê li malê zêde kesan bigire. Ji ber îxbar wisa bû! Li ser qedehên zêde yên li malê qirêj jî rawestiyan. Bala wan kişandibû. Îhtîmalek mezin hizirîne ku

Şahîn wan jî bi me re ne. An jî li benda hinek kesên din bûne. Li malê hem di lêgerînê de, hem gelek pirs pey hev kirinê ve xwestin nêzîkbûn û bertekên me fêm bikin. Em diceribandin.

Liqayî hev hatinên destpêkê, ezmûnên destpêkê, êrîşên destpêkê, bihîstinên destpêkê, hîsên destpêkê û hwd hemû jî gelekî girîng bûn. Te sekna wê kêliyê çawa bandor kiribe, dê ev bandor di pêşketinên pey wê re jî diyar bin.

Hevdîtina min a yekem bi polîsan re li Îzmîrê çêbibû. Ji ber berxwedaniya karkerên Bornova hatibûm girtin. Wê demê jî em bi komî hatibûn girtin. Lê niha pir cuda bû, êrîşek berfireh bû. Berpirsyariya rêxistinê hebû. Parastina nirxên rêxistinî, xwe ji her tiştên ku zerarê bide wan dûrxistin, li hember her cure êrîşên dijmin vîn û baweriya xwe li ser piyan girtin, di kêliya niha de hemû şerek dijwar bû. Ya girîng jî dê tu di nava şert û mercên giran û ne wekhev de şer bikî. Dê dijmin her cure amûr û teknîkê bikar bîne. Dê tu jî bi bawerî û vîna xwe ya şoreşgerî ve vî şerî bimeşînî. Min gelek romanên weke bi navê Şerê Berxwedanê, Şikêrên Sor (Kizil Kayalar), Notên ji Sêdarê xwendibûn. Tiştên ku hatibûn nivîsandin tirsnakbûn. Her yek ji wan bi rêbazên êşkenceyên ku hişê mirov ranake, îradeyên ku li hember wan têk naçin, an jî mînakên berxwedanî û lehengiyên bêhempa ve dagirtîbûn. Hemû jî rastiyên hatibûn jiyîn bûn. Li vir rastiya xwe baş naskirin gelekî girîng e. Te dijminê xwe ji her alî ve nas kiribe, dê tu bikaribî bi hêz jî pê re şer bikî û jixwe serkeftin jî li ser vî bingehî mîsoger dibe.

Her kêlî û her çirkeya ku derbas dibû çiqas girîng bû. Gelek tişt di kêliyekê de bi hev re hizirîn girîng bû! Her tişt ji xweber û lez tê derbasî nava hişê mirov dibe. Min ti caran heta

wê demê evqas mijar bi hev re ne hizirîbû. Nexwe divê mirov hinek tiştan mîsoger bijî, da ku mirov têbigihêje! An jî her ku mirov dijî, hest û raman wate qezenc dikin û zelal dibin.

Ez ji xwe re dihizirîm; “gelo me nedikariya em wê sibehê birevin? Me nedikariya wê valahiya di navbera her du avahiyan de bikar baniya? Ma qey ne dibû?” Ez jî li pey van fikiran ketime. Min berî wê li malê bi çend parçeyên texteyan ve xwe ceribandibû. Bes texte ne saxlem bûn. Ji bona amadekirina texteyek saxlem jî kes mijûl nebû. Rêya ji şibaka xwaringehê derbasî avahiya miqabil dibe, ne fikirek xirab bû. Ji ber dibû. Yên miqabilî me jî ji Sîwerekê bûn, ew jî cutek nû zewicîbûn. Baş bûn. Dema min ji jinê re got; “ger pirsgirêka me ya miftê derkeve, an jî pirsgirêkek rû bide emê wê rêyê bikar bînin. Got; “dibe, çi nabe.”

Ger em amadebûyan, me dikariya em polîsan mijûl bikin û di wê avahiyê re derkevin. Her weke din jî qeta banî hebû. Lenet be! Ger min ji dengên maşînên beriya çend xolekan dihat şik bibira û lê temaşe bikira, me dikariya em di qeta banî re baz bidin. Heta ku ew merdîwenê re hilkişiyan, emê derbasî avahiya din biban. Me dikariya em hinek cilên cuda ji Gûlay wan bigirin, carikan li xwe bikin û derkevin. Bes, êdî tiştek bi ‘xweziyan nedibû! Tenê ev fikirên xweş bûn, xeyal kirin jî xweş bû, lê niha jî rastiyek mezin li holê bû. Em ne li malê, li 1800 Evler’an û di odeya lêpirsînê de bûn. Niha ne dora wê bû ku ez li ser van bihizirim. Bila me wê demê bikira! Ji xwe aciz dibim, diviya em ev qasî erzan nehatiban girtin!

Hêj di demjêmêrên destpêkê de diyar dibû ku, rêbaza dijmin a derfetê nade mirov bihizire zêde dirêj nekir. Tiştên ku tê hizirîn, tê xeyalkirin, axaftin hemû bi hev re pênc-deh xolekan digire, an jî nagire. Nexwe wer diyar dibe hem ji bona me, hem ji bona dijmin dem gelekî girîng e. Her kêliya ji bona wan vala derbas dibû, ji bona me derfetê hizirandin, xwe amadekirin û bidestxistinê ye. Her kêliya tê berovajîkirin, wextê pey wê re jî erênî bandor dike.

Destpêkê bangî min kirin. Em ketin odeyek dawiya aliyê korîdorê yê rastê. hundir tije ye. Hemû koma ku ser malê de girtîn jî li wir bûn. Di ber xwe de dikenîn. Weke dê li meydanê şerê ga binêrin disekinîn. Lê belê, "temaşevan û ga amade bûn, bes matador nedixwiya!"

Yekê got; "niha dora me ye."

Yê din jî got; "de ka ketina wê ya hundir binêre! Çawa bi rik li me dinêre." Polîsê li ber maseyê qaxitek dirêjî min kir û got; "îmze bike." Min xwend, gelek tişt hatibûn rêzkirin. Min jî got;

"Ez îmze nakim. Tiştên ku di mala min de hatine girtin diyar in. Hinek tiştên cuda li vir hatine nivîsandin. Girtînameya ku li malê hatî îmzekirin hebû." Min jî ew qaxit bi pêkenokî avêt pêşiya wan. Ji vê nêzîkbûna min hêrs bûn. Dema pirsa nasnameya min jî kirin, min li hinek cihan weke ku kena xwe li wan bikim, wan biçûk bibînim bersiva wan da. Kêfa min ji biçûkxistina wan re dihat. Dibe ku min ev bi zanebûn jî nedikir, lê min dizaniya ku derbarê min de hinek agahî girtine û pirsên girêdayî îfadeyên hatine dayîn dikin. Ez jî wan cidî nagirim. Weke ku tiştên ew girîng dibînin, ez jî ti qîmetê nadim wan nêz dibim. Vê jî, ew diçewsandin.

Ev dema hev nasînê jî kin hat meşandin. Pir lez in. Şêwaza pirsên wan tê guhertin.

Li pey hev gelek pirsên weke “Em derheqê te de gelek tiştan dizanin. Cemîl Bayik, Metîn û Şahîn li wê malê dimînin. Hûn wê şevê bi hev re bûn. Ji wan qedehan jî diyar dibe ku hejmara we zêde bûye. Çek hebûn. We li kur veşartine? Tu jî, endamek serkeşê rêxistinê yî. Tu nikarî bi gotinên, ‘mirovek pêşverû û ronakbîrim’ me bixapînî! Hem ev pêşverûtî jî çiye? Mal, mala rêxistinê ye.”

Diyar e, hêj ne zelal bû bê ka çi dixwazin. Tiştên ku hîn bûne tînin cem hev, ji vir hewl didin min fêm bikin û nas bikin. Ne lêpirsîna esasî bû, pirsa hevalên ku beriya niha girtine dikin. Navê Zekî Budak, Riza Sarikaya, Aytekîn Tuxluk, Saîm Dursun, Hisên Taze, Elî Gûndûz dûbare dipirsin ka ez nas dikim an na. Nasnameyên wan jî şanî min dikin. Min got; “yek ji wan jî nas nakim.” Lê dibêjin dilxwede wan gotiye, ew min nas dikin û erka min jî gotine. Herî zêde li ser Elî Gûndûz radiwestin

Min got; “dibe ku min ji Dêrsimê nas dike, Dêrsim cihek biçûk e. Dibe ku navê min jî bihîstibe. Ev tiştek xwezayî ye.”

Dor hat Hamilî û Aytenê. Min jî got, ez Ayten ji Dêrsimê ve nas dikim, cîranên me ne. Ji ber nexweşe lewma hatiye Elezîzê. Îfadeyên min bi mantiq in. Dema bi zimanek mîsoger tê gotin, di pirsên nû de zehmetiyan dijîn. Ji ber neçar dimînin heman pirsan dubare bikin, herî zêde jî ew aciz dibûn. Bes, çawa elektirîke dan wan kabloyên bi tiliyên min ve girê dane, ez yekser çep û rast pekiyam û li dîwaran ketim. Kêfa wan ji qêrên min re dihat. Nexwe dema digotin; “tu bikene, gavek din jî emê bikenin.” Behsa vê kêliyê dikirin!

Carê av bi ser min de dikirin û cardin elektirîk didan laşê min. Ev jî dibû sedem ku zêdetir bihejim. Qîrên min jî her diçû di qirika min de diman. Pêlav û goreyên min jî hatibûn derxistin. Lê falaka ne dikirin. Piştî elektirîkê çend pirsên din kirin, gotin ku dê min rehet bernedin û divê ez baş bihizirim û birim odeyek cuda. Ode pir biçûk, di şêwazê hucreyê de bû. Lê di hundir de lawabo, dîwanên du qet ser hev, bataniyên pir qirêj, bi xwîn û doşekên bi xwîn hebûn. Texteyên şibakê bizmar kiribûn. Ji ber ew jî boyaxkirîne, weke dîwarekê bûn.

Piştî demekê dengê qîran hat, ev dengê zilaman bû. Hamilî dihat lêpirsîn. Wext dirêj dibû. Di navberê de jî dengê copan û ji ber elektirîkê dengê derdiket têkil hev dibû. Dengê Ayten ne dihat. Min wer dizaniya ku dê zêde bi ser wê de neçin. Ji ber dema pirsîn, "nexweşiya wê çiye?" Min gotibû; "ducanî ye." Baş bû min gotibû ducanî ye. Ji ber dema min li malê got, wan jî bihîstibû. Xeter bû, ne dibû êşkenceyê li wê bikin. Ayten nediket nexweşiya mehane. Ji bona pê qane bibin polîsên jin dixwazin, da ku bibin doxtor kontrol bikin. Dema polîsa jin dereng man, Ayten danîn cem min. Hem em bi îfadeyek wisa dikeniyan, hem jî Ayten hinekê jî şerim dikir.

Kesê Ku Hiş, Hest Û Daxwazên Wan Ne Li Gorî Rastiyên Wan Bin, Cesaret, Erdemtiya Wan Tine Ye Û Pê Bawerî Jî Nabe!

Dijmin di rêbazê yeke yek lêpirsînê de bi ser diket. Em jî wisa hînî rêbazên êrîşên dijmin dibûn. Her wiha hêj destpêk bû. Her çendî em nûbûna dijmin ya di vê mijarê de ber çav bigirin jî, wî jî ne dixwest her tiştî di carekê de xilas bike. Bi plan û bername tevdigeriya. Lê şerê bi dijmin re, ne tenê bi wextekê, bi bûyerekê re sînordar, an jî bi warekê ve girêdayî bû! Diviya

em li ser her kêliya jiyanê serwerbin, di navbera hemûyan de pirek rast ava bikin. Li gorî armanc, girêdana bi wê re qet qut nekin û tevbigerin. Ma xisleta şoreşgerî ya bingehîn jî ne ev bû? Dijmin heta wê rojê lêpirsîna gelek koman kiribû, têkildarî hemûyan jî di astekê de agahî girtibû. Nav û dengê êrîşên faşîzan ên mêtînger ên dewletê li dijî tevgerên gel, berxwedaniyan û çirûskên pêşketî ên şoreşger di salên 70'yan de dayî meşandin, hêj di hişê her kesî de bû.

Gelek bûyerên weke darvekirin, êşkence û gelek komkujiyan nîtelîka dewletê dida dest. Pergala lêpirsîna dema 12'ê Adarê bibû mijara pirtûkan. Di wan pêvajoyan de yên teslîm bûyîn, îxanet kirîn û li ber xwe dayîn hebûn. Îxanetên di dîroka Kurdistanê de îbret in. Navê Îdrîsê Bîtlîsî kesê herî bi lenet, yê vê eniya îxanetê ye. Pişt re behsa Rayberiyan dikin. Bi qasî ku serê yên herî nêzî xwe radestî dijmin bikin, ji mirovahiyê dûr dikevin û di astek herî ketî de îxanetê dikin. Ev di perwerde û dersan de tên vegotin. Her wiha encamên ku ava kirine jî bi mînakan tên pênasekirin.

Bêguman, ev aliyek rastiya me ya civakî bû. Lê dîsa jî nebûn bingehek atengiya ku rewşên nû rû bidin. Rast bû, di hemû têkçûn û binkeftinan de rolek sereke lîstibûn. Lê dîsa jî her tişt netenê bi van dihat pênasekirin. Ji ber hêza wan a bandorkirinê û zemînê wan bihêz bû. Di cihê xwe de birêxistin dikirin û bi vê ve girêdayî birêve dibirin. Di berxwedanî û raperînên civakî de pêşengiya çînî û bingeha xwe sipartinê girîng bû. Heta salên 1970'yan jî li Kurdistanê pêşengiya hemdem, rêxistinbûn û mercên şer tine bûn. Ne hatibû avakirin. Lewma îxanetan, di asta xwecihî de yekser û giştî de jî, ji gelek aliyan ve bandora xwe kiriye.

Di dîroka têkoşîna me de heta wê rojê, "rêhevalên bihurdar pêş ketine', yên hiltepîne û bi şêweyên cur be cur xwe ferz kirine derketine. Weke din jî li Dîlokê hinek kes û saziyên ku bandora sîxûr û provakatoran li ser wan hene û bi wan re di pêwendiyê de ne, derketin û hatibûn cezakirin. Li Dêrsimê jî rêxistina Têkoşîn xwest bandora xwe ava bike. Herî dawî li Elezîzê, ya rastî li Meletî Celal Aydin hebû. Bi van kes û saziyan re têkildar bû. Hinek notên wî ketin destên me. Di pêvajoya ku li Meletî dimîne de, êrîşî çi tiştê ku di hundir de dikare pêş bikeve kiribû. Bi nirxên me yên bingehîn ve dilîst. Ji bona rêxistinê pêş nexe, çi hewce be dikir. Lê ev jî zû hat ferqkirin û hat bêbandorkirin. Dema me pêşniyara xwe kir, me ti dudilî jiyan nekir. Ji ber Celal Aydin xayînek di nava me de bû. Diviya bihata cezakirin. Li ser esasê fermana partiyê hatibû cezakirin. Di pêkana vê biryarê de jî Elî Gûndûz û Şahîn cih girtibûn.

Şahîn jî, çûbû heta Depê (Qerekoçan). Ew jî ji bona tenê hinek pirsan bigire û bi armanca hinek agahiyan bigire çûbû. Ew têkilî mijarên din ne bibû. Elî Gûndûz piştî vê bûyerê zêde bêdeng bû. Yek-du rojan derûniyek cuda jiyan kir. Dibe ku cara yekê bû ev qas ji nêz ve kesek dikuşt. Belê, cara yekê bû kesek dikuşt! Bes ya girîng ew fîşek berdabû çi û kî. Ji ber ji hêla fîzîkî ve tinekirina kesekê negirîng bû. Ez bawerim di hundirê xwe de jî nakokî û hesabê vê dijiya.

Tolhildana şoreşgerî, kûraniya serwextiya çînî dixwaze. Ti nêzîkbûnên ku kîn, tol, hêrs û hezkirinên xwe li ser bingehek rastî nede sazkirin, ti caran hedefa xwe nabîne. Dê hemû bandorên wê bi kêlî û dem kin bin. Encamê jî nadin. Yên ku hiş, hest û xwestekên xwe bi rastiyan ve girê nedin, ber bi wê ve ne herikînin, cesaret, erdemtî û bibawer jî nabe.

Gengaz e ku di her mercî de kesayet werin nasîn û derbikevin holê. Xwedî kîjan xisletî dibin bila bibin, dê teqez aliyên ji hev cuda diyar bibin. Bes bila mirov di ferqa her tiştê ku tê jiyîn de be. Bila hewl were dayîn ku wateya wê were fêmkirin û bila bê zanîn ji çi encaman re rê vedike û were têgihiştin. Weke din jî ger hinek xisletên van zû derdixe holê û zelal dikin hatibin cem hev, negengaz e ku ew xwe veşêrin. Her tişt behsa mirov dike, her tişt mirov dide dest, her çav mirov dibîne û her guh mirov dibîhîse. Ji dengê dilê mirov û ji rengê xwîna mirov tê zanîn ku mirov çi hîs dike. Her tişt mirov dide dest! Ji ber mirov di wê kêliyê de her tişt jiyan kiriye û her tiştê girêdayî mirov derketiye holê. Ango kesayetek vala bûye!

Xwîna min ti carî li hember Şahîn gerim nebû. Hezkirin û rêzgirtinek ji hundir, gerim û xwezayî pêş neket. Ez liqay gelek kesayetên xisletên wî berovajî, nebaş bandor dike û sarbûn ava dike hatim. Vê jî navberek xwezayî ya li hember hev ava dikir. Lê belê, tê zanîn, rêhevaltiya wê demê xwîna me gerim dikir, agir berdida dilê me û girêdanên me jî weke agir dişewitand. Ji ber bingeha hevalbendiyê agir bû. Wî agirî em anîbûn cem hev. Her tişt rêhevaltî bû. Her tişt di nava şewata vî agirî de mezin bû. Şahîn jî endamek vê Tevgerê bû. Di nava koma hevalan a yekê ya li Dêrsimê de bû. Wê demê ti peywendiya me ya rasterast û nêzîk nebû. Piştî ku ez ji Dêrsimê derketim, em liqay hev hatin. Ya rastî hinekê jî min di vê pêvajoyê de ew nas kir.

Bandorbûna destpêkê girîng bû. Helwesta wî ya di civîna li Îzmîr Încîralti pêk hatî de, di hişê min de maye. Piştî wê jî şêweyên peywendî û nêzîkbûnên wî yên li Elezîz û Çewlikê ev

gumanên min kûr kirin. Şahîn aliyê dilê min ê qerisî bû. Biyanî bû. Ev jî biyanîbûnek ji hundir bû. Germahiya vî agirî li wî neketibû. Sekna wî ya di Kongreyê de hişt ku ez bi-axivim. Vegerê de min nêrînên xwe tenê ji hevalê Cemîl re gotibû. Min nekarîbû acizbûna xwe ya wê kêliyê di kongreyê de rave bikim. Min bertekên xwe tenê çend gotinên bi deng û hinek jî nêzîkbûnên xwe diyar kiribûn. Tenê ew qas bû!

Lewma girtina wî, weke ku dê tufanek rû bide di dilê min de guman ava kiribû. Bertekên min netiştek ji bona ketina dest dijmin bû. Kî dibe bila be ketina destê dijmin gelekî xirab bû. Tengaviyek bû. Bê tevdîrî hêj berdewam dike. Ji kêmasiyên me ders nehatibûn derxistin, qad nehatibû berdan. Gelo çima hêj Şahîn li wan malan digeriya? Di heman demê de li malên ku eşkere bûne dimîne! Bi Heyder Eroxlu re, li mala wan, li kolana Fewzî Çakmak tên girtin. Ev jî tiştek nakeve serê mirov e. Bes mijara ku hişê min tevlîhev dikir û ez aciz dikirim jî, tiştek din bû.

Wê rojê sibehê ez bi 'lêpirsînek baş re' derbas kirim. Li odeyek ku Aytekîn, Zekî Budak, Riza, Elî û Hamilî lê bûn, ez falakayê ve girê dam. Min ew ji dengê wan nas kirin. Dibe ku hinek din jî hebin. Çavên min girêdayî bûn. Mîsoger ên wan jî girêdayî bûn. Îfadeya min a 'ronakbîr im û mirovek pêşverû me' berdewam dike. Polîsan ji destpêkê ve bawer nekiribûn. Ji ber îfadeyên hinek din jî hebûn. Ew jî, ji min re digotin. Vê carê jî ji bona bidin bawerkirin, rasterast didan guhdarkirin.

Min di serî de zêde dengê xwe dernexist. Ne zehmet bû ku li hember darbeyên copan li ber xwe bidim. Bi copan li ranê min, nav lingên min, pişta min û ji kur bigirta bi hemû hêza

xwe ve li min didan. Êşên wisa bûn, mejiyê mirov ji hiş dibir. Lê çi dema yên me dest bi axaftinê kirin, ew gotinên qelsî û bi zorakî li pey hev hatin gotin û rêzkirin, ez ji hişê xwe çûm û teqiyam. Min dest bi dijûnan kir. Min hem ji wan re û hem ji polîsan re dikir. Lê min herî zêde jî dûjûn ji wan re dikir. Dûjûnên min dikir naveroka wan ne siyasî bûn. Baldar nêzî wê jî dibim.

Min dest bi qîrê û dûjûnan kir; "heywan no! Ez we nas nakim. Tenê Hamilî nas dikim. Ew jî, ji bona hevjîna wî nas dikim. Hevala min a malê ye. Ji ber Dêrsim cihek biçûk e dibe ku Elî min nas bike, lê ti peywendiyên me bi hev re tine ye. Heywan kurê heywanan! Ker kurê keran! Hûn çima îftîra li min dikin?" Min wisa bi gelek dûjûnan ve her der tevlîhev kir. Polîs poşman dibin, ji ber piştî wan lêdan û dûjûnan ji bilî Riza ti kesî gotinên xwe dûbare nekir. Ez ji odeyê derxistim, xwîna min zêde herikî, ji ber vê hinekê jî tirsiyabûn. Nexwe hinek tişt kêr dihatin! Nizanim çima, bes berpirsê wir Zafer Karaosmanoxlu tevlî lêpirsîna min dibû. Her tim di rola baviktî de nêzîk dibû. Bi pirsan, hewl dida ji aliyê şerê derûnî ve li min bixe. Weke ku ew di êşkenceyê de ne amade bûye tengezariyên xwe bilêv dikir, ji bona xwîna min zêde diherikî fanêlê xwe anî got; "pembû tine ye, dê tu vê bikar bînî?"

Bi tena serê xwe, tenê lêpirsînê de mayîn gelekî cuda ye. Ji ber mirov tenê bi dijminê xwe re rû bi rû ye. Bes ev anîna beramberî hev û lêpirsîna li cem hev jî ji kur derketibû? Min Riza fêm dikir. Li ser Elî jî îhtîmalekê dihizirîm. Lê yên din çima axivîbûn? Îtîraf ev qasî zû û berfireh bibû! Her kesî di heman astê de îtîraf nekiribû û ji hedê xwe derneketibû. Lê dîsa

jî yek gotin û yek daxuyanî ji bona dijmin bes bû, bikar danî û bandor li her kesî dikir. Wan hevalan weke berpirsên asta jorîn di komîteyên herêmî de cih digirtin. Lewma yek lewaziya wan, dê yekser bandora neyênî li girtiyên din bikira.

Carek din jî ez wisa nebirim. Heval jî bandor bibûn. Dema wan dibin cihê wan Aytekîn sond dixwe, dibêje; "ger carek din bînin beramber me, êdî ez qet na-axivim." Hamilî jî bandor û xemgîn dibe. Bes dê dijmin hinek qelsiyên ku derketibûn bikar baniya. Ev jî pir vekirî bû. Tiştek ecêb bû, min jî piştî wê bandora destpêkê her tim ji xwe re digot; "xweziya min her tim bibin beramber wan." Lewma rewşek wisa hebû, dema polîsan derheqê min de tiştek digot, min jî yekser digot; "zû bînin beramberî min, dixwazim rû bi rû werim." Min ev ferz jî dikir. Ev ferzkirin jî mirov ji hêla derûnî ve di astek bilind de digire. Tê wateya bi xwe bawerbûnê. Polîs jî li hember vê daxwaza min aciz dibûn. Ango ev rewş ji aliyekê ve ji bona mirov erênî bû, ji aliyê din ve jî dibe ku rolek xirab û berovajî derxista holê.

Di wê beramber hev hatinê de hinek tiştên ku moral xirab dikir hebûn. Her çendî bi temamî bêbaweriyek ava nekiribe, rêhevalên ku min herî zêde bi wan bawer dikir behsa peywendiyên xwe yên rêxistinî kiribûn. Ev jî erêkirina Riza, an jî yeke din bû. Lê dîsa jî bi dilek xirab nahizirim. Ez van jî weke lewaziyan dinirxînim. Di wê baweriyê de me ku dê pêşdetir neçin. Ji aliyek din ve jî ev bertek zêdetir cesaretê didin min, ez jî dibêjm; "ma ne înad e, ezê tiştekê nebêjim! Nikarin tiştekê ji min bigirin."

Ji bona ku Ayten zêde bandor nebe, zêde venakim. Lê piştî min ew jî biribûn. Di derheqê wê de jî hinek tişt hatibûn gotin. Bes li wê ne didan. Ji bona wan ya baştirîn li dijî Hamilî bikaranîn bû. Ayten jî di vê mijarê de bi guman bû.

Wê rojê dengê maşîn û dolmuşan, qêrînên weke heywanan û hengameyek hebû. Dema wisa dibû me dizaniya ku hinek nû anîne.

Ne ji xêrê re em di berbanga sibehê de birin lêpirsînê. Dengê me yê êşkenceyê bi wan didan guhdarkirin. Ji bona kesên nû tên êşkenceyek derûnî ya baş e û bandor dike. Ji ber qêrînên jinê her kesî cuda bandor dike. Bi hinekan re kîn, hêrs û sonda li dijî dijmin ava dike, bi hinekan re jî heta şaneyên wan tirs û xofê dide çandin. Ruhê tirsonek di hundir de binkeftinê pêl bi pêl bilind dike.

Em ji bona pêdiviyan çûn tuwaletê. Lê min nedikariya bimeşim. Mileke min Ayten, milê min ê din jî bekçî girtiye. Em wisa diçin. Li kêleka min a çepê li odeyek cuda, deriyê wê piçekê vekirî de, çavên min li Şahîn ket. Çawa ez dîtim lêvên xwe gez kir û ew çavên xwe yên tije tirs û xof baş vekirin. Min ji nişka ve ev halê wî dît. Weke ku nexema min e, min eleqeder nake rehet dimeşiyam. Mîsoger bi zanebûn derî vekirî hiştibûn. Di hundir de hinek kesên din jî hebûn. Gelo polîsan derûniya wî dipîva. An jî mizginiya girtina Şahîn didan min? Her carê digotin; “me girtine. Di destê me de ne! Me Cemîl, Hisên Topgûder, Apo tev girtine, di destên me de ne.” Bêguman ev jî rêbazek zextê bû.

Ti tiştî ev qasî bêhna min teng ne kiribû. Bi qasî ezê bêjim; “xweziya yeke din be, ne Şahîn be.” Bi min re li dijî Şahîn hîsek bêbaweriyê pêş ketibû. Gelo dibe ku ji ber hinek tişt di hişê min de mane, lewma ez van hîs dikim? Gelo çiqas rast bû ez yekser bê bawer nêz bibim? Belê, hinek hevalên ku ez ew qasî bi wan bawer bûm, axivîbûn! Bes na, baweriya min dîsa jî li hember wan hebû. Min ji xwe re digot; “ew wan lewaziyên xwe nagihînin asta jorîn.”

Gelo Şahîn li kur hatibû girtin? Weke din kî hebûn? Ji ber haya min ji wan nebû, ev jî bi serê xwe êşkence bû.

Tiştek ecêb bû, li cihê ku Şahîn lê bûya cesaret, hêz û baweriya min bi min zêde dibû. Carina mirov xwe li cem hinek kesan kêm dibîne, şerim dike, an jî hewayek vala derdikeve, baweriyek hevbeş, nêzî hevbûnek mirov bi aramî hîs dike. Mirov li cem hinekan tirsonek dibe, binyata kesayeta wan şikê ava dike. Mirov bi wan re bedewiyek hevbeş nabîne. Lê belê na, ev ruhê min heman weke ku dema ez û wî li Îzmîr û Çewlikê liqay hev hatibûn. Lewaziya gumana rêxistinî ya di kesayeta wî de dihat jiyîn û qelsiyên wî bêbawerî didan avakirin. Lewma di kêliyên wisa de gumana rêxistinî zêdetir jiyîn, di vê mijarê de zêdetir hişyarbûn, di kêliya ku ew xwedî dernakevê de, mirov zêdetir xwedî lê derkeve û bertekên parastinê zêdetir pêş dikevin. Ew halê wî em jî hişyar dikirin. Nexasim li cihek weke êşkencexaneyê de tirsek herî biçûk, gumanek herî biçûk û ruhê dudilî gelekî girîng bûn. Her lewaziya ku bi wî re dihesiyam, bi min re hêzek mezin ava dikir. Min ji xwe re digot; “ger ew van, ango dijmin kêfxweş bike, ezê jî bi înad dijmin biteqînim.” Na, ez pêşve li ser van mijaran nehizirîbûm û min plan nekiribûn. Her tişt jixweber

pêş diket. Di kêliya destpêkê min ew dît jî heman şêwaz bû. Dema min lingê xwe datanî ser erdê jan pê diket. Lê dema min ew wisa matmayî û reben dît, şêwaza meşa min jî hat guhertin. Zêdetir bi serbilind û zindî meşiyam.

Heman rojê, ber bi êvarî ve li kêleka odeya me lêpirsîna wî dikirin. Polîsan ji vê rêbazê re digot; "dana axaftin." Deng pir zelal tên. Guhên me jî li dîwara ne, em guhdar dikin. Çend caran dengê copan hat û Şahîn her tim gotina "kekê" bikar danî. Tenê ev bû! Berxwedaniya Şahîn (!) Ev qas bû! Pey wê re jî dest bi axaftinê kiribû. Dema min xwe nedigirt, min dîwar dida ber kulman, Ayten hişyar dikir; "neke, dê bibihîsin." Her wiha ez bawerim min di jiyana xwe de cara yekê ew qas dûjûn kirine. Ji ber tiştek din nebû em bikin.

Ez ne şaş bûm. Jixwe min ti caran baweriya xwe bi wî ketî ne anîbû û min jê hez nedikir. Heyder rast gotibû. Dibe ku Şahîn di wê dema binçavkirina Dêrsimê de ji ber bûyera bombekirina qereqola hatî kirin ku gelek kes hatibûn binçavkirin û lêpirsîna wan çêbûyî û êşkence xwarîn de xayîntî kiribe. Belê, belê, wê demê jî lênedabûn û ji polîsan re gotibû 'kekê'. Di pêvajoyên pey wê re jî berpirsyariya rêxistinê nedabû diyarkirin û helwesta wî ya di Kongreyê de bala min kişandibû. Gelo Rêbertiyê dizaniya? Ji ber Rêbertî sebrek mezin raber kiribû. Rêbertî her tim bi sebir bû. Mîsoger hewl dida wî fêm bike. Her wiha ji bona rêveberiya navendî hatibû hilbijartin. Tevî ku nehêjayî vê erkê bû! Ger hevalên din xwe paşve nevekişandiban, Şahîn jî nedikariya wisa bike. Bi rastî jî ew çi hirs, bergirî û pêşbaziyek kirêt bû? Ma çi feydeya vê hebû ku ez niha şîrove bikim? Îxanetê benê xwe qetandibû. Encamên ku evê ava bikin girîng bûn.

Serê min diteqe. Tiştên ku behs dike ne tiştên wisa ji rêzê, an jî tenê hinek xebatên wî û tenê herêmên Elezîz û Dêrsimê nagire dest. Ne tenê lewaziyek li hember êşkenceya polîsan jî bû. Jixwe polîsan êşkence jî lê ne dikir. Bes wî her tişt rast û weke heyî digot. Çima li Elezîzê ye, çi demî hatiye, çi demê çûye Agirî, çi kiriye, cardin vegera xwe ya Elezîzê tev bi saetan vegotiye.

Tika dikim, qet nebe, bila behsa tiştek din neke! Xweziya li şûna Şahîn, hevalê Cemîl an jî hevalek din bihata girtin! Ev ketî cesaretê dide dijmin. Dijmin derheqê me de ti agahî ne girtiye, me jî zêde nas nakin. Dikare me jî bişibîne rêxistinên çepgir ên din. An jî ji ber agahiya wan tine bû, dibe ku pirs jî nekiriban. Gelo çima ev mirovê ketî tevî ku girtin hebûn ji Elezîzê derneketibû û neçûbû?

Paşê vegotinên xwe berfireh kir. Hinde behsa tiştan dike, bê ku polîs pirsan jê bike, her tiştî bi hemû ziraviyan ve dibêje. Dor hat Kongreyê. Ez li wir dîn bûm, min serê xwe li dîwaran dida. Nikarim li ser hêrsên xwe serwer bim. Dixwazim biqîrim, lê nikarim. Ji bona dengê min dernekeve lêvên xwe gez dikim. Qirika min bi qasî biçire dişewite. Ayten mat bû. Ji rewşa min ditirse. Dibêje; "tu ti dînîtiya nekî, divê ev zilam ferq nekin." Haya Ayten ji radeya îxanetê ya ev qasî giran bûyî nebû. Li gorî wê tenê îtîraf bûn. Bes rewşa wê cuda bû û gelek tişt dizaniya. Cara duyê min got; "ezê ji înada wî derkevim, bêjim ez endama partiyê me û biparêzim." Ev destpêk bû, ne diyar bû ku dê weke din çi derkevin holê. Hêj hevalên din ne di ferqa rewşa heyî de bûn. Ji cihê ku ew lê diman, axaftinên Şahîn nedihat bîhîstin. Di heman kêliyan de li odeyên din lêpirsînên cuda jî dihatin kirin.

Belê, bawerî, vîn û berjewendiya rêxistinê li kur mabû? Ev îxaneta Şahîn a ketibû heta nava şaneyên wî, ber bi heta kur ve diçû? Ji ber tiştên ku Şahîn vegotine, dijmin dev ji me çend kesan berdabû. Jixwe Şahîn behsa her kesî dikir. Bes pirsgirêk ne tenê Şahîn bû. Ya girîng her kes têkil îxanetê kirin bû. Ji ber ya dijmin dixwest jî ev bû.

Rojekê sibehê zû bi ser qelebalixa polîsan a li hewşê, derketim ser dîwaneyê, min bi şibakê re li derve nêrî, bi dehan kes ketibûn rêzê. Polîsan panîk ava dikir, her yekê ji aliyekê ve diqêriya; "zû nasnameyê xwe derxînin, bila tiştek li ser we nemîne. Ger bimîne dê ne baş be." Her kesî tiştên di berîka xwe de danîn erdê. Min Hisên Taze, Îlhan, Naîl û çend kesên din nas kir. Çavên min li yê dawiya rêzê ket. Ez mat mam, min qet bawer nekir. Hevalê Cemîl bû. Pir rehet bû, destê xwe dane pişt xwe û cilên taxim li ber wî ne. Tenê rîbata (kirewata) wî tine ye. Hem kêfxweş bûm, hem jî xemgîn. Carek din min ji xwe re got; "xweziya ne Şahîn, bila hevalê Cemîl bihata girtin. Dijmin jî nedikariya agahiyên wisa bigire." Nêzîkbûna min jî ehmeqî bû! Ji ber girtina qadroyan bandora neyênî li ser rêxistin û têkoşînê dikir.

Polîs bi zanebûn mijûl dibûn, li nasnameya dinêrin. Hinek dikevin hundir û derdikevin. Hinek polîsên derve li şibaka odeya kêlekê dinêrin. Diyar e hinek ji hundir ve li wan dinêrin û didin dest. Min di wê kêliyê de dua dikir, ji xwe re digot; "xwedê nekê, bila hevalê Cemîl neyê girtin." Ji nişka ve hestên cuda bi min re hatin jiyîn. Her kêliya ku Şahîn dihat bîra min, min nedikariya tiştek din bihizirim.

Piştî ku demek din dan rawestandin, komek ku Hisên, Naîl, Îlhan û Ercan di nava wan de, cihê kirin. Ji yên din re jî gotin; “de zû bikin, li dolmuşê siwar bin.” Ferman dan polîsan ku wan jî bibin navendê. Ev dihat çi wateyê? Ma dê bihatan berdan? Cihên herî xeternak mal bûn. Baş bû, nexwe nas nekiribûn. Ji ber hevalê Cemîl her tim li aliyê din dinêriya, kêlekê disekinî, ew nas nekiribûn. Dibe ku hinekê jî bi wijdan nêz bibin, ji ber vê navê wî nedabin. Tişta ecêb, şîroveyên cuda tên bîra min.

Li ser esasê îfadeya heman rojê hatine girtîn jî gotibûn ku min nas dikin, carek din ez birim lêpirsînê. Polîs kêfxweş bûn. Digotin; “me girtin, Cemîl Bayik û Hisên Topgûder di destê me de ne. Weke bilbilan di-axivin. Tu vala li ber xwe didî.” Ger niha min bizaniya hevalê Cemîl ji Elezîzê derketiye û cihê wî saxlem e, dê min bigota; “xwediyê mejiyê çûkê, hevalê Cemîl çû, ji destê we derket.” Xala herî xweş a min ew biteqandan ev bû. Lê min jî zorê xwe girt. Pir baş dihat fêmkirin ku çawa derewan dikin. Dem bi dem heman tişt digotin. Ger mirov bawer neke jî, weke îhtîmalekê dihizire û ev jî acizbûnê dide avakirin.

Rojên min bi lêpirsîn û êşkenceyê derbas dibin. Dawiya binçavkirinan nayê. Êdî hatiye rewşek wisa kî mirovê jê şik dibin digirin, tînin malan. Bes ên UKO(Artêşa Rizgariya Netewî), dosya UKO cuda ye! Ger navê hinekan bişiba hev, ji nêz ve an jî dûr ve şibandinek û pêwendiyek hebe bes e ku bigirin! Rojekê ji ber navên wan dişibin hev kesek anîbûn. Em nizanin çiqasî di hundir de maye û êşkence dîtiye. Lê rojekê sax li derve lingên wî xas, li binya şibaka me êşkence lê kirin. Ne tenê êşkenceyên bi rêbazên elektirîk, aski, felaqe bûn, lê li

ser organê wî yê cinsî û hemû bedena wî tiştên ji dervî mirovatiyê dihatin kirin. Li kuderê gotinek ketî hebe, li kuderê tiştên ku mirovan bixe hebe, hemû pêk anîn û paşê jî berdan. Ne diyar bû ku mir an jî ma. Di wan deman de mirin jî pir dihatin jiyîn. Carekê ji ber dizanin zilamek dê bimire, di kêliya dawî de berdabûn. Zilam çawa digihêje mala xwe dimire. Piştre bûyerên wisa gelekî hatin jiyîn.

Di rojên destpêkê yên em hatin binçavkirin de, êrîşek li dijî doxtorê nexweşxaneya dewletê Musa Duman pêk hatibû û birîndar bibû. Hinek kes jî ji bona vê bûyerê anîbûn. Doxtorek faşîst bû. Beriya niha ji bona nedamê TÎKKO (Artêşa Komînîst-Gundî ya Karkerên Tirkiyê) Pîr Ahmet Solmaz ê di êşkenceyekê de komayê de bûye, rapora baş e dide. Her wiha tevî ku Pîr Ehmet di wî rewşê de ye, doxtor polîs paqij dide nîşan! Piştî wê jî Pîr Ehmet di nexweşxaneyê de jiyana xwe jidest dide. Ev çalakî jî ji bona tola wî hatibû lidarxistin. Hewl didan vê çalakiyê jî bavêjin ser hinek din.

Îxaneta Şahîn û êşkence bi hev re dimeşiyan. Tiştên wî digot esas dihat girtin û wisa lêpirsîn dimeşandin. Her roj hinek kesên nû danîn odeya lêpirsînê ya kêleka me. Lê Şahîn li cihek din bû. Li cihê ku lê dima agahî dida polîsan, da ku tiştên jibîr kirine ji wan re bêje bangî wî bikin. Êdî rewşa wî ji aliyê hevalên din ve jî dihat zanîn. Bes her kesî di astekê de hinek tişt qebûl kiribûn. Îfade erê kiribûn. Ma dikariyan bi vî halî ve, rewşa Şahîn jî rast binirxînin? Bes ferqek di navbera wan de hebû. Di navbera wî ku rêxistin ev qasî ketî da dest û ya kesên îfade dayînê de lewazin ne yeke. Diviya her kes di ferqa vê lewaziyê de be, da ku îfadeyên xwe zêdetir nekin. Jixwe yên ku zêdetir ew rih bijiyan dê ‘bibûna Şahîn!’

Zafer Karaosmanoxlu jî her tim dihat cihê lêpirsîna me, şêwazê ‘nerim’ dimeşand. Ti carî ji nîqaşa ser pêşverûtiyê aciz nedibû. Her tiştê weke ez di nava komîteya herêmê de, berpirsa komîteya jin, xebatên propaganda-ajîtasyonê me, min civîn lidarxistine, erka didim hinek din, tevlî Kongreyê bûme û weke din çi hebe tev hatine gotin, bes ez hêj dibêjim; “mirovek ronakbîr û pêşverû me” û Ayten jî weke hevala xwe ya malê destnîşan dikim. Min digot; “jixwe mirovek di halê xwe de ye.” Paşê jî min ew kir kesek “burjuvaziya biçûk.” Min ew weke kesek ku naxwaze bibe şoreşger îlan kir.

Hamilî û Ayten hêj negotibûn ku mala lê dimînin li Elezîzê ye. Ew mal saxlem e. Baş bu kesê pê nedizaniya. Em rojan û saetan hizirîn; “gelo kes wê malê nas dike, dê derkeve holê, an na?” Tenê Hisên û Şahîn dizaniyan. Mifte jî li cem Hamilî, an jî Ayten derketibûn holê. Bes dibêjin ku ji Dêrsimê hatine. Hinek tişt hatine qebûlkirin. Ji vî alî ve xeter nayê dîtin. Dîsa jî gumanên min çêdibin. Carê Ayten dibin. Ji ber êşkence li wê nayê kirin, leşkerên derve aciz dibin! Ji yek nobedarên li ber şibakê ji Çermûkê bû. Navê wî Murad bû. Got; “ez Kurd im. Ji Çermûkê me.” Paşê pariyek nanê di destê xwe de di şibakê re avêt hundir. Me xwarin ne dixwar. Jixwe xwarinên wan jî rezîl bûn. Bes ne ji bona xirab bûn, me ne dikariya em bixwin. Ez bawerim haya leşkerê bi navê Murad ji wan xwarina tine bû. Dibe ku bi mebesta peywendiyê wisa nêz dibû. Lê wî xwestibû min hişyar bike. Heman tişt leşkerek ji Serhedê jî gotibû. Her du jî Kurd bûn. Gotibûn; “baweriya xwe bi wê jinê neyne. Ew sîxûr e. Qet, zilehekê jî li wê naxin. Çayê didinê, cixareyê didinê, bi hevjînê wê re tînin cem hev, hevdîtinê dikin. Li gorî wê nêz bibe. Li cem wê qet tiştekê ne-axive. Dê biçe giliyê te

bike. (Diyar bu ku ev gotina ‘gelacî (gammaz)’ li leşkeriyê hîn bûne)” Min jî ji wan re got; “na, na. Hûn şaş in. Ez wê nas dikim. Jinek di halê xwe de ye, ne yeke xirab e.” Tevî vê wan di çavdêrî û şîroveyên xwe de israr kirin.

Bi gelemperî bawerî bi leşkeran nedibû. Diviya em hişyar nêz bin. Lê dibe ku hinek leşker jî xirab nebin û durist nêz bibin. Leşkerên ji Çermûk û Serhedê di nobetên xwe de, piranî dema bi tenêbûn dihatin. Bi dorê û nobeta hev digirtin, derbarê mijarekê de hişyarî dikirin û bi şêweyek dûr disekinîn di-axivîn. Nêzîkbûnên wan ne xirab bûn. Zêde bandor dibûn. Li gorî wan digot, dengê min ê di êşkenceyê de bandor li wan û gelek leşkeran kiriye. Carna jî dibêjin; “Bîjiyên kehban! Çi ji te dixwazin?” Bertekên xwe jî ne diveşartin.

Ez pir hizirîm, gelo dikarim bi destê Murad not bigihînim derve? Li mala Hamilî wan a li ber nexweşxaneyê arşîv hebû. Divê teqez ewder were paqijkirin. Ji ber li qeta duyê bû, kesî nedikariya ji derve de bikeve malê. Ez ne bi hêvî me ku yên derve malê paqij bikin. Bi taybet Metînê Ker (saxir) rewşa malê dizaniya. Gelo dê tevdîr bigire? Ez jî di vê mijarê de bi guman im. Yên herî guncav Nadîre ew in. Leşker dikariya pir hêsan navnîşana wan binase. Min ji leşkerê ji Çermîkê re got min ji bona xizmên xwe notek biçûk nivîsandiye, ma dikare bigihîne wan, qebûl kir.

Mal li kolana Rizaîye ye. Ji bona fêm bikin min jî nivîsand; “rewşa xaltîka min Raziye çawa ye? Li gorî texmîna min nebaş e. Biçin serdana wan û eleqeder bin. Di paqijkirina malê de alîkarî bikin. Mixabin nexweş e…” û hwd hinek tiştên din. Min bi zanebûn parçeyek ji beşa qaxida not ser nivîsandî vala hişt, weke din jî min têlek pora xwe jî kir navê û wisa band kir. Ger

were jêkirin dê ji qaxedê fêm bibe. Leşker not girt û kir berîka xwe. Got; “tu mereq neke, ezê bi destê xwe bidim wan, bersivê jî ji te re bînim.” Ev jî hêviyek bû. Ger not bihata girtin jî ti xeternakiya wê nebû. Ezê bêjim xizmê Nadîre wan im. Jixwe navê wê jî hatiye dayîn. Bes paşnavê wê hatiye tevlîhevkirin. Di nava du rojan de bersiva nota min hat. Di notê de nivîsandibûn; “tu mereq neke, em çûn cem xaltîka te, alîkariya dihat xwestin me kir. Bes Metîn çûye gund, wan jî mereq neke.” Kêm jî be bi vê bersivê hedirîm. Kêfa min hat. Êdî mal bihata dîtin jî ne girîng bû.

Piştî ez çûm tuwaletê zû derketim. Zêrevan li benda Ayten bû. Min jî firsendekê de li şibaka aliyê Hamilî wan lê diman nêrî. Korîdor bi şêweya tîpa ‘L’ ye. Dema derî tê vekirin ew dibihîsin. Jixwe ew jî bi kuna derî û şibakê re çavdêriya derve dikin. Rasthatinek xweş bû. Aytekîn û Hamilî li ber şibakê ne, me silav da hev. Aytekîn dikeniya. Hamilî cudatir bû. Dikene, lê yekser li pey wê bi dilek şikestî got; “me piştî wê rojê tobe kir. Me soz da. Dê carek din nekarin wisa li hemberî me êşkenceyê li te bikin. Bes te zêde dûjûn ji me re dan, vê jî jibîr neke!” Aytekîn jî got; “baş kir! Wan dûjûnan aqilê me anî serê me.” Hamilî jî got; “Seko xwîşka me ya mezin e. Ma çiye dûjûn ji me re daye. Tiştek nabe.” Min jê re got; “ma tu dizanî mal hatiye paqijkirin?” Kêfa wî hat û pirsî ez ji kur hîn bûme. Min jî got; “leşkerek baş heye. Min not şand û bersiva wê hat. Bawerim Metînê Ker jî çûye çolterê.” Min ev hemû di yek hênaseyê de gotin. Rihê her duyan jî dirêj bûne û pir jar bûne. Lê ew jî herî zêde li ber zeyîfbûna min dikevin. Gotin; “ li xwe baş binêre. Dê her tişt baş biçe.” Ez jî paşê çûm. Nêrînên me xweşik û watedar bûn. Tevî hemû kêmasiyan germahî û baweriya rêhevaltiyê hebû.

Carê hevdîtinên wisa baş in. Ji bona polîs tevahiya şevê êşkence dikin, sibehan kêm jî be bêdeng dibe. Em rewşa Şahîn jî axivîn. Gotin; “em jî axaftinên wî guhdar dikin.” Weke din jî gotin ku wer dihesin wî dibin hinek cihên din jî. Lê belê, polîs naxwazin rewşa Şahîn eşkere bikin. Lê polîsên ku dixwazin îfadeyên wî, bixin malê hinek din jî hebûn. Vekirî bû dê wî bi her şêweyî bikar bînin. Divê em pir hişyar û baldar nêz bibin.

Min heta roja yanzdeh û duwazdehan jî, rola xwe ya ‘jina pêşverû’ lîst. Tevî her tiştî baş diçû. Arşîv jî ne hatibûn girtin. Belgeyek nivîskî jî di destê wan de tine bû. Her çendî Şahîn esas bigirin, mirov dikare hêcetên xwe yên redkirina tiştên ew dibêjin diyar bike. Lê polîs di mijara malê de bi ser me de tên. Herî dawî Hamilî qebûl kir ku mala wan li Elezîzê ye. Mifte jî hene. Li malê digerin û her tiştî desteser dikin. Arşîv tê dîtin. Arşîva ku behs jî dikim, nenivîsên ew qasî zêde ne. Hinek nivîsên ku di boriyên sobê û hesinên şibakeyan de hatine veşartinin. Hinek nivîsên min ên bi dest jî hene. Lê polîsan yekser behsa wan nekir. Yek-du rojan lêkolîn dikin ew çine û yên kîne. Paşê hîn dibin. Jixwe tiştek ku derbarê herêmê de nehatiye gotin nemaye. Şahîn tiştê ku dizane dibêje. Krokiyan derdixin. Riza jî di asta jêr de tiştên ku nayên zanîn dibêje. Weke din jî yên hatine girtin piranî kesên ku di komîteyên jêrîn û koman de cihê xwe digirine. Ango navên li ser esasê îfadeyan hatibûn girtin, hevûdû temam kiribûn. Ez bawerim ji bona dijmin jî rewşa herî hêsan ev rewş bû!

Di nava nivîsan de di derbarê jinan de hinek nivîsên bi dest jî hene. Beriya niha li Şankuş (Çûngûş), Çermûk, Sîwerekê û cihên hwd de binyata civakî-sosyal û rewşa jinê ya di navê de

hatibû lêkolînkirin. Ew nivîs jî keçên ku ji wê herêmê bûn û peywendiyê me bi wan re heyî nivîsandibûn. Ew nivîs di nîtelîka raporan de bûn. Kî pêwendiyên me yên bi dibistanan re çiqasî dizane, tev ji polîsan re gotibû. Tenê yên nas nedikirin, an jî nav û paşnavê wan nedizaniyan mabûn. Weke din jî lîsteya navan hebû. Bes paşnavê wan nehatibû nivîsandin. Ev jî baş bû. Nexwe dê gelek keçên ku em li dibistanan bi wan re eleqeder dibûn bi aniyan. Bi gelemperî dema digotin tiştên têkildarî jinê de "Sakîne dizane", bi rastî jî polîsan ew beş ji min re hiştibûn. Lê min jî ji xwe re digot; "ewê nekarin yek keçê jî bînin û ezê vê kêfxweşiyê bi wan nedim jiyîn."

Ayten agahiyên derbarê malê de bi qasî hîn bûye ji min re jî dibêje. Carê dema polîs jî dihatin, dixwestin ji hêla derûnî ve bandor li me bikin, ji devê wan derdiket bê ka çi desteser kirine. Digotin; "mala wan kesên te digot mêvanê te ne û ducanî ye, bê gunehe derket holê. Mala rêxistinê ye, çi û çi derket holê! Temam me ev bindestî fêm kir, lê jin çima sê caran bindeste?" Û kena xwe dikirin. Ev jî di nivîsên ku desteser kirine de xwendine. Her wiha polîsan digot; "emê hemû keçên di komîteya jinê dene bigirin. Hinek ji wan di destên me de ne. Nizanim komîteya taxê…Hucre…" û hwd hinek tiştên din jî parçe parçe dibêjin. Lewma ez jî hewl didim bînim bîra xwe ku li wê malê çi hebûye. Dizanim ku ji ber gumana dibe ku xeter be, me zêde belgeyên nivîskî nedihiştin malê. Dîsa jî pir zelal nizanim û tiştek jî nayê bîra min.

Carekê destnivîsa min girtin. Di serî de jî girtibûn. Min wê demê jî tewandî û tîpa a bi dûvik dinivîsand. Hinek tîp bişibin hev jî, bi gelemperî nivîs ne yeke. Zêde nivîs jî bidest neketine.

Herî zêde dibe ku di şemayên navan û rêxistinê de destnivîsa min hebe, ew jî herî zêde Elî Gûndûz nivîsandibûn. Destnivîsên wî bûn. Şemaya komîteya herêmê hebû. Me piştî nîqaşan krokiyek derxistibû. Bes ew reşkirinek despêkê bû. Jixwe dînîtî bû ku mirov belgeyek nivîskî li cem xwe bihêle. Me ji navendê re ragihadibû, lewma me dikariya em di hişê xwe de bigirin. Ecemîtî û bê tevdîrî jî ancex evqas dibe!

Ya rastî polîs jî ji aliyekê ve ecemî bûn. Wisa xwe berdane nav karên xwe û hinde her tiştî tevlîhev dikin, gelo em hinekê bi fêlbaz nêz bibin, hewaya neyênî ya destpêkê ava bûye bişkînin nabe? Qet nebe dê îtîrafên di asta kesan de kêm bibin û kûr nebin. Ji ber bandora îxanetê ya derûnî girîng e. Dijmin jî wê baş bikar tîne, herî zêde jî ji qelsiyên me yên hundirîn sûd werdigire. Nexwe ne ku her tiştî pir bi hostane dike. Tenê giraniyê didin lêdana çors û êşkenceyê. Her wisa pirsên zêde çors dikin. Rewşa wan a pêvajoya destpêkê wisa bû. Lê her ku wext derbas dibû, cidiyeta her tiştî jî zêde dibû. Dijmin bi komên nû ve lêpirsîn berfireh kiribû. Di vê navberê de jî Şahîn pêşengiya dijmin dikir. Ji ber wî di lêpirsînê de her kes, ji her alî ve dabû dest -jixwe wî jî piranî her kes nas dikir- behsa kargeriya rêxistinî kiribû, êrîşên dijmin jî hêsan dikir û pêşiya wî vedikir.

Dema binçavkirina rojane qediya ye. Cara duyem wextek binçavkirinê ya panzdeh rojan dixwazin. Vê mijara dirêjkirinê jî polîs bikar tîne. Gefan dixwin û dibêjin; “hûn di destê me de ne. Heta ku hûn hemû weke bilbilan ne-axivin, hûn nayên berdan. Li gorî wê nêz bibin!” Em jî bi vê mebestê hîn bûn bê ka çi dibe. Ji bilî vê jî her tim behsa operasyona Dîlokê dikirin. Bi dengê bilind û kêfxweşî digotin kî li Mêrdîn, Amed, Riha,

Dêrsimê û li ku derê hene yek bi yek hemû girtine. Heta carê nav jî didan, da ku van derewên xwe bidin bawerkirin. Her yekê ji ber xwe bi me re di-axivî, “me xilas kir. Me UKO xilas kir. Ma hûnê dewleta Kurdistanê ava bikin? Ew Apo’yê we pê bawer dikir di destê me de ye…”, yekser pey wî re yê din digot; “de bila Apo bê we rizgar bike. Bes ew li pey keç û jina ye. Di avahiyên xweş de dijî. Hûn bi çiyê wî bawer dikin?” Û bi van gotinan jî hevûdû vala derdixistin.

Rojekê polîsan ez û Ayten bi hev re birin. Li odeya kêleka me Hamilî û Elî Gûndûz hebûn. Ya rastî lîstokek zêde xirab bû, lê destpêkê bi armancek cuda ne dixwiyan. Jixwe ez, bi Hamilî û Ayten re li malekê hatim girtin. Ez ti caran heta wê rojê jî bi Elî Gûndûz re wisa vekirî rû bi rû nehatibûm. Carekê biribûn cem komekê, lê ji wir jî encam negirtibûn. Ez li ber derî sekinîm. Min ji xwe re got; “ez bawerim rêbazê lêpirsînek nû ye.” Vê carê çavên me vekirî bûn. Weke ku bêjim, ‘çi heye?’ li çavên Hamilî dinêrim. Polîs jî bertekên ku di çavên min de diyar dibin ferq kir. Dîsa serkêşê wan Zafer Karaosmanoxlu got;

“Werin, wisa werin. Wisa weke ku tu me tewanbar bikî nenêre. Wan bixwe tika kirin. Hamilî xwest hevjîna xwe bibîne. Elî jî xwest te bibîne.” Min jî got;

“Ezê bi kesek ku nas nakim re çi bi-axivim.” Hewl didim bi sebir bi-axivim û pirsgirêka heyî jî fêm bikim.

Got; “Bes ew we nas dike. Ne wisa Elî? Elî got; “Sakîne were rûne, min xwest hevdîtinê bikim.”

Min cardin li Hamilî temaşe kir. Cemidiye. Ayten jî mat maye. Ti hewayek odeya lêpirsînê tine bû. Weke cihê serdanê bû! Wê demê divê em çi bikin? Gelo ez bêjim; “hevdîtinê

naxwazim" û ber bi derî ve biçim? An jî bê ku rola jina pêşverûyî bilîzîm û nêzîkbûnên tûj raber bikim, hewl bidim rewşa heyî fêm bikim? Cardin Elî got;

"Min xwest." Carê jî di navberê de bi zimanê dimilkî dibêje, "were hinek tişt hene." Lê dîsa min berê xwe da polîs û got; "hûn dîsa lîstokekê dilîzin? Hûn gelek mirovên cuda derdixin. Tiştên ecêb dibêjin. Lewma baweriya min tine ye. Ez jî masumane dibêjim!

Bi daxwaza xwe rûniştim. Elî destpêkê zêde muhafazakar nêz bû. Nedizaniya ku ji kur destpê bike. Paşê got;

"Em hinekê bi-axivin dê baş be. Ez bawerim haya te zêde ji pêşketinan tine ye. Şahîn her tişt îtîraf kiriye. Jixwe li cem me jî yekemîn Riza îtîrafkar derket. Li malê jî hinek nivîs derketin. Me hinek girtin ser xwe. Em neçar bûn di astek zerar nedê de hinek tiştan qebûl bikin. Her tiştê derheqê te de jî hatiye gotin. Me jî got em bi hev re di heman komîteyê de kar dikin. Bes mijûlbûna te zêdetir bi jinan re bûye. Ev erk jî nû hatibû dayîn…" û hwd hinek tiştên din rêz kir.

Çawa çêbû? Temam, ma ev jî ne îtîrafkarî bû? Ma ev jî ne erêkirina Şahîn bû? Ez zêde hêrs bûm. Carê dengê min jî bilind dibû. Polîs jî li ser masê weke ku bala wan ne li ser me ye nêz dibûn. Ode mezin bû, bes li cihê ku rûniştibûn çavên wan û guhê wan jî li ser me bû. Elî dîsa dest bi gotinên xwe kir;

"Dê polîs zêde bi ser te de were. Dê te rehet bernede. Em dikarin hinek tiştan qebûl bikin. Em dikarin wisa rêxistinê biparêzin." Min jî got; "gelo parastina rêxistinê çawa ye? Dê wisa were parastin? Ezê parastina siyasî bikim. Îxaneta Şahîn bandor li her kesî dike. Dijmin her tim derûniya 'rêxistin çû,

xilas bû’ bikar tîne. Ji ber gelek hevalan hinek lewazî raber kirine, dikarin bikevin nava vê derûniyê. Na, ezê parastina rêxistinê pir vekirî bikim. Jixwe tiştên din negirîng in. Hemû sirên me yên rêxistinî hatine dayîn. Ti wateya hebûna di komîteyê de tine ye. Dixwaze bila îfadeya hemû cîhanê li ser min hebe.” Elî ev weke dînîtiyê nirxand, bes dîsa jî got; “tu dizanî.” Di vê mijarê de polîs aciz bû. Dihat fêmkirin ku em her du jî lihev ketine. Em pir baş jî nîqaş nakin û di navbera me de jî ti hewayek sohbetê tine ye. Jixwe ez jî rabûm, min got; ez dixwazim biçim cihê xwe. Ayten jî paşê hat. Me bi hev re hevdîtin şîrove kir. Polîsan lîstoka xwe dilîst û em jî ketibûn nava wê lîstokê. Tişta ku dijmin nedikariya bi êşkenceyê bike, wisa bi narînî û nerim dida kirin. Polîs ne ehmeq bû. Jixwe Ayten hevjîna Hamilî ye, dê her tim li dijî wî bikar baniyan. Gelek caran gefên weke “emê dest bavêjin te” hene. Çeka ku polîsan di lêpirsînê de li dijî jinan bikar danî, mijara çeka dest avêtinê bû. Ev her tim digotin. Êdî em jî fêrî gefên wan ên; “emê cop bixin we” bibûn.

Ayten jî got, Hamilî jî hinek tişt pejirandine, zêde li Elezîzê nemaye, digeriya, gotiye Ayten jî girêdayî min kar kiriye, haya wê ji nivîsên ku ji malê derketine tine ye, haya min, Elî û Metîn ji wan heye. Ango tiştek ne girtiye ser xwe. Pirsgirêk ne ew bû hinek bi hêsan xilas bibin, pirsgirêk ew bû ku diviya peyendiyên rêxistinî derneketiban holê. Dîsa pirsgirêk ‘hêsan rizgarbûna’ hemû hevalan bû. Her tişt têra xwe tevlîhev bû.

Polîsan ji her kesî re pirs amade kirine. Îfadeyên nivîskî ji me dixwazin. Gelo dê em derxistan cem serdozgeriyê? Gelo dê wisa lez her tişt bi encam bibe? Pêşketinên ku rû didin, diyar dikirin ku dê pêvajoya lêpirsînê bidome. Her tim operasyon û serdegirtin dihatin kirin. Ji komên din zêde kes nema. Wan zû diberdin. Demekê ji Xozat û Çemîşgezek hinek xwendevan û mamoste anîbûn. Di nava wan de jin jî hebûn. Piraniya wan hatin berdan. Polîs bi taybet li ser me radiwestiya. Pirsên têkilhev û ecêb dihatin kirin. Ji malbat, çend xwîşk û bira destpê dikir, heta asta di nava rêxistinê de, armanca rêxistinê, kî hatine bandorkirin, kî di nav de ne û wisa rêze pirs hebûn. Di paraznameya nivîskî de destnivîsa mirov zêdetir bi ewle bû. Derfetên guhertin û serve zêdekirinê tine bûn. Herî zêde dê ne-ecibandan û biqetandan. Ew jî ne girîng bû. Ez jî dikarim vê weke firsendekê binirxînim, bêjim şoreşger im û armanca rêxistinê biparêzim.

Li ser rewşa min a zewacê ku çima cihê bûme jî radiwestîn. Digotin; "rêxistinê tu cuda kirî. Mîsoger tu di nava rêxistinê de yeke di asta girîng de yî." Her tim ev bikar danîn. Min jî ji wan re got ku ez bi xwesteka malbatê zewicî me, demekê li Îzmîrê mame, ji bona me li hev nekir cihê bûm. Cardin li ser vê mijarê disekinîn. Heta ji emniyeta Îzmîrê sabika min pirsîn. Mixabin derket holê ku di girtîgehê de mame, du caran jî hatime binçavkirin. Bes ev jî girevên karkeran ên asayî bûn. Jixwe min ji wan re gotibû ez kesek pêşverû me. Min dikariya li kur be li dijî bêmafiyê derkevim. Cardin di nava pirsan de dipirsîn ku çima cihê bûme. Ev îfadeya bi nivîskî ji bona min ya girîng û rastî bû. Diviya ez baş bihizirim ku li wir çi binivîsim û baş hesab bikim, wisa diyar

bikim. Divê herî kêm polîs îfadeya min li dijî min bikar neyîne, weke endamek UKO, bikaribim weke sempatîzanekê jî be parastina rêxistinê bikim, di astekê de îfadeya xwe binivîsim.

Min serpêhatiya xwe bi kin û cewherî nivîsand. “bavê min li Almanya karker e. Xwîşk û birayên min jî dixwînin…. Û hwd” Bes ez nizanim Metîn li Erzînganê hatiye girtin. Hem jî di dawiya Nîsanê de bi Doxan re tê girtin. Ez bawerim Mistefa Yildirim jî bi wan re ye. Pevçûnek tê jiyîn û birîndar tê girtin. Ez ji xweber hînî van agahiyan bûm. Bes girtina wan tenê bi wan ve sînordar dimîne. Ji aliyekê ve li Erzînganê hatina girtin baştir bû. Lê her ku îtîraf û îxanet berfireh dibû, rewşa wan jî eşkere dibû. Diya min Zeynep di meha Nîsanê de rojên ku ez bi karên hevberdanê ve mijûl dibûm de xewna xwe ji min re gotibû. Paşê jî ji hevalekê re dibêje; “bila li xwe baş binêre, li xwe miqatebe, ez van rojan her tim xewnên nebaş dibînim. Her tim di tengaviyê de ye.” Ev hîsên vê jinê çi yeman in! Tişta jê ditirsiya hatibû serê wê. Digot; “kurê min jî ji malê derket. Ji xwedê bitirsin. Hinek kesên din hem li mal in, hem jî şoreşgeriyê dikin. Hûn her du jî tine ne. Ma wisa dibe?” Ji ber her tim li ser me dihizirî, em hatibûn xewna wê. Carê me digot; “ji ber tu keça Kureyşanî lewma dihesî” û me bela xwe lê dida. Bes xewna wê jî rast derketibû.

Ji bona pirsa ku bêjin; "tu kengê bûyî endama UKO” hesaba hemû pêvajo û dîrokan dikim. Dixwazim wisa pêşiya wan bigirim ku pirsên nû nekin.

Min weke ku me bi hev re axivî û zelal kirî nivîsand; “ez çûm Îzmîrê û vegeriyam. Ez bi karên hevberdanê ve mijûl dibim. Ez wê pêvajoyê li cem diya xwe dimam. Daxwiyaniya

şoreşgerên Kurdistanê dikeve destê min. Herî zêde jî kuştina Haqî Qarer û weke kesek Laz parastina doza Kurdistanê bandor li min dike û sempatiya min jî wisa pêş dikeve. Ez jî tevlî semînerên wan ên ji her kesî re vekirî dibûm. Ji ber ez baldar bûm, ew jî baldar nêzî min dibûn. Hevalê Elî Heyder Kaytan bi min re eleqeder dibû. Paşê ez hatim min li Elezîzê malek ji xwe re girt. Mal a min e. Lê paşê Elî Gûndûz hat ez dîtim. Nîsanê jî ji Dêrsimê hatim." Îfadeya min tev wisa ye.

Dê bi van bawer bikiran. Ji ber me mala dawî jî nêzî wê dîrokê girtibû. Me di Adarê de kirê kir. Carê çûnûhatinên me çêdibûn. Ger ji xwediyê malê jî pirs bikin, tiştek bi nakok tine ye. Dê îfadeyên nêzî hev bin.

Her wiha di îfadeya min de, ez pirtûkan dixwînim, Serxwebûnê dixwînim da ku ramanê wan nas bikim. Herêmê nas nakim. Hevnasîna me û Nadîre jî ji ber xizmên Metîn Turgut wan bû. Ez çûbûm sersaxiya wan. Ji ber ev nav hene û her tim jî tên pirsîn ez van dibêjim. Lewma kesên ez bi wan ve mijûl dibûm û min hewl dida qezenc bikim ev nav bûn. Min ji bona Ayten jî got ne şoreşger e. Ti baldariya wê jî tine ye, tenê bi xwe ve mijûl dibe. Ji ber ez jin bûm, ji min re dihat gotin ku divê zêdetir di nava jinan de propagande esas bigirim. Min nû hewl dida qadê nas bikim. Jixwe bê ku tiştekê jî bikim hatim girtin. Armancên rêxistinê jî Kurdistanek serbixwe, yekgirtî, azad, demokratîk û mûrefeh avakirine. Welatê me mêtînkirî û nîv feodal e. Lewma emê li dijî dijminê me yê sereke mêtîngeriya Tirk, li dijî millî, hevkariya xwecihî, emê şoreşa demokratîk, girêdayî îtîfaka karker û gundiyan û di pêşengiya çîna karker de pêş bixin. Dinivîsînim…

Dema min ev dinivîsandin coşekê ez girtibûm. Weke ku li hember min dijmin heye û bi înadê Şahîn dibêjim; “armancê me ev in. Dê teqez jî ev hemû pêk werin.” Weke ku ez van bi dengê bilind diqîrim. Ji xwe re dibêjim; “xweziya her tim mijarên wisa pirsîban.” Hinek pirsên weke; “ma tu bi armanca UKO bawerî” jî hene. Dilxwede ev jî bi zanebûn pirsîne. Pirsên weke; “hûn dewleta KT çawa dibînin? Hûn ji bona hêzên ewlekariyê çi dibêjin?” Tenê ji bona tehrîk bikin dipirsin! Her wiha; “rêxistin pere û çekan ji kur peyda dike? Hûn çend kes li mala rêxistinê dimînin? Hinde pirsên zêde hene! Pirsa herî dawî ji hemûyan ecêbtir bû û bi zanebûn hatibû pirsîn; “ma hûn poşman in?” Min bersiva vê jî bi gotinên; “min heta niha tiştek ku jê poşman bibim ne kiriye” da wan.

Îfadeya min kêm zêde di vê çarçoveyê de bû. Yanî ez girêdana xwe ya bi rêxistinê ve dibêjim. Li gorî wê jî di çarçoveya zerar nedim rêxistin, hevalan û xwe îfadeyekê dibînim. Piştî îfadeya min hinek polîsên li ber derî gotin ji min re kirin. Gotin; “kanî tu mirovek pêşverû bûyî? Jixwe me tu nas dikirî. Bes te tiştek ne nivîsandiye. Me jî ew îfade qetand. Yê ku wê qebûl bike ehmeqe” û çûn. Van kesan piranî êşkenceya çors dimeşandin. Yên lêpirsîna esasî dimeşandin bi tevdîr nêz dibûn. Piranî Zafer Karaosmanoxlu û polîsê îfadeya min digirt ê bi navê Mehmet dixwest nîqaş bikin. Beriya hingê jî gotibûn ku rojnameya Serxwebûn dixwînin. Her wiha di bilêvkirina Serxwebûnê de jî zehmetî dijiyan. Bi taybet bi zanebûn wisa ecêb digotin, da ku ez xwe negirim rastiya wê bêjim. Jixwe min jî nedikariya rastiya wê baş bilêv bikim. Carê hevalan jî bela xwe li min didan. Ya min jî weke Kurdiya narîn pênase dikirin. Êdî niha em ji eniyan nîqaş dikin. Axaftin, nîqaş,

naverok û armancên vê carê tên guhertin. Heta polîsê bi navê Mehmet dide diyarkirin ku pê bandor bûye. Di heman demê de tiştên ku nediket serê wî jî digot; “ger hûn min qane bikin, ezê bêjim ku hûn mafdar in.” Bi vî rêbazî asta zanebûna min dipîvan. Çiqas ehmeq bûn! Êdî ew mijar zêde negirîng bû! Ev mijar ne li xema min bû, asta min çiqas mezin dikin, bila bikin. Ji ber êdî vê jî tiştek nedida guhertin. Min pir vekirî bi wan re nîqaş dikir. Pirsgirêk neqanekirina wan bû. Yên li hemberî min dijmin bûn û her kêlî, her xolek û her roj behsa xilasbûna vê rêxistinê dikirin. Li gorî wan rêxistin Şahîn bû û îxaneta wî jî her tişt xilas kiribû. Ev îxanet li hemberî me bikar danîn. Ya rastî wan jî dizaniya ku rêxistin ne Şahîn e. Şerek bû, her cure derfetên wan hebûn û ew jî li dijî me bikar danîn. Ya me jî tenê bîrdozî û baweriya me hebû. Wê demê ti xeternakî nebû ku ez jî di her firsendê de vê biqîrim.

Êdî ez jî li hemberî wan weke rojên destpêkê xwe naqeherînim. Her tim hewl didim asta moralê xwe bilind bikim. Jixwe pêşketinên heyî jî ev ferz dikir. Belê, îxanetek li holê hebû. Şahîn Donmez zû ceban (donek) ketibû. Hemû hewldanên me yên rêxistinî û her tişta ku dizaniya tev vegotibû. Gelek heval neyênî bandor bibûn. Lê belê ev tevger û ev rêxistin cardin hebû û dimeşiya. Ev aliyek lewaz û reben bû, texrîpkar bû, lê nerêxistin hemû bû. Baweriya ku, ‘dê heval teqez tevdîran bigirin’ hebû. Li kêleka vê jî bixwazî nexwazî guman û tirs jî ava dibû. Kêmek mabû hevalê Cemîl were girtin. Ma kî dizane, dibe ku li hinek cihên din jî girtin çêbûne. Lê çiqas be, ne bi qasî ya Elezîzê dibû. Wê demê divê em jî vê rastiyê baş bizanin û hewl bidin li hember dijmin nekevin.

Ez jî gelek nivîsan li ser dîwarên odeya em lê dimînin û şibaka wê ya boyaxkirî dinivîsim. Diruşme hene. Bi taybet hinek rêzên helbesta hevalê Fuat a bi navê ‘ez mirov im’ hêj di dema girtîgehê de nivîsandibû dinivîsim. Dîsa hinek nivîs û nirxandinên wî yên watedar hebûn, min bi şêwaza nivîsê xwendibû û jiber kiribûn. Ji wan hinek beşan dinivîsim. Lê belê, bi taybet beşa ‘sondê’ di bîra min de hemû teze maye. Min ew jî li ser beşek camek cuda xweşik nivîsand.

“...rast e, em jiyanek zindî ya ji qonaxên lewaz çêbûne, zêde bûne û ji pêşketinê re vekirîne. Lê mixabin hûn dibêjin ku hûn ji fazîletê hatine, hûn nikarin xwe ji rizandin û tinebûnê xilas bikin, hûn bakîreyên îxtiyar ên ti caran biser nakevine...

Em bi serê şehîdên xwe sond dixwin, ger em di nava komek herî biçûk de jî bin, emê dijwar bi hev ve girêdayî bin, emê heta serxwebûna Kurdistanê têbikoşin.”

Ev gotinên sondê di pêvajoya girtîgehê de gelek caran li ser dîwaran hat nivîsandin. Di nava daxwiyaniyan de hat nivîsandin. Di forman de hatin xwendin û gelek hevalan jiber kir. Nehat jibîrkirin.

Dibe ku di wê kêliyê de kesek din ew gotin nedixwend. Lê belê, ew bi xwe re dubare kirin, baweriya li hemberî wan nûkirin, di dilê xwe de hîskirin, weke ku biqîre li ser hinek cihan kolan, ji her tiştî xweşiktir bû. Dibû moral û hêz. Li hember wê hewaya qirêj bi înat, her gotinek ji wan bi hêvî û şer barkirî bêdeng dihat bilêvkirin.

Lêpirsîn bi hemû leza xwe ve didome.

Êşkencekar got; “Birahîm Kaypakkaya jî weke bilbilan axivî, lê ji bona wî propagandeya serî da, lê sirek neda kirin. Ma dê tu jî yek ji wan bî û ti sirî nedî? Her tişt di destê me de heye. Apo jî di destê me de ye. Li jêr e, di qeta binî de ye. De ka bînin, ev bawer nake. Ew jî weke bilbilan axivî. Ma tu hêj ji bona çi û kê lehengiyê dikî?” Min jî got; “de bînin.” Ser vê axaftina min gotin;

“Rastî ger em niha bînin dê tu çi bikî?” Min jî got; “ezê îlhamek mezin jê bigirim, dê hêz bide min.” Li vir êdî nekarîn xwe. Ew rûyê heta wê kêliyê weke kêfxweşiyê dixwiya, serkeftin rave dikir, ji nişka ve hat guhertin. Lêvên wî tewiyan, rûyê wî qermiçî. Bi hêrs e û bi kîn e, diyare dê êrîş bike. Tişt nabe, ger ev qasî bi hêrs bibin baş e. Çi dikin bila bikin. Bi copê li serê min da. Pir tund bû, lê dîsa jî li ser piya me. Ji nişka ve hejiyam. Paşê şeqam li min xist. Got; “ka li vê kaltaxê binêrin, meydanê dixwîne.” Min yekser bi tundî jê re got; “dûjûna neke!” Dîsa Zafer Karaosmanoxlu rewşa heyî nerim kir. Ji yê dijûn kirî re got; “rawest e, dijûna ji xanima Sakîne re neke.” Piranî bi Sakîne xanim xîtabê min dikir. Helwestên wî yên ber bi çav nayên guhertin. Ji ber xwe ji bona her kêliyê wisa amade kiriye.

Yeke din got; “tu vala înat dikî. Tu hêj parastina çi dikî? Rêxistin evqas bû. Çend kes din jî hene, em wan jî bigirin temam xilas dibe. Em li pey wan in.”

Min got; “yên li vir tev jî îxanetê bikin, hûn her kesî bigirin jî, tenê Apo bimîne bes e!” Demekê hemû bêdeng man. Ecêb ecêb li min temaşe kirin. Vê carê weke ku tiştên hatine gotin cidî negirtine nêz bûn. Ev jî taktîkek bû.

Ew kêlî jî wisa derbas bû. Yek ji wan ji qaxidek nivîskî çend hevok xwend: “civîn li gundê Fîs hat lidarxistin. Yek bi yek Heyder, Duran, Resul…” dijmêre. Yên din destwerdana wî kir. Got; “raweste. Ew sempatîzan e. Nû tevlî rêxistinê bûye. Tenê ji yek-du keçan re propagande kiriye. Ew fêm nake.” Wisa kena xwe bi min dikir. Pey vê axaftinê re dengê kenek kirêt hat. Zafer Karaosmanoxlu li rûyê min temaşe dikir. Dixwest bertekên min fêm bike. Cara yekê bû ev mijar ev qasî vedikirin. Min ji xwe re digot; “nexwe dê lêpirsînên piştî vê tev wisa derbas bin. Bawerim Şahîn ez ji nav dernexistibûm. Polîs bi zanebûn ne dixwend. Min ji xwe re şîrove dikir ku; “dê min bînin lîstokê, di wextek guncav de bigirin lîstokê! Dê lewaziyek min bigirin û wisa dest bi mijarê bikin.”

Dijmin hêj îxaneta Şahîn vedişêre. Rojekê liv û tevgerek çêbû. Gotinên weke kesekê di qeta binî de hewl daye xwe bikuje digere. Zêrevan û leşker carê di navbera xwe de bi dengê bilind di-axivîn. Ji nişka ve tirsekê ez girtim. Min li Ayten temaşe kir. Me her duyan jî di heman kêliyê de bi deng ji hev pirsî; “gelo kî ye?” Bi rastî jî ew kî bû? Dibe ku di êşkenceyê de kuştibin û paşê bêjin xwe kuştiye. Wê demê dê çi bibe? Na, na, nabe ku Reşo (Kara) be! Na be Aytekîn be? Nexwe dê cuda kî be? Lenet be, rewşên wisa nediyar weke êşkenceya nin. Gelo van zilaman bi zanebûn tiştek wisa belav dikirin?

Leşkeran got; “qeta binî heta serî dagirtiye.” Hinek mirovên ji komên cuda jî hene. Wan rojan hinek kesên endamên Aydinlik’ê jî hatibûn girtin. Tiştek ecêb bû rojnamevanek (Adil Turan) anîn. Di heman demê de

PDA(Ronahiya Şoreşgerî ya Proleter) jî li dijî me cîhat pêş xistibû! Ne dihiştin rojname bikeve nava gelek bajarên weke Sîwerek, Hîlwan û Êlîhê. Bi giştî dengê mêtîngeriyê diqêriyan. Îxbar dikirin. Bi zanebûn anîbûn da li xwe mukûr hatina Şahîn binivîse, hewl daye xwe bikuje û heta diruşme qêriya ye. Ji komên din jî hinek kes hene. Hinek kesên ji rêxistinên weke Rizgariya Gel, Kawa, TÎKKO, Dev-Yol, Dev-Sol û têkilhev çawa derdikevin propagandeya Şahîn dikin. Dijmin dixwest rewşek wisa ava bike, jixwe yên girtî pir in, hinek kesên ku beriya Şahîn jî hatine girtin hene, hinekan mal dabûn nîşan, îtîraf pêş ketibûn û hwd. Bes Şahîn saxlem bû! Dê di vê navberê de jî agahiyên Şahîn bi dizî ve binirxînin, dê Şahîn bibin operasyonan, da ku hinek hevalên din jî bigirin. Plana esasî ev bû, me yekser li ser her nav û agahiya ku digirt şîrove dikir. Ji ber hemû lîstokên dijmin di wê odeya goşegiriyê de hîskirin û şopandin gelekî girîng bû. Em jî hişyar û zindî li ser piyan digirtin.

Gelo bi temamî agahiya hevalan hebû? Her carê ev pirs dihat dubarekirin. Ji ber di vê mijarê de hinek guman hebûn. Nexasim ger hatibe belavkirin, ‘Şahîn xwe kuştiye û diruşme qêriyaye’, dikare heta demekê her kesî bide xapandin. Bes na! Hinek berfireh were hizirîn, tiştên ku dijmin dike werin şopan, dê were fêmkirin ku gelek tişt ji aliyê Şahîn ve tên kirin. Ji bilî vê jî ma xwe kuştin ji kur derketibû! Jixwe ev jî delîlek bû ku her tişt were fêmkirin. Wê demê çawa xwe xilas kiriye? Ger ev rewş, bi armanca serxistinê hatibe kirin, weke helwest, an jî çalakî hatibe kirin, ma ne divê encam were girtin? Ango mirov ji kur ve binirxîne bila bibe, ne îtîrafek di asta herêmî de bû. Berfireh bû û diviya tevdîrên rêxistinî bihatan girtin.

Îhtîmalek mezin bandor û rayeya (yetkiya) koma nû hatiye ser kar heye, ez vê carê jî bi wan re rû bi rû me. Nîvê şevê ye… Ya rastî şev û rojên vir nayên ferqkirin. Jixwe ne xew heye, ne jî xwarin heye. Hebe jî em nikarin bixwin. Bes tiştek ecêb bû, ez dîsa jî zindî bûm û ser xwe bûm. Min dev ji xwe bernedida. Vîn û nefreta heyî hêz dida min. Hêrsê jî ez li ser piyan dihiştim. Dibe ku vaqas tiştan encamên heyîn nediguhert, lê belê dê tişta ku dijmin jî dixwest pêk nehata. Jixwe tiştên hewce dikir dijmin girtibûn. Ev jî pir girîng bû. Ev qasî zû ferqkirin û zanîna sazûmaniya peywendî û xebatên hindurîn ên rêxistinekê windakirinek mezin bû. Darbeyek dij şoreşgeriyê bû. Di vê mijarê de nirxandinek erênî kirin xwe xapandin bû. Windahiyên fîzîk û hwd ne tenê 'windahî' bûn. Bi vî rêbazî jî binyata rêxistinî darbeyek xwaribû. Lê diviya vê rewşê ti caran ruh û derûniyek weke "temam her tişt xilas bû" û hwd ava nekiribe. Yek kêlî û yek çirkeyekê bê hêvî, bê bawerî û dudilî nehat jiyîn. Jixwe Şahîn jî ne her tişt bû. Di heman demê de herêmek jî ne her tişt bû. Her çendî bandorên van rewşan hebin, hêvî û baweriya dê teqez ev pêvajo jî derbas bibin ez li ser piyan digirtim. Gelo bi rastî jî ya min dikir, 'lehengiya vala bû?' Gelo tevî ku evqas agahî ji dijmin re hatibûn dayîn, evqas jî ji xwe bawerkirin rewşa ruhek dijber bû? Na! Lê belê, li gel vê tirs û gumanên min ên mezin jî hebûn. Bi gelemperî Şahîn texmîn dikir ku dê heval li kur bin û dizaniya. Ger di vê mijarê de di wextê û demê de tevdîr neyên girtin, dibe ku bêxemiyek û rewşên nebaş rû bidin. Ango dijmin ev qasî zû û hêsan hînî binyata me ya rêxistinî bibû û bi taktîkên me yên di derbarê pêşerojê de hesiyabû.

Şahîn bi hemû kirêtiya xwe ve divereşî. Her ku diçû diket, ketibûnek kûr dijiya. Êdî ji vê jî ti gumanê min nemabûn. Her cara min gotinek wî dibîhîst diheliyam. Kesayetek tayê xwe qetiyayî, ancex dikare ev qasî dijminahiyê bike. Diyar bû di lêpirsînan de tevliheviyek jî dihat jiyîn. Komên êşkenceyan heman weke xebatên kargehan bi şêwazê 'danê zêde' kar dikirin. Komên şevê lêpirsîn dikirin, karê xwe roj ji komek cuda re dihiştin. Carê jî li ser hev, hinekê bi komên hatine têkilhevkirin ve karên xwe dimeşandin. Bes lêpirsîna wê nîva şevê cuda bû. Dişibiya lêpirsînek pêşbaziyek di navbera koma ku dihat gotin ji Enqereyê hatiye û ya beriya wê de û lihevnekirinek dixwiya. Ev lêpirsîn jî di bin bandora wê de hat meşandin.

Zêrevanê ku bangî min kir ecêb bû û ditirsiya. Her carê paniyê wî qermiçî, potînên (îskarpîn) xwe jî bi dengek ku qelebalixe derbixe li erdê dida. Dîsa derî jî ji nişka ve û bi qelebalixek mezin vedikir. Dema em destpêkê hatin deriyek tenê bû. Paşê deriyek mezin ê hesin çêkiribûn. Mifteyek wê ya mezin hebû. Dema her du vedikirin teqez her kesî dibîhîst. Jixwe ev ketin û derketin bi serê xwe êşkence bûn, ji ber gelek caran dihat kirin. Heta ji bona carê ji hêla derûnî ve bandor bikin, mirovan her tim di nava bendewariyê de bihêlin, dengê qelebalix derdixistin, mifte jî vedikirin, lê bê ku deriyê hundir vekin diçûn. Lê di hatina vê carê de berovajî bû. Du sedemên tirs û xofa dijmin hebûn. Ya yekê, li gorî dixwest ê miqabilî xwe ne kiribû nava xefkekê. Kêliyên ku nêçîra xwe baş nedikir bû.

Yên êşkencekar di rewşên wisa de zêde reben dibin, bêçare dibin û ruhê wan pir ecêb dibe. Ji êrîşkariya bêdeng, ber bi bêdengiyek êrîşkar ve diçin. Di navbera her duyan de diçin û tên. Dema ez ketim hundir rûyê êşkencekarê nû li ser piyan li benda min bû, ji bekçî re got; "tu derkeve, derî jî bigire." Yekser çavên min li doşeka li erdê ket. Weke din jî li ber çavan ti alavên êşkenceyê tine bûn. Li ser masê tonek qaxit hebûn. Çend ji wan ên nivîskî li kêlekê bûn. Nivîs tev ên destan bûn. Weke din jî kursiyek hebû.

Ez bawerim ev jî 'kursiyê tewanbara ye! Ger manyeto li ber çavan bûya, dê min bigota kursiyê bi elektirîk ye, bes ne wisa bû. Bi tena serê xwe jî nake. Diviya yek birêve bibe, yek jî manyeto amade bike. Di vê navberê de divê yek jî pirsan bike, têlan li ser dest, ling û laşê mirovan bigerîne jî hebe. Wê demê ev lêpirsîn, lêpirsînek cuda bû.

Dema got; "derî bigire!" Min jî bê hemdî xwe got; "hûn çima derî digirin?" Di dengê min de tirs tine ye. Ya rastî ez tirsa xwe qet nadim der. Weke ku hesabê jê bipirsim pirs dikim. Ez jî kêm zêde hînî ruh û derûniya wan bibûm.

Dema mirov nêzîkbûnên weke "ez di destê we de me, bes her tişt ne di bextê we de ye, hûn nikarin her tiştî bikin" dida hîskirin, di serî de bandor li radeya êşkenceyê dikir.

Got; "xêre, ma tu ditirsî? Ji ber sar e min girt."

Min jî got;

"Na, ne sar e, bila vekirî bimîne. Ma ezê çima bitirsim?" Min ev jî bi aramî gotin.

Got; “emê hinekê sohbet bikin. Min xwest te nas bikim.” Ji serî heta binî ez ber çavan re derbas kirim. Carê jî bi kirêtî dikeniya. Diyar bû zêde sermest (serxweş) bû. Her ku ez nêzî wî dibûm bêhna ereqê zêdetir dihat min. Demekê li ser piyan çû û hat. Her ku dihat kêlekê di bin çavê xwe re li min dinêriya. Dixwest bertekên min fêm bike.

Ez hêj hewl didim fêm bikim. Gelo armanca lêpirsîna îşev çi bû? Zêde dirêj nekir, hat ber masê. Ji qaxidekê hinek beş xwendin. Beşên derbarê civîna Dîkmen a li Enqerê, Agirî, çawa Mehmet Turan şikbire û Celal Aydin tev têkilhev dixwîne. Ev jî îfadeyên Şahîn in. Weke din jî dinivîse.

Pirs dike; “ma agahiya te heye.”

Min jî got; “min qet eleqeder nake ku ev yên kîne.”

Got; “ma tu dixwazî tiştên têkildarî te jî hatine gotin bixwînim?”

Min got; “na.” Ez jî hewl didim bidim diyarkirin ku mereq nakim, ne xema min e çi hatiye gotin û negirîng e. Lê di hundirê xwe de jî dibêjim, ‘xweziya xwendina xwe berdewam bikira.’ Gelo weke din çi hebûn, min dixwest hîn bibim. Ji ber dikariyan van îfadeyan veşêrin. Dev ji xwendinê berda. Xwe li ser doşeka erdê dirêj kir. Destê xwe danî bin serê xwe û bi enîşka xwe cihê serê xwe rast dikir. Şêwazek nîv razayî dida diyarkirin. Pirsî, gelo zewicîme an na. Got; “ma te bêriyê kiriye?” Ji aliyekê ve bi destê xwe organê xwe yê cinsî dilîst. Carekê xwe rast kir û cardin dirêj kir.

Min jî bi awir û rûyê xwe da diyarkirin ku ji wan nêzîkbûnên wî aciz bûme. Vê carê jî ew nerehet bû. Jixwe armanca min jî ew bû ku ew nerehet be. Kêm zêde ez dizanim

ku dixwaze çi biceribîne. Beriya niha jî gelek gefên weke emê dest bavêjin te û copan bixin hundirê te kiribûn. Ev wisa pir vekirî nayên gotin. Min jî wê kêliyê xwe ji êrîşên ku ji nişka ve bike re amade dikir. Lê belê, cesareta yê êşkencekar nebû. Min jî di vê mijarê de beriya wî helwest raber kir û got; "hûn dixwazin çi bikin? Ez şoreşger im. Raman û baweriyên min hene. Min jî ew bi zanebûn hilbijartine. Ew namûs û onura min in. Hûn nikarin bi dijûn, êşkence û destavêtinan tiştekê bikin."

"Ger hûn di vê mijarê de li benda hinek tiştabin, hûnê xwe bixapînin. Fermo, hûnê bikarin çi bikin! Her wiha hûn nikarin min bi tena serê xwe lêpirsînin. Hûn serxweş in. Ez we hemûyan jî nas dikim. Navê we Zafer Karaosmanoxlu, Mehmet Yilmaz, Kerîm…" û gelek navan birêz dikim. Min ev nav jî beriya niha di lîsteya pişta derî ve bû xwendibûn û jiber kiribûn. Bawerim îhtîmalek mezin ew lîste jî ya êşkencekaran bû. Ev jî kêrî min hat. Dema min yek-du caran navê wan got, ketin dilê wî qurfî (panîk). Gotin; "em te sax nahêlin. Tu jî xwe mirî bizane. Tu di destên me de yî. Dê tu bi salan li vir bimînî. Êdî ti hevalê te yên ku tola te jî bigirin tine ne." Lê dîsa jî wê lêpirsîna wan a bi êşkenceyan jî bandor dikir. Heta hinekan jî rolên xwe yên nerim dilîstin.

Wî zilamî hema xwe rast kir, got; "na, na, şaş fêm nekin. Em samîmî di-axivîn. Ma tu ji qenciyê fêm nakî? Ma min tiştek kir? Ez ne êşkencekarim. Ez karmendek dewletê me. Ez jî Komara Tirkiyê diparêzim. Fikirên min jî hene. Ger tu ji wan aciz bûyî, tu dikarî biçî." Bi vî rengî hewl dida rewşê nerim bike.

Kêfa min jî ji rola min re dihat. Ger mirov derûniya van ehmeqan baş bizane, mirov dikare xwe jî baş amade bike û wan sînordar bike. Mirov dikare êşkencekaran mehkumê êşkenceya çors bike û heta di wê mijarê de pêşiya harbûna wan bigire. Ji bilî vê her tişt ji însiyatîfa dijmin re hiştin, nêzîkbûna ku her tiştî ji wî hêvî dike, di serî de dide windakirin. Ev jî tê wê wateyê ku hêj di serî de te serî ji binkeftinê re tewandiye. Lewma di zemînek wisa de jî, bûyerên ku rû didin berovajîkirin jî zehmet dibe. Kesayetan dibe encamên cuda, lewma veger gelekî zehmet dibe.

Ez nizanim çend demjimêr derbas bûn. Lê dema ez vegeriyam odeyê, min Ayten ji xwe xirabtir dît. Serê xwe danîbû ser kabên xwe, bi destên xwe jî lingê xwe hemêz kiribû, belengaz disekinî. Çawa ez ketim hundir ji nişka ve rabû ser xwe û ez girtim li min dinêriya. Tiştek ne bibû! Ez li ser piyan bûm! Got; "çi bû? Çi ji te kirin? Dilê min qetiya, ku tiştekê bînin serê te." Belê, dîmenê min nebaş bû. Min di eynikek kevin, zêde naxwiyê ya li ser dîwarê lawabo çikandibûn de li xwe temaşe kir. Lêvên min ziwa bûne, çavên min tam kûr bûne. Min jî tiştên ku bûyîn jê re got, kêfa wê hat û ez hemêz kirim. Got; "ketî kurê ketiyan!"

Kêmek mabû pêvajoya binçavkirina panzdeh rojî ya duyem jî biqede. Kesî pişta xwe nedida pêvajoyên zagonî yên dijmin. Lê ji ber armanca dirêjkirina vê pêvajoyê hinek tiştên nû derxistina holê bû, gumanên me jî zêde dikir.

Gelo partî hatibû îlankirin? Dihat payîn ku bi çalakiyên girîng ve were îlankirin. Gelo dibe ku girtinên çêbûne bandor kiribe? Gelo ji bona me çi dibêjin? Bi gelemperî navê me

UKO'parêz bû. Wisa pênase dikirin. Lê belê dijmin dizaniya ku em gihane asta partîbûnê û me navek nû ava kiriye. Vê veşartinê jî tengezariyek mezin ava dikir. Her tişt bi kesayeta Şahîn re dibû girêkek kor. Gelo îxaneta wî nû bû, yan jî îxanetek ji berê ve hebû? Pirsên min jî xilas nabin. Gelo ezê van çawa bigihînim derve?

1800 evler, li cihek zêde bêdeng bû. Gelo mirov dikariya rêyek derketinê bibîne? Şibake derabên hesinin, derî jî wisa ne. Gelo hevalan nedikariya ser vir de bigirin û me ji vir derbixin? Sê, an jî pênc kesên bi çek bes bûn. Ji ber dijmin qet ne li bendê bû.

Hişê wan tenê li ser êşkenceyê bû. Ma dê çi biba?

Ez jî pir ecêb im. Di nava ewqas berovajiyan de çawa evqasî bi dilxweşî dihizirim. Lê belê ev xeyal, an jî xwestek jî pir xweş bû. Hinekê jî be rehet dikir. Jixwe yek ji wan jî netiştên ku bê derfet bûn. Zêrevan nîştecihên xwecihî bûn. Ger yek ji wan hinekê bi wijdan û bi namûs ba, bide ber çavan her tişt temam bû. Derve jî kolikên leşkeran û cihên nobetan nedibûn asteng. Qadek pir mezin e û araziyek berfirehe. Mirov dikare di tariyê de xwe xilas bike… Min xeyalperestî zêde hez dikir. Dîsa jî pir xweş bû.

Bûyera Celal Aydin, ji bona dijmin li Meletî sedema herî bingehîn a operasyonê bû. Hinek girtinên nû hebûn. Yek ji van jî jin bû. Navê wê jî Elîf Kartal e. Hemşîre bû. Keçek ku beriya niha Celal di rojnivîsên xwe de behs kiribû. Roja destpêkê ji bona demek kin anîn cem me. Elîf ji Semsûrê, Golbaşiyê bû. Li gorî dixuya sade bû. Tevî ku hemşîre bû, derman li xwe ne dabû, birûyên wê sitûr bûn. Weke ku çavên wê werimî jêr û

jora wan dagirtî bûn. Mirov digot qey çavên xwe kil dane, wisa reş bûn. Bêvila wê kêmekê rakirî bû. Bejna wê navîn bû. Xetên bedena wê jî nexirab bûn. Lê dîsa jî bedewiyek wê ya pir diyarker tine bû. Bi taybet sekna wê, axaftina wê zêde bêxîret, girane bû. Ew zindîbûn û sivikbûna hemşîretiyê bi wê re tinebû. Li Meletî heta cihê ku em çûyînê, di rêwitiyê tevê de, mîsoger polîsan xwestiye ji her hêlê ve bandor bikin. Lê belê, ew jî hêj di nava ruhê karmendiyê de dijî. Ji ber erka ku dikir, li herêmê nebiyanî ye. Bi taybet jî ji ber ku li Gûlhaneyê li cihê tip'ê kar dikir, naverastên ku leşker, serbaz û polîs pêş dixin hene. Ango karmendî û hemşîretiya dewletê yekser di kesayeta wê de diyar dibû. Zêde jî ne ket çavê me. Dîsa jî me hewl da em pê re alîkar bin. Me jê re got ku divê netirse û li hember êrîşên dijmin jî bandor nebe. Her çendî em pir zêde vekirî nebêjin jî, em hewl didin bêjin ku Celal kesayetek îxanetkar bû, lewma divê qetiyen ji bona vê bertek nejî û tiştên şaş jî nebêje."

Min jê re got; "dijmin dixwaze nakokî û bertekan bikar bîne. Lewma ne raste ku mirov di vê mijarê de zerarê bide kesî. Dibe ku hinek kesên tu nas dikî hebin. Bes wan nede dest. Ji ber dê ev, rewşa te zêdetir giran bike." Lê ew zêde bi bertek e û dibêje;

"Çima yên ez dayîm dest li ser min nehizirîn? Jixwe ti eleqeya min bi rêxistinê re tine ye. Celal jî xwest min bikar bîne. Çi bû? Ez ti wateyê nadim van."

Min got; "temam, dibe ku zehmet e tu wateyê bidî hinek tiştan. Dê tu jî bi demê re hîn bibî. Lê belê, helwesta ku tu niha diyar bikî gelekî girîng e. Dê polîs bixwaze gelek tiştan bavêje

ser te. Tu ne neçarî ku van jî qebûl bikî. Tu hemşîreyekî. Dê gelek kesên bixwazin bi te re peywendiyan pêş bixin hebin. Di çarçoveya karê xwe de bigire dest û zêde jî ne-axive. Tu çiqasî kêm bi-axivî û baldar nêzî bersivên wan bibî, dê ji bona te jî ewqasî baş be."

Elîf zêde li cem me negirtin. Elîfê di destpêkê de rewşa xwe dabû dest. Polîs kêm zêde derûniya mirovan dizanin. Dizaniyan ku ger li cem me bimîne dê ji me bandor bibe. Jixwe polîsan jî axaftinên me mereq dikirin. Ji ber texmîn dikirin em behsa çi dikin, lewma wê di kêliya destpêkê de Elîf bikeve nava xefka me. Dema polîsan di derheqê Elîfê de agahiyên wisa dan me, me jî yekser fêm kir. Baş bû ku ji cem me jî birin. Lenet be! Çi dike bila bike, dê ew bixwe rezîl bibe.

Odeyek ji bona Elîf hatibû cudakirin. Elîf her sibeh bi derpiyê xwe û cilên şevê ve, di destê wê de mecun û sabûna wê ya taybet ve diçû lawaboyê. Xwarinên wê taybet dihatin. Elîf digeriya. Ew dibirin odeyên lêpirsînan. Rehet e, kenê xwe ji derdor re belav dikir. De ka li ser xisletên kesayeta Celal Aydin û Elîf bihizirin! Mirov di kêliyekê de dihizire ku gelo berê kî xistiye. Elîf, li gorî Celal zêdetir vekirî nêz bibû, rewşa heyî ji hevalan re gotibû. Ev alî rast bû. Lê niha Elîfa ku di lêpirsînê de bû, di demek kin de ketibû rewşek wisa kirêt. Rewşek tam a ketîbûnê bû. Me di serî de ew tewanbar nedikir. Jixwe ti girêdanek rêxistinî ya bi me re jî tine bû. Me jî tiştek ne dabû wê. Lewma me tiştek jî jê hêvî nedikir. Hemşîreyek bû. Jixwe çanda wê jî ecêb bû. Ji ber rewşa wê jî, polîsan dikariya wê pir hêsan berde. Lê ne dişibiya wê jî, polîsan ji xwe re bikar danî. Elîfê xwe pêşkêşî wan dikir û dida bikaranîn. Li naverastek ku

polîsên jin ne dikariyan lê bimînin de, Elîfa ku hemşîre bû di rola polîsan de kar dikir. Ji bilî vê jî, ji bona polîsan tenê parçeyek şahiyan bû! Bi her tiştê xwe ve pir kirêt bû! Destpêkê heval ferq nakin, dibêjin qey jinek polîs e. Herî zêde jî dema êşkence li wan dikin kenên wê, hevalan zêde aciz dike.

Dîsa dem hatibû dirêjkirin. Lêpirsînan ji nû ve destpê kir. Îfade dihatin nivîsandin. Gelo bi rastî jî tiştên ku min nivîsandî qetandibûn. Ez wê jî nizanim. Lê vê carê pirsan dikin û bersivên wan jî ew bi xwe bi daktîloyê dinivîsin. Pirs heman weke hev bûn. Carê di navberê de, ji îfadeyên berê hinek pirs derdixistin û cardin pirs dikirin. Êdî pir zelal pirsa Celal Aydin û civîna gundê Fîsê dikirin. Ji hinek îfadeyan jî hinek beş dixwendin. Bi taybet hinde Riza her tişt bi hemû ziraviyan ve vegotibû, îfadeyên wî jî yên weke; "destpêkê hûn biryar didin, paşê jî pirs dikin. Wê demê bêjin biryar hatiye dayîn, her tişt bû û xilas. Da ku em jî fêm bikin." Cih digire. Qaşo dê bi vê helwestê ve bide diyarkirin ku derveyî van bûyerane. Naxwaze polîs zêde bi ser de biçe. Bes piraniya wan tiştên ku di wan civînan de hîn bûne hemû vegotine.

Hatiye diyarkirin ku min hinek civînên din jî lidarxistine. Min di wê mijarê de kesayeta Celal bidest girt; min got; "kesayet û şêwaza jiyana wî li dijî rêxistinê bû. Hewldanên wî jî li ser vî esasî bûn. Lewma eşkerekirina kesayeta wî jî, erka rêxistinê ye. Di vê manê de derbarê rewşa wî de hatiye axaftin û nîqaşkirin. Bes biryara kuştinê herêm nade, ew me derbas dike. Tewanbariyên di vê mijarê de nerast in." Ji pirsên ku min gelek civîn lidarxistine û kî tevlî van civînan bûye re jî, got; "min tenê civînek lidar xistiye." Jixwe yên tevlî bûne gotine.

Weke din jî qebûl nakim ku hinek navên din jî têkil vê rewşê bikin. Heta ku ji min tê ez jî teng digirim dest. Hewl didim pêşiya gelek nav, bûyerên cuda, gotina navê cihan bigirim. Ez di nêrîna xwe ya; "derewan dikin, her kes ne UKO'yî ye. Ji tirsa xwe dibêjin. Her ku hûn navan bixwazin dê ew jî ji kolanan, koçeyan û dibistanan navên ku dinasin bidin we. Ev îfade hemû ji ber xwe derxistine" de israr dikim.

Şahîn, rewşa Celal Aydin pir zelal vegotibû. Diyar e wî esas digirin. Şahîn ziraviyên xebatên me nedizaniya, tenê dikariya texmîn bike. Biryara cezakirinê ji navendê hatibû. Di heman demê de ferman jî wî anîbû. Bes polîsan jî dizaniya ku komîteya herêmê ev kar lêkolîn kiriye û pêşniyar dane. Ji bona wan tişta herî girîng di hejmarek zêde de kes girtin bû. Weke din jî piştrastkirina Şahîn bû. Her tim dixwestin bi çi rêbazî dibe bila bibe, tiştên ku Şahîn gotine bidin erêkirin. Em jî di vê mijarê de nîqaş dikin. Min jî got; wê demê hûn çima ji me dipirsin? Ger hûn tiştên wan gotine esas digirin, ez jî îfadeyê nadim." Ji ber min dizaniya di mijara civîna gundê Fîsê de nêrînên Şahîn û Elî li hev hatine. Ji ber ji du jinan yek jê ez bûm. Wan jî dizaniya ku ew jî wê rojê îfadeyek li gorî ku dixwazin nagirin. Lê dîsa jî dixwestin ji aliyê xwe ve pêvajoya lêpirsînê biqedînin. Her wiha ji ber min zêde ew mijûl dikirin tehemula wan jî nemabû. Gelek pêvajoya kongrê, beriya wê û piştî wê tev hatine gotin. Jixwe tişteke ku ez biparêzim nehiştibûn. Di vê mijarê de pirsgirêk hatibû çareserkirin û her tişt hatibû îtîrafkirin. Ev ji aliyê dijmin ve jî zelal bûn. Aliyê ku bi min ve girêdayî bû, ji vê hêlê ve girîng bû: Min ji destpêkê ve li gorî min dixwest îfadeya xwe da. Ma ev jî kirin û tenê tevlîbûna xwe gotin, dê çi bida guhertin? Ger di serî de min

bigota ez şoreşgera Kurdistanê me û min tiştek din negotiba, min îfade nedaba, dê ev jî berxwedaniyek watedar ba. Belê, dê tiştek wisa gengaz bûya. Wê di encamê de çi biba? Ma dê sax bihiştan, an jî dê tiştek cuda bikiran? Ev jî zêde negirîng bû. Lê belê, dê li dijî hemû êrîş û îxanetan bersivek girîng derbiketa holê. Di rewşa heyî de jî berxwedaniyek heye. Lê ji aliyekê ve rewşa min derketibû holê. Di vê manê de di derbarê civîna gundê Fîs de jî, îfadeyek tenê min eleqeder dike û zêde sînordar amade dikim. Ez nizanim dê min ji nû ve bigirin lêpirsînê an na.

Kevanekê li vir jî vedikim.

Îro Mijdar e… 39 Sal bi ser Mijdarê re derbas bûn. Rêbertiyê, nêzî sê saetan di merasîma hewşa dibistanê de axivî. Li ser piyan bû, carê di navberê de dihat û diçû. Her wiha bi axaftinek balkêş û bandorker ve panoramaya bêhempa ya nozdeh salan, ev şerkeriya mezin carek din bi zindî da jiyîn. Rojek tav û xweş bû. Dema min guhdar kir serî heta binî coşekê bedena min girt. Şahnaz bûm. Pêvajoya şoreşek 25 salan bû. Weke din gotinên destpêkê, biryarên destpêkê, ew ruhê şoreşgerî yê destpêkê, bibûn çavkanî û ewlehiya van pêşketinên di vê pêvajoyê tevê de hatine jiyîn. Lewma ev dîtin, fêmkirin û bi watekirin pir girîng bûn.

Li kêleka van tevan çetegeriya ku di PKK'ê de derketiye holê, xisleta wê ya çînî û civakî, encamên ku derdixistin holê rast dîtin û nirxandin ji her tiştî girîngtir bûn. Ev çetegeriya ku felsefeya jiyan û şerê Partiya me evqasî berovajî dikir, çima ev qasî zemîn dît ku xwe bide jiyîn? Mîsogerî û serkeftina xeta

Rêbertiya PKK’ê û xisleta wê ya bidestxistina serkeftinê, bi salane, ew xeta situr a di navabera van meylan de xwe ferz dikir, hêj diyarkere. Rêhevaltiya PKK’ê, hewldana wê ya avakirina nirxên hevbeş, dilnimziya di vir de, fedekariya di vir de û ruhê yekîtiyê, di asta radeya herî jor de bi Rêbertiyê re xwe rave dikir. Lê mixabin hêj hinek ehmeqên ev fêm nekirine, hêza vê ya herikbar, rakêşwer û bandorker ferq nekirine hene. Ev ehmeqên di hewaya “min cîhan ava kiriye" de ne, di mijara ku di nava PKK’ê de nirx çawa tê avakirin, çawa tê parastin û çawa xwedîderketin pêş dikeve de, nezanin û xwe xapandinek mezin dijîn. Kesên ku dihizirin dê bi ferdperestiyek hovane, bi vê ferdperestiyê ve vê şoreşê bimeşînin, xwe pir xirab xapandin û di encamê de bi tenê man, belav bûn û ji nirxbûnê ketin.

Rêbertiyê ev çetegeriya ecêb a xeta bîrdoziya partiya me ji xwe re nake bingeh, ji ber xisleta çîna wî bîjî ye hewl dide rastiya şerê me berovajî bike, bi mebesta salvegera damezirandina Partiya me de pir balkêş derxist holê û pênase kir.

Rêbertiyê bi gotina; “Di Şer De Serkeftin û Di Jiyanê De Azadî” dest bi axaftinê kir. Her wiha domand; “ez yekser di serî de bêjim, ji herî kevnê we heta yê herî nû baldarî, nêzîkbûnên we û her gava ku hûn davêjin, heta pîvanekê ji bona derbaskirinê bû. Têkildarî nîtelîka van zilaman de jî, derbarê çawa de ne, hinek tişt werin zanîn jî, ji tiştên ku hewce dikin werin pêkan dûrbûnek heye. Ev dûrbûn jî dibe mirin. Çi bi êş e, ew mijarên nejiyîna nehatiye jiyîn di kesayeta we de pêk tê. Ez li vir nabêjim; ‘sucdar tuyî, yan jî ew e.’ Di vir de ya ku sucdare di nava kûraniyên dîrokê de veşartî ye, ji mij ve

miriye û çûye. Sucdar di kemînek pêşerojê de veşartî li bendê ye. Ew jî ji bona yê ku şûnde mane bikuje. Sucdar di hundirê te de ye. Dibe ku li vir te dikuje jî. Dibe ku dijminê her tim li ber çavan jî, sucdarê herî hêsan e û gengaz e ku mirov jê rizgar bibe. Bes bi dijminê ku xwe bi hezar kilifî ve veşartiye, di her gotin û her nêzîkbûnê de xwe dide hîskirin û xilaskirin re şerkirin a herî zehmet e. Ango li gel dijminê bi were şerkirin zehmetire. Ev jî lewazî ne, ev jî bê îradebûne. Ev jî ji dijwariya ferasetan dûrbûne. Ev ji gavên ku pêwîst e werin avêtin dûrbûne. Ev li cihek nayê hêvîkirin de xwe xilaskirine. Ev dibe ku parçeyek ji we, ya ku we jî hêj fêm nekiriye û di her gava we de dibe belaya serê we ye.

Sala şer a Partiya me bi serkeftinan û dibe ku salek ber bi serkeftina mîsoger ve jî tije dagirtî be. Dê tiştên ku hatine windakirin, ji nû ve werin bidestxistin. Kesayeta PKK'ê ya rasteqîn û pîroz, bi taybet jî li ser bingeha bîranîna şehîdên me, dê bi me re were ravekirin. Dê ev jî serkeftina mîsoger be…"

Vê bangawaziya watedar a vegera li cewhera PKK'ê ez zêde hejandim.

Cardin kevanekê digirim û vedigerim wan rojan

Polîs kiriye mijareke înadê. Ew dijwariya îxanet û ketîbûnê, piranî jî li cihê ku bandora vê heye, bi taybet weke jinekê parastina vê kirin û xwedî lêderketin, hewldana min a parastinê, dijmin zêde aciz kiribû. Diviya were zanîn Şahîn ne her tişt bû. Zerara ku vê îxanetê dayî rêxistinê li holê bû. Darbeyek li binyata me ya rêxistinî dabû. Ji bona dijmin serkeftinek bû, lê dîsa jî her tişt wisa hêsan nedihat xilaskirin.

Êrîşkariyek wisa lez û bez, dibe ku di demek kin de hinek zerar dabe. Rast e, bi hinek rêze girtinan ve li hinek qadan valahî hatibû avakirin. Lê belê, rolek girîng a hişyariyê jî ava kiribû. Mirov dikariya ji bilî êşkenceyên çors, li derve di rûyê wan de bi vê rastiyê bihese. Min di nîqaşên me de ev rastî pir vekirî li rûyê wan dida. Ev rastiya ku ji bona derve derbasdare, di heman demê de ji bona hundir jî derbasdar bû. Dê bandorên neyênî yên destpêkê û derûniya binkeftinê zêde dirêj neke. Şer berdewam dikir. Her êrîşa dijmin, helwestek dijber derdixist holê. Dixwestin dadgehan bikin cihên ku îxanet lê di-axive. Mîsoger seferberiya propagandeya çapemenî û weşanê destpê kiribû. Kêm jî be me ev texmîna dikir.

Şahîn, di hundir de hewl dida îxanet û ketîbûna xwe di nava hevalan de rewa bike. Hewl dida di nava hêviyan de îxanet û teslîmiyetê biçîne. Digot; "ger hûn derkevin jî dê her yek ji we xwe bide quncikekê û ji xwe re bijî. Hûnê çêlek û mirîşkan xwedî bikin. Ev doz evqas bû. Ez xilas bûm. Her tişt jî bi min re xilas bû." Bi vî rengî teoriya ketîbûna xwe dikir. Dijmin ji wî zêdetir rasteqînî nêz dibû. Bi panîk û bendewariyên destpêkê ve, panîk û xapînokiya jiyan dikirin hemû di rêbazên lêpirsîna wan de jî diyar dibû. Gelo tiştên ku hatibûn xilaskirin, an jî binxistin di kîjan radeyê de bûn? Ji ber tevgera şoreşgerî xwedî wê xisletê bû ku, bikaribe vê pêvajoyê berovajî bike. Dê ev rastî çawa hem di hundir û hem di derve de asteng bikira? Her çendî ev hesab tev bi xeşîmî û rêbazên zora çors jîndar bikira jî, vê rastiyê dihişt ku di nava xwe de jî tevdîrên demdirêj werin girtin. Dijmin jî ji vê ders derdixist.

Rojên piranî îfadeyan temam dibû. Pir vekirî digotin ku, dê min rehet bernedin. Bi roj bangî min kirin û ez birim odeya tam li miqabilî hevalan, a lêpirsîna min a destpêkê lê kirîn. Ode tam bi her tiştî ve amade ye! Dema min xwest banda ku pê çavên min girêdane vekin, yekser vekirin. Weke ku min ferman dida wan. Di lêpirsînan de dema awir nêzî hev, vekirî û rû bi rû be baştire. Gelo ev jî tawîzek bû? Lê ji aliyê eniya min ve jî derketinek bû. Ez jî pir rehet û bi ruhek ku destûrê nedim her tişt di însiyatîf û bextê wan de bimeşe li hemberî wan bûm.

Digotin; "tu zehmetiyan ava dikî. Tu tiştekê nabêjî. Ev qas delîl di destên me de hene. Ev hemû li dijî te ne. Nexwe emê te dernexin dadê." Min baş dizaniya ku, ev gefên bê wate ne. Lê dîsa jî min dizaniya ku, îfadeya ez bidim ji hêla moral ve ji bona wan baş bû. Dibe ku min destpêkê zêde hesabê vê nekiribe, lê ne li gorî xwesteka wan jî be, ji ber min got ez tevlî civîna gundê Fîsê bûme, (her çendî ji bilî axaftin û nîqaşên giştî min îfade ne dabe jî) yekser li wir, di heman kêliyê de bandor li min kiribû. Dema polîsan bi dengê ecêb qîr dan, kêfxweşiya wan û dengê min li ser kursiyê elektirîkê ku, pê ve girêdayî bûm û ji bandora elektirîkê derxistî û giriyên min hemû têkilhev bibûn. Tenê Zafer Karaosmanoxlu ew kêlî ferq kiribû. Polîsên din digot qey ji ber şoka elektirîkyê ev deng û xirênî ji min tê. Ji ber ez bi paçekê bi kursî ve girê dabûm, xirênî ji dengê min dihat û kêm derdiket. Ya di navberê de jî ez bawerim weke qîrekê bû. Hevalan ew deng pir cuda fêm kiribûn. Hinek hevalan gotibû qey dest avêtine min û gelekî bandor bibûn. Paşê wan bixwe behs dikir.

Zafer Karaosmanoxlu vala vala nediket lêpirsîna min. Di her firsendê de dihat cihê ku em lê diman, axaftinên wî jî, ji bona naskirinê bû. Di nava ewqas qelebalixê de ji ber çavên wî neçûbû. Ji min pirsî; "tu çima bandor bûyî? Tu çima digiriya? Ji bona te got tu tevlî civîna gundê Fîsê bûyî? Belê, dê paşê hevalên te ji te re bêjin te li ber xwe ne da. Tu jî vê hêjayî xwe nabînî. Hûn ji vê re çi dibêjin? Temam hat bîra min 'gurura şoreşgerî'!" Dixwesta moralê min tam bixe û ji vî aliyê min ê lewaz ve li min bixe. Ketîyo, ferq kiribû û dixwest min bi vî rengî bandor bike. Min zû bersiva wî neda. Hewl didim rehet bim, pey re cardin şîrove kir; "helal be ji te re. Di nava evqas kesî de tenê te li dijî me rik girt. Bela xwe li me da. Li gorî gotinên we jî te li ber xwe da. Rast e, niha tu me dijmin dibînî. Tu dibêjî 'polîsên faşîst', bes em jî ji neçariya erk li vir in. Em jî van tiştan pir bi daxwaza xwe nakin. Ez pir vekirî dibêjim. Ez rêz digirim. Ma min qet gotinek xirab axivî?

Di tiştên digot hemûyan de rastiyek hebû. Zilam weke gurekê ye, hem şerî bi vî rêbazî dimeşîne, hem jî mafê wê radest dike! Ev rast bû. Carê di navberê de pirs jî dikir. Min yekser bandorbûna destpêkê derbas kir. Min vê carê hêj rehetir û ji xwe bawer bersiva wî da; "ger hûn hêj zêdetir pirsên xwe berdewam bikin, ezê îfadeyên ku min dane jî red bikim. Min destnîşan kir ku, çawa tevlî civînê bûme. Ezê ji bilî wê jî tiştek din nebêjim. Hûn dixwazin, vê lêpirsînê bi mehan bidomînin." Min bi zimanek pir dijwar ev gotin. Ger bi rastî jî pirsên xwe zêde dirêj bikiran, ezê êdî ne-axivîma û dê min helwest raber bikira. Ez di vir de bi biryar bûm. Min ji xwe re digot, 'xweziya tenê bi min ve mijûl biban.' Vê gotinê zêdetir giraniya xwe ava dikir.

Wê rojê qet serdana min jî nekirin. Ez jî, xwe ji helwestên nû re amade dikim. Ji xwe re dibêjim; “ezê êdî nebim muxatap. Ger yek pirsê jî bikin ezê îfadê red bikim.” Ji ber ev ji bona min jî baştir bû. Ger ez nekarim tiştekê jî bikim, ezê bikarim propagandeya partiyê bikim. Ezê di vê mijarê de nîqaş bikim. Ji ber parastina siyasî zêdetir wan ditirsîne. Lewma carê dibêjin; “niha hûnê li dadgehê jî van tiştan bêjin? Nizanim ‘emê Kurdistanê Serbixwe bikin’ dê ev gotin we bibe sêdarê.” Li gorî xwe dixwazin eniya dadgehê jî bi ewle bikin. Ji ber di lêpirsînê de hinek kes bi baweriyek mezin doza xwe parastî derketin, ger di dadgehê de jî wisa bi-axivin, dê ji bona wan xelatek gelekî xirab be. Hedefa wan a sereke kesayetên îradeya wan şikestiye, baweriya wan xilas bûye û poşman bûne derbixin dadgehan. Lewma digotin; “ma dê tiştên ku te li vir axivîne, li dadgehê red bikî? Dê wê demê cihê te cardin evder be.”

Ji bona temamkirina îfadeya nivîskî roja paştir cardin bangî min kirin. Vê carê min çi digot ew dinivîsîn. Dema hinek gotin û şêwaza îfadeyê dihat guhertin, min yekser destwerdida.

Rêzên dawî jî pir ecêb bûn. Bê ku ji min bipirsin yekser nivîsandin; “bi ti şêwazî ti poşmanî diyar nekir.” Herî zêde jî kêfa min ji wê hevokê re hat. Dilxwede dê wan jî li dijî min bikar bînin. Cezakirin bandor dikir. Dilxwede wê diyar bikiran ku, ji ber ez pir xeter im, lewma divê ez cezayê giran bigirim.

Em hêj li 1800 evler’a nin. Pêvajoya lêpirsîna panzdeh rojan a sêyemîn tê bikaranîn. Her roj jî, ji me re dibêjin; “xwe amade bikin, hûnê biçin dadgehê.” Em bi maşînên girtî ve dibirin dadgeha leşkerî ya navenda bajêr. Em jî di rê de bi

hevalên di heman maşînê de bûn re di-axivîn. Leşkeran her carê destwerdana me dikir. Digotin; “qedexe ye!” Lê nexema me bû. Şahîn cuda dibirin. Di avahiya dadgehê de em hemû birin eywana rawestgehê. Leşker lîste xwend: Şahîn Donmez, Elî Gûndûz, Sakîne Polat, Hamilî Yildirim, Aytekîn Tuxluk…” û her wiha xwendina navan dirêj dike. Rêza navan bala min kişand. Kêfa min hat û min got; “xwezî destpêkê min bibin.”

Îhtîmala berdana Ayten zêde ye. Ez bi wê re axivîm; “li dadgehê tiştekê qebûl neke. Dê tu werî berdan. Dê pir baş be! Dê tu hem rewşên ku rû dayîn ji partiyê re bêjî, hem jî dê ji bona tevdîr girtinê baş be. Îxaneta Şahîn nayê zanîn. Lewma dibe ku di tevdîr girtinê de lewazî werin jiyîn.” Wê demê ez jî hevalan hîn bûm ku, çarik li ber Şahîn kirine û ji bona operasyonê birine Amedê. Em carê bi Aytekîn û Hamilî re di-axivin, lê ne axaftinek gerim bû. Li hember hemûyan bertekên min hene. Ew jî çewisî, xembar û mehcub in, hinekê jî bi bertek in. Polîs ji her kesî re got; ger hûn îfadeyên xwe weke heyî li dadgehê de jî dubare nekin, hûnê cardin vegerin 1800 evler’an.” Bandora vê gefê jî li giştî kiriye. Li nav korîdorên dadgehê polîsên ku êşkence jî dikirin hene.

Min hinekê bi Hamilî re nîqaş kir. Em li ser îxaneta Şahîn axivîn. Min got; “temam, a wî vekiriye. Lê ya Elî Gûndûz, an jî helwestên we çine?” Elî serê xwe tewand û got; “ya me jî îxanet e. Îtîraf, suc kirin, êdî çi jê re were gotin dibe. Lê tiştek heye, ew jî rewşek ku nayê efûkirine.” Hamilî, Ayten şanî min kir û got; “ketîno, ew li hember min bikar anîn. Her tim digotin, ‘emê dest bavêjinê’. Dema wisa dikirin, min jî hinek tişt qebûl dikir.” Ez zêdetir li hember vê nêzîkbûnê bi hêrs bûm. Min got; “temam, ma ya me jî ne namûs e? Polîsan her carê heman tişt li hember min jî weke gef bikar danî. Diviya nirxên partiyê li pêşiya vê namûsê bihatan esasgirtin.” Nîqaşa me ji aliyê hevalên derdor ve jî dihat bihîstin. Riza serê xwe ranedikir. An jî gelek caran nêzîkbûnên bi bertek û bê xem raber dikir.

Di wê kêliyê de Şahîn ji dozgeriyê vegeriya û bangî min kirin. Min jî got; “bi rastî jî dê dîsa îfadeyên wî kesê ketî esas bigirin. Lê ez dizanim çi bêjim.” Ji ber dabû diyarkirin ku, çawa em ketin hundir ger heman îfade neyên dayîn, dê me dîsa bibin lêpirsînê. Diyar e dixwaze bandorê li ser hevalan bike. Weke ku îxaneta wî nebes e, her kesî vedixwîne vê îxanetê û banga xwe jî didomîne. Ez bi hêrsek mezin ketim odeya dozger, odeyek biçûk bû. Dozgerek bi berçavk, qelew û rûyê wî sor bû. Piştî ku min qaxit îmze kirin hîn bûm ku, navê wî Cahîd Aydoxan e. Di heman demê de Serdozger e. Serdozgerê dadgeha leşkerî ya Kolorduyê ye! Bi dengek nizim got; “werin, wisa rûnin. Sakîne Polat, an jî Cansiz. Hiii… Hûn kesê beriya niha ji vir derketî Şahîn Donmez nas dikin? Ew milê Apo yê rastê ye. Her tiştê xwe ji me re got. Tiştek weke rêxistinê tine ye. UKO muku nema. Lê diyar e tu hêj diparêzî, ne wisa?” Li gorî rewşên asayî diviya destpêkê tespîta nasnameyan bihata kirin. Quralên dadgeha xwe jî pêk nedanîn. Wisa tê fêmkirin, dixwaze min nas bike, asta min, bertekên min, aliyên min ên lewaz û bihêz hîn bibe. Dozgerî jî şêwazek lêpirsînê ya asta jorîn bû. Lewma min dixwest bidim hîskirin ku, ez di ferqa tiştên tên kirin de me. Ger ew dixwaze bi destpêkirinekê bandor bike, wê demê ezê jî çi dibe bila bibe wî tengav bikim.

Min got; “gelo evder eywana dadgehê ye, an jî odeya lêpirsînê ye? Jixwe polîsên êşkenceyê jî dikin li vir in. Pirs bikin, ez jî bersivê bidim. Na ger wê nîqaş were kirin, nexwe tiştên ku ez jî bêjim hene. De fermo, em nîqaş bikin.” Cahîd Aydoxan mat ma. Bes bi sixtekarî jî dikeniya. Got;

“Tu zû aciz dibî. Her wiha evder dozgeriya leşkerî ye. Ma dê li vir çi lêpirsîn û çi êşkence hebe!”

Min berdewam kir; “Polîsan di lêpirsînê de jî îfadeya Şahîn Donmez esas girtin. We bi nêrîna wî em bi lêpirsînê re derbas kirin. Niha tişta li vir jî tê kirin heman tişt e. Şahîn ne milê kesî yê rastê ye. Ger wisa jî be, ew niha xayîneke. Ji ber îxanet kir. Îxaneta wî ew xilas kir. Lê bizanibin UKO xilas nabe. Em ên li vê derê tev îxanetê bikin jî, ev doz xilas nabe. APO bes e.” Zilam vê carê tam mat bû. Diyar dibû. Got; “ev çawa lêpirsîne! Dê ev cardin biçin 1800 evler’an.” Bi hêrs bû. Paşê dîsa weke ku axaftinên min cidî ne girtine, bi nermahî, tespîta nasnameya min kir. Her du paşnavên min bala wî dikişîne û pirsî;

Min jî got; “ez zewicî bûm, paşê me hev berda. Beriya ku nasnameya xwe biguherim, hatim girtin.”

Dîsa pirsî; “ma rêxistinê hûn ji hev cihê kirin?”

Min jî got; “na, me lihev nekir.” Bi ser vê re pirsî; “ma zewacek siyasî bû?” Min jî got; “rast e. Ez şoreşger im. Şoreşgera Kurdistanê me. Ew jî li dijî vê bû, lewma ez jî cihê bûm.” Min nedixwest ku çep û rast bikişîne. Asta min a di nava rêxistinê de pirsî. Min got; “sempatîzan im” û min îfadeyên din jî red kir. Min got; “ezê li dadgehê îfadeya xwe berfireh bidim.” Dixwaze nîqaşê berdewam bike û pirs kirin. Li dozgeriyê ti wateya axaftina zêde û vekirina asta xwe nebû. Ji ber wê mîsoger em bigirtan. Tişta herî guncav mijarên divê werin gotin li dadgehê gotin û pêvajoyên pey wê re ravekirin bû.

Vegeriyam cihê xwe. Min ji yên pey xwe re got; “li cem dozgeriyê tiştekî qebûl nekin. Min îfadeyên beriya niha red kirin. Polîs gefan dixwin ku cardin lêpirsînê bikin. Dixwazin bandor li me bikin.” Di heman kêliyê de rûyek cuda li ber çavê min ket. Ew jî Hisên Morsûmbûl bû. Min beriya niha li Çewlikê nas kiribû. Lêpirsîna wî cuda kirine. Heval dibêjin; “wê îhtîmalek mezin wî berdin.” Dema ez ne amade, rewşa xwe gotiye. Ez aciz dibim ku, li cem Şahîn rûniştiye. Şahîn jî bê navber di-axive. Dibêje; “her tişt xilas, jixwe beriya min her tişt derketibû holê” û wisa dixwaze serê her kesî şêlo bike. Min jî êdî ne karî xwe, pêlava di lingê xwe de derxist û avêt ser çavên wî. Her wiha min dijûnên weke; “ketiyo, bênamûs! Tu xilas bûyî! Tu hewl didî îxanet û xilasbûna xwe veşêrî. Hûn ser halan de jî vî xayînî guhdar dikin. Dizane ku dê were berdan, lewma hewl dide bûyeran cuda bide diyarkirin û bawerkirin. Em te baş nas dikin.” Yên derve jî dengê me dibihîsin. Leşkerên li ber derî destwerdan. Xwestin em bêdeng bin û em hişyarkirin ku evder dadgeh e. Piştî demekê hatin Şahîn derxistin. Min jî got; “wisa baştire.” Ji ber heta ku ew xayîn di nava me de dima, ji bilî xirabkirina moralê me tiştek din nedikir. Weke din jî hewl dida me bandor bike. Lê dema derketî ji min re got; “tu lehengiya erzan dikî. Ma çi maye. Tu parastina çi dikî?” Û gotinên weke vê kirin.

Piştî ku Şahîn derxistin, ez bi Hisên Morsûmbûl re axivîm. Min jê re got; “Şahîn derewan dike. Wî her tiştê ku dizaniya got. Vekirî dibêje UKO xilas bû. Li cem dozgeriyê jî heman îfade daye. Hewl dide xwe veşêre. Bi gişti jî îtîrafkarî heye. Ew dixwaze vê jî bikar bîne û bandor bike. Dixwaze derûniya ‘Her kesî suc kiriye. Sucdar e. Ferqa me ji hev tine ye.’ belav bike.

Hinek jî bandor dibin. Mane dê ev şert û merc her tim wisa berdewam nekin. Polîs zanebûn bi me re hat dadgehê.” Kêm jî be min xwest bi van gotinan hewaya heyî belav bikim. Wê rojê îfadeya her kesî xilas nebû. Jixwe Şahîn pir dirêj ma. Ya Elî Gûndûz jî dirêj kir. Elî matmayî, belengaz, weke sucdarekî, nerehet disekine. Zêde ne-axivî. Heta qet ne-axivî. Diyar bû îfadeya xwe ne guhertibû. Hamilî, Aytekîn û hinek hevalên din jî îfadeyên xwe yên lêpirsînê red dikin. Cardin em hemû li maşînê siwar kirin û paşve birin 1800 evler’an. Ya rastî ger bixwestan dikariyan heta nîvê şevê îfadeyên dozgeriyê xilas bikin. Mîsoger bi armancekê em paşve birin. Ji ber îfade dihatin guhertin.

Em li odeyên qeta herî binî bicih kirin. Deriyê her sê odeyan nêzî heve. Derî ji beradeyên hesin in. Ez û Ayten bi hev re ne. Nizanim çima Elîf anîn cem me. Îfadeya Ayten hatibû girtin. Êdî ez jî bi çavek dê were berdan lê dinêrim. Dîsa jî mirov heta kêliya dawî jî nikare tiştekî bêje ku were berdan. Aytekîn û Hamilî her tim bi hev re ne. Lez û bez tên volta davêjin. Carê Aytekîn tê ber derî di-axive û bi şêwazek henek dibêje; “me ji xwe re kar dît. Ger ez derkevim, ezê biçim gund ji xwe re çêlekan xwedî bikim. Ev jî nesîhetê Şahîn in.” Min jî ji wan re got; “hûn çawa bi wî re li cem hev dimînin? Şahîn, Riza û Elî çi dibe wisa? Her tişt asayî tê dîtin. Ma mirov evqas bêbawer ketine? Ma evqasî bandor bûne?” Gelekî xemgîn dibim. Bela xwe li min dide; “ma her kes nikare weke te pêlavê bavêjiyê!”

Nîvro Şahîn derxistin. Ne hat fêmkirin dibin ku derê, ji bo pêdiviyan bû, an jî tiştek din bû nizanim. Min jî lalîka xwarinê bi xwarinê ve avêtê û qîr kir; "bênamûs, tu dîsa diçî kuderê." Ji ber vê jî di hundir de çi hebe leşkeran girt û bir û gotin; "hûnê dernekevin ber derî." Ev jî bertekên ku zêde ti wateya xwe jî tinebûn. Ma kî dizane, dibe ku ya min jî li dijî bêbertekî û rewşa heyî ku asayî tê dîtin bertekek be. Ma avêtina lalîk û pêlavan, ji bona îxanetê ne dibû bertek! Tenê ji aliyê wijdanî ve rehet dikir. Paşê Şahîn ne anîn nava hevalan. Bes çûna wî jî di nava giştî de guman û tirs zêde kirin. Bêdengiyek heye, îhtîmala ji nû ve destpêkirina lêpirsînê heye. Ev bendewarî jî stresê zêde dike. Lewma kes nêzî derî nedibû. Ji bilî Aytekîn û Hamilî kes temaşe jî nake. An jî awirên xwe jî dizivirînin. Çiqas bi êş e!

Roja dewem û sêyem jî girtina îfadeyan berdewam kir. Nêzî hefteyekê em birin û cardin anîn wê qeta binî. Dengê êşkenceyên jorê besî her tiştî bûn. Jixwe armanca dijmin jî ew bû, me di vê derûniyê de bigire.

Di roja siyê ya derketina dadgehê de Ayten hat berdan. Ango pêvajoya lêpirsînê di rojên çilî de bû. Ev berdan ji nişka ve çêbû. Dema çû, min cardin di guhê wê de got; "bila heval teqez tevdîran bigirin. Tu çi dikî bike, hevalan bibîne. Ji her kesî re nebêje. Hevalên pê bawer bibîne û ji wan re bêje." Me hev hemêz kir. Hamilî jî ew hemêz kir. Got; "li xwe baş binêre." Çavên Ayten tije rondik bibûn. Hem kêfxweş bû, hem jî ji bona em di wî halî de dihiştin û dihizirî ku emê cardin hevûdû nebînin, gelekî xembar bû. Heta ku çû jî bi çavek êş li me dinêriya. Ez hinek din rehet bûm. Hem ji bona dê heta

derve biçe, hem jî ji bona Ayten gelekî baş bû. Bi tenê bi dijmin re şerkirin hêsantir bû. Ez hizirîm ku îfadeyên me kêrî tiştekê hatibûn.

Heman rojê dema ez li eywana dozgeriyê ya rawestgehê bûm, li ber deriyê derabeyên hesin (demîr parmaklik) Hisên Yildirim xuya kir. Tesadûf ez jî diçim û dihatim. Tam dema berê min ket derî, em rû bi rû hatin. Çenteyê wî di dest de, li ber wî jî bergê parêzeran hebû. Got;

"Sakîne, keça min, ev tuyî! Ev çi hale! Tu ketî wê rewşê ku nayê nasîn."

Li hundir temaşe kir. Rihê her kesî berdayî, çav û hinarkên rûyê her kesî daketiye, naxuyên. Hamilî jî hat. Di naskirina wî de jî zehmetî jiya. Ya rastî ji ber mezinbûna rû û serê Hamilî zêde naxwiyê ku rûyê wî daketiye. Leşker ket navberê.

Got; "Destûrê bigire, wisa were." Wî jî got; "Temam." Di cihê xwe de nasekine. Ji leşker re jî bi nêzîkbûnek rêzdar got; "temam, temam, ezê destûrê bigirim û wisa werim." Bi vegotina wî re, tirs, matbûn, baldariya wî ya li hemberî me û her tiştê wî ji min re ecêb dihat. Dibe ku piştî ewqas roj dîtina kesekê jî baş be, bes ev kes jî ne Hisên Yildirim bûya, yeke din ba, dê mîsoger baştir bûya. Jixwe min jî yekser bertekên xwe jî dabû der û got; "ev jî ji kur derket." Piştî demekê cardin hat û got; "min wekaleta te, Hamilî û Mistefa girt. Dê niha wisa be. Mereq nekin, hûnê derkevin. Malbatên we jî li vir in (Elezîzê) dê werin. Ma pêdiviyek we heye? Lê keça min divê hûn hişyarbin. Birêz Cahîd mat maye, dibêje; "helal be jê re, fikirê xwe diparêze. Min rêz girt." Bes dîsa jî tu gotinên wisa tûj nekî baş dibe. Nexwe dê li dijî te bikar bînin. Dê ew jî li te vegerin."

Ango şireta li min dike! Mijara me jî weke ku mirov di behrê de xwe bavêje mar û hemêz bike bû. Dîsa jî me got; “baş bû ku parêzer hat. Qet nebe emê agahî ji derve bigirin, an jî bikarin bidin derve.”

Piştî ku Ayten çû, ez di odeya qeta herî binî de bi tenê me. Min betaniyek qirêj li xwe pêçaye, nîvî xwe dirêj kiriye, ya rastî min xwe daye hev û hewl didim xwe di nava wê de gerim bikim. Boriyên tuwaletê yên qetên jorê hemû di nava hucreya ku ez lê dimînim re derbas dibin. Cihek ritubet e, bêhn û serma tev tevlîhev dibin. Tam di kêliya ku ez kûr çûm hênijîm de yekê di şibakê re bang kir; “Sakîne, Sakîne!” Ji nişka ve rabûm ser xwe. Ez jî mat mam ku çawa derketim ser ranzayê. Ji cihê xwe firiyabûm. Dilê min lez lê dida. Min got; “heval in! Temam, Hevalan ser vir de girt.” Di wê kêliya çirkeyekê de ev hatin bîra min. Derve reş û tarî bû. Şibake biçûk, teng û tewiyayî bû. Min li hember xwe serê leşkerekê dît. Murad e. Muradê ji Çermikê. Xwedê bela xwe bide! Min got qey heval in. Kelecana min tev şikest.

Got; “tu çawayî?” Diyar kir ku ew ji ewlekariya lêpirsînê ya derve hatiye derxistin, bes ji bona anîna xwarinê hatiye vir. Ez jî dihizirîm ku çima nedihat. Îhtîmalek mezin ji ber ku Kurd bû, bal kişandiye. Murad bi kelecanekê got; “demance bi min re heye, ez dixwazim bidim te.” Ez mat mam. Min pirsî; “demanceya çiye, niha li cem te ye?” Got na, dema ji pêvajoya destûra malê vedigere, aniye, ger ez bixwazim dê bide min. Yekser rev hate bîra min. Min got; “niha dev ji demanceyê berde. Tu dikarî derve bidî hevalan. Li Çermikê hevalên me hene. Tu dikarî bidî wan. Bes ger derfet hebe, alîkariya min

bike, ez ji vir birevim.” Vê carê jî ew mat bû. Li derdora xwe temaşe kir. Dengê xwe hinek din nizim kir û got; “hevalên min di maşînê de li benda min in. Min xwe ji wan veşartiye wisa hatime. Min xwest pirsa te bikim, tu çawayî. Ger şibake nehesin ban dibûya.” Min jî hêdîka got; “lenet be! Çi bêşansiye!” Murad pirsa pêdiviyên min kir û çû. Mîsoger ji wê daxwaza min ji nişka ve kir tirsiya. Got; “ezê li girtîgehê werim serdana te, dê li wir nebe pirsgirêk. Ezê hinek tiştan bikim hêcet û werim.” Ez bawerim ev jî xwedîderketinek Kurdinî bû!

Dibe ku Murad tiştek pir cuda nekiribe. Lê ew kelecan jî bes bû. Ango rev! Ez cidî cidî hizirîm. Hema weke di nava pêşbaziyê de li nav xeyala me. Rewşa ez di hundir de me, xwesteka min a reva derve zêde kûr dike. Xeyalên ez dikim jî tên guhertin. Hinde ez xeyalên xweş ji xwe re dikim, hemû ji hev xweşiktirin. Plansaziyên balkêş ên revê hene! Carê di navberê de jî bi qulfê mifta derî dilîzim. Ji bona bal jî nekişîne, desmala xwe li hesin dipêçim û bi wê dilîzim. Nabe, qulfe venake. Lê belê, kelepçe vekiribû. Di beşa jêr de du deriyên din ên diçûn derve hebûn. Ew jî deriyê odeya ez lê dimam û deriyê korîdorê bûn. Weke din jî mirov diçe qeta jorîn. Deriyê wê jî yê diçe derve heye. Paşê araziyek berfireh heye. Gelo dê mirov bikare leşkerên nobedar hêsan derbas bike? Li taxê hinek malên nas hene. Gelo ezê bikarim wan malan nas bikim? Tişt nabe, evder zehmet e, ezê li girtîgehê biceribînim.

Piştî îfadeyên li cem dozgeriyê em hemû bi hev re derxistin dadgehê. Her wiha em hatin girtin û em birin girtîgehê. Bes Şahîn tenê yekser serlêdan kiriye, an jî dijmin tevdîr girtiye. Weke din jî şandina girtîgehê, ji ber ewlekariya wî ji bona ji

girtiyên din cuda were girtin jî, dadê daxwiyanî da. Ketiyo! Nexwe ewlekariya wî tine ye! Gelo ji ber min pêlav û lalîk avêtibûyê, ewlekariya wî di xeteriyê de bû? Lê na, dijmin jî û ew jî ditirsiya û biguman bûn. Wî PKK baş nas dikir. Ma dê heta kengê bikariya îxaneta xwe veşêre?

Jixwe em jî pir vekirî jê re dibêjin; “Te îxanet kir.” Kêfa min jî ji vê re tê. Ya rastî ev jî tirsa PKK’ê bû. Ev tirs jî besî wî bû. Ji aliyekê ve jî hêrs dibûm. Min ji xwe re digot; “Xweziya di nava me de bûya, dê me ew ji holê rakira. Hevalên ku bikarin vê bikin hene. Dê me mîsoger rêya vê bidîta.” Lê girtîgehek çawa ye, em hêj wê jî nizanin. Heta em birin girtîgehê jî min nedizanî avahî li kuderê û çawa ye. Hinek hevalan gotibû; “dibe ku li ser rêya Xarpêtê be.”

Medreseyên xarpetê ji me re bibûn ‘zindan!’

Em birin avahiyek gewr, du qet a li quntarên Xarpêtê. Hema li ser rê, li çepê dikeve û li derdora wê çend holik hene. Kelepçeyên me vekirin. Ez cuda kirim. Li pêşiya me Elîf jî ji cîpê daxistin. Ew bê kelepçe ye. Ecêb mam çima ew ne berdabûn? Gelo weke şahidê bûyera Celal digirtin? An jî ji bona bêhna min teng bikin digirtin? Bi rastî jî bêhna min teng dibû. Serbazekî got; “bila jin werin vî alî.” Ji nişka ve hat bîra min ku dê me bixin wan holikên ku hinekê dûrî avahiyê hatine çêkirin. Belê, avahî weke yek malê dixwiyê. Qet naşibe girtîgehên ku min beriya niha dîtine. Du qet e. Şaneşîna qeta jorîn heye. Ser girtiye, lê kêlekên wê vekirîne. Şibake di astên navîn de ne. Hem têlên wê yên li hev pêçayî hene, hem jî li derdor derabeyên hesin hene. Hinek ji hundir ve li me temaşe dikin. Serbaz got; “bila xort jî werin.” Bi dorê kelepçe vekirin û birin hundir.

Heval derketin qeta jor. Ez wan, ew jî min bi mereqek mezin dişopînin. Carekê Aytekîn weke ku bêje; “xêre biçî kur?” Li min temaşe kir. Min jî got nizanim. Di navbera axaftinan de dibêjin alîgirên rastgeran hene. Nexwe emê bi faşîstan re li heman girtîgehê bimînin. Ma dê çawa be? Ev qasî di nava hev de tiştek ecêb e. Em jî birin odeyek qeta binî ya deriyê wê cuda. Ji aliyê hundir ve beşek ku deriyê wê nû hatiye çêkirin li ber çavê min ket. Nexwe ji beşên din cuda kirine. Dengê zilaman ji hundir tê. Dengê faşîstan bû. Di navbera me de tenê dîwarek hebû. Cihê ku bi kelpîçan hatibû lêkirin, teniktir bû. Carna dengê wan pir zelal dihat. Ji min re ecêb bû. Çawa dibe em evqasî bi faşîstan re nêzî hev bin!

Elîf dan cem min. Bes hêj nû ketibû hundir, bangî Elîfê kirin. Ez heta wê kêliyê qet bi Elîfê re ne-axivîm. Min bi awirên tûj lê dinêrî. Ji min re pir kirêt dixwiya. Min hêj wate ne dida. Gelo ew çima girtibûn? Gelo Elîf hinekê jî ji ber wan xisletên jiyana burjuvaziya biçûk hat bikaranîn? Dibe ku tirsiya jî be. Ji ber polîs ji bona kesayetên wisa, tenê karmendên dewletê bûn. Derdorên ku hemşîreyan herî zêde têkîlî bi wan re dijiyan ew kesên serbaz û polîs bûn. Hêj Elîf li jorê bû, bangî min jî kirin. Sitvanê (Yûzbaşiyê) bi rûtbe got:

"Sakîne xanim, dê tu û xanima Elîf bi hev re bimînin. Bes xanima Elîf dibêje ku ji te ditirse. Bertekên we li dijî wê hene. Evder girtîgehe. Tenê odeyek me heye. Cihek din ku em jinan bixinê tine ye." Min yekser da diyarkirin ku ez naxwazim bi Elîf re bimînim. Paşê min axaftinên xwe berdewam kir.

"Ez wê nas nakim. Ne diyare gelo polîs e, hemşîre ye, an jî tiştek dine. Di pêvajoya lêpirsînê de ji me cihê girtin. Ya rastî her tim serbest bû. Heta bi polîsan re tevlî wextên êşkenceyê jî dibû. Mane divê hûn kesek wisa serbest berdin." Zilam jî got;

"Em nikarin wê biryarê bidin. Me jî eleqeder nake. Dadgehê biryar daye. Ger em we herduyan bi hev re bixin cihekê, dê tu çi bikî? Ma yê tu, wê bikujî? Bawer nakim, tu naşibî kesek wisa."

Min got; "min tiştek wisa negotiye. Bes ez naxwazim bi wê re li heman cihî bimînim. Sedemên wê jî min diyar kirin. Kesayetek xwedî xisletên cuda ye. Ger tiştên ku dijberî jiyan û rêgezên min bike, ezê li hember vê bê helwest nemînim." Ez şandim cihê min. Elîf demek dirêj li wir ma. Ez bawerim bi dadgeha rêveberiya kargeriya awarte re (Sikiyontimê) hevdîtin çêdibin, lê paşê dibêjin bila bimîne. Dibêjin li girtîgehên din beşên jinan tine ne.

Girtîgeha duyem, hema li binya rê ye. Dibistanek kevne. Kirine girtîgeh. Di encamê de Elîf anîn cem min. Armancên wê hebûn. Gelo dixwestin bi rêya wê min venêrînin? Min jî digot; "bila bikin. Ev jî şêwazek şer e." Lê dîsa jî demek dirêj nêzî wê nebûm û min eleqeya xwe jê ne anî. Em bê baldarî û bê axaftin li heman odeyê dimînin. Pir kêm hinek axaftinên ji neçarî tên kirin. Herî dawî Elîf xwest bi-axive. Aytekîn li Meletî'yê wê nas dike. Di navberê de dema em derdikevin hewa girtinê, ji ber saetên me jî yek in, ew silavê didin hev. Ew jî hewl dide Elîf bandor bike.

Aytekîn got; "de ka em jî fêm bikin. Ya rastî dema li Meletî bû ewqas jî nexirab bû. Celal ew xirab kir. Weke din jî ez bawerim ditirse. Ger dijmin jî hinek sozan nedê, dibe ku cuda be. Jixwe xisletên çîna wê jî guncav in." Hewl didin min di vê mijarê de qane bikin. Gotin; "rehma te tine ye. Jinek li cem te ye. Pê re bi-axive, dê tu wê bandor bikî."

Gelo ez pir teng û bi bertek nêz dibûm? Ne baş bû ku, em Elîfê zêdetir ber bi dijmin ve biherikînin. Niha wê jî lêpirsîna tiştên ku di wê pêvajoyê de jiya ne, nêzîkbûnên dijmin û helwesta xwe ber çavan re derbas kiriye. Wê demê divê em jî vekin û bidin axaftin. Yek-du caran di bin navê girtina pere û zêran de bangî kirinê, birin îdareyê. Gelo hêj ew bikartaniyan? Ev gumanên me jî ne vala bûn. Me di pêvajoya lêpirsîna destpêkê de hewl da alîkariya wê bikin, me jê re got dê li hember polîsan helwestek çawa raber bike, wê jî çûbû ji polîsan re gotibû. Dibe ku dîsa heman tiştî bike. Di cihê hewa girtinê û peywendiyên din hemûyan de çi dibîne diçe dibêje. Her çendî em bi şîfre, an jî rêbazê ew fêm neke de bi-axivin,

wê em dibihîstin û didît. Êdî tam pê bawer bûm ku me di bin venêrînê de digirin. Tevî vê jî min hêdî hêdî dest bi axaftinê kir. Ew jî vê axaftinê dixwaze, heta kêfxweş jî bû. Min ji lîstokên dijmin ên rasterast û dorveger hinek mînak dan. Yekser neketim nava rewşa wê. Wê bi xwe behsa hinek tiştan kir. Ez jî dixwazim bizanim çawa hatiye girtin û pêvajoya lêpirsîna wê hîn bibim. Bi xetên giştî ve vegot. Di vir de xisletên kesayeta wê baştir tên fêmkirin û nasîn.

Pêdiviyên me yên giştî hevalan pêk danî. Her tim şîret li min dikirin, da ku zêde cixareyan nekişînim. Bi çend gotinan jî be, hinek tiştan dinivîsim. Ev jî dibe moral. Her tim Aytekîn û Hamilî ji min re digotin; "Seko." Wê gotinê jî hestên nêzîhevbûn, germahî û girêdanê zêde dikirin. Dema em li derve bûn, ev tişt zêde nedihatin ferqkirin. Ya rastî di kesayeta hinek rêhevalan de hezkirin, rêzdarî û girêdan zêdetir vekirî diyar dibû. Her rêhevalek nirxek bû. Lê nirxê zelal bû, zêdetir ji dil û can dihat hezkirin. Dibû hêzek nirxê ya vekirî, dikişîne û dide hezkirin. Lewma min jî di vê manê de ji dil û can ji Hamilî û Aytekîn hez dikir. Dema mirov li derve ye, hewl dide vê nede hîskirin. Ji ber nêzîkbûnek hêj kamil û hêj bi pîvan çêdibû. Di hundir de jî ev girêdan zêdetir dibû û nedikariya xwe veşêre. Li dijî dijmin bi înad pêş dikeve. Her çendî sarbûnek û şikestinek ku pêvajoyê dayî avakirin hebe jî, min ji Reşo hez dikir û nirx didît. Dema em li derve bûn, me ji Hamilî re digot, "Reşo." Ez di nivîsa ji bo derve dinivîsim de pêvajoya lêpirsînê, pêvajoya beriya wê, şêweya girtina me û rewşa dawî dinirxînim. Mijarên ku min di wir de diderbarê Hamilî de nivîsandin, bandor lê kiribû. Weke ku hinekê xeyîdîbû. Gurura wî ranedikir. Min gotibû, Ayten li hemberî wî dane bikaranîn, vê jî çavkaniya

xwe ji lewaziya wî girtiye. Wî jî ev digot. Di cewherê de ferasetek namûsê ya teng û nêzîkbûnek mulkiyetê heye. Her çendî parçe parçe jî be, ez bi xwe jî di vê mijarê de pê re di-axivim û nîqaş dikim.

Kêm jî be, em ji kesên ku tên serdanê di derbarê rewşa derve de agahiyan digirin. Di pêvajoya destpêkê de hinek tirs hebû. Lê belê, girtinên komî û îtîraf, bi taybet nîşandan hinek cihan bandor li girseya me kiriye. Ji ber gelek tişt mezinkirine û şaş hatine diyarkirin bandorbûnek çêbûye. Ev jî xwezayî bû, lê diviya ev rewş were berovajîkirin. Ji ber derve de binyata rêxistinî belav bibû. Ji nû ve dest bi xebatan kirin û xwe gihandina girseyê wext dixwest. Rastiyek hebû, ew jî valahiyek girîng hatibû avakirin. Mirov dikare yek bi yek ji nûçeyan jî vê rastiyê fêm bike. Hevalan peywendiyek çêkiribûn. Dayîka Aytekîn, dayîk û xwîşkên Naîl, dîsa hinek keçên sempatîzan ên tên serdana me hinek agahiyan bi devkî dibêjin. Me karî em îfade û nirxandinên xwe yên lêpirsînê bişînin derve.

Cihê ku heval hevdîtinan lê dikin qelebalixe. Ji bona danûstandina notan û axaftinan guncav e. Lê ji ber em li ber deriyê hesin hevdîtinê dikin, cihê em lê dimînin her axaftin û nêzîkbûnên me di bin venêrînê de ne. Her wiha Elîf jî li cem me ye. Dîsa jî ez wan derbarê pêkanên dijmin û tiştên ku baldar nêz bibin de hişyar dikim.

Yên me jî min bi tenê nahêlin. Dema ez di lêpirsînê de jî heta wir dihatin. Bes agahiyên me ji vê nebûn. Xwedîderketina wan baş bû. Her carê jî dayîka Zeynep behsa xewn û tiştên ku pê dihesiya dikir. Lê belê, ew çavên wê yên çavkesperî (çakir) her tim bi girî bûn. Heyder got ku pir şahnaz im û dema çû jî

îşareta serkeftinê kir. Elî û hemû biçûkên din bandor bibûn. Hezkirin û girêdana wan zêde bû. Li hember pêkanên dijmin jî kîna wan zêde bibû. Dosya Metîn wan jî bi ser doza Elezîzê ve kirine. Li ser wan jî zêde îfade hatibû dayîn. Doxan, Metîn, Mehmet Yildirim û kurê apê Hamilî, Mistefa Yildirim jî anîbûn. Bes Metîn û Doxan kiribûn girtîgeha jêrê. Yên ku piranî li Çewlikê jî hatibûn girtin li wir bûn.

Şahîn jî li heman girtîgehê bû. Ewder ji du beşan pêk dihat. Şahîn kiribûn beşa ku nexeter bû. Lê me agahî digirt ku hewl dide kesên rewşa wî nizanin, bandor bike. Di dema hevdîtina min û Metîn de em li ser vê mijarê jî axivîn. Me ji wan re got divê hişyar bin, ji bona kesên nû tên nekevin bin bandora Şahîn, divê di navbera xwe de rêxistinkirî bin. Ji ber ketî vala nedisekinî. Dixwest her tiştî bi xwe re xilas bike. Divê îxaneta Şahîn baş were fêmkirin. Hinek ehmeq hene hêj behsa îtîrafkirinê dikin. hêj li derve rewşa Şahîn weke mijarek nediyar didin destnîşankirin. Ti eleqeya vê bi prestîja rêxistinê ve jî tine ye. Di hinek şîroveyan de tê gotin ku, partî bi zanebûn belav nekiriye, ji ber guman heye mirov pê bandor bibin, lewma nehatiye eşkerekirin. Ya rastî ev helwest ne yên partiyê bûn.

Dema dayîk û xwîşkên Naîl dihatin serdana wî, dihatin cem min jî. Dayîka wî di astekê de pîvanên kevneşop derbas kiribûn. Lewma me dikariya em mala wan ji bona perwerde û civînan bikar bînin. Ew jî bi baldarî tevlî dibû. Ew jî û keçên wê jî zêde bi Naîl ve girêdayî bûn. Tevî ku hevjîna wî mamoste bû, bêbaldarî bû. Aliyên wê yên Kemalîst zêdetir bûn. Ji Mazgirtê bû. Li Elezîzê, kolana Îstasyonê bicih bibûn. Girtinên

komî bandor li wan kiribûn, li hember îtîraf û îxanetan bi hêrs bûn. Her tim dipirsîn; “gelo dê Naîl ceza bixwe an na?” Ji ber ew bi xwe dihatin û eleqeder dibûn, agahiyên cur be cur ji derve danîn. Ev jî pir girîng bû. Min jî ji wan re got, divê vê nêzîkbûna xwe bidomînin û ti caran bê hêvî nebin, dudilî nêz nebin. Ji ber diviya di pêvajoyek wisa de em peywendiyên xwe qet ji wan qut nekin û her tim bi wan re mijûl bibin. Li Elezîzê hejmarek zêde mirovên di heman rewşê de hebûn. Ez di vê mijarê de nerehet bûm. Ew jî derdorên ku me nû peywendî bi wan re pêş dixist in. Weke din jî derdora me ya sempatîzan û berfireh jî zêde ye. Dê ew jî ji nêvengek bêrêxistinî bandor biban. Dibe ku hinek derdorên ku di ferqa pirsgirêkê de rêya xwe bibîne û girêdana xwe cardin ava bike, lê pêdiviya yên din heye. Ez jî di vê çarçoveyê de bi wan re axivîm. Min got; “peywendiyên xwe bi derdor re qut nekin. Dibe ku em ketine hundir, lê divê hûn erkên me pêk bînin.” Dayîka Naîl bi sîtem li min temaşe dikir. Got; “xweziya ez li şûna Naîl di hundir de bam.” Tişta herî zehmet qanekirina malbatan bû.

Ji nava malbatên din jî hinek dihatin. Her carê teqez dayîka Aytekîn dihat serdana min. Di vê mijarê de ti caran gotina Aytekîn li erdê nedida. Weke din jî carê ji wan jî agahî danî ji min re. Dema em li derve bûn navbera me baş bû. Ez carê diçûm mala wan. Lê dîsa jî tirsa wan hebû û her tim gumanên xwe bilêv dikirin. Her carê digot; “ma keça min zêde êşkence li te kirin? Êşkenceyek zêde li Aytekîn kirine, bes ji min re nabêje. hêj binê lingê wî şîn û reş in. Xwîn lê hişk bûye. Qalik girtiye. Ez çi dikim, şanî min nake.” Ev jî sîtemên wê yên bi êş bûn. Paşê digiriya. Ji bona em wan bandor nekin, zêde Aysel û Alaattîn nedanî cem me.

Yek û yek girtiyên ji endamên Dev-Sol (Çepgirên Şoreşger), TÎKKO (Artêşa Komînîst, Gundî a Karkerên Tirkî), HK (Rizgariya Gel) û Dev-Yol (Rêya Şoreşger)'ê hene. Bi hevalan re li heman beşê dimînin. Pirsgirêka pirtûk, rojname, radyo û hw hene. Ji bilî hinek rojnameyên rengîn ti rojnameyan nadin. Bi îdarê re hevdîtinek pêk hat û nîqaş çêbûn. Nûnerên ku nûnertiya girtiyan dikin hene. Lewma pirsgirêkan jî ew radigihînin. Em jî di navberê de daxwaznameyên komî didin. Em hewl didin pirsgirêkên heyîn di rojevê de bigirin. Jixwe bi gelemperî mercên girtiyan tên zanîn, lê nabe ku her tişt ji bextê dijmin re were hiştin. Ji ber em girtiyên siyasî bûn, pêdiviyên weke pirtûk, komar, rojname, radyo û hwd hewce dikir. Gelek tiştên ku malbat danîn nedidan me û lêgerîn jî pir xirab e. Her tiştê ku tên piç piç tê gerîn. Heta cihên hatine dirûtin û fermaran jî digerin. Dirûnên piştstûyên gomlekan û delingan tên vekirin, wisa derbasî hundir dikin. Her wiha derziyek lihêfan jî qedexe ye. Lê cewaz nêzî faşîstan dibin. Hinde vê jî vekirî dikin, malbatan her roja hevdîtinê li cem nîzamiyê nîqaş dikir. Rojên serdanan û saetên wan cuda bûn. Lê dîsa jî dibû pirsgirêk. Rojên destpêkê hevdîtin di heman rojî de, bi dorê, kom bi kom digirtin hundir. Paşê roj û saet guhertin. Dîsa jî pirsgirêk çareser nebûn. Di rojên serdanê de malbat ji her alî ve dihatin. Ev jî pir xeter bû. Ji ber helwestên pir vekirî malbat tehdît û tehrîk dikirin hebûn. Lewma malbat jî aciz dibûn.

Rewşa me ya di hundir de jî zêde ne baş e. Dema heval ji bona hewa girtinê derdiketin, di şibakan de axaftin ji hevalan re dikirin. Dema ew derdiketin, vê carê yên me wisa dikirin. Di çûnûhatina îdareyê de liqay hev dihatin. Negengaz bû ku, di warek evqas biçûk de em liqay hev neyên. Di nava îdareya

girtîgehê, serbaz û leşkeran de yên vekirî parastina faşîstan dikirin hebûn, girêdanên hinekan jî bi wan re hebûn. Jixwe dijmin bû, nêzîkbûnên wan ji me re cuda, ji wan re jî cuda bûn.

Tevî ku du girtîgeh hebûn, sazûmaniyek wisa hêj ji serî de em dan bifikarandin. Me jî digot; "dijmin bi zanebûn tevdigeriya. Dê hinek tiştan bi provakasyonan bike." Negengaz bû ku, em nekevin ferqa van rewşan û pê nehesin. Tiştên ku rû bidan neveşartîbûn, ji ber dijmin ji gelek aliyan ve êrîş dikir. Tiştên ku li cihekê temam nekirine, ne kariye bike, dixwest ji eniya din temam bike. Bi giştî jî zext û qedexeyên dijmin bi şêwazên cur be cur berdewam dikin. Lewma guman û lêgerîna ku ev dibin sedem pêş dikevin. Xwestek û hewldana pêşiya van pêkanan girtinê, di nava girtiyan de yekbûnek hevbeş avakirin, nêvengek hevbeş û birêxistinkirî ya dijmin nekare her tiştî bike avakirinê heye. Ji aliyek din ve jî şerek hundirîn, nîqaşên derbarê pêvajoyên lêpirsînê de û bi xwe re hesab xwestinek heye. Derûniya destpêkê di astekê de hatiye şikandin. Helwestên weke bêbawerî, lewaziyên hev li dijî hevûdû bikaranîn, tewanbarkirin û xwe veşartinê hem hinek tişt zêdetir zelal dikirin, hem jî dida diyarkirin ku kî çiye û dikare çi bike. Bi hinekan re tefisandin, tirs û meyla di halê xwe da mayînê pêş diket, bi hinekan re jî, ew bêbaweriya di bingehê lewaziyan de dihat jiyîn har dibû, digiha asta ku partiyê tewanbar bike. Lê belê, li kêleka van jî hewldana xwedîderketina partiyê, lêpirsîna pêvajoya hatiye jiyîn û di vê çarçoveyê de rastiya xwe dîtin jî pêş diket.

Di destpêkê de, ji gelek tiştan re wate nedihat dayîn, an jî nêzîkbûnên teng, seresere û xwe xapandî dihatin jiyîn. Bi vî şêweyî dewlet-dijmin re rû bi rû hatin nehêsan bû. Dîsa encamên ku derketin holê jî gelekî cidî bûn. Diyardeyên weke bawerî, îrade û girêdanê herî zêde jî di pêvajoyên wisa zehmet û tevlîhev de diyar dibûn.

Hesab, lîstok û planên dijmin, ne ji rêzê bûn. Tişta herî girîng parastina rêxistinê, nûnertiya wê kirin û ew xeta zirav a di navbera îxanet û berxwedaniyê de dîtin bû.

Ev girtinên destpêkê yên komî bûn. Di rastiya komekê û herêmekê de li dijî tevgera me êrîşek dijwar rû dabû. Dixwestin ji vê xelekê darbeyek mezin li tevgerê bidin. Dibe ku destpêkê her tişt wisa baş plankirî û bi hesabkirina pêşketinên ku rû dayîn re nehatibe kirin. Lê ev jî gavên plansaziyek dem dirêj bûn. Ev rastî baş dihatin dîtin û gotin. Her wiha mijarek din a mîsoger bû; hem ji ber qadek ku pêşketinên cur be cur di nav de rû didan û di asta civakî de rûxandinek dihat jiyîn, hem jî ji ber lewaziyên li vê qadê hatibûn ferqkirin û bawer dikir ku dê encaman jê bigire, li gorî xweseriya herêma Elezîzê hinek tişt diceriband. Ango her tişt ne tesadûf bû.

Ji bona dijmin pêşketinên li qadê, binesaziya rêxistinî, hinekê jî kêrhatî û cihek stratejîk ku bi her qadê re girêdana xwe hebû, lewma gelekî girîng bû. Weke din jî herêma Elezîzê, qada ku dewletê herî zêde xwe lê bisazî kiribû. Dîsa herî zêde li vê qadê rêxistinbûna faşîzan berfireh kiribû. Ji ber girêdana binesaziya civakî ya weke qadên Çewlik, Meletî, Erzîngan dişibin hev, armanc û hewldana wî ew e, dixwaze van deran bi girêdayî Elezîzê di bin venêrînê de bigire, herêmê bike

baregehek bingehîn. Navendek wisa faşîzan a xwe bisazî kiriye, dibe ku li dijî pêşketinên cihên weke Dêrsim, Amed, Hîlwan-Sîwerek û Êlihê bersivdanek be.

Dîsa rastiyek din hebû. Di pêvajoyên destpêkê de Rêbertî bi xwe û gelek qadroyên pêşeng dihatin vir û diçûn, civîn lidardixistin. Heta ji bilî civîna Enqere ya Dîkmenê, li vir civînên komên girîng çêdikirin, xebat û vesaziyên bi navê şoreşgerên Kurdistanê herî zêde li vir dihatin kirin û kar dihat meşandin. Di heman demê de li vir komên çepgir ên Kurd û Tirk hebûn. Her wiha rêxistinên sîxûran ên yekser girêdayî dijmin hebûn. Ya rastî zemînê pêşketinek pir mezin dida avakirin. Lewma sazûmaniyek rêxistinî ya ji van pêşketinan re pêşengiyek rast bike û hêz bide hewce bû. Her wiha gelek qadro û qadroyên berendam hebûn. Lewma di nava girseya gel de xwe berfirehkirin, bi kûranî pêşxistina rêxistinê jî hewce bû. Ji bona vê jî pergalek ku bide rûniştin pêwîst dikir. Ji bona piştî Kongreya Damezirandinê asta pêşketinek bi vî rengî were bidestxistin, li vê qadê moral, perspektîf û derfetên dest dide, mercên din jî cem hev bin hebûn. Lê mixabin rastiya rêvebir û qadroyên pêşeng cuda bû.

Em ji ast û ramanê bikare van pêşketinan pêşwazî bike, bi hostane bersiva êrîşên derve û hundir bide dûrbûn. Me hêj yekbûna xebatek ku bikaribe li hember hinek bûyeran di şêwazek radîkal a şoreşgerî, wext û cih de helwest raber bike û serwer be pêş nexistibû. Zêdetir şêwaza karek şematîk, teng, rojane, hinekê jî jixweber birêve dibe serwer bû. Gelo dijmin çiqas di ferqa vê de bû, bi rastî jî ma haya xwe ji her tiştî hebû? Zehmet bû ku em van bêjin û her tiştî jî ji vir bigirin dest û

binirxînin. Bes hinek tişt diyar dibûn. Çi şaşî û lewaziyên ku çavkaniya xwe ji me digirtin, çi jî hinek encamên ku ji dervî me rû dane û bûne sedema van hebûn. Ev encam jî li holê bûn.

Min di nivîsa ku ji derve re nivîsandibû de, kêm jî be encamên ku ji pêvajoyê derxistine nirxandibû. Min di astek girîng de aliyên ku çavkaniya xwe ji me digirtin didît. Min ev îxanet weke darbeyekê binav kiribû. Bi temamî girtinên ku çêbûne, encamên ku van girtinan derxistine holê, tev binkeftin bûn. Ji ber îtîrafkariya giştî jî ne di astek biçûk de bû. Şahîn vekirî bû. Her çendî hêj veşêrin, ji aliyê partiyê ve dihat fêmkirin. Min ti îhtîmal ne dida ku bandora vê derve de zêde neyênî be. Baweriya min li hember partî û Rêbertiyê hebû. Wê berovajî li dijî îxanetek wisa navxweyî, helwestên şoreşgerane û biryardar werin pêşxistin. Di vê mijarê de baweriya min tam bû. Lê dîsa jî tevî vê agahiyên weke heta niha li herêmên weke Çewlik, Elezîz û Dêrsimê ev bûyer hatiye veşartin, ji qadroyan re vekirî nehatiye gotin, bandor li me jî dike hebûn. Em hêj nizanin derve di vê mijarê de tam çi dihizire. Lê agahiyên ku ji qadên em girêdayî wan e tên, di notan de hinek tişt tevlîhev kirine. Em di vir de bi temamî bêbaweriyek mezin li hember hemû komê dihesin. Pênaseyên weke; "her kes îtîrafkar e. Her kesî suc kiriye" û hwd diyar dibin. Lê di heman demê de xwedîderketinek vekirî jî heye. Peywendiyên me nequt in. Ev jî bi rêya malbatan tê sazkirin. Hewldanek bi her awayî ya fêmkirina rewşên heyî diyar dibe. Lê texmîn û bihîstinên derbarê çawa tên nirxandin de û rewşa ruhê em dijîn dema dibin yek bi me re bêmoraliyek mezin dide avakirin.

Ev bandor bi her kesî re cuda derdikeve holê. Berî her tiştî berxwedaniyek hêjayî tevgera me û taybetmendiyek li gorî

ruhê wê guncav nehatibû lidarxistin. Çewsîneriya vê jî hebû. Îxanetê giraniya xwe dabû avakirin. Di pêvajoyek pir girîng de dijmin xwest vê îxaneta navxweyî jî bikar bîne û di gelemperiya welat de tevgera me hedef bigire. Her tim gumana weke; "gelo dibe ku radeya girtinan berfireh bibe?" Hebû. Rast e, bawerî qet nehêjiyabû û xilas ne bibû. Baweriyek balkêş heye, di vê mijarê de bandorbûnek neyênî jî tine ye. Lê hinde îxaneta heyî har bû, xwezayî bû ku heval jî gumanên wisa bijîn. Dema polîs di lêpirsînê de îfadeyên Şahîn parçe parçe dixwend, li cihekê nivîsandibû dibe ku hevalê Xeyrî, heta Rêbertî jî li aliyê herêma Mêrdînê wan deran bin. Ketiyo, tiştên ku texmîn jî dikir nivîsandibû. Êdî zelal bû çarik li ber kirine û ji bona operasyonê birine Amedê. Wî bi xwe ev îtîraf kiribû.

Riza cardin heman helwestên xwe yên derve berdewam dike. Dike rik û hinek helwestên xwe vedişêre. Hinekan jî bi hêcet rave dike. Ji aliyekê ve baş e ku di nava hevalan de ye. Ger bi temamî teslîmî dijmin nebe, dê hevalan ji aliyekê ve ew bigirtan û xilas bikiran. Pir xirab e ku di destê dijmin de bibe amûreke lîstokê. Kesî nedixwest ku rewşek wisa were jiyîn. Weke din jî derdorek wî ya malbatî heye. Diviya bi wan re jî peywendî hebe, da ku vê pirsgirêkê bi wan jî bidin fêmkirin. Me got; "ger girêdanê wan bi rêxistinê re hebin, rêzdar bin, duristbin, xwedî li keda rêxistinê ya li ber wan de dayî derkevin, ger kurê wan jî be, dê li dijî şaşî û sucên wî xwedî helwest bin." Hevalên derve jî peywendiyên xwe yên bi malbatê re qut nakin. Lewma mirov dikariya wan jî ber bi helwestên rast ve bibe. Lê diyar bû hestewar nêz dibûn û nakokiyên beriya niha hatine nîqaşkirin tam çareser nekirine. Dê nêzîkbûna wan a erênî Riza jî baniya rêya rast.

Dijmin, her tim girîngî dida helwesta kesan a di pêvajoya lêpirsînê de. Hêj bikaranîna lewaziyan berdewam dike. Di manekê de girtîgeh berdewamiya wê pêvajoyê bû. Armanca wan netenê ji aliyê fîzîkî ve kesayet ji têkoşînê qut bike, şoreşgeriya wî/ê sînordar bike û di bin venêrînê de bigire bû, di heman demê de hedefa hukumkirina ser bawerî û îradeya kesan, şikandin û ji cewhera wan valakirinê jî hebû. Her çendî di pêvajoya destpêkê de helwestên çors li pêş bûn, paşê mirov didît ku dijmin mirov kêlî bi kêlî ji hebûna wî/ê dûr dixe û ji bona vê jî gelek rêbazan bikar tîne. Dide jiyîn lê çawa? Di nava pergala xwe de dihêle û dike yeke din wisa dide jiyîn! Wê demê mirov jî neçar e ku ji eniya xwe ve pirsa 'jiyînek çawa' bike. Tu girtiyek di destê dijmin de yî û bi gişti jî wateya vê tê zanîn. Ango rewşek bi temamî nehevseng e. Wê kesayet di rewşek wisa de xwe çawa ava bike? Dê ruhê şoreşgerî di nava wan mercên jiyanê de çawa zindî bijî? Ji aliyekê ve dijmin heye, aliyê din ve jî hêmanên dijminahî yên di hundir de hene. Ango şerek bi xwe re ye. Wê mirov van hemûyan çawa bi hev re bimeşîne? Her tiştî rewşa heyî ferz dikir, dida hînkirin, lê kesayet çiqasî rast û di cih de hîn dibû? An jî di wateya rasteqînî de hînbûn çi bû?

Diyar bû Riza heval mijûl dikirin. Ji ber ew di nava hevalan de bû tengezarî dida avakirin. Her ku nîqaşên hundirîn, nirxandinên derbarê pêvajoya lêpirsînê de berdewam dikir, hinek nerehetiyên heyîn vediguherîn bertekan. Her çendî her tiştî nedin diyarkirin jî, min asta nakokî û pevçûnên heyîn texmîn dikir. Carê dihizirîn ku Riza ji nava xwe jî bavêjin. Me jî di vê mijarê de heman tişt dijiya.

Wê rojê destpêkê hevalên me derketibûn. Saetên sibêhê yên destpêkê bûn. Cardin Aytekîn û Hamilî lez û bez dimeşiyan. Piranî bi hev re bûn. Piştî ku Mistefa Yildirim hat girtîgehê berpirsyarê fermî ew bû. Not û agahiyên derve ji wî re dihatin. Ew ji Erzînganê anîbûn. Metîn, Doxan, Mehmet û Mistefa di heman pêvajoyê de anîbûn. Rewşa koma Elezîzê ya giştî ji aliyê Partî ve dihat rexnekirin. Hêj pêvajo, yek bi yek rewşa kesan û rolên wan nedihat zanîn. Lewma di vir de fermî erkdarkirin nexwezayî bû. Kes jî ne li benda tiştek wisa bû. Ew jî ne li bendê bû. Her kesî xwe tewanbar dikir, digot suc kiriye û ji her cure cezayê ku Partî bide re jî amade ye. Berî her tiştî xwe dana dest, ango hatina girtin suc bû û îtîrafkarî suc bûn. Van girtinan xebat dabûn rawestandin û bibû sedem ku rê ji belavkirina bintara me ya rêxistinî re veke. Cidiyeta van rastiyan tevan dihat zanîn. Mistefa di pêvajoya destpêkê de hinekê şerim dikir, bêdeng bû, bê însiyatîf bû, lê pirsgirêkên heyîn jî didît. Bi çavdêriyên xwe û encamên ku ji nîqaşan derdiket holê ve, dikariya hinek nirxandinên erênî bike. Dîsa jî hêj serweriyek tine ye. Dema hevalan xwe rast tevlî jiyanê dikir, ji aliyê xwe ve rewşên ku hatine jiyîn ders derdixistin, nêrîna hevbeş û asta biryarê jî pêş diket.

Ez û Elîf di saetên hewa girtinê de derdikevin şaneşînê. Em nikarin li ber deriyê qoxuşa xwe jî bisekinin. Ji ber ên faşîst deriyê ber bi dawiya korîdorê ve bikar tînin. Dibêjin dibe ku çûnûhatin xeter bin. Gumanên wan hene. Lewma me nabin wir. Hevalên xort jî li cihê hewa ya vekirî bi têlan hatiye pêçan in. Ji ber araziya aliyê rastê li aliyê holikane çep dikeve, em jî di saetên hewa girtinê de çûna wir red dikin. Hem leşker li wir dimînin, hem jî dema em diçin wir peywendiya me bi hevalan

re qut dibe. Qet nebe li cihê şaneşînê derfetên dîtina hevalan û axaftinê çêdibin. Her çendî her tim destwerdana axaftinên me bikin jî, me guhê xwe nedida wan û di nexema me bû. Em dîsa jî di-axivîn. Em sibehê û piştî nîvro her yekê saetekê derdixistin. Ji ber faşîst jî derdixistin heman cihî, saetên derketinê kêm bûn. Me jî acizbûnên xwe yên vê derbarê de hem bi devkî, hem jî bi daxwaznameyek nivîskî ji îdareyê re ragihandin. Me ev daxwazname jî bi navê giştî da. Lê mixabin her carê jî hêcetek derdixistin.

Aytekîn jî her carê kumê xwe yê 'Mao' rast dike. Bêhna wî teng e, wisa dixwiyê. Dema li me dinêre, hewl dide ku nede hesîn. Lê diyare hinek tiştên ku wî tengav dikin hene. Hamilî jî di heman rewşê de ye. Ji dûr ve lêdana ceynikên wî diyar dibin. Ji nişka ve her der tevlîhev bû. Bi kulma ketin ser Riza. Bi taybet ên derdor, ji siyasetên din dixwazin bikevin navberê. Riza nikare tiştekê bike. Xwîna ku ji bêvila wî tê bi destê xwe paqij dike. Zer bûye. Leşkeran jî zêde ti mane nedan vê rewşê. Leşkerên nobedar jî derve de sekinîne, nobetê digirin. Çekên wan di destên wan de ne. Amade disekinin. Ji ber cihê hewa girtinê bi têlan hatiye hunan, hejmara leşkeran jî zêde ye. Her tişt di navbera çend xolekan de pêk hat. Paşê dîsa her tişt asayî bû.

Aytekîn wan meşa xwe berdewam kirin. Ez jî bi mereq temaşe dikim. Min bi awirên xwe pirsî; "çi bû?", ew jî wekî bersiva min dikeniya. Hinek helwest hewce bûn. Min weke rêgez lêdan ti caran nepejirand û rast jî nabînim. Heta li gorî min zêde bêwate ye, çors e û tiştekê jî çareser nake. Lê dema bi armanca helwestekê were bikaranîn mirov rehet dike.

Nêzîkbûnên Riza ne ku nedikariya li ber xwe bide, an jî ji lewaziyên wî bûn. Ger ev rewş bi wî re hebin jî, nêzîkbûna wî ya bingehîn bertek bûn. Dema di derve de jî sekn û nexweşiyên wî yên li dijî rêxistinê hebûn. Li gorî min rewşa wî zêde necidî bû. "Ger agir jî be, dê bi qasî rewşa xwe cih bişewitanda." Lê Şahîn cuda bû. Hebûna wî, jiyîna wî û di girtîgehê de mayîna wî ez dîn dikirim. Bi taybet hewl dida yên nû hatine girtîgehê û rewşa wî nizanin bandor bike.

Ya rastî me jî di vê mijarê de bi nûçeyên nivîskî û devkî heval agahdar dikirin. Lê me dikariya em xwe çawa bigihînin Şahîn? Ew, dana jiyîn suc bû. Min jî di vê mijarê de her roj xeyalê planek nû çêdikir. Ew jî weke nexweşiyekê bi min re mabû. Xeyalkirinê jî ez rehet dikirim. Lê ti encam nedihat guhertin.



KEMAL PÎR

Reva Pîr, xeyalên min ên revê xurt dikir…

Ji bona pêdiviyên bingehîn ên weke pirtûk û rojnameyan bi rêk û pêk bidin, rojên hevdîtinê werin veqetandin, ewlehiya malbatan bê avakirin û pirsgirêkên hwd werin çareserkirin, me du rojan rojiya birçîbûnê da destpêkirn. Bes Elîf tevlî nebû. Fermî tevlî nebû. Lê wê jî di nava pêvajoyê de zêde tiştek negirt û nexwar. Ecêb bû. Li hember dijmin, dide diyarkirin ku bi me re tevnagere û di vê mijarê de jî gelekî hişyare. Lê ji aliyê din ve bi wijdanî nerehete. Têgeha dijmin û têgeha dewletê pir cuda ye. Bi soza ku jê re gotine; "mîsoger wê tu derkevî, serbest bimînî" bawer kiriye. Ya rastî divê were

berdan. Lê ji ber dê weke şahid bikarbînin neberdane. Ji her hêlê ve mijarên ku şikên me zêde dikirin hebûn.

Me rojiya birçîbûnê tam di roja serdanên malbatan de da destpêkirin. Em derneketin hevdîtinan. Ji bona em dengê xwe bigihînin malbatên ku li cem nîzamiyê civiyane, me diruşme qêrîn. diruşmeyên weke; "Bijî Berxwedaniya me ya Birçîbûnê", "ji Zextan re êdî bes e!" Bi hev re tên qêrîn. Ji ber dengê min pir zirav e, ji nav hemû dengan diyar derdiket. Min dengê xwe bi her kesî dida bihîstin. Di vê girtîgehê de çalakiya me ya yekemîne em bi hev re komî dikin. Lewma hem li derve û hem li hundir di navbera malbatan de hevgirtinek pêş dikeve. Lê îdara girtîgehê ji vê rewşê aciz bû, di navberê de yên erkdar jî tên bi me re nîqaş dikin. Dibêjin; "hûn eziyetê li xwe dikin. Ji bilî vê ti wateya vê tine ye. Ger we daxwaznameyên xwe binivîsandan, dê her tişt çareser bibûya. An jî rêxistin vê çalakiyê li ser we ferz dike? Ji we re dibêje di hundir de çalakî lidar bixin û fermanan dide we?"

Hinek kesên ku bertekên xwe wisa didan der jî hebûn. Dihatin zêde hestiyar digotin; "heyfa we ye, hûn xwe xilas dikin." Kesên ku Elîf bi aqil didîtin gelekî kêm bûn. Zêdetir weke ku rojiya xwe xirab kiriye digirtin dest. Bi taybet jî leşkeran ev cudahiya wê baş nedidît û nedipejirandin. Nexwe dijmin jî li hember kesên wisa rêz nedigirt. Di vê pêvajoyê de Elîf baş tefisîbû.

Me di pêvajoya rojiya birçîbûnê de tenê şev û rojê yek-du caran şerbeta şekir vedixwar. Radeya wê jî hatibû destnîşankirin. Di rojiyên birçîbûnê yên min beriya niha li Îzmîrê dîtîn de hinekan çay jî vedixwar. Lê em di vê mijarê de

zêdetir zirav û hişyar tevdigerin. Hinek quralên grevên birçîbûnê hene. Ew qural derbasdar bûn û pir hişyar jî dihatin pêkanîn. Dibe ku hinek din cuda dikin, ew me eleqeder nake. Hevalên ku weke nûnerên girtiyan hatine destnîşankirin, bi îdareyê re hevdîtin kirin û ew muxatap dihatin girtin. Wê di nava daxwaziyan de kîjan bingehîn û kîjan nerim werin destgirtin, di pêş de hatibûn diyarkirin. Hinek nûnerên komên ku em bi hev re tevdigeriyan hebûn. Piraniya girseyê em bûn. Lewma îdareyê jî piranî nûnerên me muxatap digirt. Ev jî xwezayî bû û di heman demê de pirsgirêk ne mijareke hejmarî bû. Bes bû ku em PKK'yî bin. Biryardariya di çalakiyê de, rewşa giştî derketî holê û çalakgerî girîng bû. Hêj bi navê UKO (Artêşa Rizgariya Netewî) bangî me dikirin. Dema em destpêkê hatin girtin, navê ji raya giştî re ragihandin ev nav bû.

Di navberê de parêzerên me jî tên. Hisên Yildirim û piştre jî parêzer Mahmut Bîlgîlî yê hevalan destnîşan kirî hebûn. Hinek parêzerên ji Baroya Elezîzê jî hebûn. Malbatên hevalên ji Elezîzê, yan jî demek dirêje li Elezîzê dijîn jî, parêzerên cuda girtibûn. Ev jî baş bû. Me jî got; "çiqas parêzer tevlî dozê bibin, dê ew qas baş be. Qet nebê dê tiştên ku diqewimin ragihînin û emê jî raya giştî bandor bikin." Hema bêje Hisên Yildirim doza her kesî girtiye ser milên xwe. Dibêje ku çûye girtîgehên din jî. Ti agahiyek nû jî ji me re nedanî. Zêde nedihat hezkirin. Bi taybet ên ji herêma Dêrsimê ew baş nasdikirin. Kesek zêde ereq (îçkî) vedixwar bû. Dîsa jî tevlîbûna wî ya ji dozên me re erênî dihat nirxandin.

Mahmut ji Enqereyê dihat, ji Baroya wir bû. Bi xwîşka Hesen Şerîk re zewicî bû. Me li Tuzluçayirê ew dîtibûn, ji

pêşketinê re vekirîbûn, lê paşê me bihîst ku zewicîne. Dê pergala wê têkiliyê, wan zêde pêş nexe. Me got; “çi nabe, êdî Mahmut jî heval e.” Hevdîtinên me li odeya îdareyê pêk tên. Weke din jî cih tine ye. Lewma dijmin jî li me guhdar dike. Dengê me diçe wan. Her cara Mehmut dihat, di astekê de rewşa derve ji me re radigihand. Lê mixabin agahiyên ku Hisên Yildirim didan her tim ecêb bûn. Zêde li gorî xwe bû û nedida bawerkirin. Her tim weke agahiyên sixte, ti bawerî û samimiyeta wan tine û nîqaş li ser dibe bûn. Her cara ku min nêrînên xwe yên di vê mijarê de danî rojevê û parve dikir, hevalan jî zêde didît, dilxwede ez şaş dihizirim û zêde bi pêşdarezînê tevdigerim. Tiştek din a ku ez jî bizanim nebû. Dibe ku di vê manê de mafdar bin. Lê belê, çavderiyên min ên li Dêrsimê, naveroka axaftin û balên wî, zêde ji xwe razîbûn, bi min re bêbawerî û sarbûnek dabû avakirin. Li gorî min her tim derew dikir, her wiha hinde yên me jî xwedî niyeta baş bûn, diçin nêrînên min ên derbarê Hisên Yildirim de, hem jî di vê astê de ji wî re jî dibêjin. Dilxwede ji samîmiyeta zêde gotine. Her wiha ji ber ew jî ji nêzîkbûnên min ên sar û bi bertek aciz bûye, jê re gotine û dilxwede dixwazin çareser bikin. Dema min bihîst zêde bihêrs bûm. Min yekser got; “ma mirov rasterast ji zilam re dibêje, ‘baweriya Sakîne bi te nayê, gotiye ku tu derewan dikî.’ Dilxwede ew jî xemgîn bûye û dilê xwe girtiye! Dema dixwest di vê mijarê de bi min re bi-axive, ez jê direvîm, min nedixwest bikevim nav van mijaran, an jî pir kêm di-axivîm.

Min ji wî re got; “hinek tiştên ku tên vegotin û helwestên heyîn rastiyek din derdixin holê. Dibe ku hûn li gorî xwe dibêjin qey we tiştek baş kiriye. Lê ji ber em girtî ne, me

bandor dike. Lewma mirov naxwaze her tiştî weke heyî vebêje. Lê ev nerast e. Em ne zarok in. Em dixwazin her bûyerekê ji aliyê wê yê rastî ve hîn bibin. Lê dema hûn li gorî xwe vedibêjin bandor dike, min jî behsa vê mijarê kiriye." Hewl didim mijarê jî bigirim. Min bi pakiya xwe bertekên xwe li cem her kesî bi deng rave kir. Lê mixabin ên me, ji min paktir bûn. Diçin ji zilam re dibêjin. Ma ev çi kar e? Bes di pêvajoya pey wê re, qet diyar nedibû ku Hisên Yildirim xemgîn bûye, an jî ji xwe re kiriye derdek. Zehmetiyên malbatan jî her tim derdiketin. Hema bêje Hisên Yildirim bibû parçeyek ji girtîgehê. Ji parêzerên din çalaktir bû. Bi derewên xwe hêvî dida malbatan.

Hinek pirtûk derbasî hundir kirin. Lê hêj her pirtûka em dixwazin nadin. Jixwe ew pirtûkên em dixwazin di derve de, li sûkê jî nayên firotin. An jî malbat ji tirsan nikarin bikirin. Ji ber lîsteya yên qedexe heye. Ji klasîkên Marksîst ditirsin. Hinek rojname û kovaran dikirin. Em di mijara şopandina çapemeniyê de zêde hesas in. Di wan mehan de çapemenî piranî li ser me radiwestî. Rojnameya Aydinlik tam zimanê dewletê bû. Weke rêzenivîs dosya UKO amade kiribûn. Rojnameya Aydinlik tam îxbarnameyek bû. Wêne dida, nav, navnîşanên malê û xisletên wan didan nasîn. Di bin navê 'Şoreşgeriya Proleter' de (!) Şoreşger reş dikirin û îxbara wan dikir. Dijmin jî bi piştevaniya van baskên xwe pêkanîna polîtîkayên xwe berdewam dikir. Ango eniyek ev qasî dijber heye. Ya rastî baştir bû. Ji ber bi maskeyên şoreşgeriya xwe ya sixte ve, gel dixapandin. Bi vî rengî jî rûyê xwe yê rastî derdixistin holê.

Di nava girtîgehê de jî çeteyên faşîzan amade dikirin. Armanc û plana wan a bi înad me li cem hev digirin derketibû holê. Rojek tav û xweş bû. Wê rojê jî destpêkê heval derxistibûn. Her tim ev demjimêrên vê sibehê xweş in. Ew tîrêjên rojê yên li quntarên Xarpêtê diketin xweşikbûnek cuda dida wê hewaya nerim. Avahî li araziyek vekirî û tazî bû. Bes ji cihê kaniyê heta cihê aliyê nîzamiyê ve, di xetek dirêj de darên sipîndar û biyê, darên fêkiyên cur be cur hebûn. Ava wê kaniyê gelekî xweş bû. Dema em diçûn avê bînin, dema em ji bona pêdiviya tuwaletê derdiketin, ez demek dirêj dimam. Min dixwest weke zarokan bi avê bilîzim. Min sibê, nîvro û êvarî bi rêk û pêk diranê xwe firçe dikir û dest û rûyê xwe dişûşt.

Ji ber bê ku bêxîretiyê bikim, min ev her roj dubare bi zewqek mezin dikir, leşker jî mat mabûn. Ez zindî bûm. Li gorî wan girtîgeh cihê komkirina êş û janan bû. Ne dihat jiyîn. Di navbera çar dîwaran de jiyîn, nekarê aqilan bû. Lê nexema min bû. Hem jî 'tevî ku ez jin bûm û sucên min jî giran bûn!' Leşkeran zêde mereq dikir, her kesê nû dihat dipirsî. Lê belê, jorî wan ji bona ji aliyê ewlekariyê ve hişyar bin û ji me jî bandor nebin, vê asteng bikin, weke ku em cinawirin behsa me ji wan re dikirin. Ji bona me digotin; "terorîst in. Mirov kuştine. Hewl didin welat parçe bikin. Kurdperweriyê dikin. Dê dewleta Kurdan ava bikin. Lewma hişyar bin. Axaftin qedexe ye. Tenê hûnê fermanên ku ji we re tên dayîn pêk bînin. Hûnê ji bilî vê jî ti xwestekên wan pêk neyînin." Leşker jî wisa tên amadekirin. Dîsa di nava wan de yên xwediyê niyeta baş, dixwazin rastiyan hîn bibin, heta di hinek mijarên biçûk de çavên xwe digirin û 'qenciyê' jî dikin hene. Dihatin pirsa pêdiviyên me dikirin. Dîsa dema heval li cihê hewa

girtinêbûna, axaftinên me yên bi wan re qut nedikirin. An jî silavên wan ji me re daniyan. Hinek ji wan jî, ji girtîgeha duyem silav û agahî ji me re danîn. Di heman demê de notên me yên zêde nexeter danîn û dibirin. Destûr didan ku em pênc-deh xolekan zêdetir li ser kaniyê bisekinin. Weke van dikariyan gelek tiştan bikin. Ji bona ku faşîst jî li wir hebûn, bixwazî nexwazî di nava leşkeran de jî alîgirtin û piştevanî pêş diket. Yên Kurd û Kurdistanî bûn, an jî yên xwediyê xisletên gelêrîne, ji metrepolan hatine, kêmekê demokrat in, xisletên wan ên ronakbîrî hene, nêzîkbûnên wan ên li hember me bi pîvan bûn. Yên xwedî nîtelîkên faşîzan bûn, şert û mercên heyîn jî li dijî me berovajî dikirin û dixwestin pirsgirêkan ava bikin.

Muradê bejin dirêj û ji Manîsa'yê zêde baldar nêz dibû. Her çi keramet bû, ev Murad ji kur derdiketin! Muradê ji Çermikê hatibû serdanê jî. Min jî, ji xwe re dihizirî ku ger ên me peywendiyên xwe pêş xistibin, dikare bibe şoreşger. Ji ber min agahî jê negirt. Ez û Muradê ji Manîsayê li ser Îzmîr û Manîsa di-axivîn. Ji ber ez li wan deran mabûm û min nas dikirin, dibû mebesta hevpeyvînên me. Ez li gorî xwe leşkeran dipîvim û hewl didim nas bikim. Rewşa girtîgehê jî zêde guncav e. Odeya em lê dimînin deriyên wê yên dar û hesin hene. Ya ji dar e, zêde mifte nakin. Me ew ji hundir ve digirt. Menteşeya deriyê hesin jê derdiket. Bilindbûna wê jî ji asta giştî ya derî kintire. Bi qasî firehbûna destekê valahiyek heye. Mifteya derî jî, ne saxlem e. Çengela ku derabeyên hesin ve jî girêdayî ye, destpêkê bi dîwar, paşê jî bi xeleka hesin a weke betonê bûye ve dikin û mifte lê didin. Ji ber derî her tim dihat vekirin û girtin, di pêvajoya rojiya birçîbûnê de jî me zêde li

derî dida, hinek cih xirab bûne, rêza serî deriziye û hinek cih jî hatine xwarê. Dema Elîf diçe tuwaletê, ez jî di vê firsendê de bi kevçî betona erdê jî lêkolîn dikim. Zêde nuwaze ye. (harîka)! Kelecanek balkêş min dorpêç dike. Weke din jî ji ber paçên ser doşekan jî kesk bûn bala min dikişand. Ji ber di rengê leşkerî de bûn, dibe ku kêrî karê min werin. Min dikariya rehet bikim pantor. Jor ne girîng bû. Ji ber leşker şev bi fanîreyan jî digerin. Me di derketin û ketina holikan de ew baş didîtin. Leşkerek berberê mala artêşê hat porê min jêkir. Min pir kin dabû jêkirin. Gelek kesan dipirsî, min jî digot, ji ber pir diweşiya, lewma min jî kin jêkiriye. Weke din jî kesî eleqeder nake. Min zêde nedixwest heval jî ferq bikin. Min ji xwe re digot di rewşek guncav de ji yek-du kesan re bêjim bes e.

Hinde min ewê ji Manîsa kiriye serê xwe, her çendî tirsa wî hebe jî, bi qasî ez çi jê re bêjim dê bike, ew qasî ji min bandor bûye. Wî û malbata wî jî karkerî kiriye. Ango ji malbatek karker e. Zêde hestewar e, digot; “ev qas zilam hene, ez ji bona wan naqehirim. Girtîgeh cihê mirovê zilam e. Lê gelekî ji bona te diqehirim.” Elîf weke girtiyekê nedihesiband. Peywendiyên wê yên bi îdareyê re û an jî tiştên têkildarî wê dihatin gotin ne vala bûn. Bertek jî li hember wê dijiyan. Yek-du caran polîsên ku em li mala binçavkirinê de bûn hatin dîtina wê. Li îdareyê jî dan diyarkirin ku weke ji derve de hatine serdana wê. Lê me, ew nas kirin. Me ji wê jî pirsî, wê jî piştrast kir. Ji ber malbata wê ji gundiyên Kurd bûn. Ji gundeke Golbaşi ya ser bi Semsûrê ne. Dayîka wê zimanê Tirkî nizane. Bi cil û bergên xwe ve tam Kurd e. Lê Elîf jî Kurdeke xwe nedi-eciband bû û qebûl nedikir. Wan nakokiyên xwe jî li cem leşkeran diyar dike. Ew jî nîqaş û şîroveyan dikin. Ji ber tenê du jin li girtîgehê hebûn, baldarî jî zêde dibûn. Her tiştên me

dişopînin. Lewma ez jî hewl didim ji tiştên ku bal bikişîne dûr bisekinim. Ji ber bi giştî binyata girtîgehê û araziyê ku lê ye, ji revê re guncav e.

Bi taybet cihê ku kanî lê ye, ji revê re zêde guncav e. Holikên li derdor jî, li hinek cihên diyarin. Aliyê kaniyê jî piranî aîdê leşkera ye. Ji ber li odeya ku em lê dimînin tuwalet û lawabo tine ye, em neçarin biçin wir. Li girtîgehê ji têlên hunandî çeper hatine çêkirin. Xetek jî hema bêje çend metreyan dûrî kaniyê hatiye destpêkirin, ji çemberek teng e. Ya duyem jî, çend metreyan ji wê wirdetir, xetek berfireh digire nava xwe. Têlên asayî yên hunandîne. Ya di hundir de jî hinekê gilover û weke çend birca ne. Cihê hewa girtinê jî wisa çêkirine. Du qet têlên nû hunandibûn, di navberê de jî têlên bi sitirî û gilover hatibûn bicihkirin. Ango dîwarek ji têlan bû.

Dema em diçin ser kaniyê leşkerên bi çek me dibin. Piranî du kes dibin. Şev jî carê yek leşker tê. Jixwe şev jî çav li xew û bêxîret dibin. Lewma gelek caran ji derketina me ya ji bona pêdiviyan jî aciz dibûn. Ger ez bikaribim Murad amade bikim, şev ji aliyê kaniyê ve rev hêsan dibe. Rojê jî her derî lêkolîn dikim. Ezê bikarim di saetekê de xwe bigihînim Kirkdut an jî Esentepeyê. Derketina ji bajêr jî çend saetan nakişîne. Ger bikarim xwe bigihînim çolterê jî, dê girtina min pir zehmet be. Baskîl hat bîra min. Cihê herî baş ew dere. Dîsa gundê Kellek heye. Beriya niha bi salan hinek gundiyên ku ji gundê apên min hatine li wir bicih bûne hene. Ez beriya niha jî çûbûm cem wan. Ew gund jî zêde guncav e. Dikarin min veşêrin. Jixwe ezê her tim xwe di araziyê de veşêrim. Hinde xeyalên min xweşikin, weke ku pêk hatine kêfxweş dibim. Kelecanê dide min. Lê divê zêde jî lez nekim. Ji ber gelek caran ji bona min

lez kiriye, min zerar daye. Mijarên bi vî rengî hişyarî û baldariyek zêde dixwazin. Divê firsendên heyîn baş bikar bînim. Lê dibe ku gelek kêmasî jî rû bidin. Dijmin jî ne ehmeqe, ew jî ji me bawer nakin. Her roj tevdîrên xwe zêdetir dikin. Lewma divê ez jî di vê mijarê de lez tevbigerim. Herî zêde jî wextê rast hilbijartin girîng e. Carê hinekan di navberê de digot ku, girtîgeh ne cihê jina ye û ji bona wan neguncav e. Gelo îdareyê nedixwest berpirsyariya vê bigire. An jî dilê wan bi me dêşiya, ew jî nediyar bû. Ez jî ditirsiyam, ku ji nişka ve bêjin; "xwe amade bikin, hûnê veguhezîn girtîgehek din" ezê çi bikim. Heval jî naxwazin me bişînin girtîgehek din. Min jî ew hişyar kirin û got; "zêde nexin rojevê, hûn zêde bidin pey, dê dijmin jî berovajî we bike."

Romana Kelebek, hêj niha de ez kiribûm perperîkek. Şev û roj plansaziya revê çêdikim. Hinde ez planan çêdikim, nasekinim. Ya rastî dijmin hesabek wisa bike jî, ji aliyê me ve nahizire. Ji ber nêzîkbûnên wî yên jinê biçûk dibîne hene. Mantiqê, 'jin nareve' heye. Ya rastî her tim propagandeya min ji leşkeran re dikin, ku ez kesek pir xeter im. Lê hêj bala wan ne li ser revê ye. Wan rojan zêde liv û tevger hebû û agahiyên xweş dihatin. Hevalê Kemal Pîr ji pêvajoya Kongreyê ve girtî bû, me ew dizaniya. Min tesadûf di radyoyê de nûçeya reva wî bihîst. Dibêjin Kemal Pîr ji girtîgeha Rihayê revî ye! Nûçeyek weke bombeyekê ye. Min qîrek da. Nikarim xwe. Gelo hevalan jî guhdar dikir? Di heman kêliyê de, ji jor jî deng hat. Ew li qoxuşek ku berê wê diket korîdorek biçûk diman. Ji ber zêde di nava hev de bûn agahiyek herî biçûk, di heman kêliyê de dihat bihîstin. Dema bi dengê bilind di-axivîn, me jî dengê wan

dibihîst. Em di pêvajoya rojiya birçîbûnê tevê de bi dengê bilind axivîn. Em nikarin xwe. Weke ku me lihev kiriye, me hemûyan bi hev re bangî hev kir.

Aytekîn wan got; “Seko ma te bihîst?” Min jî got; “ma we bihîst Pîr reviye. Çavê me ronî be!” Me zêde dirêj nekir. Jixwe îdare jî ket navberê. Me jî got; “temam tiştek tine ye. Em na-axivin.”

Belê, Pîr revî ye. Agahiyek pir xweş e. Berî vê jî Pîr ji Ordu-Aybasti firar kiribû. Ya rastî hevalê Riza ew bi ser girtîgehê de digirin û direvînin. Xisletê hevalê Kemal nedikariya di nava ti qaliban de bimîne. Liv û tevgera wî zêde, xisletên wî yên pir zindî di her kêliya jiyanê de diyar dibûn. Lewma mirov ti caran wî di girtîgehê de nahizire. Wî bi xwe jî her tim digot, çalakiya herî xweş şoreşgerek ku, ji aliyê dijmin ve di nava dîwaran de hatiye hepiskirin de bihizire rev e. Hem got û hem jî pêk anî. Heman weke ku bêje; “ev dîwar, dîwarên we qet li nexema min in. Ne li xema me ye”, vê carê jî ji girtîgeha Rihayê revî bû. Vê agahiyê hêzek mezin da min. Demek nêzîk de dê bêjin Sakîne jî reviye. Agahiyek çiqas xweş e! Rastî jî min tam kiriye serê xwe, nikarim xwe jê xilas bikim. Mîsoger hemû hevalên di hundir de, ji vê bûyera revê bandor bûne. Qet nebe dê her kesî di vê mijarê de bide hizirîn. Ber bi fikrek wisa ve bibe.

Dadgeh venabin. Nediyar e ku dê kengê jî vebin. Parêzer Mehmut got; “li gorî me bihîstiye dê Amedê weke herêma pîlot hilbijêrin. Dosyayên dozê jî li wir bikin yek. Ev jî bihîstineke, lê bawerim rast e.” Weke din jî behsa girtinên nû dike. Operasyon hêj berdewamin. Dijmin operasyonên xwe li herêmên weke Hîlwan, Sîwerek, Êlih û qadên din didomîne.

Êrîşî girseya gel dike. Şahîn gotiye ku wê îlana partiyê fermî bi çalakiyan were kirin. Mîsoger daye diyarkirin ku, dê bi çalakiyên çawa jî were kirin. Em jî bi mehane, bi kelecanek mezin li benda îlanê ne.

Di dawiya Tîrmehê de bi çalakiyek li dijî Bucakan partî hatibû îlankirin. Lê M. Celal Bucak birîndar rizgar bibû. Salih Kendal şehîd bû. Weke din jî di wê pêvajoyê de gelek heval şehîd ketibûn. Heman weke hevalê Ehmed, Cuma Tak û hwd. Hemû jî hevalên nas bûn. Em fêrî evqas şahadetan nebûne. Bi taybet dema hevalên wisa hêja şehîd dikevin, em nikarin rakin. Her kes xemgîne. Em jî yên nas dikin tûnin bîra xwe û behsa wan ji hev re dikin. Lê belê bûyer narawestin. Bi qasî ku xwepêşandanên girseyê û pevçûn di çapemeniyê de diyar dibe berfirehin. Li kêleka êşa me ya giran, çalakî û pevçûn jî moralek mezin didin me. Ketiyê Şahîn digot; "her tişt xilas bûye." Me jî digot; "na, partî derve ye. Rêber APO li derve ye. Hem Pîr jî reviyabû. Dê mîsoger bersivek xweş were dayîn. Wê kêfxweşiya dijmin di qirika wî de bimîne." Bi wê leza di meş û sohbetên me yên ji dûr ve de kêfxweşî û coşa van axaftinan hebû. Çavên her kesî dikeniya. Tije hêvî bûn. Hemû bandorên neyênî yên demborî bûn û di gelek şoreşan de jî hatibûn jiyîn. Dibe ku binkeftin û îxanetên demborî werin jiyîn. Bes bila baweriya li hember şoreşê, baweriya ku dê ev doz berdewam bike hebe û hêvî neşikin û nerûxin, dê her tişt xweştir pêş bikeve!

Di pêvajoya van pêşketinan de, di hundir de, di navbera dîwarên girtîgehê de hepiskirî mayîn nayê qebûlkirin. Min carek din got; "xwedê bela xwe bide. Ma çima em bê tevdîr tevgeriyan? Hem jî di pêvajoyek wisa de." Dê mîsoger li

Elezîzê hinek pêşketinên girîng pêş bikevin. Jixwe ji faşîstan jî qutbûnan destpê kiribû. Hem jî bi komî ji wan qut dibûn. Çalakiyan bandor dikir. Komên din li naverastê nemabûn. Ji ber "balyoza" rêveberiya awarte (sikiyonetîm) ew tirsandibûn. Lê dîsa jî diyar bû ku, dê pêvajoya xebatek cuda derkeve holê. Ji bona me mercên çalakiyên çekdarî dihatin ferzkirin. Herî dawî jî dihat nîqaşkirin ku, dê giraniyê bidin çolterê.

Heta dihat hizirîn ku perwerdeya çekdarî were meşandin. Ev jî pêdiviyek bû. Ger girtin çênebûna, dê gelek pêşketin rû bidan. Di dema destpêkê de her kes bi xwe re di nava muhasebeyekê de bû. Zêde li ser tiştên din nedihizirî. Lê her ku dem derbas dibû, valahiya ku derdiket holê jî dihat ferqkirin. Tu ji zemînê têkoşînê hatî dûrxistin û di nava qada têkoşînek din de yî. Wê tu her duyan bi hev re çawa bijî?

Dê mirov valahiya yekê, bi ya din re çawa derbas bike? Xwedêyo, nayê tehemulkirin. Pêşketinên heyîn mirov dikişînin xwe!

PKK, ango Partiya Karkerên Kurdistanê. Êdî em li şûna UKO, an jî Tevgera me, dibêjin PKK. Aytekîn pirsî; "te ev nav dizaniya, ne wisa? Min jî piştrast kir.

Min dizaniya ku Şahîn hêj di pêvajoya lêpirsînê de ev nav eşkere kiribû. Navê partiyê hinekê jî me ber bi Kongreya Damezirandinê ya 1. ve dibe. Ez naxwazim êdî bikevim nav. Her çendî civîn û çûna me hatibe eşkerekirin, nerast bû ku mirov li ser nîqaş û axaftinan bike. Ji ber dîsîplîna partiyê û veşartîbûn di girtîgehê de zêdetir hewce dikir. Ger dijmin bizaniya jî, ev mijar gelekî girîng bû.

Hejmara me zêde dibe. Di heman rojan de ji Dêrsimê Sevîm Kormaz û ji Elezîzê jî endama Dev-Solê, jinek bi navê Atiye anîn. Di girtîgehê de zêdebûn ne tiştek baş bû, lê dîsa jî rûyên cuda dîtin kêfa mirov xweş dike. Wateya her hatinek nû, agahiyek nû bû. Min Atiye di çend meşan de dîtibû. Di meşekê de ji bona balê nekişîne çarika reş li ber xwe kiribû. Weke din jî, her komê xebatên jinê yên komên din mereq dikir. Weke kî hatiye, ji kur hatiye, navê wê çiye? hwd. Her kes zû hîn dibû. Dîsa li heman qadê xebat dihat meşandin. Ji heman koman gelek kes diçûn serdana her malbatê. Carê em li heman kolan, koçe, li ber deriyan liqay hev dihatin.

Atiye keçek Çerkez bû. Bejin dirêj, fîzîka wê cuda bû. Dayîka Bozo Hisênê me jî Çerkez bû. Jinek bedew bû. Bi gelemperî jî keç û jinên Çerkezan xweşik bûn. Bejin dirêj û narîn in. Atiye jî bejin dirêj û hinek xislet hebin jî, di rewşek jinek hinekê hilhilî (yipranma)de bû. Cixare zêde dikişand. Şêweya kêşana wê ya cixarê û girêdana wê ya bi cixareyê re, bi min re jî li dijî cixarê bertek pêş dixist. Tiştek ecêb bû, ramanên çîna serdest pê re hebûn. Di kesayetek ku ji gelê xwedî bingehek Çerkez, di dîroka wê de ew qas komkujî heyî, îxanet jiyayî de, evqasî şovenîzma civakî kûr jiyîn, tiştek ecêb bû. Pirtûka 'Ubih'ê Dawî', 'Son Ubıh' dilê min tije xwîn kiribû. Îxaneta navxweyî ya Abhazya'yî di pêvajoya şerê Osmanî û Rusan de dijîn, her wiha komkujî û nêzîkbûnên dewleta Tirk ên Qirkirinê aliyekê bûn, hestên şovenîzma Tirk ku Atiye jî di hemû şaneyên xwe de dijiya li aliyekê bûn. Hêj dema me hev dîtî, bi min re sarbûnek da avakirin. Pirsgirêk ne ew bû ku, di nava komên çepên Tirkan de bû. Na, pirsgirêk ne ev bû. Ji ber di nava wan de gelek mirovên şoreşger ên dost û

hevalbendên me hebûn. Atiye di nava hewaya keça serfermandaran de bû. Ji Eneqereyê hatibû û karmendî kiribû. Lewma hinek taybetmendiyên bûrokratîk û ferdperest ên ji wir jî girtî hebûn. Dîsa jî me nîqaş dikir. Em jî bi gelemperî pêvajoya sikiyonetîm, komkujiya Mereşê, pêşketinên li Elezîzê rû dayîn, bi giştî jî êrîşên dewletê dinirxînin. Ev alî baş bû. Ez jî pêdivî bi nîqaşê dibînim. Biçûka me Sevim, di cihê xwe de nasekine, nayê girtin. Li Dêrsimê jî komên çepên Tirkan hene. Bi wan re zêde nîqaş kiriye. Lê asta Atiyê ya nîqaşê zêde paşketî dibîne. Dibêje; "tiştên ku tu niha behs dikî, me di demên kevin de nîqaş dikir. Mijarên ku komên şoven ên civakî pênase dikin re heman tiştin. Bingeha wan yeke. Ma ne Dev-Sol ji kesî cudatir tişteke din pêş naxe." Dema wisa got, Atiye hêrs bû. Behsa cewaziya di navbera wan û Dev-Sol û komên din de dike.

Elîfê xwe zêdetir nêzî taybetmendiyên Atiyê didît. Ji ber di jiyanê de jî zû ber bi wê ve diçe. Tevî ku min rewşa wê di hinek mijaran de gotiye, Atiye cardin ji hinek aliyan ve parastina Elîfê dike. Wê dikişîne xwe.

Cardin bi gotinên weke 'heyfe' li hevalên xort ên girtî jî xwedî derdiketin. Jixwe taybetmendiya wan a bingehîn bû ku, ji endamên me yên xirab, kêrî nedihat re jî hemêza xwe vedikirin. Pîvanên exlaqên wan ên siyasî demborî bûn. Dibêje; "em di girtîgehê de ne, nebaş e ku em kesekê wisa tecrîd bikin. Wê zêdetir ber bi dijmin ve biçe." Ji aliyê teorî ve rast e. Bes ew jixwe tê bikaranîn. Her wiha nêzîkbûna wê jî ne li ser esasê sererastkirina Elîfê ye. Vê baweriyê nade. Lê ez dîsa jî kêfxweş dibim. Ger bikare bandor bike baş e, heta bila bike endama

Dev-Sol'ê. Bes bila ber bi ketiyan ve neçe. Diyar bû ku zêde ditirsiya û qels bû. Di pêvajoya peywendiyên Meletî de kesekê tiştek ne daye vê. Tenê Celal pê re eleqeder bûye. Ew jî ketiyo ji xwe re bikar aniye.

Sevîm rûyê wê biçûk, pitî (minyop) dixwiyê. Hevalek zindî û asta wê ya teorî jî pêşketiye. Dibistana mamosteyan qedandiye. Tevlî ezmûnên zanîngehê jî bûye. Bes temenê wê qet naxwiyê. Bavê wê Hesen Korkmaz, serokê şaredariyê ye. Berî wê jî mamoste bûye. Ji eşîreta Yusufxana ye. Pir zêde nedihat hezkirin. Kesek ji Dêrsimê yê çîna navîn, cureyek Kemalîzmê ji xwe biyanî kiribû. Bavek qetiyen nedixwest Sevîm bibe şoreşgerbû û nexasim jî bibe endamek UKO. Jixwe parazvantiya wî ya Dev-Yol'ê jî ecêb bû. Ji ber girtina Sevîm jî, vê carê tam ditirsiya û qels bibû. Sevîm jî digot; "ya rastî ji aliyekê ve baş bû, bila dewletê baş nas bike." Ji vê qutbûna ji malbatê jî kêfxweş dibû. Ji ber vê çûbû tevlî ezmûnên zanîngehê bibû, ger qezenc bike û zêde di hundir de nemîne, dê dibistana xwe berdewam bike. Wê dibistanê weke amûrekê bikar bîne. Dibêje; "min gelek caran xwest ku ji malê birevim. Ji ber gelekî zext li ser min hebûn." Mîsoger di girtinên Elezîzê de navê wê dane. Ji ber her kesî Tirkan, Sevîm Kaya û hwd nas dikirin. Her du Sevîm jî, li Kişlayê diman. Îhtîmalek mezin navê wê dane. Nexwe gelek keçên ku, di nava rêxistinê de ji Sevîm Korkmaz çalaktir û zû de di nav de xebat dimeşandin hebûn.

Meh derbas dibûn. Dema behsa girtîgehê dihat kirin, weke rawestandina demê dihat fêmkirin. Wext derbas nedibû, wer dihat zanîn ku rojek, saleke. Girtîgeh cihê kulan bû. Qehra

mirovan zêde dikir. Dema di civakê de ‘dam’ tê gotin, ev tên bîra mirov. Na, nedibû ku ev pêşguman rastbin. Helbet ji hêla fîzîkî ve ji derve û têkoşînê qutbûn zehmet bû, mirov nedikariya bipejirîne. Lê nedibû ku yek kêliya wê jî wisa bi kul, qehir û nayê jiyîn were destgirtin û jiyîn! Carê hevalan jî digot; “xweziya tu tineba, li zora me diçe.” Tiştên ku malbatên me digot çibûn, nêzîkbûnên wisa hevalên me jî bi dil dişewitandin û mizmiz dikirin carê pir komîk dibûn. Dijmin bi zanebûn te digire û bi rastî jî dixwest ku, her kêliya te bike zindanek. Li hemberî wî înad di zindanê de jî jiyan zindî girtin, xwe li ser piyan girtin, ji aliyê hest, raman û xeyalan ve cîhana xwe berfireh kirin, mijara sereke ye. Ev jî ji bona şoreşgerekê tişta herî bingehîne ku hewce dike. Her kêlî bi dijmin re rû bi rû bûyîn, ew qas ji nêz ve naskirin, li ber xwe dayîn, hêzek pir mezin a berxwedanê dide mirov. Lê belê, divê mirov baş û rast dijmin nas bike. Ev halê ruhî û rasteqînî jî bi xeyal, bawerî û vîna te ve girêdayî ye! Ji ber bûyer wisa vekirî û balkêş in, ger mirov di destê dijmin de jî be, mirov dikare li dijî wî kîna herî mezin bilind bike. Kêfa Aytekîn li cih e. Wê rojê bi kumê xwe yê ‘Mao’ silav dabû min…

Tişta em jê ditirsiyan hat serê me. Îdareyê beşa yekem a plana xwe temam kiribû. Ew bi mehan bû me dida diyarkirin ku bi faşîstan re li heman cihî mayîn, wê rê ji çi xeteriyan re veke. Hemû jî kuçikên har bûn. Hemû jî qadroyên wan ên herî çalak bûn. Ango hemû kujer bûn. Gelo xwîna çend şoreşgeran an jî çend mirovên ji rêzê bi destên wan ve bû. Ev jî ne diyar bû. Bi taybet kesayetên weke Raîf Çîçek û qadroyên milîtan ên faşîst ji aliyê dewletê ve dihatin parastin. Zanîngeha Firat’ê di destê wan de bû. Mamoste û personelên wan piranî faşîst bûn.

Vê carê jî kesên ku di dibistanan de herî zêde êrîşî şoreşgeran dikirin, niha jî li ber serê me bûn. Van bîjiyên faşîstan di girtîgehê de jî karên xwe dikirin.

Rojek berî wê roja hevdîtinan bû. Diya Aytekîn piştî dîtina wan, hatibû serdana min. Got ku, Aytekîn gotiye 'xelatek' min li cem wî ye û wê di wextek guncav de ji min re ragihînin. Gelo çi xelat bû? Mîsoger not bû û ji derve de partiyê şandibû. Kêfa min xweş bû. Min ji dayê re got; "temam. Hat fêmkirin. Xweziya bi te re bişandan." Bes bawerim firsenda wî çênebûye. Ji ber di nava tiştan de vedişêrin. Ma kî dizane dibe ku yên me jî nedîtibin. Giştî jî agahî hatiye. Teqez nota ku ji bona min jî hatî di nava wan de ye. Hedara min nayê. Roja paştir em derketin hewa girtinê. Heval jî tên li ber derî hewa digirin. Em jî deriyê dar vekirî dihêlin. Carê li ber derî radiwestim. Dema not, an jî tiştek din heba, yekser didan. Lê ji ber deriyê din yekser ê bi deriyê me ve girêdayî yê faşîstane, gelek caran leşker li vir disekine. Çend leşker ji bedena xwe dîwarekê ava dikin, da ku tiştek rû nede. Wê sibehê jî hinek faşîst çûn îdareyê û hatin. Heta dema min Raîf Çîçek dît, min got; "kujerê faşîst! Tu qatilê şêst mirovanî." Dema ew derbas dibû weke ku, kena xwe li me bike hinek tişt di ber xwe de di-axivî, lewma min jî ev gotinê. Bi zanebûn dixwest me tehrîk bike. Ya rastî ji kêfa bû, bê hedariyek pêkana plana wê rojê dihat jiyîn. Ew heta wextekê man. Vê carê jî komek din derxistin. Lewma em dernexistin derve. Em jî li dijî vê derketin. Me ji leşker re got; "biçe ji jorî xwe re bêje, bila me derbixin derve." Em ferz dikin. Dema dereng ma, min jî li derî xist. Serbazê nobedar ê wê rojê hat cem me.

Min bi tundî pirsî; “hûn çima me ji bona hewa girtinê dernaxin derve?”

Got; “temam, karê me hebû. Parêzerê hinek kesên rastgiran hatibûn. Dema hûn li şaneşînê ne çûnûhatinên wan nebaş dibûn”

Serbazek bejin dirêj, nerim, ji TKP’ê (Partiya Komînîst a Tirkî) hebû. Carê bi me re nîqaş dikir. Rêzdar e, lê quralên wî hişk in. Ditirse, naxwaze tiştek rû bide. Diyar bû haya wî ji rastiyên bûyeran û lîstokên heyîn tinebû. Serbazek cîgir bû. Her du kesên ku dawî çûbûn jor, hêj daneketine. Me jî zorî li wan kir. Herî dawî em derxistin şaneşînê. Me silav da hev. Kêfa Aytekîn li cih e. Ew û Hamilî bi hev re ne, her carê kumê xwe yê ‘Mao’ hem radike jor, hem dadixe jêrê. Şadî û Zekî Budak jî li cem wan in. Tam nayê bîra min. Bi hev re di-axivîn û dikeniyan. Min jî weke bêjim; “xêre, hûn bi çi dikenin?” Serê xwe li wan hejand. Gotin; “emê paşê bêjin.” Derfetê ji nêz ve axaftinê gelekî kêm e. Carê bi Hamilî re di-axivim. Bi navê ku, “kurê xalê min e” hevdîtinê me çêdibin. Ew li aliyê din ên têlan, ango cihê hewa girtinê ne, ez jî li vî alî me. Derfetê herî baş mirov dikare bê ku leşker bibîhîse ji dûr ve bi-axive. Dema leşker zêde nêzî me nebin, em dikarin tiştên ku pêwîst e bi diîve bêjin jî bi dengê nizim bi-axivin. Lê em piranî dinivîsin, wisa baştire. Yên bi rêk û pêk dimeşin Aytekîn ew in. Ên din li kêlekê rûdinin, an jî li ser piyan kom dibin û di-axivin. Şibakeyên cihên faşîst lê dimînin pir nimzin. Dilxwede her cara ku heval derdikevin yek-du hevalan dikin çavdêrên wan şibakeyan. Tam di kêliya me hinek tişt ji hev re digot de, dengê çekan hat. Aytekîn got; “ax dayê!” Kî bi ser hev de dikeve ne

diyare! Qîreqîr, panîk li pey hev e… Leşker jî fîşekan didin ber çekên xwe û qîr didin. Dibêjin; “ rawestin, nexwe emê li we bidin.” Ne diyare kî, ji kuderê fîşekan direşîne. Ez jî tenê yên dikevin erdê û di nava xwînê de dibînim. Tenê dema min; “qatilên faşîst! Qatilno! Qatilno!..” Diqêriya tê bîra min. Di wê kêliyê de hinek hevalan li bin şibakê xwe avêtin erdê. Bi hizira ku fîşek nagihêjin wir, hinek din jî têlan radikin û hewl didin di bin wan re birevin. Wê têlê hem laşên wan parçe dikir, hem jî bedena wan tam eniyek bû. Aliyê din jî leşkeran da ku li wan bixin çeper girtine. Di wê kêliyê de serbazekê ser leşkeran de qêrî û got; “kuro bisekinin, guleyan nereşînin. Jixwe ew jî ji reşandina fîşekan direvin. Derve de çemberek berfireh ava bikin. Leşker, guleyan nereşîne!” Heta ku jê dihat diqêriya.

Belê, dîmenek zêde tirsnakbû û mirov tirsek mezin jê dijiya. Leşker di nava panîkê de ye. Dibe ku leşkerên faşîst ên di nava wan de bi zanebûn li benda reşandinê bin. Dibe ku ew jî hatibin erkdarkirin. Plan guncav bû, di hundir de faşîstan, di derve de jî leşkeran heval tengav kirin û dê komkujiyek pêk baniyan. Tola xwe radikirin. Ji ber di meha Adarê de bi mebesta Newrozê faşîst hatibûn kuştin. Tola wan hêcetek bû, tenê bi vî rêbazî berdidan hev.

Ez diqêriyam, min digot; "van leşkeran bidin rawestandin. Lîstoka we pir vekiriye, her tişt li holê ye. We ev plan kir, ne wisa? Nehêlin, bila li wan nereşînin." Min jî bi ser serbaz de qîr dida. Got; "temam, ezê bidim rawestandin. Rehet bin." Hewl didan me jî daxin jêrê. Em jî ber bi hundir ve çûn. Hinek heval di hundir de mane, me bi hev re diruşme qêriyan. Bes ew di qoxuşan de ne, deriyên wan jî girtine. Ez weke dîna me, bênavber diruşmeyan diqîrim. Paşê em daketin. Tam di wê kêliyê de du faşîst derxistin jorê. Em nizanin ji kur dihatin. Paşê gotin ku; "ji bona jêkirina porê derve mane." Çawa çavên min li wan ket, min jî dest avêt kursî û avêt wan. Li ser merdîwenan bûn, gavekê şûnde revî. Kursî li kabên wî ket. Min pir bi tundî avêtibû. Got; "wey komînîst!" Min jî got; "faşîstên kuçik! We reşand û kuştin ne wisa?" Ez li derdora xwe dinêrim, tiştek din ku bavêjim wan tine ye. Leşkeran ew faşîst bi lez ber bi holikan ve birin. Em jî ber bi qoxuşa xwe ve çûn. Bê ku em di ferqê de bin, hew me dît direşînin aliyê me jî. Ji ber heval ne di ferqê de bûn, ji reşîna destpêkê dereviyan, hewl didan werin aliyê me. Mixabin, bê ku em bizanin li aliyê me direşandin. Hinek fîşekên dipekin û tên aliyê me jî hene. Çawa me ferq kir, me ew hevalên ku ber bi me ve dihatin hişyar kirin. Me ji wan re got, ber bi vir ve neyên, fîşeka direşînin vir.

Dengê me tevan têkilhev bûye. Destwerdana hundir nakin. Sitvan (Yûzbaşi) û erkdar jî li naverastê naxwiyên. Bi zanebûn nehatine. Serbaz û çawuşê nobedar jî bê însiyatîf in. Ketine panîkê, giran tevdigerin. Piştî demek dirêj bombeya mijê avêtin hundir. Bang kirin; "wê çekê radest bikin." Hewl dan me bi zorê bibin cihek weke holikê, cihê komirê. Hema bêje em şer dikin. Min carekê dest avêt demanceya serbaz. Min hewl da bigirim. Wî jî yekser dest avêt demanceya xwe. Ji tirsa qîr da; "demanca min, demanca min." Li pey vê qîrê hemû leşker kom bûn. Vê carê jî min êrîşî çeka leşkerekê kir. Ger bi rastî jî biketa destê min, dê min li wan bireşanda. Min got; "hûn qatil in, we wisa kir!" Serbaz sond dixwar; "na, ne me kir. Agahiya min jî tine bû. Ti peywendiya min bi rastgeran re tine ye." Demekê wisa berdewam kir. Paşê kesê sitvan û rayedarên din hatin. Vê carê jî min êrîşî wan kir; "qatilên faşîst! We hevalên me qetil kirin. Ka bêjin we çend kes qetil kirin!" Qîrên min nedisekinîn. Min bangî hevalên di qoxuşê de kir û pirsî; "ma hûn dibînin, çend kes hatine kuştin?" Bersivek zelal nadin. Ji ber tevliheviyê wan jî rewşa rû dayî baş fêm nekirine. Em di cihê xwe de nasekinin. Dîtin em nasekinin, sitvan (yûzbaşi) ferman da; "destên wan bi piştê ve kelepçe bikin. Bibin wî alî." Ez li dijî vê derketim. Min ji wan re got; "ger hêza we heye, biçin wan qatilan bidin rawestandin. Hûn çima wan kelepçe nakin? Hûn çima wan çekan ji wan nagirin? Belê, ma we ew çek derbasî hundir kir, hûnê çima ji wan bigirin. Lê hûn derziyekê jî nadin me. Çima? Ji bona ji me re qedexe ye. Lê hûn demanceya didin faşîstan." Em bi zorê, bi erdê re xirikandin, bi dehfan û lêdanê dûr kirin û destên me kelepçe kirin.

Ez nizanim di navberê de çend saet, an jî çiqas wext derbas bibû. Lê piştî bendewariyek bi jan û kul, hinek heval bi otobûsa leşkerî anîn. Demek dirêj li arazî dane rawestandin. Hem jî li ser dev dane dirêjkirin. Li derdorên wan jî çemberek ji leşkeran çêdikin û dirêjkirî dihêlin. Qaşo ji bona kes nereve dikin. Hinek heval birîndaran dibin nexweşxaneya leşkerî. Hem jî hewl didin fêm bikin ka çend şehîd, an jî çend birîndar hene. Gelek heval tine ne. Em navan didin û dipirsin. Kanî Aytekîn, kanî Hamilî, kanî Adil, kanî Zekî… û gelek hevalên din naxwiyên.

Mistefa got; "rehet be şehîd tine ne, lê birîndar hene. Piraniya wan jî, ji ber têlan birîndar bûne, têl canê wan re çûye. Aytekîn jî fîşek ji milê xwe xwariye. Lê baş e. Mereq neke." Lê ez dîsa bawer nakim.

Min cardin got; "ma tiştek ji Aytekîn hatiye, rast bêjin." Ji ber destpêkê li wî dabûn. Nîşan lê girtibûn. Destpêkê ew ketibû erdê. Piştî wextekê komek din jî hat. Hamilî ew bûn. Wan jî tiştek din negot. Gotin; "tenê Aytekîn û hevalek din rakirin nexweşxaneya Meletiyê."

Nexwe rewşa Aytekîn xedar bû. Gelo çima Meletî? Di wê kêliyê de çokên min şikestin. Xwîna min sekinî. Aytekîn, belê Aytekîn çûbû… Ew kenê wî yê dawî, henekên wî yên dawî, bi kumê xwe lîstina wî… Ew halê wî yê ne li xema wî, bi coş, sekna wî ya ji gelek tiştan re serî radikir, meşên wî yên sivik û bibiyar û her nêzîkbûnek wî zindî bû. Tiştên min hîs dikirin, ne vala bûn. Wê êşa evqasî xwe di dilê min de bi cih kirî nevala bû. Hamilî sond dixwar; "tiştek tine ye." Di navbera axaftinên xwe de digotin ku li nexweşxaneyê firsendek baş ji dest berdane. Mistefa got; "me çend hevalan dikariya di nava wê hengamê de birevin." Ma ne wisa ye. Divê mirov firsendan rast

binirxîne, nexwe dê hemû vala biçin. Di vê mijarê de hişyariyek tine ye. Weke ku bertekên hundirîn ên her kesî yên rewşên heyîn berovajî bikin cemidîne. Divê ev were şikandin.

Qaşo kesek 'tetîkkar' ê ji faşîstan birin dadê. Ya rastî, ji her du aliyan ve li me direşandin. Faşîstan tenê demanceyek radest kirin. Ev jî derew bû. Nexwe planên wan ên cuda hebûn. Em hêj li heman avahiyê bi hev re ne. Tevî van cih jî naguherin. Tê gotin ku, heman rewş li girtîgeha din jî hatiye jiyîn. Bûyera girtîgeha em lê dimînin bandor li wan jî kiriye. Heval jî li wir îsyanê derdixin. Bûyera rû dayî protesto dikin. Ji bona protestokirina rewşa rû dayî, em jî dest bi greva birçîbûnê dikin. Me di daxwaznameyan de diyar kir ku para îdareyê di van bûyeran de heye. Îdareyê demance derbasî hundir kirine. Her wiha tevî hinek hişyariyan bi zanebûn tevdîr nehatine girtin û hêj ti ewlekariya me tine ye. Ev çalakî bi armanca hişyariyê bû. Bêdengî xirabtire. Me hewl da em malbatan bixin tevgerê. Me ji wan re got; "hûn jî daxwaznameyan bidin û bi hev re tevbigerin."

Piştî vê bûyerê demekê Hisên Yildirim hat. Weke her carê hevdîtina parêzeran jî li odeya îdareyê pêk hat. Serbazê wê rojê jî, nobedarê roja bûyerê bû. Hisên Yildirim têkildarî dosya dozê tiştek nû negot. Wî jî got dê hemû dozên PKK'ê bikin yek. Got; "min bi birêz Cahîd re hevdîtin kir. Got ku dê hewl bide vê biryarê bide rawestandin û ji bona dadgeha koma Elezîzê, li Elezîzê were kirin mijûl bibe." Kesê ku jê re dibêje birêz Cahîd jî, Serdozgerê Leşkerî Cahîd Aydoxan e. Min jî rewşa heyî ji hevalên ku li nexweşxaneyê bûn re ragihand. Destpêkê nexwest bêje, dema min israr kir got; "rewşa Aytekîn giran bû, çawa bû?" Destpêkê sekinî paşê axivî;

“Aytekîn şehîd ket.” Ez yekser ji cihê xwe pekîm û rabûm. Min destêkê maseya ku serbaz li ber rûniştibû da ber kulman û jê re got; “Qatilno. Hûn qatil in. We ew çek derbasî hundir kir.” Paşê ji cihê xwe rabû û got; “hinekê rehet be, ma min kir? Na, min çek ne daye.” Hisên Yildirim jî ji aliyekê ve digot; “keça min Sakîne, ka hinekê bihedire! Ew serbazeke. Pirsgirêk ne ew e.”

Min bi piştstûya wî re girt û got; “na, ez dizanim we kir. Me çend carî hişyar kir, hûn lê jî negeriyan. Ji me re derziyek qedexe ye. Nexwe ew çek çawa derbasî hundir bûn?” Paşê min bazda derve û qêriyam; “Aytekîn namirin.” Ji nişka ve heval jî tevlî min bûn û diruşme qêriyan; “Bimirin Faşîst! Îdara Faşîst! Emê ji Faşîstan hesabê pirsin!” Êdî çi tê berdevê min dibêjim. Hevalan bangî min kir. Gotin; “ma çi bûye?” Destpêkê dengê kesî nedihat min. Min jî nedixwest bibihîsim. Dema min carekê li derdor temaşe kir, min dît ku Hisên Yildirim bi du leşkeran re ji cihê nîzamiyê lez û bez diçû. Çi zû gihiştibû wir? Mîsoger ji ber agahî wî anîbû, jê aciz bibûn. Mîsoger jê re gotine; “zû ji vir biçe.”

Min ji hevalan re got ku Aytekîn şehîd ketiye. Ez di korîdora navberê de rûniştibûm. Sirûd dihatin xwendin. Paşê jinên din jî ji qoxuşê hatin. Dilxwede dê min bihedirînin. Derî vekirin. Heval hatin cem min. Ecêb! Serbaz û îdare nerim bibû! Lê di wextek din de nedixwestin qet nêzî min jî bikin.

Wextê me heta êvarî bi diruşme û sirûdan derbas bû.

Paşê di agahiyek me girtî de gotin ku, Aytekîn li nexweşxaneyê bi zanebûn hatiye şehîdkirin. Ango hemşîre serûmê ji milê wî derdixe, an jî herikîna wê dide rawestin. Pir vekirî qetil dikin.

Gelo ev jî tola Celal Aydin bû? Ji ber ê ku ji bona destwerdanê çûyî Meletî Aytekîn bû. Piştî demekê jî Celal şandibû Elezîzê û carek din jî Celal nevegeriyabû. Her wiha hinek faşîstên ku Aytekîn ji kolana Çandê nas dikirin hebûn. Mîsoger van lê reşandibû. Kî dizane di derve de jî çend caran xwestine ku wî bikujin.

Şahadeta Aytekîn zêde bandor kir. Were mirov evqas bi êşkenceyan re derbas bibe tiştek nebe, lê wisa erzan di girtîgê de were kuştin! Her tim digot; "me çend caran kefenê xwe qetandiye." Belê, mirinê di hundir de, di zindanê de jî bela xwe jê venekiribû. Di heman demê de fîşeka Faşîst destpêkê ew hedef girtibû. Rewşa wî ya di lêpirsînê de… Halê wî yê roja dawî… Ew zîndewariya wî û germahiya wî ya ji mirovan re, xweşikbûna ruhê wî yê şoreşgerî çiqas balkêş bû. Bes hemû jî weke agirekê li ser dilê min sekinî bû. Min nedikariya jibîr bikim. Gelek gotin, hişyarî û rexneyên ku her carê ji min re tên dubarekirin ên weke; "tu zêde hestiyarî. Nabe ku mirov evqas jî bandor bibe. Divê mirov hîn bibe. Divê em bihêz bin" kêm nabin. Çiqas her tişt hêsan tê gotin.

Di rojên pey wê de Mistefa got; bêhna xwe teng neke. Bes nota ku ji bona te hatibû, min di roja bûyer rû dayîn de tine kir. Ez neçar mam. Ya rastî bi min re bû. Dema em derketin hewayê bigirin, ez hizirîm ku di derî re bavêjim hundir, lê nebû. Leşker hebûn. Piştî bûyerê jî em bi saetan di erazî de

hiştin. Min got dibe ku li ser me bigerin, bê ku bixwînim min tine kir. Ya rastî qelîştekek li erdê hebû, min jî di wê qelîştekê de veşart. Xweziya min bixwenda. Bes di nota ku ji bona me hatî de hinek tişt hatine nivîsandin. Girtinên ku çêbûne ji bona partiyê weke darbeyekê û binkeftinê hatine nirxandin. Nivîsên ku me jî şandine gihiştine dest. Tiştên derbarê Şahîn de hatine gotin tên nirxandin. Lê belê, Şahîn gotiye; "rewşa min ne weke ku hatiye diyarkirine. Beriya ku were girtin her tişt ketiye dest, ew jî neçar maye hinek tiştan qebûl bike. Her wiha hinek tiştên din nivîsandine. Hevala xwestiye ku em moralê xwe bilind bigirin." De were bila bêhna min teng nebe? Bi taybet jî ez? Tam berevajî, ev demek dirêje min ji xwe re kiriye derdek. Gelo hevalan çi gotiye? Weke din jî notek ji cem partiyê hatibû! Çawa çêbû? Kêmasî bû, mirov dikare di navbera girtin û vekirina çav de deh notan bide. Hebûna leşkeran ewqas jî ne asteng bû. Li ber ketim. Lê vala bû, ji ber êdî ew not di bin axê de bû. Nexwe nivîsên ku çûne derve hatine xwendin. Hatine nirxandin. Lê dîsa jî tiştên ku ji bona Şahîn hatin gotin, neket serê min, serê min pê dêşe. Gelo ez cardin notekê binivîsim?

Hinek gotinên ku weke dê ji bilî faşîstan me hemûyan derbasî girtîgeha jêr bikin digerin. Min kiribûn serê xwe di derî de birevim. Ji ber dirûtina pantor û tiştên din dê bal bikişanda. Jixwe şevê reng nediyarin. Lê mixabin bê şansî, hem jî bê şansiyek pir xirab çêdibe. Wê rojê serbazê nobedar di derî de bi me re axivî. Dest û lingên wî nasekinin. Her carê lingên xwe tavêje hesinên derî. Giranî bandor dike. Min bi kefçî têra xwe beton kola bû. Jixwe ji ber destpêkê jê kirine û paşê ev beton lê dane hêsan derdiket. Jixwe mirov dest bide cihê mifteyê dê vebe. Ew qas sist bûye. Carekê destê xwe avêt qulfê. Bi wê lîst

û mifte di destê wî de man. Zilam ji nişka ve tirsiya û got; “ev jî çiye? Ma evqas sist bû?” Şik bir. Deriyê hesin hejand. Valahiya li jorê jî ferq kir. Derî hêdîka rakir. Pir rehet ji menteşeyê derdiket. Bangî leşker kir; “we çawa ev ferq nekiriye? Tevî ku hûn her roj derî vedikin û digirin, we çawa neditiye. Zû bila yê qeynaxê were vî derî çêke.” Fermanek tûj da. Paşê li min zivirî û got; “xanima Sakîne, an jî hûn hizirîne ku birevin? Ji ber ev netiştek asayî ye.” Min jî got; “belê, min firsendek baş ji dest berda. Çi bê şansî ye. Xweziya min beriya niha ferq bikira.” Min xwest bala wan belav bikim. Lê zilam weke guran bûn. Heman cureyek Zafer Karaosmanoxlu bû. Çiqas dişibiyan hev. Mirovan lêkolîn dikin û di darizînin, ma ne karek ji rêzê ye. Ez jî dihizirim ku çima ya destpêkê tê bîra wan ez im. Lê wan tam di cih de dihizirî. Bes nebaş bû. Dê ji vir û şûn de venêrînek hişk bikin.

Lenet be, ma ev zilam çima hat û axivî? Nexwe dê min wê şevê çi diba bila biba biceribanda. Dema ku zilam qeynaxê ve mijûl dibûn, leşkeran jî ecêb temaşe dikirin. Dengê derî diçû, hevalên jorê jî. Her kesî mereq dikir. Bê ku tiştek bibe şik pêş diket. Tiştên nebûyî diket bîra zilaman. Ev jî pir xirab bû. Tişta di destê min de ma Muradê ji Manîsayê bû. Emê êdî girtîgehek wisa, weke vê nebînin. Avahî girêdayî leşkeriyê ye. Xisleta xwe ya girtîgehê tine ye. Paşê veguherandine girtîgehê. Lê ji aliyê ewlekariyê ve cihên xwe yên lewaz hene. Gelo hevalên derve dizanin? Ji ber binyata rêxistinî belav bûye, dibe ku kes li bajaran jî nemabe. Xeteriyên wê jî hene. Di mijara heqkirin û nekirinê de şîrove jî nakim. Ger derfetên heyîn baş werin bikaranîn, dê ev jî çalakiyek li dijî dijmin be. Di heman demê de wê darbeyek mezin be. Bawer im ez zêde bi niyetek baş dihizirim û xeyalên min xweşbûn.

Min vekirî ji Murad re got; “alîkariya min bike ez birevim. Bavê min li Almanya ye. Ezê, te jî derxim dervî welat. Jixwe ji bona we jî leşkertî nayê ecibandin. Tu kedkarekî. Malbata te jî weke malbata min karker in. Bawer nakim zerarek ji aliyê te ve pêş bikeve.” Destpêkê mat bû.

Got; “ez li bendê bûm. Ji ber her mirovê dikeve girtîgehê û her mirovê leşkeriyê revê dihizire. Temam, lê belê me bigirin emê çi bikin? Em bêjin rewşa te diyare. Wê te dîsa bixin girtîgehê. Jixwe te ev jî daye ber çavan. Dê çi ji min were? Bi xwedê wê min bikujin.”

Min got; “mîsoger em nayên girtin. Ji min bawer bike.”

Got; “ka hinekê bihizirim. Dê ev kar çawa çêbe?”

Min got; “ewder hêsane. Emê di nobeta şevê de biçin.” Ez naxwazim ziraviyan pê re parve bikim. Çi dibe, çi nabe. Dibe ku weke xuya dike nebe. Lê ez ne şaşbûm. Murad xwedî niyetek baş û samîmî bû. Du alî nedilîst. Hinekê bêdeng bû. Ket serê wî. Lê belê, tirsa dê paşê çi bibe û girtinê heye.

Paşê ji min re got; “ka li vî alî binêre çawa têlên wê nimzin. Cihê ku dewriye diçin û tên heye. Weke rê ye.” Ez jî li cihê ku şanî min kirî dihizirîm, ji ber aliyê kaniyê bû. Nexwe min çavderiyek rast kiriye û kêfa min hat. Nexwe wê ev kar pêk were. Ger Murad kêmekê qane bibe, dê ev kar pêk were. Got; “ezê bifikirim.” Em evqas tiştan di çûnûhatina tuwaletê û ser kaniyê de di-axivin. Ji bona pêdiviyê ez bi tena xwe çûm û roj e.

Roja paştir em hemû bi hev re veguheztin girtîgeha jêrê. Planek min a din vala derket. Çi bê şansî bû! Yên li nexweşxaneyê hatin bîra min. Digotin; “Şadî zorê xilas bûye.” Kesê ku bi Aytekîn re dimeşiya jî ew bû. Fîşekê ji eniya wî girtiye û derbas bûye.

Avahiya girtîgeha jêrê cuda ye. Du qet e. Şibakeyên wê dirêj û jora wan gilover in. Du beşên korîdoran ên ji hev cuda dibin hene. Her beşek gelek odeyên wê hene û deriyê hemûyan jî ji hev cuda li heman korîdorê vedibin. Eywan û odeyên hundir jî wisa nin. Beşa tuwaletê li cihê ketina hundir de ye. Xwarin û hwd li eywana ketina hundir de jî tên belavkirin. Deriyên wê yên sitûr û hesin hene. Li her du aliyên eywana ku dike du beş, beşên ji derabeyên hesin û têlan hatine çêkirin in. Kesên ku derve de tên serdanê li cihek cuda ku, bi sitûnên hesin hatine çêkirin dimînin. Girtî jî kabîneyên ku di hundir de ji bona wan hatine çêkirin hene dimînin. Di navberê de cihên hesin, têlên hatine hunandin û cam hene. Qeta jor jî ya îdarê û leşkera ne.

Şahîn di beşa duyem de ye. Li wir hinek kesên ji komên çepgir ên Kurd û Tirk hene. Dîsa hinek hevalên me jî li wir hene. Cihê hewa girtinê jî du ne. Cihên vekirî û bi têlan hatine hunan. Arazî bi temamî yê leşkeriyê ye. Ango qada leşkerî ye. Taxa Kirkdutlar dixuyê. Rêya Xarpêtê dikeve jorî me. Kêmek pêşde avahiyên dadgeha leşkerî hene. Qadeke ku Kolordu û avahiyên weke wê lê hatine bicihkirin e.

Hisên Gûngoz jî hat girtin. Me agahiya berfireh ji wî girt. Diyar kir ku, hewl dane derve hinek tiştan komî ser hev bikin. Bozo Hisên, ew Bozo Hisênê mala xwendevanan a li Dêrsimê kolana Daxê bû. Her tim ew halê wî yê dema ‘ji derewan çîkofte’ çêdikir û difirot tê bîra min. Ji ber nasnameya sixte pê re hatiye girtin. Hem jî li malekê hatiye girtin. Berpirsê beşekê ew û beşa din jî Mistefa ye. Em dîsa di şibaka cihê hewa girtinê de, di mazgala derî de bi hevalan re di-axivin. Rewşa cihê

qoxuşa me baş e. Em ji hevalan tecrîd nekirine. Pêkhateya girtîgehê pir rengîne. Milîtanê koma ku ji MHP'ê (Partiya Tevgera Mîllî) cihê bûyîn Reşo (Dedo) jî vir e. Bi demanceyê hatiye girtin. Dijmin jî carê bê zanebûn tiştên baş dikir. Reşo xwedî ruhek anarşîst û zazayê ji Paloyê ye. Dema destpêkê cihêbûyîn, me hevûdû dîtibû, zêde bi biryar bû. Niha jî di girtîgehê de bû. Metîn û Doxan bi hev re hatine girtin. Di pevçûnê de Metîn ji kaba xwe birîndar dibe, fîşek di kaba wî de ye. Dosya wan bi doza Elezîzê re kirine yek. Li ser wan jî îfade hatine dayîn. Bakî Polat jî hat. Ew jî girtîbû. Ew jî li beşa du ye. Dixwaze bi-axive, nîqaş bike û derbasî beşa me bibe. Derket cihê hewa girtinê. Min ew hişyar kir. Min jê re got divê weke mirovek kamil nêz bibe û sînorê xwe bizane. Lê wî bi israr got; "ma em ne xizmin" û west bi-axive. Ku westeka wî ya axaftinê jî tiştek xwezayî ye, diyar kir ku wate nade çima wisa tê redkirin. Yek-du caran ji cihê hewagirtinê bang kir. Got; "Sakîne, Sakîne em hinekê bi-axivin." Dîsa belaya Baqî hat! Mirov ji hêrsan diteqîne. Min got; "na, tiştek em bi-axivin tine ye. Ger tiştek te hebe, li cem te ewqas heval hene. Tu dikarî bi wan re bi-axivî." Min ji hevalan re got bila negirin beşa xwe. Hinek guhertinên cih em di nava xwe de dikin. Em hewl didin her du beşan jî di hevsengiyê de vesaz bikin. Me guncav dît ku em piranî hevalên me di vê beşê de bigirin. Tenê ew mil nêzî eraziyê ye. Bêdenge. Fikirek heye ku ji wî alî ve tûnel were kolan. Hinek kesên komên din jî dihizirin. Hevalên ku balê nakişînin li wir in. Şahîn heye, lewma divê her tişt baş were sazûmankirin. Dê biceribînin ku di kanalîzasyonê re derkevin. Hinek tiştên ku em beriya wê jî dihizirin hene. Me derbarê Şahîn de pêşniyar ji partiyê re kiriye. Bersiva pêşniyara

me ya cezakirinê dereng dimîne. Hêj hevalan îxaneta wî jî fermî destnîşan nekirine. Me jî li hember vê bertek raber kir. Gelo çima ji me bawer nakin. Yên ku rewşa wî herî baş dizane em in. Li gorî çi heta niha ti biryar nedane. Em jî zêde manê nadinê. Ez bi israr im. Li hember îxaneta Şahîn bê helwestiyê rast nabînim. Hêcetên weke "dê di hundir de xeterî hebin" jî, nêzîkbûnek bi pîvan nabînim. Yek kes dikare bigire ser xwe. Çalakiyek wisa wê di hundir û derve de jî bandorek mezin û erênî bike. Gelek heval ji bona ku ew di nava me de ye, ji qehra dimirin. Îxanet di nava me de bû. Nêzîkbûna partiyê ya li hember îxanetkaran kêm zêde dihat zanîn. Wê demê li benda çi bûn? Me jî pêşniyara xwe ferz kir. Hisên got; "weke ku divê hinek tişt hinek din bi hedar û veşartî werin kirin" û bersiva me wisa da. Lê got ku pêşniyara me jî ragihandiye. Şahîn carekê derket beşa em lê dimînin. Min jî di şibakê de destwerda û got; "dê carek din ketî dernekeve vî cihê hewa girtinê." Min heval jî rexne kirin. hêj di hinek mijaran de nezelal in. Bêdeng û bêhelwest dimînin. Ma qey dê her tişt jor de, ji aliyê rêxistinê ve were gotin. Dibe ku derve jî rewşa wî nizane. Dibe ku bêjin, 'peywendiyên xwe pê re çêkin.' Lê em her tiştî dizanin û wî xayînî nas dikin. Hamilî jî nirxandinên derve yên derbarê girtinan de kiriye serê xwe. Dibêje; "nikarin her kesî di heman rewşê de bigirin dest û heman pîvanan de binirxînin." Weke din jî berpirsyariya girtîgehê jî bi hinek hevalên din re ye. Vê jî zêde qebûl nake. Elî Gûndûz diçe û tê. Ya rastî rewşa wî jî zêde nebaş e û xeter e. Wî jî di astek girîng de îtîrafkarî jiyabû. Jixwe zêde negirîng bû ku, gelek tişt gotine, an jî negotine. Şêweya îtîrafiyê girîng bû. Ew ruhê ku bi wî re hatî avakirin girîng bû. Destpêkê li ber xwe da. Gelek êşkence jî lê hat kirin.

Ev rast bû. Lê her ku îtîraf kir, derûniya ku jiya, teslîmiyet bû, bêbawerî bû û baweriya li hember xwe winda kiribû. Di wî halî de çûnûhatin dijiya. Ew jî li ser xeta di navbera îxanet û berxwedaniyê de bû. Belê, rewşa ruhê teslîmiyetê! Yan dê biçe îxanetê, yan jî dê ji wir deriyekê bibîne, derketinek bi hêz bike, xwe ji rewşa wî halî rizgar bikira û cardin vegera ruhê xwe yê berxwedaniyê. Em van rewşan di navbera xwe de nîqaş dikin. Ez wî nas dikim. Lewma rewşa derûniya ku dijî baş fêm dikim. Min gumanên xwe ji hevalan re jî got. Ew bi xwe bêdeng, lewaz e, na-axive, tenê nivîsek ku nivîsandî û dabû min hebû, min ew xwend. Tam pêxirtengiyekê dijî. Hem lenetê bi rewşa ku dijî û lewaziyên ku raber kirine dike, wê jî weke îxanetê dinirxîne, hem jî ti hêza derketinê nade raberkirin. Dizane ku dê dijmin jî wî rehet bernede. Ew derûniya binkeftinê gelekî tirsnake. Ger kesayet nekare wê derûniyê berovajî bike, dê bikeve. Ev jî rastiyek bû.

Min peywendiyên Hamilî û Elî Gûndûz rast nedît. Halê ruhê Elî û gurura Hamilî, hinek tişt hezim nekirin û bertekên wan hevûdû neyênî bandor dikir. Ji ber min ev ferq kiribû, ez pir vekirî bi Hamilî re axivîm. Gumanên min ên derbarê Elî de cudatir bûn. Hinekê bêbaweriyê jî li dijî wî dijîm. Min got; "ewê nekare hêsan rabe ser xwe." Her çendî di derbarê Hamilî de hinek gumanên min hebin jî, dîsa jî hêvîdar im. Mafê kesî tine ye ku xwe bi xwe ceza bike. Em mirovê rêxistinê ne. Muhasebeya me ya wijdanî cuda ye, lê bi şaşiyan re xwe bi xwe cezakirin jî cuda ye. Ev sucek mezintir bû. Min ji Hamilî re got; "emê helwesta partiyê esas bigirin. Dê rexne jî hebin. Dibe ku em werin cezakirin jî. Kanî em her carê dibêjin me suc kir. Girtinên me, îtîrafên me hemû suc in. Wê demê divê em

samimî bin. Helwesta partiyê ya di derbarê me de çi dibe bila bibe, emê bêjin ku ‘em bi wê ve girêdayîne’, pey wê re jî dê tiştê ku tên xwestin were kirin. Ev gelekî xeter e. Elî cuda ye. Tu dikarî hîn zêdetir bandorek erênî li ser bikî. Gumanên xwe yên kesî jiyan neke, nekeve wan hesaban jî.” Di wê navberê de tiştek din jî îtîraf kir û got; “Elî dixwaze biçe girtîgehek cuda. Ji min re jî got.” Dihat fêmkirin, ev kar cidî bû. Elî direviya. Dê vê revê ew bixista nava rewşek xirabtir. Girtîgehek taybet a cuda xwestin jî dihat çi wateyê? Girtîgehek girêdayî Kolordu yê hebû. Ew jî li cihê dadgehan bû. Destpêkê kesên ku sucên leşkerî kirine li wir mane. Bes Elî jî, ev ji kur derxistibû û digot? Gelo wan jê re gotibû? An jî tiştek din hebû? Dibe ku ji nêzîkbûnên hevalan giştî nerehet be, lê ev nehêcet bû. Bertekên hevalan ên li hember wî jî xwezayî bûn. Heta bertekên di vê mijarê de zêde bêpîvan û şêlû bûn. Heta niha jî bi niyetên baş nêzîkbûn tên raberkirin. Ez li hember vê rewşê zêde bihêrs bûm. Min ji xwe re got, nabe divê bi van hevalan re hinekê jî kîna çînî hebe.

Nîqaşa min û Hamilî tûj bû. Min jê re got; “tu dînîtiyê dikî. Ger Elî vê difikire, divê herî zêde tu helwestek tund raber bikî. Nêzîkbûnên te, bertekên te yên li hember sazûmaniya peywendiyên heyî û hwd cesaretê dide wî. Çima ne ji kesek din, tê ji te dixwaze?” Moralê min xirab bû. Gumanên min zêde bûn û ez ditirsim. Dibe ku mirov carê şaşiyên mezin bike û sucên giran jî bike, lê xwe ji van paqijkirin û derbaskirina van nezehmet e. Lê hinde hinek şemitîn hene, her çendî ji rêzê jî werin dîtin, weke nêzîkbûnek ji rêzê jî werin nirxandin, dikare ber bi encamên xirab û vegera wê neyî ve biçe. Min bangî Elî jî kir û pê re axivîm. Nîqaşên me yên di mazgalê de,

asta dengê me, hem bala yên hundir û hem jî bala hevalên xort dikişîne. Ez zêde bi Elî re ne di-axivîm. Tenê dema min rewşa wî ya derûnî didît pê re nîqaş dikir. Ew axaftin jî, bû axaftina me ya dawî. Lê cidî bû. Min jê re got; "pêşniyar û fikira girtîgehek cuda, çûna cem dijmin e." Ji bona wî pir giran bû. Min dîsa got; "rewşa ku tu di navê de dijî, cesaretê dide dijmin. Dê tu xwe ji vê rewşê rizgar bikî. Nexwe wê tu bi her tiştê xwe ve bin bikevî." Ez zêde bihêrs û bi acizbûn di-axivîm. Elî şerim kir, sor bû, rûxiya, çavên wî tije bûn. Em ji hev qut bûn. Not û helbestên wî tev rewşa wî ya derûnî û ruhî dida der. Hevalan ew jî bi dizîve dan min, min xwendin. Herî vekirî xwe di nava wan nivîsande rave kiriye. Herî zêde jî di serî de ew ji rastiya xwe ditirse. Xeterî jî di vir de ye. Ger cesareta xwe rizgarkirina ji vê bibîne, dê zû jê xilas bibe. Lê mixabin… Her roja ku derbas dibû, hejmara girtiyan jî zêde dibû. Li Dêrsimê bi Têkoşîngeran re pevçûnan rû daye. Heyder Alpaslan(Kemal Zap) ji her cihê xwe birîndar bûye. Kemînê datînin û li wan direşînin. Hevalan bela xwe lê dida, digot; "neh rihên te hene." Herî zêde jî ji sitûyê xwe fîşek xwarine.

Di heman rojan de Hesen Aydin hat. Ew jî bi hêzên me re di pevçûnê de tê girtin. Pevçûn jî li aliyê Pêrtag, Çemîşgezek wan deran rû dide. Du hevalên me yên pir hêja şehîd dikevin. Min Ehmed nas dikir. Hesen Aydin dîsa li holê ye. Bênamûs nasekine. Dijminatiya HK (Rizgariya Gel) ya li Dêrsimê, di serî de vî zilamî birêxistin dikir. Em di vê mijarê de neşaşbûn. Hesen Aydinê ku mudurê dibistana mamosteyan bû, niha jî ji ber heval qetil kiribûn girtî bû. Di hundir de bi me re bû. Êdî diviya em di vê mijarê de hinek tiştan bikin. Em nikarin bi qatilan re li kêleka hev bijîn. Ev bi sala ne ev zilamê sîxûr û

provakator êrîşî şoreşgeran dikir. Tevgera Rizgariya Gel birêve dibir. Em axivîn û pêşniyarên me yek bûn. Me ev pêşniyara xwe jî ragihand derve. Helwesta me rast bû. Diviya vê carê jî bê ku ji demê re were hiştin ev çalakî pêk bihata. Hewldanek hebû ku, em bikaribin demanceyekê ji dervede derbasî hundir bikin. Me dikariya em wê di gelek karan de bikar bînin. Ev pêşniyar jî hatiye kirin. Lê hevalan ji hesinên dîwaneyan şîş çêdikirin. Meto, Memo û Daîmî bi şîşan ve mijûl dibûn. Dema her kes derdikeve cihê hewagirtinê ew bi kevir û betonê ve tûj dikin. Yek şanî min jî kirin. Weke şûran bû. Kama, li ber wan netiştek bûn. Hinde bi erdê ve anîbûn û zirav kiribûn, zêde tûj bû. Amadekariyên bi vî rengî û helwest diyarkirin, li cihek weke hundir hêz dide mirov. Dihêle ku mirov hişyar tevbigere. Zindan jî eniyek têkoşînê ya cuda bû. Ger mirov bikare şerê xwe li wir jî berdewam bike û bi amûrên gelekî sînordar ve her tim amade be, wê demê mirov ruhê şoreşgerî dizane. Nexwe cihên wisa cudatir ne tên jiyîn û ne jî tu dikarî bipejirînî. Ji ber dijmin, hewl dide wisa li ser jiyana te hukum bike. Dixwaze dawî li şerê te bîne. Ji bona mirov binêre çi hewce dike, hewl dide wê ava bike. Lê dîsa jî bi înad li dijî hemû tiştên ku jiyanê bide rawestandin, hêza vîn û baweriyê girtin û bilindkirin gelekî girîng bû.

Bê sebir li bendê me. Heval jî li firsendek guncav digerin. Endamên Rizgariya Gel jî wî bi tenê nahêlin. Ew jî nerehet in. Ji ber wî qatilî diparêzin û xwedî lê derdikevin, di navbera wan de jî nîqaş derdikevin. Heval yek-du caran ji bona negirin qoxuşên xwe wan hişyar dikin. Dibêjin; “bila di vê beşê de nemîne.” Ev hişyarî watedar bû. Lê wan nedixwest ku fêm bikin. Şevekê dema Hesen Aydin diçe tuwaletê heval lê dixin.

Dema dengê qîran hat, min fêm kir. Haya kesên li kêleka min tine ye. Tirsiyan, gotin qey êşkenceyan dikin. Şîroveyên wisa di navbera xwe de dikirin. Min ji wan re got; rehet bin, tiştek tine ye.” Bi gelemperî li hember êşkenceyan hişyariyek heye. Ji ber di êrîşek herî biçûk de jî em diruşmeyan diqîrin. Em li deriyan dixin. Ger niha bikin, dê dijmin şiyar bikin. Ya rastî di hundir de leşker hene, lê hejmara wan kêm e. Zehmete ku hemû hevalan tespît bikin. Jixwe heval her tiştî amade dikin. Ji nişka ve ji çend qoxuşan hevalan xwest biçin tuwaletê. Dema leşker bi derî re mijûl dibin, heval jî lê didin. Tevî ku ji heft cihan şîş lê dabûn, dîsa jî xilas bibû. Me ji wî re jî gotibû; ketiyo, mirov digot qey neh rihê wî hene.” Rakirin nexweşxaneyê û ji wir jî berdan. Dijmin dizaniya ku zilamê xwe çawa biparêze. Erê, ji ber vê bûyerê jî li girtîgehê gengeşeyekê destpê kir. Ji aliyekê ve îdare di nava panîkê de ye, yekser li qoxuşan lêgerîn da destpêkirin. Ji aliyê din ve jî Rizgariya Gel û komên din hene û nêzîkbûnên wan jî ecêb in. Hewl didin wê bloka şoven û înkar a civakî ya li derve ava kiribûn, di hundir de jî berdewam bikin. Gelo divê îtîfak, dostanî û yekbûna çalakiyan xwe bispêre kîjan rêgezan. Divê em çi esas bigirin, em hêj nezelal in. Nirxandinên erzan û hêsan ên weke nakokiyên di navbera şoreşgeran de ye zû dihatin kirin. Rizgariya Gel daxwiyaniyek weşand. Daxwiyaniya me jî heye. Me jî daxwiyaniya Hesen Aydin sîxûr û provakatoreke û qatilê şoregera ye, nirxand. Me bangawazî kir ku komên çepgir ên din jî helwesta xwe diyar bikin. Di heman demê de, me Rizgariya Gel jî hişyar kir ku, ew jî sîxûr û provakatorên di nava xwe de baş nas bikin.

Danûstandinên nivîsan û hevdîtin destpê dikin. Hinek kom jî vê dikin hêcet û teşvîkî blokbûnê dikin. Rexneyên hevbeş pêş dixin. Rizgarî, Kawa û hinek komên din bi tevdîr tevdigerin. Mehmet Yildirim ev çalakî girt ser xwe. Dadê bangî kir û îfadeya wî girt. Mehmet jî dibêje; "Hesen Aydin ji Dêrsimê ve nas dike, wek kes jî jê hez nake, kesek her kesî diberde hevûdûye. Aliyê wî yê siyasî jî qebûl nake.

Atiye jî, nerehetiyên ku giştî hene, zêdetir gur dike. Sedema vê jî di navbera me de nîqaşên tund hatin jiyîn. Di biryarên koma wan de rola wê jî zêde ye. Dixwaze bandorker be. Kesek wisa ye, gotinên xweş dike, qadroya Enqerê ye. Di wateyekê de gotina wê derbasdare. Weke din jî Atiye kesek zêde hesaban dike û ecêb e. Her tim gumanan dide avakirin. Kesayet û şêwaza jiyana wê, peywendiyên wê yên bi kesên dervî koma xwe re, peywendiyên wê yên bi îdareyê re, ango ji her alî ve rastiya wê dide der. Bes dîsa jî zêde bi tevdîre, fêlbaze û hewl dide ji ti alî ve xwe nede dest. Bi kesên ku tên serdana wê re li odeya îdareyê hevdîtinê dike. Carê jî derdikeve dadê. Tevî ku di heman komê de hinek kesên din jî hene, ew bi tenê derdikeve. Ketiya zikê xwe ye, qaseya wê jî cuda ye. Dilxwede qadroya rêxistinê ye. Lê di nava xwe de jî cihê dijîn. Xwe bi şîr, hingiv, hêk û penîr xwedî dike. Nan jî naxwe. Li şûna nan, biskuviyan dixwe. Ango ev qasî taybet dijî!

Hisên Yildirim jî, carekê ji devê xwe derxist. Got; "Atiye kesek çawa ye? Ew keçik dernakeve dadê. Bi serdozger re hevdîtin pêk aniye. Ezê pirs bikim û vê rewşê hîn bibim. Ji ber kesek şikdare." Wî jî rast digot. Her wiha dizaniya ku ew çi

dike û hevdîtinê bi kî re dike. Tiştek asayî bû ku ew jî bizane. Ez mat nemam. Dîsa jî min got; “belê, hûn dikarin hîn bibin.”

Kêfa Sevîm, qet ji Atiyê re nayê. Elîf jî zêde tiştekê nade. Peywendiya xwe bi min re jî tine ye. Napejirîne. Asta peywendiyên min ên bi hevalan re wê aciz dike. Kesayetek kariyerîst e. Kesayetek rengê jinek bîrokrat a har, bihirs, ji cewhera şoreşgerî dûr, gelek hesaban dike û bê rû ye. Bi kesî re nêrînek erênî ava nake, her kes jê dûr disekine. Peywendî, dev û zimanê pergalê di kesayeta wê de zêde diyar dibe. Di vê mijarê de hinek aliyên min jî yên nayên pejirandin hene. Ez nikarim hêsan pê re bibim yek. Lê aliyek wê ya balkêş, xisletek şoreşger û sosyalîst, fêrbûnên jiyana wan, xwestek û germahiyek heba, dê mîsoger min jî li hember wê rêz bigirta û bi germahî nêzî wê bûbam. Wê yek gav bavêta, dê min deh gav ber ve bavêta. Lê mixabin, Atiye weke kesek biyanî ye. Dûr, ferdperest, kesane ye. Ew û Elîf di cihekê de lihev dikin. Aliyên wê yên veşartî tine ne, ne mane, lê Atiye veşartiye. Bandor li hevalên xwe jî dike. Wan teşfîk dike, da ku ew li dijî me helwestên neyênî raber bikin. Gelo li ser bingeha kîjan berjewendiyane? Ne berjewendiya komê heye, ne jî berjewendiyek din heye. Wê demê dixwaze çi bike? Dîsa jî heta ku ji min tê hewl didim meylên hevbeş bibînim, bigirim, da ku bikaribim derfetên li eniya dijî dijmin de - di rastiyê de em her du di heman eniyê de ne - cih bigire. Heval jî nêzîkbûnên min ên di vê mijarê de ‘tûj’ derdikevin holê rexne dikin. Ez jî nêzîkbûna wan a gelek tiştan ferq nakin rexne dikim. Em wisa hewl didin hevsengiyekê ava bikin.

Mehmud Aktaş, ji ber kuştina rojnamevanek dilxwazê PDA hatiye girtin. Çavên wî tije xwîn bûne. Ji ber di lêpirsînê de demek dirêj bi lingê xwe ve hilawistî maye, êşa serê wî pir girane. Li rojnamevan Adil Turan direşîne. Lê, birîndar xilas dibe. Ango çalakî serneketibû. Mehmud ji Semsûrê ye. Piştî em tên girtin heval derbasî qadê dibe. Çalakî dihatin hêvîkirin, bi taybet li dijî polîsên êşkencekar pêşxistina çalakiyan, dê bandora xwe zêdetir bikira.

Heyder Karasungur jî bi daxwiyaniyan ve tê girtin. Koma daxwiyaniyan di otobûsê de derdikeve holê. Dixwazin bavêjin ser wî, ew jî qebûl nake. Encama girtinên bi vî rengî baştire. Li ber xwe didin, qet nebe zerara heyî berfireh nabe. Lê mixabin, Heyder her roj hinek din dihele û nexweşe. Zêde ber bi çav û diyarker dihele. Çûbû doxtor, lê hevalan nedixwestin encamên tehlîlên wî diyar bikin. Ji ber ji min vedişartin, min digot qey di encama êşkenceyê de ji hinek organên wî xwîn tê. Nexweşiyên bi vî rengî hene, lewma hêj gelek heval li şûna mîzê xwîn dirijînin.

Heyder zêde girtî nema. Bi biryarek lezgîn yekser hat berdan. Piştî ku hat berdan, ez hîn bûm ku nexweşiya wî verem e. Piraniya cîgerên wî elem û av girtiye, lewma rewşa wî zêde xetere. Di vê mijarê de rapora doxtor bi bandor bû. Hem kêfa min ji berdana wî re hat, hem jî xembar bûm. Ger derve derfetên tedawiyê bibîne, dê baş be. Vê îhtîmalê jî hinekê dilê min rehet dikir.

Me aliyê din jî zêde nepirsî, lê mirov dema di hundir de dimîne hinekê jî bi şik û guman dibe. Gelo dibe ku dijmin, ew ji ber mamoste Mehmet berdabe? Gelo dibe ku ji bona dewsa

wî bibîne, berdabin. Ev jî îhtîmalek ji hezarî yeke. Her wiha mirov di vê qonaxê de ancex dikare li gorî xwe bihizire. Heyder rêhevalek hêja ye. Di kesayeta Mehmet Karasungur û Heyder de gelek xisletên ku dişibiyan hev hebûn. Di heman demê de gelek xisletên ji hev cuda jî hebûn. Îmaja Mamoste hişk, tund, dijwar bû, lê mirov ji xwe dûr nedixist. Lê kesayeta Heyder zêdetir nerim bû! Hinde dilnizim bû, xwezayî, bêdeng, lê balkêş, herikbar û bêdeng diherikî.

Di nava tiştên ku derve de bi navê min hatine de terlikek sandelet a binê wê bilind hatiye. Hema bêje bostekê sitûre, dilxwede terlikên modeya nû ne. Heval dibêjin ku beşa bi kivarke veke. Asayî cihê kivark nerme. Lê ev giran bû. Parçeyên demanceyê hatine bicihkirin. Beriya tişt werin ji min re, pêş de agahî didin. Dibêjin; "Me hinek tişt xwestin, em lê binêrin, ger werin baş e." Hamilî û Hisên dibêjin ku ji beşa din revê biceribînin. Dibêjin; "dê hevalên ku rewşa wan girane, dibe ku cezayên giran bigirin derkevin." Têla hunandî nêz e. Ew navber nezêde ye. Tenê çend metreyan bikolin dê bes be. Lê dem jî girîng e. Dikare têl were birîn û mirov wisa jî bireve. Me birek jî anî. Mirov dikare hesinên şibakeyan bibire. Êdî dê kîjan rê guncav be, ew bê kirin. Kêfa min pir ji vê mijarê re hat. Tenê hinek parçe kêm in. Dê ew jî werin. Divê baldar nêzî vê mijarê bibin. Nabe ku li ser hev terlik û pêlavan bînin. Tiştên ku ji bona hevalên xort tên bi hemû ziraviyan ve kontrol dikin. Heta hundirê wan derdixin û lê dinêrin. Terlik balê nakişînin. Lewma divê em jî parçeyên ku tînin baş veşêrin. Her heftê lêgerînê dikin. Carê di navberê de jî dikin. Heta dema heval derdikevin hewagirtinê jî lêgerîn tê kirin. Me jî berfireh kontrol dikin. Ji ber em qebûl nakin leşker li me bigerin, roja

kontrolê polîsên jin tînin. Polîsên jin jî li nav cil û paçan digerin. Leşker jî giştî dinêrin. Lêgerîn pir zirav tên kirin. Dinêriyan cihek ku hatiye kolan û tiştên ku hatine veşartin hene an na. Heta hundirê doşekan jî vala dikirin, li tiştên qedexe digeriyan. Ji ber dijmin her carê hînî rêbazek nû dibû.

Min planek nû ya revê pêşniyar kir. Mirov pir hêsan dikare ji nexweşxaneyê bireve. Ev li nexweşxaneya leşkerî zehmet bû. Nexweşxaneyên sivîl dikarin sewkî cihek din bikin. Berî niha jî hinek kes çûn û hatin. Min got ezê ji bona kontrolê biçim beşa jinekolojiyê. Ez naxwazim kontrola min li nexweşxneya leşkerî were kirin. Jixwe ew beş jî li wir tine ye. Min sewka xwe ji bona sîgorteya civakî da çêkirin.

Agahî dane hevalan jî. Me roj û dîrokên sewka nexweşxaneyê li gorî texmînan da. Derve got; "temam." Min jî bela xwe li hevalan dida. Min ji wan re digot; "ezê beriya we biçim. Ezê beriya we li derve bim." Ez jî bi baweriyek mîsoger dê pêk were lê dinêrim. Nexweşxane qelebalixe, cihên kontrolê jî ji mirovan dagirtiye. Ez jî di nava wan de me. Çend leşker û serbazek li cem me ye. Ji ber ez jin im, texmîn nakin ku ezê tiştek cuda bikim. Herî zêde jî qelebalixiya mirovan a li derdor bala wan dikişîne. Ji ber di nava wê qelebalixiyê de rev hêsan bû. Me saet, roj û dîrok ji hevalan re ragihandiye. Di wê mijarê de kêmasî tine. Min xatirê xwe ji hevalên ku haya wan ji vê rewşê hebû xwest û wisa hatim. Serbaz bi karên kontrolê ve mijûl dibû. Derfetên min hebûn ku dora xwe bidim pêş. Ji ber leşker bûn, ew cuda digirtin dest. Her kesê derdor li me temaşe dikir. Destên min li pêş kelepçe kirine. Ev jî bal dikişîne. Leşker nerehet bûn. Cihê ku em lê sekinîne jî qelebalixe. Ez jî

bi çavên xwe derdor kontrol dikim. Ji xwe re dibêjim, ‘tika dikim, de bike, tam wextê wê ye.’ Kelepçê destên min zêde dişidand. Min ji leşker re got, da ku hinekê sist bike. Ger ez bikevim hundir dê bi temamî vekin. Lê wisa jî baş e. Ez dikarim di her rewşê de destên xwe vekim. Nabe pirsgirêk. Bê ku pê bihesînim, diceribînim, belê derdikeve. Dilê min gumegum lê dide. Hêvîdarim ti kêmasî rû nedin. Mîsoger doxtor, hemşîre, an jî personelek nas heye. Dihizirim ku ji wan sûd werbigirim. Serbaz got; “doxtor, tine ye, nehatiye.” Gelo dibe ku doxtorek din hebe? Ez dixwazim mijûl bikim. Min got; “de ka ji wan bipirsin, gelo doxtorek din a ku ez bikarim xwe kontrol bikim tine ye?” Wext derbas dibe, hêj heval nehatine. Gelo şaşiyek heye? Serbaz got; “li sûkê doxtorê taybet heye. Em dikarin te bibin wê derê.” Kêfa min zêdetir ji vê re hat. Sûk qelebalixe, ez wê derê nas dikim. Dr. Aysel Daxdevîren, yekser li kêleka rawestgeha Xozatê ye. Ger vir nebe, ez dikarim li wir biceribînim. Ger kes neyê jî, ez dikarim bikevim nav qelebalixê û birevim. Ger heval werin, bibihîsin, dikarin werin wir jî. Tişta ecêb, tiştek namîne ku ez di kêliyekê de nahizirim…

Mijûlbûna me deh-panzdeh xolekan berdewam kir. Em bi cîpê çûn sûkê. Çawa em ji cîpê daketin, kesên ku li kehwexaneyê rûniştine yekser hemûyan li me temaşe kir. Ji nava gel hinekan nas dikim. Serbaz nerehet bû. Got; “em hatine kuderê?” Bangî du înzîbatên ku digeriyan jî kirin. Diyar bû zêde tirsiyabû. Em li merdîwenan hilkişiyan. Ew der jî qelebalixe, di hundir de yên ji bona kontrolê hatine zêde ne. Sekreter got; “camêro ji kerema xwe re divê hûn hinekê rawestin.” Vê carê jî serbaz tam tirsiya. Di wê navberê de hinek ketin hundir û derketin. Kesek ciwan li min temaşe kir û çû.

Min ji xwe re got vê carê temame. Wext dirêj bû û ez kontrol kirim. Min ji bona her îhtîmalê tika jê kir ku ji leşkeran re bêje, da ku cardin werim kontrolê. Min got; “ew leşker fêm nakin, li ser qaxida tenduristiyê binivîsin.” Jinê jî bi rûkenî got; “temam.” Derman nivîsandin. Bi rastî jî nexweşiyên min hene. Ev jî dibe sedem ku bawer bikin û em daketin.

Dema em ji merdîwenan daketin, min xwe girane kir. Min di gava dawî ya merdîwenê de destek xwe hêdîka ji kelepçeyê derxist. Lê ji bona ferq nekin bi destê xwe yê kelepçe destê din vedişêrim. Serbaz got; “rawestin.” Qelebalixa li ber derî belav kir. Cîp zêdetir nêzî derî kir. Înzîbat jî hene. Ger ez birevim, dê bi patika min re bigirin. Ezê wisa jî firsendên din ên ku hene, bixim nav xeteriyê. Lewma min dev jê berda. Lê moralê min xirab bû. Xwedê bela xwe bide, ma li kur man? Çav li derdor digerînim. Yekser ji min re gotin li maşînê siwar bibe û em ketin rê. Çend xolek derbasnebûn, ji kolana miqabilî me, Bîlge û du hevalên din pê re, bi lez ber bi cihê em jê derketin ve diçûn. Ji ber hinde Bîlge spî ye, sorbûna lamên rûyê wê pir xweş diyar dibûn! Carekê ji dilê min hat ku ez biqîrim û ji wan re bêjim; “ez li vir im.” Min bi zorê xwe girt. Xweziya min hatina wan nedîtiba. Ji ber wê zêdetir bandor li min kir. Tiştek ecêb li min hatibû, weke ku xwîna min cemidîbû. Dema ez li girtîgehê daketim, her kesî bi mereq li min temaşe kir. Hamilî ew dibêjin; “Wey tif li vê yekê be!” Dest bi meşa xwe dikin. Piştî ku em derbasî hundir bûn, min di mazgalê de hemû ji wan re got. Ew jî aciz bûn. Gotin; “ya te jî bêşansî ye. Çi nabe, dê tu carek din biceribînî. Xwe ne qeherîne.” Bi van gotinan dilê min xweş dikirin.

Pişt re em hîn bûn ku, di saeta hatiye dayîn de hatine, lê em ne dîtine, lewma heta daketine sûkê jî wext ser ve çûye. Wan jî bihîstiye ku em jî çend xolekan beriya wan ji wir derketine. Ez dikim nakim nikarim ji bin bandora wê rizgar bibim.

Karê din jî baş naçe. hêj parçeyên demanceyê yên din nehatine. Me pêşniyara derbarê Şahîn de cardin kir. Me vê carê rexneyên xwe jî pê re şandin. Me diyar kir ku ev pênc-şeş meh in em li benda helwesta partiyê ya fermî ne. Her wiha me pêşniyara xwe ya cezaya mirinê jî ragihand.

Sûrgûna destpêkê...

Nîqaşên di derbarê mercên jiyan û pêkanên dijmin de dikevin rojevê. Kom jî pêşniyarên cur be cur dikin. Amadekariyên me hene, komên ku piştewaniya pêşniyarên me dikin hene. Di vê navberê de Şahîn destnîşan dike ku, ti ewlekariya wî tine ye. Ji ber vê sewkî girtîgeha leşkerî dikin. Bûyera Hesen Aydin tirsan dixe dilê wî.

Ji ber girtiyan cardin ji girtîgehê digirin û dibin lêpirsînê, bertek pêş dikevin. Girtiyên ku dixwestin bibin lêpirsînê, ji aliyê girtiyan ve nedihatin dayîn, bi daxwaznameyên hişyarî û protestoyî ve helwestên komî dihatin raberkirin. Lê dîsa jî dixwestin bi zorê bibin. Dema girtinên nû çêbûn, an li ser bingeha îfadeya girtiyên nû yên di girtîgehê de dihatin lêpirsîn, an jî ger îfadeya lêpirsîna girtîgehê hebe, ji bona girtiyên nû re rû bi rû bînin dibirin. Bi vî rengî girtîgeh jî dibû parçeyek ji navenda lêpirsînê.

Em jî li gel vê dixwazin hêdî hêdî amadekariyên xwe yên dadê bikin. Hewl didin şert û mercên hewce ava bikin. Ji daxwazên bingehîn yek jê jî, divê ji nû ve lêpirsîna girtiyên ku di girtîgehê de ne were rakirin, dadgeh demek nêz de werin vekirin û ji bona paraznameyan amûrên ku hewce ne derbasî hundir bikin. Li gel van tiştên ku kesên tên serdanê bi xwe re tînin, bi temamî werin radestkirin, pirtûk werin dayîn û daxwazên her wekî vê jî hene.

Ji bona pêşxistina çalakiyek bi vî rengî amadekariyên me yên hundirîn hene. Me nivîsên xwe yên nirxandinê û hêcetên xwe ji bo xwendinê dane gurûbên din û ji bo avaniya me jî nivîsek heye. Naveroka van jî girtîgeh çiye, armancên dijmin

çiye û planên wî çi ne? Nivîsên derbarê divê li dijî vê helwesta şoreşgerî çi be, hedefên polîtîkayên me yên zindanê û armancên wê çi ne û hwd, hene. Ji ber gumana dibe ku were girtin, me tenê carekê zêde kiriye. Heval dixwînin, cardin vedigerînin, dişînin ji me re. Ev nivîs jî herî dawî li cem min e. Ew roj, roja serşûştina me ye. Ez nivîsê jî li cihê batariyên radyoyê vedişêrim. Dema lêgerînê qet li wê derê nanêrin. Dema em ji qoxuşê derketin, hevalan pirsî, min jî got di hundirê radyoyê de ye, saxlem e. Lê dema ez ji serşûştinê vegeriyam, nivîs ne di cihê wê de bû. Pir ecêb bû. Em her çar bi hev re çûbûn serşûştinê. Lê dema em vegeriyan, me demekê xwe li cihê bêhnvedanê mijûl kir. Atiye û Elîf derbasî hundir bibûn. Lê ev çawa bûye? Ev lêgerînek veşartiye. Her wiha weke ku bi zanebûn tenê ji bona wê nivîsê hatine qoxuşê. Min beriya niha jî nivîsên cur be cur di wir de veşartibûn. Atiye beriya rojekê derketibû dadê. Min dizaniya demek dirêj li îdareyê maye. Gelo wê îxbar kiribû? Gelo Elîf e? Gelo kî ye? Dema ez derketim min ji Hisên wan re got. Gelo dibe ku hinek kesan di wê kêliyê de bihîstibe? Tam xacepirsek e. Lê divê ez çareser bikim. Heval jî li ser dihizirin, lê dîsa jî em encamek mîsoger bidest naxin. Gumana min ji Atiyê ye.

Êdî nivîs ketibû destên dijmin. Lewma diviya em yekser dest bi çalakiya birçîbûnê bikin. Ji ber dibe ku dijmin tevdîrên cuda jî pêş bixe.

Em tam zelal nînin ku dê çalakiya rojiya birçîbûnê çend roj bin. Me pêşniyara heftiyekê kiribû. Hinek koman gotibû bila sê roj, pênc roj bin. Di encamê de me biryara pênc rojan girt. Lê em wextê wê ji dijmin re nabêjin. Di daxwaznameyan de rojiya

birçîbûnê ya bêdem hatiye destnîşankirin. Ya rastî me diyar kiribû ku dê ev çalakî heta daxwazên me pêk werin berdewam bike. Ya hinek koman du-sê roj in. Ew bi me ve negirêdayî ne. Nûnerên qoxuşan hevdîtinan bi îdareya girtîgehê re dikin. Ji ber ew di heman demê de nûnerên gurûba ne. Rojiya birçîbûnê tam di wextê hevdîtina serdanan de destpê dike. Me ji kesên hatine serdanê koma yekê qebûl kir. Armanca rojiya xwe ya birçîbûnê ji wan re dibêjin. Em ji wê rojê pê ve derneketin hevdîtinan. Em di hinek demjimêrên destnîşan kirî de diruşmeyan diqîrin, malbat jî tevlî me dibin. Em di şibakeyan de ji malbatan re propagandayê dikin.

Di hevdîtinan de îdareyê her tim digot; "Kesên PKK'yî we gur dikin, ew dixwazin li vir jî serwer bin. Hûn dikevin lîstoka wan. Ma di girtîgehê de çewsîneriyek çawa heye? Her tişt baş e. Dixwazin naverasta heyî tevlîhev bikin û peyaman dişînin derve. Haya me ji serkêşên vî karî heye. Di heman demê de gotin ku hinek belge di destê wan de hene û her tiştî dizanin.

Ji ber di roja pêncan de daxwazên me yên bingehîn hatin qebûlkirin, çalakî bi dawî bû. Lê roja paştir yekser planên nû hatin ferzkirin. Îdareyê bangî min kir. Ez jî bi nûnerê beşê re çûm. Peywirek ji Elî re hatibû dayîn. Ez birim odeya mudur a girtîgehê. Ez bawerim navê wî Elî Duman bû. Serdar (Bînbaşî) bû. Sitvanek (Yûzbaşi) û çend serbaz jî li cem bûn. Dubare gotin; "fermana fermandariya Kolordu heye. Emê te derbasî girtîgeha sivîl bikin." Min cardin got; "ne wisa? Hinek jinên din jî hene, hûn nikarin mijara cih bikin hêcet. Ez dixwazim hêceta we fêm bikin. Ez dixwazim fermana nivîskî bibînim. Heta ku fermana nivîskî nebe, gava xwe ji vir navêjim. Di demên dawî de girtîgeha sivîl bûye cihê komkujiyê. Her şev

faşîst bi bistan (şîş) hev dikujin. Gelek hevalên me yên em nas dikin, dan ber bistan. Hûn çima dişînin cihek wisa? Ma ji bona faşîst çalakî bikin? Hêj nû êrîş kirin, hevalek me şehîd ket û bi dehan birîndar bûn. Ez bawerim vê têra we nekir." Axaftinên min hişk, dengê min bilind derdikeve. Ew jî tehrîk dibin. Armanca min jî ew e ku tişta di dilê xwe de bêjim. Dizanim ku min sûrgûn dikin. Nivîs hatibû girtin û weke serkêşa wan dibînin. Ev bes bûn.

Gef li min xwar; "zehmetiyan ji me re dernexe, nexwe emê te bixirikînin û bibin." Min jî got; "ne wisa? Jixwe tişta ji we tê hêvîkirin ev e. Na, ez naçim." Elî Duman jî teqiya; "girtîgehê tevlîhev bike û paşê jî bêje 'ez naçim'. Jixwe armanca te ya niha jî tevlîhevkirine. Jixwe ew jî (girtî) amade ne. Dema jinek wisa bike, dê zilam jî bandor bibin! Hûn wan har dikin. Nivîs di destê me de ye. Em dizanin ku tu çawa birêve dibî." Tif ji devê wî derdiket. Min got; "nivîsa çi? Lîstokên we pir ecemî ne. Îrada her kesê li vir heye. Kesek ne her tişt e. Ger hûn dihizirin ku bi sûrgûnkirina min re dê her tişt biqede, hûn xwe dixapînin."

Nîqaşa me demekê berdewam kir. Gotin ku ti fermanek bi nivîskî tine ye. Min jî got; "temam, lîstoka we hat fêmkirin." Telefon vekir, diyar kir ku ez fermannek bi nivîskî dixwazim. Her çi bersiv girtibe, nerim bû û got; "binêrin, ev me derbas dike, zehmetiyan dernexin." Min jî got; "ezê biçim cem hevalên xwe. Tiştên min li jêrê ne." Got; "temam." Dê bikaribin min li jor bigirin û bibin, lê ger ez dakevim jêr, ezê hem nêrînên hevalan bigirim, hem jî dema min nedin, dibe ku biryar jî were guhertin.

Hevalan destpêkê got; “em te nadin.” Lê paşê gotin, dibe ku dijmin vê bike hêcet û êrîşekê pêk bîne. Lewma çûna min guncav dîtin. Nêrîna komên din jî wisa bû. Lê hevalê bi guman jî hebûn. Ji ber girtîgehên sivîl bi temamî di destê faşîstan de bûn. Îdare, personel û hemû qadroyên faşîstan in. Hevalan got; “hişyar be. Emê parêzer û malbatan bixin tevgerê, emê te ji wir bigirin.” Min tiştên xwe girtin û derketim. Lê zêde bandor bûm. Her çendî em di girtîgehê de jî bin, dema mirov li cem hev be xweş e. Min ji nişkê ve xwe bi tenê û di valahiyekê de hîs kir. Dilê min şikest. Paşê min ji xwe re got, tişt nabe, ma ne ev jî şereke. Dê min zêdetir jî biceribînin. Ez neçarim bihêz bim. Tevî dijmin, bi înad jiyîn û di şer de cih girtin tiştek pir xweş e.

Madem ew min ewqasî xeter dibînin, ezê jî her tim bibim bela serê wan. Ev gotinên min jî weke sondekê ji devê min derketin û min kulmên xwe şidandin…

Maşîn li cem Kolordu rawestandin. Serbazê ku berpirsyar e min bibe, ji maşînê daket, piştî demekê bi hinek ewreqan re vegeriya. Em diçin girtîgeha sivîl. Maşîn nîv saetî li ber derî rawestiya û ez danexistim. Serbazê ku çû hundir jî venegerî. Min ji leşkeran re got; “biçin bêjin kî peywirdare, ez dixwazim pê re bi-axivim.” Leşkerek çû, ew jî dereng vegeriya. Got; “dê niha fermandarê min were.” Serbaz hat, min jê pirsî çima ez dame rawestandin û “ez ji ber maşînê zêde aciz bûme, dêşim, dixwazim dakevim. Weke din jî pêdiviyên min hene. Evqas jî nêzîkbûnên kêfî nabe. Çi tê kirin, ma merasîm tên lidarxistin?” Min acizbûna xwe bi ser wî de barand. Wî jî got; “Xanima birêz, karê wan heye. Min jî derbas dike. Mudur û serdozger di hundir de ne. Wê te bixwazin. Lê mîn jî hê fêm nekiriye ku çi dibe.”

Demjimêrek me wisa tije bû. Ez daxistim. Li ber derî ji leşkeran dîwarek çêkirine. Li pişt leşkeran hinek kesên bi cilên sivîl hene. Bes dişibin girtiyan. Min yekser hinek ji wan nas kir. Faşîstên li girtîgeha din bûn. Wê demê niha ew çima li vê naverastê bûn? Ez di navbera du rêzên leşkeran de derbasî odeya mudur kirim. Mudur derî ji hundir ve mifte kir. Di hundir de gardiyana jin jî heye. Mudur derbasî aliyê masê bû. Ewraqên li ber destên xwe têkilhev kirin. Got; "binêrin, ez mirovek bê alî me. Ez jî erka xwe pêk tînim. Ji bona me tu dereng derbasî hundir kirî, tu aciz dibî. Lê belê, ma ti caran hatiye dîtin ku, mudurek deriyê xwe ji aliyê hundir ve mifte bike? Lê ez neçarim ku mifte bikim. Ji ber ewlekariya girtiyan ji min tê pirsîn. Ma ez niha çi bikim? Li pişt vê qaxidê jî nivîsandine ku; "bila haya we ji vê girtiyê hebe." Zilam bê ku di ferqê de be hinek tişt dida dest û li gorî xwe bi safitî şîrove dikir. Fermandariya sikiyonetîmê ez xeternak dîtibûm, lewma gotinek wisa bikar anîbû. Wî jî weke ku behsa ewlekariya min dike, fêm kiribû. Ma nerast e her roj di girtîgehan de yek-du kes dihatin kuştin û faşîst jî li naverastan digeriyan. Qaşo dê min jî bi miftekirina derî ve biparasta! Zilam nerehet bû. Destên xwe dan pişt xwe, rabû şibakê re li derve temaşe kir. Li ser hev cixareyê dikişîne. Got; "ger hûn zêde dernekevin cihê hewa girtinê dê baş be." Min pirsî; " çima?" Got; "ez mudurek im. Ger girtiyek dikare were heta cihê min û …." Û bêdeng bû.

Belê, êdî her tişt pir zelal dihat fêmkirin. Baş bû ku zilam xwedî niyetek baş bû. Ev vekirî got. Lê beriya ez werim jî, me hinek tişt bihîstibûn. Lê tiştên ku me ji dûrve dibihîst û niha tên jiyîn ji hev cuda bûn. Bizanebûn ez şandibûm vir, min jî ev rastî baş fêm dikir. Piştî demekê ez di nava rêza leşkeran de

birim qoxuşa jinan. Ez ne şaşbûm. Ji bona min ‘merasîmek’ amade kiribûn. Ez jî bi rewşa wan a panîk ku di meşê de diyar dibû dikeniyam. Ango faşîstên li vir, ev qasî bi bandor bûn. Min herî dawî ji mudur re got; “we merasîmek baş ji min re amade kiriye.” Reng li ser gardiyana jin nemaye. Got; “şikir ya rebbî.” Pir tirsiya ye. Bi kelecanek mezin jî ji yên hundir re digot.

Tevî hişyariyên midur, heta ku ez li wir bûm, ez derketim cihê hewagirtinê. Dilxwede ji bona tevdîr gardiyanên jin û girtiyên din ên jin betanî datanîn li pêşiya şibakeyan. Tevî vê jî kesên faşîst ji şibaka odeya mudur li min nêrîn, dijûn û gef li min dixwarin.

Ez neçar im vê derê cidî bigirim. Derî zêde nesaxlem bû. Her wiha bandora wan li ser gardiyanên jin hebû. Bi taybet yek ji wan ji hêla fîzîkî ve jî bikar danîn. Heta şevekê gardiyanek ji qeta jor a dîwana ku ez lê dirazam daket û hêdîka bi cilên xwe yên şevê ve derket derve. Ez jî rabûm min kontrol kir. Ne di beşa tuwaletê de bû. Deriyê cihê hewagirtinê tam nehatibû girtin. Dema min hinek din vekir û li derve nêrî, min ew di şibaka odeya gardiyanan de di rewşek pir xirab û kirêt de dît. Kesê ku çûbû dîtina wî jî girtiyek faşîst bû. Jinan behsa hinek tiştan kiribûn. Keçan û hinek jinan wisa ji xwe re bikar tînin. Min jî roja paştir di nava hemû girtiyan de pirsî? “tu şevê din li kur bû?” Mat ma. Got; “ez razabûm. Hem ez gardiyanim, ez dikarim şevê biçim û werim.” Min jî got; “na, tu ne gardiyanî. Tu jinek ku xwe erzan difiroşî girtiyên faşîstî. Te bi cilê şevê di şibakê de çi dikir? Ma kî dizane dê tu sibe, deriyê me jî ji wan re venekî û wan kuçikan neyînî hundir? Tu carek din neyê nava me. Li cihek cuda raze. Jixwe li her girtîgehê jî cihên gardiyanan cuda ye. Baweriya min bi te nayê.”

Jinên ku ji vê helwesta min cesaret girtin, behsa gelek tiştan kirin. Heta kîjan jin pêşkêş kirine tev gotin. Ez dizanim ku dê tola vê bûyerê jî bigirin. Roja paştir lêgerîn çêbû. Mudur jî bi wê hêcetê hat. Rewşa min pirsî. Min jî pêdiviyên xwe yên pirtûkan jê re got. Weke din jî min diyar kir ku, baweriya min bi gardiyanan nayê, gardiyanên ku derî vekin û her tiştî bikin, dê faşîstan jî derbasî hundirê me bikin. Ez van jî bi qîr dibêjim. Zilam mat maye. Got; "ez çi bikim. Ya herî baş îstîfa kirine." Kesayetek bêçare û belangaz bû.

Ez zêde nemam. Mudur û serdozgerê girtîgehê daxwaznameyek nivîsandin û gumanên min jî destnîşan kirin. Ji ber piştî ku ez derbasî wir bûm, hema her şev cerîme (cînayet) dihat jiyîn. Di şevekê de du kes dabûn ber bistan. Min yek ji wan nas dikir. Ji Maden Gulemanê bû. Li Dêrsimê dihatin cem Perîhanê wan. Zarokên malxalê bûn. Çawa çêbû? Gardiyana jin behsa helwesta min jî kiribû. Destûr nedabûn hevdîtinên min ên serdanan. Dîsa Hisên Yildirim bi kelecan bû. Me di şibaka odeya mudur re hevdîtinek kir. Ew piştî roja duyem a hatina min tê serdanê. Lê li gorî ew dibêje, li ber derî lê dixin û difecirînin. Min ev tiştên ku Hisên Yildirim behs dikir dîsa weke nerast û zimandirêjiyê dît, lewma min qet cidî jî negirt. Dayîka Aytekîn jî ji bona serdana kesek din hatibû. Ew jî ji bona bal nekişîne. Piştî şahadeta Aytekîn, ew cara yekê bû me hev didît. Pir girî, ji giriyan nedikarî bi-axive. Got, beriya şehîd bikeve Aytekîn jê re gotiye ku; "tu dayîka Sakînê yî jî. Tu çawa tê serdana me, wê tu biçî serdana wê jî." Lewma digot, li kur dibe bila bibe, dê vê xwesteka wî bicih bîne. Min jê re got, hatina wê xeter e, ji ber vê divê her tim neyê. Ev jî hevdîtina dawî ya li Elezîzê bû.

Mudurê girtîgehê dixwaze di şibaka odeya ku lê dimîne de hevdîtinê bike. Her du destên xwe dide ber devê xwe û dilxwede bi dizî ve dibêje; "xwe amade bike, tu diçî. Nivîsa me erê kirine. Em te dişînin Meletî." Ev jî sûrgûnek nû bû. Ez bawerim êdî ezê bi vî halî ve li hemû girtîgehan bigerim. Lê ez pir bi hêrs bûm û min got; "hûn çima ditirsin? Ma ev çareserî ye? Li vir her roj mirovan qetil dikin. Ma ev kuçik li Meletî tine ne?" Mudur got; "ez berpirsyariya te ranakim. Min erka xwe pêk anî. Nexwe wê te bikujin. Min îxbarek wisa girtiye."

Belê, mudurek belangaz e. Weke pêlîstokekê bikar tînin.

Di nava deh xolekan de cardin di navbera rêza leşkeran de derxistim derve. Her çendî aliyên van bûyeran ên bêhna min teng dikirin hebin jî, bi xwe şahnaz dibûm. Dijmin bêçaretiya xwe destnîşan dikir. Ne dizaniyan dê min bixin kur, çi ji min bikin û çawa ji min xilas bibin. Mat mabûn. Her acizbûn û êrîşa dijmin, înad û hêza min a berxwedanê zêdetir xurt dikir. Mijûlbûna bi dijmin ve û dijmin bi xwe ve mijûlkirin gelek xweş bû. Hêza jiyanê dida min. Lewma PKK'yî bûn wisa bi watedar bû. Navê wê têrê dikir. Ger mirov hinekê jî têkil bibe, hinekê ji wî ruhî bandor bibe, kêm jî be mirov di nava germahiya wê de şewitî be, vê têra her tiştî dikir. Dema kes bi tena serê xwe be lewaz e. Qada wê ya bandorkirinê teng e, ji rêzê ye û şansê wê yê guhertinê tine. Lê belê aliyek ku bi xwe re civakîbûn ava kirî hebe, şaneyên wê ji rastiyên zanistî re vekirî bin, dilê wî/ê dibîne, îxanet li xwe nekiribe, jiyan bi wê/î re zindî ye, zêde dibe, tenêbûn jê re zehmet nabe û hebûna xwe naqedîne.

Ji hêla şer û pevçûnan ve şansê min zêde ye!..

Her cara behsa Meletî dihat kirin, her çi be, Beylerdere dihat bîra min. Mîsoger bandora sirûdên li ser navê Sînan Cemgîl û Qadir Manga wan hatîn nivîsandin hebû. Nakokiyên çepgir-rastgir ên li Dibistana Mamosteyên Arganê hebûn. Her wisa xisleta Dibistana Amadeyî ya Turan Emeksîz a bûna cihê sûrgûnê… Niha jî ez li girtîgehê bûm! Ez bawerim taybetmendiya wê ya herî zêde neyê jibîrkirin jî, dê ev be.

Beriya çend rojên ku ji Elezîzê veqetiyam, jinek girtî ji Wêranşara bi ser Meletî ve anîbûn. Ew jî ji bona ‘alîkariya PKK’ê kiribû’ hatibû girtin. Di nava heman komê de Fewzî Qara jî, ji ber kuştina zilamekî hatibû girtin. Lê ew li girtîgeha leşkerî bû. Min tişt ji wê re hiştin, ji ber ji kêliya hatî ve kesî

pirsa wê nekiribû. Kesek reben bû. Me nekarî di nav wê hengamê de nîqaş jî bikin. Min jê re got; “dema parêzerê te hat, sewka xwe ji bona girtîgeha leşkerî bike.” Ji ber girtîgehên sivîl ecêb in. Jiyanek pir ketî tê ferzkirin. Her jinek belangazeke, zû tên xapandin.

Em êvarî gihiştin Meletî, lê hêj hewa vekirîbû. Cardin ez demek dirêj li derve dam rawestandin. Di heman demê de li cihek ji nîzamiyê gelek dûr bû. Liv û tevgerek heye, gardiyan di nava bazdanê de ne. Çend parêzer hene, ev jî ji bergên wan ên parêzertiyê diyar dibe. Çend kesên hatine serdanê kom bûne. Ez jî ji ber rêwîtiyê pir westiyayî me. Rêwîtiya bi maşînan her tim min nexweş dixe. Min xwest dakevim, gotin; “na, nabe.” Min pirsî; “xêre, çima em naçin?” Serbazê ku em anîn naxuyê, bi ewrakan re ketiye hundir. Leşker tiştekê nizanin. Tenê yekê ji nobedarê wir pirsî, wî jî got; “pevçûnek çepgir û rastgiran heye. Rastgiran êrîşî çepgiran kiriye.” Wisa jî gotina xwe rast kir. Min jî got, nexwe ez jî tam hatime cihê xwe! Ji ber şansê min her tim ji aliyê şer û pevçûnan ve zêde ye. Baş bû ku komên çepgir hebûn. Lê li vir jî faşîstan êrîş kiribû.

Tiştên ku faşîstan nedikariyan li derve bikin, niha jî li vir dikirin.

Di heman wextê de li girtîgehên ku lê serwer in, ev êrîş pêk danîn. Fermanek nebe û neyên birêvebirin, nikarin tiştên wisa bikin.

Piştî demekê ez derbasî hundir kirim. Kargeriyên dihatin xwestin demek kin de hatin kirin. Ew jî derî dinixumînin. Di hundir de, li beşa ku girtî lê dimînin deng û qelebalix zêde ye.

Bangî gardiyana jin kirin. Gotin; “dayê Xetîce, ev jinek siyasî ye. Tu dikarî di hundir de li tiştên wê bigerî. Li vir kar zêde ye.” Baş bû. Êdî bi ser westandina rêwîtiyê, dil xelîn jî zêde bû, lewma dixwazim yekser biçim cihê xwe.

Çawa ez derbasî hundir bûm, her kes li min civiya. Jinek ciwan li ber derî bû. Her cihê deriyê ku dar e û kun bûye, diyar bû di wan kunan de çavderiya derve dikin. Cihek hewagirtinê ya biçûk hebû. hundirê wir jî cihê serşûştinek berê danî bîra mirov. Her cihê wê rûxiya ye. Dîwarê derve cihê ku dibêjin ‘mala mudur e.’ Odeya beşa gardiyanan jî nû hatiye çêkirin. Saxlem e, lê darên sitûna beşa qoxuşê zêde reş in, rizîne û tevna pîrepinda (orûmcek) li her derî dihe. Dîwanek du qet a ji text hatî çêkirin heye. Aliyekê bi temamî digire. Li pêşiya wê riyek teng dimîne. Çente û kel û pelên xwe bi her derî ve kirine. Hinek cilên ku bi taybet hatine nixumandin hene.

Her kesê bi mereq li min temaşe dikir. Jina ciwan (Ayşê) ya em li ber derî pêşwazî kirin got; “dayê Xetîce, ev ji kur hatiye?” Qaşo bi dengê nizim dipirse, lê min dibîhîst. Rûyê wê tev sorav û spiyav bû. Cilên taybet li ber xwe kiribûn. Carê di navberê de diçe bi kuna derî re li derve dinêre. Pir zindî ye, di cihê xwe de nasekine. Jinek derziyên hûnanê di dest de, bi şalwar, rûyê wê spî û bedew, girane nêzî min bû. Silav da min û got; “tu bi xêr hatî?” Ecêb navê wê jî Gozel e. Dema bi hev re di-axivîn, ez hînî navê hemûyan bûm. Yên ciwan ji gardiyanê re dibêjin, ‘dayê Xetîce.’ Gelek girtiyên pîr hene. Dayê Zeynep bi şalwar, tewiyaye, zeyîf ketiye, lê zêde nepîr e, bi devoka Meletî got; “keça min a şoreşger xêr hatiye. Dayîka te Zeynep qurbana te be!” Piştî van gotinan ez hemêz kirim û

ramûsam. Dayîkek xweşbînî ye, hem çi tesadûf navê diya min jî Zeynep e. Dema min got; ‘dayîkên min Zeynep pir in.” Hemû keniyan. Pirsên wan zêde bûn, ez mereqa wan jî didim ber çav, wisa kî me, rêxistina min, pêvajoyên ku hatine jiyîn bi hinek aliyan ve hemû ji wan re got. Bandor bûn. Bes pirsên wan jî xilas nabin.

Pişt re axaftin û nîqaşên me yên bi rojan û mehan berdewam kirin çêbûn. Jiyana her yeke ji wan romanek bû. Weke filmekê bûn. Jinên ku ji ber îdîayên sucên weke zina, keçên ciwan ên ji ber destavêtinên bav û bira, jinên xwedî zarok ku ji bona diziyê, jinên ku hevjînê xwe ji bona ew xapandine kuştine, dozên erdên zeviyan, kuştina zilaman û sucên cur be cur hatine girtin hene… Hinek ji wan deh sal in di girtîgehê de ne. Girtina Gozel Daxdevîren a jina bedew, tam yanzdeh sal bûn, hêj girtîbû. Dema min destpêkê bihîst mat mam. Lê tevî vê ew jin zindî, bedew û bi hêvî bû. Nexwe diyar e girêdana xwe ya bi jiyanê qut nekiribû. Li çend girtîgehan geriyaye. Çend keçên siyasî dîtiye. Li çend gardiyanan xistiye, çend caran xwestine têkil karên xirab bikin, hemû bi sebir û xwedî danehevek tecrûbeyî ve ji me re vedigot. Em bi hev re dostên baş û hevalên baş bûn.

Gardiyana duyem dayê Zohre ye. Ew hinek din pîr e. Xetîce jinek Elewî û jinebî ye. Zarokên wê dixwînin, tevlî siyasetê jî bûne. Li kolana Çawuşoxlu dimînin. Ew der jî kolanek ku çepgir lê zêde ne. Gelek kes ji wan re dibêje kolana Komînîsta ye. Ji ber ez Elewî me û ji siyasetek cuda me, bandor li wê jî dike. Gelekî rêzdar e û her tim pirsa pêdiviyên min dike. Kirîna pêdiviyan, anîna rojnameyên rojane û karên

min ên din bi dil û can dikir. Lê dayê Zohra bi tevdîr nêzî min dibû. Dihat gotin ku piştewaniya rastgiran dike. Lê kesek zêde muhafazakar bû. Gozel behsa hemû rewşên weke gardiyanên jin, personelên din, girtiyên di hundir de hemûyan dike û dinirxîne. Di naskirin û fêmkirina rewşa vê girtîgehê de alîkariyek mezin dike. Jixwe hema yekser not ji hundir hatin û pirsa pêdiviyên min dikin. Mirovên ji gelek koman hene. Kêfa min jî ji vê baldarî û eleqederiya wan re hat. Hinek hevalên me jî hene. Nota wan jî ji min re hat. Lê ew notan wisa jixweber û ji rêzê naşînin. Dema vardiya tê guhertin, bangî gardiyanek zilam dikin û notê didinê. Hinek hevalên ji Argan û Çermikê hene. Notek din jî hat. Ew jî bi îmzeya Fuat Çavgun bû. Ew jî ji girtîgehek din hatibû. Şansê min pir bû. Dijmin jî her kêliyê bi zanebûn sûrgun dikir û hewl dida me tengav bike. Lê ger di girtîgehê de jî be, xweşiya gerek wisa jî cuda ye. Ji ber mirov qadên nû, mirovên nû û pirsgirêkên nû re rû bi rû dimîne. Ango rewşek yeknesak tine ye.

Zêde dirêj nekir, min peywendiyên xwe bi derve re çêkirin. Not hat. Vê jî kelecanek cuda ava kir. Hevalê Delîl Doxan li qadê ye. Meletî girîng e, ji berê ve behsa girîngiya vê qadê dihat kirin. Piştî Aytekîn, Bozo Silêman dabûn wir. Ew jî îhtîmalek mezin piştî girtinên li Elezîzê vekişiyabûn. Lewma dagirtina valahiyan gelekî girîng bû. Li qadên ku rêxistinên faşîzan hene, zemînê derketinek radîkal ê şoreşgerî û rêxistinbûna wê, zêdetir saxlem û bingehîn dibe. Ji ber binyata wir a civakî jî cuda ye. Dê guhertina li vir giran û hêdî be, lê piştî carekê bingeh hat avakirin, xwedî xisletek pêşketinê ye. Di kêliya ku dijmin dibêje me ‘xilas kiriye’ de, berdewamkirin û meşandina xebatan, tişta herî xweş û bedew e. Hinek heval jî

çûbûn jêr (Fîlîstîn) û hatibûn. Me bihîstibû amadekariyên wisa jî hene. Hevalê Delîl jî çûbû û hatibû. Xebata komên çekdarî yên perwerdeyê neçarî bû, ji ber êdî dijmin yekser êrîş dikir.

Min pirtûk anîn. Weke din jî hinek daxwiyaniyên cur be cur hatin. Yên ku beriya niha şandine hundir, dişînin ji min re jî. Em hişyar nêzî notên xwe dibin.

Hisên Yildirim min bi tenê nahêle. Hema li pey min baz dide. Wekaleta hinek mirovên li Enqere û Qeyserî jî girtiye. Fi her derbasbûnê de serdana min jî dike û dinêre ka pêdiviyên min hene an na. Jixwe min hemû pêdiviyên xwe yên bingehîn bi wî dan kirîn. Tiştên weke doşek û lihêf kirîbû. Her cara dihat jî ji bona min pere dihişt. Lê belê, hemû pereyên ji bona min xerç dikir, ji Peder digirt. Lê ez nizanim çend qet zêde digirt. Bes mantikê bazirganiyê, bibû xisletek parêzeriyê. Dibe ku her kesî nedikir, lê gelekan zêde ji malbatan digirt.

Aliyê Hisên Yildirim serê min tam tevlîhev dikir. Her çendî weke ku bawer kiriye êdî pêwendiya min bi derve re tine ye, her carê hinek tişt dixist hêcet û dixwest hinek tiştan hîn bibe. Min jî di vê mijarê de ew diteqand. Digot; “na, ti pêwendiya min tine ye.” Wî jî digot; “ma çawa dibe? Heval te bi tenê nahêlin. Divê nehêlin jî.” Qaşo dida diyarkirin ku, ew dixwaze hinek tiştan ragihîne, lê ji ber kesî nabîne, nikare bêje.

Dîsa rojekê bi kelecan û hilke hilk hat û got; “faşîstan li min reşand. Ez bi zorê ji destên wan xilas bûm.” Weke ku li pey wî bûn, her carê li pişt xwe temaşe dikir. Li Meletî hinek tevlîhevî hebûn. Bûyera serokê şaredariyê Hemîdo, nûçeyên ku li derdora wî dizivirîn û dihatin gotin hebûn. Lê ne di wê astê de bûn ku Hisên Yildirim jî hedef bigirin. Gelo çima her tim

dixwest dîmenek ku tê hedefkirin û bi êrîşan re rû bi rû maye ava bike? Gelo dixwest bi vî rêbazî baweriyê bide? Li hember tiştên ku min jê re gotibûn, dibe ku nêzîkbûnek derûniya wî be, derdikeve holê. Ez wisa digirim dest. Lê mixabin na, rewşek wisa tine bû. Tam derewkere! Dipirse; "gelo dibe ku Şahîn îfadeyên xwe paşve vekişîne? Tiştên cidî yên li ser gotîn hene an ne?" Belê, ditirse, ditirse ku tiştekê bi wî bikin. Digot; "gelo dê partî efû bike? Rewşa te û Mazlum baş e. Ger hûn parastinê nekin, hûnê derkevin. Derve de pêdivî bi we heye. Min ev ji Mazlum re jî got. Hinekan çalakiyên ku kirine qebûl kirine. Hinek îfadeyên zelal hene. Lê ya we ne wisa ye. Hûnê tenê weke kesên ku propagandeya partiyê dikin û ramanên rêxistinê diparêzin werin tewanbarkirin. Dê we wisa darezînin. Jixwe ev demeke hûn girtî ne jî. Ger di asta herî kêm de ceza were dayîn hûnê derkevin."

Min nedixwest di vê mijarê de nîqaş bikim. Min got; "ev mijara me ye. Emê biryara vê bidin. Kesek din min eleqeder nake. Ezê parastinê bikim. Ji xwe min parastin kiriye. Ne rast e ku em vê mijarê cardin bi zagon, an jî bi tiştek din bixin nîqaşê." Dema carek din hat serdanê, nameya ku xwîşka hevalê Mazlum ji Mazlum re nivîsandibû, ji min re xwend. Jixwe xwîşka wî bi serê xwe nedinivîsand. Di nameyê de jî tiştên ku Hisên Yildirim digot, hatibûn dubarekirin. Hewl dida şîretan li hevalê Mazlum bike.

Ev zilam tam bela serî ye. Malbatan jî wisa birêxistin dike. Ji ber malbat hestewar in, jixwe dixwazin em kêliyek berî kêliyekê ji girtîgehê derkevin. Ev jî tiştek xwezayî bû. Lê mixabin, Hisên Yildirim hewl dida wan ji aliyek din ve birêve

bibe, qaşo wê bi destên wan zextê li ser me bikin, da ku em jî parastinê nekin. Nêzîkbûnek dilxwede dilê wî, bi me dêşe dide diyarkirin. Ew gotina wî ya dibêje; "pêdiviya têkoşînê bi hevalên weke we heye" sixtekariyek herî mezin bû. Ev ne lîstokek hêzên Kawa'yî bû. Ango ne helwestek ku ji ber di bin bandora siyasetek din de bû, lewma dikir. Jixwe endamdiya Kawagerî ya Hisên Yildirim jî sixtekarî bû. Ma dê çima Kawa'yî ji parastina me ya siyasî tengav bibin? Ger zêde dijminatiyê bike, herî zêde dê bixwaze "em di hundir de birizin", hemû jî evqas e! Hisên Yildirim jî bi navê hinekan bi me ve mijûl dibû û dixwest ji me hinek tiştan hîn bibe. Ev rastiyek teqez bû. Mantikê, 'tu di destên dijmin de yî, lewma ger tu bêdeng bimînî û tiştekê nekî, dê tu xilas bibî', mantikê Kemalîstiyê bû. Di heman demê de mantiqê xirabker, tirsonek û fenekî ye. Tirs û xofî heta şaneyên wî de xwe bicih kiriye, lê gelo çima? Ne dikariya tirsa xwe derbas bike û veşêre. Ya rastî baş bû, dema carê wisa xwe dida der kêfa min dihat. Ji ber min jî ew baştir nas dikir û sekna wî jî nêrînên min pirştrast dikir.

Min ji girtiyên Elezîzê re nivîsand. Di navberê de nêrînên xwe yên derbarê wî kesî de jî diyar dikim. Mijarên ku mereq dikim, bi rêbazek ku ew fêm bikin de dipirsim. Wan jî mijara revê bi ser nexistibûn. Derbarê Şahîn de jî ti agahî tine ye. Di dilê min de mabû, gelo çima Şahîn nehatibû cezakirin. Ez her tim di nava bendewariyekê de bûm.

Nîqaşên me yên dawî bi Hamilî re zêde dijwar bûn. Lewma di nameya xwe de diyar dike ku, ez mafdar im. Dibêje; "ger min biya Elî bikira, dê rewşa min gelekî xirab bûya." Lê kêfa min jî ji vê re hat. Belê, wê pirsgirêkê jî her tim bêhna min teng

dikir, mejiyê min mijûl dikir. Lewma divê mirov zemînê diçe ber bi îxanetê ve baş nas bike. Ger nakokiyên di hundir de rast neyên dahûrandin û zelalbûnek tine be, dê mirov berbelav bibe. Elî xwedî rewşek berbelavbûnê bû. Dixwest hinek din jî bi xwe re belav bike. Ji ber derûniya wî wisa bû. Ger Hamilî ev rastî jî ferq kiribe temame, dê ew bikare xwe komî ser hev bike. Min di nameya ku nivîsandî de jî, nêrînên xwe di vê mijarê de wisa nivîsandin. Di vê manê de nivîsên me yên ji hev re jî baş in, erênî ne.

Ev sal tije pirsgirêk bûn. Li eniya Tirkiyê berxwedaniya karkeran zêde berfireh bû. Bûyerên li Îzmîr Tarîşê zêde deng vedan. Li Tarîşê di radeyek bilind de potansiyelek karkeran hebû. Di dema berê de min çiqasî hewl da bikevin wir, lê wan ez negirtim. Dema em ji karê kargeha ta (îplîk) ya Basmane derxistin, zêde bi bûyer derbas bû. Em weke kesên xeter îlan kiribûn. Xebatên gelek rêxistinan li Tarîşê hebûn. Rêxistinbûnek diyarker hatibû avakirin. Ew jî di ferqa vê de bûn. Lewra di girtina karkeran de gelekî hişyar nêz dibûn. Rêxistina faşîstan jî li wê kargehê hebû.

Serok-komarê demê Fahrî Korutûrk bû. Hukumeta MC ya II. û parlamento tenê li ber çavan hebûn. Artêş û sikiyonetîm di bin navê tevdîrê de, di nava vê rêveberiyê de bûn. Her kêlî ‘yekbûna welat û Milet nayê parçekirin’ dihat bikaranîn. Têgehên weke ‘anarşî û parçekirinê’ li ser devan xilas nabin. Gelo weke din çi hatibûn plankirin? Piştî komkujiya Mereşê rêveberiya awarte piştî wê jî rêveberiya fermî û girtin hatin destpêkirin. Ji ber qadên weke Hîlwan, Sîwerek, Êlih, Mêrdîn û hwd têkoşîn xwedî li gel derket û tundiya şoreşgerî li dijî

navendên dijmin ên paşverû û faşîzan ên li Kurdistanê pêş ketin re şert û mercên nû ava bûyîn, dewlet jî dida tirsîn. Êdî PKK nehêzek wisa bû ku, bikaribe hêsan xilas bike û serê wê biperçiqîne. Lewma dijmin xwe berfirehtir amade dikir.

Di kêliya girtina Pîr wan de belgeyên ku ketine dest, ji bona dewletê mezinbûna xeteriya heyî destnîşan dikir. Bandora Têkoşîna Rizgariya Netewî ya Kurdistanê, heta wê rojê jî dibû bingehek ku dijmin tenê di nava xwe de êrîşên bi plan û berfireh bike. Êdî Tevgera me bibû hêzek polîtîk. Xebat jî di çarçoveyek ku Têkoşîn di asta herî bilind de pêş bikeve, dihat hedefkirin. Ti girtin û operasyonan nekarîn vê xebatê asteng bikin. Ya rastî, pêşketinên ku ji eniya me jî derdiketin holê, ji aliyê me ve jî baş nedihatin zanîn û fêmkirin. Lê dijmin neçar bû, xwe li hember rastiya me ji nû ve birêxistin bike. Bi taybet belgeyên ku ketin dest, dijmin zêde tirsandibûn. Ji ber rêxistinbûna Konseya Leşkerî sazûmankirin. Di vê çarçoveyê de her çendî di asta pênase de jî be, plan û bernameya şoreşê hatiye avakirin. Her wiha li Kurdistanê jî gerîlatî tê ceribandin. Lewma dê vê pêşketinê, li eniya Tirkiyê jî pêşketinên şoreşî gur bikira. Belê, ya girîng jî di vir de bû, ji ber dê dijmin çi dibe bila bibe, ev pêşketin asteng bikira. Ger gotina min rast be, dengê lingê cuntayê tê bihîstin

Nîvê salê ya destpêkê lez derbas bû. Pirsgirêkên jiyanê yên li girtîgeha sivîl tevlîhevin. Her roj bûyerek rû dide. Bes bi demê re nêzîkbûnên weke şer, pevçûn, dijûn, liberhev dayîn, bela xwe li hev xistin û giriyên ji rêzê kêm bûn, rawestiyan. Îdareya girtîgehê ecêb ma. Digot; “baş e ku Sakîne hatiye. Em her roj ji ber şer û lêdanan bi wan re mijûl dibûn. Şerên jinan

derdiketin. Êdî bûyerên ku biçin dadê û îdarê dernakevin.” Her wiha hinek şîroveyên din jî dikir. Bi rastî jî di vir de name û daxwaznameyên jinên girtî nivîsandin, dubare dubare guhdarkirina wan, çawa dostên xwe ser jêkirine, çawa destavêtinê, çawa hatiye xapandin, dema ew ne amade ne, çawa keçên wan ên ciwan avêtine kerxaneyan, sebrek mezin dixwest. Ez bawer im min di vê mijarê de jî sebrek mezin raber kiribû. Min ji wan re digot; “ezê romana we binivîsim.” Belê, mirov di rastiya wan de pir baş didît ku jin çawa hatiye windakirin û ji xwebûna xwe dûrketiye. Ez li hember rewşên ku di civakê de dihatin jiyîn nebiyanî bûm. Civak eynika jinê bû. Lê dîsa jî hinek bûyerên yek bi yek dihatin jiyîn rewşa jinê ya trajîk bû û weke pirsgirêkek civakî ya kûr disekinî. Niha ez di vir de şahnazî, kêfxweşî û xweşikbûna wê ya bûna jinek şoreşger zêdetir dihesim. Ew jin jî, ji min dihesidîn û dixwestin weke min bin. Gelek caran digotin; “xweziya em jî siyasî bûna, bila sucê me jî bi te re yek bûya.” Yek bi yek, bi her kesê re hinek guhertin hatibûn jiyîn. Nexwe mirov nedikariya di nava wan lêdan û pevçûnan de bijî.

ntax
Deterjan

Evîna min a ji nû ve di raperînê de: firar!

Ez dîsa li ser karê ku min di nîvî de hiştiye û ser nexistiye diponijim. Hema bêje hemû lêhûrbûnên min li ser firarê bûn. Firsendên din baş nehatin nirxandin. Hinek kêmasî ji dervî îradeya min pêş ketin. Belê, ezê wan çawa derbas bikim? Divê ez wisa bikim ku, ji derve de alîkarî nebe jî, ez bikaribim revê serbixim.

Rewşa girtîgehê ya niha derfetên guncav ava dike. Beşa jinan destpêkê ye. Li çepê ye. Qeta jorîn mala midur e. Dîwarên derve bilind in, bi têlan hunandiye, lê mirov dikare xwe ji dîwar bavêje. Lewma divê mirov baş çavderiya derve bike. Li ber derî û her du aliyên dîwar kolikên leşkeran hene. Leşker jî li çep û rastê li wan kolikan ji xwe re tên û diçin. Tişta di vir de feyde ye, merdîwena ku diçe mala midur, hema li ser cihê em hewa lê digirine. Bi wir re derbas dibe. Xeteriya wê rê kêmtire. Zêde bal nakişîne. Rê jî tam ber wê re diçe. Dema di kêliyên qelebalix de, bala leşkeran belav dibe. Ez dikarim wê firsendê binirxînim û xwe li ser dîwar re bavêjim cadê. Her çendî aliyên xwe yên xeter hebin, mirov dikare weke rêbazekê biceribîne.

Rêya duyem jî nexweşxane ye. Lê min ji bona vê pêş amadekarî nekirine. Hedefa min ez xwe li nexweşxaneyê bidim razandin û ji wir birevim. Bi şertê ku ezê mesrefa xwe pêk bînim, dikarim tedawî bibînim. Min di kontrola yekem de derman girtin. Doxtor got; "ger derbas nebû, emê te bidin razandin û demekê tedawî bikin. Her tişt hatiye bawerkirin. Li girtîgehê jî ti şik tine ye. Bi taybet navbera min û gardiyanên jin gelekî xweşe. Ji min hez dikin. Girtî jî bi heman şêwazî nêz

dibin. Tiştek ku bal bikişîne tine ye. Lê belê di her du rewşan de jî derbarê qadê de ti agahiyên min tine ne. Bajarek mezin e û nas nakim. Ez hewl didim ji aliyê xwe ve her tiştî amade bikim. Ji ber dixwazim bi pêşniyarên zelal ve biçim cem hevalan.

Min têkildarî vê mijarê ji bona derve notek nivîsand. Di navberê de hinek tên serdana min. Ew jî bi navê hevalên xort tên. Ji bona bal nekişîne, piştî ku ji wir derdikevin, tên cem min. Gelek mirov tên serdana min. Hema bêje mirovên ji hemû komên çepgir tên. Bi taybet girtiyên xwecihî yên di girtîgehê de malbatên xwe dişînin cem min jî. Bi navê komeleyan û koman tiştan ji min re dişînin. Ev piştewanî pir xweş e. Ez jî tiştên ku tên bi girtiyan re parve dikim. Ew zêdetir kêfxweş dibin. Gardiyan jî ji wan sûd werdigirin. Jixwe sibehê, nîvro û êvarî li wir dixwin. Carê derfet çêdibe, hinek tiştan dibin mala xwe jî. Dane fêrkirin, her kes tiştekê dide wan, heta tiştên xwe yên herî baş didin wan. Lê piştî ku ez hatim, di vê mijarê de zêdetir bitevdîr tevdigerin. Ew jî di navberê de hinek tiştan digirin. Pêşkêşî girtiyan jî dikin. Hema weke malbatî dijîn.

Notek din hat ku dibêje, nota min ji 'Herêma Yekemîn' re hatiye ragihandin, lewma divê ez mereq nekim. Nivîsa ku hatibû di şêweyek cuda de ye. Navberek dirêj çêbû, wext derbas bû, tevî vê ti agahiyek derbarê mijarê de nehat. Di vê navberê de Necmiyê bala min kişand. Di kuna boriya soba beşa tuwaletê ya di qoxuşê re li 'dostê' xwe dinêriya. Necmiye ji nîştecihên kevin ê Meletiyê ye. Bi dostê xwe re bûye yek û hevjînê xwe kuştiye. Pênc sal in di girtîgehê de ye. Derheqê wê de girtina bê dawî (mûebbet) tê xwestin. Necmiyê got ku; hema kêleka cihê hewagirtina xortan û beşa xwaringehê ye.

Tuwaletên di hundir de nayên bikaranîn. Xirab bûne. Dîwar rizîne, min hinekê ceriband, ax zû rûxiya. Hinekê jî cihê boriyê lêkolîn kir, dîwar tenike. Ango, mirov dikare di rojekê de kunekê veke.

Dema pêşniyarên revê ketin rojevê, ez pê hesiyam ku lêgerînên hevalên xort jî di vê mijarê de hene. Lewma yekser pirsa, 'gelo reva bi Fuat Çavgun wan re dê çawa be? Rêya xeteriya wê herî kêm, ji qoxuşa jinan derketin bû. Ev plan jî hat bîra min. Li ser wê jî hizirîm. Min di nota ku ji Fuat wan re dizî ve nivîsandî de pirsî, gelo derdikevin cihê hewagirtinê ya ku ez li ser dihizirim. Not jî li ser xaçepirsa rojnameya ku min ji wan re şandî nivîsandiye. Me beriya niha hinek notên kin wisa dinivîsandin. Bal nedikişand. Min da gardiyanên jin. Bi destên xwe didin. Her wiha sohbetê jî bi hev re dikin. Gelek kes pirsa min dikin, lewma gardiyan jî bandor dibin. Dixwazin dîmenek wisa ava bikin ku baş nêzî min dibin û xizmetê dikin. Niyeta wan jî baş e. Derdora Xetîce çepgir in. Lewma bandor dibe. Zohre jî ji bona bide bawerkirin nerastgir e û ti alî nagire, ti namîne nake. Ev jî kêrî me tê.

Bersiva hatî erênî bû. Ew jî texmîn dikin ku, hinek amadekariyên min jî hene. Bawerim hevalan di hevdîtinê de ji wan re rave kirine. Lewma Fuat bi hêvî dibe û dixwaze ez li ser rawestim. Vê carê jî min dev ji xwe berda, êdî li ser reva bi komî dihizirim. Ya rastî ez jî dibêjim, kîjan ji wan bibe feyde ye.

Piştî ku Atiye hat berdan, hat serdana min. Got ku li Meletî çûye serdana hevalên xwe. Hatina wê ez kêfxweş nekirim. Jixwe Hisên Yildirim jî têkildarî wê gelek tişt gotibûn.

Têkîliyên wê bi sikiyonetîmê re hebûn. Lewma gelek agahiyên di derbarê kesan de yên cur be cur ji serdozger û dadger digirt. Ji ber vê nabe ku mirov ser guhê xwe re bavêje.

Dema em li Elezîzê, Fewzî Kara tê girtin. Ji Doxanşehîrê bû. Dosya wî veguhestibûn Meletiyê. Bi îdîaya kuştina faşîstekê dihat darezandin. Lewma cuda darezandina wî jî feyde bû. Malbata Fewzî bi rêk û pêk dihatin serdanê. Her carê dihatin cem min jî. Fewzî jî têkil komê ye. Dê hevalên ku ceza girtine, an jî dibe ku ceza bigirin, di nava komê de bin. Lê wê zêde neqelebalix be. Min got dê herî zêde sê-çar kes bin. Hinek spreyên mirov ji hiş dibin hene. Mirov dikariya di kêliya revê de li qoxuşê bike. Ger şev bûya nepirsgirêk bû. Çekek mîsoger hewce dikir. Ji ber dibe ku bi derî re derketin biba pirsgirêk. Heta ger hewce bike, em dikarin gardiyanan jî rehîn bigirin. Dê wisa ne zehmet be ku em leşkerê li ber derî jî, bê bandor bikin. Ger beşa vê planê ya derve jî bihata serxistin, dê her tişt newaz (harîka) bûya. Ger maşîn amade be, em dikarin di navbera pênc-deh xulekan de ji qadê derkevin.

Bi rojane li ser vê planê dihizirim. Jiyana min tev bûye rev. Kelebek baş kiriye! Ez ji planên wî, ji xwe re gelek planan çêdikim. Bi min re weke nexweşiyekê pêş ketiye. Dîsa jî, ji xwe re dibêjim, ezê mîsoger birevim. Ez ti çaran nahizirim ku bi rêbazên zagonî derkevim. Ji ber zora min diçe. Gelo ruhek maceraperest bi min re hebû? An jî gelo ev jî xwezayek zindanê bû? Girtîbûn her tim azadîxwaziyê mezin dike. Ev rast bû. Li gorî min jî divê xeyalê şoreşgerekê/î yên li girtîgehê jî rev be. Divê zindan têra wî/ê neke…

Min Fuat Çavgun li wir nas kir. Min dizaniya ku beriya niha hatiye girtin. Li girtîgeha Rihayê bû. Birayê Halîl Çavgun bû. Dema behsa Halîl Çavgun tê kirin, berxwedana Hîlwanê tê bîra me. Sala piştî hevalê Heqî, di heman dîrokê de şehîd dikeve. Bi destên eşîreta Silêmanan şehîd dikeve. Xebatên hevalên wisa yên şoreşgerî, bandorên ku ava kirine, bi taybet jî berxwedana Hîlwan û Sîwerekê, li her qadê tê meşandin û propagandeya wê dihat kirin. Hinde behsa xwepêşandanên gel ên siyasî dikirin, digotin gel hatiye wê astê ku rêveberiya xwe ya cewherî ava kiriye, heta astekê nûnertiya vîna xwe ya cewherî dike û gelek wateyên din bar dikirin û vedigotin. Jinan jî di xwepêşandanên çekdarî yên Hîlwanê de, di refên pêş de cih girtine. Propagandeyên wisa jî bandorek erênî ava dikirin.

Lewma xwezayî naskirina me ya bi Fuat Çavgun re, em cardin birin bîranîna wateya berxwedaniya Hîlwanê. Di çalakiyek wisa hevbeş pêşxistinê de rola wî jî gelek çêbûye.

Mirov dikariya baweriya xwe bi Gozel a ku girtiyek edlî bû bîne. Min pirsa ewlekariya hundir, ewlekariya derve û krokiya girtîgehê jê kir. Min pirsa krokiya giştî ya Meletî jê kir. Derbarê kolan, xisletên wan deran û hinek mijarên din ên girîng tevê de, pir hêsan û rehet ji min re got. Agahiyên objektîf dan min. Gozel, jinek jîr bû. Dizaniya ku ez jî vale pirsa van nakim. Ecêb, gelo çima wê hewl nedabû bireve? Li girtîgeha nîv vekirî jî maye. Heta behsa jinên ku girtiyên edlî çawa revîne dikir. Li girtîgehên nîv vekirî, derfetên revê zêde ne. Her wiha rojekê bi destûr derketiye derve. Digot; “ma dê kî min biparêze? Ez biçim mala bavê xwe, tê nasîn. Hevjînê min hat kuştin. Malbata wî jî dijmin in. Ger ez weke we bûma, ez

yek kêliyê jî nedisekinîm. Gelek kes xwedî li we derdikevin. Derfetên we pir in." Mafdare. Lê em jî derfetên heyîn rast nanirxînin. Ew jî Fewzî wan nas dike. Ev jî baweriyek din dide. Lê dîsa jî bi tevdîr nêz dibim. Hevalan xwe gihand vê malbatê. Dayîka Fewzî behsa emanetek kevin dike. Gotibû; "demanceyek biçûk hebû. Radestî min kiribûn. Min jî veşart. Paşê nehatin, ne girtin. Ew jî rizî." Jinek yeman, kinik û hûrik, lê şirîn bû.

Min di derbarê plana nû de jî not şand derve. Weke din min ji Fuat wan re jî notek bi heman naverokê û nota hinek pirsên ku hewce ye bersiva wan were dayîn jî ser ve kir û şand. Baştir bû ku ji derve de ji wan re bişandan. Heta min di notê de pêşniyar kir ku vê planê bigirin pêş. Di derbarê vê planê de jî bersiva erênî hat. Bersiva pirsan jî erênî û guncav e. Fuat ew ji min bê sebirtirin. Dibêje; "divê beriya ku xebatên veguhestinê çêbin, ev kar pêk were, nexwe dibe ku hinek kêmasî rû bidin. Xwesteka min a demanceyê jî guncav tê dîtin. Ger ew demance ji qoxuşa jinan derketa û nehata serxistin jî, wê kêrî karekê bihata. Zelal bû ku Fuat ew jî hinek tiştên cuda plan dikin. Yek neba, dê ya din bihata ceribandin. Lê li şûna çêkirina evqas plan û têkilhevkirina karan, ya herî guncav pêkanîna tişta herî rasteqîn bû.

Demance di nava du qotiyên lokom û çîkolata yên cuda de anîne. Wê rojê Xetîce nobedare. Gelek caran tiştên ku kesên dihatin serdana me danîn, bê ku di qoxuşa zilaman de kontrol bikin, yekser derbasî hundir dikirin. Gardiyan jî xîret nakin, ku her carê li her tiştî temaşe bikin. Wê rojê jî dayîka Fewzî hatibû. Li gel wê jî zarokek neh-deh salî hebû. Qotiyek di hemêza wê de, ya din jî di hemêza zarok de bû. Li cem sivîlan

mirov dikariya yên hatine serdanê hemêz bike, bi dest silav bide hev. Derfetên vê hebûn. Carê mirov dikare li cem gardiyanan yek-du xulekan hemêz bike, bibe hundir xwarin û çayê bide wan.

Nêzîkbûna ku gardiyana bi navê Xetîce ji girtiyên din re dikir, ji bona min jî dikir. Ne dixwest cewazî pêş bikeve. Min û dayîka Fewzî hevûdû hemêz kir, dema qotîk dan destê min, hêdîka got; "di hundirê wê de emanet heye." Min her du pakêt jî da hemêza xwe. Gardiyan xwest alîkariya min bike. Got; "ka bide min, tu rehet hevdîtina xwe bike." Min got; "na, tu sax bî." Ji ber ku lokum bûn û şaş neyê fêmkirin, herî zêde jî ji bona bal nekişîne, min hêdîka vekir. Min bi destê xwe ji rêza serî ya lokuman derxist û da wan. Ev baş bû. Ayşe got; "ka bide min ez danim hundir." Min jî got; "na, bila bimîne." Ayşe yemane, ger ji destê min bigire, dê ji giraniya wê fêm bike ku tiştek tê de heye. Dayîka Fewzî got; "hevaleke te ev pakêt dan. Ez bawerim dê ew jî were dîtina te. Niha li beşa zilama ye."

Ji ber ew ji dûr hatine dikarin hem sibehê û hem jî piştî nîvro hevdîtinê bikin. Piştî ku ew çû, ji min re hat gotin ku kesek din hatiye serdana min. Ez jî çûm. Xetîceya gardiyan derî vekir, me silav da hev. Got; "bawerim te ez nas nekirim. Lê ez te ji mêjve nas dikim. Me nota te ragihand. Em li benda bersiva wê ne. Delîl jî li vir bû, çû." Hinekê behsa Delîl kir. Got ku di hinek mijaran de bi hev re axivîne. Tevlî nebûye ku Delîl derbasî aliyê Depê (Qereqoçan) bibe. Yekser pey wê re dest bi uslubek gazincê kir. Got; "uslubê wî hişk bû." Ji ber ku bi hatina xwe re dest bi van axaftinan kir, ez pir aciz bûm. Min jî got; "we dikariya hûn van mijaran bi hev re nîqaş bikin. Ji ber niha ti wateya wê tine ye." Êdî li ser pakêtên hatî axivî.

“Lê belê, ez bawer im hinek kêmasî rû dan. Di hundir de hevalek heye. Li benda encamê ye. Em bi guman in ku dibê not hatibe girtin. Ger ketibe dest xirab e. Ji ber di notê de behsa demanceyan hatiye kirin. Me jî têde cihê we evder destnîşan kiriye. Li gorî vê nêz bibin.” Serê min tevlîhev bû.

Min got; “Hûn çi dibêjin? Nota çi? Ma hem not û hem demance dibe? Çi kuderê tê girtin? Ez aciz bûm. Lê ew bisebir bû. Min jî got; “ger tiştek wisa heye, bila ew jin were, da ku ez cardin pakêta bidim wê. Ji me re zêde ye. Bila lokuman ji hevalên xort re bibe.” Wî jî got; “ez dikarim pakêtan cardin derbixim derve.” Min got; “wê demê xwe mijûl nekin, hûn pir rehet in. Ma wisa jî nabe!”

Dema veqetiya cardin pirsî bê ka min ew nas kir an na. Got; “navê min Heyder Eşîyok e. Ji Depê me. Ez te ji pêvajoya dibistana mamosteyan ve nas dikim. Weke din jî hinek tiştên ku dixwazim ji te re bêjim hene. Ez bawerim wext tine ye. Ezê paşê binivîsim” û çû. Piştî demekê ew jin hat, min ew pakêt cardin danê. Min jê re got; “ger tu kesî jî nebîni, bibe li gund veşêre.” Ew jin hinekê tirsiya û got;

“Qurbana te me, keça min, me têkil karên wisa xeter nekin. Jixwe mala me şewitiye.” Ez pir xemgîn bûm. Bi rastî jî karek zêde seqet bû. Temam, Heyder Eşîyok hat bîra min! Lê dema ew li vir nehat bîra min. Berî niha demekê di girtîgehê de mabû. Dihat gotin ku, darbe ji serê xwe xwariye, lewma zêde esabî bûye, her tim nexweşiya xwe dixe rojevê. Ji vî alî ve xwedî pirsgirêk bû. Min bi israr jê xwest ku krokiya Meletî jî derbixe û ji min re bişîne. Wer dixuyê, karê Fuat wan vala derketibû. Ezê dev ji planên xwe yên din bernedim. Ji ber her ku ev kar dihat tevlîhevkirin, ew qas jî xeter dibû.

Jinek ciwan di roja serdanê ya pey wê re notek ji min re anî. Du notên cuda hene. Yekê bi gotina 'heval', ya din jî bi 'Sakîne' destpê kiriye. Lê her du jî bi heman nivîsê ne. Min nota bi sernivîsa "Heval" xwend. Ew kintire. Dibêje: "wê rojê kêmasiyekê rû da. Lewma neçar mam ku cihê xwe berdim. Wê niha karên Fuat wan raweste. Bersiva pêşniyara te hat. Erênî ye." Lê diyar dike ku; "ji ber niha hinek karên lezgîn ên divê li herêma yekem werin kirin hene, lewma dê hevalên ku werin şandin hinekê dereng bimînin. Lê dîsa jî tu amadekariyên xwe bike. Dê nivîsên me jî bidomin. Ez di wê baweriyê de me, dê mîsoger ser bikeve." Hwd hinek tiştên din hatine nivîsandin. Kêfa min xweş bû. Ez jî ji xwe re şîrove dikim ku, vê jî diyar dikir ku ji bona fermî were ragihandin cidî hatiye girtin. Gelo ew karê girîng çibû? Min destpêkê ti texmîn nekir.

Paşê min nota din xwend. Dibêje: "Sakîne, her çendî di girtîgehê de jî be, cardin dîtina te kêfxweş kirim." Di navberê de jî gelek pesindan hene. Her wisa çiqas rêzdare, wê rave dike. Piştre jî di salên destpêkê yên ez dîtîm de, min çawa bala wî kişandiye, çawa ez jibîr nekirime, her wiha behsa hezkirina şoreşgeran a bilind û gelek gotinên vala yên din… Her ku dixwînim, ceynikê min radibin. Bê rû ye! Çawa cesaret kiribû ku tiştek wisa binivîse. Ev dîn bû gelo? Nizanim di serê wî de çi nexweşî hebû. Gelo ne ji ber vê be.

Xwedêyo, ez di derdê çi de me. Vî hevalî, nexasim hevalê ku li qadê berpirsyariyê bike, çi dikir? Min jî bersivek kin û tund da. Da diyarkirin ku bila cidî be. Bila li hember nivîsên ku ez dinivîsim rêzdar be. Min not vegerand. Lê hêj di bin bandora wê de me. Gelo, ev ne hevalê me ye? Ma dibe ev jî

lîstikek be. Gotibû navê wî Heyder Eşîyok e. Ji aliyê fîzîkî ve nehat bîra min. Min nas nekir. Lê min navê wî bîhîstibû. Ger min beriya niha dîtibe jî, nehat bîra min. Belê, karê revê, kete avê! Vala derket. Jixwe karê demanceyê jî vala derket. Ew çi not bû, zehmet bû fêm bikim. Kêmek mabû ez bawer bikim ku her tişt parçeyek ji lîstokê ye.

Lê belê, Heyder tam bela serî bû! Li hember nota min jî êrîşek dijber raber dike. Ji xwe re maf dibîne. Ango gurura wî ya fodalî şikestiye. Daye diyarkirin ku ji ber zewaca min beriya niha jiyan kiriye, bertekên min li dijî zilam pêş ketine, lewma ez jî bêrêziyê li hember hestên wî dikim. Dibêje, ji mêjve min nas dike, şoreşgerî û partîbûna bi min re bandor lê kiriye, vê jî hestên wî bandor kirine û hwd gelek gotin kirine. Pesindan û hezkirin (!) zêde ne, propagandeya hestan kiriye. Her wiha dilê wî şikestiye ku, min çima ew nas nekiriye.

Çiqas ecêb bû! Ev kesên ku digotin ji min hez dikin û bi çavreşî min ve hatine girêdan tev, min derdixin asta xwedê. Qaşo didin diyarkirin ku zehmete xwe bigihînin xwedawendiya min, kes cesaretî vê nake. Lê mixabin, di rastiyê de wan îlana eşqek herî çors, herî bê pîvan, herî bê rêz û herî erzan ve, qalibên xwe dişikandin. Heman weke serpêhatiyek 'hestan' dixe zehmetiyan û li ser vîna miqabilî xwe hukum dike, bi qasî kevneşopiyan jî wêdetir şêlû, nediyare ku ji kur destpê dike, dê li kur xilas bibe, xwe dispere çi, hesabê nake ku xizmetê ji çi re dike, ji aliyekê ve veşartî û dizî ve, ferdî-ferdperest, takekesî, ji aliyê din ve jî har, çors, teqez miqabilî xwe tewanbar dike, heta dikare vê veguherîne tolhildanê tê ravekirin.

Çi eleqeya xwe hebû. Ma Heyder ez ji kur û çiqas nas dikirim? Çi demî dîtibû? Ger ev hemû rast jî bin, ez di kîjan mercan de bûm, min çi dida pêş û derdê min çibû? Ger kesayetek evqasî fêm neke û nirx nede, wê demê xurifiye. Ger ez çi were ber devê min binivîsim û bişînim, ezê jî bikevim asta wî. Hinekê hedirî nêz bûm. Divê ez teqez vî karê revê ser bixim. Ma ez çawa dikarim behsa girîngî û lezgîniya vê ji wî re bikim? Ji ber li qadê hevalek din ê berpirsyar jî tine ye. Hevalê Delîl derbasî aliyê Depê bûye. Ez naxwazim pirsgirêkek wisa ragihînim jor û wan jî bi vê ve mijûl bikim.

Ger ez derkevim derve, ezê hesabê vê bipirsim. Belê, ger hinek dikarin xwe evqasî winda bikin, gelo dikarin rêxistinê jî ewqasî bimeşînin? Ev jî bi guman bû.

Min notek asayî nivîsand. Min got; "şaş fêm nekin. Min li hember hestên we bêrêzî nekiriye. Lê min pêşniyarek pir girîng ji we re kir. Li şûna ku divê hûn girîngiyê bidin wê, nêzîkbûnek wisa bi xwezayî bertek bi min re ava kirin. Ez ji zilaman nefretê nakim. Rast e, bandora pêvajoya ku min jiyayî çêbû, lê bêbaweriyek bi min re ava nekir. Ne delaliye jî. We di nota xwe de hinek gotin zêde hêsan bikar anine. Divê mirov hişyar nêzî van mijaran bibe. Ez ne kesek wisa me ku delaliyê bikim, paşê jî hestên xwe bifiroşim. Madem hûn ji şoreşgeriya min bandor bûne, wê demê şoreşgeriya min jî evqasî erzan nekin. Ger ez derkevim, emê berfirehtir bi-axivin û nîqaş bikin. Ez di wê baweriyê de me hûnê jî qane bibin. Hinek rêyên nû jî lêkolîn dikim. Hisên Yildirim dibêje, dibe ku em biçin Amedê. Ger hûn dereng bimînin, ezê jî derfetên xwe bikar bînim."

Ez dixwazim di vir de hem karê revê cidî bigire, hem jî bizanibe ez ne hewceyî wî me. Armanca nota min jî ev e.

Di vê navberê de dema hundirê qoxuşê siwax kirin, min komek mifte dîtin. Min jî yek bi yek ceribandin. Mifteyek ya derî bû, yekser vekir. Min got, temam, ev kar jî temame! Kelecanek wisa ez girtim, min nedikariya di cihê xwe de rawestim.

Di zindanê de xweseriya meşandina şer, ne tenê dikare bi salan re, ne jî bi xisletên dijmin ve were pênasekirin…

Li Kurdistanê bajarên ku dikevin çarçoveya sikiyonetimê de zêde dibin. Li Meletî jî rêveberiya awarte tê pêkanîn. Operasyon berfireh in, girtin jî zêde ne. Min bihîst ku hevalê Xeyrî û Pîr jî hatine girtin. Çi dibe gelo? Fermandariyên sikiyonetîmê û fermandariya giştî bê navber daxwiyaniyan didin. Di rojname û tv de gotinên weke yekîtiya mîllî û peymman kêm nabin. Gelo hedefa propagandeya "divê serê terorîstên cudakariyê (bolûcû) dikin were perçiqandin" çiye?

Ji eniya Tirkiyê jî hinek pêşketin hene. Tevgerên karkeran û xwepêşandanên xwendevanan zêde dibin. Ti saet û rojên bê pevçûn tine ne. Bûyerên têkilhev û girîng di rojevê de ne. Komînên gel ên şoreşgerî hatine sazkirin û şaredarî di destê şoreşgeran de ye. Gel rêveberiya xwe bi xwe dihilbijêre. Bûyerên heyîn jî, bi asta rêxistinbûna gel û têkoşeriya wê re li Hîlwan û Sîwereka Tirkiyê bûn.

Dijmin, Edîp Solmazê welatparêz ku gelê me li Êlihê hilbijartibû, yekser kuşt. Li Kurdistanê pêşketinek herî biçûk, bi harbûnek mezin û xwînê dihat astengkirin. Rê nedida tiştekî. Li Hîlwanê meclîsa gel hatibû hilbijartin. Serokê şaredariyê yê berê lêborîna xwe ji gel xwestibû û xwe sipartibû efûya gel. Hinek jin jî, ji endamtiya meclîsa gel re hatine hilbijartin.

Li Sîwerekê jî merasîmên cenazeyan vediguherin xwepêşandanên siyasî. Dijmin jî li ser girseyê guleyan direşîne, şehîdên me yên nû çêdibin. Bûyer xilas nabin û narawestin. Di çapemeniyê de, ji gelek aliyan ve şerê kozikan tê destnîşankirin. Eşîreta Bucakan li vê qadê lingek esasî yê mêtîngeriyê ye. Çetegeriya feodal jî di kesayeta Silêman, Bucak û Ramanan de li dijî têkoşîna me tê ferzkirin. Ev pêşketin di heman demê de asta nîqaş û şîroveyan jî pêş dixin. Şoreşa Demokratîk a Millî, ne du pêvajoyên ku ji hev cuda ne. Weke goşt û hestî bi hev ve girêdayî ne.

Di Kurdistanê de nakokî têkilhev bibûn. Saziyên Mêtînger û hevkariya Feodal a xwecihî bi temamî xwe dispartin hev û hebûna xwe wisa saz dikirin. Lewma gel ber bi Rizgariya Netewî ve kişandin, birêxistin kirin, bibelavkirin û rûxandina rewşa vê hevkarî û îxaneta heyî ve girêdayî ye. Ev jî rastiyek gengaz e. Ji ber dê her rûxandina li wir, eniya şoreşgerî jî bigehanda sipartekên wê. Vê pêşketinê bûyerên nû destnîşan dikir. Êdî kêm jî be ev bi pêkanên dijmin ên zelal ve dihatin fêmkirin. Lê zehmet bû pêşketinên heyîn bi temamî werin şopan, şîrovekirin û were fêmkirin ku dê çi çêbe. Asta şopandina heyî jî teng û giştî dima. Ji ber peywendiyên bi derve re jî sînordar bûn, mirov nedikariya xwe ji warekê

derbixe, da ku xwe bigihîne astek berfireh. Ev jî pêş nediket. Lê dîsa jî her pêşketinekê mereq û baldariyek mezin ava dikir û bi xwezayî dida hizirandin.

Ji Elezîzê ve dihat gotin ku dê dosyayên me derbasî Amedê bikin. Gelek qadroyên di asta pêşeng de li wir hatine girtin. Bi sedan sempatîzan û alîgir hene. Dema ez ji vî alî ve lê dinêrim, diyar dibe ku emê di demek kin de derbasî wir bibin. Hem dê îxaneta Şahîn baştir bihata fêmkirin. Li wir nedikariya li gorî ku dixwaze tevbigere. Lê weke din jî nedestpêkirina dozan, ji demê re hiştin û her kes demek dirêj di hundir de girtî hiştin jî weke planekê dihat dîtin. Sewqkirina me ya Amedê jî dem dirêjkirin bû. Di vê mijarê de hinek malbat bi tirs û xof, hinek girtî jî nerehet bûn.

Dema me dest bi têkoşînê kir, hinekan qet hesabê girtîgehê nekiribûn. Gelo girtîgeh çibûn û xizmeta çi dikirin? Paşerojê li Dadgehên Îstîklalê Şex Seît û bi dehan pêşengên berxwedaniya Kurd hatine darezandin û darvekirin. Bandora wan giştî bû û ev bûyer nebûn bingehek ku avakirina zemînek pêvajoyek pêşketî. Heta, kî li kîjan girtîgehê mabû, çiqas mabû û pêvajoyek çawa hatibû jiyîn? Ev ziravî jî zêde nedihatin zanîn. Di darizînên pey wê re jî, ji bona pêvajoyek nû di nîtelîkek destpêkirinek nû bike, wan darezînan berovajî bike de nebûn. Nûnertiya Kurdewariyê di asta navîn de jî nebû. Li gorî tê xwestin kes xwedî lê derneketibû.

Di Adarê de darvekirin, darizandin û zindan zêde di rojevê de bûn. Ji ber bandor dikir. Tiştên ku di hinek girtîgehan de hatine jiyîn, darizandina hinek şoreşgeran hatine belgekirin û ji raya giştî re hatibûn parvekirin. Li ser wan pirtûk hatibûn

nivîsandin. Dîsa darizandina Birahîm Kaypakkaya wan di rojevê de bû. Di vê manê de Amed şahidê pêvajoyên gelekî girîng e.

Têgeha zindanê, rewşa şoreş û şoreşa dijber a di vê eniyê de û rola ku zindanê di vî şerî de lîstî gelekî girîng bû. Her çendî wisa kûranî û berfireh nayê destgirtin jî, pêşketinên ku rû didin, ji hinek aliyên diyarker ve xisleta vê qadê derdixist holê. Heta wê rojê, têkildarî zindanan çi ava kirine, di şoreşan de rolên çawa girtine, taybetmendiya wan çiye û hwd de, agahiyên ku hene ji agahiyên giştî ku tên zanîn derbas nekirine. Her ku bê jiyîn, ev rûyê dijmin bê nasîn, dê asta watedariyê jî pêş bikeve.

Roj û meh pir girîng in. Dema hinek kes çend salan di girtîgehan de diman, pir ecêb dihat dîtin. Weke demek dirêj dihat dîtin. Her tim dihat mereqkirin ku çawa li ber xwe dane. Niha em mehan, salan li pey xwe dihêlin. Her wiha em bi jiyînê re hînî gelek tiştan dibûn. Tevî vê hêj gelek bûyer û diyardeyên nehatine fêmkirin, têgihiştin, hijmarek zêde bi encam nebûyî hene. Di zindanan de xweseriya kes a meşandina şer netenê bi salan, ne jî dikare tenê bi xisleta dijmin ve were vegotin. Ji ber şerek gelekî cuda, şêwaza şerek bê hejmar xislet û xweseriyan digire nava xwe ye.

Bersiva nota min hatibû. Lê dawiya wê tine bû. Mixabin di heman rojan de plana hevalê Mazlum Doxan jî ya firarê heye. Dema ew yekem car li ser rêya Rihayê hatin girtin, nasnameya sixte pê re bû. Hevalê Mazlum bi nasnameya Birahîm Şenol ve, ew Aysel û Yildirim di heman waseyîtê de tên girtin. Demek dirêj bi wê nasnameyê ve dimîne, lê dijmin jê şik dibe. An

îhtîmala eşkerebûna nasnameya wî heye, an jî ji bona dijmin hîn bibe û baş pê bawer be, gelek rê û rêbaz bikar danîn. Heta kesên sîxûr bûne di bin banê şoreşgeriyê de dişandin girtîgehan. Her wiha îfadeyên Şahîn hene. Ger bînin miqabilî hev dê nas bikin. Ji ber van mercên neyênî tevê, destpêkê firar dikeve rojevê. Bi gumana ku dibe bibe sedema bandorkirina çalakiya wî, ya min tê talok-kirin. Ez jî hewl didim xwe rehet bikim. Ji xwe re dibêjim, çi nabe, bila hevalê Mazlum Doxan derkeve tişt nabe. Bes bila ev çalakî ser bikeve!

Mixabin, me paşê agahî girt ku hatiye girtin. Ji ber demek dirêj di bîdona gelaşê de dimîne, xwîna wî nagere, lewma nikare tevbigere, bi zorê ji bîdon derdikeve. Ji ber leşker jî hene, nikare bireve. Hevalên ku werin bigirin jî di wextê de nayên. Hemû bê şansî li pey hev çêbûn. Lê mixabin kêliyên herî zehmet hatibûn derbaskirin, tenê dawî mabû.

Belê, ya girîng çima derve wisa kiribû? Ma nedizaniyan ku çiqas zehmete mirov di hundir de ewqas derfetan bîne cem hev û ava bike? Ger kêmek jî be wate bidan vê, dê berdêla wê çi dibe bila bibe ew çalakî bihata serxistin. Mîsoger li gorî xwe jî bi dehan hêcetan ava dikin. Lê çi feyde bû? Ji ber Mazlum cardin di hundir de bû. Ew firsenda manîdar jidest çûbû. Her wiha nasnameya wî jî derketibû holê. Jixwe hevalê Mazlum piştî wê çalakiyê parastina xwe kir û xwedî li partiyê derket.

Her ku bê cidiyetiya Heyder dihizirîm, ez jî zêde tiştekê hêvî nakim. Tenê dixwazim navnîşanek saxlem bidin min. Navnîşana qehwexaneyek li Seyranbaxlarê dan min. Weke ku ez Meletî nas dikim, dizanim, navnîşana qehwexaneyekê dide min. Ew jî ji min re ecêb bû.

Hewl didim ji girtiyan derdor nas bikim û hîn bibim. Hinek navnîşanên girtiyên beriya niha dem kin mayîn li cem min hene. Ez wan jî jiber dikim. Dibe ku cihên destpêkê lê bigerin jî ewder bin. Dîsa jî dê hewce bikin. Bi gelemperiya kolana Çawuşoxlu Elewî ne, komên çepgir hene, dibêjin ku baş e. Ya rastî Gozel her cihê Meletî nas dike. Ger ji wê re bêjim dê ji her kesî zêdetir alîkariyê bike. Bes ditirsim, nêzîkbûna min jî veşartinek zêde muhafazakar e. Dîsa jî min hinek tişt jê re got. Min diyar kir ku nasnameya wê hewce ye, wê jî da. Ew jî ji ber dibe ku zêde neguncav be, pirs nake.

Vê carê jî Hisên Yildirim her tişt li gorî xwe amade kiriye (!) û wisa hat. Dosya Ozden Mizrak a "Veşartî" bidest xistiye!

Got; "Dev-Yol li pey mine. Teklîfa pereyan dikin, dixwazin ez vê dosyayê bidim wan. Destpêkê Kawa got, 'bide me.' Rizgariya Gel gefan li min dixwe. Dibêjin, "wê tu vê dosyayê nedî kesî.' Min jî vekirî ji wan re got, "ger ez wê dosyayê bidim, ezê bidim PKK'ê." Lê min kesek nedît. Ger ez bikarim Elî Heyder bibînim, ezê bidim wî." ,

Min jî jê re got; "bide min." Paşê got, dilxwede ji ber ku ditirse li ser xwe nagerîne. Dibe ku ev tiştek rast be, lê belê bi guman bû…

Min pirsî; "temam. Madem wisa ye, we dosya ji kur û çawa girt?"

Got; "ango, serdozgerek nas û baş heye. Hinek serbazên (astsubay) şoreşger hene. Ger hewce bike ezê paşê behsa wan bikim. Dosyayek pir girîng e. Dosyayek 'veşartî' ye. PKK'ê ji wî şik dibir, lê kesî bawer nedikir. Hesen Aydin jî wisa ye. Beriya niha jî Ozden Mizrak nizanim li kur li emniyetê kar kiriye. Ev dosya gelekî girîng e."

Êdî divê ez jî vê carê fermî ragihînim. Divê ez çavderiyên xwe, derûniya rihê wî, doza dosya dawî û hwd binivîsim. Min diyar kir ku şikên min hene. Divê li ser wî baldariyek hebe û tevdîr werin girtin. Min ev not jî ne ji herêmê, yekser ji jor re şand. Lê min beriya niha herêm jî hişyar kiribû. Min bi devkî jî ji Heyder re gotibû. Yên li Elezîzê dizaniyan. Dibe ku hevalan zêde cidî nedigirt, lê qet nebe wan nêrînên min dizaniyan.

Min xebatên xwe yên firarê zêde kirin. Ji aliyê hundir ve vekirina derî hêsan bû. Ya rastî li cihê hewagirtinê tê razan, lewma dibe ku ev jî bibe sedema xirabkirina karê min. Bi taybet jinên qereçî bi zarokên xwe re li cihê hewagirtinê dirazan. Qadek pir teng e. Navbera derî û cihên razanê gavek e. Xewên wan jî bê rêk û pêk in. Hinek heta nîva şevê sohbetan dikin, hinek bi ax û ofan xew nakin, ji ber germe jî hinek her tim bi ava ku ji xortomê diherike dest û lingên xwe şil dikin… Ango yek saetek diyar, vala tine ye. Ji bona ez bizanim şevê kîjan saet guncav e, carê heta sibehê narazim. Ev jî aliyeke. Ji aliyê din ve jî deriyê derve berê xwe tam li nîzamiyê ye. Di navbera wan de pênc-deh metre tine ye. Aliyê min odeya gardiyana ye. Hema kêleka wê jî eywana camekan heye. Gardiyan li her cihan jî komî û qelebalix dimînin. Ji ber germe, her der vekiriye.

Deriyê nîzamiyê yê derve bistên hesin in. Bi şêwazê du baksa ne. Şevê tenê baskek dimîne. Carê wê jî dinixumînin. Lê nayê miftekirin, an jî singoyan lê nadin. Kolik jî aliyê cadê yê dine. Leşker di tevgerê de ne, jêr û jora rê, çep û rast digerin. Carê jî li pêşiya kolikê disekinin. Cade pir dişixule. Hema miqabilî girtîgehê kargeha Tekelan heye. Dema karker belav

dibin, ew cade pir qelebalix dibe. Çavên leşkeran jî li keç û jina ye. Karkerên ku şev jî kar dikin hene. Ez sibehê, nîvro û êvarî hemû demjimêrên wan dişopînim.

Kunên derî kêrî karê min dihatin. Ya ku herî zêde li wir çavderî dikir jina bi navê Ayşe bû. Ayşê ji Edenê bû. Di gazînoyê de kar kiriye. Fahîşe ye. Heft sal in di girtîgehê de ye. Hêj ciwan û xweşik e. Lewma gardiyan wê rehet bernadin. Ew jî wisa ye. Bi gardiyanekê re têkîliya wê heye. Hemû personel û girtî jî vê dizanin. Ayşe jî şev û roj di wan kuna re temaşe dike. Me hinek zêdegaviyên wê dabûn rastkirin. Lê dîsa jî me nekarî em Ayşê ji ber wî derî bigirin û xilas bikin. Li gorî berê kêmtir temaşe dikir. Herî dawî jî ji bona min bi wir re temaşe dikir bala wê dikişand. Wate ne dida. Min jî digot dê parêzer, an jî malbata min werin û wisa hêcetek temaşekirinê ava dikir. Her wiha hatiye belavkirin, dibe ku ez derbasî girtîgeha Amedê bibim. Min ew jî dikir hêcetek. Min digot; "dema dengê wesayîtan tê, mereq dikim. Ji bona min ji nişka ve nebin, lewma temaşe dikim." Wan jî bawer dikir.

Gardiyan jî du wextan kar dikin. Hewl didim ketin û derketinên wan û peywendiyên wan ên bi gardiyanên jin re fêm bikim. Gardiyanên jin dikariyan her carê derkevin derve. Kirîna pêdiviyên beşa jinan ew dikin. Carê rojê bîst caran diçûn sûkê û dikanê. Di vê mijarê de fedekar bûn! Ji ber li gorî wan jî bû û kêrî wan jî dihat.

Dayîka Zohre nexweş bû. Mala wê hema li aliyê kolana binya girtîgehê bû. Her carê diçû û dihat. Xwarin li girtîgehê çêdikir û dibir malê. Her carê di destê wê de tiştek hebû. Ya herî rehet ew bû. Çûnûhatinên wê ecêb nedihat dîtin. Carê nîvê

şevê jî diçû. Hema jiyana wê girtîgeh bû. Her yek ji wan hefteyê carekê dihatin guhertin. Yekê bi şevê kar dikir, a din rojê kar dikir. Ev jî kêrî min dihat.

Zohre cilên gardiyanan li ber xwe nedikir. Tenê carê rojên fermî çakêtê xwe li ber dikir. Bi gelemperî daw, di binî de jî derpî û li serê wê jî poşiya reş hebû. Ango cilên wê xwezayî û gelêrî bûn. Ev jî xweş bû.

Weke din ji bona bi me re jî diraza, feydeyek bû. Tevî ku odeya gardiyanan hebû, dema televîzyon temaşe dikir, di cihê xwe de bi xew ve diçû. Fêrbûna salan bû, ti xeternakî jî nedidît. Cilên xwe jî li odeyê dihişt, an jî derdixist li ser têlê radixist. Ji ber gerim bûi cilên weke derpî û cilên şevê li ber xwe dikir.

Min ji derve re gotibû ku ez çawa derfetê bibînim, ezê birevim. Ji ber Hisên Yildirim gotibû; "dê we di meha Tebaxê de bibin." Dema ev gotî hefteyek mabû. Lewma min jî hemû amadekariyên xwe di nava vê hefteyê de temam kirin. Min pêşniyar kiribû ku; "çend rojên dawî li ser hev li derve, cihek guncav li benda min bin. Tenê bila wesayîtek hebe bes e." Min ji wan re diyar kiribû ku, ji ber guncavtire ezê saetên derengiya şevê esas bigirim.

Demjimêrên belavbûna karkerên Tekelan, dema herî guncav bû. Ez jî dixwazim tam liqay wan saetan bînim. Lê mixabin her carê hinek şiyar dimînin. Min ji Gozelê re vekirî got, wê bersiva min got; "lez neke. Em baştir bihizirin. Emê di derve de jî cihek guncav amade bikin. Ezê alîkariya te bikim, dê tu derkevî." Min jê re got, ez nikarim li bendê bimînim, ji ber dê min di bîstê mehê de sewk bikin. Ji ber wî zilamê bi lenet wisa negotiba, jixwe dê min bi sebir amadekariyên xwe bikira. Min her du lingên xwe kiribûn pêlavekê.

Zohre jî di wan rojan de bi gardiyanan re nîqaş kiribû û navbera wê û serkêşê gardiyanan nexweş bû. Her tim behsa agahiyên wisa aktûel dikir. Em her tiştên ku derve çi dibe, nabe hîn dibûn. Baldariya girtiyan, mereqa wan a li hember derve, Zohre jî, Xetîce jî zêde dida axaftin.

Min weşan û biroşûrên weke Teslîmiyet ji Îxanetê, Berxwedanî jî ji Serkeftinê re dibe, bîrdozî û polîtîka, li ser komkujiya Mereşê, Ana Serxwebûn û hwd. Tev ji Fuat wan re şandin. Min tiştek nivîskî nehişt. Min nasnameya Gozelê jî jê girt. Ti aliyek me bişibe hev tine ye, lê dîsa jî şevê di tariyê de zêde baldar kontrol nedikirin. Ger tiştek awarte nebe, nasnameya jinan kontrol nakin.

Min ji Gozelê re negotibû ku ezê kîjan rojê biçim. Lê wê şev ferq kiribû. Saet yek jî pir dirêj kir. Heta ku min ew qereçî dan razan, şerek dijwar meşand. Ji bona wan bidim razan, min hezar fênek kirin. Min cilên gardiyanan ên li ser têlan girtin. Li odeya wê ya vala li ber xwe kir. Zohre jinek girs, dagirtîbû. Her tiştê wê firehe. Bejna wê jî cuda ye. Min sandeletek binî bilind li ber xwe kir. Di bin derpî, pantor, gomlek û weke din jî çarik li noqa xwe pêçaye. Encax wisa dawa wê kêrî min hat. Ji bona rûyê min sî be, weke carê Zohre dikir, min jî di bin de xavikek li eniya xwe girê da, yazma min jî neqişandiye. Wê jî mirov asayî li serê xwe û serê din jî li sitûyê xwe dipêçe. Lê ya girîng şêwaza meşa wê bû. Her wiha dengê wê jî wisa. Lê Zohre ji gardiyanan jî aciz bibû, bi wan re nedi-axivî. Min jî dikariya wê bikim hêcet û bi wan re ne-axivim.

Ezê mifteyan heman weke wê di destê xwe de bihejînim. Tepsî di destê min de, di hundirê wê de zebeşên hatine

qeşartin, sewze û hinek tiştên din hene. Her tiştê min li gorî Zohrê ne. Tam ji odeya gardiyanan derketim, di kêliya derî vekim de, çar ling ji merdîwena dîwana pîrka Ayşe daketin jêrê. Dê biçe tuwaletê. Yekser cardin vegeriyam odeyê. Şewq tev hatine girtin. Ez di tariyê de me. Gome goma dilê min e. Ger hinek tesadûfî bikevin hundir ezê çi bikim. Yên qereçî li derve razane. Dibe ku ew jî şiyar bibin.

Pîrka Ayşê merasîmek tuwaletê ya bi bismillah û zêde duayan ve pêk anî û vegeriya cihê xwe. Çawa wê xwe dirêj kir, ez ji odeyê derketim. Saet derbas dibe. Nabe ku hinek din jî bisekinim. Min mifteya derî vekir. Min qulf jî di hundir de hişt û koma mifteyan jî bi min re ye. Min li ser derî nixwumand. Lê min çengil lê neda. Lê belê di hesabê me de yan dê min derketina xwe re agahî bida Gozelê, dê wê weke ku tiştek nebûye çengila derî ji hundir ve bigirta, an jî dê min ji derve de çengil û singû baş bigirta. Nexwe dê derî di bayek herî biçûk de veba, ji ber singuya derî digirt nebû. Mixabin ez jî bê tevdîrek evqasî girîng derdikevim. Ji ber di wê kêliyê de leşkerê li ber derî bi gardiyanê ku bisiklêtê ve li ser riya jor ve dihat re di-axivî. Lewma min jî nedixwest ku li ber derî liqay wan werim.

Tepsiya di destê min de tije xwarine. Min bi destekê ew girtiye, destê min ê din de jî mifte hene. Weke jina bi navê Zohre dihejînim. Bi lez hewl didim ku deriyê derve derbas bikim. Hêj ez li ber derî bûm, yekê paş min bang kir; “Dayê Zohre, dayê Zohre.” Dengê serkêşê gardiyanan bû. Min mifteyên di destê xwe de hejandin û got; “eeh…” hinek deng derxist. Lê nediyar bû ku dengê min çû wan an na. Ji ber du

hundir de bang dikir, bala leşkeran jî belav dikir. Ew jî pê bawer bû ku ez dayîka Zohre me. Gardiyanê li kêleka wî gotin jê re kirin; "dayê Zohre ji me hemûyan xeyîdî ye." Ev baştir bû. Dilê min lez lê dixe. Sandaletên di lingê min de binî bilind in. Ji ber demek dirêj bû min tiştên binî bilind li ber xwe nekirine, ji ber kelecana ku dijîm jî, di meşê de zehmetiyê dijîm. Lê dîsa jî hişyar nêz dibim ku weke dayê Zohre bimeşim. Nobedarê li ser dîwar meşa xwe ya lez kêm nake. Carekê weke ku kêmekê rawestiya. Min jî bin çavên xwe re lê temaşe kir.

Ev dîwarên girtîgehan xilas nabin, ecêb min derbas kirin.

Yekser çûm aliyê kargeha Tekelê, aliyê çepê wan ve, lez û bez meşiyam. Koçeyek pêşî girtî derket pêşiya min. Cardin vegeriyam heman cihî. Bi heman lezê ve derbasî jêrê bûm. Koçeyên di navberê de bêdeng in. Ber bi cadê ve çûm. Min ji xwe re digot, ger wesayîtekê bibînim, ezê biçim navnîşana ku Heyder daye min. Hêj dem heye. Du saet mane ji sibehê re. Lê çavên min li polîsên dewriyê ket. Min yekser rêya xwe guhert. Texmînî panzdeh-bîst xulek in ez li derve me. Pêşiya min çend malên ku şewqên wan pêketîne hene. Dixwazim kolana Çawuşoxlu hîn bibim. Dudilî me gelo dibe ku ev kolan be. Nizanim çi bikim. Di van saetên şevê de ji malan pirsîn jî zêde nebaş e. Lê meşa bê zanebûn jî xeter bû. Min bi tirs li zengila malekê da. Deriyê wan hêj vekiriye. Zilamek hinekê kal û bi derpî hat. Min jê re got; "şev baş." Divê ez dengê xwe bişibînim dengê kesek kal. Ji ber cilên min wisa ne. Zilam matmayî li min temaşe kir û got; "fermo", pey wî re jî jinek di heman temenî de hat. Min got; "ezê biçim kolana Çawuşoxlu,

lê ji ber tariye min dernexist. Ez ji nexweşxaneyê têm. Ez hevalbendê nexweşekî me. Ji ber nexweşê min xort bû, min nekarî li cem bimînim. Ezê biçim cem xizma me ya hemşîre. Ji min re tarîf kir, lê min dernexist.”Pirsîn; “navê wê çiye?” Bê ku bisekinim min got; “Sekîne.” Nişteciheˆn Meletî ji Sakîne re dibêjin ‘Sekîne.” Nizanim çima, lê min nexest navek din bidim.

Hêj ez li ber derî di-axivîm, ji dûr ve dengê sîrenan hat, dişibiya dengê anonsan. Min sipasiya wan kir û ber bi cihê şanî min kirîn ve çûm. Zilam got; “xwîşka min, dê tu vê şevê bi tenê biçî kuderê? Nabe, wer hundir. Ev belangaz diçe kuderê.” Dema ez ketim koçeyê, min baz da. Ez bawerim ferq kirin. Ez ne şaş bûm. Nexwe ez zêde ji qadê dûr neketime. Ez hatim heta biniya koçeya jêr a kolanê. Jêra wê cadeya giştî ye. Min guncav nedît ku cihên wisa re derbas bibim. Li nav hewşa malekê, quncikek tarî de rûniştim. Hem dixwazim rewşa heyî fêm bikim, hem jî min cilên ser xwe guhertin. Ya rastî cilên dayê Zohre ji ber xwe derdixim. Her wiha min cilên zêde yên li ber xwe jî derxist. Min weke boxçeyê li nav çarşefa heyî pêçan.

Kelecana destpêkê derbas bibû. Ez di nava bawerî û kêfxweşiyek mezin de me. Temam, min beşa zor derbas kir. Niha ya girîng xwe gihandina cihek saxlem e. Ez aciz dibûm ku Heyder krokiyek baş nedaye û navnîşanek baş nedîtiye. Hem min ji wan re gotibû; “ çend rojan li ser hev li benda min bin, ezê teqez derkevim.” Ev jî ne kiribûn. Çi nabe, jixwe emê hev bibînin. Ezê hesabê van tevan bipirsim.

Cih çiqas guncav e, ez jî nizanim. Dengê kuxikê ji hundir tê. Diyar e îxtiyarê malê heye. Gelo ez li derî bixim û alîkarî bixwazim? Li derdor şewqên çend malên din jî pêketîne.

Hatibû gotin ku; “Çawuşoxlu baş e.” Gelo ez vekirî bêjim wan min firar kiriye, dê alîkariya min bikin? Dibe ku ji ber ez jin im bandor bibin. Dibe tesadûfî jî malbatek şoreşger û welatparêz bin. Dibê ku zarokên wan jî şoreşger bin. Ez li ser van dihizirim, lê dikim nakim nikarim biryarê bidim. Dengê wesayît û şewqên wan zêde ne. Ji cihê xwe rabûm û min hinekê li derdor nêrî. Li pêş dolmuşek polîsan giran giran li nav koçeyan digeriya. Rewş neasayî bû. Cardin hatim cihê xwe. Lê her ku diçû dengê wesayîtan û şewq ber bi min ve nêz dibûn. Li kolanê digeriyan. Demekê dengê polîs û leşkeran zêde nêz bû. Baş bû cihê ez lê dimam, li çepê diket, seriyek bû. Gelo di wê saeta şevê de çawa ferq kirin? Gelo gardiyanan şik bir? Dibe ku bangî Zohre kiribin. Dibe ku dema derî vekirî dîtiye, ferq kiribe. Ez jî gelek şîroveyan dikim.

Paşê naverast bêdeng bû. Lê dîsa jî dolmuşên polîsan digerin. Li benda berbangê bûm. Carek din ji cihê xwe rabûm û dixwazim cadê derbas bikim. Binê rê darên sipîndarê ne. Weke daristanek tarî ye. Gelo ez biçim wê derê? Cihê herî parastî erazî ye. Min dîsa devjê berda. Min got ez cardin boxçe û tepsiya ku min li cihê xwe hiştine bigirim û wisa biçim. Lê piştî vegeriyam cihê xwe devjê berda. Jixwe berbang e. Rê jî bêdeng e. Ciwanek derbas bû, ez ji cihê xwe rabûm. Hizirîm ku bangî bikim, alîkarî bixwazim ku ez çawa dikarim wesayîtekê peyda bikim. Lê min dîsa devjê berda. Boxçik di destê min de, ber bi aliyê wî ve çûm. Zû ji ber çavê min winda bû. Dibe ku ketibe malekê. Aliyê koçeya çepê ve çûm. Koçeyek dirêj e û serê wê jî leşker hebûn. Çawa ez dîtim yekê baz da, di navbera xwe de digotin; “ew e, ez nas dikim.” Min jî li şûna ku yekser paşde baz dim, weke ku li benda hineka me, li ber wesayîtê

rawestiyam. Min got, dibe ku şikên wan li ser min biçin. Lê wan ber bi min ve baz dan û min jî baz da. Ji ber binê terlikên min hebûn, min nekarî zêde dûr bikevim. Jixwe leşkerekê yekser ji bona bireşîne makanîzmaya çeka xwe kişand. Yê din jî ez girtim. Min got; "xêre, hûn çi dixwazin?" Got; "ma tu ne Sakîne yî? Belê, belê, ez te nas dikim. Min çend caran tu ji girtîgehê birî nexweşxanê." Yazmek li serê min e. Min li serê xwe pêçaye. Lê hişyar nêzî cilên xwe nebibûm, cilên ku her tim li ber min bûn.

Min bi şêwazek ji xwe bawer, yekser ji wan re got; "ha, ji we re nasnameya min." Leşkerekê nasname kontrol kir. Got; "temam, ev ew xweşika di girtîgehê de ye." li Fîtika da, çek teqand, ango agahî dida derdor. Min jî velvele derxist. Dixwazim hinek ji malan derkevin, min bibînin. Ji ber ger qelebalixek çêbûya, dibe ku firsendek derketa ku min xwe ji destê wan rizgar bikira. Ger şoreşger hebin, dê hewl bidin min rizgar bikin. Mixabin kes tine ye. Yek-du kes derketin ser şaneşînê û yên derketin kolanê jî tirsonek bûn. Min ji leşkeran re got; "nereşînin. Ne we ez dîtim, ne jî min hûn dîtin. Binêrin nêzî du salane di girtîgehê de me. Van zilaman bê ku sucên min hebe ez girtime. Hûn leşker in. Zarokên gel in. Wer bihesibînin min hûn neditine. Ger hûn bixwazin pere jî hene. Bavê min li Almanya ye, ez qet vê qenciya we jibîr nakim." Leşkerê ku ji Qersê bû hinekê nerim bû û hestewarî hêdîka dengê nizim got; "ne di destê min de ye. Ger ez bi tenê bam, dibû." Diyar bû yê din faşîst bû. Digot; "tu me mijûl dikî" û li derdor direşand. Yekser du xulekan de dolmuşên polîsan hatin. Ji kolanê derneketibûn. Ên ku ji malan temaşe dikin mat mane. Helhela qîra Polîsan bû. Di heman demê de ji telsizê agahî dan.

Leşker û polîsan nîqaş dikir. Leşkeran digot; “fermana serdozger heye, emê vê jinê yekser bibin cem serdozger. Polîsan jî ferz dikir ku min bibin cem sikiyonetîmê.

Hinek polîs hêj di wesayîtê de bûn dest bi dijûnan kirin. Gotin; “ Ka li keça ker kurê keran binêre. Weke ku ez revî me. Ne xema wê ye. Keçê em ji şevê ve, tevî ku benzîn tine ye, li deşt û çiyan li te digerin. Ka li ser û çavên me binêre.” Ez qet ne-axivîm. Cardin hezim nakim ku hatime girtin. Bi taybet dema ber girtîgehê re derbas bûm, dema gotin; “mizginî, me ew girt, me ew girt” ez ji qehran dimirîm. Li ber deriyê derve cihê razanê yê aîdê min û hinek tişt din hebûn. Nexwe pê qane bûne ku ez revî me û min xwe rizgar kiriye. Xwedê bela xwe bidê!

Em diçin cem serdozgeriyê. Li ber derî rojnamevan hene. Polîs nahêle derbasî hundir bibin. Min fêm nekir çawa ewqas polîs weke keriyek kuçika kom bûn. Hemû jî ji bona min bigirin tevlî operasyonê bibûn. Her wiha mereq jî dikirin. Di nava wan de ekîba ku ji Elezîzê jî hatî hebû. Şev yekser wêneyê min belav dikin. Li ser rê kontrolan dikin. Ekîban tînin. Pir lez kar dikin.

Yek ji wan polîsan xwest seriyek yazma li serê min bigire û weke bêje; “ev jî daye serê xwe ji bona em wê nas nekin” bikişîne û derxe. Min jî bi destê xwe tundî destê wî dehf da, jê re got; “hinekê bi terbiye be.” Polîs bi ser min de meşiya. Serdozger carekê de got; “polîsê birêz, evder cihê min e. Ji kerema xwe derkevin derve. Ka mudurê emniyetê li kure? Bila hemû ekîp derkevin, biçin cihê xwe. Ev xanim di bin venêrîna me de ye. Dê îfadeya wê were girtin.” Mudurê emniyetê got; “bes, birêz serdozger ji bona me ferman hatiye dayîn.

Sikiyonetîma Elezîzê xwestiye. Em ji bo wê hatine vir." Serdozger jî bi dengek herî tund got; "ez bi we re nîqaş nakim. Ji kerema xwe re hesaba nekin. Ez kar û erka xwe dizanim." Ew derketin. Serdozger bangî katip kir; "destpêkê çayekê bîne. Ji bona Xanima Sakîne jî bîne." Derbasî ber masê bû û hinekê ez ber çavan re derbas kirim. Got; "bijî ji te re. Tu weke jinekê revî. Diyar e, hûn pir şahnaz in. Ez vekirî bêjim, li hember we rêz digirim." Çay hat, min got ez venaxwim. Dilê xwe girt. Her çendî min got; "mîda min dêşe, lewma venaxwim." Wî jî bersiva min got; "hûn daxwaza me ya çayekê jî paşve vedigerînin." Kesek kinik, dagirtî û qelew bû. Her li min temaşe dikir, serê xwe dihejand û dikeniya. Rol nedikir.

Pirsî; "tu çawa revî?" Min jî weke rû dayî jê re got. Mifte di berîka min de bûn, min ew jî derxistin. Ji ber gardiyan û leşker tev di nezaretê de ne. Wî bi xwe pirsî. Zohre, Xatîce, serkêşê gardiyanan Şêxo, gardiyanên nobedar ên din, leşker û zilamê min li kolana Çawuşoxlu li deriyê wî xistî û pirsa kolana Çawuşoxlu jê kirî, dîsa nexweşxaneyê navên weke Sakîne, Zekiye û hwd. Hemû kom kirine û girtine.

Destpêkê serdozger bawer nekir.

Got; "ger gardiyan alîkariya te nekin, tu nikarî birevî. Teqez te pere daye wan, jixwe malbata te jî li Almanya ye."

Min bi israr got ku kesî alîkariya min nekiriye. Min got ger tiştek wisa heba ezê bireviyam û serbiketam. Xetîce û Zohre anîn. Hejar bûn, xirab bibûn. Pir giriyabûn. Min li cem wan jî got ku agahiya wan tine ye. Ji ber cilên Zohre li ber min bûn, ez pir hişyar gotinên xwe dihilbijêrim û di-axivim. Ji ber ew jin di nava me de diraza. Ev bi serê xwe ji bona wan suc bû.

Min got; “cilên wê yên cuda jî hebûn, min ji odeya wê dizî. Min nasname jî ji Gozelê dizî.”

Hêj Zohre li wir bû, weke ku bêje; “xwedê ji te razî be” li min dinêriya. Wan texmîn nedikir ku ezê wisa bi-axivim, ditirsiyan. Îfadeya min hemû jî xilas kiribûn. Ya rastî doz vebû, em derxistin çend dadgehan. Bi şêwazê cezayê pere dan me û bi encam bû. Lê serokê dadê ji serkêşê gardiyanan Şêxo re got;

“Şêxo ka baş binêre. Sakîne çawa dibe Zohre? Te çawa dernexist. Te çawa li ber derî ferq nekir? Ma, ev gengaz e? Rast bêje, an jî te pere girtine.” Şêxo got;

“Birêz hakim, bi xwedê heman dişîbiya dayîka Zohre, tam weke wê li xwe kiribû. Em ji hev aciz bûn. Min bang kir, got, ‘eeh’ û çû. Min jî got ji ber ji min xeyîdiye lewma wisa nêz bû.” Bi van gotinan hakim û her kesê din keniyan.

Ev ziraviyên bûyerê bûn. Aliyê din ve ji ber ez hatibûm girtin, kesekê nedizaniya ku ez dijîm. Çawa ku Fuat Çavgun wan reva min dibîhîsin govendê digirin. Heta ku ez hatim girtîgehê jî, bawer nekirine ku ez cardin hatime girtin. Hevalên li girtîgeha Elezîzê jî dema rojnameyên digirin tenê sernivîsa wê ya, “Sakîne Cansiz firar kiriye” dixwînin yekser govendê digirin. Lê piştî ku hevalek hemûyê dixwîne, kêfxweşiya wan di nîvî de dimîne. Ji ber peyva yekser pey wê re “hate girtin” dinivîse. Peder ew hatin serdana min. Min tiştek bi wan nedabû hîskirin. Tenê min gotibû; “mereq nekin, zêde namînim ezê jî derkevim.” Dema Peder bi firokê ji balefirgeha Stenbûlê radibe diçe, rojnameyê dixwîne. Beşa nûçeyê ya destpêkê dibîne. Ji kêfa weke zarokan qîr dike. Ger gengaz be, dê firokê bide rawestandin û dakeve. Paşê nivîsa pey wê re dixwîne û vê carê jî digirî. Çiqas xirab bû, xweziya qet nexwendiba.

Ez nêzî sê mehan ser xwe ve nehatim. Ji bin bandora wê derneketim. Min a zehmet serxistibû. Li ser şaşiyan dihizirîm, yek bi yek li ser aliyên kêm disekinîm û diheliyam. Bi taybet dema di nameyên ji derve û girtîgehan dihatin de tiştên dihat gotin jî ser ve zêde dibûn, ez zêdetir bandor dibûm. Hema bêje kolana Çawuşoxlu hemû barkiribûn girtîgehê. Her roj dihatin serdana min. Her kesê ku dihat digot; "xwîşkê tu çima nehatî cem me? Keça min tu çima nehatî cem me? Te qîrek bida, te agahî bida berdêla wê çi dibe bila bibe, dê me te rizgar bikira." Hinek ciwanên ji TÎKKO û HK dihatin, wan jî digot; "me şer jî bikira, dîsa jî me tu radestî wan nedikirî." Kesên qereçiyan digot; "xwedê bela xwe nedê te. Konê me yekser li binya wan darên spîndarên li biniya rê bûn. Sed metreyan dûrî cihê lê hatî girtin bûn. Tu bihata, dê me cilên xwe li ber te bikira. Çil salan jî me tu radestî wan nedikirî."

Hinde tişt dihatin gotin, ji ber hemûyan jan diket dilê min. Kolanên Seyran baxlari û Çawuşoxlu li qehwexaneyê şer dikin. Yên li Seyranbaxlarê dibêjin; "qaşo hûn xwe Elewî û çepgir didin nasîn. We nekarî hûn keçekê rizgar bikin. Ger bihata Seyranbaxlarê, artêş jî bihata me nedida wan." Li ser van gotinan şer derdikeve. Xwedêyo! Ji nişka ve her kes bibûn rizgarvanên min!

Heyder wan not şandibû; "me hewl da ku te radestî sikiyonetîmê nekin. Lê wer xuya dike, wê te bibin. Em wê şevê di saetên zû de li wan derdoran digeriyan. Me şeva beriya wê jî heval şandin. Diviya te lez nekiriba. Bawerim tu bi bertek tevgeriyayî. Bêhna xwe teng neke. Dê heval riya din biceribînin." Her wiha hinek tiştên din nivîsandine. Min bi

rexneyên xwe ve bûyer tev nivîsand û ji wan re şand. Min leza xwe jî bi gotina Hisên Yildirim a gotî; "hûnê di meha Tebaxê de biçin Amedê" ve girê da. Rastî jî ew bû. Lê min dîyar kir ku ezê hinek rêyên nû jî biceribînim. Li hember pirsa serdozger a dibêje; "ma wê tu carek din jî hewldanek wisa bikî û biceribînî", bersiva min jî; "ez şoreşger im. Ne tu mirov û ne jî ti şoreşger naxwaze di girtîgehê de bimîne. Dewletê bi zorê em kirine girtîgehê. Emê jî bi zorê derkevin. Ger firsendek çêbe, ezê cardin birevim." Hem baş bû. Lê hem ji bona tevdîrên xwe zêde xurt kirin jî, ne baş bû. Êdî wisa bibû jinên bi navê Xetîce û Zohre di xewnên xwe de didîtin ku ez direvim. Her şev çend caran dihatin en kontrol dikirim. Dema Xatîce piştî xewnek wisa diqîre û dibêje; "Sakîne tine ye." Her kes dikene. Rojekê jî ji ber serê xwe li erdê razabûm, ez ferq nekiribûm. Wê carê jî qîrek xirab dabû. Çend mehan nekarîn ji vê derûniyê rizgar bibin. Ez tam di bin venêrînek hişk de bûm. Dîsa li rêyên revê digerim. Min dev ji nexweşxaneyê berneda. Lê ji bona wê jî alîkarî hewce dikir. Di demên dawî de peywendiyên me bi Heyder re bi temamî qut bibûn. Ji ber cunta hatibû.

Li Tirkiyê pêvajoyek nû destpê dike...

Em sibeha Îlûn'ê bi dengê nijadî, sirûdên faşîzan, bi dengê tankan û reperepa ling û agaftinên serfermandaran ên di radyo û tv'an de şiyar bûn. Haticê got; "ma we bihîst, leşkeran îhtîlal kirine." Rengê wê zer bibû. Leşker hatiye… Îhtîlal!.. Cunta!.. Me tiştek fêm nekir, lewma gelek cuntayên weke cuntaya Yewnan, cuntaya Tirk, cuntaya Arjantîn û hwd dihatin bîra me.

Kenan Evren dilxwede digot, ji bona yekîtî û yekbûna welat, bekaya dewletê rêveberiya giştî desteser kiriye. Digot; "li Rojhilat komek eşkiyayên cihêkar û li Rojava jî komek terorîstên ku her roj li kolanan pevçûnan derdixin, karker û ciwanên me parçe dikin, koçe û kolanan parçe dikin, navan li xwe dikin, dixwazin vî welatê xweşik veguherînin gola xwînê. Lewma divê hemwelatiyên me baş bizanin, dê ev eşkiya negihin hedefên xwe yên xayînî. Artêşa me û hêzên me yên çekdarî serwer in. Her wiha di xizmeta hemwelatiyên me de ne…" Her nîv saetê carekê ev axaftin tên dubarekirin.

Xebatên partiyên siyasî hatine rawestandin. Parlamento kar nake, rawestiyaye. Hemû zagon hatine cemidandin. Her roj, her demjimêr daxwiyaniyên nû tên xwendin. Giştîname tên weşandin. Ferman didin ku her kes yek bi yek van pêk bîne. Her wiha dibêjin; "dê her kes di demek herî nêz de çekên xwe radestî qereqola herî nêz a girêdayî wê bike. Yên ku di sê rojan de radest nekin, dê di derheqê wan de biryarên zagonî werin pêkanîn." Çiqas komîk e! Belê pêkanên zagonî! Bi kîjan zagonê, behsa kîjan pêkana zagonî dike?

Di televîzyonan de bi sedan mirovên ku ketine rêzê hene… Ew jî çekên xwe radest dikin. Hinek jî teslîm dibin. Jixwe her kêliyê bangawaziya "teslîm bibe" dikin. Serokên partiyên siyasî hatin girtin. Di dîmenan de çawa Demîrel, Tûrkeş û Ecewît ji meqamên wan tên derxistin, ji Çankaya tên derxistin didin nîşan. Hemû jî reng ji wan çûye. Qaşo ev nêzîkbûn û helwest li gorî prosedûra leşkerî ye! Hewl didin di her firsendê de dîmen û nêrînek cunta ya kamil, dilnizim, neçepgir, ne jî rastgir bidin diyarkirin. Diyare her tişt baş hatiye plankirin.

Belê, vê xisleta cuntayê bandor dikir û dixapand. Bi vî rengî her cure bertek, muxalefetên şoreşger û demokratîk dorpêç dikir. Cuntayek xwedî ezmûne. Lê belê herî zêde jî ji lewaziyên muxalefeta şoreşger hêz digirt. Weke jehrê ye. Her taktîkên wî weke ku ji şiringê jehrê diberde ye. Hewl dide di her firsendê de bêbertekî, teslîmiyet û serî tewandinê, li her qadê belav bike… Ecêb! Ma evqas jî nedibû! Kanî koçe bi hezaran dagirtîbûn, kanî berxwedaniyên karkeran, xwepêşandanên xwendevanan, serhildanên gundiyan? Kanî ew çalakgerî? Bi qasî neyên hejmartin komên şoreşgeran hebûn. Na, na, mîsoger amadekariyan dikin. Nabe ku wisa bêdeng pêşwazî bikin.

Mîsoger amadekariyên Partiya me jî hene. Ya rastî qadro şandine Libnanê. Dihat gotin ku; "dê perwerdeya gerîla bibînin, vegerin." Lê teqez li welat jî hinek amadekarî hene. Jixwe li gelek qadên weke Hîlwan, Sîwerek, Êlih û Mêrdînê berxwedaniyên gel hene. Her roja derbas dibe propagandeya şoreşger a dijber zêdetir û lez berdewam dike. Girtin zêde ne û her kesê tê girtin di televîzyon û rojnameyan de didin nîşan. Hinek jî di tv de didin axaftin. Her amûrî bikar tînin. Weke ku hemû Tirkiye, hemû hemwelatî û hemû dewlet li ber secdeya cuntayêne didin nîşan.

Ji her alî ve diyar dibe ku Cuntayek bi fermana DYE dimeşe. Gelek dewletên emperyal piştewaniya wan dikin. Ji bona ku di qada nav-neteweyî de jî nêrînek 'cunta nerim' û leşkerê rizgarvan' bidin avakirin, hewldanek mezin tê kirin. Li hember vê bertek jî hene.

Bandorên cuntayê yên li girtîgehê jî diyar dibin gelekî cuda ne! Ji hemû girtîgehên leşkerî û girtîgehên sivîl re giştînmaeyên nû şandine. Tiştên weke "her girtî leşkereke!.." Her der bi alên Tirkî xemilandin. Li gorî cuntayê her girtîgehek çîftlîkek bû! Dihat gotin; "dê yek bi yek quralên dîsîplîna leşkerî werin pêkanîn."

Qaşo girtîgeha em lê dimînin, a sivîl e. Lê girtiyên siyasî jî lê hene. Yekser her yek gardiyan bûn weke leşkerekê. Ew jî bandor bûne. Dibe ku hêj tiştek ku di jiyanê de diyar bibe tine ye. Lê tirsa leşkeran belav bûye.

Nivîsên me bi girtîgeha Elezîzê re berdewam dikin. Herî zêde ev ferzkirin li ser girtîgehên leşkerî hene. Yekser derbarê lêgerînên hundir, derxistina hewagirtinê, karên çandî de pêkanînên dîsîplîna leşkerî yên tund dane destpêkirin. Tê gotin ku; "her girtiyek leşekereke.", her hemwelatiyek leşkereke." Ango hemû civak bû leşker! Şovenîzm û nijarperestî har dibe. Hewldana wan ew e, di nava civakê de tirsê belav bike, kûr bike û wisa di nava civakek tirs û xof de bikaribe pêkanên xwe yên tundî hêsan bimeşîne. Pêkanên cunta yên destpêkê hemû plan û hedefên wî hêdî hêdî derdixistin holê. Ew gotina wî ya; "hem li dijî çepê, hem li dijî rastê" cihê xwe girtibû.

Destpêkê komkujiya Mereşê, pey wê re sikiyonetîm û niha jî cunta. Planên wan ên li hemberî me, cewhera hedefa şêwaza tevgera cunta derdixist holê. Girtinên Elezîzê destpêkek bûn. Lê belê, tevî îxanetan, tevî darbe lê dabû, dîsa jî encama ku dixwest negirtibû. Heta rolek wisa ya hişyarkirinê lîstibû û hişt ku Rêbertî beriya cunta bikeve nav liv û tevgerê. Hinek binyata qadro derxistibûn dervî welat. Lê têkoşîn didomiya. Çalakî

zêde dibûn, xwe zêdetir li çolteran bicihkirin, li qadên guncav ceribandina gerîla û hwd di nava van pêvajoyan de dihat jiyîn. Lê dîsa jî girtinên pir giran berdewam dikin. Ev jî windakirina astek qadro ya girîng bû.

Cuntayê hemû armancên xwe yên dij şoreşgeriyê kiribû nav liv û tevgerê. Li Kurdistanê tundî û pêkanên zorî bêsînor tên meşandin. Li Tirkiyê jî muxalefeta şoreşger û demokratîk hêj di destpêkê de perçiqand û bê bandor kir. Di astek neyê hejmartin de şoreşger hatin girtin. Hinek ji wan derketin dervî welat. Ango hênaseya eniya Tirkiyê zû qut bû.

Ez jî di nava bendewariyek nediyar de me. Peywendiya me ya bi derve re jî zû qut bû. Heyder notek zêde kin hiştiye. Di notê de gotiye ku dê ji qadê vekişe, lewma dibe ku heta demekê em bêpeywendî û bê agahî bimînin. Weke din jî tiştekê nabêje.

Ji Fuat wan re jî rojane hinek tişt hatine ferzkirin. Lêgerîn zêde bûne, êdî leşker her heftê dikeve hundir û lêgerînê dike. Hinek beşên pirtûkan tên girtin. Lîsteyên wan hene. Pirtûkên ku di van lîsteyan de tine ne, yekser tên girtin. Lê hêj ferzkirinek pir eşkere tine ye.

Li Elezîzê "rêzdariya li hember alê" anîne rojevê. Heval hemû bi hev re bi lêdanê re derbas kirine. Weke komên li hember alê rêz girtine û negirtine ji hev cuda kirine. Hinek kesên qels hêj di serî de tevlî wan dibin. Her çendî hêj pir cidî nebe jî, ev vebûn ango radestbûn bandor dike. Her kes di panîkê de ye. Derve hinek tiştên din ferz dike. Di nameyan de weke nêrînên ku; "li gorî me pêkanên heyîn rast in" tên nivîsandin. Êdî name jî qut bûn.

Ez hinek tiştên nû ji Ayşe Dişkaya ya ku endama Yekîtiya Gel bû û ji Dîlokê anîbûn hîn bûm. Ew jî dema ji Dîlokê tên û dixwazin biçin çoltera Dêrsimê di deriyê Meletî de şik ji wan dibin û binçav dikin. Di girtinek beriya niha de dema pêvajoya lêpirsînê bi Gonûl Atay re dimîne. Di lêpirsîna Dîlokê de helwesta Gonûl bandor lê kiribû. Digot; "nabe ku ew keç PKK'yî be. Polîsan nêzîkbûnên taybet jê re dikir. Dema êşkence jî dikirin, digotin; "ger hûnê li ber xwe bidin, weke Ayten li ber xwe bidin." Nexwe Ayten cardin binçav kiribûn. Hem jî li Dîlokê. Got; "ji ber li ber xwe dide, wê diberdin." Behsa pêkanên dijmin ên giştî ku li derve jî demeşand dikir. Demek kin mabû, lê ji bona min guhertinek bû. Weke din jî min hinek pêşketin jî bihîstibûn. Ew û hevalê wê yê xort ku bi hev re hatibûn girtin biribûn. Elezîz navend bû. Hemû bajarên girêdayî Fermandariya Kolordu bi wir ve girê dabûn…

Nexwe Gonûl li Dîlokê mabû. Gelo dibe ku Ayşe ser ve zêde kiribe? Lê ji bona Seher heman tişt negotin. Digot; "Gonûl tam ketiyek bû. Li min bibore, lê bi cilên xwe yên şevê ku zêde vekirî ve digeriya. Her wiha dergistiyek wê jî heye. Polîsan her carê pirsa wê dikir. Behsa hinek tiştan kiribû. Îhtîmalek mezin ji bona dergistiyê wê bigirin berdabûn. Lê me rewşa wê nedizaniya. Ew ji wê jina ku hev re hatibûn girtin jî cuda kiribûn. Ango taybet bû." Dîyar bû zêde bandor bibû. Ma Elîf jî em wisa aciz nekiribûn? Dema min cara yekem Gonûl li Tuzluçayirê dît, nêrînek erênî bi min re jî ava nekiribû. Sekn û nêzîkbûnên wê nekamil bûn. Lê gelo dikariya zerarê bide? Ma kî dizane, dibe ku dijmin ji bona ku Riza bigire, bixwaze wê bikar bîne. Ji ber wê jî gotiye; "ez hatime dergistiyê xwe

bigerim û bibînim.” Dibe ku ji bona polîsan ser çavên xwe bavêje wisa gotibe, lê dîsa jî dê dijmin bixwaze wê bikar bîne.

Ez beriya niha jî hesas û hişyar bûm. Lê piştî ku min dijmin ji nêz ve nas kir, hişyarî û şikên min zêdetir dibin. Gelo mijara hîskirinê jî bi vê ve girêdayî ye?

Belê, ji min re gotin; “ xwe amade bike tu diçî.” Destpêka Adar’ê ye. Li avahiya îdarê ekîba Elezîzê ez girtim. Hemû polîsên sivîl bûn. Ez bi polîsekî ve kelepçe kirim. Ez li dijî vê derketim. Gotin; “tevdîrek ji bona ewlekariyê ye. Ev ferman e. Dibe ku tu birevî.” Min jî got; “ma ewqas cureyên ewlekariyê yên hûn digirin têrê nakin? Ger hûn evqasî ditirsin, fermo bigire.” Em di maşînê de li kêleka hev rûniştin. Ez neçar im ku milê xwe her tim li jor bigirim. Ez naxwazim destê wî yê qirêj li min bikeve. Ew aciz bû. Piştî demekê destê me her duyan jî werimîn. Neçar ma veke.

Celalettîn Can jî li maşînê siwar kirin. Hêj ew ne anîbûn di navbera xwe de behs dikirin ku; “berpirsê Rojhilat Celalettîn Can e.” Traş bûye û cilên wî paqij in. Beriya yek du rojan dayîka wî bi xizmek min re hatibû serdana min. Ez wê demê hîn bûm. Cilên paqij jî wî re anîbûn. Yek du caran li paş xwe vegeriyam û min lê nêrî. Dema min lê temaşe kir, min bi çavên xwe got; “merheba.” Bê dilê min bû. Ji ber ew derxistibûn tv. Li ser tv dihat gotin; “ji lîderên Dev-Sol’ê îtîrafên mezin.” Behsa hinek tiştan kiribû. Lê dijmin jî zêde xirab bikar danî. Derketina televîzyonê bi serê xwe sucek bû. Ji ber bandorek neyênî li girseyan dikir.

Polîsan jî di maşînê de qaşo dê min bandor bikin, dixwestin ez baş nas bikim. Pê re di-axivîn jê re digotin; “tu berpirsê Rojhilat bû. Te digot ‘yek rê heye, ew jî şoreş e’. Na, êdî tiştek wisa tine ye ne wisa? Ger tu derkevî dê tu biçî li Ewrûpa bijî, ne wisa? Dixwestin van bi wî jî bidin erêkirin. Jixwe hemû derdên wan jî ew bûn. Dema Celalettîn jî awirek ku erê dike li wan nêrî, min jî awirek da wî. Polîs yekser got; “xêre, çiye? Ne li kêfa te bû, ma tu nas dikî?” Min jî got; “na, nas nakim.” Wî jî got; “jixwe nasîn, an jî ne-nasîna te negirîng e. Lê belê…” û gotina xwe wisa hişt. Ew jî aciz bû. Lê helwesta min jî bandor kir. Hebûna min a li wir, ew ji ber qelsiyên wî dida şermê. Mirov pir hêsan ev fêm dikir.

Ez hizirîm ku emê biçin 1800 evler’an, lewma min xwe amade kir. Ji ber ku dema min pirsî; “hûn min dibin ku derê?” Gotin; “te eleqeder nake.” Gumanên min hebûn ku hinek girtinên nû hebûn. An jî doza firarê dewrî sikiyonetimê kiribûn. Ev rewş jî bi belgeyeke nivîskî ji Zohre re şandibûn. Hêj biryara wê nehatibû dayîn. Dibe ku ji bona pere nedabin, doz jî dirêj kiribe.

Celalettîn jî girtin lêpirsîna 1800 evler’an. Ez jî yekser derbasî girtîgeha Elezîzê kirim. Her kes xwe amade dike. Ji ber qelebalixe em zêde nikarin bi-axivin. Ez, Hamilî, Hisên, Mistefa û Meto li cem hev in. Ji derve de nivîsek weke; “hinek tişt dikare were qebûlkirin, lê tiştên weke ramûsandina alê nabe” nirxandinek hatibû şandin. Jixwe ji bona wê nivîsê hinek kes di êrîşa destpêkê de lewaziyên xwe didin der. Li şûna ku armanca tiştên ku tên ferzkirin rast werin têgihiştin û li gorî wê helwestek berxwedaniya rast were pêşxistin, di nava quralên

dijmin de, vebijêrkên weke yên herî erzan û sivik ku teslîmiyetê rave dikin û nêzîkbûnên ku wî ruhî pêş dixin derdikevin holê. Lê helwesta hevalan a giştî nexirab bû. Komên din jî ew bi tenê hiştibûn. Ên li ber xwe didan bi zanebûn cudabûnek qaşo di bin navê, 'komên xeter in' an jî 'kêm xeter in' didan raberkirin. Dîsa hewl didan faşîstan bidin cem wan. Polîtîkaya 'têkilhev bike û lihev bîne' di vê pêvajoyê de zêde dihat ferzkirin.

Me got; "mîsoger, cihê ku em biçinê, emê quralan qebûl nekin. Heval li wir çi dikin, emê jî wê pêk bînin." Biryara me ya herî dawî ev bû. Em 75 kes bi hev re bi otobûsan ji bona çûna Amedê ji rêwitiyê re xwe amade dikin.

Em vê carê girtî diçûn Amedê, ku me civîna partiyê ya yekemîn lê lidarxistî...

Her cara liqay Şahîn dihatim, min îsyan dikir. Bi înada li dijî wî hemû aliyên min ên asî-şoreşgerî radibûn serhildanê. Ji awir heta her gotinek min nefret dibariya. Ji ber kîna min a li hember wî ez di-axivîm û awirên min tûj dibûn. Min dixwest bi gotinekê jî be li wî bixim. Kêfa min dihat ku wî biçûk bixim. Zewq jê digirim. Bi her tiştê xwe ve 'hilîherameke (mundar).' Ji mirovbûnê derketiye, di asta herî jêr de ya biçûkbûn û ketîbûnê dijî. Awirên xwe yên tirsonek û bi guman ji me vedişêre. Ti wateya wî nîne ku hêj li ser xwe ye, an jî dijî. Leşker jî wî biçûk dibînin. Bi şêweyek ku bibîhîse min jê re got; "bê namûs, ketiyo." Ew ji tirsa ji ber leşkeran jê re gotiye; "bi kesî re ne-axive" nikare tiştekê jî bêje.

Sitvan (Yûzbaşi) lîsteyek di destê wî de û bi endamtiyek leşkerî ve hat. Lê ew jî tirs û bê aramiya xwe vedişêre û bi qîr lîstê dixwîne. Şahîn Donmez di serê lîstê de ye. Leşker dibêjin; "derbasî wir bibe. Zû bike. Rast bisekine. Tu leşker î. Li derdora xwe temaşe neke." Paşê xwendina lîsteyê bi navê Elî Gûndûz, Hamilî, Sakîne, Mistefa û hwd….. berdewam kir. Heftî û pênc kes in. Li gorî rêza navan dê du rêz were rûniştin. Dê leşker jî di navberê de rûnin. Ferman da leşkeran got; "weke min diyar kiriye rêk û pêk bike." Em li ser pişta hev siwar kirin. Şahîn û Elî li ser kursiyekê rûniştin. Di navbera wan de jî leşker heye. Elîf anîn cem min. Xwedêyo, ma ez ji vê Elîfê xilas nabim? Ji ber wext nebû, ez neçûm beşa jinan. Yildiz û Qedriye wan jî hatibûn girtin. Haya min ji rewşa Elîf a dawî nebû. Lê zêde jî bawer nakim ku were guhertin.

Di rê de şîrove dihatin kirin. Dihat gotin; "gelo me dibin kîjan girtîgehê?" Girtîgehek ku nû hatiye çêkirin heye. Heval bi gelemperî li girtîgeha hinekê ji hev dûr, jê re 'îstîhkam' tê gotin, ku girêdayî leşkeriyê ye dimînin. Her wiha li Amedê girtîgeha sivîl jî heye. Lê derbarê wê de zêde nayê axaftin. Dibe ku cara yekê ye wisa her kes li cem hev e. Lê bi tena xwe dihizirî. Gelo ji ber rewşa rêwîtiyê bû? Gelo bêdengiyek ji ber çûna qadek nû bû? Na, ya rastî hêmanên ku hevbeş bandor li her kesî dikir heman tişt bûn. Sedemên wisa pir ji hev cuda nebûn. Ya yekemîn, girtîgeha em biçinê ji aliyê dijmin ve baş hatiye amadekirin, girtîgehek leşkerî bû. Ya duyem jî, hinek hevalên ku me nas dikirin hebûn. Dê mîsoger ew jî li gertîgeha em biçinê bin.

Ji bilî Şahîn her kesî derbarê rewşa xwe de rapor dabû partiyê. Rewşa Elî û Riza hinek din cuda bû. Riza di tecrîdê de

bû. Jixwe nedikariya ku xwe veşêre. Dibe ku, di hinek mijaran de guman jiyabe, hinek jî rewşa wî subjektîf binirxînin. Lê dîsa qada her kesî ya xebatê û kêm-zêde xisletên wan dihatin zanîn. Lewma tiştek ku neyê fêmkirin tine bû.

Nêrîna wî ya di derbarê zindanê de jî girîng bû. Zindan çibû, polîtîkayên dijmin çawa pêk dihatin û dê çi bûna? Ji ber li ser van mijaran bi kûranî nedihizirîn. Weke din jî nêzîkbûnek teng, tenê bandora nêzîkbûnên di çarçoveya Elezîzê de hebûn. Kesên ku nirxandinên weke, " ger dadgeh vebin, dibe ku ez derkevim" an jî "cezayê min diyar bibe, ezê li gorî wê tevbigerim" dikirin jî nekêm bûn. Ya rastî her kesî dizaniya ku rêbaza êrîşên dijmin bi cuntayê re hatine guhertin. Hinek êrîşên rasterast, li dijî kesan û zêde ferzkirî jî çêbûn. Tenê ev di wateya giştî de dida diyarkirin ku, emê têkildarî dijmin bi rastiyên çawa re rû bi rû bimînin. Lewma di vê manê de ti heval pir erênî ne dihizirî. Lê hêj xisleta cunta, armanca hatina wê, asta êrîşên li dijî tevgerên şoreşger, asta zindanê tam nedihat fêmkirin. Her çendî hinek nirxandin û şîrove hatin kirin, armancên bingehîn ên êrîşan a zelal, tiştên ku dijmin dem dirêj bike, di van mijaran de li hember vê helwestên me yên dem kin û dem dirêj dê çibin, polîtîkayek me ya di asta helwesta ramanî de zelal û çarçove destnîşan kirî tine bû. Tenê armanca "Emê li ber xwe bidin, emê qebûl nekin. Jixwe armanca dijmin têkbirin, tenê hiştin, girêdanên me yên bi derve re qutkirin û ji lewaziyên me sûd wergirtine." Em li ser van di-axivîn. Em jî bi şêwazê ku fêm dikin ji hev re dibêjin. Dîsa jî kesî/ê nedixwest ku tiştên werin jiyîn û pê re rû bi rû were bikole. Di vê manê de bêdengiya kesên ku bêdeng dinirxand, ne ji xêrê bû. Bi her kesî re guman ava dibûn.

Tevî vê erênî dinirxînim û baweriya min heye. Ev jî baweriya min a li hember partî û nûnertiya wê ye. Her çendî di asta kesan de teke tek hinek îxanet, lewazî, heta nêzîkbûnên neyênî yên mezin jî hebin, bawerî heye ku dê berjewendiya partî-rêxistin û baweriya li hem ber bîrdoziya wê mîsoger biserkeve û hemû lîstokên dijmin werin valaderxistin. Nêzîkbûnên neyênî, binkeftinên teke tek û heta bûyerên di asta îxanetê de, ti caran qinyat û baweriya bi min re heyî nehejand û ne jî dihejand. Min kêliyekê jî ev jiyan nekir. Bandora bûyerên bi vî rengî, xirabiya moralê ku ava dikin, li dijî wan hêza li ber xwe danê raber nekirin, tevî nûnertiya heyî, baweriya min a hêza jiyanê dida min her tim li ser piyan û serwer bû. Ji ber ev rewş gelekî girîng bû. Min her tim ev aliyê ku zindî dima hez kir û pê ve hatim girêdan.

Dema em bi otobûsan ketin nava Amedê, aliyek wê şevnivîş (gecekondu) tanîn bîra mirov, aliyê din dawiya araziyê vala, avahiyên weke pîramîtan li ser hev bilind, kêleka hev gelek şibakeyên wan hene, banê wan hene hatine rêzkirin. Ev avahî ji derve de weke yek parçeyekê xwiya dikin. Ji wan kargehên ku beriya niha min li Îzmîrê dîtine jî derbas dikirin û mezin bûn. Gelo ji ber rika li dijî bircên Amedê, bircên hundirê zindanê hatibûn çêkirin? Deriyên mezin ên hesin lez hatin vekirin. Di hundir de karker hene, dîsa hinek wesayît, cîp û taksiyên reş ên leşkerî ku wesayîtên girtî yên mezbaha tînin bîra mirov hene.

Destpêkê hat gotin; “bila her kes çente û valîzê xwe bigire.” Paşê devjêberdan, di derî de fermanek dan; “dê wan pişt re bînin.” Her kes dorê daket. Gotin; “bila jin derbas

bibin.” Ketina derî de kargeriyên hewce hatin kirin. Zêde formalîte ye. Hinek rayedarên carê li holê digerin hene. Leşker û rayedarên jêr amade bûn. Em bi deriyek din re derbas kirin û dan rawestandin. Cihek weke binê merdîwenê ye. Em temamiya korîdorek dirêj dibînin. Her piştî pênc-deh metreyan deriyek derabeyên hesin heye. Di korîdora herî dirêj de leşker li çep û rastê rêz bûne. Lingê xwe nîvî vekirine, destê wan li pişt wan e. Kesên cop û kuçik di destên wan de jî hene. Hemû jî girsin û cilên wan komando ne. Dîtina destpêkê jî têrê dike, ji ber hemû weke heywanên hov ên li benda nêçîra xwe ne. Her tişt dihat fêmkirin. Heval jî du-du derbas dibin. Bes ji nişka ve dengê copan, qêrîn û kuçikan hat. Dema di navbera her du rêza leşkeran re derbas dibin, çep û rast li wan didin. Hêj di lêdana rêza yekem de heval diketin erdê. Dîsa fermanên weke; “zû xwe tazî bike, pala xwe bide dîwar” re, her kes bi zorê tazî dikirin. Her tişt di carekê de pêk hat. Ewqas kes bi hev re di demek kin de, bi pêşwazîkirinek vî rengî ve li korîdorê civiyabûn. Haya min jî tine bû ku kengê derbas bibûn.

Min lingên xwe li erdê dida û ji wan re digot; “ketîno!” Diyar bû, dixwestin me bitirsînin. Xwezî bihatan li min jî bidan. Min li Elifê temaşe kir. Lêvên wê spî û ziwa bûne, rûyê wê mat bûye, birhên wê tam tewiyayî ne, lê di çavên wê de tirs û xof heye.

Ji nişka ve yek hat kêleka me. Gelo ji kur hatibû û rûtbeya wî çi bû? Çi gavek ecêb avêtibû. Çi sûratek wî hebû. Qelleşek bû, xwîn ji çavên wî dibarî! Rûyê wî û devê wî weke ku xemla xwe ji êşkenceyê girtiye qîr didan. Mîsoger ne kenê mirovan, ne rûyê mirovan û ne-awirên mirovan bûn. Dibe ku ew rûyê bi

hinek kesan re destpêkê mirov bixapîne. Lewma mirov ji xwe re dibêje; “gelo kesayetek çawa dikare di bin vî rûyî de, evqasî êşkencekar be?” Lê mixabin na, ev cure mexlûq (yaratik) di kêliya destpêkê de rastiya xwe dide dest. Diyar e di vî karî de baş e. Li pêşberî min rawestiya ye û pirsa yekem kir; “navê te çiye?” Min jî got; “Sakîne ye.” “ma tu Tirkî?” “Na, ez Kurd im.” Şeqamek tund li min da. Hem ez ji ber rêwîtiya min kirî pir westiya bûm, hem jî tiştên di wê kêliyê de hatin jiyîn û wê şeqamê, hişt ku çavên min tarî bibin. Lewma min got; “xêre, hûn çi dikin?” Paşê bi ser Elîf de çû û pirsî; “navê te çiye?” Wê jî got; “Elîf e.” Dema Elîf li hember pirsa ku hat kirin; “ma tu Tirkî?” Got; “belê Tirk im”, kesê êşkencekar bi ketîbûnek mezin ve keniya û got; “bijî ji te re.”

Belê, pir baş dihat fêmkirin. Nasîna bi Esad Oktay Yildiran re ya destpêkê bû! Ez bawerim kes naxwaze şeqamê ji dijminê xwe bixwe. Lê kêm jî be êşa hevalan a di dilê min de kêm bibû. hêj bi wan ve mijûl dibûn. Esad di kêliyekê de gihiştibû wir. Rewşa ku min dît ji her tiştî xirabtir bû. Gelek ji wan tazî, tenê derpî li ser wan maye. Hinek jî hêj li erdê ne û li ber xwe didin. Dengê qêrîn û nalînên ji ber êşkenceyan derdikevin her derî dihejînin. Di vê navberê de Elîf jî şikestiye, serê xwe tewandiye ber xwe, wê fermana ‘li xwe vegere’ pêk ani. Ji ber min nedixwest hevalan di wî halî de bibînim, li kêlekê sekinîme. Rayedarek din hat. Got; “zû çenteyê xwe bigirin û bikevin pey min. Li wî alî temaşe nekin. Serê xwe bitewînîn.” Bi bazdanê em dan meşandin. Lê tişta wî digot jî ne li xema min bû. Hêj hem li hevalan dixin û hem wan tazî dikin. Mirov nizane kîjan heval e. Zehmete ku mirov lê derxe. Jixwe ne di

wî halî de ne ku, mirov bikare li wan binêre. Leşker kom bi kom li ser serê wan sekinîne û li wan dixin.

Korîdor, di nava korîdorê de ye. Korîdorek zirav û dirêje û li her du aliyên wê jî mazgalên ji hesin hene. Gotin; "emê li valîzan bigerin." Serbazekê got; "emê ser we jî bigerin." Min li dijî vê bertekek tund raber kir. Got; "na, ma erkdarên we yên jin tine ne? Hûn nedikarin li ser me û ne jî li nav tiştan bigerin." Leşkerekê got; "wê çaxê de ka çakêtên xwe rakin, da ku bizanim ma li ser we tiştek heye an na?" Ango dê mîsoger weke xwe bike. Min dîsa jî got; "na, tiştek tine ye." Min kêlekên çakêt rakirin. Elîf çakêta xwe derxist û li valîza wê geriyan. Lê min ber xwe da. Cardin gotin; "ferman e. Emê lê bigerin." Dema min vê carê jî got; "biçin, kî ferman daye, bila ew were. Ezê ji wî re bêjim ku divê erkdarek jin were." Yekser got; "temam, ezê ji jor re bêjim." Diyar e, naxwaze ku jorî wî jî vî bêkêriya wî bihese. Di panîkê de ne. Di nêvenga êşkencekaran de hemû jî, parçeyek wê jiyanê û amûrek ji wê rastiyê ne. Dibe ku hinek ji wan cara yekê ye li navendek wisa leşkeriyê dikin. Her çendî kesayetên faşîst ên ciwan û bijarene û bi taybet hatine perwerdekirin, di nava wan de hinek leşkerên hêsan ku mirov dikare bikar bîne hene. Jixwe pergala artêşa Tirkan bi xwe jî di nava xwe de li ser bingehek zorê xwe birêxistin kiriye. Pergala leşkertiyê bi çanda nijadî, şoven û faşîstî ve tê meşandin. Mantik û hizir tê qedexekirin. Hema bêje pergala tê ferzkirin her leşkerî di nava xwe de dihêre.

Piştî demek kin Esad cardin hat. Got; “ez li serê wan çiyayên Dêrsimê, li wan çiyayên di xweşikbûnek har dike de zêde li te geriyam. Niha jî tu di destê min de yî. Tu li Dêrsimê bûyî ne wisa?” Min jî got; “na, ez li Elezîzê hatim girtin.”

Got; “li vir quralên min derbas dibin. Her kesê ku vî derî re derbas dibe neçar e pêk bîne. Her kes Tirk e. UKO ye, Kurd e, nizanim çiye, êdî ew tine ne. Ne wisa Elîf? Tu jî Tirk î ne wisa.” Wê jî bersiv da; “belê Tirk im.” Esad carek din bi kenê xwe yê ketî ve, li paş xwe zivirî. Çend gavên lez avêt, paşê dîsa vegeriya. Bi copê li nav destê xwe dide. Ji leşker re got; “Elîf bibe jorê, da ku polîsa jin lê bigere.” Jinek polîs, zerik, derve li ber derî sekiniye, destê wê li ser sitûyê wê ye, serê wê nivî tewandiye, bêdeng sekiniye. Dema gotina Esad ya ‘polîsa jin’ bihîst veciniqî, yekser xwe rast kir.

Esad ji nişka ve paş xwe vegeriya û şeqamek li min da, dîsa got; “ma tu Tirk î?” Min dîsa got; “na. Ez berî her tiştî şoreşger im. Di şoreşgeriyê de cidabûna millet negirîng e. Lê ez Kurd im. Bêguman ger ez Tirk bûma, wê bigota ez Tirk im.” Vê carê jî cidî bû û got; “wey wey wey! Na, ezê carek din peyva Kurdiniyê nebihîsim. Zû vê bibin, dirêj bikin.” Leşkeran ez dirêj kirim, wî bi xwe falaka girê da. Min copên destpêkê di hundirê xwe yek, du… panzdeh…. Bîst hejmartin. Wisa dirêj hêj berdwam dike. Pişt re ji ranê min ber bi jor ve, heta kemaxên min li min da… Êdî nizanim çiqas li min dide, nikarim bijmêrim.

Carekê hêdîka, weke ku dengek ji kûr ve hat min got; “gelo miriye?” Esad pêlûyên (kapak) çavên min rakir got; “na, na nemiriye.” Ez jî bawerim tenê kêliyekê ser hişê xwe çûm.

Dema Esad li min dida polîsa jin pişta xwe dabû me. Dîsa destên wê li ser sitûyê wê bûn. Ecêb polîsa jin nekarîbû li me temaşe bike. Ev jî ji ber çavên min neçû. Dema leşker jî lingê min digirt, radikir rûyê xwe dizivirand. Nedixwest lêdana copan bibîne. Heta weke ku ew lêdanê dixwe, rûyê xwe diqermiçand.

Divê mirov pişt falakayê bimeşe. Dihat gotin ku xeter e, dibe ku mirov kangren be. Hêj di hişê min de ye. Lê ji ber laşê min pûç bûye, ez nikarim bê alîkarî bimeşim. Polîsa jin ez girtim. Hinekê hatim û çûm. Di wê kêliyê de hinek deng ji cihê hewagirtinê hat. Dengê Esad bû. Pişt re dengek lewaz ê komî hat. Dengên weke "Tirk im, rast im, jêhatî me…" bi qelsî derdiketin. Dengê jina bû. Gelo ji bilî me hinek kesên din hatibûn? An jî hinek ji berê ve hatibûn girtin hebûn. Min tam nedizaniya, lê diyar bû dengê girtiyên jin bû. Ez pê hesiyabûm ku Aysel dema Mazluman de hatibû girtin. Gelo weke din dibe kî bin?

Ev jî pêşwaziya duyem û ya esasî bû. Ya yekem şeqam, ya duyem jî falaka bû. Weke din çi maye? Weke din aski, elektirîk, tazîkirin û destavêtin maye… Dema Esad cop li min dida digot; "ger tu nebêjî Tirk im, ezê vê copê rûn bikim û bixim te de." Ev jî netenê bi armanca gefan digot. Wê demê evder negirtigeh bû. Ez jî hewl didim fêm bikim. Tirkbûnê ferz dike. Dibêje, "tenê bêje Tirk im. Temam her tişt xilas dibe." Ez mîsoger dizanim armanca wî ne tenê peyva 'Tirk im' bide gotine. Li Elezîzê jî 'li hember alê rêzdarî û ramûsandina alê' hatibû ferzkirin. Xwestibûn niyazan bidin xwendin. Niha li vir jî 'Tirk im' didan gotin. Armanca wan yek bû. Çima nedigotin;

“ma tu şoreşger î? An jî ma tu ji UKO'yî yî?” Ji ber gelek kesan peywendiya xwe ya bi rêxistinê re qebûl nedikir. Çima tenê peyva ‘Tirk im’ dihat ferzkirin. Di rastiyê de hewl didan ji wir dest bi şikandina kesayeta me bikin. Ev jî plana wan a Kurdbûnê, PKK’bûnê û nirxên şoreşgerî ji qonaxekê destpê bikin û di kesayeta me de xilas bikin bû. Nû dest bi pêkanîna vê planê kiribûn. Girtin, operasyon, di bin çavan de ferzkirina îxanetê, şikandina berxwedanî, avakirina zindanan û niha jî zindana qada pîlot!

Gelo dengê beriya niha yê kê bû? Jixwe Elîfê gotibû ku nedengê yek kesî tenê ye. Gelo beriya niha heval li vir hebûn. Ger piştî me hatibin, ji kur hatine? Ev deng van pirsan tînin bîra mirov.

Dema min kêliyekê di şibakê re li derve nêrî, li şibaka miqabil hinek jinan dizîve li me temaşe dikir. Min ew dîtin. Nexwe li qata jorê hinek girtiyên jin hebûn. Mîsoger niha Elîf ji wan re gotiye ku ez li jêrê me.

Piştî ku min her der hinekê guhdar kir, min qetek şibakê hinekê vekir, min hinek jinên din ku di şibaka qata jorê de çavdêriya cihê ez dimînim dikin dîtin. Dema wan jî ez dîtim, hinek din rehet temaşe kirin. Me silav da hev. Yek ji wan zêdetir xwe da pêş. Min ew şiband yeke nas. Lê min dernexist kiye. Got; “ez Aysel im.” Her du destên xwe dabû ber devê xwe digot. Nedixwest derdor dengê wê bibihîse. Belê, Aysel Oztûrk bû. Em herî dawî li Çewlikê li mala Zekî bi hev re axivîbûn. Dema ez ji Elezîzê yekem car (bû cara dawî jî) derbasî Çewlikê bûm, me hev dît. Abdullah Ekîncî di girtîgehê de bû. Ez çûbûm serdana wî. Bi demancê ve hatibû girtin. Me

jî hewl dida em wî bi kefaletê bidin berdan. Em jî li mala Zekî liqay Aysel û Selîm hatin. Wan mala Elî Gûngor a em berê lê diman ji xwe re girtibûn. Ji min re gotibûn; "were mala me ya burjuvaziya biçûk, bibe mêvana me." Ez ji bona demek kin çûbûm wir. Aysel nerehet bû. Dida diyarkirin ku derbarê jiyana wan de hinek rexne û gotinên cur be cur pêş ketine. Ji wan re dibêjin ku jiyan û zewacek burjuvaziya biçûk e. Min jî ji wê re got; "ger ev rexne tenê ji bona tiştên malê hatine kirin, ne girîng in. Ev mal ne ya we her duyane. Mala rêxistinê ye. Lê belê, ger hûn zewaca xwe didin pêşiya karên rêxistinî, ger di vê mijarê de kêmasî hene, divê hûn baldar nêz bibin." Hinekê jî behsa Nurheyat kir. Dibêje ku bangî wê kirine, xwestine hinek tiştan ji devê wê bigirin û xwestine peywendiya Nurheyat a bi Mehmet Turan re fêm bikin ku, di çi astê de ye. Li hember Mehmet Turan guman hebûn. Derheqê wî de dihat gotin ku, sîxûr e. Dema Nurheyat li Agirî kar dike, dikeve bin bandora wî. Ji hêla hestiyarî ve pê ve hatiye girêdan. Ne di ferqê de bû. An jî ew jî ji hêla wî ve hatiye xistin. Ango şîroveyên bi vî rengî dihatin kirin.

Aysel jî piştre li ser riya Rihayê tê girtin. Bi Yildirim Merkît, hevalê Mazlum Doxan û şofor re tê girtin. Nexwe ji Çewlikê derketiye. Ew jî zû hatibû girtin.

Bi îşaretan diyar kir ku dê not binivisîne. Şev jî ber bi jêr ve daxin. Hedara min nayê. Di wê navberê de jî hatin bi copan li min xistin û çûn. Leşker mereq dikin. Her carê hinek leşkerên din tên. Lê leşkerê bi navê Bahattîn bejin dirêj, leşkerek bê cop bû. Gardiyanê esasî ye.

Bi gelemperî ji girtîgehê dengên ecêb tên. Dengên sirûdan, sirûdên ku leşker di werzîşa sibehê bazdanê de diqîrin tên gotin. Nizanim "serê çiyan mijê girtiye… de em bimeşin hevalno…", sirûda îstîklalê, Behra Reş li ber xwe dide (Çırpınırdı Karadeniz) û hwd. Her carê di astên cuda de tên gotin. Carê dengê copan jî tê. Dîsa dengên di astên qîran de jî diyar dibin. Ji ber qeta jêrê ye, dengê ji hemû korîdoran tê dikişne xwe. Dengên derve jî her çendî baş neyên fêmkirin jî mirov dibihîse.

Şev hinekan hêdîka li boriya kalorîferê dan. Min jî bersiva wan da. Ez şibakê jî kêmekê vekirî dihêlim. Poşetek bi ben ve girêdayî daxistin jêrê. Min poşet girt. Cardin ben kişandin. Di poşetê de hinek tiştên xwarinê hene. Min destpêkê not vekir û xwend. Nivîsandiye:

"Ev demek bû em heft heval li cihê ku tu lê dima bûn. Em îro derketin jorê. Bi gelemperî hinek qural ji hêla taktîkî ve hatin qebûlkirin. Di qoxuşên din de jî qural hatine qebûlkirin. Tu jî qurala 'ez Tirk im' qebûl bike û derkeve. Emê pişt re berfireh bi-axivin silav. Aysel."

Min jî dijûn kirin. Bila xwedê bela xwe bide we. Ma çima biryar evqasî zû hat guhertin? Kanî wê me qural qebul nekiribûna? Ev taktîk jî ji kur derket? Ev cihek çawa bû? Min bi pênûsa hatî şandin ve notek nivîsand. Min li beşa vala a nota hatî nivîsand:

"Min tiştek ji nota we fêm nekir. Ma çawa dibe. Dema ez hatim me bi hev re biryar girt. Wê qural nehatiban qebûlkirin. Ma ev dîn bûne? Behsa taktîkê dikin. Taktîka esasî ev zilam dikin. Ma gelemperiya hevalan qural qebûl kirine? Ma ev fermaneke? Ez dixwazim hîn bibim. Li benda bersivê me."

Vê carê jî min li boriya kalorîferê da. Ben dirêj kirin. Min di wê kêliyê de jî ji bona xwarinê hinek tişt girt destê xwe. Yê din jî ji wan re paşve bi notê re şand. Baldar nêz dibim ku li derdor tiştek nemîne. Bila peywendiya me neyê ferqkirin. Nexwe dê asteng bikin. Cardin not hat. Dibêje; "gişti qebûl kiriye. Me wisa agahî girt. Dema tu derkevî emê berfirehtir bi-axivin." Weke din hinek tiştên din gotine.

Wê rojê heta dibehê serê min tevlîhev bû. Parçeyek betaniyê heye. Hewa sar e. Em nû ketine meha Adar'ê.

Çawa dibe ku mirov quralan bi taktîk qebûl bike! Ma pirsgirêka me ne ew e em bêjin ku, "em Tirk in", ne qebûlkirina vê ye jî. Ji ber nediyare ku dê pey re çi were. Bi taybet li girtîgeha leşkerî, bi Cuntayê re zext û êşkenceyê destpê kiribû. Ev jî piştî meha Mijdarê zêde bibûn. Li Elezîzê al, jêkirina por, rih û pêkanîna niyazan ketibû rojevê. Wext teng bû, me zêde li ser van jî nîqaş nekiribû. Evder jî girtîgehek nû bû. Beriya niha kî li vir bûne, em wê jî zelal nizanin. Ez bawer nakim ku heval bi serê xwe quralan qebûl bikin. Jixwe acizbûna min ne li hember Aysel wan bû. Weke helwest û biryara wan jî nanirxînim. Dema behsa hevalan dikim, her tim dihizirim ku hevalên berpirsyarê giştî hene. Ger hinek hevalên din ne anibin, tenê hevalên ku ji Elezîzê hatibûn. Kî hevalê dibe ku biryarê bide, acizbûna min ji wî re ye.

Ez biguman nêz nabim, bi qasî misqalekê jî guman bi min re tine ye. Nêzîkbûnek bi niyeteka baş hatiye kirine. Evder zindan bû. Mirov nikare biryarên îradeya hevbeş rave bike her kêliyê li vir bigire. Divê tiştek wisa neyê hêvîkirin jî. Ma şert û mercên vê hebûn? Gelo agahî çawa dihatin? Ez jî zêde li ser

van nahizirim. Teqez pêwendiyek heye. Belê, di vir de tişta herî girîng rola kes e. Neçar e ku weke rêxistinekê tevbigere. Divê li ser mijarên weke gelo polîtîkayên dijmin çine, quralên ku ferz dike heta kuderê diçe û wê rê ji çi re vekin bihizire? Ma helwesta me ne ya berxwedaniyê bû? Ne tenê navendên lêpirsînê, cihên lêpirsînê bûn. Êdî girtîgehê jî ev rol pêk danîn. Hêj di hevdîtina destpêkê ya bi Esad re got; "te Celal Aydin kuşt ne wisa?" Di heman demê de li cem Elîf ev tişt got. Nexwe dizaniya ku Celal Aydin hatiye cezakirin. Saziyên dijmin ji hev ne cuda bûn û bê agahiya hev kar nedimeşandin. Ez jî rojê li gorî hinek wextan bi şibakê re temaşe dikim. Ji hundir de kes temaşe nake. Tenê leşker hene. Êdî pir kêm tên cem min jî.

Ji ber min nota hatî weke fermanekê fêm dikir, gumanên min çênedibûn ku dibe nêrîna kesekê, yan jî hinekan be, her tişt tevlîhev dibû. Ber ez piçekê fêm bikim ku wê biryarek dijî helwesta rêxistinê be, qet nabe pirsgirêk. Ev jî dikariya bi tena xwe jî min bi mehan, salan jî di hucreyê de bihêlin, ezê li dijî wan quralan derkevim. Ez dikarim berxwedaniya xwe berdewam bikim. Qet nebe wê heta agahiyek saxlem, bibawer û rêxistinî were wisa berdewam bike. Baweriya min bi Aysel jî heye. Ger min nas nekirbûya wê gumanên min pêş biketan.

Ji derdûr jî dengê sirûdan tê. Her tişt bi dengê copan û êşkenceyê ve têkilhev dibe. Wê demê divê ez çi bikim? Heta ku dijmin neyê, ew bi xwe tiştek nû nebêje, ferz neke, min ji leşker re got; "bangî berpirsê jorî xwe bike." Wî jî got; "ma evder kudere? Li vir ne tişta ku tu dibêjî, tişta ku em dixwazin pêk tê." Baş e. Çûna leşker jî baş bû. Qet nebe wê hinek din jî

wext derbas bibe. Dema ez hatîm ew gotina Esad ya pirsî; “ma tu Tirkî?” Min jî bersiva; “na ez Kurd im” dabû. Pişt re jî dema êşkence kirî jî pirsî, min heman bersiv dabûyê. Niha çiqas komîk bû ku ez bêjim; “temam were. Ez Tirk im.” Diyar e ku wê kêfa dijmin ji vê tiştê re bê. Bes wê mat jî bimîne. Êdî çi bifikire ne xeme. Divê ez derkevim û tiştên ku pêş dikevin fêm bikim.

Serbazek hat. Ew jî ji bona nas bike hatibû! Li wir naskirin ‘lêdan’ bû. Leşker ji Esad re dibêje ku cesaret nekiriye li min bixe. Dipirse; “te çima bangî yûzbaşiyê min kiriye?” Min jî got; “min rayedarek xwestiye. Kî dibe bila be ferq nake.” Got; “wê demê ez jî rayedar im. Tu dixwazî çi bêjî?” Min got; “ez dixwazim biçim gel hevalên xwe yên jorê.” Got; “bes em kesekê heta ku quralan qebûl neke dernaxin.” Min jî got; “temam. Hûn dixwazin ez bêjim ku ‘ez Tirk im.’ Hûn jî dizanin ku ez ne Tirk, Kurd im. Jixwe berî her tiştî ez şoreşger im.” Zilam matmayî, weke ku tiştek fêm nekiriye li min dinêre. Gelo ezê bêjim ku, ez Tirk im, an jî wê min li ser bêmantiqiya wî nîqaş bimeşanda? Serê xwe hejand û derket çû. Piştî demekê weke kuçikekê harbûyî, tiliyên xwe jî diqirçand û bi lez Esad hat.

Pirsî; "ma tu dizanî kî li jorê ne?”

Min jî got; “ez dizanim ku hinek girtiyên jin hene. Lê nizanim kî ne û navê wan çi ye.”

Dema got; “te xwestiye tu biçî cem wan. Gelo çima?” bi kînek mezin li min dinêriya. Ji ber zêde neketibû serê wî. Gelo ji bona min şahiyên çawa (!) amade kiribûn.

Ji her halê wî diyar dibû ku bi zewq êşkenceyê dike. Gotibû; “dengê jinê, ji bona min weke dengê mûzîkê ye.” Belê, weke ‘melodiyê’ bû…

Vê carê jî ez hewl didim fêm bikim. Gelo çima Esad, ji ber xwesteka min a çûna jor aciz bibû? Ma nedixwest ku ez quralan pêk bînim?

Got; "were.”Ez derxistim derve, cihê hewagirtinê.

Got; “ma tu Tirk î?

Min jî got; “hûn dizanin ku ez ne Tirk im. Lê hûn dixwazin zorê bi min bidin gotin, hûn dixwazin ez bêjim ‘Tirk im.’ Ti wateya vê tine ye. Ez şoreşger im. Negirîng e ku ez Tirk-Kurd an jî ji miletek din bim.”

Got; “Nabe! Naxwazim tu nîqaş bikî. Ka ma kî bi zorê dide qebûlkirin?

Min dîsa got; “niha min bi xwe xwest werim, lê ji hinga ez hatime heta niha hûn hewl didin zorê bi min bidin gotin.”

Pirsî; “ma tu sonda me dizanî?”

Min jî got; “Na.”

Pirsî; “ma te dibistan nexwendiye? Min jêre got min xwendiye. Cardin dubare got;

“Temam, nexwe ezê bêjim, tu jî dubare bike.”

Min got; “ma ev jî qural e.”

Got; “tişta ez dibêjim dubare bike.” Ya rastî tam wextê wê ye ku ez bêjim, “na, ne ez diçim ti derî û nejî tiştekê dibêjim.” Helwesta herî zêde jî Esad dîn û har dikir ev bû. Xwedê bela xwe bidê. Ma ev berxwedanî bû, yan jî teslîmiyet bû? Dijmin di serî de bi çend peyvan destpê dike, gav bi gav bi te ve tê. Ev

rêbazê şikandina îrade û baweriya mirov in. Hêviya ku kesên ku îro ev gotin, dê sibe hinek tiştên din jî bêje dide dijmin. Rê ji vê re vedikir.

Çend caran sond dubare kir. Ji xwe re didomand. Lê ez nabêjim. Min jê re got; "we destpêkê xwest tenê em bêjim ku em Tirk in. Niha jî hûn tiştên cuda dixwazin." Pişt re ferman da leşker ku min derxe jorê. Ez çûm jorê. Lê moralê min pir xirab e. Dema merdîwenan dihilkişim zehmetiyê dijîm. Hêj ez ne hilkişiyayîm gardiyan giha bû derî. Kesên ez dîtim digotin qey ji ber êşkenceyê nikarim hilkişim jorê. Lê min êşa wan ji mêjve jibîr kiribû, nedihatin bîra min jî. Em zû binkeftin. Hevalan ji vê re digot, "taktîke." Gelo bi rastî jî armanca vê çibû. Hevala çima ev hewce dîtin? Gelo ji bona hêza me parçe nebe ev pêk anîn? Heta hilkişiyam jorê min gelek tişt di serê xwe de birin û anîn.

Aysel, Cahîde, Hawa, Gonûl, Fatma û bi dehan jin hene. Hemûyan ez hemêz kirim. Hinek ji wan jî bi şermok tên cem min. Hinek dayîkên ku temenê wan mezin hene. Ecêb dimînim. Tevî ku hejmar zêde bû, qoxuş bêdeng bû. Dengê wan nedihat jêrê. Çend rojin bêdegniyek kûr heye.

Min jî piştî axaftinên kin ên destpêkê xwe negirt û got; "kî ye? xwedê bela xwe bide wan hevalan. Ma çima wisa kirin? Ma biryarek rêxistinê ya wisa heye an na?" Hevalan got ku, li Elezîzê notek hatiye girtîgehê. Çetîn (Semîr) şandiye.

Gotiye ku, 'hinek tiştan qebûl bikin. me nîqaş kiribû ku ew biryar nerast e. Min ji wan re got; "ka bêjin, ma çawa çêbû?" Aysel destpêkê cixareya xwe pê xist. Keserek kûr kişand. Gonûl jî li pêşiya xwe dinêre.

Fatmayê jî xwe nîvî dirêj kiriye. Ji qelebalixê re gotibû “nexweş im.” Hevalên din jî em bi tenê hiştin. Ez jî hizirîm nexwe di nava jina de her sê berpirsyar in.

Aysel got; “ev hefteyek, deh roj in peywendiya me ya bi hevalan re qut bûye. Carê yên li qoxuşa kêlekê dimînin navbeynkariyê dikin. Li gorî ew dibêjin, hemû girtiyên li zindanêne quralên heyîn qebûl kirine. Koma Elezîzê jî qebûl kiriye. Lê hêj tiştek zelal tine ye. Heval çûne nexweşxaneyê, dibe ku hinek agahiyan bînin. Nêrînên ku di nota me ji te re şandî de hemû yên me bûn.” Fatma jî got; “ez ne amade bûm. Bi navê xwe bi-axive. Ger Sakîne dernektibûya, wê ez jî daketam jêrê. Min xwe amade dikir.” Gonûl jî dest bi axaftinê kir; “Fatma hinekê rast bi-axive. Ger wisa ye, nexwe çima te hinek din berdewam nekir?” Aysel jî bi awirên tûj lê nêrî. Giran girane û sucdar di-axive. Di nava şikestinekê de ye.

Ev heftiyeke em di hucreyê de bûn. Em neh kes bûn. Her tim êşkence li me kirin. Destpêkê em hemû li dijî quralan derketin. Bi rojan êşkence kirin. Leşker dihatin di qoxuşê de dimeşiyan. Şevê jî li vir man. Esad jî ma. Ji leşkeran re digot; “her yek ji we bikevin nav cihekê û raz in.” Êşkence û zextên derûnî bûn sedem ku her kes qebûl bike. Lewma em neh kes man. Piranî hevalên ciwan bûn. Ji Xalfetiyê ne. Bi taybet çend rojên dawiyê zêde êşkence kirin. Esad behsa hatina koma Elezîzê dikir. Digot; “wê Sakîne were.” Aysel digot; “ji bona berxwedaniyê bişkîne û xilas bike di cihê xwe de nedisekinî.”

Ez nikarim xwe. Min got; “belê, wisa kir da ku ez bi tenê bimînim. Ger we rojek din jî li ber xwe bida, emê wê demê cardin yekbûna. Qet nebe wê bi serê xwe biryar nedida. Dê

bandora me li ser hev çêbûya. Hûn çawa dikarin wisa nêz bibin? Ma çima we negot nêrîna me ye?" Dema ez di-axivîm, min weke dîna qîr dida. "ev naşibin ti karî. Ev zilam quralan ferz dikin. Armancên wan hene. Ma ezê niha biçim ji wan re bêjim ku, 'min şaşiyek kiriye'. Na, ez nikarim li vir bimînim. Ez bi tena xwe jî bimînim, ezê li ber xwe bidim." Derdor tev axaftinên me guhdar dike. Kesên ku li ser dîwaneyan rûniştîne û volta digerin bi mereqek mezin li me guhdar dikin. Hem tirsek heye, gumana dibe ku êrîşek nû û êşkenceyek nû pêş bikeve heye. Hem jî, dibe ku hinek tiştên din jî rû bidin, bendewariyek me ya wisa heye.

Dijmin her tiştî sînsî û gav bi gav pêk tîne. Hêdî hêdî bi niyaza xwarinê, hejmar, sondê û bi gotina 'Tirk im' her tişt dabû destpêkirin. Her tişt di demên cuda de, lê di nava hev de, bi şêwazek ku hevûdû temam bike hatibûn pêkanîn. Di nava xortan de por û rihên wan, di nava jinan de jî bi zorê porên wan hatine jêkirin. Pênc-deh komandoyan êrîşî her yeke ji wan dikir. Bi meqesê çep û rast ji hinek cihan porê wan jê dikirin û wisa dihiştin. Yê hinekan jî bi şêweya jêkirina kerê dîmenek didan avakirin. Gûlten digot; "weke ku berxan bibirin. Ketibûn ser wan." Dema behs dikir, ji ber jana di hundirê wê de rûyê wê tirş dibû. Di hinek mijaran de jî ji êşa dikeniya. Her yek ji wan ji aliyekê ve behsa pêşketinên heyî dikin. Aysel bênavber cixareyê dikişîne. Ji bertekên min bandor bûye. Ne di ferqê de bûn, lê di kêliyek ku qet ne li bendê bû, bi şêwazekî, bi notek di bin navê 'biryara rêxistinê' de, hêdî hêdî qural bi min dabûn qebûlkirin. Tişta heyî jî şikestina vê rastiyê bû.

Lê rewşa min, hestên min û giyana min çawa bûn? Bi yek gotinê tirsnak bûn! Tiştek bi êşkence, çewsînerî û lîstokên dijmin pêk nehatibû. Ev jî ji bona dema ez bixwazim rewşa xwe biguherim gelekî girîng bû. Lê dîsa jî binkeftinek taktîkî bû. Derfetên vê yên yekser ez biguherim hene. Ne zehmet e. Dijmin quralên heyîn yekser domdar nake. Ev jî bi zanebûn dikir. Ji ber her tiştî ser hev de ferz bikin, dê bertek jî cuda pêş bikevin. Ji demê re dihêlin. Dibe ku qural yekser li wan vegere. Ji ber her tişt bi êşkenceyê dabûn qebûlkirin.

Ez jî bangî wan dikim û diyar dikim ku quralan qebûl dikim.

Ev dihat çi wateyê? Esad jî ev dinirxand. Ev avanî ji meha Mijdarê ve bi êrîşan re rû bi rû mabû. Ev jî pêvajoyek çar-pênc mehan bû. Niha hinek qural hatibin qebûlkirin jî, hêj potansiyela giyana berxwedaniyê nehatiye windakirin, hêj heye. Bi gelemperî tirsek, bêdengiyek û tiştên ku rû dane re watedayînek pêş neketibe jî, tiştên ku pêş ketine bi her kesî re tam nehatiye rûniştandin. Di nava jinan de jî ji ber bandora ji giştî qutbûnek heye, nikarin pêvajoyê ji her hêlê ve binirxînin û hinek tiştên din, hişyariyek mezin heye. Berxwedaniyek dem dirêj heye. Di heman demê de hêrs û bertekên ji ber pêkanînên dijmin pêş ketine zêde ne. Her dengê ji derdor tê, vê zêdetir bandor dike. Tiştên ku hatine kirin û pêkanên bi heqeret bertekên heyîn zindî digirin.

Ya rastî di meha Mijdarê de destpê kirin. Heval jî li Îstîhkamê li cihên cuda bûn. Bi taybet piştî Cuntayê hinek hevalên taybet ji binyata heyîn veqetandin. Planên wan ên ji hev cudakirinê hebûn. Dixwestin bi provakasyonan hewayek

îsyanê ava bikin. Hedefa wan hebû ku hinek hevalên rêber ji aliyê fîzîkî ve jî tine bikin. Ev jî hatin ferqkirin. Êdî me nîqaş dikir ku, dijmin weke din dikare çi bike. Armanca wan rêxistinbûna heyî xerabkirin bû. Armanca wan a sereke jî ev bû. Tişta herî girîng jî hemû heval li cem hev bin. Ji ber me perwerde û semîner dimeşand û weşanên me hebûn. Kovara me ya bi navê Hawar bi rêk û pêk derdiket. Weke din jî me hinek nivîsên cur be cur derdixistin derve. Ya herî girîng jî em bi kesên ku ji lêpirsînê dihatin re yekser mijûl dibûn û bi wan re eleqeder dibûn. Derfetên me hebûn ku rewşa wan bizanin.

Tişta herî girîng jî giyana kesên ku lêpirsînê derdiket bû. Ji ber li xwe muqirhatin û qelsî dihatin jiyîn. Dema ev derûnî berovajî neyê veguhertin, dikariya ku kesayetan dûr bixe. Bêbaweriyê pêş bixe. Lê navendek rêxistinkirî ji bona her kesê ku dihat moralek bû. Derfetên xwe komkirinê ava dikir. Kesayetan jî dikariya ku rewşa xwe baştir binirxînin. Piştre hêza heyî parçe kirin. Destpêkê hinek heval anîn vir. Piştre dem bi dem hinek anîn û hemû li vir kom kirin. Destpêkê peywendiyên di navbera qoxuşan û blokan de jî baş bûn. Qut nekirin. Me dikariya ku em hevûdû bibînin. Me her tim not dişand ji hev re. Heta carê hevalê Mazlum, Xeyrî û Pîr ew jî dihatin qoxuşên me. Gelek caran em li korîdoran di mazgalê de bi hev re di-axivîn. Heta demek nêz jî not ji me re dihatin.

Piştî meha Çilê zext û êrîş zêde bûn. Rojiya birçîbûnê destpê kir. Lê 'Tirşikçî' tevlî nebûn. Jixwe yên destpêkê ala teslîmiyetê jî rakirin ew bûn. Hinek kesên ji TÎKKO, Kawa û hinek komên din bi me re tevdigerin. Lê bi taybet komên KUK, Riya Azadî, DDKD, Rizgarî û hwd hêj serî de qural pêk anîn.

Pişt re di qoxuşan de van şikestinan destpê kir. Lê zêde weke dîn û haran êrîş dikirin. Yek bi yek êrîşî qoxuşan kirin. Yên ku diçûn nexweşxane û dadgehê, dema dihatin behsa van pêkanan dikir. Her hucreyekê çend kes xistinê. Kesên ku qural qebûl nekirine, kirine van hucreyan. Em jî di demê dawî de nikarin ti agahiyên rast bigirin. Dibêjin ku kesên di hucreyan de jî qural qebûl kirine. Qoxuşên gelekê ji me re dibêjin; "hûn vala li ber xwe didin. Berxwedaniyek giştî tine ye. Hûn maceratiyê dikin." Her tim van dubare dikin.

Gonûlê, axaftinên Gûltenê qut kir û got; "Mûmtaz ew her tim şîretan li me dikin û dibêjin, 'ji xwe re bi aqil bin.'" Gûltenê hinek din jî rewşên heyî vekir. Jixwe heta hingê her tişt hêdîka bi sebir vedigot. Got; "di pêvajoya rojiya birçîbûnê de jî agahiyên wisa nerast belav kirin. Weke din jî gotin ku ger sibe, keçên APO'yî ji leşkeran ducanî bibin qet mat nebin. Bi van gotinan dixwestin pêkanên dijmin weke çarenûsekê bidin qebûlkirin, berxwedaniya heyî ya dijberî dijmin biçûk bixin û weke şêwazê jiyanek xeternak destnîşan bikin. Ev nêzîkbûna xwe ya dixwestin van bidin qebûlkirin qet neveşartin."

Fatmayê dîsa got; "min her tim digot. Ger Sakîne were ezê dakevim cem wê. Min xwe amade kiribû." Aysel jî awirek tûj da Fatmayê û got; "tu çima bi me re daneketî? Hinekê durist be. Bila niha her kes tiştekê nebêje. Dijmin herî dawî got, 'bila yên qural qebûl kirine werin vî alî, yên qebûl nekirine jî xwe bidin wî alî.' Em jî ji wan cihê bûn. We jî wê demê em bi tenê hiştin. Niha jî hûn pesnê xwe didin, weke ku we tiştek pir mezin kiriye." Bihêrs di-axivî.

Gonûl jî her carê tecrîdbûna xwe bilêv dike. Nerehetiya wê jî li ber çavan e. Zêde nerehete. Gelek hevalên ku volta davêjin, awiran didin. Dema ew di-axive bi mîmîkên xwe ve hinek tiştan di ber xwe de di-axivin û bertekên xwe diyar dikin. Ev jî bala min dikişînin. Hejmar zêde ye. Her ku derî vedibe, hinek kesên din tên. Hinek kesên ji komên TÎKKO, HK, TKP, DDKD û komên din tên. Lê piranî hevalên me ne. Girtiyên PKK'ê ne. Kesên pir ciwan û kal zêdetir bal dikişînin. Kesên di nava komên Xalfetî, Êlih û Sêrtê de zêdetir ciwan in. Kesên di nava komên Hîlwan-Sîwerekê de têkilhev in. Zarokên hinek ji wan jî girtî ne. Kêliyekê Aysel xwest bi tenê bi-axive. Nêrînên xwe yên derbarê Gonûl de digot:

"Gonûl Atay, li Rihayê bi Metîn wan re hat girtin. Dibe ku tu jî dizanî dergistiya Riza ye. Min werem dike. Behsa tecrîdê dike. Lê nêzîkbûnên dijmin ên jê re jî cuda ne. Bi navê ku ew serkêşiyê dike cuda kirin. Her carê xwe dide pêş û hemû balê dikişîne ser xwe. Di rastiyê de jî yê li hemberî xwe dijmin nabîne. Zêdetir zimandirêjiyê dike, van jî bi helwestên tûj ve dike. Zêde êşkence jî lê nekirin. Li jêrê bi tenê ma. Hinek serbaz jî qet ji wir derneketin. Heta gelek gotin hatin kirin. Heval li hember wê bibertek in. Kesek ecêb e. Ev wisa ye. Fatma jî her carê dibêje; 'min di lêpirsînê de liber xwe da. Lewma divê hûn jî niha baş li min binêrin.' Xwe ferz dike. Jixwe em nizanin çiqas jî li ber xwe daye. Ji xwe re dike sermiyan. Ji berê de wisa ye. Em bi hevalê Mazlum wan re jî axivîn. Ji me re got; "îdare bikin, çi dixwaze bidinê. Tiştên wisa nekin pirsgirêk. Wê di nava me de kesên ecêbtir jî derkevin. Vê jî bizanin. Lê em neçarin ku hemûyan jî

bimeşînin. Ne hêsan e ku mirov li girtîgehê her kesî bimeşîne. Bila ev di hişê we de bimîne.” Ger hevalê Mazlum wisa negotibûya, kesî nedikariya vê îdare bike.”

Min jî hemû guhdar kir. Weke din jî dişopînim. Nexasim nirxandinên Gûlten guhdar dikim. Ji zêdetir objektîfin û gelek aliyên wê yên rast hene. Pirsgirêkên heyîn bi rasteqînî şîrove dike.

Dema ez di goşegiriyê de Cahîde anîne. Ew dûr disekine. Dema destpêkê hatim ez hemêz kirim û giriya. Yekser derbasî qoxuşa din bû. Dema tê dibêje; “jixwe ez Tirk im” wisa jî ne ew, ne jî zehmetiyan dernaxe. Wisa jî derxistine jorê. Dûrî hevalan disekine. Roja destpêkê jî vekirî gotiye; “ez ne ji partiyê me, an jî ti girêdana min bi partiyê re tine ye. Jixwe dema ez li derve bûm, rêxistinê jî ez tecrîd kiribûm. Niha li vir jî di bin navê xwedîderketinê de nêzî min nebin. Ez serbixwe me. Ez li gorî xwe çi rast bibînim, ezê wê bikim.”

Cahîde, di pêvajoya Sîwerekê de gelek tiştan jiyan dike. Hêj em nehatibûn girtin malbata wê, plana derketina ji Sîwerekê dikir. Cahîdê dixwest ji dibistanê derkeve û profesyonel kar bike. Malbata wê jî li şûna Îzmîr û Stenbûlê, berê xwe dabûn Riha yê. Wê demê jî ew û xwîşka wê Nevîn ji malê direvin. Wê jî Sîwerekê kar kiriye. Weke din jî nîşana xwe bi Silêman re pêk aniye. Ez Silêman ji Dibistana Mamosteyan a Dêrsimê ve nas dikim. Cuma Tak, Amed, Cumayê din û Silêman tev komek bûn. Li gorî gotinên komên çepgir ên li Dêrsimê ew jî ‘kiroyê’ me bûn. Ew jî girtiye. Ew beriya Cahîde hatiye girtin. Nîşana Cahîdê jî, li Sîwerekê bûye pirsgirêkek mezin. Rêxistinê nîşana wan erê kiriye. Heta hevalê

Pîr û Qarasungur li qadê ne, gotine; “dema we xwest hûn dikarin bizewicin.” Lê Cahîdê gotiye ku zûye. Xebatên wê jî yên di wê pêvajoyê de erênî ne. Lê Sîwerek cihek biçûk e. Ji ber di nava hemû hevalan de tenê ew desgirtî ne, her nêzîkbûnek wan bal dikişîne. Nexweşiyên Cahîdê yên Jinekolojik pêş dikevin. Li ser reçeteya ku ji nexweşxaneyê girtiye, bandora ku li ser jinên ducanî bike hatiye nivîsandin û her wiha her kes behsa vê mijarê dike. Lê di rastiyê de hebên ku nexweşiya jinê ya serê mehê bi sazûman bikin dane wê. Mixabin ji ber keçên ku mala dermanê xwe lê hiştine û hinek hevalên diçin wir dibînin, tenê gotina ‘jinên ducanî’ di hişê wan de dimîne û vê rewşê dixin rojevê. Di encamê de ev weke fesadiyekê digere. Fesadiyên ku tên kirin heta gotinên weke; “Cahîdê zarok ji ber xwe biriye” dirêj dibin.

Li cihek weke Sîwerekê fesadiyên wisa bi qasî dozên xwînê xeternakin. Hevalên me jî vê mijarê weke doza namûsê dinirxînin. Di wê pêvajoyê de jî Cahîde di çavê her kesî de ye. Bucakan jî pere destnîşan kirine ku, yê wê bikuje wan pereyan bidin wan. M. Bucak dibêje; “kesê ku wê sax bîne, nizanim ezê çiqas pere bidimê.” Ew jî gelekî çalak e. Zilaman jî dikuje. Ango xwe ji ti karî şûnde nade. Lê ev fesadî jî zêde bandor lê dikin. Ew jî ji her kesî xirabtir pirsgirêka heyî dinirxîne. Ew jî weke doza ‘heqareta ji namûsê’ re dinirxîne. Hinde ev pirsgirêk her kesî mijûl dike, di nîqaşekê de li dijî hev çekan radikin, da ku hev bikujin.

Cahîde jî mafê xwe dibîne ku hesabê bipirse û dikeve pey vê mijarê. Xebatên rêxistinî jî li aliyekê dihêle. Di encamê de cezayê tecrîdê didinê. Demekê li aliyê Dîlok û Adana dimîne.

Di rapora xwe de rewşa heyî ji navenda partiyê re dinivisîne. Silêman jî tam di wê pêvajoyê de tê girtin. Dema Silêman girtiye, bûyer evqasî mezin dibe.

Tevî ku dijmin li Cahîdê digere, diçe malê. Bi nasnameyên cuda ve tê serdana girtîgehê. Ji ber van nêzîkbûnên wê tê girtin.

Min ev rewş jî yekser ji devê wê guhdar kir. Dema behs dikir pê re digiriya. Bibertek e. Nexasim li hember Yilmaz Uzun ewan biberteke. Bi gelek hevalan re rû bi rû hatiye. Li Dîlokê jî bi Hesen Şerîk re hinek pirsgirêk jiyan kiriye. Tecrîdbûna xwe jî qebûl nekiriye. Digot; "Hesen rapora min ji jorê re neragihandiye." Li gorî wê her kes û rêxistin jî di vê mijarê de sucdar bû. Ev jî hêceta wê ya bingehîn bû. Nêzîkbûnên teng û paşverû yên hinek kesan dixist şûna her tiştî. Lê qebûl nedikir ku bi gumanên rêxistinî tevnegeriyaye, nêzîkbûnên wê gelek tişt tehrîk kirine. Ango xwe bi temamî mafdar dibîne. Lewma nêzîkbûnên xwe yên beriya lêpirsînê, pêvajoya lêpirsînê û hatina xwe ya girtîgehê diparêze û hêcetan ji wan re dibîne. Dibêje; "tenê tişta ez bikim ev in. Ma min dikariya weke din çi bikim?" her tişt danî heta vê astê.

Koma Êlîhê jî ecêb bû. Got; "neh kes bûn. Çend ji wan di pêvajoya destpêkê de berdan. Dijmin di lêpirsînê de zêde bi wan lîst." Gûlten got; "hemû jî hevalên temenê wan biçûk in. Di vî halî de jî xwe kirine berpirsê taxan û baskê jinan. Li cem polîsan jî axivîne. Tişta herî xirab komî hatine girtin. Hinek hevalên xort jî di nava wan de hene. Ji wan jî hinek kes axivîne. Gelek heval jî zêde bandor bûne. Heta ez bawerim hevalek bi navê Muslim dîn dibe. Polîs di lêpirsînê de zêde êşkence dike. Lê herî zêde ji ber hevalên jin li hember wan

bikar anîne bandor bûne. Hevalek jin hêj zarok e. Ew jî li hember hevalên xort û hevjînê wê bikar anîne. Dijmin sifreyek îçkî amade kiriye, di vîdeode dîmenên seksê dane temaşekirin û êrîşî van keçan kirine. Lewma rewşa wan pir xirab bû. Hinek ji tirsan ketine xefka lîstoka polîsan. Polîsan ji hêla fîzîkî ve jî bikaranîne. Me rewşa rû dayî di daxwaznameyên xwe de jî nivîsand û şandin dadgehê. Navê polîsan jî dizaniyan. Ew polîs tên vir jî û diçin. Bangî hinekan kirin û bi wan re axivîn. Ji wan re gotin; "ger hûn îfadeyên xwe paşve nekişînin, emê cardin we lêpirsînê re derbas bikin." Hêj bandora pêvajoya lêpirsînê derbas nekirine. Nedizaniyan ku nirxên rêxistinê û polîtîkaya partiyê çawa ye. Gelek ji wan li hember partiyê xwedî bertek in. Lewma dema dijmin êrîş dike, pir zû dişkên. Îradeyek bihêz tine ye. Li gorî baweriya min wê dijmin vê rewşa heyî zêde bikar bîne."

Hîlwan û Sîwerek jî pirsgirêkek cuda ye. Dijmin hinek ji wan jî jixweber anîne. Hinek ji wan jî zêde di bin bandora pêvajoya lêpirsînê de ne. Êşkence û gefên li wan kirine, ew zêde tirsandine. Li wir polîs wan tazî dikin û deqên PKK'ê li ser laşê wan digerin! Li singê wan, li organên wan ên cinsî dinêrin û wisa van nivîsan digerin. Li gel vê jî gefên destavêtinê li wan dikin. Herî zêde jî kesên ku xizmên hev in li hember hev didin bikaranîn. Wan neçar dihêlin ku her kes li ser hev bi-axive. Lewaziyên ji vê hêlê ve derdikevin, dibin sedem ku kesayet bi tenê bimînin. Ev rewş hema bêje di nava hemû koman de heye. Dijmin jî vê rewşê sûd wergirt. Beriya ku xwe birêxistin bikin, dijmin êrîşî wan kir.

Mazlum wan di her wextê û her firsendê de gotin. Rêxistinbûna xwe ya navxweyî baş ava bikin. Dijmin hewl dide rêxistinbûna heyî belav bike, her mirovî jî di nava xwe de parçe bike û bi tena serê xwe bihêle. Armanca bingehîn a êrîşên wan ev mijar e. Wê destpêkê tenê bihêle da ku bi lewaziyên xwe ve rû bi rû bimîne. Pişt re jî wisa bêbandor bike, bibe kesayetek şerma lewaziyên xwe dijî. Dema bigihîne asta civatek ku nikare xwe ji vê giyanê rizgar bike, wê bixwaze komî bikuje û xilas bike. Jixwe pirsgirêka sereke jî ne ji hêla fîzîkî ve xilaskirin û ji holê rakirin bû. Ev jî pir vekirî diyar dibû.

Komên çepên Tirk û Kurd ên din di vê mijarê de rewşek zêdetir xeter dijiyan. Yek bi yek ji bilî hinek kesan, gelek ji wan hêj di serî de binkeftin di nava giyana xwe de pejirandibûn. Hinek kesên ku berxwedanî weke hêceta çewsandin û êşkenceyê dîtin û devre de bi şêwazên cur be cur dijberiya PKK'ê pêş dixistin, li girtîgehê jî ev nêzîkbûna xwe berdewam dikirin. Dijmin jî ji vê rastiya heyî sûd werdigirt.

Di encamê de bi gelemperî nebe jî, ez jî hînî xetên giştî bûm.

Diyar bû ez bi pêşdîtinekê nêzî pêvajoyê nebûme. Di asta ku şert û mercên heyîn hîn bibim nêz nebûm. Lewma min ev rewşa xwe ya teng, her tim lez dike, hesaba her tiştî nake û rewşa jiyan dikir qebûl nekir. Min bandora wê jî kûranî jiyan kir. Lê piştî ku hînî van rastiyan jî bûm, min fêm kir ku ne raste berxwedaniyê jî tenê bi xwe ve girê bidim. An jî sînordar bikim. Ne rast e. Bêguman berxwedaniya min a bi serê xwe wê bandorek erênî jî bike. Wê di nava xwe de ji hev cudabûnê jî

ava bike. Wê bi demê re hinek heval jî xwe bidan aliyê min. Lê belê, wê dijmin jî li ser giştî lîstokek xirab pêk baniya. Ez vê jî hîs dikim. Ger min helwesta xwe ya destpêkê, bi şêwaza ku tiştekê qebûl nakim bidomanda, wê baştir bûya. Min her tim bi wê moralê ve li hember dijmin bi berxwedaniyek zelal ve di sekna xwe de, ji aliyê wijdanî ve rehetiyek jiyan kir. Ji ber giyanek bi vî rengî besê mirov e.

Bes di vê rewşî de jiyîn, tengezariyek hundirîn jî dabû jiyîn. Min ev binkeftin hêjayî xwe nedidît. Ji ber destpêkê de dijmin bi hêz û berfireh pêşwazîkirin girîng bû. Lê min hem dizaniya dê ev nebe qonaxek teslîmiyetê, bê yeqînî û bê baweriyê û hem min dikariya vê rewşê veguherînim kesayetên herî zêde dijmin ku ji wan hêvî dike, lewaziyên heyî li dijî dijmin bikim qonaxên hêz û berxwedaniyê. Ji ber ev jî bi înad, yeqîn û sonda wê ve girêdayî gengaz dibû. Ev jî bi min re hebûn. Biryara; "em hêza xwe hinekê bigirin û wisa dest bi berxwedaniyê bikin", nêrînên derbarê vê mijarê de, herî zêde jî Gûlten û Zelîha kêfxweş dikir. Moralê yên din jî xweş dibû. Di vê navberê de me got; "emê rewşa heyî bi hinek kesayetên xwedî xisletên şoreşgerî, hewl dide pêvajoyê fêm bike û bibîne yên komên din re jî nîqaş bikin." Me di navbera xwe de jî emê bi kî re û çi nîqaş bikin, destpêkê pêdiviya kî bi eleqederî heye tespît kirin.

Weke din jî me li ser mijarên weke bi gelemperî rewşa girtiyan çiye, çi dibe, em dikarin bi hevalan re çawa peywendiyan pêş bixin, em dikarin rewşa xwe çawa ragihînin nîqaş kir.

Me di navbera xwe de vesaziyek kir. Rêxistinbûnek beriya niha pêş ketî heye. Dema êşkence zêde û giran bûn û qural hatin qebûlkirin, hevalan rêxistinbûnek tengtir saz kirin. Komîn belav dibe. Pereyan di navbera xwe de belav dikin. Nêrîna dibe ku dijmin wan ji hev cuda bike jî, dibe bandorek sereke ya belavbûnê. Ya rastî di cihên bi vî rengî de komîn gelekî girîng in. Ji ber dijmin hewl dida takekesiyê pêş bixe. Armanca sereke bi tenê hiştinê re xistin û radest girtin bû. Ji ber ev rêbaz jî pir hêsan bû.

Dijmin hewl dida bi quralan giyanweriya mirov parçe bike. Ev jî bi pêvajoya lêpirsînê re destpê dikir, her wextî hewl dida qenayat, bawerî û girêdana mirov bişkîne. Li girtîgehan jî vî rêbazî bi planek dem dirêj û rêk û pêk dimeşîne. Ji hêlekê ve dibêje; "rêxistin tine ye. PKK tine ye. Êdî hûn di destê me de ne. Hey yek ji we leşker e. Hûnê li cem hev ne rûnin. Hûnê bi hev re ne axivin." Ji hêla din ve jî mirov ji aliyê fîzîkî ve tenê wê rojê û wê kêliyê bi 'jiyanê' ve girê dide! Dibêje; "ger dê tu bijî, tu ancex dikarî li gorî ez dixwazim bijî." Ji bilî vê jî mirinê şanî mirov dike.

Belê, jiyan û mirin! Ez bawerim ev têgeh herî zêde di nava rastiya zindanê de bi cih dibin. Tevî ku her du jî zêde dijber û ji hev dûr in, ên herî zêde nêzî hev dijîn, li cem hev in û her tim jî bi mirov re ne, ev her du têgeh in. Gelo çawa dibe ku mirov her duyan li cem hev bijî, bigire, an jî yekê li hember ya din hilbijêre dê çawa be? Ma ne dijmin ji bilî mirinê ti tiştek din ne dabû zindanê? Lê mirinek çawa?

Gelo zindana Amedê şahidê çi cure mirinan bû? Kî hat û çû? Gelo divê mirov di vê mijarê de li nav labîrentên dîrok û paşerojê de bigere? Belê, zindanek din çibû, dijmin çima ev tûnelên mirinê, 'damanê' mirinê vekiribûn? Jin û zindan çawa hatibûn li cem hev? Kêm jinên ku di bîra mirovan de heyîn û dihat zanîn hebûn. Ew jî ji ber doza xwînê girtîbûn… Piştre jinên girtiyên siyasî derketin holê! Jinên ku di pêvajoya Adar'ê de hatin lêpirsîn nekêm bûn. Lê tevî vê rastiya wê ya zindanê zêde nedihat zanîn. Herî dawî ez li Îzmîrê hatibûm girtin.

Bes, bûyer, tewanbarî, wext û mekan ji hev cuda bûn. Bêguman hinek aliyên ku dişibin hev hene. Lê dîsa jî gelek kesan jin û zindan di xeyal û ramanên xwe de jî ne danîn cem hev. Dema berdêlên ku bi tiştên jiyan kirine ve dihizirin pê yeqîn nakin. Hinek kesan digot; "ma me çi kiriye ku, em evqasî êşkence û zilmê jiyan dikin?" Gelek ji wan li qadên ku têkoşîna me lê pêş diket bûn. Bandora têkoşînê zêde bû. Serwextbûna Kurdewariyê pêş diket. Xwîşk û bira, hevjîn û zarokên hinek kesan di nava têkoşînê de bûn. Hinek jî nû serwext dibûn. Hinek ji wan tevlî xebatên perwerdeyê bûne, an jî perwerde didan hinek komên hevalên jin. Di nava komîteyên kolan, tax û herêman de cih girtine. Di nava ciwanên xwendevan de propagande kirine. Kuştina kesan, birîndarkirin, desteserkirin, şelandin tine bû. Karên weke belavkirina daxwiyanî û hwd jî nekirine. Tevî vê dijmin evqasî dijwar êrîş kiribû. Gelek ji wan di watedarkirina van rewşan de zehmetî jiyan dikir. Bendewariyek jî hebû. Digotin; "ger hêmanek wisa tewanbariya min giran bike tine be, dibe ku min berdin jî. Her çendî min li cem polîsan hinek tişt qebûl kiribe, min li cem dozgeriyê red kirine. Jixwe min jî ev di bin êşkenceyê de qebûl

kirine. Nexwe ger di dadgeha yekemîn de nebe jî, wê min di ya duyem de berdin.” Ji aliyê xwe ve mafdar bûn. Lê rastiya heyî hinek din cuda bû!

Diijmin, dijminê Kurdewariya ku vejîna xwe danî bû. Lewma gotina “ez Tirk im” ferz dikir. Her kesê di bin ala Tirk de, Tirk bû. Ev welat nayê parçekirin, yek bû û her kes leşker bû! Tevî ku di nava pergalê de rastiya leşker û jin diyardeyên gelekî dûrî hev bûn, hemû jin kiribûn leşker. Ev jî statûyek nû bû!

Ez hewl didim van mijaran yek bi yek, kom bi kom vebêjim û wan bidim fêmkirin. Me lez û bez ew hewaya tirs û xofê şikand. Me di nava sazûmaniya navxweyî de jî rêxistinbûna xwe ya dem kin û dem dirêj destnîşan kir. Hinek hevalên ku zêde balê nakişînin hene. Em jî wan zêde dema ku hewl bidin me ji hev veqetînin ku bikevin nava liv û tevgerê diyar dikin. Di peywendiyên bi komên din re, bi kesên ku zêde naxwazin bikevin nava me û ji rêxistinbûnê dûr disekinin re ev heval mijûl bibin. Em dihizirin ku Gûlten jî ji bona van karan binirxînin. Ji ber ew bi xwe jî zêde baldar e. Hem li hember dijmin baldar û hişyar e, berxwedêr e, hem jî li hember binyata hundir wisa ye.

Me komîna xwe dîsa hevbeş ava kir. Lê em dîsa rêbaza dijmin di vê mijarê de jî parçe bike hesab dikin û pereyan li ser hinek hevalan belav dikin. Xerckirinên me hevbeş in. Pêdiviyên me ji yek cihî tên pêşwazîkirin. Em di rewşên ber çav de hem li pêşiya hinek nêzîkbûnên nerehetiyên binyata heyî digirin, hem jî bala dijmin belav dikin. Pêdiviyên ji kantîn û cihên din tên, bi şêweya yek lîsteyê tê dayîn. Her pêdiviya ku

li gorî lîsteya her komê tê cudakirin. Lê di nava komên çepgir ên din de ji mêjve xwe cudakirin pêş ketiye. Di nava kêmek ji wan de jiyana hevbeş tê jiyîn. Dema em girîngiya jiyana hevbeş ferz dikin, bandor li ser wan jî dike. Em jî wisa dikarin bi hinek ji wan re jiyana hevbeş ava bikin. Em pêdiviyên gîştî bi hev re dikirin. Bi hev re jî xerc dikin. Em hevbeşbûna li gorî pereyan esas nagirin! Em hewl didin vê ferasetê bişkînin. Ji ber gelek mirovên ku malbatên wan nayên hene. Dema em bi wan re hevbeş tevdigerin bandorek erênî dike.

Di nava beşa jinan de mijara herî zêde bandor dikir, ev jiyana hevbeş bû. Lewma bixwazî, nexwazî neçar diman ku di mijarên din de jî hevbeş tevbigerin. Di heman demê de dibû mebesta peywendiyan. Wateya wê ya giyanwerî mezintir bû. Beriya niha jî di nava girtîgehê gîştî de xebatên komîna hevbeş pêş ketine. Lê hinek koman xwe têkil vê hevbeşbûnê nekirine.

Em jî herî zêde li ser mijarên weke wateya quralên ku dijmin ferz dike çine û hedefa wî di van quralan de çiye nîqaş dikin.

Her kesî pir vekirî dîtibû ku pirsgirêk ne gotina "ez Tirk im", an jî beriya xwarinê bixwe niyazê bike û bêje "Bismillahîrehmanûrehim... noşî can be… Hemdê xwedê, bila artêş û miletê me her hebe…" bû. Ji ber destpêkê di bin navê ewlekariyê de hijmar dihat girtin. Ev hejmar jî li ser piyan û di rêzê de dihat kirin. Pişt re her kesî hejmara xwe bi dengê bilind digot. Piştî van rabûnên li ser piyan û hwd, sond û sirûda îstîklalê pêş ket. Wê pey vê re jî hinek tiştên din werin…

Dijmin jî bi vê destpêkê bi zorê te tîne rê, pişt re jî gav bi gav hukma xwe dike. Mirov ji Kurdewariya xwe dûr dikeve. Mirov dibe 'leşker'. Mirov dikin Tirk. Mirov birêve dibin. Bingeha ji xwebûnê dûrketinê amade dikin. Dibe ku peyva tenê 'Tirk im' her tiştî bi xwe re xilas nake. Dibe ku dema mirov wê gotinê dibêje jî, kena xwe bi wê Tirkbûnê dike. Lê ew jî Kurdewariya mirov desteser dike, mirov jî kena xwe bi wê Tirkbûna ku ew bilind kriiye dike. Ma mirov bêje 'Tirk im' wê çi bibe? Mirov dibêje 'şoreşger im'. Bes her tişt jî li wir, di wê kêliyê de xilas nabe. Ji bona mirov jî, ji bona dijmin jî ev rastî wisa ye. Ji ber dijmin wê ji bona îrada mirov bişkîne û mirov radest bigire weke amûrekê bikar tîne.

Hinek ji wan hêj di serî de teslîm girtin. Teslîmiyet û îxaneta Şahîn têkilhev bibû. Binyata kesayeta wî ya heta dawî ji deriyê îxanetê re vekirî hebû. Her kêliyê ji îxanetê re vekiriye! Ev derî û hîm bi dijmin re hevdîtina yekemîn re vebûn. Ji ber sînorê di navbera şoreşgerî û donektiyê de nesitûr bû. Pir zirav bû. Ya rastî vî hêj di pêvajoya Kongreyê de xwe dabû dest. Hedefa wî ya di şoreşê de ne ji bona xwe li gorî hêz û jêhatiya xwe ferz bike, li gorî erkên şoreşgerî amade û bicih bike, ji bona an xwe li gorî erk bifiroşe, an jî erk li gorî xwe bifiroşe bû. Ferq nake, ji ber mantiqê her duyan jî heman yek e. Ez bawerim, hêj wê demê de Rêbertiyê ev rastiya Şahîn kifş kiribû. Gelo ew Karyerîzm û hirsa bi wî re dihat çi wateyê. Rêbertiyê ev baş fêm kiribû. Her çendî dema ji bona rêveberiya navendî hat hilbijartin em hemû mat bûn, Rêbertiyê zêdetir dixwest ku kesên bi vî rengî di nava xebatên girîng de binase. Ev jî rêbazek nêzîkbûnên Rêbertiyê bû. Her ku min ev pirs ji xwe dikir, min ev bersiva xwe digirt.

Belê, ji bona Şahîn rêbazên gelek cuda nehewce bûn. Ji ber hêj ew di nava lêpirsînê de bû, aqil dida polîsan. Kî dikare çawa bidin axaftin, lewaziya kî di kîjan mijarê de ye? Tev digot. Dijmin şerê bi wî re dikir de ti zehmetî jiyan nekir. Niha jî binyatek nêzî hezar kesî li girtîgehan hebû.

Ji qadroyên pêşeng bigirin heta alîgir, sempatîzanan û heta mirovên welatparêz ên ji rêzê her kes hebû. PKK jî ev bû. Nûnerê binyatek wisa bû. Rêxistina wê bû, qinyata wê bû, girêdan û hêviya wê bû. Hemû aliyê mirovahî yê vê binyatê bû. Bêrîkirinên hevbeş û nasnameya wan bû.

Belê, niha jî êrîşî vê kiribû. Ma gengaz bû ku qinyatek, kedek, hêviyek di kêliyekê de were tinekirin û berovajîkirin? Her tişt evqasî nehêsan bû. Ji ber -her çendî nû jî be- dê ev biba tinekirina jiyanek ku tovê xwe çandiye. Jixwe ne hêza ti evdî û ne jî ti xwedayî têra vê nedikir! Ne xweda bi qasî qebûl bikin bikevin zindanê dev ji asîmanan berdabûn, ne jî evdên wî yên hov bûne bi qasî bikarin jiyanekê tine bikin, xwediyê hîkmetekê bûn. Ger wisa be, dê ji mêj ve hemû evdên ku di dîrokê de tonek hovîtî kirine bibûna xwedê! Ji ber avakirin û tinekirin jî tenê karê xwedê bû.

Divê mirov vê baş bizane. Her quralê ku dihat ferzkirin ji bona şikandina kesayetê bû. Têkçûna di nava me de pêş diket bihurdar bû. Me qural qebûl kirin, lê di asta qinyat û ramanê de radestî pêş neket. Em teslîm nebûn. Ti tiştî nekarî baweriya me û qinyata me ya darbarê mafdariya doza me de biguhere. Emê dev ji xwe bernedin. Ti kesê ku moralê xwe bixe, vî rihê xwe radestî dijmin bike û ji lîstokên dijmin re bibe amûrek nabe PKK'yî. Nabe şoreşger jî. Ger bawriya me hebe, nezehmete ku

em van quralan berovajî bikin. Jixwe armanca dijmin jî ew e ku me bêbawer bike. Vala nabêjin; “em we dernaxin dadgehan, hûnê yek bi yek bimirin.” Lewma divê dema em dijmin binirxînin, li gorî rewşa xwe nenirxînin. Ji ber ev ne pirsgirêka, ‘kî sucdare, yan jî sucê kî kêm e’ye. Kî yeqîn bike, kî şoreşger be, kî rihê PKK’ê bi xwe re dide jiyîn, bi şêwazekî jê bandor bibe, hemû jî ji bona dijmin sucdar in. Bêguman, dê hinekê cuda bi ser hinek ji me de were. Wê ji me re bêjin; “APO hûn xapandin. Ew bi xwe li derve di nav xweşiyê de dijî. Bi jinan re dijî. Lê hûn dirizin.” Wê Esad me jî şanî we bike û bêje; “ev we dixapînin.” Wê di her firsendê de bêje; “di destê me de ne. Min hemû jî weke mêşekê perçiqandin. Her rêberek we niha bûne Kemalîstek. Wê di demek nêz de jî bibin her yek ji wan bibin leşker. Êdî rêxistin tine ye.”

Di zindanê de avakirina berxwedaniyek rêxistinkirî, an jî rêxistinkirina berxwedaniyê gelekî girîng e. Rêxistinbûnek saxlem avakirin, di heman demê de ewlekariya kes e. Ewleya siyasî jî ev e. Ango xwe birêxistinkirine! Bê mirov jî ev jîndarkirin, domdar û herikbar kirin girîng e! Girêdana di navbera mirov avekê ji binî ve bêdeng, lihev bixe, bîne asta ku serve biçe û bi pêlek mezin ve bigihîne asta ku bikare carekê de mezin biherike çiye? Di rastiya herduyan de jî xwe dayîn, ango feda kirin heye. Yek raveya hêza bi te re ye. Ya din jî hêza di zemînê heyî de ye. Ew jî parçebûna pêlên mezin ên bi te re heyî ne. Lewma bi her duyan re jî hevsengî baş were avakirin. Dibe ku mirov di nava ya destpêkê de winda bibe. Di vê wateyê de ‘fedabûn’, dikeve nava xeternakiya ku wateya xwe ya siyasî winda bike. Gelo di wê astê de ye ku hemû derfetên tevdîr û zemînê heyî pêşwazî bike? Berî her tiştî ev zimîn ji

hemû êrîşên dijmin re vekiriye. Giyana her kesî weke deriyekê vekiriye. Di vir de armanca êrîşên heyî jî van deriyan zêdetir veke û hemûyan bîne cem hev e. Lewma di vê wateyê de divê mirov xwe li her derî bixe, da ku wan deriyan bigire. Qet nebe mirov dikare wan deriyan kêm bike, teng bike. Ya girîng mirov xwe bigihîne vê astê ye. Her tişt, nêzîkbûna her mirovekê, sekn, bawerî, bêbawerî, tirs, cesaret, qinyat û bêqinyatî, bertek û hêrs tev di vir de diyar dibin… Ango bi her tiştê xwe ve girê dide. Serweriya li ser qadê hemûyê, kêlî bi kêlî bûna muxatabê hemû pêkanên dijmin, bi rastî jî tê wê wateyê ku mirov xwe bi temamî datîne holê. Belê, xeternakiya vê jî zêde ye!

Lê weke din mirov yek bi yek jî be, dema mirov li hember dijmin dimîne cuda ye. Ev mîsoger neşaşiyeke. Tişta ku bi mirov re dibe yek û ava dibe vîna şoreşgerî ye. Bawerî û biryardariya heyî, şerkeriya tazî ya bi mirov re rave dike. Ev sekna li hember hev tişta herî xweşik, şerê herî zêde şoreşgerî ye. Mirov jî bi vê hêza di nava tenêbûnê de, dijmin parçe dike. Ew jî hem bi te re, hem tiştên ku mirov dide der ve mijûl dibe. Di di berxwedaniya kesayeta te de bêçaretiya xwe, têkçûnê bibîne û bixe nava binkeftinek mezin.

Fikira ku; "wê dijmin di nava vê binyatê de tişta ku dixwaze bidest nexe. Nekare dest bavêje ti jinê û li dijî şoreşê bikar bîne" serwer bû. Weke din jî ramanê madem emê wisa werin liqay hev û em jiyan dikin, ezê jî hemû hêza xwe birêxistin bikim, qinyata divê em berxwedaniyek hevbeş ava bikin serwer bû. Bes her tim bi tena serê xwe jî bim, ezê li ber xwe bidim. Ger hewce bike, ez dikarim bi tena xwe helwest raber bikim. Her du nêrîn jî bi hev re dimeşiyan. Dem bi dem

em bi tenê, an jî bi gurubekê re jî ji hev cuda bûn. Dema dijmin xeter didît, an jî ez bi tenê li dijî tiştên ku dihatin ferzkirin derdiketim, di tecrîd û goşegiriyê de bûm.Vê jî dihişt ku qural xirab bibin. Lê dîsa jî ev qural nedihatin rakirin. Ev hêz heta cihekê digirt û herikbariya wê asteng dikir. Dîsa jî, kesayet ji serî heta dawî bi tena xwe jî be, berxwedaniyek yek kesî ya zelal cuda dibe. Mirov neçar e hemû berdêlên wê bigire ser xwe, qebûl bike. Ev jî mirov ber bi zêdebûnek balkêş, baweriya cewherî û însiyatîfek cewherî ve dibe. Ti gumanên mirov namînin. Mirov şahnaziya serxistin û bidestxistinê di asta herî jor de dijî.

Lê ya din cihek wisa ye, mirov qêrîna hezaran kesî dibîhîse. Mirov tirsê di çavên wan de dibîne. Mirov her roj kesên ku bi lîstokan tên xistin, neçarî îtîrafkariyê dikin, neçarî fesadiyê dikin, kesên dijûnan ji nirxên xwe re dikin dibîne û dibîhîse. Dema tê gotin; “ezê birûm devê te de” di asta ku bêje; “fermo fermandarê min” de ji xwe dûrbûnek tê jiyîn. Mirov di vir de dirama van kesên li xwe berovajî ketine dibîne û temaşe dike.

Lê giyana kesên ku tevî li ber xwe dide têk çûye gelekî cuda ye. Dijmin jî di vê mijarê de bi tevdîr nêz dibe. Dizane ku di qadek hatiye ceribandin de, nikare her tişta ku dixwaze pêk bîne. Qet nebe dizane ku ev pêkan nehêsan e.

Rojên destpêkê bertekên li hember sirûdên ku li qoxuşên nêzî hev cuda bûn.

Gelek caran dihat gotin ku; “bênamûsan, we em bi tenê hiştin. Hûn zû teslîm bûn. Niha jî hûn sirûdên faşîstan dixwînin. Ma hûn şerim nakin? Piştî ku qural di astekê de hatin

qebûlkirin, berxwedanî hat şikestin, bertekên heyîn jî bêdeng bûn. Lê mixabin, ev jî ber teslîmiyeta bi wan re hedê xwe derbas kiribû. Ji ber êdî dijmin her tişta ku dixwest, li gorî daxwazên xwe pêk danî, êdî me jî heman dijûn dikirin. Mirov nikare wisa her tiştî ji bextê dijmin re bihêle. Ma evqas bêbawerî û ketîbûna jiyanê dibe?

Baş bû ku min ev cewazî dît. Ji ber armanca dijmin jî derûniya têkçûn û teslîmiyetê belavkirin û kûrkirin bû. Lewma zû radestî şert û mercan bûyîn û di giyana xwe de bandora wan jiyîn gelekî xeter bû. Ji ber hêj şer xilas ne bibû û nû destpê dikir. Li gorî vê ev di kesayetê de di demek kin de bi encamkirin, bi temamî xilasbûna qinyata mirov bû.

Her wiha di heman pêvajoyê de rojiya mirinê jî hatiye destpêkirin. Me gelek agahiyên tevlîhev û hevûdû derew derdixin bihîstin. Gelek kesên ku me dizaniya di nava berxwedaniyê de, li goşegiriyan tên girtin, di çûnûhatinên nexweşxane û dozan de ji hev cuda di-axivîn.

Hinek kesan digot; “hemû qoxuşan qural qebûl kirine. Tenê hucre mane.” Hinek kesan jî digot ku, rojiya mirinê hatiye destpêkirin û agahiya şahadetan jî heye. Hinek kesan jî digot ku, her kesî qural qebûl kirine. Ti agahiyek saxlem tine ye. Carê em jî ya herî zêde erênî bawer dikin. Carina jî em ji ber bandora hinek agahiyên neyînî nikarin bûyerên ku rû didin baş binirxinîn. Çawa me rojiya birçîbûnê bihîst, me got; “em jî destpê bikin.” Lê di vê mijarê de gumana, ‘mirov nikare bê agahî, bêrêxistinî dest bi rojiya mirinê bike’ jî hebû. Pêvajoyên beriya niha rojiyên birçîbûnê jî bi serê xwe nehatine destpêkirin. Hevbeş, hemwext û bi heman daxwazan hatine

kirin. Em jî çalakiyên wisa di kîjan şert û mercan de guncav in, an jî neguncav in nîqaş dikin. Ma ne divê em jî ji tiştên hatine jiyîn dest derbixin? Wê di rewşên wisa de biryar, erêkirin, agahî û hwd nêzîkbûnên rêxistinê li gorî çi werin pêkan? Ger qada ev lê werin pêkan nebe, wê çi were kirin?

Em jî qehra tiştên ku dijmin ferz dike jiyan dikin. Lê em nikarin rewşên wisa nediyar rakin. Tengezariyê ava dike. Em di nava heman mekan û qadê de ne, lê em nikarin xwe bigihînin yê dîwarekê, blokekê ji me wirdetir. Dema wisa be, ma emê rewşa xwe çawa bikarin binirxînin? Beriya niha jî tê zanîn ku jin li ber xwe didin. Heta niha jî wisa ye. Hêj her kes dizane ku qural nayên pêkan. Ji ber dema em diçin nexweşxane û dadgehan, em ne weke zilamanin. Berê wan didin dîwaran û wisa didin rawestandin. Pergala rêza wan heye. Dîsa bi dengê bilind, lingê xwe li erdê didin weke sekna leşkeran fermanên ku tên dayîn pêk tînin. Lê demek dirêj nekarîn di nava jinan de van sepanan pêk bînin. Dema tiştên ji bilî niyaz (dua) dihat ferzkirin me digot; "me ev qebûl nekirine" û pêkana wan asteng dikir. Hêj bandora rojiya mirinê heye. Lê em ne di ferqa vê de ne. Ger bi ser me de werin, em dikarin wisa bi rojiya mirinê tevlî berxwedaniyê bibin. Lewma nerim nêzî me dibin. Em vê rastiyê jî piştî me bihîst rojiya mirinê destpê kiriye û çalakî bi encam jî bûye hesiyan. Her tişt di dawiyê de baştir hat fêmkirin.

Esad, ji hinek endamên TKP'ê yên nû hatine re, ji bona di nava qoxuşê de fesadiya tiştên ku tên kirin bike û peywendiyên navxweyî bide dest sîxûrtiyê ferz dike. Li ser kesên ku beriya niha hatin re jî ferz kiribû. Ya di vê mijarê de herî zelal Elîf e.

Lê em vekirî pê re axivîn û me got; “ ger tu tiştekê bejî wê ji bona te qet nebaş be. Her tim tu ji bona xwe bikaranîn. Êdî divê tu li hember wan helwestekê raber bikî. Ger wê tu di nav me de jiyan bikî, hinekê jî weke mirovan nêzîk bibe. Nexwe dê nêzîkbûnên din hemû te kirêt bikin.” Elîf zêde nema. Ji ber di her çûnûhatinên wê de Esad agahî jê dixwest. Nexasim navê hinek ji me dida, digot ku ev kesan birêxistin dikin, civînan lidar dixin, dilxwede haya wî ji her tiştî heye, lewma divê her tişt jê re were gotin. Elîf jî diyar dikir ku tiştekê nizane. Ya rastî bandora lêdan, êşkence û hinek pêkanên din jî jiyan dikir. Hem kesayetek cureya ku wan dixwest bû, hem jî ‘hemşîreya dewletê ya bi aqil bû’, di heman demê de jinek belangaz bû. Li hember pêkanên ku li dijî cinsê wê dihat kirin şikestinek jî jiyan dikir. Ji ber carê leşkeran bi şaşî li wê jî dixistin. Hinek leşkeran jî bi gumana ku agahiyan ji wan re dibe, nerim lê dixistin. Hinek kesên ku li hember îxaneta jinê ya li dijî jinê bertek raber dikir jî hebûn. Kêfa leşkerek êşkencekar jî ji sekna wê ya di nava hemû jinan de cuda re nedihat. Ango leşker jî ji vê sekna wê nerazî bûn. Tiştek ecêb bû, digotin; “madem ew jî wisa dike, dema em li wan dixin, emê jî wekhev nêz bibin.” Hesen’ê ji Çorumê, Bahattînê ji Gîresunê jî ti caran ji Elîf hez nekirin!

Elîf, xizma Elî Osman bû. Em jî, dema ew lez û bez hat berdan pê hesiyan. Elî Osman ûsttexmen bû. Kesayetê ku piştî Esad gotina wî derbasdar bû. Elîf jî xêra xizma wî bû rizgar bibû! Lê baştir bû.

Kêliya herî zêde Esad pê kêfxweş bûyî, kêliya berxwedaniya bi jinan re dişkand bû. Nexwe weke din Esad her tim har, bihêrs û di nava giyanek êrîşkariya ku tiştên dixwest bidest nedixist de bû. Rûyê wî yê li cem me diyar dibû wisa kirêt bû. Her cara dihat qoxuşan digot, "heywan kurê heywanan! Hûn jî min aciz dikin." Hêja bû mirov wî rêbazê dijûn û gotinên wî bibîne. Ma ezê niha çawa bidim diyarkirin ku, ev rewşa dijmin çawa moral dide mirovan? Ew dijûn û harbûna dijmin dihişt ku baweriya mirov li hember mirov pêş bikeve. Ger dijmin evqasî har e, dijmin evqasî bi kîn e, wê demê bi me re jî aliyên ku dijîn, li ber xwe didin, li ser piyan disekinin hêj hene û bihêz in. Ger tevî ku me hinek qural pêk anîne, van tiştan dibêje, wê demê dijmin negihaye armancên xwe. Dema destê xwe dida ser dîwaran weke ku mêşan biperçiqîne dikir. Lê pirsgirêk ne weke Esad digot û dikir bû. Nekarîn me weke mêşan bipirçiqînin. Em ewqasî biçûk nebûn ku, bikevin nava lepên wî. Wî jî ev rastî dizaniya.

Ez dîsa di nava wê hengameyê de li ser revê hizirîm. Derî heta derengiya şevê vekirî dimînin. Êdî leşker jî her tim di nava me de nasekinin. Dema lêdanê dikin, an jî dema rewşek hebe, bi qelebalix dikevin hundir. Weke din leşkerê gardiyanên qoxuşan û çawîşê blokan hene. Ez jî dihizirim ku mirov bi ser ban re bireve dê çi bibe. Min ev nêrîna xwe ji Gûlten û Aysel re jî got. Hinek ecêb dimînin ku ez çawa di nava vê hengameyê de li ser vê mijarê dihizirim. Weke fikrek niyeta baş û xeyal jî dinirxînin. Aysel got; " avahî bilind e. Qada derve jî ya leşkerî ye. Zilaman tevdîrên xwe baş girtine. Nabe." Min jî got; "emê derkevin ser ban, lê binêrin." Gûlten di vê mijarê de zêdetir hişyar bû û hinekê jî xwedî rihek anarşîst bû. Lê anarşîstek

bêdeng û nerim bû! Me got, em paçan girê bidin, daxin jêr. Pişt re me bi benê cilan ceriband. Ben pir tûj e. Destan dibire. Mirov herî zêde giraniya wê di destan de dihese. Girêkên me li benê jî dayîn kêrî tiştekê nedihatin. Piştî ku ez heta asteke diwar hilkişiyam, min devjê berda. Deriyê ku derdikeve derve heye. Em di kêliyên ku korîdor bêdengin de diceribînin. Negengaz e ku mirov mifteyan veke. Em hinekê li dîwar mijûl bûn. Odeyek cihê gardiyanan heye. Jixwe gardiyan jî zêde lê namînin. Me got; "gelo ew der çawa ye, mirov nikare ji wir ve dîwar kun bike?" Wir jî hêvî neda me. Di destê me de hinek parçeyên hêsin hene. Lê zehmete ku mercên heyîn mirov birêxistin bike. Ji ber her roj rewşek nû rû dide. Êdî cihê hewagirtinê jî li gorî demjimêran tê bikaranîn. Ew ode jî dibin odeyên lêpirsînê. Ango xwesteka revê jî dibe xeyalek û xilas dibe. Ez jî carê behsa firarên berê dikim. Ji ber dema mirov behsa paşerojê dike, ew zindî dimînin. Her kêliyek têkoşînê ya hatiye jiyîn, dibe moralek. Her bîranînek weke pirtûkekê ye. Weke helbest û weke romanê ye. Bi her aliyê xwe yê henek, trajedî, hezkirî û xemgînî ve tije û dagirtiye. Lê herî zêde jî dibe çavkaniya hêzê. Her hevalek, her axaftinek, her tiştê aîdê Rêbertiyê, her gotinek, her çalakiyek, her zehmetiyek bi dehan car tên vegotin. Her carê jî weke ku, nû tên vegotin bi zîndewariyek mezin tên guhdarkirin. Ji ber êşa tiştên ku hatine jiyîn wisa dihat derbaskirin. Dîsa girêdana bi tiştên hatine jiyîn re jî wisa dihat avakirin.

Me jî hevalên ku ji bona hevalan peywendiyê çêkin, xwe sewkî nexweşxaneyê bikin destnîşan kirin. Ev jî hevalên saxlem û qinyata me bi wan tê ne. Rojiya mirinê hat pirştrastkirin. Ji destpêka Adarê heta nîvê Nîsanê berdewam

kiribû. Elî Erek şehîd ketibû. Daxwaza bingehîn jî rakirina êşkenceyan bû. Piraniya qadroyên pêşeng tevlî rojiya mirinê bibûn. Bi gelemperî girtiyan di bin êşkenceyê de neçarî teslîmiyet û îxanetê dikin. Şoreşgeiya berpirsiya evqas girtiyan hîs dike û difikire û berxwedaniya wî, bi çalakiyek wisa ve derketibû pêşberî dijmin. Diyardeya rojiya mirinê yekem car bû dihat bihîstin û nîqaşkirin.

Ji rojiya birçîbûnê cudatir bû. Êdî em li hember rojiya birçîbûnê nebiyanî bûn. Di rojiya birçîbûnê de li cem avê di wextên diyar de -ger derfet hebin- hinekê jî ava şêrîn didan! Dîsa mirov di navbera xwe de wext diyar dike. Ger xeteriya mirinê hebe jî, li gorî naverokên daxwazên hatine destnîşankirin, li gorî girîngiya wan helwest tê raberkirin. An dê werin qebûlkirin, an jî heta sînorê mirinê nayê berdewamkirin. Lê rojiya mirinê cuda ye. Daxwazên tên destnîşan kirin di asta jiyanî de ne. Dijminê te bi hemû amûrên xwe ve li holê ye û ti mafê jiyanê nade te. Dadikeve hemû şaneyên jiyanê. Bi hovane êrîş dike û jiyan bi xwe dibe êşkence. Di van rewşan de rêbaza çalakiya ku dijmin paşve bixe, wî bide rawestandin, henaseyekê bide girtiyan a herî bi bandor rojiya mirinê ye. Mirov dibeje ma tu mirina min ferz dikî? Ha ji te re mirinek bi onur! Di naverastek ku di jiyanê de her tiştê weke hewa girtin, heta pêşwazîkirina pêdibiyên herî asayî dibin amûrên êşkenceyê de, bi hemû vîn û şaneyên bedena xwe ve li ber xwe dayîn, çalakiyek ku dijmin ti caran hesab nake û nahizirê ye. Ji dijminê ku birçîbûn, bê avî, bê xewî, axaftin, temaşekirin û dîtinê qedexe dike re, çalakiya rojiya mirinê dide diyarkirin ku mirov çawa bi rojan, hefteyan û mehan dikare tenê bi avekê û hewayekê bijî, îradeyek çawa ji pola ava dibe dabû diyarkirin.

Her kes li ser di-axive û şîroveyan dike. Leşker jî mat mane. Dibêjin; “ma çawa dibe, dema em rojekê xwarin naxwin, em bandor dibin. Çi îrada van heye.” Doxtoran jî digot; “ev çi kar e? van zanista heyî jî serûbin kirine!”

Girtiyan lenet li lewaziyên xwe danîn. Wan jî digot; “ger dijmin dixwaze bila cezayê cixareyê jî bide, dixwaze bila salakê çayê nede, dixwaze bila me qet dernexe hewagirtinê. Bila werin me di yek kêliyê de bikujin. Ma kesên di rojiya mirinê de çawa li ber xwe dan?” Êdî her endamek rojiya mirinê ji bona malbatan jî hêzek îlahî bûn. Navê Mazluman, Xayriyan, Pîran û dehan kes ji devê wan nediket. Êdî hemû zarokê wan bûn. Weke din jî di raya giştî de behsa çalakiya rojiya mirinê kirin. Her çendî nexwazin di çapemeniyê de diyar bibe jî, di bikeve rojeva wan. Ev jî bersiva Cuntaya girtîgehê bû. Despêkek û hişyariyek bû. Esad Oktay soz dabû. Hem jî gotibû “soza leşkerî ye! Lê mixabin ev soz nehatibû cih. Heta demekê goşegirî û êşkence li cem me kêm bûn. Tenê şêweya wan hat guhertin. Lê ev ji bona demek kin bû.

Di girtîgeha amedê de du jinên girtî, yek ji libnanê, yek ji fransa…

Dema ji gelên cuda hinek mirov danîn girtîgehê pir cuda dibû. Sarah û Monîka li beşa ku em lê diman dihatin girtin. Li qoxuşa jêrê hatibûn bicihkirin. Sarah ji Libnanê, Monîka jî ji Fransa bû. Hevalên wan ên xort jî li beşa xortan girtî diman. Monîka di heman demê de doxtor bû. Şibake boyaxkirî bûn. Bi gelemperî jî girtî diman. Ji bona em bi hev re peywendiyê pêş nexin, an jî ji bona ew me nebînin dihatin girtin. Bes mirovên zêde hişyar û baldar bûn. Dibe ku di jiyana wan tevê de pêvajoya herî zêde baldar jî ev pêvajo bû. Bi qasî ku tiştên em hîs dikin, ew jî hîs bikin ew qas gerimbûn û nêzîkbûnek bi hest û raman hebû. Reyhan Saribal bi Îngîlîzî dizaniya. Ew jî ji doza TÎKKO dihat darezîn. Me bi navbeynkariya wê dest bi nivîsê kir. Dema ji Başûrê Kurdistanê derbasî Bakur dibin tên girtin. Doxtoriya wan jî bibû bela serê wan. Ji ber ‘alîkariya ji Kurdan re’ weke alîkariya ji PKK’ê re hatibû destgirtin, hatibûn girtin.

Sarah zêde hestewar bû. Zû bandor dibû. Ji ber dengê cop û êşkenceyan ketibû nav cihan. Monîka jî her ku firsend didît, bi îşaretan ji me re behsa Sarah dikir, bê çawa bandor bûye. Me di notên xwe de pêkanên dijmin û polîtîkayên wî yên girtîgehan dinivîsî. Me ji wan dixwest ku her agahiyên ku girtine û her tişta ku şahidiya wê kirine derve de diyar bikin.

Monîka pir zindî û weke cinekê bû. Di şibakeyên hatine boyaxkirin de kun vekiribûn. Her sehneyek dişopand. Dengê êşkenceyan girtibû teybê. Bes dema ev hat ferqkirin, teyb ji destên wê girtibûn. Ji bona vê û pêkanên li dijî wan tên kirin

protesto bikin, rojekê xwarinê nagirin. Ya rastî ev jî protestiyek li dijî pêkanên li hember me dihat kirin bû. Tiştên din jî bibûn hêcetek. Dema çûyîn jî kulmên xwe rakiribûn û gotin; "Kurdistan, Kurdistan" qêriyan û wisa xatirê xwe xwestin. Hinek nivîsên ku me di kêliyên dawî de dabûn wan, bi gumana ku dibe were girtin paşve dan me. Bes gotin; "me di serê xwe de nivîsandine, soz emê wan her cihê ku em diçinê vebêjin û ragihînin." Me di kêliyên dawî de ji panîka leşkeran sûd wergirt, di xulekên dawî de gotinên xwe yên herî gerim û rêhevaltî ji hev re gotibûn.

Mirov her kêliyê bi dijmin re rû bi rû ye, mirov her kêliyê rastiya xwe ya tazî dibîne. Ma wê mirov heta kengê û çawa ji kîjanê bireve?

Cahîde bê moral e. Cahîde her tim li nav cihan e û digirî. Cixare li ser cixareyê dikişîne. Axaftina me ya destpêkê zêde berfireh bû. Ne rast bu hinek bûyerên derve di mercên cuda de hatine jiyîn evqasî derxe pêş û evqasî di bin bandora wê de bimîne. Tiştek ecêb bû. Me çi dikir, me ti wate nedida. Ya ku herî baş ew nas dikir ez bûm. Di pêvajoya Elezîzê de baş bû, xebatên dibistanê û xebatên wê yên pêvajoya Sîwerekê her tim bi pesindan dihatin vegotin. Çi bû, çawa çêbû ku evqasî partiyê li dijî xwe bibîne?

Rewşa derûnî, sekn, bertek û hêrsên wê tev bandorek neyênî li hevalan dikir. Ji ber mercên dihat jiyîn gelek kes di hundirê xwe de bihêrs bû. Dema nedikariyan nêzîkbûnên dijmin û zehmetiyên wan hovîtiyan rakin, mîsoger bi rêbazên

cur be cur bertekên xwe diyar dikirin. Hinekê jî bipîvan nêz dibûn. Bertekên xwe yekser nedidan der. Lê kesên pirsgirêkên xwe yên wisa heyîn, pirsgirêkên xwe yên kesane derdixistin pêş, zêdetir bihêsan ser bi kesên xwe cihê dikirin û dijiyan de diçûn. Ji ber di rastiya derûniya wan de rastiya xwe didîtin. Hinek xalên ku bi hev re dibûn yek hebûn. Belê bertekek li dijî rêxistinê! Vê bertekê hiştibû ku ew di nava lêpirsînê de qelsiyên mezin jî bijîn…

Di girtîgehê de Rêxistin, ji bona wan hêcetek êrîşa dijmin dihat dîtin ku bi ser wan de diçe! Dijmin pir vekirî digot; "ger hûn rêxistinek din bûna, evqas tişt nedihat serê we." Di heman demê de li nava çavên endamên rêxistinên din dinêriya û wisa di-axivîn. Belê, qaşo ji ber ew ne PKK'yî bûn, bi qail bûn! Wisa di çavên dijmin de, tenê lêdana çors kêm dixwarin. Li gorî dijmin ev jî ji bona wan xelat bû. Hemû jî evqas bû. Ya rastî di nava van koman de hevalên pir hêja hebûn. Her wiha bi rastî jî ew heval her tim bi onura şoreşgerî ve jî girêdayî bûn. Her çendî lewazî, bêçaretî û helwestên wan rêxistinên cuda hebin jî, gelek tiştên me hevbeş parve dikirin hebûn. Dijmin jî ti caran nekarî vê girêdana di navbera me de qut bike. Di vê manê de lîstokên wan pêk nehatin. Heta gelek kesên ku xwestin wan bixin, bikin sîxûr û neçarî îtîrafê bikin, ji nêzîkbûnên me bandor bûn û dev ji wan helwestan berdan. Pir vekirî lîstokên dijmin pênase kirin û bêşermiya wan bilêv kirin.

Cahîde, di nava derûniyek wisa de dijiya, hem nedikariya xwe ji êrîşên dijmin rizgar bike, hem jî nedikariya xwe ji bertekên girtiyan û gelek nêzîkbûnên wan ên ji ber van helwestên wê rizgar bike. Di nava pençeyekê de mabû. Di nava mercên wisa de derûniyên bi vî rengî gelekî xeternakin. Dijmin

ji hêla taktîkî ve bihêz e û her amûrên xwe jî bikar tîne. Her kêmasiya ku bi kesayetan re tê jiyîn, her lewazî, derfetên hevgihîna bi dijmin re zû dibîne. Lewma ser her cure lewazî û kêmasî girtin, hemû derfetên ku deriyê ji dijmin re vedike ku dijmin bikare bikeve hundir girtin, şertê sereke bû.

Ya rastî qadek şer a pir dijwar e. Qada ku kesayet herî zêde li vir tazî tên ceribandin evdere. Tu nikarî ti lewaziyên xwe veşêrî. Hemû amûrên te yên şer ji destên te hatine girtin, her cure venêrîn heye û qadek ku jiyan bi temamî di bin însiyatîfa dijmin de dimeşe ye. Mirov her kêliyê bi dijmin re rû bi rû ye. Mirov her kêliyê rastiya xwe ya tazî dibîne. Ma wê mirov ji kîjanê heta kengê û heta kuderê bireve?

Gardiyan bangî Cahîdê kiribû. Bes ne roja serdanê bû, ji ber mehane serdan qedexe bû û serdan jî hatibûn jibîrkirin. Ne jî roja dadgehê bû. Gotibûn parêzer hatiye. Hevdîtina bi parêzeran re jî bi serê xwe belayek bû. Herî dawî Hisên Yildirim hatibû serdana min. Ez ji hucreyê biribûm. Li kêleka min jî polîsa jin hebû. Wisa xwe li cihê hevdîtinê bicih kiribû, di şêweyek ku lingê wê pêl lingê min bike de bû. Çavên wê li çavên me digeriya. Bi gumana ku dibe em bi çav îşaretê bidin hev, çavên xwe nahejîne jî. Ji ber Hisên Yildirim pirsî; "tu çima evqasî zeyîf ketî, ma tu nexweşî?" Min jî got; "na, tiştek min tine ye. Ez bi tenê bûm. Bê xewî û hinek tiştên din bandor kiriye ku wisa bim." Bes ji ber vê bersiva min, ew jina ku polîs bû bi hişkahî li pêl lingê min kir. Dema min jî ji nişka ve awirek tûj dayê tirsiya. Bes Hisên Yildirim rewşa heyî fêm kiribû. Sedema pêl lingê min kirî jî hişyariyek bû ku dibêje; "zêde ne-axive. Zêdegaviyê neke û behsa tiştên hundir neke" bû. Jixwe hevdîtina me jî dirêj nekir.

Di rojên pey wê de bi zorê hîn bûm ku Hisên Yildirim hatiye girtin. Nizanim çi ji wan kirin. Bes dizanim piştî ez vegeriyam cihê xwe, ji ber min pirsa parêzerê xwe kir, min lêdan xwar. Ji ber hînbûna girtina Hisên Yildirim agahiyek bû. Ji ber dê teqez ti agahî ne ji derve de bihata hundir û ne jî dê ji hundir derketa derve! Ev jî qanunên Esad bûn.

Cahîde demek dirêj mabû. Hevdîtina bi parêzeran re jî herî zêde yek-du xulek bûn. Heta carê çirkekê didoma. Ji ber hinek ji qoxuşan derdiketin hebûn, bi gelemperî her kes bêdeng dima. Çi çûnên dadgeh, nexweşxane, çi jî hevdîtinên bi parêzeran re dibe, her tişt ji bona kesên ku derdiketin derve ezmûnek bû û kêliyên zehmet bûn. Ji ber di her kêliyê de, her tişt dibû. Dibe ku bibin êşkenceyê jî, an jî bi yeke din re jî bînin miqabilî hev. Tu biçî kuderê biçe, her der rêya êşkenceyê bû. Nexasim yeke ku zêde baweriyê nede, derûniya wî/ê tevlîhev be, kesayetek bi sekna xwe hêvî dabe dijmin be, her sekinandin bi serê xwe vediguherî êşkenceyekê.

Dema vegeriya qoxuşê serê wê li ser milê wê bû. Çavên wê weke yên sucdaran bû. Awirên xwe ji yên me vedişart. Belengaz û bi kele girî bû. Yekser dest avêt cixareyê. Belê, vê carê jî Cahîdê parçeyek xwe winda kiribû û wisa hatibû. Ev rastiyek mîsoger bû. Di vir de her kes li hember Cahîdê hinek tişt hizirîbû, şik biribû, dilê xwe pê şewitîbû, an jî bihêrs bû. Bes herî zêde jî wê dizaniya ku, herî zêde ez wê fêm dikim. Dema li min temaşe dikir çavên wê tije girî dibû, ji şerimbûna wê bû. Demekê qet nehat cem min. Her kes li gorî xwe şîroveyan dike. Bêdengiya min jî çarenûsa ziman dikişîne xwe. Êdî her kes hişyar nêzî şîroveyên zêde bi dijûn dibû. Her kes li bendêye ku ez tiştekê bêjim.

Berî wê jî dijmin bangî wê kiribû. Em bi hev re kiribûn heman hucreyê. Em neh kes di heman hucreyê de bûn. Hucreyek avî bû. Me pêdiviyên xwe jî di nava hucreyê de li hember hev ji bedena xwe dîwar çêdikir, wisa pêk danî. Derî û şibake girtîbûn. Hewaya wir wisa xirab bû, dema êşkencekar derî vedikirin, bi desmalê bêvila xwe digirtin. Bêxewî, birçîbûn, bê avî û sermayê em tev kiribûn rewşek gelekî xirab de. Lê dîsa jî moralê me pir baş bû. Me ti caran ewqasî henek nekiribû û em nekeniyabûn. Me ji wê jiyanê bi dehan pêkenok derxistibûn, me girêdanek bi bîranînan re çêkiribû û em wisa ji wê nêvengê dûr ketibûn. Bes, wê demê jî bangî Cahîdê kiribûn. Li gorî dijmin di bin derûniya cezayê goşegiriyê de dê Cahîde hêsantir were bikaranîn. Lê pirsgirêka Cahîdê ne tenê bi wir ve girêdayî bû. Jixwe ew kêlî û rojên bi êşkence vediguherîn ku gelek tirsên di hundir de jî bişkîne.

Ji ber her ku dijmin êşkence zêde dikir, kîn û nefret jî zêde dibûn. Bêçaretiya dijmin, ferzkirina evqas ketîbûnan, riyên zêdetir ku mirov bikaribe girêdanekê jiyana bi onur re çêbike derdixist holê. Tirsa mezin êşkence zêde dikir. Tirsa kesê ku êşkence jî didît parçe dibû. Dijmin jî ev rastî ferq dikir. Lewma ji girtina lewaziyan û kêmasiyan û ji wir li kesan dayîn zêde ti encam ne dida.

Cahîdê jî behs dikir ku dijmin çi jê hêvî dike, çi dixwaze û çi axivîne. Di vê mijarê de tiştek neveşartibû. Ji ber ger yek peyv jî veşarta, dê dîsa jî xwe bida dest. Di vir de her tişt dihat fêmkirin. Wê rojê jî dema xwest vebêje, ez hemêz kirim û bi girî got; “ez tiştekê ji te naveşêrim. Weke ku tu hêzek lêpirsînê yî. Ez neyêm ji te re nebêjim jî, hêzek heye ku min ber bi te ve

dikişîne, da ku ji te re bêjim. Aliyên şoreşgerî ku te berê bi min re dane avakirin û paşeroja min zêdetir derdikevin holê. Carê ji te aciz û hêrs dibim. Ji xwe re dibêjim çima li vir e? Çima evqasî bandor li min kiriye? Baweriya xwe jî û bertekên xwe jî yên li hember partiyê, li hember te dijîm. Tu çima dev ji min bernadî?"

Ez ji xwe ecêb mam. Min sebrek çawa raber kiribû. Di rastiyê de jî ez kesek zêde bêsebrim. Gelo bê sebirtiya zêde, hewcedariya sebra zêde jî ava dikir?

Belê, vê carê jî dijmin hinek tişt ji Cahîdê xwestibûn. Polîsên di lêpirsînê de hatibûn. Bavê wê jî anîbûn. Koç Elî, polîs û Cahîde bi hev re ne… gelo Koç Elî ji bona keça wî Cahîde dihat çi wateyê? Di pêvajoya lêpirsînê de 'Nevîn' kiribûn parçeyek ji bazarê. Di bersiva 'berdana Nevîn' de îfadeyên heyîn li dadgehê jî cardin dubarekirin. Navê vê jî îtîrafkariya veşartî bû. Derneketibû TV û gefên destavêtinê jî hatibûn rakirin. Jixwe îfadeyên ku beriya niha li ser wê hatine dayîn jî negirîng bûn. Bes bila Cahîde poşmaniya xwe rave bike. Pirsgirêkên Cahîdê yên bi rêxistinê re hebûn û dijmin jî ev dizaniya. Ji ber Cahîdê di lêpirsînê de ev rewş dabû der. Li hember rêxistinê bi hêrs bû. Li şûna gumanên rêxistinê, gumanên xwe yên kesayetî dabû pêş. Malbatperestiya wê derketibû pêş. Rizgarkirina xwe ji rêxistinê jî hêvî nedikir. Berovajî vê digot; "rêxistinê mehfa min anî, ez xilas kirim." Di nava çeloxwariyek wisa de bû. Nêzîkbûnên kesan ên teng û şaş bi yên rêxistinê re têkilhev dikir. Koç Elî bi tona pere dide polîsan. Ev jî ji bona êşkenceya zêde li wan neyê kirin, Nevîn were berdan û her wiha xelata ku şevekê Cahîde li malê bike

mêvana xwe digire! Tevî ku firsend jî heye, Cahîde ji ber rewşa malbata wê nekeve xeteriyê nareve. Ango ev qasî girêdana xwe ya bi rêxistinê re tûj qut kiriye. Goşegirî hêjayî xwe nedîtiye. Bersiva vê jî weke ku bêje; "ma goşegirî dibe? Ha ji te re hebûna di bin venêrîna dijmin de bijî." Diyar dike.

Wê demê nameyekê jî dinivisîne. Polîs dibêje; "ji derve re binivisîne, bila bavê te navbeynkariyê bike. Em jî wan bigirin." Wê demê hedef girtina Mehmet Karasungur ew in. Li gorî polîsan qaşo Cahîdê dizaniya ku kî li kure, mirov dikare çawa peywendî pêş bixe. Wê jî got ku agahiyên şaş dane wan, bi zaravayê dimilkî ji bavê xwe re gotiye ji polîsan dûr bikeve. Ev rast bûn. Lê êdî Cahîde jî nedizaniya ku dê heta kengê di nava vê çûnûhatinê de bijî. Di navbera radestbûn û îxanetê de xetek pir zirav hiştibû. Yan dê cardin vegere berxwedaniyê, xwe cardin di vî zemînî de ji nû ve bibîne û derfetên vê hemêz bike, yan jî dê ber bi îxanetê ve biçe.

Bi gelemperî di bin lêpirsînan de axaftin û îtîraf çêdibin. Lê divê kes piştî wir vegerek pir bi lez pêk bîne. Dema ev pêvajo ji demê re bê hiştin û israra di wir de mirovan xilas dike. Dema vê çûnê dirêj jî û kin jî dibe. Ev zêde negirîng e. Bes berê xwe dide wir.

Heta cihekê sînorê sebrê jî heye. Ger di vê rewşê de jî hevsengiyek neyê sazkirin, dê zerarê bide. Li hember Cahîdê şik hene, rastiya wê ji vî tiştî re rê vekiriye. Lewma divê di vê mijarê de rewşa Cahîdê baş were nirxandin. An dê xwe sererast bike, yan jî dê biçe cihê ku biçiyê. Şerê bi vê rewşa wê re jî, dê bibe mebesta amûrên girêdana rast a bi berxwedaniyê ve baş were hilbijartin.

Min jê re got; “tu doza gel a ku evqas mirovî canê xwe di vê riyê de daye davêjî aliyekê, li pey mafê namûsa xwe ya kesane ketî. Pirsgirêkên me gelek kesan çêbûn. Gelek heval cezayên tecrîdê girt, peywendiyên gelek hevalan hatin cemidandin û hwd gelek tişt pêk hatin. Lê kes ji wan ev nekir mijareke pirsgirêkê. Kesî nekir hêceta bertek û hêrsên xwe. Ma tiştên ku ji bona te tên gotin ewqasî girîng in? Jixwe hûn bi dergistî bûn û partiyê jî têkîliya we erê kiribû. Dibe ku tu zewicî jî bî, dibe ku te zaroka xwe jî jiber xwe biribe, an jî wisa were zanîn. Ewqas pêşketinên girîng li qadê hatin jiyîn. Gelek şahadet hatin jîyîn. Tu yek ji van ji xwe re nakî derd, serê xwe jî bi namûsperestiyek teng ve mijûl dikî. Her wiha dijmin jî ji vê rastiyê sûd werdigire. Dibe ku yên beriya te hatine girtin agahiyan bidin dijmin, dibe ku di raporên hatine girtin de navê te jî hebe, dibe tewanbariyek girantir jî li ser te hebe. Lê yek ji van jî ji ber nêzîkbûna te ya li cem polîsan te mafdar nake. Tevî ku te dizaniya li te digerin, tu ji bona serdana Silêman têyî malê. Her wiha tu li cem polîsan pir vekirî Nevîn dikî mijara bazarê. Dibe ku bavê te pere jî anibin. Lê ewlehiya te ji her tiştî girîngtir bû. Tu bi dijmin re bazarê dikî. Tu vê li ser çi esasî dikî? Her wiha ev helwesta te li vir jî berdewam dike. Tu nama dinivisî, paşê dibêjî; “agahiyên şaş in.” Bes ev jî teslîmiyete. Yan dê tu helwestekê raber bikî, yan jî evê te ber bi îxanetê ve bibe. Rojên derbasbûyîn bîne bîra xwe. Bihizire ku şoreşgerî çiqas diyardeyek bêhempa û bilind e. Ma ne te behsa balkêşiya wê jiyanê dikir. Wê demê divê dîsa tu xwe bi lez û bez ji vê rewşa heyî rizgar bikî. Ev di destên te de ye. Dê dijmin bela xwe ji te veneke. Ji ber te cesaret daye wî. Dê her carê tiştekê ji te bixwaze. Dê te jî ji xwe re bixwaze. Jixwe tu niha ne ya

PKK'ê yî. Te li dijî partiyê cih girtiye. Dê dijmin te xirabtir bi kar bîne. Ger tu helwestek rast raber bikî û bipîvan tevbigerî, dê dijmin jî bela xwe ji te veke. Dibe ku her cara bangî te dikin tu xwesteka wan pêk nayînî, lê tu hêviyê didî wan. Ji ber ti helwesta te tine ye. Ger tu helwestê raber bikî, êdî cesaret nake ku bangî te jî bike. Lê binêre ji yên dervî me re daxwaza sîxûrbûnê ferz dikin. Fesadiyê ferz dikin. Bes em di-axivin, dema em kêmekê helwest raber dikin, dijmin dev ji wan jî diberde. Neke, lê binêre ger bi rastî jî tu bi Silêman ve girêdayî, ger hinekê rêzdariya te li hember hezkirinê heye, helwesta xwe biguherîne. Ji ber te li hember Silêman jî bikar tînin…"

Dema min ev jê re digot carê dengê min jî bilind dibû. Carê jî min nêzîkbûnek nerim li hember hestên wê yên winda nebûne, wê bibe rojên bîranînên xebatên me yên hevbeş û wisa di-axivîm. Digiriya û digot; "ew roj cuda bûn. Partî li Elezîzê cuda bû. Li Sîwerekê jî her tişt cuda pêş ket. Ji bona hesabên kesane hevaltî dihat fedakirin. Pîvan cuda bûn. Ez di nava gel de jî teşîr kirim. Min êdî nedikariya li rûyê kesî binêrim." Bi van gotinan re bi nalîn giriyên xwe jî didomand.

Min cardin jê re got; "xwe kom bike. An tu li nav cihayî, yan jî tu digirî, yan jî tu cixarê dikêşî. Xwe ji vê derûniyê rizgar bike! Tişta ku te lewaz dixe, helwesta te ya li cem polîsa ne. Ji ber bandora wê hêj heye. Bes hêj dem derbas nebûye. Her tişt di destê te de ye. Dê tu pir vekirî bêjî; "êdî bangî min nekin, ezê tişteke din ji we re nebêjim." Dixwazin bila bangî bikin. Ma ne her kêlî û her roj tên vir jî? Ma her cure zext, êşkence û gefan nakin. Wê demê dê tu jî li ber xwe bidî. Tu ne bi tenê yî. Xwe ji wê tenêbûnê rizgar bike, temam?" Got;

“temam.” Min cardin pirsî; “soz?” Hinek din nava çavên wê dikeniya. Lê hêj tije rondik got; “temam soz.” Min cardin got; “wê demê rabe xwe komî ser hev bike, zindî be. Ji vê rewşê derkeve.” Rabû. Êdî Cahîde hinek din zindî bû. Xwarin dixwar, dimeşe, di-axive, kêm jî be cardin li jiyanê vedigere. Guhertina bi wê re bi hevalan re jî rehetiyek ava kir. Lê dîsa jî hinek bêbawer lê dinêrin, weke ku bawer dikin ev rewş jî buhurdare û wisa dinirxînin.

Not ne giha Mazlum…

Ne diyar e ku rewşên giştî çine, li derve çi dibe, rewşa gel çiye, hevalan tevdîrek çawa girtine. Her tiştê texmîn, xeyal, şîrove û pênase tarî û nezelal in. Derfeta şopandina derve tine ye. Em nikarin ne bi rêya radyo, ne rojname û ne jî ji serdanan ti agahiyê bigirin. Carê hinek rojnameyên ku agahiyê windahiyan didan, girêdayî propagandeya dijmin nepixandî û nûçeyên derew nivîsandî didan me. Lê paşê ew jî ji me digirtin. Carê jî rojnameyên rengîn didan me. Lê ti nûçeyek bi nirx jî di wan rojnameyan de nebû. Bes rêzek nivîs jî carê gelekî bi nirx bû.

Êşkence zêde bibûn. Êdî her roj û her saet bi êşkenceyê derbas dibûn. Şev û roja wê nediyar bû. Çi saeta dixwestin bi dehan leşker diketin hundir û li me didan. Di rewşên asayî de jî leşkerên qoxuşan êşkence weke parçeyek jiyanê dimeşandin.

Dosya doza koma me ya weke koma Elezîzê dihat binavkirin, tevî hemû hewldanên parêzeran venegerandin Elezîzê, bi dozên PKK’ê yên Amedê ve hatin girêdan. Herî zêde jî Esad Oktay bi vê biryara dadgehê kêfxweş bû. Ji kêfa di

cihê xwe de nedisekinî. Piştî rûniştina dadê tiliyên xwe diqirçand û digot; “ez ti caran bi tiştekî ewqas kêfxweş nebûme.” Ew jî cara yekê bû tevlî rûniştina dozekê dibû. Pir vekirîbû, ku wan dadgeh birêve dibir.

Ew demek dirêj bû min jî cara yekê bû heval didîtin. Bi salan bû me tenê gelek agahiyên nexweş dibihîstin. Ez di wê baweriyê de bûm ku li dadgehê agahiyan bigirim. Lê mixabin, ji ber temaşekirina me jî lêdan û dijûnan bersiv didan. Jixwe yên li çep û rastê min rûniştîn qet temaşe nedikirin… an jî bersiva pirsên min nedidan. Min dîsa bi rêzê weke zorê bixwazibin tiştekê bibînim çav li derdor digerand, ew rûyên xemgîn û aciz ên bersiva axaftin û pirsên min nedidan, ez zêdetir dîn dikirim. Me di heman mercan de jiyan dikir. Êşkence li me jî dikirin. Li dadgehan ji me re jî dihat gotin; “ne axivin.” Her wiha me dizaniya ku dê teqez di vegerê de li me bixin. Tevî vê jî diviya em bi-axivin, li hev binêrin, bi çavan jî be silav bidin hev. Ma evqas jî ne dibû! Yek du hevalan digotin; “em baş in.” Ewqas bû. Ez li hevalên aliyê din rûniştine dinêrim. Ew dûr rûniştine û dîsa jî dikenin. Ew di vê mijarê de rehet in, leşker zêde dest nawerdin, lê dijûna ji yên din re dibêjin, bi copan li destên wan ên bi kelepçe dixin. Heta ku şandeya dadê nedihat ew kelepçe nedihatin vekirin. Hevalan her carê montê reş li ber xwe dikir. Ew jî cilên girtîgehê bûn. Lê yên bin sivîl bûn. Heval dihizirîn ku dosya dozê li Elezîzê were destgirtin dê baştir be. Zekî Budak, zêdetir nêzî cihê Hisên Gûngoz wan in. Ez pisepisa wan dibihîsim. Ez jî di wê kêliyê de tevlî wan bûm, lê dema min kêfxweşiya Esad dît, min ji xwe re got; “bi lenet be! Xweziya em bişandan Elezîzê.” Dema vegeriyam qoxuşê jî me demek dirêj li ser vê şîrove kir.

Li ser koma Elezîzê hinek hesab hebûn. Şahîn di îxanetê de jokerek bû. Pir vekirî bû ku dê dijmin wî li dijî komên din jî bikar bîne. Bes bi dehan qadroyên pêşeng hebûn. Kesên weke Mazlum, Xeyrî, Pîr, Karasu, Riza, Muzaffer hebûn… Gelek kesên din jî hebûn, her yek tevlî dozekê dibûn. Gelek hevalên din ên nas dijmartin. Dibêjin; "ev hemû bi partiyê ve girêdayî ne. Hêza wan heye ku parastinê bikin." Ma Şahîn dikariya çi bike? Jixwe tiştên ku bêje tev gotibû, tiştek nû jî tine bû. Me jî got; "ji bona ku moral xirab bikin, dê herî zêde wî bidin axaftin."

Koma yekemîn hatîbû girtin, koma Elezîzê bû. Lewma em jî dihizirin ku koma yekemîn derkeve dadê ew kom e. Ez jî di vê mijarê de amadekariya paraznameyê dikim. Dema heval li cihê istihkamê bûn, di derbarê paraznameyê de nîqaş kirine û planek derxistine. Heta ew derxistine derve, ji partiyê re jî şandine. Nushayek jî şandine qoxuşa jinan. Ew not parçe parçe hatibûn veşartin. Hevalan digot ew saxlem in, lê derxistina wan xetere. Ji ber hem dibe ku hinek bibînin, hem jî ger li holê bin, dibe ku di kêliyek lêgerînê de zehmet werin veşartin û parastin. Weke din jî em her cihî bikar nayînin. Ji ber vê, em jî li wextek guncav digerin. Diviya em her yekê nushayek wan derbixin û cardin veşêrin. Ger bikevin dest jî, 'ezê bêjim paraznameya min e.' em di derbarê plansaziyê de jî tiştên ku di hiş de mane nîqaş dikin. Bes aliyek din a pirsgirêkê heye. Gelo me dikarî em bê destûra rêxistinê û erêkirina wê parastinê bikin? Em komek biçûk a ku ji hevalan pêk tê, li ser van mijaran tevan nîqaş dikin.

Ez bi xwe ji roja lêpirsînê ve peywendiya xwe ya bi rêxistinê re diparêzim. Parastina bîrdozî û armancên me dikim. Vê helwesta min di doza yekemîn ya em hatin tevlî bûn de jî berdewam kir. Heta min parastinek zelaltir û di astek herî pêşdetir de kir. Ez bawerim dê ji vê gavê şûnde jî kes ji min nexwaze ku ez gava xwe vekişînim. Di vê mijarê de ti gumanên min tine bûn. Lê dîsa jî me di vê mijarê de agahî bida rêxistinê, wê çiqas baştir bûya. Min gelek caran notên biçûk nivîsandin û li cem xwe amade kirin. Lê min ti caran firsendek nedît ku ji hevalan re bişînim. Tu her demî didî, lê gelek caran liqayî hevalê ku tu dixwazî nayê. Ji ber vê karê me tev ji şans re mabû. Herî dawî notek ku min bi navê hevalê Mazlum nivîsandibû bi mehan çû û cardin li min vegeriya. Ne min ew not vekir, ne jî min karî wê notê tine bikim. Min her tim hêvî kir ku ezê bigihînimê. Lê mixabin not negihayê. Me nekarî em bigihînin hevalê Mazlum.

Tazîbûna ji mirovahiyê hatiye dûrxistin, bi êşkenceyê haitbû pêçan

Hema bêje di Gulanê de qiyamet rabû. Rojên êşkenceyan ku Esad her tim dihat qoxuşan û bi gilîza devê xwe dijûn dikir –bê ku qoxuşa jinan cihê bike- bûn. Rojên wisa bûn, cilên hinek kesan bi zorê ji ber wan dikir û ew dişandin qoxuşa jinan. Armanca wî da ku bêje hewl daye di qoxuşa jinan de dest bavêje wan û şerê derûnî li ser wan kesan bimeşîne. Jixwe heta newqê tazî çûnûhatinên wî ne ji xêrê bûn. Carekê jî bangî Aysel kiribû û biribû. Dema Aysel hatî bêmoral bû. Rengê wê şîn û reş bibû. Biribû cem Selîm, hevdîtinek pêk anîbû. Ji ber

Selîm hêj li qoxuşa ku ew lê dima quralên wan qebûl nedikir. Lê em pê hesiyan ku wê rojê wan jî qural qebûl kirine. Aysel digot; "êşkenceyên zêde dijwar hatine kirin, hemû heval tazî bûn. Di nava komê de heval Mazlum jî hebû. Dema Selîm jî anîne, Esad ji Aysel re gotiye, emê dest bavêjinê û anîn cem min. Selîm jî ji neçarî qural qebûl kirin û ew bi xirikandinê cardin birin." Xemgîniyek giran bi me re hebû. Lê dîsa jî ez qet ne bê hêvî bûm. Her carê min digot, teqez tiştek ku ew dizanin heye.

Berxwedaniyek tam heft mehan bê navber berdewam kirî hat jiyîn. Di şerê artêşan ên li dijî hev de jî demek wisa dirêj zêde û mezin e. Ji ber hêzên hevseng û mercên ku hevsengiya hev ava dikin hene. Di dîrokê de ti şer evqasî bêhevsengî, ji yek alî ve ne bûye û nexwedî amûrên hovane ye.

Girseyek girtiyan a bi hezaran hebû. Gelek koman hêj di rojên destpêkê de teslîmiyet hilbijartibûn. Ev bi xwe ji qada şer vekişandin bû. Ya dihat kirin zemînê êrîşên dijmin ên di nava xwe de lewazkirin û bi tenê hiştin bû. Piştî demekê, berxwedanî ji aliyê komek qadroyên pêşeng ve hatibû meşandin. Her wiha ev qadroyên pêşeng ji aliyê pêkhateyên wan bi xwe ve tenê hatibûn hiştin. Pêkhate bi êşkence û çewisandinên pir giran ve parçe parçe hatibû qutkirin. Bêrêxistin, bêpiştewanî hiştin û şêwaza şerek yeke yek pêşengê ku ew dimeşand mabû. Berxwedanî jî di qonaxek wisa de diyardeyek efsanewî ye. Hêzek baweriyê û hêzek moral a bêhempa ava dikir. Hêvî li wê derê bû. Her kesê, me hemûyan digot; "dê teqez ev rewşa me berovajî veguhere." Ji ber quralên ku bi zorê hatibûn ferzkirin bûn. Dihat gotin ku; "em di wê

baweriyê de ne, wê rojên em bikaribin wan jî red bikin werin. Bes bila yek riyeke ku em bikaribin ji van rizgar bibin bêje. Bila rêbaza wê şanî me bike." Her kes li benda îşaretekê bû. Di vê mijarê de li hember nêzîkbûnên weke reşbînî bi qasî misqalekê, an jî baweriyek ku bêje, "ev nêveng nayê guhertin" yekser bertekên mezin dihatin raberkirin. Dem bi dem nêzîkbûnên wisa bê hêvî derdiketin holê. Li dijî gotinên weke; "ev e her kesî qural qebûl kirin. Dê herî dawî her kes serî ji dijmin re bitewîne…" bertekên tund dihatin raberkirin. Ev bêbaweriyek bû! Di nava PKK'ê de bêbawerî tine bû. Yê ev dijiya jî ne PKK'yî bû. Ne şoreşger û ne jî çepgir bû. Dibe ku dijmin ji hêla taktîk ve xurt be. Dibe ku me jî hinek qural qebûl kiribin. Bes ev jî zêde dirêj nakin, dê ji dervede teqez heval hinek tiştan bikin. Ger em bikaribin di hundir de jî ji nû ve hinek peywendiyan pêş bixin, baweriya ku dê teqez hinek tiştên nû pêş bikevin hebû. Ev bawerî her tim zindî dima. Lê mixabin dîsa jî ne dil, ne jî zanebûna heyî agahiyên nû qebûl nedikir. Weke êşekê li ser dilê me tevan datanî. Ji rewşa me zêdetir êş dida me. Her çendî bihurdar jî be, li hember dijmin rewşek binkeftinê jiyîn, nexasim ji hêla qadroyên pêşeng ve jî ev jiyîn, gelekî zehmet bû. Min hewl dida ku bi derdor nedim hesîn. Kesekê nedixwest qebûl bike. Dema ku bêzariya ew bi tenê hiştin jî bi ser ve zêde dibû, jan girantir dibû.

Di vir de propagandeya dijmin a esasî, rewşa kesên ku hewl didin ji teslîmiyeta xwe re kilifekî bibînin, hêza wan tine ye lewaziyên xwe derbas bikin, qelsiyên xwe bin bixin, bêçareserî û bêçaretiya xwe derbas bikin, gelekî girîng e. Di berovajîkirina mercan de yek ji van jî ne asteng bû. Qada bandora van heta cihekê bû. Dikariya hinek hêmanan bigire

nava xwe. Berxwedanî di mercên zêde bêhevsengî û di nava êrîşên hovane de hatibû şikandin. Bêguman, bandorên vê hebûn. Bes ji ber rewşek bikare yekser di nava xwe de hêviyê, baweriyê û girêdanê ava bike heye û ji bona wisa tê nasîn, fêmkirin û hîskirin, girseyek mezin weke pêkanên ku demek dirêj bidomînin nedidît. Hêviyek hebû ku berxwedanî zêdetir berfireh bibe û her kes li bendê bû ku mercên vê ji nû ve werin avakirin. Ev jî ji pêşketinên ku dibe di heman kêliyê de rû bidin, rewşek ku sonda ji nû ve xwe komkirinê dide. Ji bilî hinek kesên îxanetkar û tinebûn ji kûranî jiya ne, kesên ku di bin pêkanên zor de baweriya xwe winda kirine, bêçaretiyê dijîn, bandorkirin û ji nû ve qezenckirin nezehmet bû. Dijmin jî di ferqa vê de bû, lewma hewl dida hemû derfetên ji nû ve kombûnê ji holê rake. Ji bona vê jî çi hewce dikir, pêk danî. Her lewazî û derengmayînek ji eniya berxwedanê pêş diket, qada dijmin a bandorkirinê berfirehtir û kûr dikir.

Êdî mirov nedikariya ji dengê qêrînên mirovan bi korîdor, cihê hewagirtinê û qoxuşan re derbas bibe. Dijmin biryar girtibû ku kesayetên yek tîpî ava bike. Kesayetên ku dev ji mirovahî, Kurdewarî, şoreşgeriyê berdayîn, ango civatek hovane ya li hember her tiştî rik digire! Dijmin dixwest ku bi giyanek cîhana mirovan ku li ser rewşa ji xwe biyanî bûye, herî lewaz, herî paşverû, herî reben, di nava hemû şaneyên xwe de nijadî, şoven û faşîzmê dijî bilind bike. Cewhera polîtîkaya girtîgehê ev bû. Bi harbûnek mezin ve êrîşî lewaziyên kesayetan dikir, bi cezayên ku her cure tinekirinê derbixe holê rêbazek tolhildanê dabû ber xwe.

Li Wargehên Naziyan mirovahî laşek û koma goştên bêdengbû, ku şerimbûna wê jî tine bû. Laşên tazî û nedihatin veşartin hebûn. Ew hêviya ku ti wateyê rave nake jî hatibû tinekirin. Tenê dema wextê wan dihat, di reva van laşan a ber bi mirinê ve de tevgerek wan diyar dibû. Her tişt û hemû ev bû! Dema were pirsîn gelo, li ser rûyê erdê cihên wisa hene? Qet hewce nake ku mirov li dûr bigere. Belê Amed! Lê belê, Amed jî gelekî cuda ye.

Gelo mirov dikare Amedê çawa pênase bike û ma ev gengaz e? Hem dişibiya her derê, hem nedişibiya ti derê. Ji aliyekê ve tazîbûna ku ji mirovahiyê hatiye dûrxistin jî bi êşkenceyê hatibû pêçan. Rewşek ku heta dengê dawî diqîre, di-axive, lê zimanê wî/ê sirûdên dijmin dibêje, dilê wî/ê ji xwe şerim dike, mejiyê wî/ê li hember her duyan jî li ber xwe dide hebû. Kesayeta girtî paradoksek wisa dijiya. Dijmin jî hem kêfa destkeftiyên xwe dijiya, hem jî tirsek mezin li hemberî wan dijiya. Bi gelemperî jî yên girtî li hember binkeftina xwe di nava hezînê de bûn. Lê weke din jî ya esasî ku tirsa dijmin ava dikir, hêviya girtiyan a veşartî bû, yên ku rayên jiyanê bi wan re hebûn.

Dadgeh bi zanebûn nedihatin vekirin. Ji ber dijmin texmîn dikir ku dê li dadgehan çi were darezandin. Lewma dixwest beriya her tiştî hêz û vîna ku li wir diyar bibe baş biperçiqîne û bişkîne.

Esad digot; “min Rêbertiya we weke mêşekê pirçiqand. Yek ferdek ku quralan qebûl nekirî nemaye. Hemû jî niha Kemalîstên ciwan in. Êdî Komîteya PKK’ê ya Navendî tine ye. Niha Ciwanên Kemalîst hene. Êdî ti kesê Komînîst, Kurdparêz,

PKK'yî, nizanim çi û çi tine ye. Êdî ew hemû leşkerê min in." Dixwest vê propagandeya xwe jî bixe meriyetê. Di vir de bandorkirina avaniya heyî girîng bû. Gelek girtiyan nedizaniya ku qural qebûl kirine. An jî pê bawer nedikir. Ger pê bawer bikira jî, dihizirî ku sedemek vê heye. Di çûnûhatinên weke dadgeh, nexweşxane, revîr û hwd yên di qoxuşekê de cardin ji yên din cudatirbûn. Rûyê wan ne li dîwar bûn. Dema leşkeran dijûn dikir, nedigotin; "fermo fermandarê min." Dîsa hewl didan ku wan cuda bikin. Bi giştî jî hinek cewazî hebûn. Hinek kes û hinek qoxuşan her tiştê dijmin qebûl dikir. Çi dihat xwestin, ew dikirin. Sînor tine bûn, weke ku benê xwe qetandibûn. Ango teslîmiyetek wisa kûr dijiyan. Ew ji her alî ve dorpêça tirsê de bûn, belengaz bûn û baweriya xwe gelekî xirab winda kiribûn.

"Ciwanên kemalîst" lîstoka mijdarê!

Wê Esad dixwest, Mijdarê cuda pîroz bike! Dê 'Ciwanên Kemalîst' ew bi xwe tevlî merasîma bîranîna Atatûrk bûna. Pêşbirka helbest, nivîs û axaftinê birêxistin dikir! Hesabê wî yê di vir de jî gelekî ketî bû. Dê mîsoger hesabê hinekan û hinek tiştan bihata pirsîn. Di haparlora li her qoxuşê hatiye bicihkirin de Esad digot; "meha Mijdarê merasîmek hêjayî Ata (!) hatiye rêk û pêk kirin. Kesên ku demekê endamên navendî yên vê an jî wê rêxistinê bûn, gelek mirovên rêber xapandin, parçekirina welat ji xwe re kiribûn hedef, niha di destê dewletê de ne. Poşman bûne. Dê êdî ji vir û şûnde weke milîtanên dewletê bin."

Ji her qoxuşê bangî hinekan kirine. Yên îxanet jî kirine, yên li ber xwe jî dane, yên lewaziyên wan hene, an jî yên xwe bi ‘aqil’ dihesibînin jî hebûn. Hinek kesan jî weke ku bi rastî jî aqil bûye (!) qebûl kiribû. Tirsê hinek bi aqil kiribûn! Çawa be ketiye nava vê şilekiya xefkê, hinek din jî bikeve nav, wê qirêjê bi her cihê xwe ve bike, ma dê çi bibe? Lê belê, kesayetên bi vî rengî ji bona dijmin negirîng bûn. Ji ber plan û hedefa wî cuda bû.

Ji qoxuşa me jî Gonûl çû, bangî wê kirin. Vê hejmarê bes nabînin, bes cuda jî kes naxwaze derkeve. Ger dixwazin bi lêdan û êşkenceyê bibin, bila bibin. Dê kesek bi daxwaza xwe neçe. Gonûl dîsa di hewaya xwe ya ‘aqilmendiyê’ de ye. Esad anons kir; “dê gavek din Şahîn Donmez, M. Xeyrî Durmuş, Kemal Pîr û Riza Altun… axaftinê bikin.” Destpêkê kesî bawer nekir. Min got; “dê îtîrafkaran bi navê wan bidin axaftin. Ketîno, bi zanebûn van navan didin. Dixwazin me bandor bikin. Ev lîstoka dijmin e. Bila heval moralê xwe xirab nekin” û hwd hinek tiştên din jî got. Rast e ez van tiştan dibêjim, lê di hundirê xwe de jî hinek tirs û gumanan dijîm. Gelo tiştek wisa dibe? Ez naxwazim di vê mijarê de kêliyekê jî bihizirim. Dîsa jî li hember her îhtîmalî hewce dikir heval werin hişyarkirin û pêşiya bandorên neyênî were girtin.

Aysel weke xwe di dîwana xwe de fetisandiye rûniştiye. Keserên kûr û bi deng derdixîne. Keser û nalînên wê her tim hevjîna apê min Mehmet, Esma tanî bîra min. Piştî ku kurê wê yê ciwan di nava geravên Munzurê de dixeniqe, keser û nalînên wê kêm nedibûn. Li hember wê tehemul kirin di cîhanê de karê herî zehmet bû. Ez ti caran fêrî nalîn û axînên wê malê nebûm.

Her wiha ev peyvên ku bêhna êşê ji wan dihatin, her yekê weke êşkenceyê bûn. Bi Aysel wan re jî tiştên wisa hebûn. Weke nalînên bêçaretî û windakirinê bûn. Ango bêhna mirinê ji wan dihat. Her çendî aliyek kîn û nefretê di nava xwe de bihewîne hebe jî, lewaz bû û di nava bêçaretiyê de winda dibû.

Di haparlorê de Şahîn behsa Atatûrkperestiyê dike. Rêgezên Kemalîzmê dijmêre. Bi dengê bilind nivîsa ku baş hatiye amadekirin bi aheng dixwîne. Lê mirov di dengê wî de jî hemû hest û şopên xayîntiya li pey pêşbaziya ezmûna xwe de ye dibîne. Di her tiştî de ev tê hîskirin. Her kes ji aliyekê ve li dijî axaftinên Şahîn dijûnan dike. Hemû dijûn têkil hev dibin. "Ketiyo! Çawa diqîre. Heman weke heywanan diqîre. Bûye ciwanê Kemalîst! Qet nebe bila navê xwe bike Atatûrk…" û hwd gotin tên kirin. Ez û Gûlten bi hev re dimeşin. Gûlten jî bi guman pirsî; "gelo dê hevalên ku navê wan didin bikarin bidin axaftin?" Min jî got; "dibe. Bes ev jî taktîkeke. Hevalan qural qebûl kirine. Lê hêj di serî de ew jî berovajî kirine. Tu jî dibînî ew ne weke yên dinin. Dijmin di ferqa vê de ye. Dijmin jî fêm kiriye ku hevalan li ser giştî hizirîne û ev pêvajo wisa dane ber çavên xwe. Lewma rêbazên din bikar tîne. Hewl dide hem wan û hem hemû girtiyan bixe rewşek ku ji xwe û xeyalên xwe dûr ketine, xişikîne, her kesî bi hev re ketîbûnekê bijî û vê jî bide bawerkirin. Mîsoger ev jî lîstoke. Dixwazin li hember hevalan bêbaweriyê ava bikin."

Em jî wisa di nava mereqan de, bi axaftinên, şîroveyên cur be cur û nîv jî bêdengiyê de bûn, ji nişka ve dengê hevalê Xeyrî hat. Destpêkê me got; "Aaa! Dengê hevalê Xeyrî" paşê dîsa me got; "na, ne ew e", dîsa nîqaşên "ew e, ne ew e" pêş ketin. Ev

bertekên destpêkê bûn. Paşê em hemû ketin nava bêdengiyek kûr. Weke ku hevalê Xeyrî zindî li hemberî me ye, em hinek tiştên din guhdar dikin. Her kes bê hemdî xwe rabû ser xwe. Rewşek rêzgirtinê hebû. Tevî ku di wê kêliyê de hinek gotinên din ji devê hevalê Xeyrî derdiketin, ti caran rêzdariya li hember wî bandor nekir. Her çendî qehrek ku di nava êş, xemgînî û giriyên kûr de xwe dida der hebe jî, berî her tiştî bawerî hebû. Ayselê bi kulman li dîwaran dixist. Dayîka Dûrrê kilamek bi lorîn digot, bi dengê bilind digiriya. Awirên kesên ku serê xwe kirine nav destên xwe û wisa cemidîne êş û hêrsek cuda rave dikir. Ew îfade, ew awir, ew keserên kûr û ew dengê ku her kesî bêriyê kiriye, lê digere û hêviyên xwe pê ve girêdane… Ew deng jî bes bû, têrê dikir.

Pey re Pîr, pey re jî Riza… êdî kes guhdar nake. Êdî sond, sirûda Îstîklalê, an jî nizanim sirûda çend salî, qet ferq nedikir. Wateya di wan dengan de derdiket holê girîng bû. Dengê Şahîn an jî xayînên din cuda bû. Kemalîstê baş û ketiyê ceban (donek) baş, di dengê wan de baş diyar dibû. Bes ên din pir cuda bûn! Na, ew cuda bûn. Ez ketim nava korîdora hundir. Ji wir jî çûm beşa tuwaletan. Ez naxwazim kes rondikên çavên min bibîne. Ger ez jî heman bertekan diyar bikim, paşê jî nikarim ji wan re bêjim. Na, divê yek ji me van rewşên ku rû didin rast şîrove bike. Divê em armanca dijmin baş bişopînin. Temam nayê pejirandin, nayê hêvîkirin, an jî şûjina heyî nedihat dîtin, lê belê hewce bû xisleta vî şerî, bûyerên rû didin û mercên heyîn tev li cem hev û bi qasî hewce dike werin nirxandin. Ji ber bi bertekên din ve xwe têr dîtin gelekî xirab bû!

Destpêkê bi ser Aysel de aciz bûm û min got; “çi dibe? Çi bûye? Ma emê wisa pêşwazî bikin? Ma armanca dijmin jî ne ev e? Ma ne vala ye bi me dide guhdarkirin, hewl dide her kesî bandor bike. Ma nexwe çima hinek kesên din ji bona axaftinê dernexistin? Ji ber armancên wan baweriya li hember qadroyên rêber û pêşeng şikandine. Bi vê dixwazin bêjin ku, ‘ev rêberên we ne, xwedî li wan dernekevin’. Na, divê em ji dengên wan, ji navên wan, ji henaseyên wan hinek tiştên din fêm bikin. Bawer bikin, weke ku hevalê Xeyrî qêrîna şoreşgeriyê dike. Ji min re wer tê behsa Kurdistanê dike, weke behsa têkoşînê dike. Weke ku Pîr bikeve pêş û bi artêşekê re pêş ve diçe. Divê em wisa fêm bikin. Nexwe dê dijmin jî bigihêje armanca xwe. Jixwe negengaz e ku em wan bi xwendina sirûdên faşîst û sondên din bibînin û bibîhîsin. Bawer bikin êşa herî zêde jî wan jiyaye. Li hember avaniya xwe di vê rewşê de jiyîn, herî zêde jî ew tengav kirine û ji qehran xistine. Emê bibînin dê ev rewş dirêj neke, radeya asta ferzkirinên dijmin dihat guhertin, heta cihekê tawîza hinek tiştan tê dayîn, nexwe weke din heval jî û em jî qebûl nakin. Ger hûn bal bidinê, her tim hinek ji me jî derdixin pêş, êrîş dikin û wisa dixwazin giştî bandor bikin. Ma çend roj berê negotin; “tu sirûdê naxwînî” û bi vê hêcetê ez ji nava we derxistim. Xwestin ez bi tenê bêjim. Min asta dengê xwe neguhert. Zêdetir kêm kir. Herî dawî jî avêtin hucreyê. Ma ez bi xwesteka xwe nabêjim, tiştên ku bi zorê tên gotinin. Qebûlkirina hinek quralan, nayê wateya pêkanîna her tiştê ku ew dixwazin. Ev mijar gelekî girîng e. Dê dijmin herî zêde heta demekê bixweze hewl bide ku her kesî bi vê bandor bike. Dê hewl bide di çapemeniyê de jî diyar bike. Dibe ku radyo û tv de jî bidin. Raste dê hinekê bandora wê ya neyênî çêbe, lê bawer bikin ti kesê derve van guhdar bike pê bawer nake, moralê xwe

wisa xirab nake, dê bêje, ‘ev lîstokek dijmin e.’ Em hevalên xwe û pêvajoyê baştir dizanin û nas dikin. Wê demê dê yê herî kêm ji van bandor bibe em bin…”

Gonûl hat qoxuşê, her çendî ji dûrve jî heval dîtibin, dîsa jî em hemû pê kêfxweşin. Riza silav daye, heta dema derbas bûyî gotiye; “xwe tengav nekin, dê ev jî derbas bibin.” Weke ku her kesî rewşa beriya niha çend xulekan şikandiye. Gonûl got; “moralê hevalan baş bû. Dema Pîr derbas dibû hemû leşkeran lê temaşe dikir. Kes ne serî tewandî û ne jî çilmisî bû.”

Gûlten hinek din zîndî got; “bawer bikin dijmin niha ji her demê zêdetir tirsiyaye. Divê dema ku rewşên wisa ferz dike, bizanibe ku dê bertekên cuda jî rû bidin. Neçar e hesabê van bike. Mîsoger niha Esad dihizire ku dê piştî van rewşan berxwedaniyek bêhempa rû bide. Em hestewar li mijaran dinêrin. Ez niha baştir fêm dikim. Maf didim acizbûna te. Divê em di nava hevalan de baldar nêzî bertekên xwe bibin. Ji ber ew zûtir bandor dibin.”

Esad dijminê jiyanê û xweşikbûnê bû

Komek ji yên hatibûn serdanê hatibûn girtin. Di cihên valîzan ên veşartî de not hatibûn dîtin. Hejmara me her tim tê guhertin. Carna sedî derbas dike. Her qoxuş jî heta serî dagirtiye. Pêkhateya vê carê cuda bû. Dayîka hevalê Mazlum, xwîşka wî Serap û keça wê Baran hebûn. Ecêb bû. Her sê nifş bi hev re hatibûn girtin. Weke din jî jinên ji Sîwerek û Wêranşarê jî hebûn. Gelek ji wan hemû malbat bi hev re hatibûn girtin. Yên din jî biribûn cem qoxuşa xortan. Hevalek Hêlîn çêbibû. Bi Baran û Elî re sê zarok hebûn. Baran ji hemûyan mezintir bû. Zarokek pênc-şeş salî gelekî şêrîn bû.

Esad, navê Baran kiribû ‘Bihar’. Her cara ku behsa lewaziya Esad a ji hêla zarokan ve dihat kirin, nîqaş derdiket. Kesek sadîst çawa dikariya ji zarokekê hez bike? Gelo ji ber zarokên wî hebûn ji ber wê bû? Ez ti caran di vê mijarê de qane nedibûm. Esad, dengê qêrîna jinan weke melodiyekê fêm dikir û jê hez dikir. Bes ne ku ji jinê hez dikir. Wî di asta herî kirêt de êrîşî jinê dikir. Bi saetan li ser betonan, zemînên qerisî dida dirêjkirin û falakayê ve girê dida. Ma ev bû baldariya wî ya li hember jinê? Bi qîre qîr digot; “ezê we qisir bikim, dê malzaroka we elem bigire û hûnê êdî nekarin zarokan bînin. Wê êdî ev nifşê we jî tine be.” Dê nifşê Kurdan wisa tine bike! Belê, yên ku qoxuşa li kêlekê jî bûn, ev gotin dibîhîstin û qaşo şerim dikirin! Gelek ji wan gotibûn; “xweziya ev jin nehatibûna girtin.” Dîsa jixwe ew baldariya wî ya li hember jinan, ji gotinên weke; “dê di demek nêzîk de keçên PKK’ê ji leşkeran ducanî bimînin” pêş (!) diket.

Bi cop û daran heta ku xwîn ji wan dihat, li nav ranê jinan dida û bi zanebûn jan dida kêşan. Gefên weke; “ezê copan bixim we”, bi qasî parçe bike lêvên wan bi destê xwe kêşan, hezkirina jinê ya bi sadîstekê re bû, ev jî hezkirina wî bû! Hezkirina wî ya zarokan jî ecêbtir bû. Hêlîn di nava van dengên êşkenceyê de mezin dibû. Birçî dima, li qoxuşên sar û qerisî di nava taya agir de nexweş diket. Her kêlî bi vê nexweşiyê jiyan dikir. Dema Esad didît, diqêriya digot; “bes e, êşkenceyê neke!” Ma ev bû hezkirina zarokan? Hestên kîn û nefretê bi zarokan re ava dikir. Esad, dijminê jiyan û xweşîkbûnê bû. Lewma, ne dibû ku ji zarokan hez bike.

Dema Baran digirt hemêza xwe, dilê me tevan jê dixeliya. Destên wî pir kirêt bûn, diviya li zarokan neketiban. Baran jî ditirsiya. Ji ber Baran jî bibû şahidê êşkenceyan. Lê mixabin, Hêlînê li girtîgehê, hêj di zikê dayîka xwe de qêrînên êşkenceyan bihîstibû, bandorên wan dijiya, hîs dikir û wisa mezin dibû.

Di vê manê de Helîn ji Baran û Elî jî cudatir bû. Ew parçeyek ji me bû. Wê em hîs dikirin. Guman, tirs, êş û kêfxweşiyên me bi me re parve dikir. Dema yek xemgîn dibû, ew jî xembar dibû. Wê jî weke me rewşa hevalên xort mereq dikir. Wê jî weke me bi saetan guhê xwe dida ber dîwar, an jî serê xwe dida ber mazgalê, ji dûrve dengên heyîn guhdar dikir. Her dengek bi wê re dibû bertekek. Carna jî dengê leşkeran dişiband dengê hevalan û ji kêfa diqêriya.

Baran û Elî li hember me biyanîbûn. Ji me ditirsiyan. Hem ji dijmin, hem jî ji me ditirsiyan. Ew jî, ji ber dijmin êşkence dikir ji wan ditirsiyan, ji ber me jî êşkence dixwar ji me ditirsiyan…

Baran û Elî xwedî nasnameyekê bûn. Dayîk û bavê wan, cih û warên ku lê dimînin hebûn. Ev nasname ya KT jî be, cih û navnîşana lê dimînin û mezin dibin heye. Lê mixabin hemû navnîşana Hêlînê girtîgeh bû. Li ti cihî nehatibû nivîsandin. Me navê wê jî bi zorê dabû pejirandin. Ji ber Hêlîn bi Kurdî ye. Ji Emîne dayîk bibû. Lê bavê xwe nas nedikir, ne diyar bû. Hinekan digot polîs in, hinekan digot Abdurahman, hinekan jî digot Yusuf e. Ti caran ne tehlîlên xwînê, ne îfade û ne jî wijdanan bersiva vê nedan. Jixwe Hêlîn jî li bav nedigeriya. Hemû zilamên bi cilên leşkeran didît, êşkencekar bûn. Weke

din jî hinek ‘apên’ wê yên qêrînên wan dibîhîst hebûn. Ji hemû ‘apên’ xwe hez dikir. Peyva yekem me hîn kirî APO bû. Wê zilam tenê di wê peyvê de nas kir, ji ber peyvek raveya zilam bû. Digot; “APO’yên min.” Xaltîkên wê, ango hevalên wê yên jin jî em bûn. Ya rastî li hember peyva dayê jî biyanî bû. Digot; “Emîne.” Dema Baran û Elî peyva dayê bikar danîn, li ecêba Hêlîn diçû. Ya ku Hêlîn anî dinê Emîne bû. Bes di heman demê de xaltîk û metên wê jî dayîka wê bûn. Ji ber tenê Emînê ew xwedî nedikir. Paçên wê tenê Emînê ne dişûşt. Dema binê xwe qirêj dikir, tenê Emînê paqij nedikir. Dema birçî dibû, tenê Emînê ew têr nedikir. Dema ew nexweş diket, ne dayîka wê li ber serê wê bû. Her kes bi Hêlîn ve mijûl dibû, baldar nêz dibû. Di vê manê de ew parçeyek ji her kesê bû.

Hêlîn bê ku li ser lepan biçe, hînî meşê bû. Ti amûrên wê yên lîstokan tine bûn. Tenê dîwan û dîwarên beton nas kir. Asîman û şîn tenê nas kir. Hînî copan, kalas, falaka, di nava ava gu de meş û rûniştinê bû. Lewma ew ne zarok bû. Bi wê re kamilbûn, bi wê re êş, bi wê re bêrîkirin û bi wê re xeyalên xweşik ên di derbarê pêşerojê de zû mezin bûn. Cara yekê bû min didît ku, zarokek wisa watedar mezin dibe. Min cara yekê bû zarokek wisa ji nêz ve û ji dil hez dikir. Hêlîn, li dijî wan kirêtiyan înad, tevî ew qas hovîtiya dervî mirovahiyê aliyê me yê paqij û mirovî bû.

Dayîka Kabîre, Serap û Baran girtî birin, lêpirsînê. Dayîka Kabîre jî hevalê Mazlum li wir dîtibû…

Digiriya û digot; “ez pir xemgîn bûm ku dê dîsa Mazlum bigirin lêpirsînê. Pir ditirsiyam. Bes ji bona min derfetê Mazlum hemêz bikim dît jî pir kêfxweşim. Xweziya ew yek-du

xulek dirêj bûna. Bila polîs jî li wir bûna, lê bila ez li cem Mazlumê xwe bûma.” Êdî rondikên çavên wê ziwa bibûn. Janên heyîn ew dabûn ziwakirin. Li ser hevalê Delîl û Mazlum kilam digot.

Mirov nedikariya wan kêliyan rake. Bi taybet ên îxtiyar hemû bi hev re digiriyan. Êşên dayîka Durriye dihejiyan. Kurê wê Elî Yawerkaya jî girtî bû. Keça wê Xanim li çiyê bû. Her tim bi wan şahnaz bû. Bes aliyek wê jî jan dida. Li singê xwe dida û wisa digiriya. Ew çi rengê rûyê wê bû! Weke ku hemû janên dîrokê di wan rondikên çavên wê de, di wan xetên rûyê wê de veşartî bûn. Min êş jî û kîna jina Kurd herî vekirî û tazî di kesayeta dayîka Durrê de dît.

Serap bêdeng bû. Kêfxweşî, êş û bêrîkirinên xwe di nava kûraniyan de veşartibû. Tenê çavên wê di-axivîn. Ji ber vê jî Esad nedikariya lê binêre. Esad dizaniya ku çav çiqasî yeman in, rastiya ku di wan de tê îfadekirin çawa hêdîka diherikin û tên. Di nava reşkên çavên Serapê de kîn dibiriqîn. Çavên wê weke çavên Delîl û Mazlum reş, weke komirê bûn. Weke yê wan dibiriqîn. Weke yê wan dijwar û rêzdar bûn. Çavên wê besî Esad bûn. Çavên Baran jî dişibiyan ên wan, lê hê ew zarok bû.

Esad, carekê Baran girt hemêza xwe û bir cem Mazlum. Çi ecêb bû di dilek êşkencekar de, azweriya zarokan ma dibe. Gengaz e ku carna kesên êşkencekar ne di ferqê de bertekên mirovbûnê raber bikin. Lê belê, Esad ne wisa bû. Di kesayeta wî de hemû pergal, hest û ramanên faşîzane bi rêk û pêk hatibûn sazkirin, ji ber vê her tişta ku dikir li gorî vê pergalê bû, bi wê re di nava ahengê de bû. Bi wî re ji hev cudabûn tine bû.

Ew ne mirov bû. Di nava ewqas kirêtiyê û ketîbûnê de, parçeyek aliyê baş, misqalek hestên mirovahî gerîn, ji hêla mirov ve rastiyek xwe nenaskirinê bû, sucek li dijî mirovahiyê bû. Esad, li girtîgeha Amedê, împaratoriyek biçûk a Naziyan ava kiribû. Ew pergal dihat meşandin. Bes divê em neyên xapandin. Em girtî bûn, ne Cihû bûn. Na. Ne ku ez ji bona Cihûyan xerab û ketî bidim nîşan vê tiştê dibêjim. Bes xwedî xisletek gel a pir cuda ye. Faşîzmê hinekê jî xwe li ser van xisletan ava kir. Ez nabêjim bû çavkaniya faşîzmê. Lê belê, Nazîzîmê xwe li ser vê xisleta netewa ketî, bêkêr, ne bûye yê xwe bilind kir. Dê netewa jorîn li ser lewazî û paşverûtiyên geleke ku war ji xwe re nedîtiye û hatiye tinekirin, ya rastî bi xistina hebûna hatiye tengkirin ve avabûn pêk baniya. Bi daqurtandin û tinekirina yê lewaz ve bikira!

Yên ji xwe biçûktir û lewaztir xwarin, di qanunên heywanan de heye û Nazîzîmê jî ev pêk anî. Kompleksên xwe yên biçûkbûnê û bêhêziya xwe, bi vî rengî bi hêz kir. Mirovatiyê wisa mê'tî pêş xist!

Kemalîzm ne xwedî cewherek cuda bû. Hewl dida bi helandina gelan û ji xwe biyanîkirinê ve netewbûnekê ava bike. Li gorî xwe gelê Kurd ji mêjve binax kiribû! Lê dîsa jî nekarîbû tirsa wî bişkîne. Ew tirs jî hatibû serê wî û li dilê wî xistibû. Kemalîzmê dixwest di zindana Amedê de, ji hêmanên ceban û xayîn hêz bigire û gorek nû çêbike. Naziyan Cihû bi qanûnên heywanan ve tine kirin. Bi şêwazê guruban ji laş, bêşermî û ji hemû aliyên wan mirovahî paqij kirin, binax kirin. Ji bona wan gorek jî çênekirin. Şewitandin. Hestiyên wan jî nehiştin. Ji wan sabûn û hinek hêmanên din çêkirin. Nifşek ji binî ve tine kirin. Li Amedê jî ev bi şêwazek cuda pêk anîn.

PKK ji nû ve avakirin bû. Avakirina Kurdewarî, mirovahî, netewbûn û sosyalîstiyê bû… Hinde hêza wan a bîrdozî hatibû girtin, bi gel re vejîn bilez pêş ketibû, ji kur ve lê bixista jî, ji aliyeke din ve vejîna xwe nû dikir û derdiket pêşberê wî. Hostatiya vê avakirinê û binesaziya wê pir cuda bû. Dijmin çepgiriya kevneşop jî, Kurdewariya kevneşop jî nas dikir. Yek bi yek darbe li berxwedaniyên ku li Kurdistanê pêş ketin dabûn. Hemû tevger bi pêşengên wan ve hatibûn tinekirin. Bêbandor hiştibûn. Xwe kiribûn rewşek wisa ku êdî nekarin xwe nû bikin. Lê, li Kurdistanê cardin vejîn nû bibû. Dibe ku ya vê carê hêj lewaz bû, lê saxlem derketibû. Ev vejîna ku di girtîgehê de hatibû ceribandin, gelo dibe ku cardin bi encamek trajîk ve were serxistin?

Belê, Baran jî biyanî bibû. Gelo hîs kiribû ku ji ber çûbû hemêza xalê xwe Mazlum ‘suc’ kiriye? Gelo ji ber Esad hezkirina zarokan jî weke amûreke êşkenceyê bikar danî, bi Mazlum re bertek pêş ketibû. Lewma Baran tirsiyabû, qîr dabû û neçûbû hemêza Mazlum. Ez bawerim ê herî zêde bi vê kêfxweş bûyî jî Esad bû. Lewma me hemûyan bertek raber kir û got; “biçe, êdî em bi te re na-axivin. Tu çima ne çûyî hemêza xalê xwe?” Me jî wisa ew zarok ceza kir. Ew çi hal bû? Diçûya cem kî heman tişt dibîhîst. Her kesî jê re digot; “biçe ji cem min! Em bi te re na axivin.”…

Ya rastî ev helwesta li hember Baran zêde bê rehim bû. Ew zarok bû û nedikariya rake. Her wiha bi ser me hemûyan de qîr da û got; “ma hûn çima na-axivin? Soz, ezê carek din biçim hemêza wî.” Belê, carek din… Carek din… Gelo kengê carek din? Gelo Baran fêm kir ku carek nabîne çiye, yan jî ferq kir?

Xweziya carekê biçûya hemêza wî, xweziya bes carekê Mazlum ew çavên wê yên xweşik ramûsa! Belê, ev tişt jî bi xweziyan ne dibûn û Baran jî ti caran jibîr nekir. Bes Baran nedizaniya ku dê evqasî hesreta dest dana Mazlum de bimîne. Ew kêlî ti caran jibîr nekir. Derbarê girtîgeha Amedê de, tenê ew kêlî mabû di hişê wê yê zarokatiyê de. Lê mixabin Esad jî, her tim fermanên mirinê dida aliyên bêrîkirin, daxwaz û hestên mirovî. Mirina xwe jî di nava hesretên zaroka xwe de çand. Çiqas ecêb bû, yê dikir pir xirab jî dît û jiya.

Valahiyên di giyan, dil û zanyariya kesayetê de, her wextê zemîna xeternakiyê ne…

Ne weke berê jî be rewşa Cahîdê carna asayî, carna jî derûniya wê têkilhev dimeşe. Peywendiyên me yên bi wê re zêdetir bi xweser in. Hem di nava jiyana komînê de, di nava sazûmaniyek peywendiyan de dijî, lê hem jî cuda ye, ango ji aliyê ruhî ve cuda ye.

Dê Aysel ameliyat bibe. Di malzaroka wê de kîs çêbûne. Elema veremê têkil wir jî bûye, divê were paqijkirin. Her demê nexweşe û li nav cihê xwe ye. Divê hişyar nêzî her tiştê xwe bibe. Dibe ku ew elema veremê belav bibe. Ji ber di cihên komî de zû vedigire. Em jî hewl didin di çarçoveya derfetan de baş lê binêrin. Baldar nêzî cil û firaxên wê dibin û cuda dikin. Ew zêde girîng nêz nabe, her wiha di vê mijarê de gelek heval zêde wate nadin paqijiya min jî. Heta hinek aciz jî dibin. Herî zêde jî Aysel aciz dibe û baldar nêz nabe. Ev nêzîkbûn jî tê wateya ku dev jiyanê berdaye. Na. Dibe ku em di girtîgehê de, di dûjeha binê dûjehê de bin. Dibe ku derfet nebin. Lê tevî vê paqijî, tevî

vê bi rêk û pêk jiyîn, tevî vê jiyan xweşik kirin, rêgezek bingehîn bû. Hewce bû. Heval her tim behsa hevalê Mazlum wan dikin, bê çawa xewliyên rûyê xwe paqij dişûn, ziwa dikin û çawa paqij bikar tînin. Dîsa wan bi xwe digot; "dema hûn li ser dîwaneyan rûniştin, xwe rast bikin wisa rûnin. Ji bona pişta we xwehir nebe. Bila pişta we kof nebe. Zindî û paqij bin…" wê demê em çima hişyar û baldar nêz nabin?

Dema Aysel li nexweşxaneyê dan razandin, Cahîde jî rakirin nexweşxaneyê. Vê mijarê destpêkê bala kesî nekişand. Bes min yekser şik bir. Jixwe ne başbû ku vekirî û li her derê li ser bihata axaftin. Ji ber hinekan axaftinên me yên têkildarî van mijaran belav dikir, wê jî guman û tirs ava dikir. Dihişt ku mantikê dê dijmin her tiştî bike pêş bikeve, ev jî dibû sedem hestên hişyarî, tevdîr û baldariyê kor bibin.

Dema bangî Cahîdê kirin, min jê re gotibû; " Cahîde dê tu vê carê helwestê raber bikî. Ger tu piçekê li hember xwe rêzdar bî, evqas mirov hene, xwe nexe şûna amûrek lîstokê." Wê, carek din fêm kir ku tiştek ji ber çavên min naçe. Ji ber tiştên min jê re digot, heta radeyekê tirsa pê re heyî dişkand. Ez jî ketibûm nav jiyana wê, dijmin jî ketibû nav jiyana wê. Hebûna min a bi wê re girêdana Partî û bandorên wê bûn. Pêvajoyek hatibû jiyîn. Dema girêdana xwe bi vê tevgerê re çêkirî, destpêkê em dîtibûn. Lewma nedikariya carekê de me qut bike û bavêje.

Li îdareyê nêzîkbûna yekem a bi tirs û sist raber kir. Got; "ez ji bona revîrê hatibûm nivîsandin. Naxwazim biçim nexweşxaneyê." Elî Osman jî bêvila wê re digire û dişidîne, dibêje; "ezê te bikujim." Bi vê gefê di navbera nêzîkbûna xwe

de tê û diçe. Paşê li nexweşxaneyê didin razandin. Ew jî ji bona Aysel venêrîne. Dibe ku bi derve re peywendiyan çêke. Nexweşxaneya leşkerî bû. Bes hinde personelên wê berfirehbûn, ew jî PKK'yî bû, dikariya gelek riyan biceribîne.

Dema dijmin jî em wisa nas dikirin û dinirxand, bawerî û girêdana me ya li hember PKK'ê zêdetir dibû û em şahnaz dibûn. Piştî ku Cahîde li ber xwe dide, piştî du rojan derdixin. Piştî ku Cahîde vegeriya girtîgehê ji min re got, li wir hinekê bi Aysel daye hesîn û gotiyê; "hişyar be." Lê min jê re got; pirsgirêk ne ew e ku te tiştek nekiriye. Weke din jî li ber Aysel nekeve, kesek nayê, naçe. Ger bên jî malbata wê dê were, jixwe ew jî tiştekê nakin. Ya girîng heta niha te çawa didin bikaranîne. Çima te li ber xwe neda? Tenê te bigota, 'ez naçim' israr bikira bes bû. Tenê dê hinekê tu daban ber êşkenceyê. Tu hêj dudilî. hêj tawîzan didî. Dê bi vî rengî jî li te bixin û bişkînin. Qet nebe li dijî wan derkeve, wisa lêdanê bixwe. Divê mirov hinekê bi onur be. Ma tu çima nikarî biryarê bidî? Ma tu ji lêdanê ditirsî? Tu ji mirinê ditirsî? Çima? Wê demê dê rewşa te çibe? Dê tu ne bibî Cahîde, dê bibî yeke din. Wê demê biçe dişibî kê, dibî kî bibe." Dîsa giriya. Çi nabe, ma Esad dikir rik, ez jî rikê digirim. Na, ewê nekare ji vê qoxuşê îtîrafkarekê derbixe. Dê ev daxwaza wî di qirika wî de bimîne. Her carê propagandeya; "îtîrafkarek jin derxist" dikir û dixwest bi vê bandor li xortan bike. Qaşo mizgînî dida, digot; "dê sibe di TV de bi-axive, hûnê bibînin."

Min ji xwe re digot, dê lîstokên Esad pêk neyên. Di nava me de jî hinek kes ji min aciz dibin. Dibêjin; "Cahîde tê nasîn, dê herî dawî biçe cem dijmin. Tu çima ewqasî pê re mijûl dibî.

Çima wê diparêzî? Hwd hinek tiştên din digotin. Lê her çendî bihatan gotin, ez di vê mijarê de bi biryarbûm. Ez bi hevalên ku di zanebûna vê mijarê de bûn re di-axivîm. Wan ji min fêm dikir. Heta wan jî bi şêweyên cur be cur alîkariya min dikir. Wan jî hewl didan wê ji wê derûniyê rizgar bikin.

Herî dawî Cahîdê biryar da. Çend rojan bi hedar bû, dîsa zindî bû. Dest bi hezkirina jiyanê kiribû. Her çendî bi gelekan re bêbawerî hebe jî, bi gelemperî erênî dihat nirxandin. Her kes dibêje; "em bawerin dê êdî xwe rast bike." Dema Esad û Elî Osman dihatin qoxuşê, her çendî ji bona were dîtin jî hinek tiştên ji rêzê jê dipirsiyan, bersivên ziwa dida wan, an jî ew bê bersiv dihiştin. Ev jî helwestek bû. Ger di nava girtiyan de bi ser de biçûna, dibiya ku li wan vegeriya, lewma ew jî weke ku ne xema wan bû, nêz dibûn.

Em rojekê li cihê hewagirtinê ne. Wê rojê Cahîdê cilên paqij û xweş li ber xwe kiribû. Porên xwe jî kêlekê de toke kiribû. Berda bû. Weke ku hinekan vexwîne meydanê dimeşiya. Di kesayeta wê de hemû tiştên ku diyar dibû, cuda bû. Li şûna wî rûyê tirsonek, sar, bêçare, binkeftî, seknek ku biryara hinek tiştan daye ve dihat. Warê em lê cihek wisa ye, her rastî û derûniya mirov bi hemû tazîbûna wê ve diyar dibe. Tiştek li ber çavan winda nabe. Her nêrîn û awirek weke projektorekê ne. Em dijmin dişopînin, hevûdû dişopînin. Her çendî hinek kesên di nava cîhana xwe de fetisî hebin jî, bi gelemperî hişyariyek hebû.

Cahîde zû derketibû jorê. Her çendî di kêliya ku her kes li cihê hewagirtinê de ew derketibe jorê bala her kesî kişandibe jî, dê me ji kur bizaniya ku ewê DDT (dîklorodîpenîltrîkloroetan,

jehrek xurt ya ji bo kuştina pêşûyan e) vexwe? Hevalan ji şibakê bangî min kir. Gûlten û Zelîha bi tirs; "zû were jorê." Bi yek henaseyê derketim jorê. Cahîde li qoxuşa paş, li ser dîwanê hişk bûyî, ji devê wê kef derdikevin, lê hêj dijiya. Me kêliyekê dudilî jiyan kir. Gelo em agahî bidin dijmin, an nedin? Gelek ji mereqê derketibûn jorê. Yên dîtin pir bûn. Min bang kir; "Cahîde, Cahîde, te çi kir? Te çima kir? De bi-axive." Bi çend gotinan jî be baş bû ku axivî, got; "min nivîsandiye." Bi zorakî cihê ku nivîs lê daniye got. Me ji berîka wê derxist. Her wiha yek jî ji bona min nivîsandiye. Em li wê jî geriyan.

Dibêje ku DDT vexwariye. Me pirsî; "li kuderê bû?" Di wê kêliyê de leşker ketin hundir. Esad hat. Ecêb çawa yekser agahî dabûn wî? Kî dabû? Em mat man. Dema liv û tevger çêdibe tê fêmkirin û berpirsyarê qoxuşê jî yekser agahî dide. Yekser birin. Dijmin jî di nava panîkê de ye. Rengê Esad kêm caran wisa xirab dibû. Dema zêde hêrs dibû û dema zêde ditirsiya rengê wî wisa dihat guhertin.

Piştî demekê Elî Osman jî hat. Em tev ber çavan re derbas kirin. Mirov ji rûyê her kesî ditirse û her kes bihêrse. Çi dibe bila be, berpirsê vê bûyerê ew êşkencekar bûn. Elî Osman heta demekê bê ku bi-axive li me temaşe kir. Piştî ku got; "kî dîtiye? Çi karê DDT heye li vir?" Li min vegeriya û pirsî; "an jî te jê re gotiye xwe bikuje." Dixwaze bertekên min fêm bike. Min jî qet dengê xwe dernexist. Min bi awirên xwe bersivên ku hewce dikir da. Bi hêrs bû; "heywan keçên heywanan. Li vir di bin venêrîna me de xwe kuştin miştin nabe. Jiyana we jî, mirina we jî di destên me de ye. Ma dê çi bibe? Ma wê di xema kî de be? Hûnê bimirin biçin. Bi aqil bin. Ka binêrin, ma em

tiştekê dikin? Her yek ji we li dijî vê dewletê sucek kiriye û hûn hatine vêderê. Dê cezayê wan jî dadgeh bide. Ev me eleqeder nake. Em tenê berpirsê pergala vir in. Em berpirsê ewlekariya we ne. Zehmetiyê nedin me." Paşê jî çû. Lê gotinên xwe yên dawî bi dengek nerim gotibû. Diyar bû ev hewldana xwe kuştinê ew tirsandibûn. Mirina Cahîdê ji bona wan negirîng bû. Di vir de ya girîng bertekên me, bandora ev bûyer ava bikin û encam bûn.

Gotin ku ger pênc xulek din jî doxtor dereng bima, dê bimira. Piştî ku demekê li nexweşxaneyê ma, cardin vegerandin girtîgehê. Gelo tirsa mirinê bin xistibû? Gelo gumanên kesane şikandibûn? Gelo pira ku wê bibe ber bi îxanetê ve şikandibû? Wer hasil, Cahîde hêdî hêdî li jiyanê vedigeriya. Lêpirsîna xwe dikir. Baş bû ku wisa bi ser aliyên xwe yên lewaz û aliyên xwe yên binkeftî de diçû. Ger şerimbûna ne hêjabûnê hatibe hesîn, kêm jî be hatibe ferqkirin bertek, hêrsên kesane û ferasetên namûsê yên teng çi ava dike, kesayet dikare carek din li xwe vegere. Bes ev jî nehêsan bû. Ger tiştekê di giyan, dil û mejiyê xwe de hemû riyên diçin teslîmiyet û îxanetê negirtibin, dê valahiyên li wir her demê xeternak bin. Her wiha dema îxanetê firsenda xwe jî dît, dê bi wir re bikeve hundirê mirov.

Me jî ev rewş di navbera xwe de nîqaş kir. Xweziya bihata serxistin. Wê demê dê me jî weke çalakiyek protestoyê binirxanda û emê xwedî lê derketan. Qet nebê dê me dijmin di rewşek herî zehmet de bikar baniya. Dê me li dadgeh û ji raya giştî re diyar bikira. Dijmin bi zext û êşkenceyan îxanet û sîxûrtî li ser kesayetan ferz dikir. Em neçar bûn van eşkere

bikin. Min diyar kir ku êdî divê em baştir nêzî Cahîdê bibin, wê qezenc bikin, divê rewşa xwe li dadê baş binirxîne. Hevalan jî diyar kir ku dê baldar nêz bibin. Cahîdê soz da. Got ku dê li dijî dijmin bibe xwedî helwestên pir vekirî. Di nameyên wê de jî mijarên ku me bêxe zehmetiyan tine bûn. Tenê gotibû rewşa ku jiyan dike ranekiriye, ew hêz bi xwe re nedîtiye ku li dijî dijmin helwest raber bike. Tenê ev rave kirine.

Weke din jî kesayetên bêbiryar, di lêpirsînê de qelsî jiyane jî ji vê rewşê bandor dibûn. Ev mijar tev dibûn sedem ku nîqaşên kûr û berfireh werin meşandin. Heval jî êdî di van mijaran de şiyar bûn. Qonaxên lihevkirin û hevgihînan zêdekirin, hemû zemînên ku dijmin jê sûd werbigire tengkirin, ji bona me jî dibû moral. Nêrîna ku dibêje; "em di hundir de çiqas lewaz dibin bila bin, bertekên me yên li dijî hev di kîjan astê de dibin bila bin, lê emê ji dijmin re diyar nekin û emê di nava xwe de çareser bikin" pêş diket. Biryardariya vê pêş diket. Bi rastî jî pirsgirêkên me yên navxweyî ne hindik bûn. Xisletên heyîn ecêb bûn. Tirs û xof, ferdperestiyên ji ber zext û êşkenceyên dijmin derketine holê, bûyer û pêvajoyên têne jiyîn bi kûranî û nirxandinek jiyasî ve dest negirtin, kaprîs û dilreşî û bi gelek çeloxwariyan bi hev re jiyîn û di vê jiyanê de hinek rêgez avakirin, girêdana bi wan re afirandin, ti caran nehêsan e.

Belê, wê şevê tufan rabû

Em di rojên dîrokî yên dihat zanîn de her tim di mereqê de diman. Li girtîgeha Amedê Newroza me ya duyem bû. Di pêvajoya Newroza beriya vê de rojiya mirinê hebû. Em vê carê jî bi temamî agahiya me ji tiştekê tine ye. Çapa îtîrafan berfirej bûye. Her quncikek girtîgehê bûye cihê lêpirsînek cuda. Bi taybet dixwazin vê îtîraf û îxanetê di kesayeta koma Elezîzê de, kûr bikin. Heman weke kesayetên Şahîn, Elî Gûndûz, Erol Dexîrmencî û Yildirim Merkît… Vê şebekeya îxanetê ya ku berfireh bûyî, di polîtîkaya dijmin a girtîgehê de rênastî dikir.

Di beşa ku em lê dimînin de jî gelek kesan tînin û lêpirsîna wan dikin. Her carê kesên nû tên û diçin. Em jî di şibakê re bi dizive li wan dinêrin. Ji dûrve jî be dema wan dibin tuwaletê em li wan dinêrin. Lewma em her tim bi vê mebestê şibakeyên cihê serşokê vekirî dihêlin. Dema ji yekê zêdetir bin, didin rawestandin, em jî di wê navberê de wan dibînin. Em li nav bîdonê gelaşên wan digerin. Em hinek parçeyên îfadeyên wan ên hatine nivîsandin û paşê hatine qetandin digerin û dibin bixwînin. Dijmin îtîraf bi wan daye nivîsandin. Bi dehan listeyên pirsan hene. Di bin her îfadeyê de nêrîna poşmaniyê hatiye nivîsandin, jixwe ya herî girîng jî ev der bû.

Em hinek ji wan nas dikin, lê hinek jî tenê di asta nav de tên bîra me. Me ew qaxit kom kirin. Parçeyên wan anîn cem hev û xwendin. Paşê me rakirin û veşartin. Em dihizirîn ku, em dikarin van li rûniştinên dadgehan bikar bînin.

Dijmin îfade bi zorê dida nivîsandin. Dema ne di-eciband her carê ji nû ve dida nivîsandin. Bes hinek ji wan jî îxanet hilbijartibûn û dijmin jî her carê hêsan bi wan dida nivîsandin û

bi qasî dikariya ew bikar danîn. Dema yên nas hebûna bandorbûn jî zêdetir çêdibû. Lewma heta ku me dikariya me nedihişt her kes îfadeyên wan bixwîne. Di heman demê de me nav jî ji her kesî re digot.

Di heman pêvajoyê de odeyek din jî amade kirin. Alavên êşkenceyê yên weke aski, manyeto û yên din jî hatin derbasî wir kirin. Odeya gardiyan jî bibû odeya êşkenceyê. Nêzî me bû. Weke din jî kesek din nedanîn wir. Jinên nû dihatin girtin heta demekê bi wir lêpirsînê re derbas dikirin, paşê danîn cem me. Alavên taybet ên êşkenceyê tine bûn. Bes amadekariya dawî ne ji rêzê û asayî bû.

Em neçarbûn xwe ji êrîşên nû re amade bikin. Em destpêkê bi komek teng re axivîn; "dijmin îtîrafkariyê li ser giştî ferz dike. Dibe ku li ser me jî ferz bike. Ger me bibin, tişta yekem em bikin, kî ji me dibe bila be dê çalakiya întîharî pêk bîne. Ger derfetên xwe xeniqandinê hebin, emê xwe bixeniqînin. Ger ti derfet jî nebin, emê serê xwe li dîwaran bixin û parçe bikin. Dê ev helwesta me jî êrîşên heyîn bide rawestandin. Dê mîsoger nêzîkbûnên weke destavêtin û hwd bikin. Dê li ser vê lewaziyê ve êrîşî jinê bikin." Her kesî got; "temam." Paşê jî me ji hevalên endamên komên din têkûz û durist jî ev gotin. Me biryara xwe ji wan re ragihand. Pişt re jî em bi hemû hevalan re axivîn û min got; "ev ode ji bona me hat amadekirin. Dibe ku lêpirsîna taybet destpê bike. Jixwe her roj jî êşkence tê kirin. Dê me li wir bi tenê bihêlin û neçarî îtîrafkariyê bikin. Dê lêpirsîn jî li ser vî bingehî were kirin. Dibê ku dest bavêjin me. Em nikarin di vê mijarê de her tiştî ji însiyatîf û bextê dijmin re bihêlin. Ger em li dijî wan helwest raber nekin, dê dest bavêjin

her kesî. Wê demê destpêkê kê bibin, dê ew helwesta xwe diyar bike.” Her yekê ji aliyekê ve got; “wê demê emê xwe bikujin, bila ew zilamên hov destên xwe li me nedin.” Ev gotin hema bi her kesî re weke sonda biryarê belav bû. Heta wê rojê ji bilî lêpirsîna polîsan, li girtîgehê destavêtina jinan pêş neketibû. Dê wê biceribînin, emê jî qet destûrê nedin vê. Bertekên pêş ketîn baş bûn. Qet nebe, me dikariya em ji vê hêlê ve dest berxwedaniyê bikin. Nabe ku em tim li benda giştî bin. Ger bi taybet ser me de werin û îtîrafkariyê ferz bikin, em jî ancex dikarin vê bikin.

Ev jî bû weke hevpeymanek komî. Piştî axaftinan zindîbûnek giştî pêş ket. Her kesê gore û derpiyên xwe yên sitûr li ber kir. Em her tim di bin dawên xwe de derpî an jî eşofmanan li ber xwe dikin. Cilên wisa li ber xwe kirin, di êşkenceya falaka de her tim baş bû. Dema girtiyên destpêkê dihatin ger daw (etek) li ber wan hebûna, Esad bi zewqek mezin deng derdixist, lingê wan ji hev vedikir û ew didan falakayê.

Roja paştir bi panîkek mezin cardin ew alav tev paşve birin. Êdî deriyê korîdorê nedihat miftekirin. Ode kirin weke berê. Me jî ti wate ne da vê. Gelo tiştin bibûn? Gelo ji beşên din hinek kes ji êşkenceyê miribûn? An jî em bihîstin? Em jî di navbera xwe de şîroveyên ecêb dikin. Weke ku me lîstokek wan vala derxistiye, em ewqasî kêfxweş dibin. Heval jî weke ku hinek tişt biser xistine şahnazin. Çûnûhatinên wan lez û sohbetên zindî dikin. Bi qasî ku biryara beriya rojekê hevbeş hatiye girtin pêk hatiye, veguheriye çalakiyê ewqasî bandor kiriye. Çiqas ecêb bû, di heman kêliyê de kêfxweşî, kelecan,

xemgînî pir zû cih li hev diguhertin. Bi rastî jî moral û kêfxweşî çi bû gelo? Li hember dijmin moral gelekî girîng bû. Li hember dijmin bi înat misqalek jî be derfetên jiyînê dîtin, bi înat baweriyê ve jiyîn, bi înat hebûna xwe parastin gelekî bedew bû. Bes tiştên van jî watedar dikin, hê zêdetir girîng bûn.

Divê em teqez Newrozê pîroz bikin. Dê mîsoger derve de çalakî werin lidarxistin. Dibe ku heval tiştek wisa bikin û rewşa vir biguherin. Gelo hevalan bi taktîkî qural pejirandibûn û li benda Newrozê bûn? Gelek tiştên ku em nizanin hene. Xwedê bela xwe bide, me tenê carekê jî agahiyek negirt.

Nota min ji Mazlum re nivîsandiye hêj li cem min e. Min di wê notê de kurtasî behsa rewşa me kiriye. Min gotiye ku ezê parastinê bikim, ezê bikaribim derfetên amadekirinê bibînim. Lê ez nizanim ezê vê di asta sempatîzan de, an jî di asta qadrobûnê de bikim. Ger em agahiyekê bigirin, jixwe dê ew bi xwe hinek tiştan bêjin. Lê ger em ti agahiyekê jî negirin ezê di asta sempatîzanekê de parastinê bikim. Ger ez bêjim qadro dibe ku rewşek ku asta min derbas bike rû bide. Wê demê divê ez parastineke bi temamî bikim. Ez wî mafî bi xwe re nabînim ku, ji xwe re bêjim qadro. Ez wî mafî bi xwe re nabînim ku bi serê xwe nasnameya qadro li xwe bikim. Divê partî fermî vê erkê bide. Ji ber nîqaşan jî bandor dike. Dîsa em bi komek heval re van mijaran nîqaş dikin. Ew jî qebûl nakin ku ez xwe hêjayî vê nasnameyê nabînim. Herî dawî min got; “ma ya girîng ne parastina partiyê ye. Ezê jî biparêzim. Ezê paraznameya xwe jî li gorî vê plana me amade bikim. Xilas bû çû. Ma hewce nake ez mîsoger li dadgehê asta wesfa xwe diyar bikim.” Ya rastî

xwesteka erêkirina rêxistinê û ew agahdarkirinê heye. Dema ew jî ne dibû, hemû acizbûn ji vê çêdibûn. Her tiştê ji vê çavkaniya xwe digirt.

Me ji bona Newrozê daxwiyaniyek nivîsand. Weke din jî ji bona ew bê sembolkirin kompozîsyonek hat kirin. Cahîdê ew amade kir. Me ew jî weke ku ji mazgala derî ve nexwiyê bi dîwar ve kir. Bi qasî du qaxedên dosyayê ye. Weke din jî hinek findên me yên ji berê mayîn hene. Me ew jî veşartibûn. Me ew find jî derxistin. Me her findek kir parçeyek biçûk. Bi qasî "Bijî Newroz" cihê kir. Findên me têrê kirin. Me "Bijî PKK" jî nivîsand. Me li ser erdê weke qewsa nîvê heyvê bi rêz kir. Em carê qaxidan jî dişewitînin û datînin korîdorên navberê. Li şûna findê hinek benên bi rûn jî tên çêkirin. Me di carekê de hemû find pê xistin. Me rêzgirtinek kir û daxwiyanî hat xwendin. Pey re jî me govend gerand. Me hinek tişt kirine kunên mazgalê û girtiye. Her wiha heval li pêşiya wê rûniştine. Ger leşker binêre jî nabîne. Piştî ku me karê xwe xilas kir, dixwazin bila werin. Newroz e. Êdî em tiştekê guhdar nakin. Hinek kesên komên din jî tevlî me dibin. Hinek kes jî ji ber tirsa dijîn weke ku tevlî nebûn, di heman demê de çûn qoxuşa din. Ji ber ger dijmin bi ser me de bigire, ji ber ew ne li wir bûn, dê lêdan jî xwariban! Vê nêzîkbûnê bêhna me teng dikir, lê dîsa jî ne xema me bû. Hinde coşa me zêde ye, gelek kes tevlî govendê dibin, xeleka govendê jî mezin dibe. Her wiha şano jî pir xweş bû. Newrozek nûnerî hat pîrozkirin.

Tufan bû, lê yek leşker jî li naverastê tine bû. Gelo tişek awarte hebû? Çi dibe? Cardin şîroveyên me yên ecêb destpê kirin. Em dibêjin; "teqez di derve de çalakî hatine lidarxistin. Nexwe negengaz e, dijmin di vê şeva girîng de me bi tenê

bihêle. Ji ber ti caran bê lêdan derbas nedibû. Gelo di hundir de tiştek bibû? Dibe ku çalakiyek hatibe kirin? Dibe ku cardin rojiya mirinê hatibe destpêkirin. Emê carê mîsoger zû agahî bigirin. Emê jî destpê bikin…"

Em serê xwe didin ber mazgalan, li korîdoran guhdar dikin. Ji ber deng dikişîne, em qedehên mîka li dîwaran guhdar dikin. Ji qoxuşên kêlekê deng dernakeve. Gûlten got; "wan jî li govend û stranên me guhdar dikir. Ew pîroz nakin. Niha dilê wan ji tirsan qetiyaye." Bedriye carê li dîwar dixist, dengê, 'Bijî Newroz, Bijî PKK' derdixist. Yek-du caran ji miqabil dengek nizim dengê lêdana dîwar hat. Lê ne lêdanek ku bersiva dihat xwestin bû.

Roja paştir heman bêdengiyê berdewam kir. Weke bêdengiyek mirinê bû. Heta êvarî doma. Gelo waswasên me zêde bûn? Gelo her lêdan xwarin, ji me re bibû fêrbûnek, lewma me gumanek wisa dijiya? An jî tufanek din hebû? Çima nayê fêmkirin bê ka çi heye. Em ji xwe aciz dibin.

Belê, wê şevê tufan rabibû. Tufana esasî jî ew bû. Ev tufan jî li heman girtîgehê, li heman warê ku me bi hev re henase digirin pêk hatibû.

Newroza wê şevê herî watedar hevalê Mazlum pîroz kiribû. Jixwe tiştên ku em dihesiyan ewqasî nemezin bûn. Tenê me digot; "hinek tişt bûne." Em tenê li benda çalakiyên derve bûn. Lê mixabin me ew agirê bêhempa yê li ber serê xwe nedîtibû û nebihîstibû. Hevalê Mazlum li dilê dijmin xistibû. Me tim digot; "teqez heval li ser hinek tiştan dihizirin ku bikin." Ev baweriya beramberî wan bû. Bêguman, me bi wan re hêvî didît, lewma em wisa dihizirîn. Lê belê Mazlum… Lê belê Mazlum… Ev Mazlum bû.

Na, kesê bawer nedikir. Me nedizaniya ku çiqas wext di navberê de derbas bûye. Hinek girtiyên nû anîbûn. Bêzar jî di nava wan de bû. Ango xwîşka Riza Altun. Bêzar, ew Bêzara keça dayîka Xetîceya karmend ku me jê re digot; "reş û reqê û xwe ecibandî" li wê mala kedê ya li ser rêya Natoyê dima, kesayetek kedkar û rûken bû. Me nas dikir. Em ji bona her mirovê/a dihat girtin hêrs dibûn. Li ber diketin. Me digot; "na, bila neyên, bila li xwe miqatebin, da ku neyên girtin." Lê piştî me ji derve agahî digirt, nûçeyên nû dibihîst, em diketin nava karê agahiyan, me hemû bertekên xwe yên destpêkê jibîr dikir. Tenê hevalên ku xwarin belav dikirin, dikariyan bikevin qoxuşa jêrê. Gardiyan jî bi wan re diçû, da ku ti peywendiyan nekin.

Me wê rojê berpirs destnîşan kiribû ku biçe. Dê wê jî leşker li ber derî mijûl bikira. Ger di hundir de jî bûna, dê bi-axiviya, bala wî bikişanda ser xwe û mijûl bikira. Dê Gûlten jî agahiyên nû û girîng ji Bêzarê bigirtan. Dê paşê jî me peywendiyên xwe bi ser notan ve bimeşanda. Ez jî li jorî merdîwenan rawestiya me. Weke ku ew xulek bibûn rojek, ewqasî dirêj dibûn. Bendewariyek zêde bi tengasî bû. Hestên min ecêb bûn. Weke bendewariyek bi tirs bû. Weke ku dê min agahiyek ne baş bigirta. Gûlten nikare merdîwenan hilkişe. Di jiyana asayî de ne wisa bû. Tevgera wê giran bû, sist bû, lê Gûlten nedikariya gav bavêje. Weke ku serê wê li ser milê wê dihejiya. Bêvila xwe paqij dikir û dikişand. Weke nedixwest hinek tiştan bide hesandin. Hêj li kêleka merdîwenê bû, min jê pirsî; "çi bû Gûlten? De zû were." Serê xwe rakir, li min temaşe kir. Bes çavên wê şilin, weke ku xwîna wê hatiye kişandin reng daye, lêvên wê spî bûne, canê wê yê zer bi temamî spî bibû.

Karavana danî ber derî, derbasî aliyê xwaringehê bû. Ez peyde çûm. Diyar bû agahiyek ne baş hebû. Dilê min hat guvaştin, hêj min nedizaniya çi bûye, kî ye, tiştek bi dilê min hat. Xwaringeh cihek biçûk bû. Navê wir ê fermî jî, tiştek bi navê teqez tine ye. Em wir li ser tiştên veşartî di-axivîn. Ev cih, miqabilî cihê hewa girtinê ye. Lewma nikarin çavdêriyê bikin. Hevalan jî rola wir wisa dizaniyan. Her cara ku hinek diçûn wir, dihat gotin; "dê teqez hinek tiştên girîng werin axaftin." Vê carê jî her kes bi mereqek mezin me dişopîne. Ji ber girtiyên nû anîbûn. Gûlten jî di hundir de digirî. Ez dipirsim; "çi bû, ma tiştên nû hene?" Ez hemêz kirim û got; "Mazlum." Her du milên min şikestin û daketin. Dilê min weke ku ji cihê xwe derkeve û bedena min qut bibe bû. Yekser hema dirêjî wir bûm. Mazlum… Mazlum…

Ma çi bibû? Weke din jî tiştek tine bû. Vekirîbû dê çi bigota. Dema min dest bi girî kir, Gûlten bi hedar got; "ev bûyer di Newrozê de dibe. Xwe daleqandiye!" Ez hilpekîm û min got; "çî? Ma xwe daleqandiye? Na. Dijmin derewan dike. Şeva Newrozê bû û dijmin ew kuştiye. Paşê dide diyarkirin ku wî xwe kuştiye. Teqez bûyer wisa pêk hatiye." Min dev ji girî berda. Dê dijmin heta kuderê vê rêbazê berdewam bike? Ger wisa biçe dê hemû qadroyên pêşeng qetil bike. Êdî bes e, divê em tiştekê bikin. Xwedê bela xwe bide. Em tiştekê nabihîsin. Em di nava girtîgehê de, li girtîgehek din de ne.

Aysel hat. Çawa ew jî hîn bû, dest bi girî kir. Ev agahî di demek kin de belav bû. Hawarên dayîka Dûrrê tên heta derve. Li pêsîrên xwe dide. Dîsa bi lorîn digirî. Ecêb bû, rondikên wê xilas nedibûn!

Dema dayîka Kabîre ew hatin berdan, gotibû; “xweziya min Mazlum ew dîtibana.” Lê mixabin nekarî bibîne. Baranê jî sonda xwe pêk ne anîbû.

Me êvarî bibîr anî. Her kes tevlî bû. Min axaftinek kir. Rêzgirtin pêk hat. Sirûd hatin xwendin.

Mazlum her kes kiribû yek. Dilê her kesê/î ronî kiribû. Kînek kiribû dilê her kesî de. Kesayeta herî xirab jî wê şevê li hember çalakiya Mazlum ji xwe şerim kiribû, rûxiyabû û hejiyabû.

Her ku me ev bûyer dinirxand, me baştir girêdana vê çalakiyê bi Newrozê re çêdikir. Li şûna şîroveyên destpêkê, me hewl dida em fêm bikin Mazlum bi vê çalakiyê çi dixwest û kîjan peyam dida me. Peyam vekirî bû:

“Berxwedan Jiyan e!...”

Nivîsa wî ya Teslîmiyet Dibe Îxanet, Berxwedanî Dibe Serkeftinê hebû. Me ev mijar ji nû ve nîqaş kir. Dijmin îxanetê ferz dike, îtîrafkariyê jî lez dike. Hevalê Mazlum Doxan, çembera vê îxanetê şikand. Lê dîsa jî diviya her kes tiştekê bike.

Dema hevalê Xeyrî agahiya “hevalê Mazlum xwe daleqandiye” dibîhîse, dibêje; “Temam, ev çalakiyeke. Çalakiyek siyasî ya mezin e. Pir bi wate ye.” Piştî ku di meha Gulanê de berxwedanî hat şikandin, nîqaşên ‘cardin, ji nû ve berxwedanî” wisa zelalbûn û ketin rojevê. Pêvajoya piştî Gulanê derbas bûyî ne hindik bû. Her wiha dijmin jî îtîrafkarî belav dikir û îxanet jî weke şêwazek jiyanê ferz dikir. Bi şev û roj hewl dida çi tiştê bi navê jiyanê heye, di kesayetan de bi qêrîna sirûd û êşkenceyan ve biqedîne. Naverastek wisa hatiye

avakirin, êdî kesayet li wir tine ye, hatiye xilaskirin. Çi tişteke aîdê kesayetê heye tine dike. Di nava qelebalixiyê de destpêkê kesayetan bi tenê dihêle, paşê di wê ferdiyê de jî kesayetê tine dike. Encamên ku ev bê kesayet hiştin û polîtîkayên îxanetê ava bikin tên texmînkirin. Jixwe di vir de Mazlum Doxan bi vê xeternakiyê dihese ku dê zêdetir pêşde biçe. Dixwaze ji cihekê destpê bike û li pêşiya vê xeternakiyê bigire.

Tenê wan, Mazluman dikariya li ser van tevan bihizirin. Lewma dema destpêkê hevalê Xeyrî ev çalakî nirxand, wate û girîngiya vê çalakiyê jî rast û di cih de pênase dike. Demek dirêj gelek kes wate nadin vê çalakiyê. Ne karîn xwe bigihînin siriyeta wê lehengiyê. Ev jî xwezayî bû. Her kesî nedikariya ji mirinan, ji xwe re mirinê hilbijêre. Ne karê her kesî bû, jiyanê wisa di nava mirinê de ewqasî watedar û bedew ava bike. Hinek din nekarîn bedewiya bi onur a jiyanê bibînin, ne jî karîn mirinê mezin hemêz bikin. Ew bi kûranî ji jiyanê jî, ji mirinê jî tirsiyan. Ew tirs jî ew bi mirinek ku wan xilas bike ve rû bi rû anî. Ti caran nekarîn xwe ji vê jî rizgar bikin.

Baweriya ku dê ev çalakî bi tenê nemîne, bersiva ku hewce dike were dayîn û di nava bê sebirtiyê de li benda îşaretekê mayîn, bû jiyan bi xwe. Em her tim li bendê ne. Em nizanin ji cihekê û ji xwe destpê bikin. Me tim dihizirî heta ku heval hene, emê dest bi çi bikin? Hem daxwaziya me heye û pêşketinan jî têra xwe bandor kiriye. Em jî dibêjin; "êdî bes e, em li bendê namînin, emê jî destpê bikin." Lê em nizanin emê ji kur û çawa destpê bikin. Em her kêliyê li derdora ramanên weke; 'biryara rêxistinê, erêkirina rêxistinê, rêxistin û pêşeng destpê dikin' dizivirin. Lê belê, hinde zemîn hebûn, me

dikariya em kêliyekê jî bikin mebesta berxwedanî û destpê bikin. Îsyankirin nezehmet bû. Lê bersiva herî rast parastina rêxistinê jî ew kêliya destpêkê girtin, erêkirina rêxistinê û hwd bi şêweyek afirînerî jîndarkirin, xwe gihandina rêxistinê bû.

Taybetmendiya lêpirsîna çalakiya Mazlum a sereke, bi giştî di nava girseya girtiyan de, hem bi qadroyên pêşeng re û hem bi her hevalê/a ku girêdayî partiyê, baweriya xwe diparêze re lêgerînek pêş xist. Çalakiya Mazlum, pîvanên berxwedaniya PKK'bûnê bû. Kêliya wê ya herî cewher, dijwar û bibiryar bû. Her kes neçar bû ku xwe jî li gorî vê pîvanê bigire dest. Aliyekê hovîtî, ketîbûn, aliyekê, îxaneta herî ketî, aliyê din jî mezinbûna vê çalakiyê, armancgeriya wê û serkeftina bi wê re tê dîtin. Asoyên her kesî vebûn. Êdî dilên ku ber bi wê ve biherikin zêde li bendê neman.

Tişta ku Yildirim ber bi îxanetê ve bir tirsa kesayeta şîrheram bû

Dadgeh hatibûn vekirin. Îdîanameya doza giştî bi merasîmên êşkence û lêdanan ve hatibû dayîn. Leşkeran ji vê îdîanameyê re digot; "Pirtûka APO." Bersiva xala ku doz li ser hatiye vekirin, li gorî zagonên KT îdam e. Belê îdam! Ne peyvek wisa erzan û hêsan bihata bilêvkirin bû. Lê di girtîgehê de zû hatibû belavkirin û di devê êşkencekaran de bû. Dihat gotin; "dê hemû jî werin îdamkirin." Ji bona Esad mijarek 'pêkenok' a din derketibû holê. Navên di îdîanameyan de, helwestên lêpirsînan, îfadeyên dadgehên destpêkê, dema ku derve bûn asta wan a di rêxistinê de, xebatên çawa hatine kirin, hemûyan yek bi yek dixwînin. Ji ber îdîaname esas tê girtin, bê

ku derkevin dadgehan, darezînên dadê destpêkê li girtîgehan dihatin kirin. Serdozgerên êşkencekar jî li gorî rewşa her kesî ya di îdîanameyê de, radeya êşkenceyan bilind dikir. Navên cur be cur li me dikirin. Ji bona hinek hevalan digotin sucê bîst-sih mirov kuştine kiriye. Jixwe ev nêrîn bes bû. Carê jî hinek kesên ku ji wan re digot; "tiştek te tine ye, dê tu derkevî. Ger tu bi aqil bî, ti pirsgirêkan dernexî, dê tu werî berdan" hebûn. Lê dîsa jî ew zêde cidî nedigirtin. Ew bi mirovên mezin re mijûl dibûn. Leşkerê herî ji rêzê yên êşkencekar jî, li sucdarê mezin digeriya, ew mereq dikir. Tiştek ecêb bû.

Hevalê Pîr li ser zimanê hemû leşkeran bû. Herî zêde jî leşkerên Laz, ên ji Behra Reş behsa wî dikirin. Hemû vegotin weke destanekê pêş diketin. Dema ji hev re behs dikirin, weke ku yê beramberî wî Pîr nedîtiye û nas nekiriye vedigot. Bes hemûyan jî hevalê Pîr dîtibû. Tevî ku ji bona her kêliyê hatibûn amadekirin, weke ku her kesî li dijî dewletê har dike, dewletê parçe dike, fermanên kuştina mirovan dide û dikuje, çirûska bedew a 'bi vî zilamê Laz' re her kes ber xwe ve dikişand. Siriyeta bi vî zilamê ku her tim êşkence lê dikirin nedihat fêmkirin. Axaftinên wî, helwestên wî yên li dijî yûzbaşiyên 'herî mezin' jî bandor li wan dikir. Dema Esad dest tavêje werîsê girêdayî û daleqandî û ji Pîr re dibêjie; "ev werîsê te ye", Pîr jî bersiva; "ew werîs nikare min bikişîne û rake, dê biqete" dide, her kes di nava matbûnê de behs dike. Her gotinek Pîr tije wate bû. Bi taybet her axaftina li hember Esad dihat kirin bi baldarî dihat hilbijartin, di cih de û bi Pîr'î dihat gotin. Ji ber her kêliya bi Esad re beramber hev jiyîn, qadek şer a cuda bû. Di vê manê de her awirek û her gotinek gelekî girîng bû.

Hevalên ji endamên Komîteya navendî tevlî doza gîştî dibûn. Tenê tevlî dozên weke Elezîz û hinek dozên din ên biçûk nedibûn. Dijmin jî bi zanebûn nedixwest wan di doza Elezîzê de derbixe. Ji ber koma Elezîzê ji Şahîn û Yildirim re hatibûn hiştin. Dê wan hespê xwe bidan bazdan!

Yildirim Merkît bi hevalê Mazlum re hatibû girtin. Wê demê nasnameya hevalê Mazlum derneketibû holê. Bes girtina destpêkê, bi taybet ji aliyê polîsên trafîkê ve hatina girtin, bi wan re şik avakirinê de, helwestên Yildirim gelekî girîng bûn. Ya rastî tiştek dida diyarkirin. Ji ber îxanet di carekê de dernediket holê. Her şaşî û kêmasiyek jî di carekê de mirov ber bi îxanetê ve nedibir. Lê mixabin hinek taybetmendî hene, wan kevirên destpêkê yên riya diçe îxanetê ava dikin. Ew bi qasî çaqilekê jî bin şopeke. Dema nêveng jî guncav dibin, mirov digire dibe wê derê.

Ma tirs çiye? Gelo tirsa Yildirim ji tirsek şoreşgerî çavkaniya xwe digirt? Ez bawerim di wê kêliyê de kes bi qasî Mazlum vê gumanê najî. Kes nikare cesaret, bawerî û xeternakiyê di şêwazek herî baş de derbas bike. Ji ber tirsa wî bi teqez sekeftin rave dikir. Ji ber jixwe xeteriya li hember, ango dijmin li ser bingeha tirsê ew tevdîr digirt. Tirsa wî mezinkirin, ew di nava tirsa wî de bêçare hiştin, bê bandor hiştin, yekser bi xisleta tirsa mirov ve girêdayî ye. Lê mixabin tirsa Yildirim ne ku ji ber hevalê Mazlum li cem bû, an jî tirsa ji ber rêxistinê bû, ku dijiya. Bêguman, bandora van jî heye. Bes ya ku giraniya xwe dide avakirin, tirsa ji xwe dijiye. Ew jî xisletek tirsa dijmin e. Bi dijmin re rû bi rû hatiye, tirsa nekarînê, cesaret bi xwe re nedîtin, di kêliya destpêkê de li ser

dilê wî hatibû rûniştandin. Her wiha ev tirs nehat derbaskirin. Li girtîgehê jî her kêlî bi dijmin re rû bi rû bû. Heta demekê wan tirsan û bandorên têkoşînê hevsengiyek dabû avakirin. Heta bandora têkoşînê girantir xwe dabû der. Wisa karî di vî zemînî de bimîne. Tirsa wî di bin bandora gumanên şoreşgerî, şêwaza jiyana li gorî berjewendiyên rêxistinê tevdigerê de bû û bi qasî bikaribe vê bendê derbas bike jî, neketibû bin venêrîna tirsa xwe.

Pêvajoya girtîgehê rastiya Yildirim jî derxistibû holê. Yildirim kesayetek zêde kêr nedihat. Sekna wî tev tirs û xof rave dikir. Kesayetek ji binkeftin, hevgihîna tirsan û refên xwe zû guhertinê re hevalbend pêk dihat bû. Bi malbatî ji PDA derbasî nava me bûn. Ji aliyekê ve ne raste ku mirov xisletên çîna hinek koman û rewşa ku li Kurdistanê diyar dikin ji hev cuda bigire dest. Lê dîsa hevgihîna Yildirim, an jî Merkîtan a bi PDA re ne ji xwebere. PDA li Kurdistanê bi gelemperî ti caran ji şoreşê re û çepgiriyê re, heta di rêbazê herî paşverû de jî be ji demokratbûn û gelbûnê re ne bû yar, dê nebe jî! Xisletên komên din ên derketina destpêkê hene. Kevneşopiyek heye. Giyanweriya di kevneşopiya îhtîlala di paşeroja wan de jî, mirov dikişand xwe û dihişt ku bi hinek nirxan re hevgihînek pêk were. Ev bes bû. Bes Merkît wan bi kevneşopiyek din re hevgihînek pêk anîbûn. Ew jî dewletbûn! Ango aliyê Kemalîzmê yê herî berbiçav. Têkoşînê ew ber bi xwe ve kişandibûn. Hema weke ku gelek kes girtî nava xwe. Ev rewşek neçarî bû. Di vê demê de binyata bi Merkîtan re heyî hat jiyîn, bes heta cihekê. Paşê hevgihîna xwe bi îxanetê re pêk anîn.

Niha jî gelek derfetên ku em bikaribin pêşketinan ji doza gişti (Amedê) hîn bibin derdikevin holê. Darezandina Aysel wan jî ya di nava vê dozê de, ji bona me ser esasê peywendiyên bi derve re navberek gelekî girîng e. Her çendî dadgeh gelek caran nehêle heval bi-axivin û wan ji eywana dadê derbixin jî, dîsa her çendî mafê axaftinê nede û bide rûniştin jî, dîsa jî me hinek tişt dibîhist. Bi gelemperî îtîrafkar didan axaftin. Bes ecêb bû, Şahîn tevlî her komê nedikirin. Şahîn îxanetkarê sereke û taybet ê koma Elezîzê bû. Herî zêde jî li girtîgehê bikar danîn. Peywendiyên wan bi dadê re ne tenê, di kêliyên rûniştinên dozan de bûn. Hevdîtinên taybet û bi riya 'hevdîtinên veşartî' her tişt dihat kirin. Ji her dozê re, îxanetkarek serkêş û taybet dibirin.

Dema Yildirim, hevalê Xeyrî di kuna mazgalekê de li odeyek vala bi armanca nivîsandina paraznameyê dinivîse dibîne, îxanet dike! Belê, yên diçûn dadê û dihatin behs dikirin, em mat diman. Di rastiyê de ji bona me dîtina heval Xeyrî moralek bû û vejînek bû. Em jî ji hev re dibêjin; "çawa tiştek wisa dibe?" Kesayet û binyata bi wî re ewqas ji îxanetê re vekirî mabû, tiştek ji rêzê jî bes e ku wê pêvajoyê temam bike!

Dema Esad di haparlorê de bi Pîr û Xeyriyan sond û sirûd dida xwendin jî armancê xwe hebûn. Dema êdî qural jî dihatin qebûlkirin digot; "min weke mêşekê hûn perçiqandin. Dê her kes pergala min pêk bîne. Her kes leşkerê min e. Rêxistin tine ye, komîteya navendî tine" jî armancên xwe hebûn. Heval kirin odeyek din û ji Yildirim wan re got; "binêrin, Xeyrî îtîrafa xwe dinivisîne" heman şêwazî armancên xwe hebûn. Jixwe hevalê Xeyrî ji şandeya dadgehê re gotibû ku, dê paraznameyê

binivisîne. Gotibû; “ji ber şert û mercên em di navê de bi ti şêweyî ji amadekirina paraznameyê re neguncav in. Ne materyalek heye, ne pênûs û ne jî qaxidek heye. Ji bilî êşkenceyan tiştek tine ye. Em endamên tevgerekê ne. Hûn jî me wisa darezînin. Lewma mafê me heye ku em jî têkildarî rêxistina xwe de hinek tiştan bêjin. Ez dixwazim paraznameya xwe bi nivîskî bidim. Lewma bila pênûs û qaxid ji min re were dayîn.” Dadgeh jî ji ber vê daxwaza wî biryarê derdixe. Esad jî ev biryara dadgehê pêk danî. Gelo dê tevî vê propagandeya Esad a reşkirinê ku digot; “îtîrafa xwe dinivisîne” çawa bandor bike?

Ev e tirsa ku Yildirim dida dest, rêya xwe ya cuda li vir zelal dikir. Nexwe ne encamek ku ji bandorek nişka ve derketî holê bû. Ji ber bi gelemperî îtîraf dihat ferzkirin. Dijmin jî êrîşî zemînên lewaz dikir. Cesaret nedikir, ji her kesî re nedigot îtîrafê bikin, ji ber nedikariya. Hevalê Xeyrî şanî her kesî nedikir, ji ber derewek mezin bû. Bi salan bû hewl dida ku ji dûr ve jî rûyê wî şanî kesî neke.

Ez biribûm dadgehê. Wê rojê rûniştinên doza me liqay hev hatibûn. Ji ber hevalê Xeyrî tevlî dozên komên din jî dibû. Hêj ez ji cîbê daneketibûm, beriya kes dakeve, an jî piştî ku her kes daketî ez dibirim li quncikekê didam rûniştin. Leşkeran jî yekser ji bedena xwe li derdora min dîwarek ava dikir. Ez şanî kesî nedikirim. Lê min tevî vê jî li derdor dinêriya. Dema kes nebûya li min binêre jî, min dîsa dinêriya. Min wê rojê hevalê Xeyrî di cîbê de sekinî dît. Ew jî bi tevî wê bedena xwe ya mezin tewiyayî bû. Destên wî paşve bi kelepçeyê girtîbûn. Vê jî bandor li ser sekna wî dikir. Li pêş û paş hinek hevalên din jî

hebûn. Dema min ew di wê rewşê de dît gelekî xemgîn bûm û giriyam. Lê di wê rewşê de jî be dîtina wî bi mehan besî min bû. Dema hevalê Xeyrî li yên paş û pêş xwe dinêriya, weke ku wan biparêze nêrîna wî gelekî girîng bû. Ev jî xisletek wî ya bingehîn û girîng bû. Ew mezinbûna nêzîkbûna wî, berpirsyariya bi wî re, portreyek rasteqînî ya pêşengekê bû. Bedena tewiyayî, fîzîka ku bi zorê kirine nava quralan, tenê aliyek ji vê portreyê bû. Wî dîmenî nedikariya ku yekbûna di kesayeta wî de heyî xirab bike. Ji ber bêbawerî û dûrbûna ji ber van rewşan suc bû. Ma ne jixwe fikirê ku dijmin dixwest ava bike jî, ne ev şêwaz bû? Ma Esad jî bi şev û roj ji bona vê mijûl nedibû? Dijmin di her firsendê de digot; " Apo li dervî welat e. Li avahiyên xweş û bi jinan re dijî. Hûn çima ehmeqiyê dikin? Ma hûn parastina çi dikin? Ma ne heyfe?" Ma ne dijmin jî bi van gotina dixwest bêbaweriyê pêş bixe?

Mirov dikare gelek kêmasiyan bike. Lewaziyan raber bike, bin bikeve. Teqez mantiqê van tevan heye. Lê mixabin bi lîstoka ku dibêje; "Xeyrî îtîrafa xwe dinivisîne" bawerkirin û gotinên weke, "ma ne jixwe wî jî îxanet kiriye, wê demê ez jî îxanet bikim" dê bi çi hêcetî bihata ravekirin. Ma ti mantiqê vê hebû? Gelo kî vê bûyerê wisa digire dest, çima wisa tê axaftin û şîrovekirin? Qaşo Yildirim, Xeyrî di wê rewşê de dîtiye û bandor bûye! Gelo li ser rûyê erdê ji kesên bi lenet re li cihên din û cîhanên din cih heye? Îxaneta Yildirim ayîdê kîjan cîhanê û kîjan rewşê ye? Ayîdê kî ye?

Ew kesayeta kêr nayê û ji rastiya xwe hatiye derxistin a PDA, ma ne bîjîtiya kemalîstiya di bin maskeyê 'proleterya şoreşger' de bû? Ma ne ew kesayeta bîjî bû ya ew bir heta

îxanetê? Esad ev tirsên wî baş dîtibûn. Ji ber ên êşkencekar tirsa di dilê mirovan de tê jiyîn, ên weke wan ditirsin û yên ku pir zû bikevin nav xefka wan baş nas dikin. Ti xisletên ku ayîdê yek çînê tine ye. Çanda wê ya bîrdozî tine ye. Şahîn û Yildirim jî nûnertiya kesayetên bi vî rengî dikirin. Di kesayeta her duyan de jî deqa tirsê hebû. Ji mirovahiyê derketibûn. Di destên Esad Oktayê ku hecku ji bona dîtina tirsan hatiye avakirin de ev kesayet derketibûn holê. Lewma bandora neyênî li kesî nekirin. Ji bona gelek kesên ku lewazî jiyane û gihane asta radestbûnê, kêm jî be heyfek bû. Gelek kesên ku digotin; "xweziya neketiban vê rewşê. Keda partiyê hebû. Keda wan hebû. Ger lewaziyên xwe derbas bikin, dê rizgar bibin." Lê tişta ku li hember Şahîn û Yildirim dihat hîskirin tenê kîn û hêrs bû. Baweriya ku partî û rêxistin ji kesayetên wisa kirêt paqij bûye hebû. Yên ku herî ji nêz ve ew nas dikirin, kesên ku bi rêya wan hatine qezenckirin jî, ji bilî gotinên lenetkirinê wêdetir tiştek din, yek gotin nedikirin.

Di nava koma Elezîzê de îxanet didan pêş

Rûniştinên me yên dadgehan vediguherîn şova Şahîn û îtîrafkarên din. Tenê ew didan axaftin. Tişta herî ecêb a dadgehên leşkerî yên Kolorduyê, dadgeha rûniştina doza Elezîzê bû. Hema weke meydana şerekê bûn. Ew doza ku li girtîgehê Esad Oktay taybet li ser radiwestî, dixwest bike doza îxaneta reş. Dê tişta kêm mayî jî wisa bihata temamkirin. Şahîn di hemû wexta rûniştina dozê de axivî. Ji derketina PKK'ê destpê kir û berdewam kir. Her tiştî berovajî dike. Rêbertiyê hedef digire û wisa vedibêje. Çiqasî kîndar bû! Ji xwarin

xwarina Rêbertiyê heta her tiştî berovajî dike. Li gorî xwe şîrove dike. Qaşo diyardeyên bîrdozî bi ramanek Kemalîstî ve dirizîne. Tenê êrîş dikir. Têr nebûye, bi salane vedibêje. Bi salane vedireşe. Tevî vê hêj têr nebûye. Armanca wî ew e ku dadgehê jî weke cihê lêpirsîn û girtîgehê bike cihê ku îxanet xwe lê dide axaftin. Li gorî dijmin dê kesekî parastina rêxistinê nekiriba.

Min jî di navberê de mafê axaftinê xwest. Dixwazim bi-axivim. Şandeya dadgehê destûr neda. Dibêje; "dema dor hate te, wê tu jî bi-axivî." Şahîn her kesî didarizîne. Behsa her kesî dike. Bênavber dê PKK çawa bin bikeve û ser nexe vedibêje. Weke din jî tehemul nake yek peyvek din bikar bîne. Van nêzîkbûnên min jî weke 'lehengiya vala' dinirxîne. Jixwe li gorî wî her kes teslîm bibû. Qaşo min jî lehengiya vala dikir. Dilxwede çend kes jî li derve hene. Tenê ewqas in! Şahîn, îxaneta koma Elezîzê mîsoger dikir!

Dadgeh li dijî her cure quralên huquqê dihatin meşandin. Tiştên ku li girtîgehan dihatin jiyîn nedihatin zanîn! Dixwazin rewşek di nava wan dîwaran de hatiye girtin û nayê zanîn bidin avakirin. Tenê îxanetê didin axaftin. Di rûniştinên dozên din de hevalan rewşa îxanetê û rûyê îtîrafkaran derxistine holê. Di wir de yên parastina partiyê kirine û baweriya xwe bilêv kirine zêde bûne. Girêdana bi Mazlum ve, giyana wî ya berxwedêr ku li dijî îxanetê raber kirî hatiye ragihandin.

Bîrdozî û polîtîkaya Partiyê, xisletên şoreşa me, binyata rêxistina me, asta têkoşîna me, wateya paşvekişînê, hewcedariya wê, nêzîkbûna ji sosyalîzmê re, karekterê dijmin, bi temamî hedef û îtîfakên şoreşa me, binyata civakî û siyasî ya

xwe dispêriyê, Rêbertiya wê tev di çarçoveya paraznameyan de tê destgirtin. Emê jî li ser van bi-axivin. Bila Şahîn berovajî bike. Dê kî baweriya xwe bi derewên wî bîne? Wê bikaribe kî/ê bandor bike?

Şahîn di heman demê di nava îxanetê de rastiyek jî rave dikir. Bi rastî jî dijmin di radeyek girîng de lîstoka xwe ya li ser koma Elezîzê ser xistibû. Bi dehan îtîrafkarên vekirî, bi dehan bêbawer, hinek di nav lewaziyan de ketine, hinek bêçare, li bendê ne ku ji hinek cihan îşaretek were. Kêmek ji wan jî xwedî li partiyê derketine. Erkek ji Şahîn, Elî Gûndûz, Erol Dexîrmencî û Yildirim re hatibû dayîn. Gotibûn; "hûnê yeke yek her kesî birêxistin bikin!" Li gel êşkenceyên gelekî dijwar, di bin lêpirsîna xayînên herî xirab de, şev û roj ew neçarî îxanetê dikirin. Her tim jî lewaziyên di bin lêpirsînê de, rexneyên partiyê yên ji bona koma Elezîzê di rojevê de dihiştin û wisa bi ser wan de diçûn. Ji wan re digotin; "jixwe rêxistin xwedî li we derneket. Hûn hemû xayîn îlan kirine. Lewma hûn nikarin parastinê bikin. Ma hûn hêj parastina çi dikin?" Bi vî rengî ew tam tengav dikirin û dixwestin wan ji hêla derûnî ve dorpêç bikin. Rast bû, nirxandinên partiyê yên di derbarê girtina koma Elezîzê de hebûn. Her wiha ya rast jî parastin jî ne mijarek hêsan û ji rêzê bû. Ger dê parastinek bê kirin, divê li ser bingeha bersivdana partiyê, gel û dîrokê were kirin. Hewcedariya esasî ev bû. Bi qasî ev ji bona her kesî derbasdar bû, ewqas jî di serî de ji bona koma Elezîzê derbasdar bû. Ji ber berxwedêriya wê rast nehatibû parastin. Ev hêj di pêvajoya lêpirsînê de dihat zanîn. Her kesî destnîşan kiribû ku, dê rewşa xwe ya di vê mijara çawa hêjayî partiyê nebûye, ji ber vê ji her cure hesab dayînê re amade ye, binirxîne. Ev nêzîkbûn jî hêj

partiyê rewşa heyî nenirxandî hatibûn raberkirin. Kesî nedikariya xwe bixapîne. Di navbera PKK'bûna rastî, berxwedêriya wê û qadrobûna milîtaniya wê û rastiya me de dûrbûnek mezin hebû. Em ji hev dûrbûn. Berî her tiştî girtin û xwe neparastina me suc bû. Gafletek bû.

Belê, ya herî girîng jî piştî van tiştên hatine gotin, rewşên ku hatine jiyîn in. Têkoşîn ne rawestiyabû. Qada zindanê, qadek têkoşînê ya herî zehmet bû. Îxanet li kêleka serê me bû, ne dûr bû. Niha jî dîsa ew di-axivî. Li hember vê bêdengî, nexwedîderketina li partiyê, an jî pêkanîna lîstokên dijmin ma nedibû? Na, na, na. Ev dem tam dema xwedîderketina li partiyê bû. Ji ber partî di kesayeta me de dihat darezandin. Li şûna ku dijmin her lewaziyekê bike gavek û li me bixe, emê lewaziyan her yekê bikin hêz û mêtîngeriyê darezînin.

Wê rojê bêdengiya giştî didomiya. Ez jî li Hamilî wan dinêrim. Ew jî na-axivin. Gelo li benda çi bûn? Gelo ez bê sebir bûm? Ma diviya ez li benda dora xwe bûma? Lê dîsa jî ez dixwazim ew bêdengiya dijwar xirab bibe. Çawa dibe bila bibe, bes bila xirab bibe. Bila dijmin nede axaftin, dixwaze bila Şahîn bêje ku ez lehengiyek erzan jî dikim. Ez bi çend gotinan jî be axivîm.

Endamên çapemeniyê tenê axaftinên Şahîn digirin. Parêzer jî na-axivin. Tenê daxwaza berdana yek du kesan dikin. Bes awirên wan di nava tirsê de fetisîne. Ev jî zêdetir trajîk e. Yên ku ji malbatan jî hatine rûniştina dozê ji dûr ve dişopînin. Digirîn. Tirsên wan zêdetirin, di serdanan de tiştên ku tên serê wan, êşên ku di riyên dadgehan de dijîn û rewşa ku zarokên wan dijîn tev gelekî giranin. Ji ber tirsa ku, 'bila tiştekê li zarokên me nekin' carek jî be li wan jî temaşe nakin.

Di çûnûhatinên dadgehan de merasîmên êşkenceyan xilas nabin. Bes kes jî ranabe, nabêje; “êşkence tê kirin.” Dema tê gotin jî şandeya dadê dibêje; “ ewder girtîgehe, me eleqeder nake.”

Dozên destpêkê tev wisa derbas bûn. Di navberê de lîstokên Esad jî berdewam dikirin. Carekê ez jî li maşîna mezin a girtî siwar kirim. Destpêkê kêfxweş bûm. Ji ber bi hevalan re li heman maşînê siwarbûn derfetên axaftinê jî ava dikir. Min ji nişka ve li hundir dît ku koma ku serê xwe dane pişta hev û yek rêzê rûniştine kesên îtîrafkar in. Kes li rûyê min nanêre. Min carekê di nava wan de kesên cuda jî dîtin. Weke nas bûn. Her wiha min dît ku Metîn, Doxan, Mehmet… çavên me li hev ket. Ew jî ecêb dixwiyên. Min bawer nekir. Weke ku ji wan re bêjim; “hûn li vir çi dikin, çima di nava van de ne?” Li wan dinêriya. Serê xwe dihejînim. Metîn hewl dida bi awirên xwe hinek tiştan bêje. Rewşa ku min hîs dikir û awirên min bandor li wî jî dikir. Cardin serê xwe ditewîne ber xwe. Carê dîsa li min temaşe dike. Gelo çima ez li vê maşînê siwar kiribûm? Ez niha baştir fêm dikim. Esad dixwest moralê min bixe. Tam dema ez ji maşînê daketîm, min got; “çi karê te di nava van bênamûsan de heye? Ma qey piştî evqas êş û janan dê tu jî îxanetê bikî? Heywan! Derkeve ji nav wan.” Dîsa Metîn dixwest hinek tiştan bêje. Gelo Doxan û Mehmet ji xwe şerim kiribûn? Ji ber ecêb disekinîn. Leşker destwerdan kir û got; “zû ji wir dakeve.”

Ez nizanim, ez çawa ketim eywana rûniştina dozê. Vî ketî çembera îxanet û îtîrafan berfireh dikir. Meto ji ber çavên min naçe. Hinek tişt di qirika min de dimînin. Ez ji xwe re dibêjim,

“na, nabe, nabe.” Dijmin, ketiyê Esad dixwest herî ji nêz ve li min bixe û bandor li min bike. Bi înat li hember her axaftina min, digot; “ha ji te re îtîrafkarek din.” Ez ne di wê ferqê de me ku li dadgehê çi tê axaftin û çi dibe. Min çend car din li aliyê îtîrafkaran temaşe kir. Metîn jî temaşe dikir. Lê weke wan nerûdinişt. Dîsa di nava wan de bû. Li xwe zivirîm, min li yên din temaşe kir. Hamilî, Selîm û Şadî li kêleka hev bûn. Weke ku ji wan re bêjim, ‘çi dibe’ min li wan temaşe dikir. Ew jî tiştekê nabêjin. Weke ku êdî çavên me jî nedi-axivîn. Ji ber demên din me gelek caran, gelek tişt bi çav ji hev re digot.

Dema ku Metîn wê rojê diçe qoxuşê, diçe tuwaletê û bi îske îsk digirî. Dema piştî demekê me hev dît, ji min re got; “ez ti caran weke wê demê ne giriyam.” Jixwe roja paştir li cihek din rûniştibû. Diviya mirov lîstokên Esad baş bizanibe. Her sibeh çend kes li nava îtîrafkaran didan rûniştin. Ji ber lewaziyên koma Elezîzê baş dîtibûn. Îfadeyên ku bi riya êşkenceyan daye nivîsandin, dozên ku Şahîn birêve dibe, ji bona Esad weke pesindana ‘min koma Elezîzê bidest xist’ ji bona xwe serkeftinek didît.

“...Pir vekirî bû, bêdengiyek bi êşkence û çewsandinê hatî avakirin hebû. ”Hevalê Xeyrî di doza giştî de gotibû; “ez di wê baweriyê de me ku, bê ku wext serve biçe dê her kes efûya xwe ji partiyê bixwaze. Îtîrafên xwe jî paşve bikişîne. Ji ber bi êşkenceyan û pêkanên dervî mirovahiyê ev rewş derketine holê.”

Nêrînên Şahîn ên weke; “her kes bi şêweyekî bandor bû û wisa tevlî vê rêxistinê bû. Hemû ciwan bûn, hatin xapandin. Xeyalên wan ên ciwantiyê hebûn. Divê mirov wan tewanbar

neke. Ji ber niha nû fêm kirine. Niha ne rêxistinê, beriya demekê derketina ji vir dihizirin." Bi van gotinan xwest bêdengiya heyî hinek din kûr bike. Min jî li dijî vê mafê axaftinê girt û hinek tişt gotin; "ev mirov bi êşkence û zextan tên bêdengkirin. –li paş xwe zivirîm û min got- çima hûn ranabin na-axivin. Dê ew bixwe jî bêjin. Şahîn lêpirsîna heyî li dadgehê jî berdewam dike. Bêbaweriyê belav dike. Ji ber wî bi xwe ji tirsonekî îxanet kiriye, her kesî jî tirsonek dide nîşan. Dadgeh jî quralên xwe pêk nayîne, ji ber Şahîn li vir darezandinê dike. Ew bi xwe bi rojane di-axive, lê mafê gotinekê jî ji me re nayê dayîn." Hakîm dîsa qîr da û got; "rûne, nexwe ezê te bavêjim derve."

Dema dor hat paraznameya min, wext gelek derbas bibû. Bizanebûn hiştin dawiyê. Hamilî, Selîm û min parastina xwe kir. Hinek jî yên di asta sempatîzan û alîgir de xwedî lê derketin. Wextê paraznameya me ya destpêkê zêde kêm kirin. Li ser bingeha tewanbariyên di îdîanameyê de bi pirsan derbas kirin. Her tim îfadeyên Şahîn esas hatin girtin.

Paraznameyên me yên nivîskî gelekî berfireh bûn. Min plana veşartî esas girtibû û wisa nivîsandibû, lê mixabin nehiştin ku ez bixwînim. Min tenê heta cihekê xwend. Ji ber ew jî weke hêmanek tewanbar dîtin, nedan xwendin. Dema min ferz kir ku bixwînim jî, ez ji rûniştina dadê avêtim. Lê paraznameya min a me bi Hamilî re nivîsî zêdetir berfireh bû. Wan ew li beşa ku lê diman nivîsandibûn. Me her duyan jî îmze kir. Hamilî ew xwend, hinek cihên wê dan derbaskirin û wisa destûr dan ku were xwendin. Paşê îfadeya min a nivîskî cardin bû mijara dozek nû. Demekê jî rûniştina wê dozê

berdewam kir. Derbarê îfadeyek ku min nexwendî de ez tewanbar kirim. Bi rastî jî gelekî pêkenok bû. Dadê helwestên polîtîk raber dikir. Ji ber hewce dikir ku dadgeh jî ji aliyê xwe ve me ceza bike. Parastina partiyê, parastina bawerî, kevneşopiya paraznameyan a şehîdên me gelekî girîng dihat dîtin. Lewma xwedî derketin û parastin suc bû. Tehemula dijmin jî ji vê re tinebû.

Vî şerê di eniya dadgehê de destpê dikir, moralek mezin jî dida me. Êdî piştî her rûniştina dozê navên ku parastin kirine, bi mizgîniya ku, "parastin hate kirin" dihatin diyarkirin. Êdî di derve de hevalên ku di asta sempatîzan û alîgir de jî dest bi parastinê kiribûn.

Tam wê demê roja hevalê Heqî hilbijartibûn…

Rûniştinên doza giştî bi zanebûn talok dikirin. Dîrokek sazûmanî tine bû. Rêveberiya dadê û girtûgehê çi demî hewce bidîta, wê demê rûniştina dozê pêk dihat.

Ji ber di ya me de îtîrafkar zêdebûn, di her rûniştinê de yek di-axivî. Dema ez ji bona rûniştina Gulanê ji qoxuşê derxistim, gardiyanek ku ez liqay hatim pir ecêb bibû. Ne dereng bû, saeta her demê bû ez derdiketim. Lê di korîdorê de heval tine bûn. Li maşînê hatibûn siwarkirin. Her wiha wê rojê xwendina sirûdê û lêdan jî nekirin. Berê her carê beriya em biçin rûniştina dozê, ew korîdor ji ber dengê êşkenceyê dehejiya. Çend saet beriya rûniştinê heval derdixistin wan korîdoran, li piyan sirûd didan xwendin û li wan didan.

Gulan bû! Gelo dîroka wê ji xweber hilbijartibûn. Tam dê rûniştina doza me ya di Gulanê de çêbe! Ez li cîpê siwar kirim. Leşkerê kêleka min kûr çûye, copa di destê xwe de li lingê xwe dide. Li nava destên xwe dide. Carna jî ditewîne, tiştên ecêb dike. Her wiha bêdenge. Gelo cardin tiştek bibû? Dengê dilê min bilind bû û qirika min dişewite. Ajokerê maşînê Laz e. Ji devoka wî diyare. Berê jî tim di-axivî. Hêza ewlekariya derve ye. Lewma zêdetir serbest di-axivî. Digot; "çi bû? Di wî agirî de çend kes mirin? Min ên ku birin nexweşxaneyê dît. Ooof… ji her derê wî xwîn dihat. Ew çi hal bû!" Yê li kêleka min qet bala xwe jî nedayê. Kûr çûye, bêdenge. Dibe ku nebihîstibe. Leşkerê Laz cardin pirsî. Lê gardiyan ji hebûna min aciz dibe, ji ber li cem girtiyan mijarên wisa na-axivin. Li gorî wan divê em rewşên ku pêş dikevin nezanin, wisa hatine amadekirin. Di heman kêliyê de nekarî xwe, weke ku ji erdê re di-axive, çavên xwe berdaye cihekê û axivî; "ecêb, ew çi baweriye! Zilam gav bi gav dişewite, ew hêj diruşmeyan diqîre. Ew çi zilam bû wisa!" Her çendî bertekên min ên ji nişka ve bala wî kişandin, êdî ji dev derketibû. Ya rastî min cardin xwe komî ser hev kir. Ez jî weke ku bala min ne li ser wan e, nêz dibim. Lê ew dîsa jî zêde ne-axivîn. Carê leşkerê Laz dibêje; "rewşa yê li nexweşxaneyê giran bû, bawerim dê ew jî bimire."

Ez tam hînî hejmarê nebûm. Maşîna me bi rê ket. Bes ez nizanim, maşîn di rê de ye, sekinî ye, difire, girêdanek me bi erdê re heye an na. Gelo asîman ronî bû, şînahiya asîmana çawa bû… çavên min tije bûne. Bê navber datiqurtînim. Dê çi bûya? Gelo, bêjim ez nexweşim û paşve vegerim. Dê rûniştin dirêj bajo. Li dadgehê rûniştin jî tam êşkenceyeke. Paşê min ji xwe re got, dibe ku hinek rabin bi-axivin. Li hêviyekê digerim.

Tika dikim Hamilî, yek ji wan rabin bi-axivin. Dibe ku ew jî bin. Dibe ku Hamilî jî di nava wan de be. Sibehê zû ew biribûn. Bes min her roj ew didîtin. Me her tim teqez ji dûrve jî be hev didît. Me bi çavên xwe silav dida hev. Carê serê xwe tewandin û silav dayîn û rûkeniyek, dibû kêliya jiyanê ya herî bedew. Me bi dehê caran li qoxuşê behsa wê silavê dikir. Cardin dubare dihat pirsîn; "weke din, weke din çi bû?" Me jî digot; "keniya û silav da." Her carê kêfxweşiya me di heman astê de derdiket derve. Tenê yên din digot; "xweziya me jî bidîtan."

Çawa em ketin eywana dadê, min çav li derdor gerand. Yên di wê qoxuşê de rûniştibûn. Tenê Şadî, ne bi wan re bû. Min cardin çav li giştî gerand. Kêmbûnek li ber çavên min bikeve tine ye. Şandeya dadê pirsî; "ma kesê nehatî heye?" Di lîsteyê de Şadî tineye. Gotine nexweşe. Cardin ji bona sekreter bibîhîse dubare dike. Nexwe Şadî nexweşe. Wê demê kî ne ew? Gelo dîsa hevalên qadro yên pêşeng bûn? Hakîm di-axivî. Hinek tişt tên kirin, lê weke ku ez ne li wir im, nikarim guhdar bikim. Ez hawara xwe digihînim xwedê. Hêdîka ji xwe re dibêjim tika dikim bila îro rûniştina dadê zû biqede.

Navber dan rûniştinê. Kesek nerabû û tiştek ne-axivî. Gelo agahiya wan tine bû? Ezê çawa bipirsim?

Ez li kariyerê siwar kirim. Piştî demekê Hamilî ew jî anîn. Kêfa min hat. Her çendî serê wan tewandîbe, ne-axivin jî, ew li ber çavên min bûn. Her carê leşkeran digot; "ne nêrîn, li pêşiya xwe binêrin, serê xwe bitewînin." Paşê jî di navbera xwe de dest bi axaftinê dikirin. Qelebalixa kariyerê û dengê ku derdixist, mirov gêj û dîn dikir. Dengê wê guhên me ker dikir. Nexwe min dikariya dengê xwe bigihînim wan. Min jî yek du

caran lingê xwe li lingê Hamilî xist. Ji ber diyar bû dengê min nedibihîst. Dema min lingê xwe lê da, ji nişka ve veciniqî. Pey re jî rûyê wî keniya. Wî jî yê kêleka xwe hejand. Riza Bozyel heye. Min got; “ma tiştek heye?” Riza jî hêdîka got; “na, tine.” Min got; “agir.” Hamilî hêdîka berê xwe da min, hewl dide ji min fêm bike bê ka ez çi dipirsim. Min cardin got; “agir” gelo leşkeran bi zanebûn wisa gotibûn? Bes na, di vir de lîstok nebû, ji ber leşker jî zêde bandor bibû.

Ez çûm qoxuşê. Min wê rojê jî nekarî merdîwenan hilkişim. Dema deriyê korîdorê vebû, Gûlten ew li serê merdîwenê li benda min bûn. Carê bê ku min bibin jor, jêra merdîwenê têra xwe li min didan, paşê derdixistin jor. Lê li dadgehê jî hevalên xort didan. Li dadgehan didan diyarkirin weke ku baş nêzî me dibin. Em jî ji vê aciz dibûn. Em ji xwe re dibêjin; “dê heval bêjin, qey rewşa me pir baş e û em rehet in.” Qoxuşên kêlekê dengê lêdanê dibîhîstin, ji ber carê dengê qîran baş diçû guhên wan. Lê haya blokên piştê ji tiştekê tine bû

Gardiyanan jî hêj bandora bûyera şevê din derbas ne kirine. Ji ber gardiyanê qoxuşa me ti caran bê ku lêdanê li me bike ranediwestî. Lê wê rojê bêdeng bû. Ez çûm qoxuşê, her kes mereq dike. Min behsa rewşa sibehê kir. Her kes ket nava bêdengiyek xembar. Kes naxwaze şîroveyek cuda bike.

Em di rûniştina doza Rihayê de baş hînî bûyera ku rû dayî bûn. Hevalê Fuat Kav rabû axivî; “çar hevalên me xwe şewitandin. Peyama ku hevalê Mahmut, Ferhat, Eşref û Necmî hiştîn heye. Ew dixwazin ev peyam derbasî girtînameyê bibe.” Piştî vê bi temamî peyama hevalan vegot.

Nexwe wê rojê, roja şahadeta hevalê Haqî, şeva 17'ê Gulanê bi 18'ê ve girê dide xwe şewitandibûn. Dê gotina; "avê li me nekin. Agir gur bikin" jî hinek din bigota. Êdî her çalakî û her gotinek bangawaziyek bû. Her Çar Hevalan, bersiva bangawaziya hevalê Mazlum dabûn. Em jî di navbera xwe de bibîr tînin. Hevalên ku nas jî dikin, bîranînên xwe yên derbarê wan de vedibêjin.

Ew di nava me de biyaniyek bû...

Her şahadetê em di hundir de zêdetir nêzî hev dikirin. Lê hinek kesayet jî rast nedibûn. Her carê lewaziyên xwe weke gefekê li dijî me didan bikaranîn. Dema êşkence zêde dibûn, ev kesayet jî bêdeng dibûn. Dema êrîşek bi komî çêdibû, her çendî bihurdar jî be bertekên heyîn didan rawestandin. Bes dema êrîş hinekê sist dibûn, ev kesayet jî nedisekinîn. Êdî tehemul nedima. Leşker her tim di nava me de bûn. Hemû kiribûn sadîst, hewl didan hestên heywanî har bikin. Hinek kesên ku bi awir û nêzîkbûnên xwe ve, tawîz didan van nêzîkbûnên leşkeran ên heywanî hebûn. Dibe ku ev yek bi yek bûn, lê dîsa jî tengezarî ava dikirin. Ji ber di rewşên wisa de hişyariyek giştî hebû, helwestên tund didan diyarkirin û hişyar dikirin. Bi wan re mijûlbûnek hebû. Me diyar dikir ku, em ti caran destûrê nedin ku ti jin di vê mijarê de bikeve. Me destûr nedida dijûnên leşkeran jî. Li me jî bixistan me bertekên xwe raber dikirin. Jinek li gazînoyê di pavyonê de kar kirî hebû, dema êrîşî wê jî kirin em li dijî derketin û me ew jin jî tevlî xwe kir. Ji ber rewşek destavêtinê û her wiha rewşên mîna vê êrîşek pêş biketa, me dikir sedema derxistina îsyanê. Lewma her kes tevlî

vê kirin û bertekên heyîn hevbeşkirin gelekî girîng bû. Carna ceribandinên wisa dibûn. Ji ber bertekên komî yên bi hev re ew paşve dixistin. Esad jî ev fêm kiribû. Dema heta newqê tazî dihat, me jî berê xwe dida wî. Me bi awir û bertekên cur be cur ve acizbûnên xwe diyar dikir. Lewma dema êdî ew wisa dihat, tenê berpirsyarên qoxuşê li pêşberî xwe didît. Wî jî her carê bangî Gonûl dikir.

Gonûl jî di navbera me de kesayetek pir cuda bû. Dema min destpêkê li Tuzluçayirê ew dît, gumana yekem car bi min re pêş ket rast bû. Her tim dilê min jê sar bû. Min ti germahiyek hîs nekir. Her nêzîkbûnek wê ji bona min nexwezayî, nesekinî û sivik dixuya. Di awir û rûyê wê de ew nêrîna kamil dixuya tev xapînok bû, mirov pê bawer nedikir.

Dema ez destpêkê hatîm, hevala behsa wê kir. Bi taybet zimandirêjî û zêdegaviyên bi leşkeran re dikir, beriya zext û êşkenceyan jî pêş xistiye, lewma zêde li ser dihat axaftin. Gelek rexneyan lê dikin. Dîsa jî Gonûl dev ji van nêzîkbûnên xwe bernade. Dema îdareya Esad Oktay tên, yek nûnerên qoxuşan ên berê muxatap nehatin girtin, weke serkêş dihatin dîtin. Jixwe nûnerên qoxuşan bi gelemperî jî ji kesayetên ku hêza wan a nûnertiya kom û siyaseta wan heye û dikarin di vê mijarê de navbeynkariyek baş bikin, pêk dihat. Di pêvajoya êşkenceyan de îdareyê bi xwe ew hilbijartine. Destpêkê Gonûl davêjin tecrîdê. Li qoxuşa jêr e. Hemû pêdiviyên wê jî tên pêşwazîkirin. Êdî bi zext û êrîşên rasterast ve her kesê ku li ber xwe dida hedef tên girtin. Bes fesadiyên ku di pêvajoya tecrîdê de pêş ketine, di dema pey wê re jî didomin. Jixwe dema ez nû hatim rewşa ku hatî jiyîn ji min re gotin. Nêvenga heyî cuda

bû. Ferzkirinên dijmin û pirsgirêk cuda derdiketin. Lê mixabin Gonûl nehatibû guhertin. Ji aliyekê ve jî Esad bi zanebûn Gonûl dihilbijart. Dixwest bêbaweriya derbarê wê de kûr bike û me bîne beramberî hev. Weke din jî bi lewaziyên Gonûl hesiyabû. Gonûl di pêvajoya lêpirsînê de nas kiribû. Ji ber di dosyayên derbarê kesan de, raporên dijmin jî tên bikaranîn. Di wir de derbarê kesan de agahî hene. Xeter tê dîtin, weke kesek girêdayî rêxistina xwe tê binavkirin û lewaziyên wan kesan tên destnîşankirin.

Esad di her hatina xwe de destpêkê bi qîr digot; "Gonûl, kanî Gonûl? Li kure?" Paşê destê xwe datanî ser milê wê û weke ku jê re bêje; "were", carna jî tiştên herî hêsan û ji rêzê bi zanebûn dengek nizim jê re digot û diçû. Carê dipirsî ku, 'ji bona serê mehê, çi pêwîstiya jinan heye? Emê rojnameyê bidin, paçên xwe di nava wan de bipêçin" an jî digot, 'çi ji Hêlîn re hewce ye? Û diçû. Digot; "ji ber Gonûl bi aqil e, van tiştan dizane. An jî ew fêm dike." Ev gotinên weke "Gonûl dizane, Gonûl bi aqil e. Gonûl fêm dike. Gonûl û Gonûl…" dilê Gonûl jî xweş dikir. Ji ber Gonûl jî zêde ji pesindanê hez dikir. Zêde kêfa wê ji van pesindanên Esad û gotinên wî re dihat. Esad dijmin bû, lê mixabin a li hember wî ti caran ji helwestên wî aciz nedibû û nêzîkbûnên xwe jî li gora vê ber çavan re derbas nedikir. Ev nêzîkbûn hemû jî li ber çavên her kesî dihatin kirin. Niha pirsgirêka sereke ne ku wê daxwaz û nêzîkbûnên Esad, an jî êşkencekaran erê dikir. Na, pirsgirêk ne ev bû. Ger nezîkbûnek wisa hebûya, dê helwest jî cuda bûna. Ji ber ne wê û ne jî yên êşkencekar cesaretek wan nebû ku nêzîkbûnek wisa raber bikin. Di wir de ew xalek lewaz bû û diviya ku li wir hinek tişt qut bûna. Ev jî pir baş dihat hîskirin û didan

hesandin. Bes ji ber nêzîkbûnên Gonûl ên di vê mijarê de sivik, bêpîvaniya wê û ji ber di vê mijarê de nêzîkbûnek wê ya birêgez tine bû, yê li hember xwe dijmin nedidît, weke karmendek jin çawa nêzî karsazê xwe dibe, rewşa heyî wisa dinirxand, em jî zêde tengav dibûn. Hêrsa me zêde dibû. Her carê min Gonûl digirt cem xwe û bi saetan pê re di-axivîm.

Carna jî min nedikariya xwe, li naverastê digot; "bes e Gonûl! Ev mirovê ketî lîstokan dike. Tu çima li dijî wî helwestan raber nakî? Bi qasî misqalekê jî acizbûna te dernakeve. Dijmin dizane ku tu dergistiya Riza yî. Te nûnertiya vir kiriye. Esad pir baş çavdêriya te dike, dizane ku her nêzîkbûnek te wê bandorek neyênî li hevalan bike. Lewma bi israr vê nêzîkbûnê didomîne. Tişta ku bi êşkenceyan bidest nexistiye, dixwaze bi van nêzîkbûnan ser bixe." Lê mixabin Gonûl bi şêwazek bêar digot; "temam." Carna jî digiriya. Carê jî digot qey em wê şaş dinirxînin. Har dibû û nêzîkbûnên xwe jî berdewam dikir. Şerê ku bi Gonûl re dihat meşandin, tam şereke sinirê bû.

Wê dijmin nekariya her tişta ku dixwest bike. Ev ji bona rêgeza bingehîn bû. Heta cihekê tehemula me ya pêkanîna hinek quralan hebû. Me ew jî sist dikir, jihev dixist, dem bi dem jî em li dijî derdiketin û helwestên me yên bi vî rengî tim rû didan. Em her tim li benda kêliyek teqandinê bûn. Lewma me dixwest em Gonûl jî dûrî xwe bikin. Em carê dirêj di-axivin. Carê min tika jê dikir û digot; "ger tu hesabê tiştekî nakî, qet nebe ji bîr neke ku gustîlka Riza di tiliya te de ye. Hinekê li hember wê têkîliyê rêzdar be. Kî dizane Esad diçe ji Riza wan re çi dibêje? Hinekê xwe bi-êşîne, dema ew tê

dernekeve pêş. Bila berpirsê qoxuşê bersivê bide. Tiştên ku tu bi-axivî jî di nava hevalan de bi-axive. Ji ber dema wisa dibe, bêbawerî û guman pêş dikeve. Ger tu li dijî wî helwestekê raber bikî, dê ew jî dev ji van taktîkên xwe berde." Ez bi van axaftinan hewl didim ku hinekê hişê wê bînim serê wê. Bes carê helwestên min jî hişk û bêrehim derdiketin. Di wan kêliyan de jî Gûlten dest werdida; "hinek tişt giranin. Bandor li ser wê dike, bihêle emê jê re bêjin, ji ber tu dibêjî zêde bandor dibe." Paşê ew jî dirêj bi Gonûl re di-axivî.

Gelo çima Gonûl her tim di nava me de biyaniyek bû? Kesekê jê hez nedikir. Her kes ji xwe dûr dixist. Ji ber wê jî her tim ji jor ve li her kesî dinêriya. Xwe zêde di-eciband. Zanebûn û demogojiya xwe weke amûreke xwe mezin dîtinê digirt dest. Xwe cihê dikir. Lewma ti caran ji pesindanên Esad aciz nedibû û kêfa wê ji gotinên wî re dihat.

Her carê di jiyanê de çep û rast belav dibû. peywendî jî li gorî vê dihatin guhertin. Em di navbera xwe de weke komîteyekê bûn. Me ew jî tevlî biryaran dikir. Ji xwe dûr nedixist. Heta me karê hinek nivîsan dida wê û tevlî karê perwerdeya navxweyî dikir. Me dixwest bêbaweriya li hember xwe dijî derbas bike. Gonûl nerehet bû. Di nava xwe de xirabûnek dijiya. Her tim derûniyek ku bi xwe re lihev nake dijiya.

Çi bi keçên destpêkê yên ji Dêrsimê dihat?

Di vê navberê de komek ji Elezîzê hat. Di nava wan de Fadîme Killi jî heye. Nîmet Erdoxan û çend kesên din jî hene. Ji ber navên wan di îfadeya kesên beriya niha hatin girtin de hebûn, dosya wan bi dosya doza koma Elezîzê re kirine yek. Hinekê jî bi zanebûn wisa kirine. Li girtîgeha Elezîzê bi sedan heval girtîbûn. Bes dosya hinekan bi vir ve girê dabûn. Herî zêde jî îtîrafên Şahîn Donmez û hinek îtîrafkarên din esas dihatin girtin.

Fadîme, bi Hisên Eroxlu wan re hatibû girtin. Amadekariyên derketina dervî welat kiriye, di kêliya derketinê de li Mêrdînê tên girtin. Ji bona lêpirsînê dibin Dêrsimê. Demekê li wir dimînin. Piştî ku demekê jî li girtîgeha Elezîzê dimînin, tînin girtîgeha Amedê. Pêvajoyek dirêj û tevlîhev jiyane.

Piştî girtinên 79'an derbasî çolterê dibin. Piştî cunta jî heta ku tên girtin li çolterên Dêrsimê dimînin. Di nava koma wan de Çîçek Selcan û Azîme Demîrtaş jî hene. Her wiha Azîme Demîrtaş di heman demê di pevçûnek bi dijmin re rû dide de, di nava gerîlayên jin de weke şehîda yekem derbasî dîrokê dibe. Pêvajo gelekî girîng e. Qadroyên wê, binyata ku şer dike parastin, bê ku têkoşîn raweste dana meşandin, her kes li baregehên guncav bicihkirin ne hêsan bûn. Partiya me gelek qadro derbasî dervî welat kirin, da ku pêvajoyê di şêwazên cuda de bimeşîne. Li ser esasê fermana partiyê ji Dêrsimê jî hinek kom hatine destnîşankirin û amadekirin. Ji bona derbaskirina qada Rojhilata Navîn hewldan tên kirin. Metînê

Ker jî wê demê li çoltera Dêrsimê dimîne. Di gelek pirsgirêkên ku tên jiyîn de, di radeya yekem de berpirsyariya wî heye. Têkildarî wî gelek tişt dihatin gotin.

Metînê Ker dixwaze bi komên destpêkê re derbas be. Ew jî di navbera xwe de lihev nakin. Metînê Ker piranî kêfî, hişk, bê însiyatîf û herî zêde jî bi gumanên xwe yên ferdî tevdigere. Weke din jî li ser hevalên jin nêzîkbûnên cuda ferz dike. Dema Fadîmê behsa Metînê Ker dikir, gelekî bihêrs digot;

"Min ti kes bi qasî wî cureyek kirêt nedîtiye. We çawa li Elezîzê bi hev re kar kir? Mirov nikare yek xulekê jî bi wî re bijî. Nikare tehemul bike. Bi qasî misqalekê jî girêdana wî bi partiyê re tine ye. Di pêvajoya em li çolterê bûn de, yek bi yek bi hemû hevalan re şer kir, kesek ku pê re şer nekir nema. Hesabê kesî nedikir. Her digot; 'partî jî ez im, rêxistin jî ez im.' Bela xwe li Hisên dabû. Jixwe tu dizanî dergistiyê Çîçek Selcan bû. Herî zêde jî Metîn aciz dibû ku her du li heman qadê bimînin. Li her derê di derbarê wan de fesadî dikir. Lê weke din jî, ew bi xwe li pey her cure kirêtiyan bû. Çend caran êrîşî min kir. Min carekê lê da, gef lê xwar, jê re got, 'ezê te bikujim.' Tirsiya, careke din jî nêzîkbûnek wisa nekir. Ez vekirî bêjim, hinavê min jê diqetiya. Dema em derketin derve, nîqaş kir û got, 'mîsoger ezê biçim', tirs û gumanên wî hebûn. Ditirsiya ku ez rewşa wî bêjim. Hêvîdar im ku ew derneketibe dervî welat. Ger biçe, gelo dê çi ji partiyê re bêje, raporek çawa bide? Ez û Hisên di hundir de ne. Berpirsyar jî tenê ew dimîne. Dê derewan bike. Ez dizanim dê Hisên reş bike. Ger rojekê ji vir derkevim, ezê hesab jê bixwazim. Ezê hemû xirabiyên wî ji partiyê re vebêjim."

Fadîme Killi di nava komên me yên destpêkê de bû. Wê jî zû girêdanek ava kiribû. Me digot; “ev bîrdozî mirovên bedew dikişîne xwe.” Me xebatên xwe yên perwerdeyê li mala wan a kolana Dax dikir. Kîjan mal guncav ba, me ev xebata xwe li wir dikir. Her çendî ew ne ji yê destpêkê be, yekser li pey wan tevlî bibû. Dihat hezkirin. Zêde ne di-axivî. Axaftinên wê kin û cewherî bûn. Seknek wê kamil a bandorek erênî dikir hebû. Seknek wê bêdeng û neşên (durgun) hebû. Me her tim ji bona wê digot; “ger vê kesayeta xwe dijwar, xwedî pêngav, herikbar bike, dê milîtanek xurt ava bike.” Ya rastî kesayetek tebitî û asî bû. Bertekên xwe zû nedida der. Heta mirov gelek caran bertekên Fadîmê mereq dikir.

Derdorek ku Qiymetê, ew bandor kirî hebû. Fadîme ne li wir bû. Zû û hêsan bandor nedibû. Destpêkê hewl dida fêm bike, paşê helwestên xwe diyar dikir. Dema di bin çavan de elektirîkê didin canê wê, qîr nade. Polîs jê mat dimînin. Heta guman jiyane û ketine panîkê. Ji ber dema enerjiya elektirîkê didin, mirov bêhemdî xwe qîr dike. Min li hember copan li ber xwe dida. Ger bixwazî dikarî qet li hember copan deng nekî. Lê, dema elektirîk didin canê mirov her cure deng bêhemdî mirov derdikevin. Carna dengên tûj, zirav, carna weke bixeniqe, dişibe girî, carna jî dişibe ken derdikevin holê. Fadîmê jî deng nekiriye. Polîsan gotiye; “em cara yekê ye tiştek wisa dibînin. Di bedena te de tiştek ne asayî heye.” Her wiha ji her kesî re behsa vê bûyerê kirine. Me jî li ser vê bela xwe li Fadîmê dida û digot; “nav û dengê te derketiye.”

Li cem polîsan tiştek qebûl nekiribû. Tenê di derbarê kuryeyê ku bi hev re hatine girtin de hinek tiştan dibêje. Her

wiha gotiye Hisên dinase û ji ber lê digerin wê derbasî dervî welat bibe. Weke din jî tiştek din qebûl nekiriye ku zerar bide. Bes li cem polîsan derbarê wê de gelek agahî hene. Ew agahî ji Fadîmê re jî xwendine. Gelek kesên ku li Dêrsimê hatine girtin, weke ku yekîtiyekê ava bikin hemûyan li hember pirsa polîsan a; "hûn ji keçan kê nas dikin?" Wan jî ji polîsan re gotiye; "em Fadîme Killi û Nîmet nas dikin." Lê navê Menekşe û hinek keçên din nedane.

Ez mat mam ku Nîmet ew çawa hatine heta girtîgehê. Hatibû heta Amedê. Fadîmê berfireh behsa wê malbatê kir. Nîmetê di şaredariyê de kar dikir. Herî dawî Nîsanê çûbûm Dêrsimê. Wê demê rewşa Qiymet wan dihat nîqaşkirin. Peywendiyên bi Nîmet re hatibûn cemidandin. Rewşa Tirkan Çakmak, Erol Dexîrmencî, Menekşe, Qiymet û xwîşkên wê yên din hatibû nîqaşkirin. Derbarê hinekan de cezayê tecrîtê û erk dana rawestandin hatibû pêkanîn. Ji bona Qiymet jî tecrîda sînordarkirina peywendiyan hatibû erêkirin. Lê diyar bû ku dê Qiymet ti caran guh nede vê cezayê. Ji ber rewşa wê bandor li hevalan dikir. Rewş tevlîhev bû. Meral çûbû. Ev jî pêvajoya pevçûnên bi Rizgariya Gel (HK) re bû. Em jî bê ku pê bihesin çi pêşketinan rû dane, hatin girtin.

Piştî girtinên li Elezîzê, Qiymet ew jî diçin metropolan. Nîmet dibêje li Enqerê ye. Perîhan, ji xebatên Hîlwanê tê vekişandin. Têkîliya biçûka wan bi leşkerekî re pêş ketiye. Her ku van li pey hev digot, min jî jê re got; "bes e. Hat fêmkirin." Çi malbatek ecêb e! Malbata ku herî zêde pêşketî dihat şîrovekirin, malbata herî zêde xwedî pirsgirêk bû. Keçên wan jî yek bi yek têk diçûn.

Cemîle Merkît (Seher) derbasî Dîlokê bûye. Piştî pêvajoya destpêkê zewaca wê û hevalê Fuat jî hatiye nîqaşkirin. Digotin; “hevalê Fuat gotiye dê komek zarokan çêkin.” Me destpêkê got qey bi armanca hevalê Fuat reş bikin û bidin nîqaşkirin van tiştan dixin rojevê. Heta me nîqaşên bi vî rengî di nava xwe de qedexe jî kirin. Me digot; “wê nîqaşên wisa bi bihincirînin.” Mixabin ev mijar rast bû. Fadîmê got; “ma li ser devê her kesî ye, tu nikarî devê wan girê bidî! Lê zarok ji ber kirine. PDA jî di rojnameyên xwe de nivîsandine. Sernavek ‘cenî avêtine sobeyan” nivîsandine. Hevalê Fuat jî ev kiriye pirsgirêk û Kesîre tewanbar kiriye. Gotiye; “tu qatilê zaroka min î.” Bawerim ji ber Kesîre ji Seherê re gotiye; “wê zarokê ji ber xwe bike” wisa tewanbar dike. Ma ez çi dizanim, weke din gelek tişt hatin jiyîn.”

Çi ecêb bû, yên me bi çi ve mijûl dibûn? Li gorî evqas propagandeyên dijber hatine pêşxistin, hinek tişt hatibûn jiyîn. Di notên diketin dest, rapor û îfadeyan de tiştên ku mirov tengav bike derdiketin holê. Dijmin jî ew gelekî xirab bikar danîn. Lê min ticarî nêzîkbûnên wisa di vê astê de paşverû û teng hêjayî hevalê Fuat nedît. Dîsa min digot; ‘mîsoger hinek mijaran dinepixînin.’ Min pir zêde ji nêz ve nas nedikir. Lê şopa ku bi min û bi piraniya me re hiştî gelekî cuda bû. Navê Elî Heyder Kaytan her tim ji min re weke mirovê hûr û kûr kar dike, rastiyan, hûmanîstî, bawerî û girêdanê dijî rave dikir. Di forma bîranîna Leyla Qasim de nivîsa di destê xwe de danîbû, bi hestewariyek kûr, bi ajiteyek xurt ve axaftinek kiribû. Çavên wî jî tije rondik bibûn. Ez bawerim girseya xwendevanan nîvî zêdetir giriyabûn. Lewma gotinên wî ya; “qatilê zarokan” hestewariya wî danî bîra min. Dibe ku li dijî zarok ji ber kirinê

be. Gelo wê çi ji komek zarok bike? Ne fikir û ne jî xeyalê qadroyek pêşeng ê şoreşger wisa nabe. Ji ber em bi gumanin ku ji şîroveyên şaş re rê veke, em jî zêde li ser ne rawestiyan.

Gelek ji wan keçên Dêrsimê yên destpêkê xirab bibûn. Ne karîn li derekê xwe bicih bikin û xwe ava bikin. Tirkan Çakmak hatiye tecrîdkirin. Ewqas jêhatinên xwe, kir qurbana pîrektiyê. Ti caran seknek wê ya saxlem, bivîn û bipîvan pêş neket. Ecêb, Erol Dexîrmencî zewicî bû û du jî zarokên wî hebûn. Hevjîna wî jî heval bû. Bi Tirkan re li qada Mazgîrtê xebat dimeşand. Li wir asta peywendiya şoreşgerî û rêhevaltiyê derbas dikin, exlaqê xebatê û rêgezên wê xirab dikin. Ev jî bê îradebûn û ketîbûn bû. Tirkan berê bi Celal Aydin re jî çend rojan kar dike. Li wir jî yekser daxwazên zewacê pêş dikevin. Kesayetek sivik û xwe ava nekiribû. Ti caran xwe ji wê rewşê rizgar nekir.

Erol, ji wê zêdetir ketîbûnek jiyabû. Kesek çawa bû? Min wê demê jî ti caran ew nas nekir. Ez çend caran çûbûm mala wî. Ew jî ya civîn hebû, yan jî hinek karên me çêdibûn. Gotinên tûj dikir, lê kûranî û samîmiyet pê re tine bû. Binyata malbata wî jî tevlîhev bû. Bi Ozden Mizrak re birayê hev ên jinbavê bûn. Ozden ji Rizgariya Gel (HK) bû û me jê şik dibir. Jixwe herî dawî jî rewşa wî derket holê. Qaşo Hisên Yildirim dosya wî ya veşartî derxistibû holê! Digot; "ezê wê dosyayê radestî Elî Heyder Kaytan bikim." Min jî ji Fadîmê pirsî; "gelo birastî nêzîkbûnek wî ya wisa hebû, wî çi kir? Ti agahiya te têkildarî vê mijarê heye an na?" Wê jî got, ji hinek cihan bihîstiye, lê tam nayên bîra wê. Paşê got; "temam. Ew zilam (Hisên Yildirim) li aliyê Pertekê dixwaze bi hevalan re

hevdîtinê bike. Lê dema ev komî ser hevin dijmin êrîş dike. Ez bawer im hinek ji wan birîndar dibin. Ne şaş bim hevalê Elî Heyder Kaytan jî sivik birîndar dibe."

Ev ecêb bû. Şik û gumanên min ên di derbarê Hisên Yildirim de zêde dibûn. Her cihê ku ew diçûyê, dijmin êrîşî wir dikir. Mîsoger destên wî jî di van bûyeran de heye. Çiqas heval pak in, çawa vî zilamî nas nakin. Hêj ez li Meletî bûm, min agahî dabû hevalan. Min ji partiyê re not nivîsandibû. Nexwe kesî bawer nekiriye û baldar nêz nebûne.

Niha jî dibêjin hatiye girtin. Ez di vir de jî şikekê dibînim. Zilam li gorî tê xwestin tevlî dozên me nebû. Li rûniştinên dozê jî her tim bi tirsonekî axivî û ji xeynî daxwaza xwe ya berdanê têkildarî ti tiştî ne-axivî. Ma çima ew girtine? Divê em di hundir de hişyar nêzî vê bibin. Gelo di kîjan qoxuşê de ye? Hinek parezerên din jî hatibûn girtin. Dibe ku ev jî gefek dijmin be. Wê bixwazin van baş bêdeng bikin. Naxwazin tevlî dozên me bibin û dê wan ceza bikin. Ev alî jî heye, dîsa jî ez nerehet im. Li hember kesayeta wî bi gumanim.

Sevîm ew jî pasîf mane, kêr nayên. Min pirsa Nadîrê kir, ew jî jîr û bi xwestek bû. Dîsa min pirsa Gonûl Tepe û Yildiz Durmuş kir. Yildiz û Qadriye ji girtîgeha Elezîzê berdidin. Gonûl jî dema li Çewlikê li malekê ye, polîs bi ser wan de digirin, ew jî xwe ji şaneşînê davêje, ji ber vê pişta wê dêşe. Ew jî derbasî çolterê bûye. Min jî got; "baştire. Jixwe ew jî xwediyê giyanek anarşîst bû. Bila li çolteran bibe jinek xwedî du demanceyan." Û her kes bi vê gotina min keniya.

Nurheyat li Agirî dikeve nav xefka Mehmet Turan. M. Turan jî di bin navê têkîliya hestiyarî de, Nurheyat bikar tîne.

Dijmin jî dest davêje. Herî dawî demekê li Amedê girtî dimîne, bes bi zanebûn digirin. Bi armanca ku rewş û peywendiyên hevalan ji dijmin re ragihîne tê girtin. Dema tê ferqkirin jî berdidin. Ayselê pir dirêj behsa vê mijarê kir. Lenet be. Kes nema. Min pirsî; "gelo çi ji wê keça biçûk û kin a li dibistana mamosteyan dixwend hat?" Ew jî derbasî aliyê Hîlwanê bibû. Fadîme Yildirim hebû. Digot, ti agahiyê wê jî ya zelal di derbarê wan de tine ye. Lê mîsoger ew jî bê bandor mane û belav bûne. Teşegirtina destpêkê û sekna di nava rêxistinê de gelekî girîng bû. Pêvajoyên zehmet, kesayetên lewaz û xwe birêxistin nekirine, zû derdixistin holê.

Peywendiyên me bi Nîmet re ji hev dûr bûn. Lê dîsa jî em nahêlin ku zêde dûrî me bisekine. Ji ber dijmin teqez rewşa malbata wê dizaniya. Lewma dibe ku bikar bîne. Lewma em jî di nava peywendiyên xwe de cih didinê. Heta em di nava karên saziyên lojîstîk û weke wê de erkdar dikin. Em dixwazin baweriya xwe ya li hember wê bidin nîşan. Ya rastî pirsgirêkên heyîn fêm dikir. Ger bixwesta dikariya pêşketinên girîng û erênî jî ava bike. Lê mixabin bi gelemperî bandora girêdanên wê yên malbatî û hinek xisletên wê, li ser Nîmet hebûn. Ji aliyê kesayetiyê ve hinek nêzîkbûnên wê yên bêrêgez hebûn. Ji aliyê xwe yê pîrektî ve zû bandor li ser kesayetan dikir. Ev jî xisletek wê malbatê ya ber bi çav bû. Weke ku hemû xisletên burjuvaziya biçûk ên diyarker di kesayetên wan de kom bûne.

Wan, rêbertî û pêşengiya şoreşê bi girêdanek herî paqij û zelal ve temsîl kir

Piştî çalakiya her çar hevalan, dijmin zêdetir bi tevdîr tevdigeriya. Gelek rêbaz di nav hev de dimeşand. Pirî caran li qoxuşan çav li me venedikirin. Ji bona bandorên heyîn asteng bikin, 24 demjimêrên rojê bi sirûd, zext û êşkenceyê dimeşandin. Ger carê radeya êşkenceyên çors bihata xistin jî, ev bi sirûdan û pêkanên din ve her tişt di destên xwe de digirtin. Hişyar nêzî her hucreyê dibûn. Em jî, ji tiştên ku dibînin wisa fêm dikin. Çalakiyên weke çalakiya Mazlum û çalakiya her Çar hevalan, ne çalakiyên ji rêzê bûn. Her çendî binesaziya wan a rêxistinî parçe kiribe û venêrînên xwe zêde kiribin jî, her tim li girêdanek ku heye digeriyan. Bendewariya dijmin ew zêdetir har dikir. Li cem me jî sepanên heyîn di nav hev de, lê carê sist dikirin û dimeşandin. Sirûd didan xwendin. Lê nedikariya jiyana me bixin bin venêrînê, bixeniqînin û ji aliyê derûnî ve bişkînin. Ji ber hêza wan ne di wê astê de bû. Me jî her tişt têkilhev dikir, di demjimêra xwendina sirûdê de, me jî mijarên din nîqaş dikir û em ji xwe re di-axivîn.

Êdî li hinek qoxuşan pêkanên bi vî rengî hatine qebûlkirin. Êdî ji xwe re dibêjin. Carê leşker di navberê de hewl dide venêrîne, an jî dixwaze lê bixe, bi hêceta ku ‘deng derneket”, “baş nehat gotin” diket hundir zext ava dikir. Di wextên din de jî nûnerên qoxuşan an jî kesên ku wan erkdar kirine ev “venêrîna xwe bi xwe” saz dikir. Lewma diviya nûnerê ku dijmin hilbijartî ne, ji dijmin re, li gorî vîna me tevbigeriyan. Me jî ji destpêkê ve ev ferz kir, her çendî cih bi cih hinek neyênî derketin jî, bi gelemperî vîna hevbeş hebû, ya girîng jî

ev bû. Pîvanên ku xisletên serî ji xwestekên dijmin re ditewîne, dijî dernakeve û xwe ayîdê wî dibîne red dike serwer in. Me di hundir de ne ku tiştên dijmin weke şert û qural danîne, quralên ku me tespît kirine pêk danîn. Em ji nêrînek biçûk a li hember dijmin bigirin, heta helwesta me ya dadê, me her tiştê xwe diyar dikir. Dema yên li gora vê tevnedigerîn, me suc didît. Me lewazî û qelsiyên di vê mijarê de ti caran efû nedikir. Li hember lêdana dijmin, di wê kêliyê de ti nêzîkbûn û xoyek ku cesaret bide dijmin nedihat qebûlkirin. Nêzîkbûnên weke girî, dil bi xwe şewitandinê, tika kirin û hwd, di heman kêliyê de bi awirên tûj û hêrs ve rû bi rû diman. Bes di vê mijarê de gelek lewazî jî hebûn. Li gorî kesayetan nezîkbûn dihatin kirin. Ji aliyekê ve hewl didan li ser lewaziya kesayetên ji vî alî ve bi-axivin, hişyar bikin û bi wan bidin fêmkirin, lê carna jî helwestek pir tûnd, heta hinek pêkanên tûj û hişyarî dihatin kirin. Em li dijî her cure êşkenceyê bûn. Dema me ew êşkence dijiyan jî, me pê re nefretek mezin hîs dikir. Lê dema hewce dikir, em li dijî her cure nêzîkbûnên ku cesaret dide dijmin, îxanet li girtiyan dike, tenê ji bona sembolîk jî be me ceza dida. Ev jî paradoksek bû.

Dijmin bi pergal û dervî mirovahiyê êşkence dikir. Êrîşî xisletên mirovî, nirxên şoreşgerî û îdealên bedew ên mirovahiyê dikir. Bertekên bi me re zêdetir xwedî pîvanek rewa bûn. Li dijî nêzîkbûnên ku dij mirovahî, dij hevalê xwe, li hember jinbûna xwe îxanet kiriye, bertek û helwestek girîng bû. Ev jî xwezayî bû. Di vê manê de her du gelekî ji hev cuda ne. Ya me dijiya bertek, kîn û hêrsa li dijî ketîbûna di kesayetan de, koletiya di kesayet de û paşverûtiya di kesayet de dihat jiyîn bû.

Bi gelemperî jinên ku hatibûn girtin, hêj di bin bandora kevneşopî û tarîtiya herêmî de bûn. Ne tam Kurdewariya wan û ne jî nasnameya wan a jinbûnê baş derketibû holê. Lewma di hundir de hêmanên herî zêde zehmetî didan avakirin jî ew bûn. Ji van jî ya ku herî berbiçav Pakîze bû. Ew ji Hîlwanê bû. Hevjînê wê jî hatibû girtin. Dema van dibin lêpirsîna yekem, Pakîze du canî ye. Di êşkenceyê de zaroka wê ji ber diçe. Ev bûyer jî weke kulekê di dilê wê de dimîne. Ji ber vê gelek caran li hember dijmin hêrs bûye û weke dijminê windakirina zaroka xwe dibîne, carna jî ji bona vê bûyerê partiyê û yên ji partiyê tewanbar dike. Li gorî xwe digot, ger ew ne PKK'yî bûya, ne Kurd bûya, an jî deriyê mala xwe ji hevalan re venekiriba, di asta xwe de jî xebat nemeşandiban, ev bela jî nedihat serê wê! Pakîzê her tim ev rewşa dudilî jiyan kir. Carna baş bû, tevî êşkenceyan jî hestên xwe bi me re hevbeş parve dikir. Heta gelek caran dijûn ji êşkencekaran re dikir. Hinek caran jî qêrînên wê erd û ezman dihejand. Wan qêrînan zilamên li qoxuşa kêlekê girtîbûn bandor dikir û ew didan şermê. Ji ber girtiyên jin, bi halê xwe yê jinbûnê dijmin bi xwe ve mijûl dikirin. Weke wan neketibûn. Tevî hemû êşkenceyan bawêrî û hêviyên xwe winda nekiribûn. Hêj li dîwaran dixistin û li rêyek peywendiyê digeriyan. Ango ew qêrînên Pakîzê bi qasî wan bide hizirandin kêrî hinek tiştan dihat. Lê heman Pakîzê jî, hinek deman weke dîna êrîş dikir. Li gora wê yên tewanbar em bûn. Weke ku sedema windakirina zaroka wê em bûn! Ev şoreş, ev rêxistin, ev girtîgeh jî ji kur derketibûn! Li gorî quralên di nava jiyana me de tevnedigeriya. Bi tena serê xwe tevdigeriya. Dema ji me aciz dibû, diçû cem jinên komên din. Dilê xwe ji wan re vedikir. Li gorî Pakîzê ew kêmtir xeternak

bûn. Tiştên ku dijmin bi me dikir, li wan nedikir. Dilxwede ew zêdetir bi aqil bûn, em di cihê xwe de nedisekinîn. Dijmin heqê me dida me û êşkence li me dikir. Tevlî civînan nedibû. Tevlî xerckirinên hevbeş dibû. Lê her carê jî tiştên ferdî ferz dikir. Weke ku em neçar bûn her tiştên ew dixwaze pêk bînin. Ango, deyn bû, qaşo ger ji doza PKK'ê hatiye girtin, ger ji bona PKK'ê evqasî êş dijî, wê demê em jî neçarin her tiştên dixwaze bikin û delaliyên wê qebûl bikin!

Esad dixwest Pakîzê li dijî hevjînê wê bikar bîne. Çend caran ji bona hevdîtinê biribûn cem hev. Hevjînê wê li qoxuşên asayî bû. Ew jî di bin bandora pêvajoya giran de bû. Lê Pakîzê dixwest bi fêlbaziyên xwe yên gundîtiyê ve bertek û lewaziyên xwe bikar bîne! Demek dirêje ji hevjînê xwe jî agahî nagire. Bendewariya dadgehê ya berdanê jî vala derket. Ji heman herêmê çend kes hatibûn berdan, lê hêj di hundir de girtî bû. Hest, ajo, lêgerîn û pêxirtengiya hundirîn tev gihane hev, niha yek in. Derûniya wê ev hemû didan diyarkirin. Kesek di rewşek wisa de gelekî xeter e. Di girtîgehê de jî, ji derûnî û rewşên wisa re derî hatiye vekirin, heta dawiyê vekirî maye.

Leşker rewşa derûniya mirov jî dişopînin. Lê dinêrin gelo pirsgirêka yekê heye, ma bi tenê digere, bêhna wan teng bûye yan na, gelo bi çavên xwe qelsiyên xwe daye dest, gelo xoyên didin der hinek tiştan rave dikin, hemû nebe jî hinek ji wan baş fêm dikin. Ji ber peywira wî jî li ser me girtiyan lêhûrbûne. Dijmin pergalek wisa saz kiriye. Her kes, her kesî di bin venêrînê de digire. Hemû leşker jî di heman demê de hev dişopînin, ji hev şik dibin. Yek wateya nêzîkbûnên girtiyan li cihê ku wî xwe pê ve girêdaye de lê digire. Her tim weke

tişteke xeter û dikare bidest bixe li girtiyan dinêre. Nêzîkbûnên herî xwezayî jî, li gorî xwe şîrove dike. Bes ên ku rast şîrove dikin jî hene. Me miqabil hev baş nas dikir bê ka kî lewaz e, kî qels e, kî xwedî vîn e, kî dijwar û serhişke, dijmin dikare kê bidest bixe, me hemû texmîn dikir. Ji ber me zêde hevûdû nas dikir. Me jî gelek tişt ji nêzîkbûn û derûniyên leşkeran fêm dikir. Herî zêde texmînên me kûr dibûn. Gelek caran em dihatin xapandin jî. Carê me pir baş dikariya em di çarçoveya xwestek û bendewariyên xwe de gelek tiştên baş şîrove bikin. Lê cardin me dinêrî di dawiyê de agahiyek bi êş heye.

Pakîze carekê 'çav li leşker dişkîne." Ango rewşa xwe daye diyarkirin. Piştî ku çû revîrê û hat, her carê bi hêceta dermanan diçe cem leşker. Gelo hevjînê xwe dibîne, gelo giliyê me dike? em nizanin? Dixwest peyama çi bide me? Heval di vê mijarê de hişyar bûn, ku dê kesek bi tena serê xwe bi ti leşkerî re ne-axive. Ev quralek bû. Ger kesekê nêzîkbûnek wisa bida der, dê weke niyeta xwe xirab bihata nasîn.

Me jî Pakîze dişopand. Bi tena serê xwe nedikir. Di nava vî karî de hinek hêvî hebûn, an jî rewşa derûniya wê ew dixist nav lêgerînan. Di wan rojan de êşkenceyek dijwar jî tinebû. Bêdengiyek ecêb jî heye. Çûyînên dadgehan jî kêm bûne. Rûniştina doza giştî ya Rihayê jî di demek kin de çêbû. Her wiha rûniştina dozên komên biçûk jî didomin.

Em di meha Tîrmehê de ne. Hewa germe. Esad jî kêm tê û diçe. Gardiyan û leşker bi qelebalix ketin qoxuşê û gotin; " ma hûn amade ne, fermandarê me tê?" Ecêb, tu dibêjî qey amadebûn ji bona me pir girîng e! Carê hema ji xwe re pêşde agahî didin. Me jî ji bona vê kêm lêdan nexwariye. Dema me

digot; “evder qoxuşa jina ye. Xêre hûn şev û roj ji xweber dikevin û derdikevin. Gelek pêdiviyên me yên ji neçarî hene. Çima bê ku hûn agahî bidin dikevin hundir? Em vê qebûl nakin.” Bersiva wê li me didan. Esad jî diqêriya û digot; “li vir jin û zilam tine ne. Leşker hene.” Carê jî bi şêwazek gelekî ketî, pêkenokî digot, ji ber em jinin, divê em hêkên malzaroka xwe necemidînin. Dîsa ji leşker re digot; “kuro, ev jin in, divê hûn fêm bikin. Pembû bînin, rojnameyan bidin, da ku pakêtan çêkin.” Lê mixabin, heman Esadî, ew paçên nexweşiyên me ji xwe re dikir pakêt, dibir odeyên êşkenceyan, an jî hucreyan belav dikir û kena xwe bi namûsa me dikir. Dixwest li ser zilamên girtî bandorê ava bike. Dema me jî ev dibîhîst, me ew pakêt di nava bîdonên gelaşê de vedişart. Her wiha em xemgîn dibûn û êş dida me. Dijmin bi çi ve mijûl dibû!

Elî Osman hêdîka ket hundir. Çend gavan ji derî dûr li hundir rawestiya. Weke her çarê çav li ser me digerîne. Got; “Sakîne Polat, Aysel Çûrûkkaya, Gonûl Atay xwe amade bikin, dakevin jêrê” û çû. Ji nişkê ve rûyê her kesî hat guhertin. Em hema wisa di cihê xwe de sekinîn. Elî Osman jî tine ye, leşker jî tine ye. Lê dîsa jî em li ser piyan sekinî ne, me rêzek xelek çêkiriye, cimidî disekinin. Paşê ev xelek teng bû. Her kes ber bi me ve hat. Pirsên weke; “gelo çibû, dê we bibin kuderê?” Têkil hev bûn.

Gûlten, Fadîme, Nîmet û çend kesên din gotin; “emê jî werin. Dê we bibin kuderê? Dê mîsoger we bavêjin hucreyê. Yan jî dê we bibin beşa hevalên xort…” ecêb çawa beşa xortan. Me got; “bes ew der cihê xortaye. Ma dibe ku me bibin wê derê? Xweziya me bibin wir. Emê jî zêdetir nêzî hevalan

bin. Dê peywendiyên me bi wan re çêbin. Emê wê demê bikarin ji we re jî agahiyê bişînin. Em dikarin di nava tiştên weke cilên em bişînin de notan jî veşêrin û ji we re bişînin. Wê demê baş kontrol bikin!" Heval hem kêfxweş dibin, hem jî xemgîn dibin. Hestên ecêb derdikevin pêş. Her du jî tên jiyîn. Ev hest di heman kêliyê û yek bûyerê de tên jiyîn.

Li gorî ku got xwe amade bikin, emê tiştên xwe jî bi xwe re bibin. Aysel got; "dema ji we re got xwe amade bikin, min got qey dê dîsa we bibin falakayê girê bidin, kêmek mabû ez rûnim." Belê, ji ber beriya niha ji bona çavên hevalan bitirsînin, em li ber çavên hemûyan bi falakayê ve girê didan û wisa dadixistin jêrê. Vê carê jî taktîkê wan nerim bibû.

Bes na, vê carê tiştek hebû. Gelo em ji leşker bipirsin nabêje me? Gûlten çû cem gardiyan pirsî; "ma wê heval cilên xwe jî bigirin?" Gardiyan jî got; "fermandar çi gotiye bila wisa bikin. Bila dakevin, min derî vekiriye. Tenê dibêje cihên razanê kêm in." Dihat fêmkirin, em naçin dûr. Em naçin goşegiriya beşa xwe jî, tenê diçin qata jêr. Dîsa me tecrîd dikin, bes çima, ma dîsa çi bû?

Ger bipirsin bêjin êşkenceya herî bi lenet çiye, ezê bêjim rewşa nediyare. Belê, nediyarî… Nediyarî… Nediyarî… ji ber texmînan zêde ti encam nedida. Em li heman girtîgehê ne, bes di goşegiriyê de ne, gelo bi giştî çi hebû, haya me ji wê jî nebû. Tenê tişta ku dihat zanîn, mijarên ku ji qoxuşa kêlekê diyar dibûn. Di çûn û hatinên revîrê de jî yek du kesên girtî dihatin dîtin. Pir kêm ên nas dihat dîtin. Weke din jî çiye, ne çiye em nizanin. Carê hevalan ji ber nas nedikirin, silav didan îtîrafkaran jî. Me hinekê jî ji gardiyanan dizaniya kî çiye. Ji ber

gardiyanê her qoxuşê cuda bû. Çawuşê wê cuda bû. Bi nimareyên qoxuşan bangî hev dikirin. Navên ecêb li hev dikirin û wisa bang dikirin.

Me xatirê xwe ji hevalan xwest. Her kesê em hemêz kirin û ramûsan. Hinek jî digirîn. Di wê navberê de Fatmayê got; "Fadîme û Gûlten bi wan re tevbigerin. Moralê hevalan bilind bikin. Berpirsyarî ya we ye. Hişyar nêzî Pakîzê bibin. Pê re bi-axivin. Hevalên ji Hîlwanê wê dinasin, bila hinekê jî ew mijûl bibin. Alîkariya Cahîdê jî bikin. Em li jêrê ne. Emê her tim agahiya bidin û bigirin. Hişyar nêzî notan bibin. Bila şev her tim bi şibakê re ben neyê daxistin. Ger tiştek lezgîn hebe, emê wê riyê bikar bînin. Em dikarin notan di xwarinan de jî bidin. Ger em agahiyek nû jî bigirin, emê ji we re ragihînin. Emê hewl bidin bi qoxuşa kêleka xwe re peywendiyê pêş bixin. Dema hinek ji we jî çûn dadgeh, nexweşxaneyê an jî hinek cihên din agahî bidin. Bêjin ku em ji hev cihê kirine. Dibe ku bihizirin hinek tiştên din jî bikin. Baweriya me bi we heye. Bila rewşek neyênî dernekeve." Gûlten û Fadîmê jî nêzîkbûnek erênî raber kirin, lê hinekê jî xemgîn bûn. Gotin "temam." Fatmayê got; "gelo çima ez nedaxistim. Ezê jî bi we re werim. Bila Gonûl li vir bimîne." Heval tev keniyan, hemûyan ecêb li Fatmayê temaşe kirin.

Min jî jê re got; "ma ne me destnîşan kiriye, dijmin wisa kir. Em nikarin bêjin 'bila şûna Gonûl Fatma were', pêdiviya hevalan heye, li vir alîkariya wan bike. Weke berê nêz nebe, bi hevalan re tevbigere." Dilê xwe ji ber van gotinên min girt û got; "de ka hûn biçin, em dizanin çi bikin." Dev ji vê xoya xwe bernade. Bi gelemperî jî nêzîkbûnên hevalan ên li hember wê,

nexema wê ne. Ne diyar e ku cuda ye, ne jî bi me re ye. Ev nêzîkbûnên wê li ber çavên her kesî ne. Di kêliyên zor û kêliyên dijmin êrîş dike de, yekîtî gelekî girîng e. Fêlbaziya xwe ji xeteriyan veşartin, kesan dixe nava rewşek gelekî xirab. Ev jî hîskirin gelekî girîng e. Ji ber her tişt di navbera van dîwaran de namîne, dê nemîne jî. Wext nerawestiyabû. Jiyanê berdewam dikir. Gelek tiştên ku pêvajoyê hêra bûn, belav kiribûn û bi zorê xirikandibûn hebûn. Her wiha ên ku bi wextê re dibeziyan, her çendî bi ketin û rabûnê jî be, gelek kesên ku gelek bahoz bi hev re, bi heman hestan, bi heman baweriyê, bi heman lêdana dil ve, dildarî hevûdû hemêz kirîn jî hebûn. Ev cewazî gelekî girîng bû. Diviya ti diyarde têkil hev nebûna. Ev bêjeya gel a dibêje; "gunehê kesî, ji kesî re namîne" rast bû. Di şoreşgeriyê de ti tirsên veşartî, hestên veşartî, daxwazên veşartî û jiyanên veşartî tine ne. Xwezaya şoreşgeriyê neveşartî bû. Bi her awayî tazî bû.

Her çendî em sedemê nezanibin jî, em goşegiriya xwe erênî şîrove dikin. Her tişta ku dijmin xeter didît û ji bona wê tevdîr digirt, ji bona me pêşketinek erênî bû. Cezaya ku dijmin dida me, ji bona me moralek bû. Dema me didît em di rewşeke wan mijûl dikin de ne, zewq dida me. Hestên me yên têkoşer û berxwedêr xurt dikir. Ma şer jî ne ev bû? Bi taybet dema ku ev şer bi hevalan re di nava rêxistinbûn û peywendiyek sazûmankirî de pêş diket, bêguman wê kêfxweşî û şahnaziya vê cudatir ba. Dema ev dihatin axaftin, êş û axîn zêde mezin dibûn. Em bi şahadeta Mazlum jî gelekî dereng hesiyan. Her wiha bi ya Çar Hevalan jî dereng hesiyan. Tenê me bihîstibû hinek bûyeran rû daye. Ya esasî jî em di rûniştinên dozan de bi çalakiyê hesiyan. Ev daxwiyaniya di rûniştina doza Riha-

Bozovayê de hat kirin, bu sedem ku gelek heval parastina xwe li ser bingeha behsa mercên girtîgehê bikin, ji bona hêjayî Partiyê bin, çi hewce be amadene bikin.

Gelek tişt têkilhev pêş diketin û binakok bûn. Li girtîgehê sirûdên Tirkan dihatin xwendin û qural pêk dihatin, lê di heman demê de li dadgehan parastinên dijmin darezîne, mêtîngeriyê darezîne, bîrdozî û polîtîkayên Partiyê rave dikin pêk dihatin. Em li dadgehan serwer bûn. Însiyatîf di destên me de bû. Ji ber nûnertiya Partiyê li pêş bû. Ji aliyê fîzîkî ve em li ser kursiyê sucdaran bûn. Lê me mêtîngerî li erdê dixist. Bawerî bi dengek bilind dihat qêrîn. Hewcedariyên girêdana bi şehîdan ve dihatin vegotin. Her wiha gelek gotin û sondên ku hêjayî Partiyê derneketine, lê ji bona teqez hêjayî vê bin dihat dayîn. Li hember vê jî hêdî hêdî şaşî û sucên ku hene diderizîn. Ev rûyê rastiyê, rûyê me û rastiya me bû. Êdî aliyek wê ya ku bi kêliyekê jî bihata jiyîn nemabû, aliyê ku heyî dijmin bû, wî jî tenê dihêriya, dixwar û dikojî.

Em hewl didin li cihê xwe yê nû bûyerên ku rû didin hêj baştir û aramî binirxînin. Em destpêkê derdora xwe guhdar dikin. Bi saetan guhê me li mazgalane. Em hewl didin dengên ji dîwaran tên fêm bikin. Qeta jêr dengên ecêb derdixin. Hemû xirênî, xurexur û heta dengê bloka herî dawî jî tê. Lê ji ber hemû têkilhev dibin, tiştek nayê fêmkirin.

Em hinekê dengê qoxuşa kêleka xwe fêm dikin. Lê ew jî gelekî asayî di-axivin. Bi qasî çi dikin, çi nakin, weke ku em dibînin wan dibîhîsin û şîrove dikin.

Derî vebû. Gardiyan bangî yekê kir. Yekê pênûs xwest. Yek kuxiya. Çiqas xweş dikenin. Yek ji wan pir kûr dikuxe. Mîsoger ew werem bûye. Her wiha gelek tiştên ku nayên dîtin, lê em dihesin, dibihîsin gelek beşên ji jiyanê hene. Dema werem hat bîra min, li Aysel vegeriyam û min jê re got; "tu dikarî li vir hêj baştir baldar nêz bibî. Em qedeh, kevçî û lalîka te cihê bikin. Cil û xewliya xwe paqij biparêze. Dê ji bona te baş be. Bes tu zêde cixareyê dikişînî. Ger tu dev ji wê bernedî, wê werema te jî derbas nebe." Hinekê aciz bû û weke ku bêje; "de ka li vê girtîgehê di nava evqas êşkence û janê de li paqijiya vê ya zêde binêre!" Li min dinêriya. Dema dilê Aysel dima bêdeng dibû, lê awirek tûj a mezin dibarand. Axîn, keser, rûyê wê û reşkên çavên wê tev bêçaretî, êş û keder dida diyarkirin. Meş û gavên ku davêje jî, weke kesek ji hev ketî, li benda mirinê û dev ji jiyanê berdaye rave dikir. Dema cixareyan jî dikişîne cuda ye. Wisa dikişîne kezebên xwe, weke ku nahêle misqaleke wê jehrê vala biçe. Ango dixwaze kezebên xwe bi jehir bike!

Min jî cixare dikişand. Lê min ti caran cixare bi hezkirin nekêşa. Carê min kampanyayên berdana cixarê didan destpêkirin. Min digot berdana cixareyê zehmet e, lê gelek caran min kena xwe pê dikir û wisa diberda. Ango kena xwe bi cixareyê dikim! Li girtîgehê cixare, di destê dijmin de çekek giran bû. Hêmanek sereke ya cezakirinê jî cixare bû. Carna cezayên weke çayê, cixarê, serdanan û hewagirtinê bi mehan didomandin. Ev jî dihat wê wateyê ku hêmanên herî zêde girêdan bi wan ve hene, ev hêman bûn. Ma ne çay fêrbûna bi salane, ma dil naxwaze? Ma ne xweş bû bi taybet dema hewa sarba, dema dibû mebesta sohbetên komî, yên bi hev re? Lê

niha jî ji êşkenceyê re xizmet dikir. Çekek çewsandinê bû. Êdî ti xweşikbûn û balkêşiya wê nemabû. Heta navê wê jî hatibû guhertin. Êdî ti tama wê çaya xweş tinebû. Bêhna bîdonên naylon, bêhna qedehên naylon û şapê hebû! Dema dihat vexwarin jî gelek heval îshal dibûn, lamên rûyê me sor dibûn û ta diket canê me. Dibe ku hinek tiştên din jî dixistin nav. Lê me sira vê nezanî.

Gelek caran dema cixare nedihat dayîn, acizbûn derdiketin. Ji ber fêrbûnek nîkotînê hebû û ev jî dibû derdek. Tiryakîbûn tiştek xirab bû, fêrbûn û girêdanek ava kiribû. Hinek bibûn koleyên wê. Dema neba jî hêrs zêde dibûn. Ger di wan kêliyan de nirxên wan ên herî hêja ji destên wan werin girtin, evqasî har nedibûn. Hinek kesan jî pêxirtengiya tinebûna cixareyê pir kirêt dijiya. Hinekan parçeyên rojnameyan dikişand, hinekan parçeyên çaya ziwakirî dikişand. Jixwe dema min ev dît, min temamî ji cixareyê nefret kir. Her ku ew dihatin qedexekirin û yên me jî diketin nav helwest û rewşên wisa, ez jî ji cixareyê dûr ketim. Dema cixare heba, min yekser dest bi kampanya berdana cixareyê dikir. Lê mixabin, her tim jî dawiyê ez bi tenê dimam.

Gelek caran li benda serdanan mayînê jî acizbûn ava dikir. Ev jî peywendiyek bi derve re bû. Hêj girêdanên malbatî bihêz bûn. Her wiha ji dadgehan agahiyên ecêb dihatin girtin. Malbatan hebûn û tinebûna xwe didan ber her tiştî. Gelemperiya parêzeran weke bazirganan bûn. Lewma malbat gelekî bêzar dibûn. Gelek caran pere didan da ku bandor li biryara dadgehê bikin. Hinek rêbazên wisa diceribandin. Çiqasî reben bûn! Dewletê jî netenê pereyên wan dixwar, di heman

demê de dixwest hêvî û mirovbûna wan jî biqedîne. Lewma bi vê riyê dest avêt gelek malbatan û destpê kir. Her tiştên weke hatina serdanan, hevdîtina bi zarokên xwe re, agahiyek herî biçûk têkildarî dosyayê ji dadgehê girtin, girtina parêzeran û hwd tev di bin venêrîna dewletê de bûn.

Malbat netenê di bin venêrînê de, di heman demê de di bin zext û êşkenceyê de jî bûn. Binçavkirin û girtin xilas nedibûn. Malbatên welatparêz ên ku ji zarokên xwe bandor bûne di hedefa wan de bûn. Lê bi gelemperî hedefa wan ew bû ku wan di nava pergala ava kirîn de bigirin, dixwestin girtîgehan, bircan û dîwaran berfireh bikin. Wisa yê derve bi yê hundir dihizirî, yê hundir jî bi malbata xwe ya derve dihizirî û hev meraq dikirin. Her kesî digot gelo çi bû? Gelo dijîn? Hevdîtinên fîzîkî jî weke hêviyekê diman. Gelo weke din wateya jiyanê çi bû, çawa dihat jiyîn, gelo tenê li ser piyan mayîn jî jiyîn bû? Ev jî dibûn pirs û bersivên ku ji pergala hizirandinê dûr dixistin.

Cihên hewagirtinê, hinekê bi azad ji xwe re gerîn bû. Qoxuş, şibakeyên bi derabeyên hesin, kelepçe, her tişt hesin û beton bû. Lewma her tim di navbera li wê mekanê bûyîn û cihê hewayê ku şibakeyên xwe hene mirov li asîmanan binêre de, gelekî ferq hebû. Çûnûhatin, kêm jî be hinekê bi tenê mayîn û hizirîn, an jî bi hev re çûnûhatin, her çendî bê ax jî be, pêl wî zemînê ku roj, baran, berf û xweza xwe digihîneyê kirin gelekî xweş bû. Bi taybet jî di bin baranê de meş gelekî xweş bû. Bes gelek caran jî heman cihê hewagirtinê, dibû cihê roj, baran, berf û serma ku her yek ji wan dibe amûrek êşkenceyek gerim. Carna em bi saetan pêxas li ser wan betonan, di bin tavê de

disekinîn. Carna em bi saetan li ser wê betona weke qeşayê di nava sazûmaniya falaka de rêzê dirêjkirî diman. Em li nav berfê û di bin baranê de dihiştin.

Hevalên xort jî bi tazî dabûn rawestandin. Em çi dikin nakin ew qîr ji guhê me dernakevin. Dîsa li ser wê betonê didin xirikandin. Heta newqê di nava wan avên tuwaletê de didan meşandin û bi wî şêwazî sirûda Tirkan didan gotin… rûniştin… di wan avên ku gû, pênûs, jîlet her tişt di navê de hene, pênûs diyarîkirin… ew ji xwe re kirina pêkenok, sirûd guhertin û behsa sirûdên şoreşgerî kirin, an jî di navberê de dijûn kirin… ev rastiyên heyîn tev di nava kêliya bêhnvedanê de dihat kirin. Ango bêhnvedana me girtiyan ev bû. Gelek tiştên din jî hebûn. Govend gerandin, gilokên berfê lîstin… her wiha kêfxweşiya beramber şînkahiyên li ser betonê şîn dibûn jî dihat jiyîn. Di nava tiştên herî kirêt de bedewî dîtin, teqez bi înat ew jîndar kirin jî di nava berfirehiya kêliya bênhvedanê de bûn.

Em dernedixistin cihê hewagirtinê. Yên ku di goşegiriyê de bûn, ji dervî vê dihatin girtin. Heval jî her tim nedihatin derxistin. Li gorî saetan derdixistin. Ev jî ji bona peywendiyên wan ên bi me re bixin bin venêrînê dihat kirin. Dema êşkence zêde dibûn, qedexe û cezayên pêdiviyên wisa çênedibûn. Ji ber ti girîngiya vê jî nebû. Li cihên ser vekirî kêfa lêdanê cuda bû. Esad gelek caran ji şibakeya bloka miqabil dîmenên bi vî rengî temaşe dikir.

Miqabilî korîdorê jî qoxuşa kevin heye. Mazgalên me yên çavderiyê rû bi rû ne. Qoxuşek dirêj e. Bi qasî mezinbûna qoxuşa em lê dimînin û quxuşa kêleka me tevê ye. Bawer im di

dîwar de derî vekirine. Odeya dawî ya beşa ew lê dimînin cihê kirine. Ewder di pêvajoya destpêkê de hatiye çêkirin. Deriyê derve ji aliyê korîdorê ve vedibe û berê wê û deriyê me yê ketina hundir ve miqabilî heve. Yên ku îtîrafên xwe dinivisînin tînin wir. Ev demeke ewder vala bû, pir kêm tê bikaranîn. Herî dawî dema korîdor tê şûştin, heval firsendekê dibînin û deriyê mazgalê vedikin. Dibînin ku îtîrafkarek li ser maseyê nivîs dinivisîne û bi çavên wî yên kirêt ku belok bûne re rû bi rû dimînin. Yê temaşe jî dike ditirse. Yên di hundir de jî ditirse. Bes her tirs ji hev cuda ye! Hinde ew îtîrafkar di nava tirsê de fetisiye, hinde ji xisletên bûna mirov hatiye dûrxistin, ji nêrîna jineke girtî bi wêrek ku deriyê mazgalê re lê temaşe dike jî ditirse. Her wiha tirsa bêşermiyê li ser giran bûye. Hevala me jî qet hêvî nedikir ku di wir de zilamek hebe. Ji ber ew jî li hember xwe portreyek zindî ya îtîrafkarek ji mirovahiya xwe dûr ketiye dibîne ditirse. Lê tişta herî baş dema dibêje; "tif..xwedê bela te bide te" û deriyê mazgalê cardin li ser digire bû. Di vir de tirsên wî jî û bêşermiya wî jî zêde bibû.

Ya rastî şerimkirin jî diyardeyek girêdayî mirov e. Xweziya aliyên şerimkirinê hebûna. Em ji vê re bêjin bêşerimbûn dê baştir be. Belê, bêşermiya mirovên sucê mirovahiyê dikirin zêde dibû. Çiqas rewşek kirêt bû!

Dema dengê deriyan hat, me jî serê xwe da ber mazgalê, em bi kuna derî re dinêrin. Ew odeya behs tê kirin di rojên dawiyê de vala bû. Yan jî me tam nedizaniya gelo vala ye, an na. Em hewl didin vê jî fêm bikin. Em dikarin ji kuna mazgalê ve tevgera qoxuşa miqabil baş bişopînin. Di navberê de korîdorek zirav heye, ev navbera di neqeba her du mazgalan de

ne zêde ye. Lê kuna mazgalan jî bi qasî navbera tiliya beranekê û tiliya şehdê digihin hev. Em wan dema sirûdan dixwînin, rûniştina wan a li ser dîwana jor û di navbera dîwanan de diçûn û tên dibînin. Herî kêm serên wan dixwiyê û beşek mezin tevgera wan dibînin û dişopînin. Ji ber wer dizaniyan ku gardiyan bi kuna mazgalê re wan dişopîne, gelekî bi mazgalê re li derdor dinêriyan. Her wiha dema di vê korîdorê de liv û tevgerek pêş diket bala wan zêde dikişand. Gelek caran jî dema dihizirîn girtiyek jine, yekser di kunê de dinêriyan. Dema hevalan ewder paqij dikir, ji kuna mazgalê bangî dikirin, kin jî be rewş dipirsîn û wan jî digot ew jî baş in. Di navberê de jî me bi mebesta rojên girîng û bûyeran not davêt ji wan re.

Me mazgala qoxuşa yekemîn re daxwiyaniya Newroz û Gulanê avêtibû. Bes em nizanin çi kirin û çawa pêşwazî kirin û nirxandin. Me jî di navbera xwe de gelek şîrove kirin; "teqez ji tirsan bê ku bixwînin qetandine û avêtine.", "na, teqez xwendine, dizaniyan ku me avêtiye ji wan re, ji ber em ji dengê me nas kirine." Lê tenê rastiyek hebû, ew jî her not û dengê ji aliyê me diçû ji wan re, ji bona wan dibû moralek. Her çendî şîroveyên bi acizbûn û sîteman ve dihatin kirin hebin, nedikariya van rastiyan biguhere.

Piştî şopdarî û çavderiyek dirêj, çavên me û yeke ji qoxuşa miqabil liqay hev hat. Kêfa min hat. Min ji xwe re got temam, em dîtin. Her wiha di kêliyên wisa de gardiyan di navbera xwe de di-axivin. Zimandirêjiyê dikin. Bes ji wan re bêjin; "ji qoxuşa jinan sê kes hatine tecrîdkirin" dê bes be. Wê fêm bikin û hewl bidan binasin bê ka kî ne. Min bi îşaretan pirs kir, ji ber dixwazim bizanim li girtîgehê bi giştî tiştek heye an na. Min

gelek îşaret kirin. Bi destê xwe diyar dike ku tiştek fêm nekiriye. Herî dawî min parçeyek nan girt destê xwe û paşê min bi tiliyên xwe devê xwe girt. Xwarin nexwarin dihat wateya rojiya birçîbûnê. Min jî pirsa mijarên weke rojiya mirinê û rojiya birçîbûnê dikir. Hinek îşaretan dike, lê nayê fêmkirin. Gelo çi fêm nedikir, an jî fêm nedikir ez rewşa wan pirs dikim, an jî em di rojiya birçîbûnê de ne? Me bi rojan wisa ji hev dûr, miqabilî hev îşaretên ku nayên fêmkirin, an jî li gorî xwe şîrove dikin kir. Xwedêyo, ew çi sebir bû!

Me li dîwarên qoxuşa kêleka me da. Carê jî me digot; " hevalno, bersivê bidin. Em ev û ev in. Em di goşegiriyê de ne. Gelo bi giştî ev tişt heye an na?" Lê ti bersiva me tine. Tenê di tempoyekê de li dîwarxistinê bersiva me didin. Ez jî carê ji acizbûna dijûnan dikim. Ma evqas jî tirsonekî nabe! Ger ew ji me bipirsin, emê ji kêfa çi bikin nediyare.

Roj derbas dibûn. Em notên xwe dişînin jorê. Ti agahiyek nû tine ye. Bêdengiyek bi lenet heye. Ev bendewariya bi bela jî çiqas girane. Ez nikarim rakim.

Rojekê em wisa di nava bendewariyê de bûn, hinek dengên têkilhev ji haparlorê hatin. Ew demek dirêj bû ew haparlor nedihat bikaranîn. Me ya jorê xirab kiribû. Lê ya jêrê saxlem bû. Weşanek ceribandinê dihat kirin. Haparlora hemû qoxuşan hat kontrolkirin, em vê jî ji bazdana leşkeran fêm dikin. Leşkeran mazgala cihê me kontrol kirin. Esad got; "merheba zarokno" û destpê kir. "ez amîrê ewlekariya we ya hundirînim. Dê daxwiyaniyên girîng werin dayîn. Çend ker kurên keran gotin qey dê bikaribin hinek tiştan bikin. Li dadê rabûn daxwiyaniyên weke "emê xwe bikujin" kirin. Ji vê re jî gotin

rojiya birçîbûnê. Çend kes jî xapandin. Lê niha bi tenê man. Xwarinê dixwin. Mejiyê van bi qasî yê çûkê ye. Kemal Pîr bi dizîve mişkan dixwe. Ma ew dikarin li ber xwe bidin, an jî dizîve xwarinê dixwin. Binêrin dê gavek din yeke ku di nava wê komê de cih digirt û hatî xapandin bi-axive. Ev zarok jî xapandin. Lê niha xwarinê dixwe. Êdî aqilê wî hat serî. Evder girtîgehe. Li vir qural hene. Qanun hene. Ezê yê li dijî van derkeve jî bikujim. Lê binêrin dê ew jî bimirin. Nizanim li girtîgehan çi heye, ma tiştek wisa heye an na? Na, ew nikarin ji destên min rizgar bibin." Yekser pey wî re jî Elî Kiliç axivî. Destpêkê xwe da nasîn.

Got; "navê min Elî Kiliç, ez ji Sîwerekê me. Wê demê jî wan hewl dan ku me bixapînin. Gotin, 'tekoşîna Hîlwan-Sîwerekê', 'Bucakan.' Em jî ciwan û cahilbûn û ji wan bandor bûn. Ferman dan me da ku em mirovan bikujin. Wan bi xwe tiştek nekir. Gotin, 'Bucakan çav berdaye namûsê, keç û jinan direvînin çiyan.' Bes wan bi xwe jî keç û jin derdixistin çiyê. Wan malê gel desteser kirin. Nizanim min li dadgehê çi kir, ez poşmanim. Jixwe min fêm kir ku şaş e. Niha jî xwarinê dixwim. Banga min jî ew e, bila kes bi van bawer neke û dînîtiyê neke." Carê dengê wî qut qutî dihat. Disekinî wisa di-axivî. Diyar bû ev axaftin pê dabûn jiberkirin. Dibe ku ji qaxidê jî didan xwendin. Ketiyo! Tu çi jî bêjî, tu nikarî xwe ji êşkenceyan rizgar bikî. Madem wê tu wisa îxanetê bikî, tu çima tevlî rojiya mirinê bûyî?

Me dev ji axaftinên wî berdan. Me hevûdû hemêz kiriye, em ji kêfan digirîn. Nexwe çalakî hebû. Esad Oktay çi tiştek baş kiribû. Dibe ku di pêvajoya girtîgehê de tişta herî baş

derbasdar bû, em dikarin bêjin erênî bû, em ji bendewariyê rizgar kiribûn. Ji ber vê bendewarî mirov diteqand. Gelo roja çendê bû? Mîsoger nû destpê kiriye. Em hewl didin komên ku rûniştina wan a dozê hene bînin bîra xwe. Mîsoger ev çalakî di rûniştina doza gîştî de îlan kirine.

Ger koma Amedê derketa, dê Aysel jî derketa. Her wiha koma Mêrdîn û Rihayê hebû. Ya herî qelebalix Riha bû. Me yekser ji jor re not nivîsand. Cihê hewagirtinê bidenge. Ji dema em daketine jêrê heta niha heval dernakevin. Di demjimêra xwe de jî dernakevin. Ji ber em her tim di hundir de ne, gelekî bandor bûne. Dixwazin bi me re heman tiştan parve bikin. Me bangî Fadîmê kir û not avêt ji wan re. Me bi devkî jî got. Fadîmê ji kêfa qîr da. Hêj çend xulek derbas nebûyîn ji jor dengê gengeşeyekê hat, dengê bazdanê, qîrên kêfxweşiyê hatin. Her kes di-axive, dibêje; "bi rastî wisa ye?... "ma kî got?... Ma rojiya mirinê ye?... Vê carê emê jî tevlî bibin?... Ma Elî ye?...xwedê bela wî bide! Mîkrobe!.." Herî zêde jî Kezban bandor bûye, dibêjin; "ma gotine jin û keçan PKK dibe çiyan, Bucak gotiye? Ew ketiye, ma wê ew bi van îtîrafan ve xwe xilas bike?" Dengê wan yek bi yek tev tê jêrê. Şibake vekirîne. Gelek deng derdikevin, lewma em jî nikarin baş ji hev derbixin.

Me jî di notê de diyar kiriye; "emê amadekariyên xwe bikin. Rewşa Elî ji hevalan re vebêjin û bidin fêmkirin. Emê paşê diyarbikin ku dê kî tevlî bibe. Dikare bi şêwazê du koman be. Lê ji ber Aysel nexweş e, em dihizirin ku wê dervî çalakiyê bigirin. Bes Fadîme, Gûlten, Cahîde dikarin tevlî bibin. Rewşa Cahîdê jî tê nîqaşkirin, nezelal e. Bêzar jî dikare tevlî bibe. Bes ji ber dê Riza û Gonûl jî tevlî bibin, ma dibe ku Bêzar jî tevlî

bibe? Lewma me di vê mijarê de jî tam biryar nedaye. Lê wê hejmar zêde nebe." Tevî ku Aysel dijî derket, me jê re got, ji ber nexweşiya wê dê tevlî grevê nebe.

Vê biryarê, mîsogeriya di vê mijarê de û helwesta zelal zindîbûnek ava kir. Gelo vê çalakiyê dikariya bêzarbûna demên borî bide derbaskirin? Ji ber me Mazlum bi tenê hiştibû. Me her Çar Heval bi tenê hiştibûn. Her carê janek mezin tê li ser dilê min datîne û min bê henase dihêle. Ma qey bi rastî jî derfet tine bûn, hevalan nedikariya xwe bigihînin me, ma qoxuşên wan jî weke yên me bûn? Ez bawerim ti derî goşegiriyek wisa bi qasî me nedijiya.

Ayselê bertek raber kir û got; "bila Gonûl tevlî nebe." Dema Gonûl çû pêdiviyên xwe pêk bîne, got; "rewşa wê pir vekiriye. Pêxirtengiyê dijî. Ew nehêjayî vê tiştê ye. Ezê çima nekaribim tevlî bibim? Ger ez tevlî nebim, ezê herî zêde wê demê xirab bibim. Ma hûn dixwazin min wisa bikujin?" Aciz bû û giriya. Ez jî di mijara Cahîdê de nezelal bûm. Gelo em şansekê bidinê, dibe ku ji bona wê derketinek be, bikaribe vê bêzariya xwe derbas bike û zelal bibe. Bes ev kar jî ezmûnek gelekî girîng bû, dudiliyên ku dijiyan, hatin û çûnên di navbera teslimiyet û berxwedaniyê de, helwestên ku raber kirîn jî nekêm bûn.

Elî Kiliç jî bi hevalan re dima. Di nava berxwedana giştî de bû. Lê di rojiya mirinê de heval bi tenê hiştin. Di vê manê de kesên ku tevlî bibin pir girîng in. Ji ber ev rojiya mirinê ye. Lewma divê kesên tirs û gumanên wan hene, dudilî ne, bi xwe re ne di aştiyê de ne, tevlî nebin. Em hemû di vê nêrînê de hemfikirin.

Gelo em dîroka rûniştina min a dadê esas bigirin dê pir dereng bikeve? Ji ber divê em li dadê daxwiyanî bidin û ji raya giştî re diyar bikin. Herî kêm divê heval bizanibin. Nexwe dê Esad çi ji destî wî bê, wê bike da ku tevlîbûna me veşêre. Nade der. Berî min Gonûl heye. Em Gonûl jî guncav nabînin. Bes ger em daxwaznameyek hevbeş binivisînin, em dikarin wê daxwaznameyê bidin. Dê li wê derê were diyarkirin ku tevlî dibin. Bes em Gonûl di nava koma yekemîn de nahizirin. Tenê dikare rabe bêje, em tevlî rojiya mirinê bûne û kî tevlî bûne. Ger nedin axaftin dê çi bibe? Gonûl got; "ezê daxwiyaniya vê bidim. Mafê axaftinê nedin min jî, ezê rabim bi-axivim. Ger derbasî girtînameyê nekin jî dê heval bibihîsin."

Gelo me her tişt zêde bi ziraviyan ve hesab dikir? Divê em ji cihekê destpê bikin. Bes em hevalan bi tenê nehêlin. Lê divê nebêdeng û tarî be. Dibe ku Esad daxwaznameyan qebûl neke û baldar nêz nebe. Lê berpirsyariyê jî ranake. Neçar e ku daxwaznameyan bişîne dadgehê.

Heman rojê ji korîdorê dengên ecêb hatin. Tam nedihat fêmkirin bê ka zilam in, an jî jin in. Dengek tûj hat. Paşê me ji xirecira hevalên me fêm kir ku yeke nû hatiye. Çawuş got; "çi Ralf e. Ralf maf tine ye. Êdî navê te Elî ye. Temam fêm bû? Elî, Elî! Dubare bike." Ew jî dibêje; "temam Elî" çawuş cardin; "te kêm got, Elî dê tu bêjî fermandarê min û qîr bikî." Ew jî dibêje; "Elî fermandarê min." Tam nikare gotina Fermandarê min bilêv bike. Ralfê Alman jî di girtîgehê de bibû Elî. Ralfê gawur, bibû leşkerê Tirk-Misliman! Nasnameya wî pir zû guhertibûn. Peyvên, "fermandarê min, ez Tirk im, fermo fermandarê min" di korîdoran de deng vedidan.

Baş e, qet nebe dê gelek tiştan bibîne. Hem em, hem jî hevalên xort dibîhîsin. Şibaka wan miqabilî cihê bêhnvedana qoxuşên din bû. Neçar bû pêdiviyên xwe yên tuwaletê û yên din di beşa me de pêk bîne. Ji ber cihek din nebû. Dê bi vê mebestê biba şahidê bûyerên ku li cem me pêş diketin.

Beriya rûniştina doza Riha-Bozovayê rojekê em birin jor. Bes heman rojê hevdîtinek ecêb û kin pêk anîn. Bangî Aysel û ji komên din jî yek du kesan kirin. Gotin; "hevdîtin heye." Hevdîtinê çend xulekan jî berdewam nekir. Esad hevdîtinên bi vî rengî di nava xulekan de dikir. Ew bi xwe jî ji nêz ve bi qasî bikeve devê kesên diçe hevdîtinê nêzî wan dişopîne û guhdar dike. Heman weke êşkenceyê ye. Carek din jî di dema yekem a vekirina dadgehan de, Metîn anîbû korîdorê. Îdîaneme hatibûn dayîn. Yekser ketibû navbera min û Metîn de. Tenê me karî em ji hev re bêjin; "em baş in." Weke din jî min jê re got; "rewşa te baş e, dê tu derkevî. Ev îdîaneme li ser bingeha hinek îdîayan hatiye amadekirin. Mereqa min neke, silavan bike." Jixwe me jî zêdetir nedixwest. Ji ber Esad weke kuçikekê li derdora me dizivirî. Digot dibe ku em bi çavên xwe îşaretan bidin hev. An jî bi zanebûn dikir. Hem li min, hem jî li Metîn dinêrî. Çiqas komîk dibû. Vê carê jî wisa kir û em nedan axaftin.

Dema Aysel vegeriya got; "dema min Selîm hemêz kir, min hêdîka di guhê wî de got ku em dest bi rojiya mirinê dikin. Wî jî got na. Niha rawestin. Emê agahî bidin we." Êdî min jî îsyan kir. Ma çima, çi mafê wan heye wisa bikin? Ma baweriya van bi me tine ye? Ma emê heta kengê li bendê bisekinin?

Ez jî di ber xwe de di-axivim û moralê min xirab bû. Nexwe Selîm ji bona vê hevdîtin kiribû. Gelo wan texmîn dikir emê jî tevlî bibin?

Me jî wer dizaniya ku Selîm bi navê hevalan û rêxistinê di-axive. Ji ber girêdana me bi wê qoxuşê re hebû. Ger ew hevdîtin nebe, dê rojek pey wê re Gonûl derkeve rûniştina dozê û emê daxwiyaniya tevlîbûna rojiya mirinê bidin. Ger ti guhertin nebûya, biryar ev bû. Dîsa jî me biryar da ku em bi plana xwe ve girêdayî bin. Emê bi şêweyê du koman tevlî rojiya mirinê bibûna. Di koma destpêkê de ez, Gonûl, Fadîme û Fatma, ya duyemîn de jî Aysel, Bêzar û Gûlten bûn. Dê navbera deh rojî de destpê bikira. Em bi Cahîdê re axivîn. Got ku ji mirinê re ne amade ye. Got; "ezê di rojên pey wê re piştewaniya we bikim. Ji bona koma destpêkê baweriya min bi min nayê." Me got; "temam." Ji ber ji bona vê dilsozî û dilxwazî tê xwestin. Dê tirsa mirinê nebe, ji ber mirov her kêlî nêzî mirinê dibe. Di kêliya ku mirov zêde nêzî mirinê ye jî, mirov jiyanê zêde hez dike, mirov têra watedariya wê nake.

Bes Selîm jî diyar dikir ku ew jî derbarê rewşa hevalan de agahiyên bi nakokî digirin. Roja paştir Gonûl derket rûniştina dozê û dîsa di vegera xwe de agahiyên ku xwîn ji kezeba me bîne anîbûn. Emê êdî li hember kî, çi, kîjan nêzîkbûnê, kîjan agahiya tije bi êş ber xwe bidin. Ma van agahiyan em nedikuştin? Ma kezebên me parçe parçe nedikirin? Êdî emê li benda çibin? Ev pirsa çendê ye, ev axîna çendê ye, ev qêrîna çendê ye ku li ser dilê me disekine?

Nexwe Selîm dizaniya û ji bona wê nedixwest em rojiya mirinê destpê bikin. Hevalê Pîr û Xeyrî mîsoger şehîd ketibûn. Lê derbarê Akîf, Elî û Karasu de ti agahî tine ye. Dîroka wan jî gotin. Di meha Îlûnê de hevalê Pîr û Xeyrî şehîd dikevin. Berxwedanê jî di meha Tîrmehê de destpê kiriye. Hinek hevalên din jî dest bi rojiya mirinê kirine. Fuat Kav jî tevlî bûye.

Dîsa ne zelal bû, gelo hêj didomiya, an jî xilas bibû? Gonûl jî piştî ji dadê vegeriya got; "ya rastî ez dihizirîm ku rabim daxwiyaniyê bidim. Lê paşê li we fikirîm. Êdî nedihiştin ez werim cem we. Dê paşê jî we zehmet agahî bigirta. Her wiha Selîm gotibû 'tevlî nebin', ji ber wê min jî devjê berda.

Roja paştir me agahiyên cuda ji yên çûbûn nexweşxaneyê girtin. Karasu şehîd neketiye. Rojiya mirinê bi encam bûye. Heval jî li nexweşxaneyê ne. Wê demê hinek şehîdên din jî hebûn. Bê ku wext ser ve biçe em bi şahadeta Elî Çîçek û Akîf Yilmaz jî hesiyan. Ji meha Tîrmehê heta nîvê meha Îlûnê, nêzî du mehan berdewam kiribû. Em cardin çûn paşerojê. Dema di haparlorê de hatî axaftin roja çendê bû gelo? Em ji xwe re rojan dijmêrên. Hema bêje nîvî bûye. Her çendî em bihizirin dibê ku ji zû ve hatibe destpêkirin jî, me dîsa jî zêde îhtîmal neda vê. Ji ber me dîrokên rûniştinên dozan mîsoger nedizaniyan. Me digot herî zêde dibe hefteyek, an jî deh roj bin. Em xwe jî weke posta duyem dinirxînin. Mixabin postayên duyem jî tevlî bûne. Em jî ancex dema heval digihin sînorê mirinê û her tişt bi encam bû, bi her tiştî hesiyan.

Belê, Tîrmeh hatibû hilbijartin. Di heman demê de dîroka raperîna Bastille ya li Fransa pêk hatibû. Her wiha li dadê destpêkê hevalê Xeyrî çalakiya rojiya mirinê îlan dike. Vê berxwedanî û raperîna mezin a bi hemû şaneyên bedena xwe fedakirinê ve datînin holê, destpê dike… daxwaza bingehîn dawî anîna êşkence û zextên heyîn û avakirina derfetên paraznameyan bû. Belê, parêzname! Di dîrokê de paraznameya Reischtag a Dîmîtrof heye. Li wir faşîzmê didarizîne. Belê, li Amedê darizandina Mêtîngeriyê! Paraznameyek hemû planên dijmin ên di kesayeta rêhevalên leheng û me girtiyan de darizandina PKK'ê bike, berovajî bike, darizandinek dîrokî hewce dikir. Yê ku herî zêde jî bi girîngiya vê ya dîrokî dizaniya û herî baş fêm dikir, ev darizandin dabûn destpêkirin.

Bûyerek wisa bedew û bi onur a dîroka mirovahiyê manîdar dike û wê bêhempa dike di cîhanê de heye gelo? Kêlî bi kêlî bi helandina şaneyan ve bedenên ku dihelin de mirovahî mezinkirin, hêviyên gelekî mezinkirin û xisletek dozek wisa zelal û serkeftinê mîsoger dike, danîna holê gelekî girîng e! Wateya Rojiya Mirinê ya Mezin a Tîrmehê, bi girêdanek evqasî zelal, bê dudilî nûnertiya rêbertî û pêşengiya şoreşê kirine. Ji ber hin de hêza wan a bandorê hebû, ew dorpêça tinekirinê ya hovane li ser mirovahiyê dihat meşandin hat rakirin. Hemû tirs hatin şikandin. Her kes li ser wan di-axivî. Her kesî di kesayeta wan de lêpirsîna xwe dikir. Ji ber kêfxweşiya wan di destpêkirina çalakiyê de dijiya, heta kêliya dawî her tişta ku derbas bûyî yek bi yek dîrokek bû. Li dadgehan û di paraznameyan de ev dîrok dihat axaftin. Hêza vê dîrokê ya avakirin, dana jiyîn û bilindkirinê girtîgeh derbas kiribû. Negengaz bû ku bandora wê hêzê were rawestandin û şikandin.

Gotinên weke “Me serxist, ser xist” bi stran û helbestan ve hatin bilêvkirin. Wesiyeta “Li ser gora min deyndar binivisînin”, nirxandinên weke “Kurdistan dibe weke Vîetnamê, ma hûn van qêrînên mirovahiyê dibîhîsin?” Baweriya li hember şoreşê, saxlem û biryardar meşa bi şoreşê re û erdemdiya di asta herî jor de bû. Girêdanek kûr a bi armanc û rastiyan ve, ew di gotin û çalakiyên xwe de pêkanîn, ancex wisa dibû.

Me nekarî em piştî rêzgirtina ji bona şehîdan, mezinbûn û wateya çalakiyê baş pênase bikin û hêza me jî têra vê nekir. Me tenê karî em di vê çarçoveyê de hinek tiştan bêjin. Her kes tevlî nebû. Ji ber hinek jin, ji hinek guruban ditirsiyan tevlî nebûn. Ji ber bêşermiya xwe bataniyên xwe kişandibûn ser çavên xwe û guhên xwe girtibûn. Li vir cih ji wisa bêşermiyên tije tirsonek re nebû! Êdî me jî nedikariya em nêzîkbûnên wisa qebûl bikin. Me got; “hûn nikarin li hember van şahadetên ku dijmin jî li ber mezinbûn û awartebûna wan berê xwe daye qublê, bêrêziyê bikin. Rabin biçin, li ber çavên me nemînin. Di kêliyek rêzgirtin û em wan bibîr tînin de qet nebe tenê kêliyekê bê hêvî, dil reşî û tirsê nejîn. Rabin biçin qoxuşa din.” Min bi hêrsek mezin qîr dabû. Paşê rabûn çûn. Her wiha cara yekê bû ji komên din yekê, Xalîdeya ji Lîceyê, axaftinek kin kiribû; “Pîr û Xeyrî’şehîdên me ne jî. Ew bi onur şehîd ketin.” Di van kêliyan de yek du gotin jî gelekî girîng bûn.

Wateya jiyanê, di rastiya dayîn û sitandina henaseyan de, dema lêdana dilan di rastiyekê de rê dibîne, herikbariyek bê dawî de ya ku ew bi xwe ye dijî. Nexwe dê bilindbûna wan bihîstinan û hîs neyên fêmkirin. Sedema ku mirin evqasî bedew

û biwate ye; di wir de jiyanek mezin a evqasî veşartî heye û yên ku ev jî dijiyan bedew û egîd bûn. Kêlî bi kêlî jiyan û mirin evqasî nêzî hev û bi onur jiyîn, ancex hejayî wan bû.

Yek jî Esad hebû, ji bona vê mirinê qurban jê kiribû. Yên ku ji mirinek mezin re, ancex kînek mezin bijîn, ên ku dijî mirovahiyê bijîn, dikarin ji bona vê mirinê qurbanan jê kin. Hinde Esad ji mirinê ditirsiya, di qonaxên herî zêde ditirsiya de bi êrîşkariyek mezin ve ji bona mirinan qurban jê dikir. Belê, dema şahadeta Pîr wan bihîst, Esad du karikên ku xwedî kiribû, qurban da leşkeran. Yek ji bona Xeyrî, yek jî ji bona Pîr kiribû qurban. Ez bawerim ev jî ketîbûnek cara yekê bû ku bi dijminê me re dihat jiyîn û derdiket holê.

Ralph'ê gawur bibû Tirk-misliman û Elî

Em ji şibakê li Ralph temaşe dikin. Em hewl didin demjimêrên ku tînin tuwaletê bizanin. Wê rojê jî çavên me bi tesadûf li hev ket û me silav da hev. Ji ber dengên jina, qelebalix, mereq kiribû û hewl dabû ji şibakeyên vekirî derdor kontrol bike, bê ka çi heye. Weke ku ew jî li hinek tiştan digeriya û weke dîtibû jî kêfxweş bû. Çavên xwe mezin vekir. Baş bû ku di wê kêliyê de leşker ne li cem bûn. Parçeyek qaxet di destê min de bû. Min bi îşaretan jê re got ezê not binivisînim û danim ser aliyê derve yê şibaka tuwaletê. Yekser fêm kir û serê xwe hejand got; "temam." Piştî nîvro min li ser parçeyek biçûk ya rojnameyê notek ceribandinê nivîsand. Min di notê de bi zimanê Almanî navê we çiye, hûn ji kur hatine? Em keçên ji Kurdistanê ne û hwd nivîsand. Em jî çavdêriyê dikin. Qaxid girt û destê xwe hejand. Roja paştir jî wî bi xwe notek nivîsand. Bi Tirkî nivîsand. Dibêje ku bi alîkariya ferhengê dinivisîne.

Di nota xwe de digot; “navê min Ralph Braune, ez li Almanya dimînim. Cihê min, cihek di navbera Siwêd û Almanya de ye. Ez rêberê turîsta me. Em çûbûn Wanê serdana Axtamara. Ez her sal têm. Li Wanê, li Axtamara xweşikbûnên dîrokî gelek in. Gelek tişt ayîdê Ermeniyanin. Min behsa wan ji turîstan re jî kir. Polîsan wer îdîa kirin ku ez endamê rêxistina ASALA me û anîm vir. Ez nizanim evder kudere. Pir kêfxweş bûm ku, min hûn dîtin. Ralph’ê we”

Êdî me ji hev re nivîs dinivîsand. Me her carê not datanî ciheke tuwaletê. Ji bona ku dema leşker kontrol bike û ferq neke û nebîne, me her du aliyan jî hemû afirîneriya xwe bikar danî. Me di wan notan de behsa, PKK’ê, Kurdistanê, girtîgehê, pêvajoyên ku hatine jiyîn yek bi yek dikir. Pirsên wî jî çêdibûn. Her mijara ku mereq dikir dipirsiya. Behsa hemû welatên ku lê geriyaye dikir. Herî dawî çûbû Afganîstanê. Em jî nîtelîka şoreşa Afganîstanê nîqaş dikin. Lewma em behsa polîtîkayên Sovyetê dikin û dinirxînin.

Bandora êşkenceyên li wan kirine, tiştên ku dîtine, bihîstine, yek bi yek pir xweş û biwate dinivîsand. Lê carê jî digot; “ xweziya derfetê bi zimanek din a ku em bikaribin baş hevûdû fêm bikin hebûya. Da ku me ev zimanê Tirkî bikar ne anîbûya. Hinde wan kirêt dibînim, ji min re zehmet e ku zimanê wan jî bikar bînim.” Her wiha wisa bertekên xwe jî destnîşan dikir. Me Çalakiya Mazlum, çalakiya her Çaran, şehîdên me yên Rojiya Mirinê, hemû tiştên ku me dîtine û bihîstine, tev dinivîsand. Ji ber em di wê baweriyê de bûn, dê ew van tiştên ku me nivîsandine weke belge veşêre, an jî bi qasî ku dikare di hiş de bigire û hemûyan di derve de vebêje û ji raya giştî re ragihîne.

Mirovek gelekî baldar bû. Her tiştê ku li derdor çêdibû, mijarên ku ji axaftinên leşkeran fêm kirine û heta xewnên xwe jî ji me re dinivîsand.

Cîhana me yek bû. Ralph parçeyek ji me bû. Bê ku me ji nêz ve binase û bibîne, xisletên me, me çiqas cop xwarine, em çi demî diçin dadgehê û nexweşxaneyê, kêfxweşiyên me, xemgîniyên me, zewqên me, asta kîn û hêzên me û aliyên me yên di wan de veşartî mane tev ji me re vedigot. Me ji heman karavanê xwarin dixwar. Me ji heman çayê jî vedixwar. Bi me dihizirî û xwarin kêm digirt. Dema goşt bûya nedigirt. Digot; "pêdiviya we zêdetir heye." Di notê de bi taybet dida diyarkirin ku; "ji hevalên xwarindane min re bêjin."

Sûrprîza herî ecêb jî di serê salê de kiribû. Xwestibû noela xwe, ango sala nû bi me re pîroz bike. Ew şitlên dara qaçê ku dayîka wî jê re şandî û piştî mijûlbûnek dirêj derbasî hundir kiribû, şemal û parçeya pasteya ku ji bona me cuda kiribû, di binê bîdona gelaşê de veşartibû û danîbû cihê serşokê. Tenê bi notek kin gotibû; "îşev bîdona gelaşê kontrol bikin." Me jî bi hevalên ku dizaniya em û Ralph ji hev re dinivisînin, me wê şevê ew parçeya pastê ku li naylonekê hatibû pêçan kir pariyên biçûk li hev belav kir. Me şemal jî di nava şitlên qaçê de pêxist, kêliyek jî be me bi hev re sersal di nava hestên dostaniyê de pîroz kir. Me jî jê re peyama pîrozbahiya sersalê nivîsand. Me jî jê re salên nû ji bona me çibûn, çi hatibûn jiyîn, wateya tiştên rû dayîn çi bû, diviya em çawa hêjayî van derkevin û hêviyên xwe tev nivîsandibûn.

Digot bi alîkariya ferhengan nivîs û nameyên me fêm dike, ew name jî ji bona wî hêza jiyaneke pir girîng rave dike. Gelek caran digot; "hûn şibaka min a jiyanê ne. Ez jiyanê bi we re dibînim. Lewma gelekî ji we hez dikim."

Soz dabû gotûbû; “ezê di hemû jiyana xwe de tiştên ku min jiyan kiriye û bûme şahidê wan qetiyen jibîr nekim. Ezê li her derê behsa van bikim. Dayika min jî rojnamevane. Ezê van ji raya giştî re diyar bikim.” Jixwe dema Ralph çû me jî valahiyek hîs kir. Ew korîdor vala bû. Di girtîgehê de peywendî jiyan bû. Ji bona vê ye dijmin di girtîgehan de ji bona peywendiyên li kêleka hev jî qut bike, her riyê diceribîne. Mirovan bi tenê dihêlin û dixwazin mirovan bi tenê hiştinê re xilas bikin. Dixwestin mirovahî, şoreşgerî û pêşerojê di kesan de bikujin. Çi tişteke bedew û xweseriya mirov rave dike hebe qirêj bikin û bixeniqînin.

Ralph Braun ê ku ji taxeke Almanya bû, li girtîgeha Amedê destpêkê kiribûn endamê rêxistina Ermeniyan ASALA, paşê jî bibû Tirk! Di nivîs û belgeyên girtîgehê, di zimanê êşkencekariyê de, bi kurtasî di lîteratûra mêtîngeriyê de nasnameya Ralph ev bû. Lê di rastiyê de Ralph bibû şahidê her cure zilma ku li ser mirovahiyê dihat kirin. Ji Hîtler heta Esad Oktay, ji SS’yan SS’yên Tirkan, dîmenê bi sedan mirovan dîtibû, dibe ku tevî hemû êş û êşkenceyên xwarîn, şansa xwe ya herî mezin jî hevgihîna bi PKK’ê re jiyayî bû. Bi rihê wê ya enternasyonalîst ve û şehîdên wê yên mezin re hevgihînek pêk anîbû. Ew hewa kişandibû hinavê xwe. Lewma bingeha dostaniyê evqasî bi wate û saxlem bû. Bîranînên wisa xweşik li pey Ralph mabûn. Her wiha Ralph li ser soza xwe sekinî. Sarah, Monaîk, Ralph û yên din jî, ango turîstên girtîgehê tev li ser soza xwe sekinîn.

Hêrsa mezin a li dijî îxaneta cins

Elî Osman cardin bêdeng, çavsor, bi harbûneke ku nizane dê çi bibe ve ket hundirê qoxuşê. Ji ber dixwest her kesî ji yek eniyê ve bibîne û rûyê wan bişopîne, di ketina derî de rawestiya. Awirên me li dijî hev bi kîn û nefretê dagirtîbûn, awirên xwe dibarand. Awirên her kesî zivirandibû ser xwe. Diyar bû ku dê tiştek bigota û bike. Dema di reşkên çavên wî de şer diyar dibû, gelekî kêfa min dihat. Kêliyên herî xweş dema mirov bi dijminê xwe re rû bi rû tê, bi awiran rihê gemar ê miqabilî xwe diperçiqand, bi wî re tirs û xof zêdekirin, kena xwe bi wî maska wî ya xwe pê hêz dibîne kirin, bi bedenên lewaz ketî ve li hember wî rast li ser piyan radiwestin bû. Dema mirov dizane ku dijmin evqasî dijminê te ye, kêfa wê gelekî cuda ye.

Dema dijmin lewaziyên te digere, derfetên li te xistinê digere, pir asayî ye ku di vê mijarê de li gorî xisletê xwe hişyar, bi israr û li gorî xwe tevbigere. Lewma divê em jî bi vê zanebûnê ve tevdîrên li hemberî wî hişyar xwe amade bikin û pêş bixin. Ev jî erk e. Şêwazek jiyanê ye. Lê mixabin, hinek xisletên hêvî dide dijmin, cesaret dide, derî jê re vedike û bi wê deriyê dijî, dudilî, bêpîvan, bêbawer, lewaziyên xwe di hemû nêzîkbûnên xwe de diyar dike, ji peyvek herî biçûk, heta nêzîkbûnek herî ji rêzê, dizîve reva ji şer dijî, hene. Jixwe dawiya vê jî diçe heta îxanetê. Dema li girtîgehê kesayet xwe bi van xisletên ku hewce dike ne dagirtibe, yekser diçe îxanetê. Li bendê namîne. Ji ber zemînê wê heye. Lê di wê astê de ye ku dikare kesayetê bi rewşa heyî re daqurtîne, xirabûn ji hundir e û çareser nabe.

Dema Esad digot; “Gonûl Atay”, an jî Elî Osman digot; “Gonûl Atay”, bangawaziyek cesaret û hêvî dida lewazî û qelsiyên Gonûl bû. Ji ber wan bangawaziyan awirên girtiyan dida guhertin. Gumanek mafdar belav dibû. Di hundir de bertek û hêrs hebûn. Hemû awir dizivirîn ser Gonûl. Ez heyranê wan awiran bûm. Hevbeşiya wan awiran çiqas xweş bû!

Elî Osman hat got; “belê, Kemal Pîr, M. Xeyrî Durmuş, ew heywan kurê heywanan mirine. We fêm kir? Bes li gorî min bihîstî hûn girî ne, we porê xwe aniye xarê. Nizanim we gotiye, ‘ew nemirin, ew dijîn.’ Sakîne Polat tu gelekî bêhna min teng dikî. Rêzgirtin û porê xwe anîna xarê jî çiye? Ma ew heywan kurên heywanan kî ne? De bêj e.” Min jî bêdengiya xwe xirab kir. “dijûna nekin, ew şoreşger in. Kesî pora xwe ne aniye xarê.” Hêj min axaftinên xwe xilas nekirî şeqam li rûyê min ketin. Piştî ku li min jî xist bê ku raweste yekser derket çû. Ji ber dizaniya ger zêde bi-axive, wê bertekên di awiran me de hemû bizivirin ser wî. Ev hişyariyek bû. Nexwe hinekan behsa civînên me kiribû. Belê, hinek girî bûn. Dayîka Dûrê û çend heval giriyabûn. Dayîka Dûrê bi lorîn giriyabû. Ew deng jî pir hêsan ji derve de dihat bihîstin.

Dema Pakîze tevlî civînê nebû bala her kesî kişand. Bes wê jî bertekên xwe wisa da der; “we çima bangî min nekir? Ez li qoxuşa din razayî bûm. Nexweş bûm. Ma hûn ji min bawer nakin? Belê, emê evqasî êşê bijîn, hûn jî li gorî dilê xwe nêzî me bibin. Ger hûn wisa dibêjin, min jî baş kir. Bila ji vir û şûn de kes eleqeya xwe ji min neyîne. Ez ne di komînê de me jî. Karavana besî min e. Mehê-salê carek jî be, malbata min tê, ez jî ne ewqasî bê xwedî me.”

Demekê berovajî axivî û sekinî. Rewşa wê ya di rojên dawiyê de bala her kesî kişandibû. Kî pêxirtengiya hundirîn û dudilî dijiya xwe radestî nav cihan dikir. Wisa bal dikişandin ser xwe. Ne ji ber nexweşiya fîzîkî bû, nexweşiya ruhî û dilreşiya wê ew bi cihan ve girê dida. Ruhê ku radestî cihan dibû, di bin wê bataniyê de reşbînî dihizire. Çûn û hatinên di rihê xwe de vedişêre. Hinek ser hiş dikevin, hinek jî qrîz derbas dikin, ser û çavên xwe dide ber lepan, tiştên ne asayî dike. Di wan deman de jî ji bona ji wê rewşê derbikevin hewldanên eleqederî, axaftin, tika kirinê pêş dikevin. Lê dîsa jî kesayet dikeve û radibe. Dibe ku carna ji ber bandora derve kêliyekê radiweste. Pêşiya rihê binkeftî digire. Lê her carê jî ber bi zemînê miqabil ve çûyîn jî heye.

Bê hişketinên Gonûl bi navûdeng bûn. An dema Esad dihat, hişê wê dihat serî, yan jî dema dibirin revîrê. Me bi saetan hewl dida ew were ser hişê xwe, lê mixabin hemû hewldanên me vala bûn. Di rastiyê de mirovek ewqas dirêj bê hiş namîne. Nexweşên emeliyatên giran ên bi narkozê ser hiş hatine birin jî, ewqasî bê hiş namînin. Çawa dikariya vê bike, çima hewceyî tiştek wisa didît?

Her carê piştî ji hiş çûna Gonûl, pirsa min jê dikir ev bû. Ya rastî nezehmet bû ku em derûniya wê bizanin. Gonûl weke şovmenekê tevlî şoreşê bibû. Li Enqerê, Tuzluçayirê ji derdora hevalên xwe bandor bibû. Bi xelekekê jî hatibû girêdan. Kêm jî be di nava zanebûna bîrdozî, polîtîk û sazûmaniya wê ya rêxistinî de neheliyabû. Hêza şoreşê ya giyanwerî nehesiyabû. Bi coşa wê ya ciwanî û xwezayî nedimeşiya. Na! Ew tam weke şovmenekê bû. Kesayetek pir zêde dixwest bi valabûna burjuvaziya biçûk were pesindan û nepixandin bû. Nirxandinên

me yên destpêkê di derbarê wê de kirî ev bûn. Bes ne tenê ev jî bûn. Axaftinên Ayşe Dişkaya ya ku dema ez li girtîgeha Meletî bûm, ew jî ji Dîlokê hatî tên bîra min. Ez behs dikim û em şîroveyên cur be cur dikin. Pêvajoyên lêpirsînê gelekî girîng in. Ger kesayet lewaziyên li wir tên raberkirin, şaşiyên li wir tên kirin û sucên din jî veşêre, wan bi duristî ne raxe ber çavan û ji bona derbaskirina wê nebe xwedî hewldan û ked, dê her tim pêxirtengiyê, dudilî, xwe û derdora xwe xapandinê bijî û heman şaşiyan jî dubare bike.

Ev rewşa Gonûl jî, bandor li kesên ku nexweş û pirsgirêkên wan hene dikir. Hewldana me ya sererastkirina wan kesayetan vala derdixist. Gonûl xwe qadroyek rêveber didît, dijmin jî jê re digot; "Gonûla bi aqil." Lê hevalan jî li hemberî vê digot; "ger kesayetek wisa pêşketiye, wê demê ev çi hale? Yên bertekên xwe li dijî jiyanê heyîn, ev ruh bi wê re parve dikirin û ji xwe re jî dikirin hêcetek.

Ji ber Pakîze bandorên hem di nava vê gengeşeyê, hem ên çalakiya avakirinae hesiyayê, bi hesabên ku dibe hinek tişt rû bidin, xwe dispêre dijmin. Reçeteya xwe dide leşker. Dibêje; "ji min re dermanan bikirin." Jixwe ev xwestek pir vekirî li hember dijmin deriyê radestbûnê vedike. Leşker jî pir baş dizane jiyana me ya komîn heye. Heta wê rojê pêdiviyên her kesê ku malbatên wan tên, an jî yên nayên li gorî derfetan hevbeş hatine pêkanîn. Lewma dijmin gelekî hewl da jiyana me ya komîn xirab û belav bike. Pakîzê jî wisa diyar dikir ku ne bi me re ye, nerehetiyên wê hene. Bes dê dawî heta kur biçe. Ev jî nedizaniya. Fêlbaziya xwe hem li hember me, hem li hember dijmin ferz dikir. Ev jî bi nêzîkbûnên xwe yên saftirîk ve dikir. Ecêb e!

Êvarî beriya dema hijmarê ket nava cihan, dibêje; “ez nexweş im.” Ji ber hevalan dizaniya ku roj bi gardiyan re axiviye, di jiyanê de zêdetir baldar dişopînin. Ger di kêliya hejmarê de ne amade be wê serbaz û leşker biçin wê kontrol bikin. Her wiha dê vê carê jî peyam rasterast bidan.

Min got; “bangî wê bikin, bila were. Ger nexweş jî be, dikare du xulekan li ser piyan bisekine. Jê re bêjin.” Berpirsyara qoxuşê Îsmahan bang dike. Pakîze di ber xwe de di-axivî û wisa hat. Em tev li ser piya ne. Derî vekirî ye. Gardiyan jî derve li ser merdîwenan li benda serbaz e. Tam di wê kêliyê de cardin axivî;

“jixwe hûn ji min bawer nakin. Ez nexweş im. Hûn çi ji min dixwazin?” Bi dengê bilind di-axivî, xwe kele girî dikir. Qaşo dê dengê xwe bigihîne gardiyan got;

“ji bona ez tevlî civîna bîranînê ne bûm, hûn bûne dijminên min. Hinek din jî tevlî nebûn. Ma qey ên tevlî bûyîn jî gelekî dixwestin tevlî bibin?” Hêj gotinên xwe neqedandî, her kesî êrîşî Pakîzê kir û lê xistin. Her kesî jê re tiştek digot; “ketiyê, tu diçî îxbara me li cem dijmin dikî.”, “dînê, ma tu çi di-axivî? Te çi ji leşker re got? Tu van rezîltiya tev ji bona hevjînê xwe re hevdîtinê bikî dikî? Dê ew te weke paçekê bikar bînin…” her wiha gelek gotinên din hatin gotin. Hinek jî ji bona deng neyê bijîstin devê wê digirin. Leşkerî hişyar kir, agahî da ku serbaz tê. Gûlten ji Pakîzê re got; “dê tu tiştekî ji dijmin re nebêjî. Nexwe tu dizanî.”

Pakîze jî di rêza hejmarê de ye. Lê bi kele girî ye. Teqez serbaz peyama ku Pakîze roj dabû leşker girtiye. Piştî ku hejmar qediya, Pakîze şanî da û pirsî; “ma tu nexweşî?” Wê jî

bersivand; “belê, nexweşim.” Tiştek din jî negot. Îsmahan yekser ket navberê û got;

“Nexweşiya jinê ye. Tiştek cidî tine ye. Emê dermanê wê bikirin. Jixwe reçete jî hatiye dayîn.” Her wiha nahêle Pakîze tiştek din bêje, asteng dike. Serbaz jî mat dibe, wî digot qey haya me ji reçeteyê tine ye.

Roja paştir Pakîze ji nav cihan derneket û ji serbaz re got;

“Van li min xist.”

Berpirsyara qoxuşê jî got; “na, ne rast e. Derewan dike. Lîstokan dike. Dîne. Em xwarina wê didinê û xizmeta wê dikin. Xwe bi safînî datîne. Ya rastî nenexweş e.”

Serbaz mat ma. Dê ji kîjanê bawer bike? Paşê serê xwe hejand û derket. Piştî demekê bangî Pakîze kirin û Pakîze avêtin hucreyê. Dê hem ew bitirsandan û hinek tişt ji dev derxistan, hem jî bi qasî bikarin dê bikar bînin. Belê, Pakîze wê demê behsa civînên bîranînê û merasîman dike. Ji ber baş bi zimanê Tirkî nedizaniya, her tişt tevlîhev dikir. Bi fenekî dixwest xwe bide qebûlkirin. Leşker jî jê şik dibin û dibêjin; “li gorî tê gotin ev jin dîn bûye.” Roja duyê dengê hawarên Pakîzê ji hucreyê bilind dibûn. Li ser betona tazî, birçî hiştibûn. Xwe bi dijmin jî nedabû qebûlkirin. Pakîzê nakokiyek dijiya. Ji me re jî nedibû yar, dijmin jî ew cidî nedigirt. Bêpîvan bû. Her kêlî rewşa wê ya ruhî dihat guhertin. Tevî ku giliyê me kiribû, ew ketibû hucreyê. Em hemû bi hev re tevgeriyan. Ew ruhê me yê yekîtiyê bandor li Pakîzê kiribû. Hem ditirsiya, hem jî digot; “xweziya min nekiriba. Du sal e min xwedî dikin. Ew jî weke min bûn. Ew ji min zêdetir êşkence dibînin. Ger dikarin li girtîgehê ber xwe bidin, ezê jî bikarim li ber xwe bidim.”

Di kêliya van nakokiya dijî de, şibakê re bangî me kir. Bi kele girî got;

“Min efû bikin. Ez dizanim min gû xwar. De ka min ji vê derê derbixin.”

Em nizanin em bêjin drama Pakîzê, an jî rewşek trajî komîk e? Nakokiyek çiqasî ecêb bû. Hestewariya jinê, tengezariya jinê… Her du jî li nav hev hebûn. Ji ber pirsgirêk netenê Pakîze bû. Hemû kesayetên ku di kêlî, demjimêr, rojê de rihê wan dihat guhertin, ev rewş jiyan dikirin. Li dijî pêkanên zext û êşkenceyên dijmin ên domdar û bi pergal, nakokî rast dana şerkirin, bi kesayetê re girêdana bi jiyanê zindî hiştin, tengezarî, bêbawerî, biparçe, tena serê xwe û bêhêviya ku dijmin hewl dide ava bike tev şikandin, ji bona me girtiyan gelekî girîng bû.

Bi Pakîzê re di şibakeyê de axaftinek veşartî hat kirin. Me xwarin dayê. Cilên sitûr hatin dayîn. Piştî ku jê re hat gotin, helwestên wê yên heta niha suc bûn, piştî soz da dê ji vir û şûn de tiştek wisa neke, neyênî ne axive, baş bû ku bi rêya berpirsa qoxuşê ji serbazê nobedarê rojê re hatibû gotin; “Pakîze mirovek gundî ji rêzê ye. Demek dirêj dernexistin dadê. Di êşkenceyê de zaroka wê ji ber çûye. Hêj pêxirtengiya wê dijî. Deprasyonê derbas dike. Ger zêde di hucreyê de bimîne, dibe ku xeternak be.” Me di navbera xwe de digot; “Divê dijmin kesek herî ji rêzê jî li dijî me bikar neyîne. Divê di qoxuşa jinan de îxanet neyê jiyîn. Divê Esad kêfxweşiya vê nejî.” Êdî pakîzê mijarên ku berê axivî bû jî tev înkar kirin. Dibêje; “ez nizanim çi dibêjim.” Dijmin jî bawer dike ku dîne û gêje. Lê bi guman nêz dibin ku cardin bixin qoxuşê. Bes weke din jî cih tine ye.

Herî dawî cardin Pakîze hat cem me. Heta demekê peywendiyên wê yên civakî hatin sînorkirin. Di nava komînê de cih negirt. Tenê hevalên ku pê re eleqeder dibûn, di-axivîn. Rexnedana xwe da, got ku suc kiriye û soza xwe da careke din nêzîkbûnêk wisa raber neke. Piştî vê sozê di nava jiyana civakî de cih girt. Demek dirêj tevlî bîranîn û civînên fermî nehat kirin. Her wiha Pakîze bi destpêkirina doza Hîlwan-Sîwerekê re, di encama çend rûniştinên dadê de hat berdan.

Gelo ev hêrsek li dijî îxaneta ku li cinsê xwe kirî bû, an jî me tehemul nedikir ku em kirêtiya îxanetê û jinê li cem hev bibînin? Lê çi dibe bila be li dijî nêzîkbûna ku jinê têkil vê kirêtiyê dike bertekek hevbeş û tevgerek hevbeş gelekî bedew û watedar bû. Dibe li hember dijmin serkeftinek mezin û helwestek mezin nehatibû bidestxistin. Lê dîsa jî lewazî û rizînên di kesayetê de derdikevin derve û encamên ku ew ava dike, bi vê bûyera biçûk ve jî pir vekirî derket holê. Bû sedem ku em jî demek dirêj di navbera xwe de nîqaş û nirxandinan bikin.

Ger mirin be, ancex ez dikarim wê mirinê hilbijêrim

Tam salek bi ser şahadetên Rojiya Mirinê ya Mezin re derbas bibû. Êdî li dadgehan pêşxistina parastina siyasî, hewcedariyek girêdana bi şehîdan ve bû. Wan her tim parastin gelekî girîng dît. Ji ber dijmin dihesiband dê PKK'ê bêdeng, bê ku kes pê bihese li zindanan bixeniqîne û hêza ku bûye hêviya gel bişkîne. Ev hemû jî ji bona vê bûn. Di dîroka Kurdistanê de, biryarên ku Dadgehên Îstîklalê yên cezakirina Kurdewariyê

kirine karê xwe yê bingehîn û bê rehim nêz dibin û zagonên dewletê yên hatin derxistin jî kêrî tiştekî nehatin. Berxwedêrên Kurd li sêdaran hejandin, her tişt di nava dîwarên zindanan de man. Hinek gotinên ku hatin kirin jî derbasî nava dîrokê nebûn. Xwestin bidin jibîrkirin.

Lê vê carê cuda bû. Vê carê PKK'ê dîrok darizand. PKK'ê mêtîngerî darizand. Hêza PKK'ê ya bîrdoziya zanistiya mezin, derketina wê ya Rêberî, afirîneriya şoreşgerî ya di rêxistinkirinê û şêwaza şer, berxwedaniya wê gelekî berfireh bû. Ji ber li ser bingehek wisa rast gav hatibû avêtin. Her çendî li hember êrîşên dijmin hinek têkçûnên bihurdar hatibin jiyîn, cardin xwe ava kiriye û kariye şaneyên cewherî yên şoreşgerî ava bike. Pêvajoya paşvekişînê, berî her kesî ji aliyê Mazluman, Xeyriyan, Pîran ve hatibû erêkirin. Tevdîra Rêbertiyê, parastina qadroyan û bênavber meşandina têkoşîna wê, ji bona şoreşa me şertên sereke bûn. Pêşbîniya şoreşgerî, hişt ku ev heval her tim bi xebatên derve bawer bin û bizanibin divê di taybetmendiyek çawa de were meşandin. Ev nêrîn her tim bi wan re zindî ma. Her wiha her tim jî di hundir de dê çawa şikandina berxwedaniyan û pêvajoyên bihurdar ên binkeftinê berovajî bikin, dê çawa berxwedaniyê ji nû ve ava bikin, li gorî wê guncav amûrên têkoşînê bikar bînin, dê jiyanê li kur û çawa bigirin û ava bikin pir baş dizaniyan û di biryarên cih de her tişt zelal dikirin. Di heman demê de rê ji zelalbûna her biryarên di derbarê van mijaran de vedikirin.

Pişta cuntaya faşîst li zindanan şikestibû. Dijmin cesaret nekir ku bi dezgehên mirinê yên wî bi xwe amade kirine ve jî, bikuje. Ji ber firsenda wê nedît. Weke ku bêjin; "***Ger Mirin Jî***

Be, Ancex Ez Dikarim Wê Mirinê Hilbijêrim" li ber wan meydan ava kirin. Her wiha rûpelên yekem ên zêrîn ên dîroka zindanê bi vê berxwedaniya bêhempa ve hatin nivîsandin.

Êdî li her dadgehê, sozên girêdana bi Mazluman, Ferhatan, Kemal Pîr û Xeyriyan ve bilind dibûn. Parazname bi gotin û nirxandinên wan ên hêja ve dihatin nivîsandin. Plana parastinê, çarçoveya wê ya gîştî, rihê wê yê cewherî ya Mazluman, Xeyriyan, Kemalan bû. Wan hîm danîbû, wan nivîsandibû û wan kiribû diruşme. diruşmeyên weke "BIJÎ PKK! BIJÎ KURDISTANA SERBIXWE! BIJÎ APO!" Wan bilind kirin.

Mazlum gotibû; "em dereng dimînin." Piştî pêvajoya pey Gulanê, ji aliyê dijmin ve ferzkirina îxanet û derûniya neyênî ya ku di nava girseya girtiyan de ava kirî gelekî girîng bû. Herî baş wan dît ku divê hinek tişt werin kirin. Her wiha yê ku dirêjbûna pêvajoyê jî rexne kir, di vê mijarê de giraniya berpirsyariya xwe ya dîrokî hesîn, berdêla derengmayînê jî ji kesî re nehiştin, ew bûn. Heval Mazlum serkeftina ji nû ve bilindbûna rihê vejîn, yekîtî û azadiya NEWROZÊ pêk anî. Çalakiyên pey wê re hemû li ser esasê temamkirina vê çalakiyê bûn. Bi ser hev de zêde bûn. Vê jî xweserî û bêhempabûna çalakiyên PKK'ê derxist holê.

Gelek îtîrafkarên bi zora êşkenceyan axivîbûn, îtîrafên xwe paşve kişandin. Di her rûniştina dadê de gotinên weke; "ji partî û şehîdan afûya xwe dixwazim. Ew îfade di bin êşkenceyan de hatine îmzekirin. Min nekarî berxwedaniyek hêjayî partiyê raber bikim. Ger vê carê partî şansekê bide, ezê ji vir û şûnde berdêla wê canê min jî be, rast binirxînim" dihatin bikaranîn. Rihê bi sedan kesî wisa zindî dibû.

Em hêjayî Mazluman, Çar Hevalan, Pîran û Xeyriyan nebûn. Me ew bi tenê hiştin. Nûnertiya jiyana bi onur jî, mirina bi onur jî wan kir. Belê, bandora çalakiyan cur be cur berdewam dike.

Ji yên tevlî Rojiya Mirinê bûye û ji qadroyan sax maye Karasu, pêşengê berxwedana dijî ya li girtîgehê bû. Karasu, ji bona her kesî parçeyek ji berxwedanî û hevalên ku şehîd ketine li pey wan mabû. Weke emanetek wan bû. Dibe ku wî dixwest ji Xeyri jî, ji Pîr jî, ji Akîf û Elî Çîçekê ku heyranê coşa wan a ciwantî bû zûtir jî, ango beriya wan şehîd bikeve. Ji ber tevlî wê kerwanê nebibû, tengezariya wê jî dijiya. Ev tengezarî ji me yên ku tevlî wê çalakiyê nebûne zêdetir dijiya. Demek dirêj Karasu, Fuat Kav û hinek hevalên ku di wê pêvajoyê de destpêkirine, baş nebûn. Tenduristiya wan xirab bû. Nehatin ser xwe ve.

Di zemînê erênî yê berxwedaniyê ava kirî de ji nû ve birêxistinkirina girtiyan, gav bi gav di raman, hest, ruh û zanebûnê de ji berxwedaniyê re amadekirin û bi hewcedariya vê bawerkirin mijarek şert bû. Erka bûna şopdarê şehîdên berxwedaniyê jî ev bû. Helwesta li dadgehan hatî raberkirin, li girtîgehan jîndarkirin, meşa di şopa şehîdan de bû. Ancex wisa dê girêdana bi cewhera polîtîkaya berxwedaniya me ve hatiba fêmkirin.

Piştî şahadeta hevalê Mazlum, agahî hat ku li derve û girtîgehên din hejmarek zêde qadroyên pêşeng hatine kuştin. Dema Fadîme wan ji girtîgeha Elezîzê hatin behsa van kirin. Agahiyên bi vî rengî hem bawerî û girêdan pêş xistibû, hem jî ji bona windahiya qadroyên pir girîng xemgînî hebû û bandor li

ser moralan kiribû. Mirov evqas windahî ranedikir û nedikariya qebûl bike. Mirov çawa dikare şahadeta Mazluman, her Çar Hevalan, Pîran û Xeyriyan rake û qebûl bike? Dibe hinek din, an jî yên dûr bikaribin rakin. Bes dê yên li kêleka serê wan çawa rakin? Bes me dîsa jî li ber xwe da û rakir. Ji ber wan hînî me kir ku, em bikaribin her tiştî rakin û li ber xwe bidin. Wan got ancex bi jîndarkirina berxwedaniyê ve dikarin li ber xwe bidin. Fermana wan jî ev bû.

Dosya Fadîmê wan cardin bi Elezîzê ve hatibû girêdan. Pênc-şeş kes bûn. Serlêdana dadgeha bilind a Elezîzê kiribûn. Daxwaz jî ji wir dihat. Bes Kolorduyê, komareke ku Komara Tirk jî derbas dike ava kiribû. Erka wan a herî sereke her kes li Amedê komkirin bû.

Esad, ji ber şahadetên berxwedaniya Tîrmehê qurban jê kiribû. Lê di dawiya vê de encamên ku rû jî bidin dabû ber çavan. Ji ber texmîn kiribû. Esad, ji girtîgeha Amedê derxistibûn. Dijmin di wan bûyerên şahadetên mezin ku ji bona xwe serkeftinek mezin rave dikir de, tenê hesaba rastiyek gelekî girîng nekiribû. Di derve de Partî-Rêbertî, peyama berxwedêriya PKK'ê bi şêwazek herî watedar girtibûn. Lewma xebat jî bi vê hêzê, li ser bingeha girêdana bi wan ve xebatên xwe dabû lezê, dê teqez rêbazek bersivdanê de hinek pêşketin bihatan avakirin. Me jî her tim bi vê bawer kir. Me digot; " dê mîsoger derve û Partî tola van hevalan bigire." Em li bendê bûn. Dil û guhê me li derve bû. Me ji vir derxistina Esad jî bi vê ve girê dida. Me di navbera xwe de şîroveyên weke; "dibe ku hevalan kuştibe" dikir.

Me nekarî em di hundir de bikujin. Ji beriya Esad biçe me plan kiribû ku em bikujin. Kes ne li benda tiştek wisa jî bû. Li cihê bêhnvedanê ji bona şikandina qeşayê hinek bistên hesin hebûn. Min yek ji wan veşartibû. Min bi rojan plan çêkir. Gûlten, Fadîme û Aysel jî dixwestin tevlî bibin. Bes zêde kes têkil vî karî kirin jî nebaş bû. Tenê dikariyan alîkariyê bikin. Aysel, Gûlten û Fadîmê jî herî zêde plan mereq dikirin. Serê bistê zêde ne tûj bû. Lê pir giran bû. Dê hem serê wê bihata tûjkirin û hem jî giraniya wê bihata bikaranîn. Ji ber me yekser li patika wî bixista, paşê bist lê bixista dê zûtir bikuşta. Wan jî li hember vê planê got; "temam, bes dê li kuderê û çawa were kirin? Li her naverastê ev nabe." Min çareyek ji wê re jî dîtibû. Diviya me Esad bibira qoxuşa piştê. Dê min bigota ji bona wî daxwaznameyek min heye û ez dixwazim li odeya piştê pê re bi-axivim. Dê tiştek qet ne li bendê bû bihata kirin. Dê berî wê Fadîme û Gûlten weke nexweş li qoxuşa piştê razan. Jixwe dema Esad dihat gardiyan pêş de digot; "Yûzbaşi hat" û agahî dida me. Di wê kêliyê de ji herduyan yekê dikariya biçe. Divê bal nekişîne. Xeter bû ku em bistê di qoxuşê de veşêrin. Lewma dê min bi xwe re, li pişta xwe bi paçek sitûr girê bida û bibira. Dema ez bi ser de êlekekê jî li ber xwe bikim, dê min bikariya pir rehet derbixim. Dê Esad jî bi mereq derbasî odeya piştê biba û dema li daxwaznameya me dayî dinêriya, wê min jî darbeya destpêkê lê bixista. Paşê jî dê min darbeyên mirinê lê bixistan… diviya heta wê kêliyê jî gardiyan pê nehesê. Ji ber carê gardiyan li pey Esad baz dida. Nêzî wî disekinî. Dê me rewşek wisa bi Esad re bida avakirin ku, ew jî bawer bike tiştek wisa veşartiye, em naxwazin leşker jî bibihîse, dema ku leşker jî were wî vegerîne.

Di navbera her du qoxuşan de sê korîdorên dirêj û teng hene. Bes di şêweya tîpa L de ye. Qoxuşa destpêkê di ketina hundir de ye. Ji bona mirov biçe ya din aliyê çepê dizivire. Piştî çend metreyan cardin çepê dizivirî. Dirêjiya wir kêmtire. Ji wir jî mirov rasterast yek du metreyan korîdorê re derbas dibe û dikeve qoxuşê. Heman weke labîrentekê bû.

Me di mijara deng de jî plan çêkir. Dê mîsoger bi şêwazê ku gardiyan were mijûlkirin bihata axaftin. Heta diviya wî bibin deriyê holka derve, ser merdîwenan û dikariya li wir bi-axivin. Ji bona bal nekişîne, dê me ev jî bi rêya nûnera qoxuşê pêk baniya. Berpirsa qoxuşê her demê dikariya bi gardiyan re bi-axive. Ji bona hevalên din jî ferq nekin, wê dengek qelebalix bihata derxistin. Jixwe dê her kes di rewşek matmayî de ba. Dê gelekan wate nedabûya vê rewşê. Dê gelek texmîn bihatan kirin. Ev jî ji bona avakirina qelebalixekê bes bû.

Dê me piştî ew kuşt, daxwazname û çi tiştên li holê hene rakiran. Dê min jî yekser di îfadeya xwe de bigota; "ji bona Esad êrîşî min kir, lewma min jî ew kuşt." Armanc heta dadgehê ez sax bimînim bû. Dê min paşê li dadgehê ev çalakî yekser bigirta ser xwe. Wê min bigota; "Esad qatilê dehan hevala ne. Min jî ji bona wê kuşt." Parastina xwe jî li ser vî esasî bikira. Jixwe dê pey wê re jî yan îdam ba, yan jî înfazek bi rêya êşkenceyê pêk bihata. Ez ji herduyan re jî amade bûm.

Her axaftin û amadekariya têkildarî vê moralek mezin dida me. Her carê em weke ku çalakî pêk hatiye şahnaz dibûn. Lê Esad weke berê nedihat. Dema wisa dibû, li ser çalakiyê jî nîqaşên nû vedibûn. Aysel digot; "gelo dê bandorek çawa li ser gişti bike? Dê kuştina yûzbaşi van zilaman har bike. Ewê jî tam

komkujiyê pêk bînin. Temam em bêjin me kir, lê emê çawa vê xeternakiyê bidin ber çavan? Em nikarin bê hevalan vê bikin. Ji ber çalakiyek zêde cidî ye.”

Ma emê dîsa li benda agahiyê bin? Ma çima hema em li dor xwe dizivirîn û li benda agahî û erêkirinan diman? Ez bawerim fêrbûnek peywendiyên berê koman dabû avakirin. Ev nêzîkbûnên di nav xwe de girtî, her tişt ser û bin dikir. Ma dê çima bi afirîneriya şoreşgerî ve nirxandina firsendan weke şaş bihata dîtin? Jixwe em neçar bûn gelek tiştan bi xwe bikin. Ew du sal bûn, em bi tena serê xwe bûn. Ma dîsa jî me bi serê xwe hinek tişt nedikir? Em yekser ne di rewşek berxwedaniyê de ne, ne jî em weke qoxuşên li derdora xwe bi her tiştî ve radest bûne û li gorî xwesteka dijmin quralan pêk tînin. Em di navbera her duyan de bûn. Me dikariya em têkildarî gelek mijarên weke li dijî dijûn û hakaretên leşkeran bi komî bertek raberkirin, protestoya em ‘karawana nagirin’, dîsa girtî berdana hev, karên weke ‘fermo fermandarê min’ û tekmîlan nekin, dijî vê derketin, zemîn nedana pêkanên wan ên bi pergal, berovajîkirin, destûr nedayîna dijûnên ji bona şehîdan tên kirin û hwd biryaran bidin. Di beşa jinan de gav bi gav ev bertek pêşxistin, li cihek qet ne li bendê darbeyek wisa, dê hemû girtîgeh rakira serhildanê.

Belê, em gelek caran di mijara pêşengiya derketinê de jî nîqaşan dikin. Planên cur be cur pêş dixin. Me digot; “em dikarin girtiyên xort tevlî berxwedaniyê bikin. Tiştek em bi hev re komî bidin destpêkirin dê belav bibe. Piştewaniya wê jî pêş bikeve. Dibe ku hinek helwestên din jî gur bike.” Dê çalakiya kuştina Esad, rê ji gelek bandorên din re veke. Min got; “ka ji

xwe re bihizirin, dervede partî bibihîse, gel bibihîse wê çiqas kêfxweş bibin. Dê bêjin ‘wan di hundir de dest û lingê wan girêdayî çalakî lidarxistin, em dikarin derve de çalakiyên wisa baştir bikin.’ Wê ev çalakî her kesî bixe nava liv û tevgerê.” Di wan rojan de Gûlten hat berdan. Dikarim bêjim bûyera herî zêde pê kêfxweş jî bûm, berdana wê bû. Bi qasî min Esad kuştiye kêfxweş bûm. Gûlten dîrokek zindî bû. Gûlten hemû pêvajo dizaniya û şahid bû. Kesek berxwedêr, girêdayî bû. Dê her tiştî objektîf ji partiyê re ragihîne. Temam. Wê demê em dikarin plana derbarê Esad de jî ragihînin. Berî wê me bi Serap wan re not şandibû. Min bi rêbazek taybet ve li ser nivîsandibû û veşartî şand. Dê wê mîsoger ragihanda. Min derbarê bersiva wê çawa ji me re ragihînin de jî baş hişyar kiribû. Me ji bona vê jî çend rêbaz destnîşan kiribûn. Em demekê li benda bersiva wê man. Lewma min ji Gûlten re got; “qet nebe, tu me li benda agahiyê nehêle. Dibe ku Esad ji vê derê biçe. Em demek kin li benda agahiyê ne. Ger bi niviskî nebê jî bi devkî dibe û hûn dikarin bi şîfreyan agahiyê bişînin.” Me şîfre jî ji hev re got û jiber kir. Gûlten jî got; “temam. Mereq nekin, bes ez yeke bi bawerî bibînim. Ji ber piştî derketinê zehmete ez yekser hevalan bibînim. Bes dê karê min ê destpêkê ev be. Bi min bawer bin.” Min jê re got îddîanameyekê jî bi xwe re bibe. Ji ber her îddîaname belgeyeke. Helwestên hevalan ên lêpirsînan, şêwaza dijmin a destgirtina PKK’ê, şêwaza kargeriya dadgehan, tev di wan îddîanameyan de heye. Mirov dikare gelek tiştan di wir de bibîne. Gûlten jî îddîanameya ‘doza giştî’ bi xwe re bir. Bes paşê me nezanî gelo piştî ku derketî îdareya girtîgehê destûr da ku bibe an na. Gûlten pir giriya. Gotibû; “ji bona min gelekî zehmete ku ez we li vir bihêlim û biçim.” Me

peyamên xwe devkî jî ragihandin. Min got; “li şûna min Rêbertiyê hemêz bike. Çavên wî ramûse, eniya wî ramûse.” Gûlten parçeyek ji me bû diçû. Lewma gelekî girîng bû ku zindanê ragihîne derve û rastiyên heyîn bide nasîn. Lê dîsa jî hinek gumanên me hebûn. Em ji xwe re dibêjin ger hinek bela werin serê Gûlten dê çi bibe! Me ti caran bi dijmin bawer nedikir.

Gûlten bi mehan em di mereqê de hiştin. Her serdanên me de, her ku tiştek dihat, kelecana me zêde dibû. Bê ku cil werin belavkirin destpêkê me digirt, li beşa xwaringehê kontrol dikir. Carê em bi demjimêran bi wan ve mijûl dibûn. Bi taybet tiştên ku me xwestine piç û piç kontrol dikir. Me hal di wan de nedihişt. Dîsa jî me hêviya xwe winda nekir. Me di navbera xwe de şîrove dikir; “ancex Gûlten dikare piştî ku derkeve dervî welat agahiyan bişîne.” (dema ku min piştî heşt salan Gûlten dît, şerê me yê destpêkê di vê mijarê de pêş ket. Min soz dabû ku ‘porê wê bikişînim.’ Bi rastî jî min ew porê wê yê ecêb gilolik kişandibû.)

Esad reviyabû û çûbû, an jî dihat parastin. Êdî hêviya me derve bû. Diviya Esad nejiya. Ji ber Esad nehêjayî ser rûyê erdê bû. Sucek bû henaseyek ji hewayê jî bigire. Sucek bû ku bi wan potînên xwe yên lenet ve pêl axê bike, ji ber qirêj dikir. Diviya mirina wî jî bi destê me ba. Kuştina mirovan dil xweş nake. Na! Tevî ku ez di nava şer de bûm, min bi hezarê caran lenet bi vê xisleta şerê çînî aniye. Lê bi rastî jî diviya Esad nejiya. Di her şaneyek wî de xwîna mirovan hebû, wî xwîna mirovan vexwaribû. Pir ecêb bû ku heywanek xwîna mirovan vexwe. Di hewşa girtîgehê de du karikên ku xwedî kiribû, kirin

qurban. Gotibû; “de ka wan karika bînin, yek ji bona Kemal, yek jî ji bona Xeyrî ye.” Divê mirovahî ti caran vê jibîr neke… jibîr neke!

Dema Esad çû, êdî ez li ser Şahîn hizirîm. Min dixwest Şahîn di nîvê dadê, li ber çavê şandeya dadê ku her yek ji wan parçeyek ji Esad bûn bikujim! Şahîn ji bona min dijminek, ji KT, ji Esad, ji hemû êşkencekaran, ji hemû îxanetkarên Kurd cudatir bû. Dibe ku kombûna hemûyan bû. Hemû aliyên wan ên kirêt, ên ketî rave dikir. Lê dîsa jî min nedikariya bi ti diyardeya îxanetê ve pênase bikim. Ji ber wateya xwe tam nedida. Ez bi her peyva hêjayî wî dihat dîtin, têr nedibûm. Çiqas peyvên weke ketî, bênamûs, îxanetkarê mezin, bêkesayet, xirab, kirêt, werin rêzkirin jî rehet nake. Ez her tim li pênaseyên nû geriyam.

Gardiyana jin tine bû. Yek du caran bi navberên kin re li şûna gardiyan polîsên jin erkdar kirin. Wan jî nekarîn rewşa heyî rakin. Polîsa jin a êşkencekar a bi navê Nuray ku ji pêvajoya Adarê mabû jî, nekarî ji bilî panzdeh rojan bimîne. Polîsa jin a êşkence li ser cinsê xwe dida kirin çiqasî kirêt bû. Li ser kursî rûdinişt, lingê xwe tavêt ser hev û êşkenceyên leşkeran temaşe dikir. Tevî wan kenên xwe yên sixte û nêzîkbûnên xwe yên leşker tehrîk dikir, nekarî bimîne. Cixare li pey cixareyê dikêşand. Dibe ku hinek hebên rehetkirinê, an jî hinek tiştên din jî bikar danî. Lê dîsa jî nekarî li ciheke ku êşkence li her jin û keçên di her temenî de tê kirin temaşe bike. Ew hêz bi xwe re nedît û çû. Tayîna xwe ji nişkê ve derxistibû. Dibe ku îstîfa jî kiribe. Dema polîsên jin hebûna, di çûna nexweşxaneyê û dadê de li ser me digeriyan. Lê em li dijî wê

şêwaza ser me gerînê jî derketin. Navranên me û li nav cilên me yên binî digeriyan, em dijî wê jî derketin. Jixwe ew jî her tim di berbangê de nedihatin. Carê di lêgerînên qoxuşan de polîsên jin jî danîn. Lê heta demekê ne polîsên jin, ne jî gardiyanên jin tine bûn.

Min ew bista hesin bi lingê xwe ve girê dida û xwe diceriband. Ji ber min daw li ber xwe dikir, bal jî nedikişand. Tenê kêmekê meşa min bandor dikir. Min nedikariya rehet gavên xwe bavêjim. Kêmekê dikuliyam. Herî zêde jî paçên ku min lê pêçabûn astengî derdixistin. Gera xwînê asteng dikir. Jixwe çûnûhatinên dadgehan bi serê xwe êşkence bûn. Ez bi saetan li ser piyan dimam û paşê jî bi wan maşînên kariyer an jî yên cenazeyan çûyîn, di wan maşînan de sekin gelek xirab bû. Her wiha li dadgehê li benda rûniştinê mayîn, tehemula guhdarkirina çeloxwariyên şandeya dadgehê, gelek caran bê ku me bidin axaftin dest û lingê bi ser û pî ve avêtina derve jiyîn, hemû, hemû jî bi yek gotinê kirêt bûn. Lê ji bilî van tevan, em van danin aliyekê, negengaz bû ku em tehemula Şahîn û endamên çeteyên din bikin. Herî zêde jî min qet tehemula Şahîn nedikir. Heta ku rûniştin diqediya min jî ew bi awirên xwe aciz dikir. Dema kêlekê re jî derbas dibûm min jê re digot; "Ketiyo! Bê namûs!" Dema derfetên axaftinê jî çêdibûn, min di paraznameya xwe de jî behsa îxaneta wî dikir. Min her carê ew bi şêweyekê mijûl dikir. Ev şerê bi gotin, awir û dijûnan misqalek jî be, ez rehet dikirim. Weke din jî di dilê min de sondek mezin a tolhildanê hebû. Ma heta min ew neteqandiba çi dikariya min rehet bike!

Divê ez wî hesinî wisa bi ranê xwe ve girê bidim, dema ez rûnim jî ferq nekin. Herikînek herî biçûk dihişt ku were dîtin di bin dawa min de tiştek heye. Di ceribandinên me yên li qoxuşê de jî kêmasiyên bi vî rengî derketin. Min tenê karî carekê bibim rûniştina dadê. Wê rojê jî Ketiyê Şahîn nebû. Biryara rûniştina dada veşartî hatibû dayîn. Dema şandeya dadê ev daxwiyanî da, ez di cihê xwe de weke cemedê rawestiyam. Evqas jî bê şansî nedibû! Ev çend carin hemû bêşansî li qay min tên. Nexwe çiqas bûyerên hêjayî şansê bûn. Gelo şans jî bi me dilîst? An jî ez di girtina şansê de nekêrhatî bûm. Ez bawerim a rast jî ev bû. Pir vekirî bû, min şansê heyîn baş bikar nedanîn.

Min çend caran xeyalê wê kir, min çend caran di xewna xwe de dît. Li eywana dadê li gorî şandeyê miqabil, li rêzên pêşî yên beşa aliyê çepê rûdiniştin û Şahîn jî her tim li serî rûdinişt. Serkêşê îxanetê, destpêka cebantiyê (doneklik). Şahîn ji van tiştan hez dike. Di nava refên me de jî bi hêrsa karyera kirêt dişewitî. Niha jî ji bona bûna yekemîntiya îxanetgeriyê xwe diperpitand. Jixwe bû xayîn. Îxanetgerê bêhempa yê dîroka têkoşîna me û dîroka girtîgehê Şahîn e! Belê, dîrokê ew wisa li dergeha îxanetê nivîsand.

Ezê di kêliya rûniştina dadê de ji nişka ve nexweş bikevim û ezê hewl bidim da ku min derbixin derve. Dê min ew hesin di tuwaletê de ji ranê xwe vekira, di bin çakêt de milê xwe ve girê bida, serê wê bi şêweyek ne hata dîtin dest de bigirta. Paşê dema ez nêzî bûm dê min ji nişka ve derxista, darbeyek lê bixista. Plan wisa bû. Ji ber negengaz bû ku em weke din hevûdû bibînin. Bi darbeya destpêkê ve mirina wî pêkanîn zehmet bû. Lê ez dihizirîm ku ser hev darbeyan serî bixim û

mejiyê wî belav bikim. Gelo dikariyan di wê panîkê de hesinî ji destê min derbixin, an jî leşkeran dikariya li me bireşînin? Ev jî dibûn. Hem jî bûyerên pir girîng ên dibin ku rû bidin. Lê tevî vê xeteriyê şansê serkeftinê jî zêde bû.

Ez weke dîna me. Ewqas deman Şahîn li rûniştinên dadê bû. Ma her tişt liqayî vê rojê hat? Weke ku ziman, an jî destek veşartî jê re gotibû. Bes na. Komek hevalên teng û biçûk tenê dizaniya. Ne gengaz bû ku bizane. Tesadûf bû. Dîsa jî mirov di her mijarê de bi geloyan ve dimîne. Ez bawerim ev jî ji bêçaretiyê pêş dikeve.

Li Elezîzê nehat serxistin. Ger me bixwesta, em li benda derve nemabûna û me biryara xwe pêk baniya, dê Şahîn ji zû ve bihata cezakirin. Dema mirov biryarekê tam bide, dê pêk jî bîne. Jixwe li girtîgehê girêdana rêxistinî hatibû qutkirin, dê me ji kî, kuderê agahiya erêkirinê bigirta, em li benda kî bûn? Her çendî me dem bi dem ev bi acizbûn bigota jî, nêzîkbûnên me yên dudilî û biguman ev asteng dikir. Ew dijwariya şoreşgerî, hêza nirxandina kêlî û firsendan û encamên di xistina îxanetkaran de derbikevin holê rast hesabkirin û pêşbîniya wê lewaz bû bi me re. Bandora vê jî gelekî diyarker bû. Dê kî israr bike? Ji bilî hinek hevalan, hinekan dîsa dikariya bêjin ku; "Şahîn dîsa yê me bû." Ji ber wê ewqasî rehet tevdigeriya, nêzî lewazî û qelsiyan dibû, helwestên radîkal jî dişkand.

Min jî her tim israr dikir. Helwestên min her tim zindî bûn. Di vê mijarê de dudilî tine bû. Tam dijî wê min li hember ên dudilî tufan radikir. Aciz dibûm, bihêrs dibûm. Diqêriyam. Min behsa plan û amûran jî ji wan re dikir. Min jî heta cihekê ferz kir. Ev tenê di asta gotin û biryarê de bi bandor e. Her derfetên

jî di asta amadekariyê pratîkî de nêzî hev dikim, lê ez nikarim hevsengiya pey wê re were hesab bikim. Bandorên derve an dibin sedem ez zêde lez bikim, -jixwe di her tiştê min de lezbûn serwer e- an jî acizbûn, hêrs û bertekên min derdikevin pêş, "rojiya xwe xirab dikim." Her çendî ne di destê min de jî be, rêbazên min, nêzîkbûnên min ên wisa derdixe holê. Lê mixabin, encamên girîng çiqas di nav xwe de dihewîne, ew jî berbiçav in. Wan encaman hêz dida mirov û ji bona pêşketinên nû yên zêdetir mirov biserkeftî pêşve dibe. Ji bona min ew encam bidest nexist, ez cardin bi xwe re şerek derve û hundirîn dimeşînim. Ji xwe aciz dibim. Dema mirov dikare hinek tiştan bike û dibe ku pêk werin de, bi rihê em nikarin bikin ve ji nû ve xwe amadekirin, ji nû ve plankirin, vê carê hem wext winda dike, hem ji bona mirov diwestîne, em hêz winda dikin. Ango mirov berê şerê xwe nade hedefê. An jî tu nikarî li heman cihî yekbûna xeyal û rastiyan ava bikî.

Çi dibe bila be encam binkeftine. Ez çiqasî êşiyam ku me li Elezîzê Şahîn nekuşt. Derfetên min bi qasî yên hevalan tine bûn. Min nedikariya ji dûr ve hinek tiştan bikim. Lê min dikariya tevî her tiştî heta dawî pêkanîna çalakiyê ferz bikim. Ji ber ew hêz û bandora min hebû. Min dikariya berpirsyariya wê jî bigirim ser xwe. Jixwe partiyê jî ji ber me xayînek kuştiye em rexne nedikirin. Em li benda demanceyê man, parçeyên wê kêm derketin. Paşê jî sûrgûnê destpê kir. Lê dîsa jî ew nejêhatîbûna me ji min re bibû derdek. Her wiha min ev derd û hêrs li Amedê jî li gorî dilê xwe bi serê Şahîn de neteqandibû. Plana min di asta xeyalan de ma.

Dema hemû bûyer wisa berovajî qulipîn, bi hevalên em bi hev re axivîn re jî, bêhêviyek pêş diket. Wer bawer dikirin ku ez xeyalên pir xweş, lê neyên pêkan dikim. Ev jî xirab bû. Belê, xeyalên min jî di navê de hebûn. Hişê min ê xeyalan berfireh bû, zêde bêsînor bûn, bêpîvan bû, min nedikariya bidim rawestîn, lê hemû jî yên dikariyan werin pêkan bûn. Bes me nekarî em wan baş bigirin. Me herî dawî xwe bi hinek cihan ve da girêdan. Hêviyên bila ji wê derê erêkirin were, ji xeyalan xiraptir bûn. Di nava wan şert û mercan de kêrî tiştekê jî nedihat. Xeterî esas girtin û xeyal kirinê ve, her tim ji xeteriyan tirsîn, ji wan dûr sekinîn û xeyal jî nekirin çiqas ferqa xwe ji hev heye! Ez li şûna ya duyê ya yekê dihilbijêrim. Jixwe jiyana min jî hinekê wisa meşiya.

Emê vê carê li benda kesî nemînin. Dê şehîdên me ferman bidan. Wateya çalakiya wan gelekî vekirî bû. Ger mirovahî bi temamî nehatibe windakirin, misqalek wijdana şoreşgerî mabe, hinekê bawerî mabe, te xwe bi mirinek temamî bê onur re amade nekiribe, wê demê nedibû ku ev ferman nehatiba bihîstin û dîtin. Divê te bihîstibe. Gelo yên nebihîstî hebûn?

Min li dadgehan pir vekirî got;

“Ger wisa berdewam bike, emê biçin mirinê. Em êdî dergistiyê mirinê ne. Em êdî vê bê onuriyê qebûl nakin…

Li şûna ku em jiyanek bi êşkence û dervî mirovahiyê bijîn, emê bi dehê caran bimirin…

Rêya me rêya Mazluman, Kemalan, Xeyriyan û Ferhata ne…”

Êdî di navberan de jî hêdîka bi pise pis dihat gotin ku; “mereq nekin, dê êdî wisa berdewam neke.” Berê kesî serî

ranedikir û nedinêriya. Her çendî hinekan êşkence bigirta ber çav û lê binêriya, axaftin û pise pis nedigihişt girtiyên jin. Pir kêm me silav dida hev, ew jî bi nêrîna çavan. An jî me kêmekê serê xwe dihejand. Ma mirov di wan kêliyan de di berdêla wan kenên çavan de çi nade. Em ewqasî hesreta hev bûn, êdî axaftin, piste pist, heta carna bideng axaftin jî çêdibûn. Peyama herî bi deng di kêliya paraznameyan de bû.

Fadîme wan çûn Elezîzê. Me ji hevalên wir re not nivîsand. Me behsa berxwedanî, wate û girîngiya wan, encamên ku ava kirine, dê teqez pêşketinên nû çêbin kir. Herî dawî jî me bi vê nota biçûk jî girêdan û baweriyên xwe bi şêwaza "Riya me riya Mazluman, Xeyriyan û Pîra ne" destnîşan kir. Me nivîsand ku divê ew ti caran bi propagandeyên dijberê şoreşgeriyê qet bawer nekin. Fadîmê nota me saxlem radest kiribû. (piştî wê dema ez û Şamîl liqay hev hatin, pir xweş da diyarkirin ku wê notê çi ava kirine, hestên çawa avakirine. Nexwe ew nota me kêrî hatibû. Herî zêde ez bandora notan dizanim. Piştî salan parçeyek qaxit jî ji bona mirovan weke tu cîhanê bigirî ye. Kêfxweşiya wê kêliyê û şahnaziya wê kêliyê gelekî cuda ye.)

Bijî mirin!

Em di navbera xwe de bi şêwazê komên teng û fireh axaftin û civînên nîqaşan lidar dixin. Hucre weke berê nayê bikaranîn. Ji ber cihê yên nû hatine û kesên yeke yek dixwestin wan ceza bikin dixistin wir. Kêm caran bi komî cezayê kirina hucreyê hebû. Me jî digot vê carê jî em bikar bînin û me ji bona karê axaftin û nîqaşên veşartî bikar danî. Hucre, piştî beşa cihê tuwalet û serşokê bû. Li dawiya korîdorê bû. Dema deriyê korîdora derve dihat vekirin, dihat bihîstin. Heta ya duyê vekiran em belav dibûn. Wisa bal jî nedikişand. Êdî gardiyan jî weke berê nedikariyan bikevin nava me, em li dijî derdiketin.

Me digot; “neguncav e ku hûn li beşa serşok û tuwaletê binêrin.” Em wê rojê jî civiyabûn. Hemû heval tevlî civînê bibûn. Em bi endamên komên din re cuda axivîn. Me derbarê

rewşa giştî de, pêşketinên ku li dadgehan diyar dibin, ev rewşên heyîn hemû didin diyarkirin ku amadekariya tiştekê heye, lewma divê her kes xwe li gorî pêşketinên nû amade bike, bi wan re jî nîqaş kir. Peywendiyên me li gorî berê baştir û erênî ne. Ew jî di navbera xwe de dicivin. Lê mixabin yên ji TKP'ê bi parçe ne. Di nava yên din de jî yên biguman hene. Di vê mijarê de nêzîkbûna kesekê bi me ve negirêdayî bû. Lê dîsa jî me hewl dida ku em wan erênî bandor bikin.

Me hinek heval jî nobedar danîne derve. Em yên din jî di civînê de ne. Em çarçoveya heyî jî vedikin û nîqaş dikin. Hema her kes nêrînên xwe dide. Em pêşketinên li dadgehan şîrove dikin û didin diyarkirin ku em di wê baweriyê de ne, divê hinek tişt werin kirin.

Dema em pêvajoyê jî dinirxînin, em şaşî, kêmasî, nêzîkbûnên me yên ji pêvajoyê re, peywendiyên me yên bi hev re, ango di hemû mijran de lêpirsîna xwe dikin, hinek heval jî li ser vî bingehî rexnedana xwe didin. Em di rewşek erênî û gerim de ne. Êdî em ber bi kêliyên dawî yên civînê ve diçin. Heval wer dizanin ku heçku em bi dizive agahiyan didin hev. An jî me dizîve ji hevalan not, agahî girtine. Ya rastî fêmkirinek bi vî rengî baştire, ji ber bandor dike.

Yên ji TKP'ê gotin; "heta em ji hevalên xwe ti agahiyê negirin, em tiştekê nakin. Lê tiştên hûn giştî dibêjin erênî ne. Divê mirov li hember hişyar û baldar nêz bibe." Diyar bû guman û tirsên xwe derbas nekiribûn. Li gorî wan dijmin hêzdar bû. Girtiyên ku dest û lingên wan girêdayî çi dikarin bikin? Ev jî encama tirsa ji dijmin û têgeha dijmin li gorî xwe şîrove kirinê bû. Polîtîkaya wan vekirî bû. Li gorî wan jî

dijminê herî xeter em bûn. Me ew xewnên kabûs ên mamoste Nîmet her carê bi ‘Apo’gerên terorîst’ dinaliya ji bîr nekirine. Lê tevî vê jî me her tim alîkariya wê kir. Esad, dixwest Nîmetê jî bikar bîne. Kesek durist bû. Wê jî fêm kir ku me ev rewş ferq kiriye û em axivîn. Li hember me pir vekirî bû. Jixwe êdî Esad nekarî tiştekê ji Nîmetê bigire. Dema çû jî got; “ez deyndarê we me. Ez ti caran we jibîr nakim.” hêj hinek kes hene dixwazin bawer bikin ku jiyan xilas bûye. Ji ber ne li gora wî/ê ye. Ji ber hêza li dijî derketinê bi xwe re nabîne.

Hinek ji yên me bi bertek digotin; “divê em bi milê van bigirin û bavêjin. Bila li cem me nemînin.” Bi vê helwestê jî dixwestin bidin zanîn ku yên bêbawer ketine, radestî tirsê xwe bûne pir vekirine û em jî wan baş nas dikin. Belê, gertîgeh bi her awayî şadihê rastiya tazî ya her kesî û her komê bû. Tiştek ku were veşartin û tarîkirin nemabû.

Di kêliyek me ev şîrove dikirin de, hevala ku nobedar bû bi qîre qîr bazdanê hat got; “hevalno, hevalno! Mizginî! Dengê diruşmeyan tê. Bi rastî jî dengê diruşmeyan tê. Dibêjin, ‘Bimire Mêtîngerî!’” bi vê mizginiyê re her kesî hevûdû hemêz kir. Temam nexwe destpê kir. Hinek jî aciz dibûn; “we çima negot dê îro destpê bike?” Her kesî bawer kir ku, agahiya me ji tiştekê tine ye. Komên din jî xeyîdî bûn. Tenê rastiyek hebû, ew jî em bê agahî bûn. Lê dîsa jî me baş hîs kiriye. Me pêşketin kêm jî bin baş nirxandibûn. Her kesî bazda cihê bêhnvedanê. Me piştî sê salan cara yekem bi komî diruşmeya xwe qêriya. “Bimire Mêtîngerî!”

Ew jî çiye? Di navberê de sirûdên faşîstan jî tê xwendin. Li hinek cihan jî deng têkilhev dibin. diruşme têkilhev dibin. Hêj li qoxuşên kêlekê sirûd tên xwendin. Me heval şiyar kirin. Min got; "ser û bedena xwe baş şidiyayî li xwe bikin û bişdînin." Her kes hem diruşmeya diqîre, hem hevûdû hemêz dike û ji kêfa digirî. Hem jî her kes mat bûye. Hinek diçin qoxuşê cilên xwe diguherin. Her kes sol û botên xwe şidayî girê dide. Kîjan rehete ew li ber xwe kiriye. Heman weke xwe ji şer û pevçûnê re amade bikin tevdigerin. Min ji şibakê bi dengek bilind bangî qoxuşên kêlekê kir;

"Hevalno, berxwedanê destpê kir. Êdî dev ji wan sirûdên faşîstan berdin. Salane dijmin bi onura me dilîze. Xwest bi pêkanên xwe yên dervî mirovahiyê me bêbawer bixe. Ger hinekê jî onura me ya şoreşgerî hebe, ger hinekê hestên me yên welatparêzê hebin, ger hinekê aliyên me yên mirovahiyê mabin, bila her kes tevlî vê berxwedanê bibe. Tenê qevdek îtîrafkar hene. Hemû girtî tevlî bûne. Hûn jî tevlî bibin. Rêya me rêya Mazluman e. Wan ji bona van rojên pîroz bidin me canê xwe yên hêja feda kirin. Li hember bîranîna wan rêzdar bin. Dev ji wan sirûdan berdin. Netirsin. Ger girse hemû bi hev re tevbigere, tiştek nabe, emê ser bixin." Hevalan jî bi diruşmeyan piştewaniya min kir. Vê bandor li ser wan jî kir. Tenê çend dengên fetisî digotin; "Bimire Mêtîngerî!" Nexwe hinekên ku dijûn li hinekan dikirin û asteng dikirin hebûn. Me jî diruşme û sirûd li pey hev gotin. Li wan deran di asta komên biçûk de jî bin deng dihat û tevlî dibin.

Demek derbas bû, qelebalixa gardiyanan hat. Digotin; “bila her kes bikeve qoxuşên xwe.” Me destpêkê got qey hatine li me bixin. Ji tirsa jî qelebalix hatine. Xwedêyo, her tişt û cîhan berovajî bûye. Tirs, xof û panîk ketiye nava dijmin. Piraniya girtiyên ku digotin tirsandine, heta hemû şaneyên wan ji cewhera wan vala kirine jî di serhildanê de bûn. Ev çi kar bû? Xweziya Esad bidîta. Bila ev jî bidîta. Xweziya Mazluman, Pîran û Xeyriyan ev roj bidîtan. Ma wan ne gotibû; “Teslimiyet Dibe Îxanetê, Berxwedan jî Serkeftinê Ava Dike.” Ma Hevalê Xeyrî jî di rûniştina dadê de li xwe ne zivirî, li girtiyan ne nêhêrî û ne gotibû? “Ez di wê baweriyê de me, dê sibe ev hemû partiyê biparêzin. Dê yên îtîraf jî kirine, îtîrafa xwe paşve vekişînin. Dê efuya xwe ji partiyê û gel bixwazin.” Pîr jî ne gotibû? “Îro, ez bi ser mirinê de dimeşim. Dê sibe yeke din, yên din û yê din hemû, di rêya vê dozê de hînî mirinê bibin.” Çiqas xweş bû ku me Îlûn wisa pêşwazî kir. Tişta hêjayî Îlûnê jî ev bû. Her wiha ev rihê berxwedaniya wan bû dijiya û bandor dikir.

Derî hatibûn girtin. Bes weke ku her kes li meydanek mezin civiyaye û serkeftinê pîroz dike. Em diruşmeyên weke; “Bîjî PKK! Bijî Serxwebûn! Bimire Mêtîngerî! Bimire Îxanet! Bijî Mirin, Mirina Bi Şeref Dide Jiyîn! Bimire Êşkence! Îdareya Faşîst! Mazlum Namirin! Kemalan, Xayriyan, Ferhatan Namirin!...” Û weke din çiqas diruşme hene diqîrin.

diruşme bi gelemperî pêl bi pêl tên, li bloka miqabil dikevin û wisa digihên me. Fêmkirina wan dengan nezehmet e. Lê dîsa jî gelek diruşmeyên têkilhev dibin hene. Kî çawa dibihîse hema yekser destpê dike. Di serî de tevlîheviyek wisa

hat jiyîn. Komên din gotin; “ev diruşmeyên PKK’ê ne” û tevlî nebûn. Em bi wan re axivîn; xwezayî ye. Me berxwedanî destpê kir. Şehîdên me ne. Divê hûn jî xwedî li Mazluman derbikevin. Ger hûn xwe şoreşger binav dikin, hûn li benda çi ne? Ne rast e. Ew em bûna kê ev berxwedanî bida destpêkirin bila be, emê tevlî bûna.” Lê dîsa jî me ji xwe re nekir derdek. Em di wê baweriyê de ne ku dê berxwedanî her kesî bikişîne xwe. Dibe ku hinek jî tevlî nebin. Ji ber hinek kesên evqas sal heta şaneyên xwe îxanet jiyayîn hebûn. Ne gengaz bû ku ev jî di kêliyekê de bişkê. Jixwe tiştek wisa ji her kesî hêvîkirin ne rast bû.

Em di navbera xwe de di-axivin û pêşketinên ku dibe rû bidin dinirxînin. Me yekser dest bi rojiya birçîbûnê kir. Me got; “emê daxwaznameyan sibe siharê bidin. Dibe ku em hinek tiştên cuda jî bibihîsin.” Her wiha rûniştina dadê ya koma Elezîzê heye. Emê li wir daxwiyaniya xwe bidin. Herî zêde jî kêfa me ji vê re tê. Divê şandeya dadê van rojan baş bibîne û di nava kursiyên xwe de bifetisin. Ew rûyên wan ên faşîst dîtin, ew tirsa di nava çavên wan de dîtin, tişta herî xweş bû.

Dê teqez di şêwazê rojiya mirinê de be. Min got; “emê daxwaznameyê bi giştî binivisînin û îmze bikin. Ezê li dadê daxwiyaniya rojiya mirinê bidim. Piştî ku em ji wir vegerin, dê êdî min nedin cem we. Emê jî li pêşketinên giştî binêrin û wisa tevbigerin. Bi giştî kîjan diruşme werin qêrîn, emê jî wan esas bigirin. Bila hîn zêdetir bi rêk û pêk be. Emê diruşmeyên bingehîn sê caran li ser hev biqêrin. Bila bi navber be. Divê em hêza xwe bi temamî neqedînin. Emê hêza xwe bi rêxistinkirî, plan û dem dirêj bikar bînin.” Hevalan xelekek mezin ava

kirine govendê digerînin. Sirûdên şoreşgerî jî bi dengê dawî tên gotin. Her tişt hêdî hêdî bi rêk û pêk, aheng û coş dibe. Dê li her qoxuşekê hevalên diyarkirî birêve bibin û venêrînin Dê zêdegavî û bêpîvanî çênebin. Dê her kes bi serbaz û leşkeran re ji xweber ne axive. Êdî ne nûnerê ku wan destnîşan kiriye, dê nûnerê me hebin. Dê her tişt ji rêzê û ji xwe re neyê axaftin. Divê hinek mijarên giştî eleqeder dike mîsoger were pirsîn. Herî girîng jî divê şaşî neyên kirin.

Me daxwazname dan. Em dibêjin rojiya birçîbûnê ya bê dem. Dem diyar nakin. Heta ku zext û êşkence rabin, heta ku hemû qural û qedexeyên kêfî yên ferz dikin bi dawî bibin, emê rojiya birçîbûnê bidomînin. Ên ji TKP'ê dem diyar dikin. Daxwaznameyek cuda dinivisînin. Ji ber ew daxwaz dikin, wan dibin qoxuşa jêrê. Ev jî tam li gorî armancên dijmine. Dibêjin; "ev çalakî yên PKK'yî destpê kirine. Jixwe ew terorîstên dijwar in. Mêrkuj in, yên darvekirinê ne. Hûn cuda ne. Têkil wan nebin." Şîreta li wan dikin. Hinek tam li gorî van gotinên dijmin tevdigerin.

Di Îlûnê de bi gelemperî pêla diruşmeyan zêdetir gur û bi rêk û pêk dimeşe. Heval dîsa bi coş in. Ne dev ji govendê diberdin, ne jî ji qêrîna diruşmeyan westiyane. Tevî ku roja pêncemîn a rojiya birçîbûnê ye, her kes pir zindî ye. Rojê carekê bi qedeha çayê ava bi şerbet tê dayîn. Jixwe divê şekir jî bi rêk û pêk were bikaranîn, ji ber kêm e.

Deriyê qoxuşê vebû. Riza, Muzaffer û Karasu ketin hundir. Her kes mat ma. Hinekan jî ji kêfa qîr dan. Piştî salên dirêj heval wisa ji nêz ve dîtin, hestek cuda da avakirin. Di çalakiyê de hevdîtin hêj zêdetir watedar bû. Her kesî baz da, li derdora

wan xelekek ava kir. Me hevûdû hemêz kir. Em destê wan digirin, lê hêj bawer nakin. Çawa em dikarin evqasî ji nêz ve destê wan bigirin! Bi salan bû bêrîkirinek gotina peyvekê, an jî bihîstinekê hebû! Me bi mereq pirsa wan kir, wan jî pirsa me kir. Bi gelemperî tiştên ku hatin jiyîn tenê hinek ji wan di dadgehan de diyar bûn. Gelek hevalan bi devkî, nivîskî êşkence û zextên ku hene ragihandin. Lê dîsa jî ya me zêde nehat diyarkirin. Tenê bi hinek vegotinên ku li dadgehan hatin kirin ve sînordar man. Şandeya dadgehê em nedan axaftin û piraniya tiştên me nivîsandibûn nedan xwendin. Tiştên hatin ragihandin de jî piranî êşkence hatibûn nivîsandin, bi taybet pêkanên li hember girtiyên jin hatin kirin nehatin diyarkirin. Dijmin di çûnûhatinên dadgeh û nexweşxaneyan de cuda dida diyarkirin. Êşkenceyên me jî dizîve dihatin kirin. Ji ber rewşa me ya tecrîdê hebû, her tişt veşartî girtin. Lê ji ber dengên me û xisleta dijmin, bi gelemperî dihat texmînkirin ku çi hatine kirin. Dîsa Riza wan bi şêwazek ecêb pirsî; "ma sirûdê bi we jî didin xwendin?" Ango tevî tiştên hatine gotin, heval jî îhtîmal nadin ku em jî weke wan heman rewşan dijîn.

Em piştî sohbetên kin derbasî mijara esasî bûn. Dê Riza daxwiyaniyekê bide. Komîteyek ji pênc kesan derketibû da ku li girtîgehan bigerin. Li hemû qoxuşan geriyabûn. Heta çûbûn qoxuşa kesên ku ji ber karên qaçaxî hatine girtin. Armanca vê komîteyê jî çalakî di nava yek pergalê de dana meşandin û birêxistinkirin bû. Riza; "di Îlûnê de komek heval dest bi rojiya mirinê kirin. Dîsa rojiya birçîbûnê jî heye. Zêdetir hevalên me ne. Paşê ji TÎKKO û Kawa jî hinek tevlî bûn. Îro jî her kes tevlî bû. Li her cihî diruşmeyên cur be cur tên qêrîn. Emê diruşmeyên daxwazên me rave dikin biqîrin. Dê ev diruşme jî

hinek demjimêrên destnîşankirî de werin qêrîn. Dê ji vê blokê were destpêkirin. Dê blokên din jî bi dorê biqîrin. Dê her tişt bi rêk û pêk bimeşe. Dê diruşmeyên weke, "Bimire Êşkence!, Bijî Berxwdana Me!, Êdî Bese ji Zordariyê re!" Werin qêrîn. Ev diruşmeyên hevbeş in.

Rojiya birçîbûnê di navbera hefteyek û deh rojan de ye. Dê rojiya mirinê jî di şêwaza postayan de be. Postayên du-sê jî hatine birêxistinkirin. Lê kes ji xweber tevlî rojiya mirinê nabe. Divê em li hember provakasyonan jî hişyarbin. Armancên me yên çalakiyê û daxwazên me;

- Rakirina her cure êşkence, zext û qedexeyan,
- Rakirina emîr-komuta,
- Kujerên kesên ku di êşkenceyan de hatine qetilkirin divê werin darezandin,
- Zext û qedexeyên li ser serdan û parêzeran werin rakirin,
- Nûnerên ku me hilbijartine ji aliyê îdarê ve muxatap werin girtin,
- Ji bona paraznameyan materyalên ku hewce werin dayîn,
- Rojname werin dayîn,
- Pirtûk û hwd pêdiviyên jiyanî werin dayîn!

Dê ev komîte hevdîtinan bimeşîne. Komîte, nûnertiya vîna hemû girtiyan dike. Dema hewce kir, dê dîsa bigerin. Vê carê jî me, ji bona tiştên zêdegavî û rewşên nû rû bidin pêşî bigirin serlêdan kir. Jixwe zilaman ji doh ve pê qayil bûn. Gotin; "Yûzbaşiyek nû hatiye. Navê wî Abdullah Karaman e. Nerim

dixwiyê. Lê kesek zêde yaman e.” Di wê navberê de yûzbaşiyê ku behsa wî jî dikirin hat. Hinekê xwe rêzdar dida diyarkirin. Ecêb li me temaşe dikir. Nêrînek wisa dida diyarkirin ku ji axaftinên hevalan ên gerim û jidil bandor bûye. Lê dema me jî ew ber çavan re derbas dikir got; “Sakîne Polat kîjan ji we ye?” Weke ku nas dikir. Teqez li wêneyan nêrî bû. Her wiha propagandeya cinawirtiya me ji hev re ragihandine. Xwezayî mereq dikir. Carê jî dizî ve li me dinêriya. Lê dema min dinêriya çavên xwe li ser min dibir. Mixabin min ew nêrînên wî yên sinsî û veşartî digirtin. Me herduyan li hember hev di hundirê xwe de diranê xwe ji hev re tûj dikir. Bi axaftin nebûya jî, me ji hevûdû fêm dikir. Yên neyartiya wan beramberî hev hebe, ger ji hev jî fêm bikin, (ne di wateya fîzîkî de), dema liqay hev tên, tiştên ku hîs dikin baş fêm dikin. Şeytanê rûyê xwe nerim! Nêrîna yekem ji bona Abdullah Karaman bi min re çêbû ev bû. Riza gotibû; “yûzbaşiyê nû dişibe yekî baş.” Pir zêde nema çû.

Herî dawî min ji Riza re got; “ez jî ya xwe vediguherînim rojiya mirinê.” Her wiha min di wê navberê de derbarê rewşa me de jî hinek agahiyên kin dan û çûn. Em cardin li ser mijarên ku hatine ragihandin şîroveyan dikin. Min, Aysel û Fatmayê dest bi rojiya mirinê kir. Me daxwaznameyek cuda û hêj berfirehtir nivîsand. Çarçoveya giştî ya ku hatibû amadekirin, me jî di asta xweseriya xwe de ji nû ve girte dest. Dibêjin piştî ku daxwaznameyên me biçin dê me derbasî qoxuşa jêrê bikin. Yên li wir in ji TKP û DDKD’ê de ne. Jixwe rojiya birçîbûnê jî bi encam kirine. Hinekan du rojan, hinekan sê rojan, rojiya birçîbûnê meşandin.

Roja paştir sibehê zû diruşme hatin qêrîn. Me bi diruşmeya dest bi rojê kir. Herî dawî ez li maşîna dadê siwar kirim. Dema ez çûm eywanê her kes berovajî rûniştibû. Ev jî protestokirina dadê bû! Kêfa min jî zêde bû. Cara yekê bû min her kes didît û li çavên wan dinêriya. hundirê çavên min dikeniya. Ew xetên şermê û belangaziyê ji ser rûyên wan çûbû. Me silava berxwedaniyê dida hev.

Min çiqasî bêriya peyvên "Merheba, hûn çawanin kiribû?" Herî zêde jî ji ber min bersiva wê digirt, ez şahnaz dibûm. Dîsa taybet li wan temaşe dikim, ji ber cihê wan ji bona me gelekî cuda bû. Dergehek bû. Dergeha abîdebûna Mazlum, Pîr û Xeyriyan bû. Di her misqalek wir de rihê wan, bedewiya wan û bilindbûna wan hebû. Ew jî aliyên bedew ên di her kesayetekê de hatibûn jiyîn û li ber xwe dide derdiketin holê.

Dema şandeya dadê ket hundir, mirov hema dixwest wê matbûn, hêrs, harbûn û hovitiya di çavên wan de li hember dîmenên heyî dibarin bibîne. Ji ber gelekî hêjayî dîtinê bûn…

Yekser serokê dadê pirsî; "kî berpirsyarê van e? Rayedarên girtîgehê kî ne? Kî van wisa derdixe li hemberî me, çi dibe? Van zû ji vir bibin." Me jî di wê kêliyê de mafê axaftinê girt. Min got; "me dest bi rojiya mirinê kiriye. Em di berxwedaniyê de ne. Em dixwazin xwestekên me derbasî girtînameyê bibin. Şandeya dadê ji tiştên ku rû bidin berpirsyare. Em vê dadê jî protesto dikin. We hemû heta roja îro bi hev re hem wext kar kir. We em nedan axaftin. We tiştên ku me gotine derbasî girtînameyan jî nekirin. Li ber çavên we êşkence li me kirin. We jî ferman da. Heta ku xwestekên me pêk werin dê çalakiyên me jî bidomin." Lê her yek ji aliyekê ve di-axive.

Hakîm rabûye ser xwe da biçe. Ketî yekser dibihîst. Lê ji ber ne li kêfa wî bû, destpêkê derbasî girtînameyê nekir. Paşê hinek tişt dan nivîsandin. Piştî wê em lez û bez cardin birin girtîgehê.

Me ji her kesî re ragihand ku me dest bi rojiya mirinê kiriye. Di astekê de li girtînameyê jî hatibû nivîsandin. Serbazê hatî ev rewş ji rêveberiya girtîgehê re ragihand. Ez birim qoxuşa jêr. Heval jî kirin beşa cihê hevdîtinê. Gelo koma Elezîzê li ber xwe dida, diviya me her tişt bêvila wan re baniya! Koma Şahîn û Yildirim wan hemûyan bi hev re îxanet kiribû. Niha jî li ber xwe didan.

Hêj ez nû diketim qoxuşa nû, dengê cam, hawaran, dengê copan û qêrînan destpê kir. Bi fetisî dengê diruşmeyan dihat. Ên me jî yekser li jorê di şibakeyan de bi diruşmeyên piştewaniya wan dikir. Ji şibakeyên ku şikestine, kêmekê ji kabîneyê dibînin. Bê navber bi dengê bilind dipirsîn; "hevalno, hevalno çi bû? Rewşa we çawa ye?" Dengên ku derdiketin her der dihejand.

Koma Elezîzê anîbûn qoxuşa kêleka me. Min jî ji xwe re digot pir baş bû. Yekser li dîwar xistin, min jî bersiva wan da. Wan jî got; "leşkeran êrîş kir, hinek heval birîndar bûne. Meto jî di nava wan de ye. Lê bi giştî rewş baş e. Hemû hevalên me tevlî bûne. Ji komên din kêmek kes tevlî bûne. Yên din jî hêj tevlî nebûne." Rewşa me pirs kirin. Min jî hinek pêşketinên heyîn ragihandin. Pênc xulek derbas nebû, ji wir jî birin. Li dîwar xistin û gotin ku wan ji wir dibin. Ketîno, bi zanebûn hevalên me li qoxuşên nêzî hev nahêlin. An ên îtîrafkar, an jî tirşikçiyên weke Bucakan, Silêmanan û piranî weke wan, an jî kesayetên ji komên din li nêzî me dihêlin. Dixwazin me her tim di tecrîdê de bihêlin.

Heman rojê weke ku me biryar girtî Aysel û Fatma jî daketin. Di daxwaznameyên me de rakirina êşkencê, emîr û komuta, sucên di êşkenceyan de qetlên ku hatine kirin werin eşkerekirin û ragihandin, qatilên wan werin dîtin û darezandin, zext û qedexeyên li ser serdanan û parêzeran werin rakirin, nûnerên me peywendiyên di navbera me û îdareyê de pêk bînin, çareserkirina pirsgirêkên tenduristî, ji bona paraznameyan materyalên ku hewce dikin anîn, pirtûk dayîn û rojane bi sazûmanî dana rojnameyan û hwd hinek xalên din hatine nivîsandin.

Êdî rastiyek heye, di wateyekê de ya ku çarenûsa çalakiyê destnîşan bike, rojiya mirinê ye. Rojiya birçîbûnê jî bidemî û bêdem gelemperî bi encam dibin. Li hinek cihan sê rojan, hinek cihan heftiyekê, yên me jî bi giştî heta deh-donzdeh rojan domandine.

Ji bona yên di rojiya mirinê de, her roj doxtor tên kontrolê. Lê em jî kontrolê qebûl nakin. Doxtor jî mat mayî tê û diçe. Carê hinek pirsan jî dike. Qaşo hişê me çiqasî li cihe, dixwaze wê hîn bibe.

Çalakî ber bi roja bîstan ve diçe. Girtî jî di navberê de bi diruşmeyên cuda ve berxwedaniyê didomînin. Dengê sirûd û êşkenceyan tine ye. Zêdetir li ser ên nû hatine tên pêkanîn. Di vê mijarê de her kes hesas bûye. Lewma di dengek herî biçûk de, her kes yekser bi diruşmeyan dest werdide. Di derxistina ji qoxuşan û ferzkirinên bi vî rengî de, bertekên hevbeş tên raberkirin. Yên diçin rûniştina dadê jî dibêjin ku rojiya mirinê berdewame, ger daxwaz neyên pêkanîn, dê ew jî dest bi rojiya mirinê bikin.

Di haparlorê de wazên olî dihatin dayîn. Ew yûzbaşiyê rûyê xwe nerim lê şeytan bû, li şûna sirûdan, dixwest me bi wazên olî bandor bike, da ku em dev ji rojiya mirinê berdin. Rêbazên wan ecêb bûn! Ji ayetan hinek beş dixwendin, digotin ku dema kesek xwe bi birçî hiştinê ve ceza dike gelekî gunehe, cezakirin bi temamî girêdayî xwedê ye. Em haparlorê xirab nakin, ji ber carê hewce dike. Lê belê, tam şerek sinirê dimeşînin.

Meleyan tînin heta qoxuşan. Qaşo dê ew yûzbaşiyê ketî ji raya giştî re ragihîne ku em bê ol in. Ya rastî armanca di vir de neguhdarkirina wazan bû. Şerek derûnî hebû. Ji ber girseyek berfireh hebû. Gelek ji wan baweriyên wan ên olî cuda hebûn. Hinek mirovên temenê wan kal û nîv îxtiyar ên welatparêz hene. Kesên qaçaxiyê jî dikin tevlî berxwedaniyê bûne. Piştî ku her kes wisa tevlî çalakiyê bû, mafdarî û hewcedariya çalakiyê zêdetir derket holê. Dijmin dixwest ji aliyekê ve deriyeke xirab veke. Lewma em jî neçar mabûn ku bi meleyê anîne re nîqaş bikin.

Yûzbaşi jî bi mele re hat. Mele kumek sixte daye serê xwe. Her wiha kirasek reş ê sixte yên meleyan li ber xwe kiriye. Rûyê wî jî yê faşîstane. Ya rastî rûyê wî dişibî kesên êşkenceyê dikin. Axaftinên wî jî, rastiya wî biştrast dikir.

Carê dema tehrîk dibe, meletiya xwe xirab dike

“We dixapînin. Ma dê hûn bi birçîbûnê ve çi mafî bidest bixin. Xayînên welat xwe bi vî şêwazî dikujin, da ku Tirkiyê ji dewletên din re xirab bidin nîşan.”

Pir ecemî di-axivî, yûzbaşî jî ji ber axaftinên wî aciz dibe. Paşê got;

“Ev wisa bê zanebûn nakin. Teqez armancek wan heye. Hinek aliyên ku mafdar in jî hene. Lê divê em van bi rêya nîqaş û axaftinan çareser bikin. Vala eziyetê li xwe dikin. Em çi bikin, ew dizanin, em zorê li wan nakin. Ma zordariyek heye?” Ji awirên min aciz dibû. Min her carê bi wî dida hiskirin ku ez dizanim ew şeytaneke.

Min jî got; “zordarî çiye? Êşkence çiye? De ka copên xwe jî bînin û bikar bînin. Ma êşkence ne tenê cop û elektirîk ye. Tişta hûn niha jî dikin êşkence ye. Berê we di hoparloran de sirûd dida, niha jî hûn wazan didin. Weke din hûn bi anîna meleyan ve şerê taybet dimeşînin. Ka binêre mele weke meleyan di-axive. An jî weke leşkerekî di-axive? Em naxwazin. Me di daxwaznayên xwe de daxwazên xwe rêz kirine. Lê ji bona bicihanîna wan yek hewldan tine ye. Bes hûn diçin mele tînin. Tevî ku em naxwazin ji aliyê doxtoran ve werin kontrolkirin, hûn her roj doxtoran tînin. Lê me weke din ti rojan jî doxtor nedidît. Hevalên me yên nexweş hene, ew nayên tedawîkirin û bi wan ve mijûl nabin. Me bi mehan malbatên xwe nedidît. Niha jî hûn digirin tînin hundir. Ji bona bandor li me bikin hûn zextê li ser wan jî dikin. Ango hûn hem zextê li me dikin, hem jî li ser malbata dikin. Paşê jî hûn dibêjin; ‘ma em êşkencê li we dikin? Di dema îdareya borî de

hinek rewşên nebaş hatine jiyîn.’ Carek din jî ne mele, ne jî kesek din neyînin, em naxwazin. Hûn bi vî rêbazî tenê mirina me bilez dikin. Weke din jî kêrî tiştekê nayê.”

Yûzbaşi aciz bû; “ev nêrîna te ye. Dibe ku hevalên te yên din bixwazin. Tu bandor li wan jî dikî û wan birêve dibî.”

Ayselê jî li dijî vê nêzîkbûnê bertek raber kir û bi dengek qut qutî û hêrs got; “Em tev bi vîna xwe tevlî bûn. Ev pirsgirêka me hemûyane. Ma hûn dizanin hûn çi di-axivin?

Derve de malbat tembîh dikirin û gef li wan dixwarin. Pir xwezayî bû ku malbat bixwazibin me bibînin û mereq bikin. Lê dijmin jî di bersiva hinek şertan de ew derbasî hundir dikirin. Hewl didan bi axaftinên weke; “ji bona dev ji rojiya mirinê berdin hûnê zextê li ser wan bikin. Nexwe dê bimirin. Em jî têkil nabin, eleqeya me jî pê tine ye. Tiştên ku ji me dixwazin me derbas dikin. Hûn jî dibînin êşkence tine ye. Îdare hat guhertin. Hinek van birêve dibin. Zarokên we dixapînin. Ma ne heyfe” ve bandor li ser wan bikin. Heta hinek malbat ji mala wan anîbûn. Komek anîn hundir. Dayîka Aysel hem digiriya, hem dixwest em dev ji rojiya mirinê berdin. Digot; “ma hûnê bi vî şêwazî çi bidest bixin?” Lê dema em hemêz dikirin û radimûsandin, hêdîka li ber guhê min digot; “em hemû li cem we ne. Em jî dervede mijûl dibin. Mereq nekin. Tenê ji bona em bikaribin werin cem we hinek tiştan dibêjin. Nexwe dê ev kuçik nehêlin em bikevin hundir.” Kêfa me jî zêde ji nêzîkbûnên wan re dihat. Ji aliyê malbatan ve pişteWaniya çalakiyê kêfa me xweş dikir. Herî dawî got; “dema em ji vir derkevin, emê ber bi fermandariyê ve bimeşin.” Nexwe malbatan jî her ku dem diçû xwe birêxistin dikirin. Hêza çalakiya di hundir de pêk hatî, ravekirina yekîtiyê, malbatên me yên derve de jî anîbûn cem hev.

Di rojên serdanan de em dernediketin hevdîtinê. Destpêkê tenê komek derdiket hevdîtina rewşên heyî radigihand, an jî ji derve agahî digirt. Weke din jî di wê rojê de diruşme dihatin qêrîn da ku malbat jî baldar nêzî rewşa heyî bibin. Bangawazî dihatin kirin. Me dikariya em ji şibakeyên jorê ve dengê xwe bigihînin malbatan.

Her roja ku derbas dibû rewşa me jî giran dibû. Vê helandina fîzîkî herî zêde jî dijmin ditirsand. Lewma nedixwestin zêde li girtîgehê bigirin. Yekser hemû rakirin nexweşxaneyê. Dihizirîn ku dema rewşek awarte rû bide, bikaribin destwerdin. Ji ber ti xeterî nedidan ber çav.

Di maşînê de Selîm Çûrûkkaya û komek hevalên din jî hene. Li gorî wan digot rewşa giştî baş e. Derbarê dervede jî, agahiyên ku ji girtiyên nû hatîn girtine dibêjin. Li gorî wan behs kirî; "kom derbasî welat bûne. Baregehên binerd ên ji bona bîst-sih kesî tên amadekirin. Dem bi dem li dijî kesên sîxûr û hevkarên dijmin çalakî tên lidarxistin. Ev jî di asta komên biçûk ên propagandeya çekdarî de ne. Gel zêde kêfxweş dibe. Bes ji bona dema pêş amadekariya çalakiyên mezintir tên kirin." Carekê dengê xwe zêde kêm kir û got; "partiyê plan kiriye ku bi ser girtîgehê de bigire û me jî bi firokan birevîne." Di nava maşînê de leşker jî hene. Ew di navbera xwe de sohbetên kûr dikin. Berê zêde baldar li me guhdar dikirin. Lê niha eleqeya xwe bi me nayînin. Belê, ma berxwedanî çi ava nake!

Em demekê li nexweşxanê, li odeya rawestgehê bi hev re man. Em ji xwe hinekê çûn paşerojê geriyan. Mereq dikin çi li me kirine. Me jî bi xetên giştî ve hinek tişt vegotin. Tenê em

di-axivin. Fatma bêdeng û sar disekine. Di jiyana asayî de wisa nedihat tehemulkirin, niha jî em bi hev re diçin mirinê. Em bi hev re di heman çalakiyê de ne. Ji ber vê ji xwe re dihizirim gelo emê çawa bikaribin pê re bijîn. Mirovek çiqas ecêb e. Xwîşka wê Gûler a me jê re digot Çîllî ji wê zindîtir bû. Gerim nêzî mirovan dibû. Lê belê gav avêtin, axaftin, meş, awir û hwd her tiştên Fatmayê piç bi piç bi hesab, yê miqabilî xwe dixist nava zehmetiyan. Dema mirov dikariya di rêwitiya mirinê de her kêliya jiyanê gerim, xweşik, dagirtî û durist bijî de, dema nêzîkbûnên wisa mirov aciz dikin derdiketin holê bêhna mirov jî teng dibû. Divê mirov bi ken û govendê biçe mirinê! Lê mirov bizanibe li hember wê jî bi înat çi tişteke ya jiyanê hebe, nirxên wan bizane, bê ku mirov wan bi-êşîne, hincirîne, cewhera wê bişkîne biparêze. Ev jî, di heman wateya mirov dizane çawa bimirê de ye. Nexwe dê mirin ji rêzê, jiyan jî jirêzê be. Heman tişt hesîn, di bedewiya giyanek hevbeş de hevgihîn, yekser bi hêz girêdana bi armancê dide diyarkirin. Ev, kûraniya di baweriyê de, herikbariya di evînê de, hêza hevbeş hemêzkirina zehmetiyan û moralê jî ava dike. Nexwe weke din mirov nikare li cem hevbûnê û li kêleka hevbûnê pênase bike.

Di blokek nexweşxaneyê, li odeya girtiyan a qata jorîn em, di bloka din û korîdora jêr de girtiyên xort hebûn. Em birin cihê me. Me herî dawî serkeftin ji hev re xwest û got; “heta ku hevalên saxlem û hevalên endamên ji komîteyê neyên, heta em bi wan re ne-axivin, emê çalakiya xwe berdewam bikin” û em ji hev cuda bûn.

Beşa ku em lê diman, beşa zayîna jinan bû. Hema her şev di berbangê de zayîna jinekê pêk dihat. Qêrînên tifalên (bebek) nû weq weqa wan û qêrînên wan guhê me ker dikir. Aliyekê rojiya mirinê bû, aliyê din jî çavên xwe li jiyanê vekirin hebû! Ger dema ew zarok mezin bûn, hinek hebin ji wan re bêjin, dê ew jî bêjin; " dema ez ji dayîk bûm, li heman nexweşxaneyê, li odeya ku leşker ber bi çek nobet digirtin de, hinek di rojiya mirinê de bûn." Dê wisa jidayîkbûna xwe bibîr bînin.

Malbatên me anîn wir jî. Vê carê malbatên me hersêyan bi hev re hatin. Heman şêwazî li cem serbaz û leşkerên erkdar digiriyan û diloriyan. Lê bêdeng jî behsa karê ku kirine dikirin, çûne kuderê, ji bona avakirina raya giştî çiqas hewl dane. Gotin; "me şandeyek şandiye Enqereyê. Em heta ber bi cihê Walî ve meşiyan. Em çûn cem Kolordu. Me îdare kir nav zehmetiyan. Me daxwazname nivîsandin."

Ev tişt baş bûn. Lê li hember rewşa me jî nedikariyan gumanên xwe veşêrin. Êş dijiyan. Girî, ser hiş çûyîn, di demek kin de porên xwe spîkirin, hemû ji jana ku dijiyan bûn. Em jî ji wan re behsa pêvajoyan dikin. Dema em behsa tiştên ku dijmin kirine dikin, zêdetir bandor dibin. Em hewl didin bi wan bidin fêmkirin ku jiyan çiye. Dengê qelebalixê, gengeşê, girî û lorînên wan hemû têkilhev dibin. Vê jî em diwestandin û hêza me winda dikir. Lê dîsa jî diviya em jî bi sebir bi wan bidin fêmkirin. Em ji wan re dibêjin divê li hember lîstokên dijmin tim şiyar bin. Divê di navbera xwe de yekîtiyê ava bikin. Em ji wan re dibêjin, li şûna ku jiyîna ku dijmin ferz dike, emê bi dehê caran bi onura xwe bimirin baştire. Lewma divê vê çalakiyê jî wisa binirxînin û me biryardariya xwe ji wan re got.

Êdî ew jî zêdetir cidiyeta vî karî, rastiya wê, taktîkên dijmin ên wan li hember me dide bikaranîn fêm dikin. Her ku fêmkirina wan zêde dibû, rêzdariya wan jî zêde dibû. Her wiha derve de jî zêdetir dibûn xwediyê hewldanê. Taktîkên dijmin li dijî dijmin bikaranîn gelekî girîng bû.

Carê rêveberiyên nexweşxaneyê, bînbaşi, rayedarên Kolordu, îdareya girtîgehê tên nîqaş dikin. Her carê jî heman peyvan dikin. Her carê dibêjin emê seqet bimînin, em bi vî rengî jan dikişînin û dixwazin em devjê berdin. Di nava personelan de jî yên bandor dibûn hebûn. Bi riyên malbatan, li hember roj bi roj helandina me, doxtor, hemşireyên mat diman, di-axivîn, di nava tirsê de dişopandin jî hebûn. Lê bi gelemperî jî berhemên heman hişmendiya berovajî bûn. Zimanê wan ê xwe tenê bi hinek gotinan ve girêdaye, heman tişt dubare dikir.

Roja çalakiyê ya 27. e. Hevdîtin hatine kirin. Hinek din nû anîn nexweşxaneyê. Ji ber di navbera me û hevalan de rojname tên û diçin, pêşketinên heyî veşartî û bi notên kin ve radigihandin.

Heman rojê bangî Ayselê kirin. Bi Selîm re hevdîtin kiribû û Selîm gotibû çalakî bi encam bûye. Du hevalên ji komîteyê hatibûn û çûbûn. Ne hatibûn serdana me. Dema Aysel vegeriya wisa got. Min jî bertek raber kir; "ev çi hevdîtine wisa? Ger hevalên ji komîteyê heta nexweşxaneyê hatibin, dê bi me re jî hevdîtinê bikin. Ez bawer nakim. Gelo rewşa Selîm çawa bû? Kî li cem hebû? Gelo dijmin lîstokan li ser me neke. Dîsa we li dijî hev nedê bikaranîn?" Got; "Selîm bêhal bû. Ne dikariya bi-axive." Dîsa min bawer nekir got; "nexwe çalakî bi encam bûye diviya moralê wî bilind bûna, zêdetir bi zindî bûna. Na,

heta em tam pê qane nebin û hinek tiştan nezanin emê çalakiya xwe berdewam bikin.” Me notek nivîsand. “em çalakiya xwe berdewam dikin. Heta ku hevalên ji komîteyê neyên emê bidomînin.” Erkdar nota me nadin wan, lê ji wan re dibêjin ku em çalakiya xwe berdewam dikin. Şev cardin Selîm hat. Vê carê anîbûn qoxuşê. Got; “min ji we re hinek tiştên sivik weke şîr jî aniye. Hûn çima wisa dikin. Piştî me hevdîtin kir, me çalakî bi encam kir. Riza wan hatin û çûn. Dê hemû qoxuşên li girtîgehê bigerin. Destpêkê hatibûn vêderê. Ma hûn bi vê bawer nakin.”

Min jî got; “kî dibe bila be, pirsgirêk ne bawerkirin, an jî nebawerkirine. Bi hezaran lîstokên dijmin hene. Ev ne karê zarokane. Divê em her tiştî saxlem bikin. Her wiha çawa bi encam bû? Kîjan daxwazên me hatin qebûlkirin? Ma hemû daxwazên me yên bingehîn qebûl kirin?”

Got; “dê êşkence û zext nebe. Dê emîr-komuta rabe. Daxwazên din jî hema bêje tev hatine qebûlkirin. Hinek mijarên biçûk ên weke dê ji serbazan re ‘fermandarê min’ were gotin hebûn, emê wan jî di nava jiyanê de rakin.”

Min bersiva wî da; “me heta niha ji wan re negotiye ‘fermandarê min’, emê ji vir û şûnde jî qet nebêjin. Nexwe her ku emîr-komuta rabûye, şertek wisa dana pêş neraste. Em dibînin ku hevdîtin û hesabên di van mijaran de baş nehatine kirin û zelal nebûne. Wer xwuya dike peymanek bi tawîz û şertan pêk hatiye.” Her wiha ji ber bi me re jî hevdîtin nehatiye kirin, me rexneyên xwe jî li wan kir. Ev mijarên cidî ne. Mînak hinek mijarên em qebûl nakin hene. Ma niha em sê kes vê çalakiyê bidomînin? Ger wisa be wê demê emê dijî biryara

rêxistinê derkevin. Gumanên me yên pir cidî li hember hevdîtina Selîm a destpêkê çêbûn. Ji ber tevlîbûna me ji Rojiya Mirinê ya Tîrmehê re jî Selîm asteng kiribû. Dibe bertekek me li dijî wî hebû, ev bertek jî di bin hişê me de hatibûn rûniştandin.

Belê, me rojiya mirinê bi encam kir. Lê dîsa jî şikestinek bi me re heye. Ji min re hinek tişt berovajî dixwuyan. Qane nedibûm. Çima ji nişkê ve her tişt qediyabû? Di roja 27. de bû. Her tişt negihabû asta mirinê jî. Me jî got; "emê di meriyetê de pêk neyînin. Lê ger hinek tiştan ferz bikin, emê jî hinek tiştên din pêş bixin." Piştî ku em demek din jî li nexweşxaneyê man, em derbasî girtîgehê bûn.

Ji dînên PKK'ê jî ditirsin!

Çalakî xilas bû, lê belê wer diyare çalakiyên navxweyî destpê dikin. Di wê kêliyê de êşkende û zextên ew sê salbûn berdewam dikirin, di wateya çorsî de rabûn. Demjimêrên hevdîtinan ji yek-du xulekan derbasî deh-panzdeh xulekan bûn. Êdî sirûd nedihatin xwendin. Me bi pereyên xwe ji qantînê tişt dikiriyan. Pirtûkên di sûkê û lîsteya girtîgehê de neqedexe û nexeternak didan me. Hevdîtinên me yên bi parêzeran re rû bi

rû di bin venêrîna leşkeran de pêk dihat. Bi giştî aramî û hedarek û van mijaran ava kirî hebû. Lê dîsa jî yekser di nava çalakiyê de jî derket holê ku, xirabûna zêde ya bi kesayetan re, tengezarî, acizbûn, harbûn, ferdperezî û takekesî herî zêde jî di vê pêvajoyê de derket holê. Ger hinek din rojiya mirinê dirêj bidoma, wê bêbawerî û paşve ketinek bihata jiyîn. Ev meyil jî hêdî hêdî derdiket holê.

Êşkence û zextan di wateyekê de yekbûna me ava dikir. Lê ji aliyek din ve jî di hundir de texrîbatên mezin ava dikir. Ji ber dema kîn, hêrs û bertekên li dijî dijmin li ser bingehek zanebûn neyên rûniştandin, diyardeya dijminatî bi her awayî rast neyê nirxandin, xisleta şerê çînî, aliyê wê yê dîrokî û rojane neyê zanîn, zext û zora ji derve de tê, dikare diyardeyên ku hedef dike ji hundir ve zû bişkîne, hilweşîne û birûxîne. Aliyên ku êrîşî hev dikin, yekser dibûn aliyên ku dişibin hev. Bertekên li hember derve, li hember aliyên hevûdû yên wekhev jî dihatin raberkirin. Jixwe xeternakî di vir de bû.

Diviya nakokiyên heyî rast werin şerkirin û çareserkirin. Ji ber Gonûl ne di rojiya mirinê de bû hem şikestî bû, hem jî bibertek bû. Hinek hevalên din jî yên xwedî bertekên wisa hebûn. Lê me rêya duyem a postayê hem ji Gonûl, hem jî ji yên din re vekirî hişt. Her kesê ku li girtîgehê bû, ne di rojiya mirinê de bû. Riza jî ne di rojiya mirinê de bû. Lewma em di vê manê de qebûl nakin weke nêzîkbûnek bêbawerî were nirxandin.

Pirsgirêka sereke mirov bizanibe di nava rewşa wê pêvajoyê ava kiriye de rast tevbigere û bijî. Dijmin ji aliyekê ve dij-paropagandeya çalakiyê dike, dibêje; “jixwe ew ber îdamê

ne, mirinê dixwazin. Ji bona propagandeya rêxistinê bikin û peyam bişînin derve van tiştan dikin. Maf wisa nayê girtin.” Ji aliyê din ve jî yûzbaşiyê nû xwe nerim dida nîşan, polîtîka û taktîkên sînsî di rojevê de digirt û dimeşand. Îdare bi girtiyan re di-axivî, tişta li ber çav nûneran muxatap digirin. Di wateya çors de êşkence tine ye. Radeya xwarinan li gorî berê baştir û zêde ye. Ango hinek başî bi giştî hatine kirin. Lê di nêzîkbûna ji daxwazên çalakiyê yên giştî re, durûtiyek heye. Her tim bi propagandeyek berovajî ve çalakî xirab dan nîşan, her tişt weke ku wê ti caran pêk neyên destnîşan dikirin. Îdarê digot; “ji bona em dixwazin em dikin. Nexwe ne ji ber ên di rojiya mirinê de xwestine em dikin.” Hewl didan nêzîkbûnek wisa bidin bawerkirin.

Bi taybet jî yê yûzbaşî bû ev vekirî dikir. Ev jî bandor dikin. Weke din jî rêxistinbûna hundirîn lewaz e. Hêj belav e. Hêj girtiyan di navbera xwe de rêxistinbûnek saxlem ava nekirine. Di pêvajoya borî de her kesî kêm zêde kêmasî kirin, lewazî hatin jiyîn û qelsiyên kesayetî derketin holê. Lewma ev aliyên ku ser hev kom bûne ji nû ve diteqin. Gelek meyîl û ferasetên şaş xwe didin der. Hinek jî dibêjin; “ger her tişt baş be, bi rêxistin û partiyê re peywendî pêş bikevin, dê dîsa hesabê her tiştî were pirsîn, hesab were dayîn û rewşa her kesî jî derkeve derve.” Bi vî rengî jî tevgerek bi guman heye. Ji ber gumanên kesane yên bi vî rengî, bûyerên ku rojane rû didin rast nayên nirxandin. Dema nêzîkbûnek li hember kesayeta wan hat kirin, hingê dengê xwe derdixin. Vê jî asta radeya xirabûnê diyar dikir.

Baş bu ku em zêde li nexweşxaneyê neman. Her kesî destpêkê bi kêfxweşî em hemêz kirin, tam rewşek cejnê heye.

Lê yekser pey wê re hêrs û bertekan xwe dan axaftin û derketin holê. Giliyê hev kirin, gazinc, tewanbarî, axaftinên kena xwe li hev dikin, li her naverastê belav bûn. Ev ji aliyekê ve xwezayî bûn. Şikandina qalibên rastiyekê bûn, ango ronîbûna rastiyekê bûn. Dibe ku di qoxuşa jinan de kesek vekirî îtîrafkar û îxanetê bike derneketibû. Di vê mijarê de yên kesayeta wan di xeteriya xistinê de bûn, hatibûn rizgarkirin. Lê potansiyelek xirabûn, bertek û bêbaweriya hundirîn pêş ketibû.

Em bi rojane li ser van di-axivin û nîqaş dikin. Diviya em kesên ku pêxirtengiya navxweyî dijîn sererast bikin. Ji hiş çûna Gonûl berdewam dike, heta zêde jî dibe. Êdî em pir vekirî pê re axivîn. Ji ber bi îdarekirina hinek tiştan ve pirsgirêk nedihatin çareserkirin. Dibe ku ev ji bona hinek kesayetan dirêj bajo, lê diviya êdî Gonûl bi ser xwe ve were. Me jê re got; “an derkeve biçe, yan jî bibe ya me, bibe ya xwe.” Ji ber van gotinên me jî mat bû. Giriya. Demekê bêdeng ma. Paşê rewşa ji dema lêpirsînê heta kêliya niha vegot.

“Min nekarî berxwedaniya ku dihat xwestin di lêpirsînê de raber bikim. Li xwe mikurtî hebû, ez jî li xwe mikur hatim. Hema bêje hemû hevalên ku qada min lê kar dikir hatin girtin. Tiştek ku derneketî holê nemabû. Min jî hinek tiştên derbarê xwe de qebûl kirin. Dîsa di mijara têkîliyên min ên bi Riza re de hinek tişt çêbûn. Têkîlî û nêzîkbûnên hinek hevalên me bi hev re li Rihayê kar dikir, ji min re cuda bûn. Bes vê jî çavkaniya xwe ji lewaziyên min digirt. Rexne çêbûn. Fesadî çêbûn. Min hemû jî bi kamilbûn pêşwazî kirin û nêz bûm. Ango ev pirsgirêka di têkîliya di navbera min û Riza de bi min ve girêdayî bû, lê di pêvajoyên pey re bandora xwe kir.

Ya rastî min weke ku zêde bi Riza ve girêdayî me dida nîşan. Lê di cewher de ew girêdan tine bû. Di dervedebû û nêzîkbûnek sixte bû. Min di rapora xwe ya yekemîn a derbarê pêvajoya lêpirsînê de zêde behsa van mijaran nekir. Tengezariya vê jî hebû. Weke ku min hinek tişt vedişartin. Di pêvajoya girtîgehê de jî peywendiya bi îdareyê re di asta nûnertî de min peywendî dimeşandin. Zêde baldar nêz nedibûm. Min nedikariya li dijî nêzîkbûnên dijmin helwestên bibiryar û birêgez raber bikim. Dema heval jî zêde bi ser min de hatin, min jî bi temamî xwe girt nava xwe û ji derve re girt. Li hember min bêbaweriyek heye. Ev jî bandor li min dike. Ez dizanim sedemê van tevan ez im."

Ez jî destpêkirinek bi vî rengî erênî dinirxînim. Min got; "temam, dibe ku van bandor li te kiribe. Lê divê tu her tim bi heman mijaran ve asê nemînî. An tu xwe diçewsînî, xwe ji her tiştî re digirî, an jî tu di hinek mijaran de zêde xwe ferz dikî û pêk tînî. Her du jî te tengav dikin. Dibe ku em jî di vê mijarê de zêde bi ser te de tên. Lê tu dizanî ku em di girtîgehê de ne. Em her kêlî bi dijmin re rû bi rû ne. Lewma nêzîkbûnek te ya ji nişka ve derdikeve, di heman kêliyê de hem dijmin û hem jî girtiyan bandor dike. Berî her tiştî bila navberek di neqeba te û van zilaman de hebe. Ji bilî tiştên ku hewce dike ne-axive. Em tev nîqaş dikin, lê sînorê wê jî heye. Ew dijmin e. Bi rastî jî ne ku ji bona hinek rastiyan ji me hîn bibin, bi me re nîqaş dikin. Divê tu di ferqa vê de bî."Vê axaftinê heta demekê Gonûl li ser piyan girt. Me di meriyetê de jî tevlî her nîqaş û biryarê dikir. Hinekê zindî bû. Her ku ew xwe rast dike, ji aliyê derdor ve jî nêzîkbûnên erênî li hember wê tên kirin.

Em pirsgirêkên din jî zêde nîqaş dikin. Hewce bike yek bi yek, hewce bike kom bi kom bi hevalan re nîqaş dikin. Zehmet e ku mirov pirsgirêkên pêvajoyên wisa giran û têkilhev di kêliyekê de çareser bike. Ji ber her tişt xwe dispêre paşerojê. Lewma divê dema em ber bi pêvajoyek nû ve diçin, her tiştê ku hatiye jiyîn baş werin destgirtin û şîrovekirin. Em jî hinekê li ser mijarên rojane, bûyerên di demên dawî de hatine jiyîn radiwestin. Em jî ji bona nirxandina pêvajoyê ya giştî li benda hevala ne. Em ji xwe re dibêjin, dê rêxistina girtîgehê perspektîfên di vê mijarê de ragihîne. Ji ber bendewariyên me jî ev in.

Pir vekirî bû îdareya girtîgehê rewşa nû qebûl nedikir. Carekê dema heval li nexweşxaneyê ne, ji wan re dibêjin; "mafên çi, lihevkirinên çi û hesabên çi?" Abdullah Kahraman li hember peyvên 'lihevkirin û hesaban' bertek raber dike, tehemula xwe tine ye ku wan weke tavîz an jî binkeftinekê qebûl bike.

Heman tişt ji malbatan re jî tê gotin. Hewl didin ku bandora çalakiyê bişkînin. Pirsgirêkên bêhnvedanê (havalandirma) derdikevin. Ferz dikin ji serbazan re bêjin, 'fermandarê min' û yek-du rêzên sirûda Îstîklalê were xwendin. Dibêjin; "ev bi nûnerên we re jî hatine axaftin. Ger hûn van pêk nayînin, emê mafên din jî paşve vekişînin. Ger hûn di rêzê de nemeşin, hûn nikarin derkevin bêhnvedanê. Hûn ne di rêzê de bin, hûn nikarin biçin hevdîtinan." Gelo çi dibû, ma emîr-komuta wisa hatibû şikandin? Vekirîbû dijmin hezim nedikir, lê dîsa jî her tişt bi ewle nebû. Ji ber derd û kulên me, qofika ('kambura me') hebû. Dijmin di hinek mijaran de her

tişt desteser kiribû. Diruşmeyên di çalakiyê de hatibûn qêrîn, bûn mijarê dozên nû. Bi gelemperî di dadgehan de ji bona paraznameyan dozên cuda tên vekirin û ev jî berfireh bûne. Tişta ku li cihekê sist dike, ji aliyê din ve dişidîne!

Rojnameyan jî piştî ku 'nûçeyên girîng' jê dikin, wisa didin. Heta ku yek bikaribe pirtûkekê bigire, bi hêceta 'tê lêkolînkirin' mehan li bendê dimîne. Daxwaza nûneran a hevdîtinê tê redkirin. Naverastek tam şêlû ye. Hem dibêjin erê, hem dibêjin na! Di demek kin de gelek tiştên ku hatibûn desteserkirin beşek girîng cardin paşve girtibûn. An jî qet jîndar nekiribûn.

Em jî yek-du pirtûkên ku dikevin dest, dixwînin. Em pirtûkên Orhan Hançerlîoxlu û hinek nivîskarên din weke xebata perwerdeyê bikar tînin. Em dixwînin û li ser wan nîqaş dikin. Em gotar, nivîsên lêkolîn-lêgerînan ên di rojnameyan de jî weke beşek perwerdeyê bikar tînin. Heta em hinek pirtûkên xwendevanên hatine girtin û anîne jî wisa ji xwe re dinirxînin.

Hevalan carê bidevkî agahî dişandin. Derbarê helwesta îdarê, çi dixwaze bike û em dikarin li dijî van tevdîrek çawa bigirin de nîqaş tên kirin. Nêrîn û pêşniyar jî tên xwestin. Gelek kêliyên êşkenceyên giran û çewsandinê hatin jiyîn. Pêdivî bi henaseyekê heye. Ev çalakî jî her çendî kêm be, ev encam derxist. Lewma divê em rast binirxînin. Dijmin hinek daxwazên me bicih nayîne, zehmetiyan derdixe. Ev jî xwezayî ye. Dibêjin; "hûn nikarin bi berxwedanê hinek tiştan bidest bixin. Em çi dibêjin dê ew pêk werin." Ne dixwestin tirsa li ser kesan were şikandin.

Notek jî bi nivîskî hat. Di notê de; “di peymanê de tê gotin ku dê hefteyê de carekê sirûda Îstîklalê were xwendin, sond were dayîn, ji serbazan re ‘fermandarê min’ were gotin. Her wiha ev îdare van li hember me dide bikaranîn. Dibêjin ku ‘ger hûn van pêk neyînin, em jî daxwazên we pêk nayînin.’ Em jî dixwazin wext bidest bixin. Peywendiyên di navbera qoxuşan de qutin. Kes nizane di pêvajoya borî de kî çi kir, çi bû û hwd. Ger em rêxistinbûna xwe ji nû ve saz nekin, em nikarin zemînê berxwedaniyek bi hêz pêş bixin. Lewma bila her kes li gorî peymanê guncav tevbigere. Ka biceribînin, îdare dixwaze ji aliyê eniya xwe ve çi bike? Em neçarin ku hemû hêcetên di destê wan de hene, ji wan bigirin.

Vê notê bêhna min teng kir. Jixwe ev demek dirêj bû me ev nedigotin û bi taybet nekarîn “fermandarê min” bi me bidin gotin. Ceribandin lê nebû. Dema di hilbijartinan de nûner hejmar got carekê bikar anî, ew jî paşê hat rakirin. Me hemû qural çeloxwarî kiribûn, an jî me piraniya wan pêk nedanî. Niha cardin ev û nexasim di roj û demjimêrên ku wan destnîşan kirine de gotin, paşde ketin û pêkanîna fermanên fermandariyê ne. Me jî got; “em dizanin ku biryara rêxistinê ye, lê mixabin emê pêk neyînin. Em dizanin ku ev jî sucek rêxistinî ye, lê ev biryara ku hûn li ser me ferz dikin, siyê datîne li ser berxwedaniyê û reş dike.” Min weke vê gelek tiştên din jî nivîsandin. Hevalan jî notek din a helwestên me rexne dikir şandin. Dîsa jî digotin; “hûn dizanin.” Destpêkê bi navê nûneran, paşê komî, pey wê re jî yek bi yek ji malbatan re gotin. Malbatan jî bi komî daxwazname dan, fermandariya Kolordu ya 7. Me parêzer kirin liv û tevgerê, lê ew ji malbatan zêdetir belangaz bûn!

Li hember vê jî giştînameya nû hatî weşandin dan me. Di giştînameyê de: “Her girtiyek leşker e. Dê weke leşkeran tevbigere. Wê ji xwarina wî bixwe…” nivîsandibû û ev giştîname jî wisa dirêj dibû. Weke din jî axaftinên cilên yek tîp hebûn. Me tam nedizaniya çawa ye û çiye. Tenê cilên xet xetî yên ji filmên Emerîkî di hişên me de mane, tên bîra me. Gelo dê ji bona me jî daw (etek) û gomlek, an jî derpî û gomlek bidûrin? Heman weke derpiyên dayîkên me. Em jî di navbera xwe de dibêjin; “emê bi wan werzîşek baş bikin” û kena xwe dikin. Ev aliyên wê yên henekî ne. Lê divê em cidî nîqaş bikin û bihizirin ku divê em çi bikin.

Heval di vê mijarê de jî agahiyên hişyariyê ji her kesî re dişînin. “ ev êrîşek li dijî berxwedaniya Îlûnê ye. Yek tîp hêcete. Bes dê kes li ber xwe neke. Ji ber ev nêzîkbûn ji avakirina kesayetek yek tîp zêdetir tiştek din nîne.”

Her kes di bin pantorê xwe de cilên zêde li ber xwe dike. Çend cilên binî li ser hev dixe ber xwe. “ger me neçarî li xwe kirina yek tîpan bikin, ev jî tevdîreke.” Bes aliyên vê yên eyb jî tên nîqaşkirin. Hinek kesên weke ku hatine tazîkirin şerim jî dikin hene. Yên bêhna wan teng dibe jî hene. Wê demê dihat hizirîn dibe ku dijmin gelek tiştên kirêt jî biceribîne. Dihat gotin; “ ger leşker gelek jinên heta nîvî tazî bibîne dê teqez êrîş bike.” Lewma çi dibe bila bibe, dê kes cilên yek tîp li ber xwe neke. Ev jî biryarek zelal û mîsoger bû. Dê yek gav jî ji destkeftiyên berxwedaniya Îlûnê paşve neyê avêtin. Dê barên qofik ên li ser piştê jî bihatan derbaskirin. Em jî xwe wisa amade dikin.

Dihat gotin ku hinek heval avêtine hucreyan. Ev hucreyên kor bûn. Hêcet jî; "li dijî leşkeran derketine, heqaret li erkdaran kirine." Ji ber kes dernakeve bêhnvedanê nexweşî jî zêde bûne. Rengê rûyê hemû hevalan jî zer bûye. Em jî dema heval diçin revîr, an jî dadgehan dibînin.

Ji bilî me û çend kesên ji komên din hema tev hatin berdan. Hemû jinên ji TKP'ê (Partiya Komînîst a Tirkiyê), an damezrîner, an jî rêveberiyên Komaleya Jinên Pêşverû (ÎKD) bûn. Dijmin zagonên xwe li ser wan pêk netanî. Ji ber yên ku esasî pê mijûl dibûn em bûn. Ango PKK bû. Abdullah Kahraman di wextek ew û em amade de pir vekirî, ji yên TKP'ê re hevalên me yên ciwan di temenê sêzdeh û çardeh salî de nîşan da û got; "ez ji van zarokên PKK'ê ditirsim. Bes ji we qet natirsim. Bi qasî ku ji dînê wan jî ditirsim, ti caran ji qadroyên pêşeng ên komên din netirsiyame. Dînê wan jî dibêjin, 'Bijî Komînîzm, Bîjî Kurdistan'" dema ev got, em jî şahnaz bûn û keniyan. Axaftinek rast û di cih de bû. Cara yekê tiştek rast digot. Lê weke din jî tam marek bû.

Dema ew li qoxuşê bûn, helwestên wan ên li hember dijmin û şêwaza jiyana wan bi her awayî bandor dikir. Lewaziyên wan ew dikişandin. Bi êş û heyfî li hevalan dinêriyan. Li gorî wan ev keçên ciwan di temenek biçûk de şewitîbûn! PKK'ê ew şiwitandibûn! Nekarîbûn jiyana xwe bijîn, nekarîbûn zarokatiya xwe bijîn! Tam zimanê dijmin e. Di vê mijarê de dijmin sucdar nabînin. Li gorî wan ên sucdar em bûn. Partiya me bû. Qaşo cunta jî ji ber me hatibû! Li gorî wan dilxwede êşkence jî ji ber nêzîkbûnên me yên Donkîşotî ketibû meriyetê! Li hember me evqasî bibertek bûn. Ji ber jiyana wan

xirab bû, bertekên wan ên esasî jî ji bona vê bûn. Ev şoreş jî ji kur derketibû. Kurdewarî û PKK ji kur derketibûn? Ji xwe re li Komaleyan xweş û baş şoreş dimeşandin!

Mixabin çiqas bi êş bû, kesên wisa jî dihatin girtîgehê û diçûn. Bi rastî jî dijmin ehmeqiyek mezin dikir. Me ev ji bona çi danîn? Dema min nêzîkbûnên wan ên kirêt li hember şoreşê didît, li hember wan ji girtîgehê jî dihesidîm. Diviya ew ne li vir bûna. Bila hemû barê şoreşê yê giran ji me re be. Bila girtîgeha wan jî ya me be. Ma van kesan ji bona çi tînin? Dê sibe bêjin; "em jî di girtîgehan de mane" û ji xwe re bikin sermiyanek jiyînê. Em jî bi acizbûn dibêjin heyf û li ber dikevin.

Belê, êdî em xwe bi xwe mabûn. Êdî peywendiyên me yên navxweyî zêdetir gerim dibin. Madem dijmin dixwest vê girtîgehê ji me re bike zindan, madem cardin rojên berê ferz dike, wê demê divê em jî berdêla vê çi dibe bila bibe li dijî derkevin. Tenê ev jî fêmkirin, ji bona bi hev re pêşwazîkirina rojên herî zehmet bes bû.

Mirov bi bedena xwe re şer dike her organek mirov eniyekê vedike!

Tengezarî zêde dibe. Di çûn û hatinên dadgehan de bi hêcetên cur be cur lêdanê dikin. Ên di dadgehê de di-axivin wan davêjin hucreyan. Me jî bi vê mebestê di gelemperiya girtîgehê de 5 roj giştî rojiya birçîbûnê bi armanca hişyariyê da destpêkirin. Di dawiya Sibatê de bi êrîşê bersiv dan me. 1'ê Çileya 84'an de yekser berxwedanê destpê kir. Dijmin berdêla wan sê-çar salan tevgerek dijber dabû destpêkirin. Yekîneyên

taybet anîbûn. Dema yên çûyîn dadgehê vedigerîn êşkence li wan dikirin û dîsa qural dihatin ferzkirin. Her kesî dizaniya ku dê tiştek neyê qebûlkirin. Lewma dijmin di êrîşên destpêkê de encam nedigirt.

Me ji roja destpêkê ve barîkat ava kirine. Hinde me dîwanên hesin û mase baş bicih kirine, me li ber derî tam dîwarek ava kiriye. Her dolabek ji pola bi qasî mezinbûna derî ye. Navbera du deriyan teng e. Lewma dîwar jî alîkariyek erka xwezayî didin me. Ew jî ji tirsan nikarin deriyê derve vekin. Ji mazgalê dinêrin, lê dolabên pola dihatin dîtin.

Ji bona dema narîncokên mijê hatin avêtin, em bê ewle neyên girtin, em her tim çavderiya kunên mazgalê jî dikin. Me heval hişyar kirin. "Ger narîncokên mijê werin avêtin, bila her kes xewliyê, an jî paçek din şil ber bi rû û bêvla xwe bigire. Weke din tiştek tine ye. Bandor nake." Em bi lalîkan li hesinê şibakeyan, mazgal û deriyan didin. Gengeşeyek erjeng heye. Em jî êşkenceyan wisa protesto dikin. diruşmeyan diqîrin û sirûdan dibêjin. Tilîliyan didin. Helbest tên xwendin. Ji ber weke din amûreke din a êrîşê em bikar bînin tine ye.

Qoxuşa jorîn li hember êşkencexaneya herî mezin a bi navê cihê sînemayê bû. Mazgalên wan tam miqabilî hev bûn. Ji ber salon vala bûn, mirov tevgera yên di hundir de pir hêsan pê dihesiya. Bes mirov halên wan ên nivçe didît. Beşa heta serî an jî ser milan dixwiya. Tiştên weke dîwanan tine bûn. Salonek vala bû. Ji ber salon bilind bû, dengên heyîn vedidan. Em jî van dengan hem ji mazgalan dibihîsin, hem jî dengê ku ji aliyê şibakeyan ve dide der, em jî ji şibakê dengê hemû qoxuşan dibihîsin.

Kom bi kom, qoxuş bi qoxuş anîn eywana sînemayê. Êşkenceyên weke kuçik diberdin mirovan, elektirîk, falaka, tazîkirin û her cure çi hebe dikin. Tam navendeke êşkenceyê hatiye avakirin. Êdî em ji ber dengên êşkenceyan nikarin li ber xwe bidin. Ne qêrîna diruşmeyan, ne li derî û şibakeyan xistin, ne xwendina sirûdan, tiştek rehet nake. Tişta ku her kes dibêje tenê peyvên weke "ketîno, çima hûn bi ser me de nayên?" Ji ber bi dijmin re rû bi rû mayîn, li hember êrîşên wî hêrsa xwe mezinkirin gelekî cuda ye. Weke din mirov xwe bi xwe dixwe. Lê dijminê miqabilî te, li ber çavên te, bi qasî tu dengê wî bibihîsî êşkenceyê li hevalên te dike. Ew qêrîn, ew nalîn û ew ax û jan ji guhê me dernakevin. Na, dernakevin… Qêrînên weke, "Na, ez nabêjim! Na, ez li ber xwe nakim! Na! Na! Na!" Di wan kêliyan de mirov tenê dikare bêje, ez qurbana wan peyvên 'Na' bim!

Belê, dema me ew qêrînên, "Na" dibîhist, biriqandina ji çavan dibariya, ew şahnazî û kêfxweşiya ji çavên aciz û bi hêrs dibariyan û belav dibûn cuda bû. Bi dehên caran dihat dubarekirin ew deng. "Ma we bihîst? Na, ez li ber xwe nakim." Min ew deng nas kir; "Ma we bihîst? Dibêjin Na, em li ber xwe nakin." "Ma we bihîst? Dibêjin Na, ez nabêjim." Di navberê de jî dengên; "ax, ay, of" dihatin bihîstin. Di wan kêliyan de dengê qêrînên dilên me parçe bikin dihatin me. Her ku diçû deng bilind dibûn. Me jî diruşme diqêriyan û sirûd dixwendin. Me digot; "bênamûsan, ketîno! Hûn çima ser me de nayên?" Me jî dixwest bi van rêbazan êşên heyîn kêm bikin.

Me ewqas salan êşkence jiyan kiribû. Niha jî me nedikariya wan dengan rakin. Ecêb me sebrek çawa li dijî wan êşkenceyan raber kiribû? Gelo bertekên me miribûn? Gelo qalikê dilê me hişk bibû? An jî zimanê me lal bibû? Lê me niha nedikariya li hember van dengan li ber xwe bidin. Em niha jî nikarin bêdeng bimînin. Qalikê me şikestibû û tarîtî hatibû qetandin.

Barîkatên me jî weke, barîkatên me di pirtûkên derbarê pêvajoya berxwedaniya Komîna Parîsê û di şerên din de hatine danîne de bûn. Li kolanan gel û yekîneyên berxwedaniyê barîkat ava kirine û şer kirine. Tiştên ku di roman û filman de dihat gotin, li ber çavên min zindî dibûn. Lê me di nava şert û mercên herî xirab û newekhev de barîkat ava kiribûn. Çeka me bawerî û vîna me bû. Bedenên me yên tazî bûn. Niha jî tenê zimanê me di-axivî. An jî dikariya şer bike. Me li şûna fîşekan dengê xwe diberda naverastan.

Beriya berxwedanî tam destpêkê, me di navbera xwe de got; "dema yekser êrîşek çêbe, emê çi bikin?" Dema êşkenceya destpê kir, karê destpêkê me barîkat ava kirin. Diviya dijmin wisa hêsan xwe negihandiba me. Dibe ku deriyan, dîwaran bişkîne, heta hesinên şibakan bişkîne wisa bixwaze bikeve hundir, lê bila heta karî bikeve hundir, gelekî mijûl bibe. Diviya hêsan negihê me. Em çiqasî bikaribin zehmetiyan ava bikin, dê me ewqasî moralê wan bişkanda. Paşê em pê hesiyan ku bi gelemperî hinek qoxuşande barîkat hatine avakirin. Cihên ku karîne barîkatan bişkînin û bikevin hundir de, êşkenceyên komî kirine. Girtiyên bi zorê ji qoxuşa derxistine birine eywana sînemayê kom kirine, li wir jî yên karîne radest bigirin girtine,

yên radest nebûne û cilên yek tîp qebûl nekirine ku li ber xwe bikin tev, tazî kirine da ku wan neçarî li xwe kirinê bikin. Yên quralên wan qebûl dikir an dişandin heman qoxuşên wan, an jî dibirin blokan.

Me jî di şibakayan de qîr dikir, bangî qoxuşên din dikir, dixwest hinek tiştan bizanibin. Hinek tiştên me navbera blokên dûr ji hinek dengan dibihîst di navbera xwe de jî şîrove dikin.

Tê gotin ku; "berxwedanî ji qoxuşa 25 tê birêvebirin." Hucre nikarin bi her cihî re peywendiyê pêş bixin. Nikarin dengê xwe ragihînin. Lewma ev erk dane qoxuşa 25'an. Li wê derê Şener heye. Fermanan ew dide, an jî agahiyên tên ew ji 35'an re radigihîne. Agahî hat ku hinekan di 27'ê de xwe şewitandiye. Şehîd hene. Dibêjin Remzî Akyûrek û Yilmaz Demîr şehîd ketine. Mistefa Bayik jî agir berdaye xwe. Birîndar rakirine nexweşxaneyê. Nexwe ew duyê reş ê ji banê blokên dawî li asîmanan bilin dibû ji ber vê bû. Bi vê agahiyê re hinek heval jî dibêjin; "em jî agir bikin." Me destpêkê asteng kir. Bi her agahiyê her kes gerim dibe, em nikarin kesî bigirin. Her kes weke dîna ye. Bi rastî jî gelekî zehmet e, negengaz e ku di van kêliyan de hevsengiya hêrs, hest, bertek û xemgîniyan were sazkirin.

Paşê me got; "em dikarin bi pêxistina agir ve bala wan bikişînin vî alî. Divê em hêza dijmin parçe bikin. Bila hinekê jî bi me ve mijûl bibin. Qet neyên jî herî kêm em dikarin pêncî leşkerî ber bi xwe ve bikişînin. Temam, doşek û cilên kevin ji bona agir kom bikin." Her der bû dû. Ji şibakeyan dû bilind dibû. Heval jî tenê ji bona balê bikişînin hemû perdeyên şibakan dane ber agir. Paçan jî di şibakeyan de dişewitînin. Tevî ku bloka miqabil a leşkera ne, yek ji wan jî naxwiyê.

Bi textên kursiyan û qasayan ve agir tê gurkirin. Min jî cara yekem wê demê got; “gelo em jî carekê çalakiyek xwe şewitandinê pêk bînin?” Belê, ma çima nebe? Lê, ew agirê heyî nedikariya çalakiya heyî bibe serkeftinê! Ji ber dema neft, an jî hinek madeyên din ên şewatê hebin, mirov zûtir pê dikeve. Bi agirek wisa û di nava komek hevalên wisa de, şansê serkeftinê kêm e. Dê yekser mirov bigirin û derbixin. Lê min dîsa bi dengê bilind got; “agir zêde mirov dikişîne xwe.” Çend kesên li kêleka min bihîstin. Lê Aysel xirab li min temaşe kir û got; “xêre! Gelo tu dînîtiyek wisa dihizirî?” Min jî got; “na. Tenê min got agir mirov dikişîne xwe. Ger me bikariya çalakiyek jî ji eniya xwe bikira, dê bandora xwe çiqas baş bûya! Xwedê xirab bike! Me nekarî heta roja îro bikin.” Ji bona her kesî mirin pir hêsan bû. Lê weke ku ji bona me bê derfet bû! Min jî axînek kûr kişand. Mirinek di wext û cih de dîtin û pêkan jî hostatiyek mezin dixwest.

Êdî me bawer kir ku dijmin bi zanebûn nayê. Demekê hevalan şibake jî girtibûn. Me wisa da diyarkirin ku wer bizanibin her kes an ser hiş çûye, an jî miriye. Me wisa kir dema di mazgalê re binêrin bibînin. Me dengê xwe jî kêm kir û em bêdeng man. Êdî wext wisa dirêj kir, bi rastî jî hinek ji wî dû, dûyê reş û bê hewayî ser hişê xwe çûbûn. Hinek weke miriyan jî razabûn. Bandora westandina rojan û bêxewiyê hebû. Em hemû nîv bi nîv ji ser hişê xwe çûbûn. Me jî ji nişka ve ferq kir û camên şibakeyan vekirin. Lê ne di xema dijmin de bû. Wisa êrîş dikirin, wisa bênavber û bêrehim êrîş dikirin, ne di wê rewşê de bûn ku agir û bêdengiya me ferq bikin. Bes em jî bi înad bênavber dû derdixin.

Pir dereng ketin ferqa dû û deriyê mazgalan vekirin, bi xortomên agir tefandinê ava şid berdan hundir. Jixwe armancê wan ew bû ku, me jî bi wê ava şid ve bêzar bikin. Em nikarin wan xortoman asteng jî bikin. Em lalîkan û alavên hişk favêjin wan, dîsa jî em tişteke wê ava şid asteng bikin nabînin. Qoxuş heta nîvî tije av bû. Em jî di nav de ne. Me yekem car wê demê Elî Osman dît. Demek dirêj bû nedixwiya. Herî zêde jî kêfa me tê ku ew van rojan dibîne. Em jî qîr dikin û diruşmeyên weke, "Elî Osmanê Qatil! Elî Osmanê faşîst! Îdareya Qatil! Îdareya Faşîst! Ketiyo! Êşkencekar! Qatil! Ma tu dîsa hatî rihê me bistînî? Vê carê emê rihê te bistînin" diqîrin. Ti leşker li ber çav naxwiyê. Lê ew jî bi diruşmeyên weke; "Elî Osman ê herî mezin e" bersiva me didin. Tenê tiştek got; "li wir bimirin" û paşê çû.

Em jî ji mazgalên derî temaşe dikin. Me vê carê bi tiştên çavên xwe dîtin bawer nekir. Cilên yek tîp li ber xwe dikirin. Dengê êşkenceya jî tine ye. Tenê xirênî dihat. Carekê Gonûl got; "aaa! Karasu, Riza, Yilmaz… Ez hemûyan jî nas dikim. Cilên yek tîp li ber xwe dikin." Hema bêje min dijûn ji Gonûl re kirin; "navê wan hevalan negire ser devê xwe. Ma tu di zanebûna axaftinên xwe de yî? Tu çawa dikarî wisa bêjî? Ma qey tu li benda tiştek wisa yî? Dilê te reşe. Xêra xwe wê dilreşiya xwe jî belav neke." Weke din jî min gelek tiştên din da pey hev. Em hemû ji mazgalê temaşe dikin. Ma te çawa nas kir? Ez ji hêrsa nikarim di cihê xwe de bisekinim. Dil dixwaze biçim şeqamekî li nîvê devê wê bidim. Zêde aciz bû û bi girî got; "wê demê were tu bi xwe lê binêre. Ma ez derewan nakim" û daket. Çû li qoxuşa din giriya. Heval bêdengin, bandor bûn,

mat mane. Dibe ku hinek din jî heman heval dîtibûn û nas kiribûn. Dibe ku ji ber bertekên min bêdeng bûn û ne-axivîn.

Ber bi êvarî yûzbaşi, polîsa jin, hinek serbaz û leşker hatin ber derî. Gotin; "barîkatan rakin emê bi-axivin." Çawa me ew dîtin, me jî dest bi sirûd û diruşmeyan kir. Paşê çûn. Piştî demekê cardin hatin. Tiştên weke; "em cilên yek tîp li ber jinan nakin. Tiştek wisa tine ye. Ji bona vê vekin. Xwarinên xwe bigirin" gotin. Me jî di navbera xwe de nîqaş kir. Weke din jî gotin dê li hundir bigerin. Me biryar da em vekin.

Me rojek piştî wê agahî girt ku, Necmettîn Bûyûkkaya şehîd ketiye. Hevjîna wî Cemîle jî hatibû berdan. Di vê çalakiyê de sê şehîdên me çêbûn. Ji ber van şahadetan nerim bibûn. Lê me nedizaniya ku cilên yek tîp bi biryara giştî hatine li ber xwekirin. Em di rojên dawî yên rojiya mirinê de pê hesiyan. Li eywana sînemayê bi êşkenceyê wan ser hiş dibin û li ber wan dikin. Lê dema heval tên ser hişê xwe jî, yekser wan cilan ji ber xwe dikin. Tiştên ku heta wê rojê me bihîstin û dîtin hemû wisa bûn. Lê dijmin got; "her kesî li ber kiriye. 35'an jî li ber xwe kirin." Propagande dikir. Em jî pê nebawer bûn.

Ecêb êrîşî me nekirin. Em li bendê bûn ku êrîşî me bikin.

Tam 18'ê Çileyê ye. Ji dûr ve dengek xurt got; " me dest bi rojiya mirinê kir. Hevalên me dest bi rojiya mirinê kirin." Min yekser bersiv da; "temam. Em jî li benda vê kêliyê bûn. We heval bihîstin. Gotin ku dest bi rojiya mirinê kirine. Temam emê jî destpê bikin." Aysel cardin xwe ferz kir. Me got; "bila vê carê Gonûl jî tevlî bibe." Gonûl bixwe jî pêşniyar kir. Fatma ne erê bû, ne jî na (ne serden ne yardan) bû. Bi vê agahiyê bawer nake, lê dîsa jî tevlî bû. Me jî daxwazname nivîsand û yekser destpê kir.

Piştî ku rojiya mirinê destpê kir, êşkence jî kêm bûn. Lê dem bi dem dengê sirûdan dihat. Ya herî zêde bandor li me dikir jî ev deng bû. Gelo çend kesî dev ji berxwedaniyê berdabû, an jî hebûn an na? Em naxwazin bawer bikin. Her tişta ku dema berê bibîr tanî û dida diyarkirin, em hêrs dikirin. Ji ber ew qalib şikestibû. Ma kî dixwaze wan rewşên bi lenet ji nû ve bijî, an jî kî cardin vegerê wan lenetan? Gelo dibe ku yên ji dev jiyanê berdabin hebin? Dibe ku yek bi yek ên ku li qoxuşan ketîn li yek-du qoxuşan kom kiribin. Ji ber em nikarin û naxwazin weke din şîroveyan bikin.

Demekê ji qoxuşa kêlekê dengên qelebalix hat. Me jî li dîwar xist û pirsî. Ji aliyê din bersiva me hat gotin; "Ez Mêhdî Zana me. Hûn çawanin? Hûn kî ne?" Me jî navê xwe got. Her wiha diyar kir ku em di rojiya mirinê de ne û rewşa me jî baş e. Yên ku ji dadgehê anîbûn, xistibûn wê qoxuşê. Dixwestin kesan ji hev cuda bikin, bê peywendî bihêlin û wisa encam bigirin. Di kêliyek bêdengiya şevê de Mêhdî Zana bi dengek xurt bangî 35'an kir. Kêliya agahiyan destpê kir.

Nîvê şevê ji blokan û qoxuşan bi zimanê Dimilkî, Kurmancî, Tirkî heta Îngîlîzî di astek tarîtiya şevê biqetîne de dengê agahiyan bilind dibe. Ev şêwaza agahî dana hev her kesî zindî dike û moral dide. Li cihê bêhnvedanê haparlor tên bicihkirin. Li ser banan deng tên derxistin. Dîsa jî nikarin asteng bikin. Qoxuşa jinan jî tevlî vê şêwaza agahiyan bû. Dengek Kezbanê yê tûj hebû, herder dihejand. Dema tiştek zêde girîng û hewce hebûya, em jî tevlî vê şêwazê dibûn. Weke din zêde nedihat axaftin. Zehmet bû ku mirov deng bigahanda hev. Lê dîsa jî bi hevalan re heman tişt jiyîn û parkirin moral

dida me. Mêhdî Zana jî li pişt dîwarê din bi kilamên Kurdî yên xweş ve moralek din ava kiribû. Min zêdetir jî ji kilama Xezal hez dikir. Min berî wê ji dengê Şivan guhdar kiribû. Vê carê jî li ser daxwaza me 'Xaloyê' me digot. Belê, me ji pişt dîwar de xwestekên xwe gotibûn ku bêje. Dengê wî pir zelal dihat û kilama Xezal ji me re digot. Ew kilama bi mewal dihat gotin, her der hejandibû. Ma ew çi deng bû! Dibe ku hemû hestên êş, bêrîkirin, dostanî yên hevbeş û bedew bûn ku, ewqas bi watedar û xweş dihat guhên me.

Aysel û Gonûl rakirin nexweşxaneyê. Tansiyona wan ketibû. Ez û Fatma man. Piştî demekê jî em rakirin. Komek hevalên xort jî hebûn. Yek li ser darbestê bû. Heval zû ketibûn. Êşkenceya zêde bandor li wan kiribû. Destpêkê Fatma birin, lê berî derbixin jor, birin odeya kêlekê. Min got qey dê li wir bidin razandin. Ez jî bi darbestê birim jorê. Li cihê ku em berê lê mabûn. Aysel û Gonûl li wir bûn kêfa wan jî hat ku ez jî çûm cem wan. Her du hinek din zindî bûn. Ji ber rewşa wan li girtîgehê zêde xirab bû. Min jî got qey Fatma li cihek din dane razandin. Paşê ew jî anîn. Min pirsî; "tu birin kuderê?" Bi acizbûn bersiva min da. Min jî got; "nexwe tedawî pêşniyarê te kirin." Vê carê zêdetir aciz bû. Xoyên wê yên her demî ne, dema ne li kêfa wê be, xwe aciz dike û wisa bersivan dide.

Asayî her roj, her carê doxtor dipirsin; "ma hûn tedawiyê qebûl dikin an na?" Em jî dibêjin; "Na." Ev kar dizîve, veşartî nedihat kirin. Lê carê jî li gorî xwe rêbazên cuda bikar danîn, hewl didan bandor bikin û bê baweriyê ava bikin. Li gorî kesayetan nêz dibûn. Ji derûnî, awir û rûyê wan hinek tişt hêvî dikirin. Cuda pirs dikirin, pistepist pirs dikirin. Bi gefan, qîran, xirabkirina moralê û tehrîkirinê ve, hewl didan rewşa mirov a

giyanî bizanibin. Heta mirov cuda dikirin, derheqê kesê beriya niha çend xulekan em bi hev re bûn, hev ji nêz ve nas dikin de, digotin; "wî/ê tedawî qebûl kir. Xwarin dixwe. Ew bi aqil nêz bû." Bes hinek ehmeqan jî bi vê bawer dikirin.

Dijmin kesayetan, herî zêde jî di van deman de nas dike. Ji ber mirov di nava rewşek bi mirinê re dimeşê de ye. Her roj şaneyek mirov a dimire, mirov dixe nava êşek pir mezin. Ger ruhê mirov saxlem be, li ser vîna xwe serwer bî, bi ken diçî mirinê, baweriya te ruhê te hemêz kiribe, dê mirov mirinê û dijmîn ji qehra bikuje û bide tirsîn. Nexwe di rewşek berovajî de dê tirsa mirinê hêdî hêdî te bibe îxanetê. Mirov carekê bi mirinê re, carekê jî bi jiyanê re dilîze. Lewaziyên çav li îxanetê didin, di rengê çav û rûyên mirov de diyar dibin. Rûyê mirov weke ku tirs û bêhêvîtî vexwariye, ewqas kirêt dibe. Mirov her tim bitirs, bişik, har dibe, digirî û hewl dide wê tirsê di bin bataniyê de veşêre. Weke mirov dest û lingên xwe ji jiyanê dikişîne, bi derdor re jî qet na-axive. Mirov bigotin û awiran kirêtiya di hundirê xwe de, li ser hevalên xwe yên kêleka serê xwe ku rêwiyên mirinê ne vedireşe. Ev jî hevalbendiya yên ku bi hev re diçin mirinê ye.

Ya herî girîng naskirina mirova ne. Kêliyên herî zehmet jî, kêliyên van pênaseyan a herî zelal û rasteqînin. Weke helandina madeyeke hişk bûye. Her ku kesayet vedibe û îtîraf dike, zêdetir vedireşe. Her aliyê mirov tazî ye, parçeyek an jî nesneyek mirov li xwe pêçe nabîne. Bes bixwazibe vê rastiyê bibîne, ev rastî wisa ye. Lewma divê çavên ku dibîne û dilê mirov hebe! Nexwe êdî dê mirov ji yên tazî re bibe parçeya pêçanê. Ji ber her kompleks, kaprîs, tirs, poşmanî û hêrsên te yek bi yek dibin pêçanek.

Karasu ew jî li nexweşxaneyê bûn. Rojname şandin ji me re. Dijmin tenê rojnameyan dide. Her wiha hinek notên ku pêdivî di nav de hatine nivîsandin dide. Nivîsandinek din qedexe ye! Lê dîsa jî bi wan re li nexweşxaneyê jî mayîn bi serê xwe moralek bû. Me rewşa heyî ji leşkeran pirsî, ew jî dibêjin; "her roja ku derbas dibe hejmara wan zêde dibe. Nizanim îro 3 kes hatin…Îro 5 kes hatin…Nizanim îro…" dirêj dibe û diçe.

Rewşa Ayselê hinek rojan xirab dibû. Em destûrê didin ku tansiyonê kontrol bikin. Rojê sê caran doxtor tên û diçin. Carê jî zêde tên û diçin. Min ji Aysel re got; "cixarê nekêşîne, tu mirina xwe amade dikî. Nerast e tu dikî." Rast e em diçûn mirinê, lê bila em di wextê û cihde bimiran. Ne ku mirina xwe bi destê xwe lez bikin. Ev bêxemiya wê ji min re berovajî dihat. Her tim bi kul û derd bû! Ez jî ji vê aciz dibûm. Ji ber ew bi xwe jî bi nexweşiya weremê ketibû. Qedehên cuda nadin her yek ji me. Dema em dixwazin ji wê re jî dibêjin; "qedexe ye." Em devê ser sirahiyê jî weke qedeh bikar tînin. Ez li dijî bûm ku em hemû bi heman qedehê avê vexwin. Aysel dîsa ji ber vê helwesta min aciz dibû. "Em diçin mirinê, tu hêj dev ji van xoyên xwe bernadî." Dilê Aysel mabû! Ez hewl didim jê re bêjim û bidim fêmkirin, her ku min digot; "ger em bimirin jî dixwazim paqij bimirim. Ezê nexweşiyê nêzî bedena xwe nekim. Ez di vê de bibiryar im", zêdetir dilê Aysel dima. Armanca min ne ew bû ku ez wê aciz bikim. Lê min bertekên xwe yên li hember bêxemiya wê, wisa rave dikir. Ew ne tenê kêmasiyek, an jî fêrbûnek bû. Xisletek girîng a kesayetê bû. Aliyek wê ya hêsan û ji rêzê bû. Weke xisletekê jî di kesayeta xwe de bicihkirin, mirin xwestin bû. Ne ku di wateya ji mirinê

natirsê de bû. Xwe ji mirinê re dida razandin. Kesayet dema dijî jî, dema ji aliyê fîzîkî ve saxlem jî be dikare xwe ji mirinê re bide razandin. Ji ber li hember mirinê serî rakirin, heta kêliya dawî serweriya li ser jiyanê ye. Mirin wisa hêsan nêzî xwe nekirine. Divê wisa be mirin jî ji te bitirse, ne ku tu ji mirinê bitirsî!

Gelo dê rojekê derfet hebe ku ez li rojên rojiya mirinê ya mezin guhdar bikim? Tenê Karasu ji wan rojan mabû. Hema bila ew vê carê tevlî rojiya mirinê nebûya. Di ser halan de pênc rojan beriya me dest bi rojiya mirinê kiribû. Avêtine hucreyê, wî jî li wir destpê kiriye. Me piştî rojiya birçîbûnê ya pênc rojan ku bi mebesta hişyariyê destpê kiribû. Ez bawerim di heman wextê de ye. Bes ew zêde hincirî (yipranma) bû. Niha hincirîna berê û êrîşên dawî ew zêde xirab xistiye. Na, divê ew bijîn. Ger mirin be, divê vê carê dora me be. Min got; "xwedêyo tika dikim vê carê jî destpêkê ez mirinê hemêz bikim." Belê, min duayek wisa kir. Ma ezê çawa êdî mirina yeke din rakim? Na! Ez naxwazim tiştek wisa bifikirim. Ez jî carekê bi deng axivîm û weke mijarek henekî min got; " bila destpêkê ez bimirim." Aysel jî got; "na, bila ez bimirim." Aysel axînek kûr kişand û got; "ez zêdetir nêzî mirinê me." Belê, Aysel diheliya. Hem jî bi lez diheliya. Carê bi saetan weke miriyan diraza. Di kêliyên wisa de dilê min dihat ber devê min. Min jî hêdîka; "Aysel, Aysel..." bang dikir. Hinekê xwe dihejand. Gumanên doxtoran jî herî zêde ji Aysel hebûn. Dema dihatin yekser diçûn serdana wê.

Gonûl di rojên pêş de cardin bê moral bû. Tişta herî girîng kêliyek jî be, le hember wan şaneyên ku dihelin, ew bêhna pîs a

ji devan dihat û êşên ku ji her alî ve îsyan dikin, mirov têk neçe. Rojiya mirinê naşibe ti şerî. Ji ber mirov bi hemû laşê xwe re di nava şerekê de ye. Her organek mirov eniyekê vedike, her şaneyek weke cinawirekî tev, hewl didin dil û mejiyê te dorpêç bikin. Her hestiyek jî weke mertalekî ne. Mirov li ser kîjan alî raze, ewder li hember mirov îsyan dike. Her xwe zivirandinek windakirina enerjiyê ye, windakirina hêzê ye. Her hêrsek jî windakirina hêzê ye. Her nêrînek hundirê çavên te dişewitîne. Mirov ditirse ku li xwe û yên derdora xwe temaşe bike. Mirov herî zêde jî li destê xwe dinêre, hestiyên te berovajî bûne, çermên mirov heliyayî, ji hev daketî û zindîbûna xwe winda kiriye. Neynok jî şîn û reş bûne.

Na, divê mirov xwe ji van tevan paqij bike. Dema mirov bi van re mijûl dibe, mirov di nava bêgengiya mirinê de difetise. Mirin jî weke kabûsekê bi ser mirov de dibare. Nexwe dê çavên te jî weke yên Gonûl mezin vebin, bataniyê bikişînî ser rûyê xwe û bigirî. Di her janê de binalî. Ew jan, êş û bêhevsengiya ku di encama nekêrhatina sihên (organ) te de ava dibin re, bi te re tirsên nû ava dike. Lêgerîn û bendewariya ramanek din bi sinsî tê dikeve navarasta mejiyê te. Tu jî vê çûn û hatinê dijî. Êdî tu nikarî lewazî û tirsên xwe ji dijmin jî veşêrî. Berovajî dê tu li hember wî kurmê xasûk (sinsî) bin bikevî û êdî di nêzîkbûnên te de jî diyar dibin.

Serdarê (Bînbaşi) li nexweşxaneyê bi doxtoran re hat. Bi Gonûl re mijûl bûn. Gonûl jî bi girî û nalînê bersivê dide. Serdar jî ev weke firsendekê nirxand û got; “ger tu bixwazî em te tedawî bikin. Paşê tu dîsa berdewam bikî. An jî tu ditirsî? Ma tu nikarî bi tena serê xwe biryarê bidî? Dema ev digot jî bi

awirên nîv bi zorê, bin çavan de dikeniya, nîv jî diranê xwe tûj dikir li min dinêriya. Çavên me li hev ketin. Ez di wê baweriyê de me, hêrsên di çavên min de ew zêdetir tirsandibû. Jixwe çavên wî di nava çalek kûr û tirsnak de mabûn. Destpêkê wî çavên xwe dan alî. Paşê min. Ez jî weke ku jê re bêjim; "dê tu sernekevî" dikenim. Yên li derdor tev li me dinêrin. Awirên Aysel jî zêde tirsnakin.

Fatma berovajî raza ye û dîsa tiştek ne di xema wê de ye. Jixwe nayê zanîn gelo ew diçe mirinê, an jî diçe jiyanê. Pir kêm di-axivî û tiştên ku dihizirî ne dida der. Ger mirov baldar nêz nebe, mirov nikare ruhê wê binase. Carekê ji ber dereng bersiv da doxtorê ku jê pirs kirî, doxtor got; "mirov dikare nizanim çend saniyan de bersivê bide, lê tu kesek ecêbî. Ger tu piştî evqas li bendê dimînî û paşê bersivê didî, pirsgirêkek derûnî û ruhî bi te re heye." Dibe ku yêm ev gotî dijminek bûn. Lê ji aliyê zanistî ve jî dema mirov dixwaze fêm bike, bi rastî jî kesek ecêb bû. Kesek dikare qet ne-axive û bêdeng jî bimîne. Lê hinek bertek, refleks di xweseriya mirov de hene. Ger te ew dabin rawestandin, bêbaldarî pirsgirêkek ruhî be, wê demê bi rastî jî xeter e.

Carê em jî di navbera xwe de dibêjin; "gelo vê hinek tişt bin erd kirine?" Gumanên xwe rave dikin. Gelo çima di rojiya mirinê de bû? Çima tevlî bibû? Bi kî re tevlî bibû? Yên cem wê kî bûn û armanca wê çibû? Nêzîkbûnên wê ji mirovan re çawa bûn? Li gorî wê bawerî, hezkirin û rêhevaltî çi bûn? Ev têgeh û hêj gelek tiştên din weke pirs dirêj dibûn û bi guman bûn.

Min vala nedigot; "ezê ji partiyê re pêşniyar bikim, dema ev hat berdan bila mejiyê vê li qada tip'ê ya herî pêşketî were

lêkolînkirin. Ez bawerim tip herî zêde li qada Sovyetê pêş ketiye." Ez cidî dihizirîm ku vê pêşniyar bikim. Mirov ji dostên xwe re dibe dost, ji dijmin re jî dibe dijmin. Ev di bingehê xwe de du diyardeyên ji hev cuda ne. Ji bona mirovan nediyarin ku dost in, an jî dijmin in, mirov ti nav nedidît. Mirov di pênasekirinê de zehmetiyan dijî.

Piştî pêvajoyekê hema bêje malbat her roj tên. Ew jî eniyek vî şerî ya cuda didin avakirin. Aliyê dramatîk, trajîk, komîk hemû bi wan re heye. Berî her tiştî zêde bêçare ne. Ji hêlekê ve êşa her roj em zarokên wan li ber çavên wan dihelin, hêla din ve jî zextên dijmin, bindestiya ku hêza wan têrê nake û jana vê hebû. Min di hinek filman de mirovên ku li hember rewşên weke darvekirin, an jî bûyerên bi êş çawa porên wan yekser spî dibû dîtibûn. Min wer dizaniya ku qey rol dîlîzin. Lê di filim û lîstoka me de rol tine bû. Her kesî xwe dilîst û dijiya. Jixwe ger bi rastî jî derhênerek hosta derbikeve, dê lîstokek nemir derbixe holê. Ji ber lîstoka me nedişibiya ti lîstokên li ser dikan.

Bûyera Babby Sands hebû. Carekê di çapemeniyê de behs kirin. Rojiya mirinê ya li Amedê û ya li Îngîltereyê di heman dîrokê de hatibû destpêkirin. Dîrokek nêzî rojiya mirinê ya 81'ê bû, an jî di heman dîrokê de bû. Komek endamên IRA rojiya mirinê dabûn destpêkirin. Demîr Leydî zêde bi israr e, derfet nade, di nava wê komê de ji deh şoreşgeran zêdetir hene. Herî dawî jî di rojnameya Posta de nivîsandibûn, 'Babby Sands bi lehengî şehîd ket.' Zêde bandor kiribû. Em xwedî li wî jî derketin û me ew jî bi şehîdên xwe re bibîr anî.

Ji bona dayîka xwe wesiyeta xwe dabû; “ezê heta kêliya dawî jî destûrê nedim destwerdana doxtoran. Lê ger min hişê xwe winda kir, wê demê jî tu destûrê nede wan.” Bi rastî jî ew dayîka leheng xwedî dilek mezin, destûrê nade doxtorên ku ji bona bidin jiyîn destwerdanê bikin. Babby Sands di vê mijarê de jî rehet bû, ji ber dayîka wî wesiyeta wî bicih anîbû.

Lê malbatên me zêde ecêb bûn. Ji ber êş û janan taqeta wan nemabû. Giriyên wan, ser û porên xwe anîna xwarê, gotinên weke, “emê xwe bikujin” kirin, hemû jî ji ber bêçaretiya wan bû. Hemû jî berovajî tiştên ku me ji wan dixwestin tevdigeriyan. Dijî wesiyetên me tevdigeriyan. Ango rewşa wan nebaş bû. Lewma vê rewşê bandor li me jî dikir. Berî her tiştî diviya wan, wate û hedefa çalakiya me baştir bizaniyan. Dibe ku wan ji hinek aliyan ve dizaniyan. Bi gelemperî wate jî didanê. Lê ev bi giştî kêm bû. Lewma bertekên wan em didan mijûlkirin. Li şûna ku bi qirika dijmin re bigirin, hesab ji wan bipirsin, hêrsa xwe bi ser wan de bibarînin û bertekên xwe li dijî wan bikar bînin, zêdetir hewl didan me qane bikin. Berî her tiştî nedixwestin ku em bimirin. Hawar û êşên wan di serî de ew didan kuştin. Ew jî diheliyan. Min ji nişka ve spîbûna porê apê Xidir, Peder, dayîka min û yên din dît. Her roj parçeyek ji wan diheliya. Ji ber digiriyan, tiştên me ji wan re digot, guhdar nedikirin, nedibihîstin. Dema destpêkê bangî wan dikin, dijmin ji wan re dibêje; “werin miriyê xwe bigirin.” Hinek malbat jî bi tabûtan ve tên. Belê, bi tabûtên xwe ve hatibûn.

Me bi zorê bertekên wan ber bi dijmin ve herikandin. Me got; “biçin êrîşî îdareya girtîgehê bikin. Biçin êrîşî Kolordu bikin. Meşan lidar bixin. Biçin heta Enqereyê. Ancex hûn dikarin wisa li pêşiya mirinan bigirin. Bi vî rengî nabe.” Dest

bi pêkana van kiribûn. Malbatan bi keviran êrîşî girtîgehan kiribû. Dema hevdîtinê bi Serdar re dikin, êrîş dibin ser, dibêjinê; “we zarokên me kuştin.” Şandeyek şandibûn heta Enqereyê.

Dijmin jî di ya xwe de israr dikir. Li posta yekem, di nava me de jî, deh kes li ber mirinê bûn. Aysel xwîn davêt, xwîna hişk bûyî. Gonûl û Fatma û kesek din nikare ji cihên xwe rabin. Ez jî heta rojên dawî înat dikim. Xwendina rojnameyan berdewam dikim. Çavên min hêj baş in. Her çendî carê şêlû bibînim jî, dîsa baş in, îdare dikin. Çavên Gonûl û Aysel şêlû dibin. Bedenek xwe radestî cihan kirî maye. Dema carê mijankên wan dihejin, an jî nalînek biçûk derdikeve ez dizanim ku dijîn. Tenê ev diyar dibin. Dema carê bêdengî zêde dirêj dibe, ez yekser bi navê wan bangî wan dikim. Gonûl li ser cihê kêleka min e. Aysel jî li kêleka wê ya dine. Miqabil jî Fatma dimîne. Çavên min di navbera her sê cihan de diçe û tê. Ez jî her carê duaya “tika dikim bila destpêkê ez bimirim” dubare dikim. Dixwazin bila hawara ji bona xwedê, mirada xwe anîna bilêvkirin weke îdealîstî binav bikin. Dibe ku duakirin û xwestek ji xwedê kirin jî tenê duayek karê wan bû. Carek din dema ez biçûk bûm, min hawara xwe gihandibû xwedê.

Li ser banga min Aysel, Fatma û Gonûl ne bi deng jî be, bi hinek tevgeran bersiva min dan. Carekê Aysel demek dirêj bersiva min nedabû, ez jî tirsiyabûm. Ez rabûm çûbûm heta cem wê. Dema min dît dijî, zêde kêfxweş bûm. Carna jî Aysel berovajî bersiv dida. Bi acizbûn digot; “xêre!” Xoya wê bû, gelek caran peyva ‘xêre’ bi acizbûn û dengek çors digot. Gelo ew rewşek dînîtiyê bû, çi bû? Di jiyana asayî de jî ev uslup wisa bikar danî.

Wesiyeta Peder a dawî ecêbtir bû. Lênûsa xwe ya notan derxist û got; “ez nikarim hem mirina keça xwe, hem mirina lawê xwe Metîn rakim. Ez dixwazim beriya wan bimirim. Zarokên min tiştek xirab nekirin. Ji bona mirovahiyê têkoşiyan. Propagandeya doza xwe kirin. Weke din jî ti sucê wan tine ye. Ew ji bona karek bi şeref têkoşiyan. Ez di vê mijarê de tiştekê ji wan re nabêjim. Lê em nefikirîn. Ez nikarim êşa wan rakim. Ezê biçim xwe daleqînim. Aha, ji te re lênûsa min a notan.” Bi kelegiriyek kûr derket çû.

Malbat jî weke koro digiriyan. Hinek ji hemşîre, doxtor û leşkeran jî digirîn. Êdî kes nikare rondikên xwe veşêre.

Piştî me, diçin cem Karasu wan. Rewşa wan jî girane. Karasu ji ser hiş çûye. Orhan Keskîn û Cemal Arat birine odeya nexweşên giran. Lê agahiya malbatan jê nîne. Dayîk û bavê Orhan weke dînan li Orhan digerin. Bavê wî hinek din bi sebir, hedare, lê hawarên dayîkê weke ku parçeyekê ji min bibe, ewqasî pê êşiyam. Hatiye cem min, bi destên xwe lingê min kontrol dike, lingên min radimûse, destên min radimûse û dibêje; “ez qurbana te me, kanî Orhanê min? Ji min re nabêjin, çi ji Orhan hatiye? Tu niha dizanî. Êdî ji vê rewşê re çareyekê bibînin. Orhan tine ye! Orhan… Orhan…” diqîre.

Paşê dev ji min berda çû cem yên din. Derdikeve derve, cardin tê. Taqeta min tine ye, ne min karî destên xwe, ne jî lingên xwe jê biparêzim. Ew ramûsanên dayîkekê yên bi êş bûn. Min jî tenê karî jê re bêjim; “xema neke, ew baş in.” Ez jî nizanim. Kes ji min re jî nabêje. Dema em piştî çend mehan cardin derbasî girtîgehê bûn, em jî hingê bi şahadeta wan hesiyan.

Ti ferqa dayîka min ji dayîka Orhan tine ye. Diqîre; “Meto miriye, Karasu miriye. Êdî bes e! Tu tiştekê bêje. Ew zilam dibêjin, ‘ger Sakîne bêje, dê berdin.’ De tu bêje, êdî berdin. Hawara min ji te, ma dê çi bibe? Gelo bi rastî jî Meto û Karasu miribûn? Wê jinê çi digot? Ma ne di wê ferqê de bû, ez jî dikuştim. Ma agahiya mirinan wisa hêsan bû? Dilxwede dê ew wisa bandor li min bike û min neçarî dawîkirina çalakiyê bike. Lê ne di ferqa axaftinên xwe de bû. Min bi îşareta destê xwe bangî dayîka Aysel kir. Min jê pirsî, wê jî got; “tiştek wisa nîne. Em nû ji wir hatin, tenê rewşa wî hinekê xeter bû ew qas?” Ez jî rehet bûm. Ew hêj zêdetir kamil nêzî bûyeran dibû.

Piştî çend rojan Metîn hat hevdîtinê. Got; “ ji sibehê ve hevdîtin heye. Hinek zilam ji Kolordu û girtîgehê hatine. Ji bilî hinek tiştan hemû daxwazên me qebûl kirin. Tenê mijara cilên yek tîp qebûl nakin.” Min jî got; “yek tîpê çi?” Weke ku ji valahiyekê bikevim. Heman weke ku mirov ji kabûsekê şiyar bibe û xwe vala hîs bike, rewşek jiyan kir. Lê tam nehat fêmkirin. Li ber xwe kirine, an jî dixwazin bikin mijara hesaban. Ew nediyar bû. Lê yekser gotina Gonûl li girtîgehê gotî; “35 cilên yek tîp li ber xwe dike. Min Karasu û Yilmaz ew dîtin” hat bîra min. Lê dîsa jî min ji axaftinên Metîn ev encam fêm nekir. Ez qet nahizirim ku, dibe li ber xwe kiribin. Dîsa jî bertekek hundirîn û gumanekê xwe da der. Gelo di bin hişê min de mabû? Jixwe Metîn zêde nema got; “hevalê Riza ew li benda min in. Emê biçin girtîgehê van encaman bi wan re nîqaş bikin. Ji ber Riza nekarî derkeve jor, ez bi tenê hatim. Hûn lîsteya xwe amade bikin. Paşê emê dîsa agahiyek mîsoger bidin we.” Min jî got; “di hevdîtinên wisa de bangî yek ji me jî

bikin. Temam, komîte heye, lê xweseriya me jî heye. Em cuda dimînin. Derfetên nîqaşan çênabin. Ez bawer nakim ku ew zilam ti astengiyan derbixin." Paşê Metîn çû.

Malbatan jî li beşa din bihîstibûn. Ew jî bi komî çûbûn girtîgehê. Heman rojê ti agahî nehat. Roja duyê jî nehat. Diyar bû, bi encam nebûye. Me jî di navbera xwe de got; "Baş bû me yekser lîsteya xwe ne da malbatan."

Dihat gotin ku Karasu xiraptir dibe. Hinek heval jî di dîtin û bihîstinê de zehmetiyan dijîn. Di nava van de Hamilî jî heye. Malbata wî jî tê serdana me. Ew jî tîpek cuda ne. Cara yekê ye tên cem me. Gotina yekê kirin; "Lawê me dimire. Ji xwedê bitirse! Ma ne heyfe?" Malbatên kêleka min jî heman tişt gotibûn. Xwedêyo, tam zextek wijdanî li ser min dimeşînin. Min di bin tohmetan de dihêlin. Dibêjin; "Tu û Karasu hinek tiştan bikin. Karasu jî çûye, rewşa wî girane. Ger tu bêjî dê xilas bibe. Tika dikin neke!" Weke din jî tiştekê nabêjin. Ez bawerim di cîhanê de nêzîkbûna herî mirovan aciz dike û di bin zextê de dihêle jî ev şêwaze.

Min got; "bangî serbaz bikin." Bangî kirin hat. Min got; "ez dixwazim bi Karasu re hevdîtinê bikim." Ji ber qaşo dê rojek berê lihevkirinek pêk bihata. Li girtîgehê tengezariyek hebû. Ev ketî bi me re dilîstin. Hinek malbatan hinek tiştên cuda jî digotin. Dayîka Aysel û dayîka min digot; "hemû ew Şener nahêle çareser bibe. Li girtîgehê ew dijî derketiye. Serdar bi xwe got. Ma ji zarokên me çi dixwaze?" Me jî xwe bi malbatan re aciz dikir. Dijmin her carê we bi tiştekê dixapîne, hûn jî bawer dikin. Dijmin dûrîtiyê dike. Tevî ku li vir dibêje 'temam', gotiye 'me li girtîgehê lihev nekiriye.' Lewma evqasî dirêj kir."

Dema min bangî Karasu kir, malbat jî bi hêvî bûn. Ên digiriyan jî bêdeng bûn. Her kes bi mereq disekinî. Gelo emê çi bikin û çi bi-axivin.

Karasu li ser darbestê anîn. Hema danîn li pêşiya cihê min. Dema ew hat her kes zînde rabû ser xwe. Ecêb! Aysel, Gonûl û Fatma jî ji cihê xwe rabûn, xwe li cihê min girtibûn. Heta wê kêliyê jî her yek ji wan weke miriyan bûn. Ez jî heta nivî rabûm û li wî temaşe dikim. Li ser darbestê bedenek biçûk heye. Ew kazak û siwûterên li ser hev li ber xwe kirî nebin, dê hêj biçûktir bixwiye. Rûyê wî bi qasî kefa destekê maye. Weke ku mirov dikare bi destekê tenê rûyê wî bigire. Çavên wî tam kûr çûne. Rengê çavên wî û reşahiya li derdora çav bûne yek. Tenê çermek reş û şîn bûyî heye. Lêvên wî ziwa û spî bûne. Çavên min tije bûn, lê weke ku rondikên min jî ziwa bûne. Min hinekê zorî da xwe. Jixwe giriyên malbatan bes bûn. Li gel van nedibû ku ez jî bigiriyam… Na, nedibû! Li her alî dijmin heye.

Min got; "hûn çawan in?" Di bersivdanê de zehmetî dijiya. Dibe ku nebihîstibe jî. Piştî demek derbas bû got; "em baş in. Heval jî baş in." Çavên wî carê dihatin girtin. Heman weke nexweşek narkozê bidinê çavên wî hêdî hêdî dihatin girtin û giran dibûn. Malbat weke xelekekê li dora wî civiyabûn. Hemû çav û guh li ser me rawestiyane. Karasu got; "dijmin li ser soza xwe nesekinî. Nahêlin hevalên ku çûne girtîgehan li qoxuşan bigerin. Li qoxuşên destpêkê destûr dane. Hinek xalên ku hatine qebûlkirin hatine diyarkirin. Ew Sitvan (yûzbaşi), ew zilamê faşîzan tevî ku li vir, li cem me got qebûl, dema diçe wir dibêje, 'tiştek wisa tine ye. Me qebûl nekiriye.' Lewma her tişt zehmetir kiriye. Heval jî radibin vedigerin. Maşînan jî ew bêzar kirine. Lewma vala çûne.

Ango ew durû ne. Di rojiya mirinê ya 81'ê de Serdar gotibû; "ez soza leşkerî didim." Çi soz bû? Tiştek nehat guhertin. Her wiha hevalê me Elî Erek şehîd ket. Qaşo di 14'ê Tîrmehê de jî soz dan, lê mixabin hevalên me yên herî hêja şehîd ketin. Dîsa jî pêk ne-anîn. Bi van zilaman re exlaqê siyasî tine ye. Li benda mirina me ne. Li şûna ku hûn xwe bi me re aciz bikin, qirika wan re bigirin û xwe bi ser wan de aciz bikin. Em bibiryar in, dehan ji me bimirin jî, emê vê carê vê çalakiyê saxlem bi dawî bikin. Êdî ev mijar bi sozan nabe."

Min jî got; "mîsoger me bi zanebûn mijûl dikin, ev jî pir vekiriye. Divê weke Îlûnê nebe. Hinek tişt zelal bibin. Divê em hinek tiştan nekin mijara nîqaşê jî. Em jî heta dawî bibiryar in. Metîn jî hat û çû. Me carek din agahî jê negirt. Hem me ev, hem jî rewşa me mereq kir. Ji bo vê me hevdîtin xwest. Em zêde we newestînin." Paşê em ji hev cuda bûn. Ji ber bendewariya malbatan jî tiştek din bû, bi van gotinên me yên dawî ku bibiryar derketibûn, hêviyên heyîn jî bi temamî qediyan. Hêviya xwe qut kirin. Hêj Karasu li ber derî bû, malbatan bi hawar qêriyan. Her der têkilhev kirin. Yên ku li kabên xwe didan û digiriyan, erkdaran ew derxistin derve.

Me jî di vê navberê de wesiyetên xwe ji malbatan re digot. Min ji dayîka xwe re got; " min li Dêrsimê, li goristana Mamikî, li cem gora Aydin veşêrin." Li wê goristanê yek kevireke mermer a bêhempa ji her derî ve dihat dîtin ya Aydin Gul bû. Belê bila li wir be, li cihek bilind be."

Min pir dixwest min li cem Mazlum veşêrin. Gelo cenazeyê wî girtibûn? Dayîka min Zeynep ji giriyan tiştek nedibîhîst. Zêde bandor bibû. Min got; " ji bona me negirîn.

Binêre, em çiqas rehet in. Hûnê neqeherin. Em ji bona dozek bi onur têdikoşin. Berdêla wê jî çi be, emê bidin. Hûnê bi serxwebûna Kurdistanê bawer bin. Hûnê bi mezinbûna vê dozê bawer bikin. Di vî şerî de mirin û bizanibe bimire gelekî girîng e. Binêre, hinekan jiyanek rezîlane hilbijartin. Mirina herî kirêt jî ya wan e. Ma ne hûn naxwazin em jî wisa bin,, ne wisa? Ji hemû hevalan re bêjin, em bi wan bawer in. Ewê tola me bigirin. Heta dawî jî ala têkoşînê rakin." Dayîka min Zeynep bidengê bilind digiriya. Dibêje; "van tiştan ji min re nebêje." Lê bi qasî dilê xwe parçe jî bike, digirî.

Nizanim çend roj derbas bûne. Malbat li bendê ne û vê carê jî zêdetir bi hêrs in. Dayîka min got; "di nava we de hinek xirabiyê dikin. Naxwazin ev kar pêk were. Şener e, çiye, dibêjin kurê Salîha kor e. Dibêjin ew nahêle. Bi sonda Dûzgûn Baba, wisa dibêjin. Jixwe ew jin jî dîneke. Ew jî derve de her tiştî tevlîhev dike." Dayîka Aysel jî van tiştan erê dike. Min cardin hewl da ji wan re bêjim û aciz bûm; "dijmin lîstokan dilîze. Her carê hêcetekê derdixe. Hûn jî bawer dikin. Hûn jî dizanin ku hemû biryar ji vir derdikevin. Ne girtîgeh, Karasu wan li vir biryaran didin. Qirika wan zilaman re bigirin bêjin; "hûn mirina zarokên me dixwazin. Weke din jî serê xwe bi tişteke din ne êşînin."

Em zêde nikarin bi-axivin. Piştî ku ew çûn me ev mijar nîqaş kir. Min got; "Gelo çima girtîgeh wisa dike? Raste ku ev mijar tê tevlîhevkirin, ma Şener jî bûye çi? Çima li gorî vir tevnagere? Gelo komîteyek jî li wir hatiye avakirin? Na, teqez armanca dijmin cuda ye. Li benda mirina ne. Rewşa Karasu wan gelekî xirab e, dê piştî şahadeta wan bêjin "temam." Jixwe gotibûn "temam." Bi armancek din mijûl dikin. Em nêrîna xwe

ji hevalan re bêjin. Xweziya me ji Karasu re bigota. Lê ne dibû, em li cem malbatan bêjin." Aysel jî tevlî min bû. Lê Fatma got; "tû bi navê her kesî ne axive. Ezê çalakiyê bidomînim. Ma emê bi gotinên malbatan bawer bikin?" Dîsa Fatma ecêb nêzîk bû. Tu dibê qey min gotiye; "em yekser çalakiyê rawestînin, an jî biryara vê bidin."

Min got; "hewce nake ku tu axaftinên min bi cihek cuda ve girê bidî. Lê baş dizanim ku di vê mijûlkirinê de armancek dijmin heye. Ez vê dihesim. Ne şaş e ku em di vê mijarê de bi hevalan re bi-axivin û nîqaş bikin."

Ez bi biryar im. Divê nêrînên xwe ragihînim. Ji ber hîsên dijîm, min neçarî vê dikin. Min got erkdaran ez dixwazim bi Hamilî re hevdîtinê bikim. Ne baş bû ku em her kêliyê bangî Karasu bikin, ji ber bêzar dibû, nexweş bû. Ger bi zimanê dimilkî bi Hamilî re bi-axiviyam, dê serbaz jî fêm nekin. Hamilî li ser darbestê anîn. Min jê re got; " nêzîkbûnên dijmin me dide hizirandin. Malbat jî hinek tiştan dibêjin. Dibêjin ên li girtîgehê ne, destûr nedane were çareserkirin. Ger evder biryarê dide, jixwe piraniya hevalên biryarê didin jî li vir in, wê demê çima ji girtîgehê hinek biryarên din derdikevin. Divê ew jî tevlî biryara vir bibin. Rewşa Karasu jî nebaş e. Gumanên min hene. Nêrîna min ew e, evder giraniya xwe bide nîşan û çalakiyê bi dawî bike. Divê dijmin vir muxatap bigire. Gelo tu fêm dikî ez dixwazim çi bêjim?" Got; "temam." Ew jî tevlî vê nêrîna min bû. Got; "em jî nîqaş dikin. Hinekê endamên TÎKKO zehmetî dexistin" û çû. Rojek din derbas bû, rojiya mirinê giha roja xwe ya 50'mîn. Karasu 55 rojbûn di rojiya mirinê de bû. Tam di asta mirinê de bû.

Wê rojê dîsa derdora min bêdeng bû. Lê di hundirê min de li gel hestên xweş, kelecanek ecêb jî hebû. Min nivîsên li ser dîwaran nivîsandibûn dinêriya, lê nikarim bixwînim. Ancex dikariya ji nêzve lê binêrim û wisa bixwînim. Wê rojê jî rojname anîn ji me re. Wê rojê dîsa rojname hatin. Tenê çend peyvên xaçepirsa wê hatine dagirtin. Tîp ji malkên wê derketî, ecêb hatine nivîsandin. Ez jî hewl didim vê xaçepirsê jihev derxînim û binivîsim. Min carekê dît ku dilê min zêde xirab xeliya. Xwîna hişk bûyî ji devê min hat. Bêhnek zêde xirab tê. Min heta demekê serê xwe danî ser balgî û wisa mam. Paşê min hinek din zehmetî da xwe û ji xwe re got divê şiyar bimînim. Her ku li rojnameyan dinêrim, dil xelandina min zêde dibe. Lewma min dev ji wan berda. Min balgî da ber pişta xwe û pal da. Tiştek ecêb bû, weke ku li benda hineka û li benda tiştekê me disekinim.

Bûye şev. Li şibakê re tarîtiya derve dinêrim. Cihên ku şewqên darên elektirîkê lê dikevin, kêmekê ronî ne. Ez ji tarîtiyê hez nakim. Şev lenet in, ti caran derbas nabin. Min ti caran ji şevê hez nekir. Dema ez dervede bûm, gelek caran şevê radibûm digeriyam. Li Îzmîrê qiraxên deryayên Nêrgizê meş kirin, ew hewaya nerim a deryayê girtina hinavên xwe gelekî bedew bû. Carê ez û Meral bi hev re li Elezîzê, li wê riya diçû Esentepe re dihilkişiyan. Carê jî me bi bazdanê xwe têre diberda. Lê belê meşa di bin heyvê de ji her tiştî cudatire. Bi taybet dema dibû heyva çardeşevî dilê min cuda lê dida û coşa min zêde dibû. Weke ku ez diketim nava wê ronahiya heyva dagirtî û mezin. Dema ez li mala pîrika xwe li ser banê xanî radizam, min bi saetan li heyva çardeşevî temaşe dikir. Di wan kêliyan de kêfa min zêde ji dua û hawarên dayîka min ên bedew re dihat.

Gelo ji ber kêmbûna şewqa lampeyê bû, an jî min şêlû didît, ev bêdengiya li nav odeyê û hewaya heyî bêhna min teng dikir. Dîwar heta nîvî gewr û berdewamiya wê spî bûn. Min bi tiliyên xwe qeydên destên xwe yên çepê kontrol kir. Dixwazim lêdana henaseyên xwe bihesim, dixwazim dilê min lê bide. Lê min çi kir, ew lêdan nedît. Ecêb! Gelo rayên min jî heliyabûn? Paşê min hîs kir ku tiştek weke ku ji kûranî ve derkeve û hêdîka were lê da.

Derve dengê qelebalixê tên. Dengê serbazê erkdar e. Derî vebû. Du darbest danîn tam korîdora miqabilî min. Yê vî alî Karasu bû, yê din jî Hamilî bû. Hamilî got;

"Sakîne em in. Ez Hamilî me. Yê kêleka min jî Karasu ye, ma te em nas kirin?"

"Belê, ma dibe ez nas nekim? Çavên min pir baş in. Ez dikarim rojnameyê jî bixwînim."

Hamilî got; "ez û Karasu ji girtîgehê tên. Me çalakî bi encam kir. Bi lihevkirinê qediya. Rewş baş e. Karasu di maşînê de hinekê xirab bû. Divê berî her tiştî destwerdana rewşa wî bikin. Lewma ez zêde nikarim bi-axivim. Emê paşê bi-axivin."

Min got; "ma her tişt hat qebûlkirin?"

Got; "belê, belê."

Min pirsî; "temam, bes kes şehîd heye?

Got; "na, na."

Dema min got; "rast bêje."

Got; "bawer bike rast dibêjim." Kêfa min ji vê agahiyê re hat. Lê dîsa jî ji min re wisa hat ku rast nabêje. Got; "li xwe baş binêrin, dê doxtor mijûl bibe." Min jî got; "silavan bike." Reşatiya ser û çav, û rihên Reşo baş dixwiyan.

Yekser doxtor û hemşîre ketin hundir. Destwerdana rewşa me kirin. Weke awareyek nû ji xew rabûye, weke ku derziyê li nexweşek ji rêzê bide, derzî li kemaxê min dan. Êşa min di wê kêliyê de jiya, min ti deman nejiya bû. Jina derzî li min dayî, bi dengê ku min derxistî ve recifî û ser xwe ve hat. Weke ku hestiyên min hêrandibû. Min jî bêdeng got; "jina bi lenet."

Ez pir zû ser xwe ve hatim û zindî bûm. Hêj serûma min neqediyayî li ser cihê xwe rabûm ser piyan. Ez sibehê li ser piyan bûm. Hêdî hêdî her kes zindî dibû. Me hevûdû hemêz kir û encam li hev pîroz kirin. Piştî demjimêrekê malbat hatin. Her kes di rewşa cejnê de dijîn. Bawer nakin ku em zindî bûne û hatine guhertin. Min yekser cilên xwe guhertin. Bes hêj bêhna mirinê dihat.

Tedaviya bi rojan doma, xwedîkirina bi serûman û diyetê ve hêdî hêdî ew bedena me ya xirab bûyî dihat guhertin û ser xwe ve dihat. Hêj axaftin û meş ne bi şêwazê asayî ne. Metabolîzma me ser û bin bûye. Doxtor jî ecêb dimînin. Dibêjin; "zanista Tip'ê ser û bin bû." Em jî dibêjin; "ev rihê PKK'ê ye. Jixwe dê her tiştî ser û bin bike."

Em çûn girtîgehê û me li wir agahiyên şahadetan bihîst. Cemal Arat û Orhan Keskîn şehîd ketibûn. Me pênc şehîd dabûn. Duyan xwe şewitandine, yek di êşkenceyê de, du jî di rojiya mirinê de şehîd ketine. Me di maşînê de şokek din jiyan kir. Li ser hevalan cilên yek tîp hene! Me bi guman li wan temaşe kir. Paşê me nêrî hemû jî nasin. Hevalên ku di çalakiyê de bûn. Hevalên di çalakiya rojiya mirinê de bûn. Destpêkê me got qey ji ber cilên wan tine ne, ji ber wê li ber xwe kirine. Ji ber di êrîşa Çileyê de bi zorê û êşkenceyê dabûn li berkirin. Dibe ku wisa rakiribin nexweşxaneyê. Li hember nêzîkbûna me ya matmayî gotin;

“Ma hûn nizanin? Ev cilên yek tîp di meha Çile de hat liberkirin. Di roja mirinê ya hatî destpêkirin de. Jixwe piştî wê êrîş hatin rawestandin. Cilên yek tîp bibû bazara rawestandina êşkenceyan. Di nava daxwazên me de jî hebûn. Lê qebûl nekirin, tiştên din hatin qebûlkirin.”

Agahiya şehîdan, agahiya cilên yek tîp. Kî dizane weke din çi hebûn. Dê me çi tiştên din bihîstan? Dema Meto hatî cem me cilên yek tîp li ser tinebû. An jî min ferq nekiribû. Gelo ji bona di rojiya mirinê de bûn, ji ber wê li ber xwe nekiribûn? Nexwe dema got; “cilên yek tîp qebûl nakin” behsa vê dikir. Min qet bawer nekir ku di dema çalakiyê de li ber xwe kirine. Min û Gonûl li çavên hev nêrî. Weke ku bêje; “dema min ji te re got, te ji min bawer nekir û dijûn ji min re kir” li min dinêriya.

Em li heman warî bûn, lê me di tecrîdê jiyan dikir

Em jî her tim peymanên bi qofik çêdikin. Gelo çima? Me jî bersiva vê ancex di pêvajoyên pey re, salên dirêj nû fêm kir. Dijmin yek tîp dikir hêcet, me ew hêcet jî dest derxistibû. Lê ferzên din girîng bûn, me li ser wan jî li ber xwe da. Me nirxandinên weke; "Me cilên yek tîp li ser esasê ku heta merc baş dibin paşê dîsa derxin, li ber xwe kirine" ve parçe parçe rastiya vê pirsgirêkê jî baştir fêm kirEm her tiştî nîv bi nîv hîn dibûn. Em hem di heman warî de bûn, me bi hev re heman pêvajo dijiya, lê hem jî cuda bûn, weke ku ji dervî bûyerane û em dûr bûn. Rastiya heyî destnîşan dikir ku rewşa me nediyarker e. Berjewendiyên giştî û pirsgirêkên bingehîn ên hemû girtiyan eleqeder dikirin girîng bûn. Me jî di vê mijarê ji tiştên ku pêwîst in werin kirin zêdetir, tiştek din nedixwest. Bes bila bihata gotin, bila agahiya me heba, an jî em merc û demên kirinê bizanibin.

Lê mixabin hêj, çembera tecrîta ku dijmin demek dirêj disepîne neşikandin, an jî ji ber bandorên wê hêj dervî biryarên jiyanê mayîn, gelek xirab bûn. Li cihekê ev alî hinekê xwezayî dixuyê. Jixwe ji berê ve girtiyên jin bi tena serê xwe bûn. Heta niha bi çaveke îdarekirinê li wan dinêriyan. Lewma ji bona wan yek tîp li ber xwe kirin û nekirin girîng nebû. Bes tecrîd bixwe pêkanek dijmin bû. Dibe ku hêzek me ya ku bikaribe biryaran bandor bike tine bû, lê gelek tiştên ku em bêjin hebûn û ev jî nemijarên erzan bûn. Ango her tişt ji tesadûfan re hiştibûn. Ji bona nivîsandina notekê, agahî şandin, girtin, girêdanek çêkirin, ji pêşketinan agahî girtinê re her tim em mijûl bûn, me hewl da. Hewldana hevalan zêde lewaz bû.

Weke qadek dûr û cuda dihat dîtin. Weke din em jî hînî vê rewşê kirin. Asta li ser me dihizirîn, çarçoveya hestewarî derbas nedikir. Ango em heyf bûn! Nêzîkbûnên wan bi şêwazek xweziya em hatiban girtin bûn. An jî dibe ku ji aliyê moral ve bandor bibin.

Em jî tiştên ku me bihîstine û hatine jiyîn dubare dubare dinirxînin û nîqaş dikin. Em çi dikin, di hinek mijar de qane nabin. Lê dîsa jî em di nava hevalan de her nirxandina ji rêzê nakin. Em naxwazin zemînê bandorên neyênî werin avakirin. ‘Yek tîp bi taktîkî li ber xwe kiribûn!’ em jî hewl didin di vê mijarê de hem qane bin û hem qane bikin. Bes em di navbera hinek hevalan de mijarên ku qane nebûne vekirî nîqaş dikin. Di vê manê de dikevin bendewariyek ku emê yek tîpî kengî li ser xwe bavêjin.

Em ancex du-sê mehan hatin ser xwe ve. Yên herî dirêj li nexweşxaneyê man Karasu ew bûn. Gelek hevalên ku tenduristiya wan xirab bûyîn hebûn. Em jî li bendê ne ku derbarê peywendiyên di navbera koman, paşeroj, nirxandina pêvajoya dawî, nîqaşên giştî, rewşa avaniya me, divê çi were kirin de heval perspektîfan bişînin. Lewma em jî ji bona vê hevdîtina bi malbatan re ferz dikin. Em malbatên nêz, ango xwîşk û bira, hevjîn, zarokên ap û xal, çi xizmek heye didin pêş û daxwaza hevdîtinê li îdareyê dikin. Hevalên xort jî ji aliyê xwe ve hewldanên wisa dikin. Li gel vê gelek hêcet jî didin pêş, da ku pêk neyînin.

Ji ber demek dirêj bû kesî hev nedîtibû, xwezayî mereqek hebû ku her kes rewşa tenduristiya hev bizane, pêdiviyan pirs bike. Di navberê de her çendî quralên zêde hişk hebin jî, bi

dem kinî hevdîtin jî çêbûn. Hevdîtina destpêkê li korîdora jêr beşa me pêk hat. Piraniya qoxuşê hatine. Hema bêje xizmên her kesî hene. Her wiha dema hinek din jî weke xizim tên diyarkirin hejmar zêdetir dibe û qelebalix pir e. Riza, Hamilî, Silêman, Selîm, Meto û gelek kesên din hatine. Min hemû jî hemêz kirin. Hemû leşker, serbazên nobedar, sitvan, tev di hevdîtinê de amade ne. Baldar nêz dibin, dihizirin ku em not bidin hev. Jixwe ger nehizirin ehmeq in.

Me bi Riza û Hamilî re parçe parçe jî be hinek mijarên ku mereq dikir nîqaş kir. Dem kine, ji ber kelecan û kêfxweşî zêde ye, em nizanin emê kîjan mijarê bi-axivin. Min ji Riza re behsa rewşa Gonûl kir. Min got ger li ser vî bingehî pê re were axaftin, dê bandorek erênî bike. Lê gumanên xwe jî bi nirxandinên xwe re diyar dikim. Pirsgirêka heyî bi nêzîkbûnek takekesî nanirxînim. Dixwazim rêxistin bizanibe. Em li ser rewşa Cahîde jî axivîn. Ji ber Riza jî ew nas dikir. Ew jî di deh rojên dawî yên rojiya mirinê de tevlî komê bû. Min derbarê yek tîp de nirxandinên xwe kirin û çawa agahiya me pê çêbû ji wan re got. Got; "dê pêvajo hêj berfirehtir were nirxandin. Di wê mijarê de hinek nebesî çêbûn. Bes nêrîna me ya giştî bû. Ne tenê ya du-sê kesan bû. Jixwe em gelek qadro li cem hev bûn. Lê dîsa jî hinek mijarên divê werin ronîkirin hene. Ger firsend hebin emê nivîsan ji we re jî bişînin. Hûn dikarin nêrînên xwe binivîskî ragihînin."

Dîsa tiştek zelal tine ye. Hevalan nedizaniya em di çi rewşê de ne. Em bêhedar li benda van rojan bûn. Em dixwazin hinek tiştan hîn bibin. Tenê tiştê giştî dizanin. Gotin em bi komên din re jî nivîsan dinivîsin. Mercên peywendiyên bi wan re, hinekê

jî girêdayî nêzîkbûnek rast a pêvajoya paşerojê re bû. Li ser bingeha helwestên lêpirsîn û rexnekirina paşerojê, dikariya peywendiyên dostane ji nû ve werin pêşxistin.

Ez û Hamilî zêde ne-axivîn. Ew bi fanîleyek milên wê kin, spî ve hatibû. Zora wî çûye ku bi cilên yek tîp ve were hevdîtinê. Dizaniya ku dê zora min jî biçe. Hêj em baş û dagirtî nikarin hevdîtinê bikin. Her tim hinek tişt kêm dimînin. Vê carê jî cilên yek tîp li ber wan e. Berê yek gotinek û awirek bes û girîng bû. Ji ber di nava wan quranlan de yek tişta girîng hebû, ew jî ev bûn ya dihat gerîn. Lê niha her tişta ku yên dijmin bû tehemula me nemabû. Di navbera me de biyanibûn ava dikir. Lewma her çendî Hamilî çakêt li ber xwe nekiribe, li ser pantorê xwe yê şînê tarî fanîle jî li ber xwe kiribe, rastiya heyî nediguhert. Her çendî ji bona kêliyekê jî be, ew dîmenê bêhna me teng dikir vedişart, tenê ev rastî dida diyarkirin. Ya rastî ji bona wan zehmetir bû. Lê rastî jî ev bû.

Her hevdîtineke min bi Meto re dil şikestî dima. Îxaneta di nava koma Elezîzê de, hêj di pêvajoya lêpirsînê ya destpêkê ve heta niha weke deqek reş maye. Bandorên wê xilas nebûn. Dijmin jî ev îxaneta navxweyî heta dawî bikar anî. Dijmin ji bona her miroveke di wê komê de ji aliyê moral ve bixe û radest bigire, çi hewce be ew dikir. Êşkenceyên herî giran wan dît, her tim ew bi îxaneta herî ketî ve rû bi rû man. Lîstokên herî kirêt hatin lîstin. Her cure şerê derûnî li ser wan hat ceribandin. Di wê dema serî hata pêvajoya 82'an de, bi zora zorê û êşkenceyan îfade bi wan dan îmzekirin. Hinek ji wan bi temamî îxanet hilbijartin. Hinek bê bawer bûn. Hinekan jî cardin xwe kom kirin û ew pêvajo derbas kirin.

Metîn dijûnên ku min jê re kiribûn, qet jibîr nekiribûn. Rast bû, ez di vê mijarê de gelekî hişk bûm. Wê demê ez çi bûm? Ma qey ez jî wê rojê kêm bandor bûm. Çi karê wî rêheval û birayê min ku, zêde jê hez dikir Metîn, Metoyê min di nava wan xayînan de hebû? Dilê min sekinî bû. Lê Metîn jî zêde bêzar disekinî. Ez di peywendiyên xwe de bi qasî hestiyar û nerim bûm, ewqas jî hişkbûn û bêrehmiya min demek dirêj bandor lê kiribû. Min di van hevdîtinan de zêde alîkariya wî nedikir. Em zêde nedi-axivîn. Lê ez bawerim me pir baş hevûdû fêm dikir. Ez bi Hamilî û hinek hevalên din re zêdetir di-axivîm. Dema min kêmasiya xwe jî ferq kir, vêca min ji xwe re kir derd û xemgîn bûm. Gelo hemû xwîşk û bira wisa bûn. Li heman eniyê, heman dozê, heman qada têkoşînê hem zêde nêzî hev, hem jî zêde dûrî hev bûn. Ma qey ev jî nenakokiyek xwezayî bû?

Berxwedaniya Îlûnê ya Mazluman, Ferhatan, Pîran û Xeyriyan a bêhempa, di nava girseya girtiyan de deng veda. Ew çalakî bi girse bû. Ew bandor bû hêzek serhildana îsyanek girseyî. Peyamên berxwedaniyan gelekî zelal bûn. Lewma pêşengî û rêxistinbûnek van peyaman baş fêm bike û bigihîne cihê wan gelekî girîng bû. Bandora Karasu ya giyanwerî diyarker bû. Baweriya pêkana hevalbendiya wan pêvajoyan dayî avakirin, bi xwezayî ew kir rêberê berxwedaniya ku dijî. Lewma dema Karasu dihat gotin, dihat wateya rêxistina girtîgehê. Ev bawerî û girêdan bedew bû. Cewhera vê girêdanê, girêdana bi Mezluman, Xeyriyan û Pîran ve bû. Me jî ev di kesayeta Karasu de zelal dîtibû. Ev rastiyek bê nîqaş bû. Li kêleka vê ji nû ve avabûna rêxistinî, kargeriya wê û ji nû ve dana rûniştandin jî hebû. Ev jî nekarek wisa bû ku, tenê bi hêza

giyanwerî bihata meşandin. Pêvajoyek sê-çar salên giran di nava şert û mercên girtîgehê de hatîn jiyîn hebû. Lewma tiştên ku hatine jiyîn derxistina zanebûnê, encamên wan rast nirxandin, ji bona pêvajoyên pey re di asta jiyanî de gelekî diyarker û girîng bûn.

Di meha Çile de jî dijmin bi êrîşeke topyekûn xwest bandora berxwedaniya 82'an bişkîne. Îlûnê rolek pêvajoya navbera derbasbûnê lîst. Lê belê, berî ku rêxistinbûn û pêşengiyek têkûz were rûniştandin, dijmin destwerda. Dikare were gotin dijmin, di meha Çile de, kombûna hemû êşkenceyên xwe yên hovane yên salên derbasbûyî da meşandin. Hem tinekirina fîzîkî esas girt. Hem bi ferzkirina îxanet û radestbûnên nû ve, xwest tinebûnê pêk bîne. Ya rastî pirsgirêk ne tenê li xwe kirina cilên yek tîp bû. Dê ev di pêvajoyek wisa de ji bona radestgirtina girtiyan, firsendê nede ku xwe kom bikin, ji nû ve vîna wan bişkînin û bigirin bin venêrînê weke amûrekê bikar bînin. Dê weke hêcetekê bihata bikaranîn. Ji bona dijmin pirsgirêka cilên yek tîp, amûrek kêm dihat dîtinbû.

Dema me navê vê pêvajoyê kir qofikê li ser piştê (Kambur), ev nav di cih de bû. Lê çima ev 'bar' ava bû? Çima berxwedaniyan piştî demekê bandora xwe cuda diyarkirin? Hema bêje hem pêvajoyek bi kul û derd bû û hem berxwedaniyek windahiyên mirovên girîng bû. Ji ber dijmin mirina koma yekê ya rojiya mirinê dabû ber çavan. Erê kiribû.

Me zêde derfetên nîqaşkirina li ser van pêvajoyan nedît. Em di vê mijarê de bêdengin. Tevî vê jî min ji pêvajoya 81'ê girt dest û weke rapor dest bi nivîsandina pêvajoyê kir. Bi gelemperî hejmara me, pêkhateya me, pirsgirêkên ku tên jiyîn

û yek bi yek rewşa hinek kesayetên me dinivîsim. Bi taybet jî rewşa kesayeta Gonûl û Cahîdê digirim dest. Em hêj nikarin hêsan notên xwe bişînin. Her tişt ji xweber re maye, firsendek hebe, em jî dinirxînin.

Rûniştina me ya dadê ji aliyê min ve bi encam bû. Em tevlî rûniştinan nekirin. Min 24 sal ceza girt. Her wiha ji bona paraznameyê jî dozek nû hatibû vekirin. Hamilî cezayê îdamê girtibû. Hêceta biryara derbarê min de jî zêde ecêb bû. Digotin; "ji ber qet baş nêzîk nebûye, heta dawî rêxistin parastiye, cezayê wê nehatiye daxistin." Metîn 18 sal ceza girt. Hinek jî hatin berdan. Piraniya wan jî ji ber di bersiva cezayê ku hatî dayîn de li girtîgehê mabûn, hatin berdan. Jixwe hinek jî xayîn bûn. Ew jî kom bi kom hinek cezayan ve derxistin derve.

15’ê Tebaxê rewşek cejnê ava kiribû

Sala Cuntayê ya çaremîn e. Çeteyên generalên faşîzan, ji bona her tiştî sê sal destnîşan kiribûn. Dê piştî bernameya salê ya hundirîn, plana derbasbûna ‘demokrasiyê’ pêk banîna. Hukumeta Ozal a di 83’an de hat damezirandin, rûyê cuntaya faşîzan a sivîl bû û hêj her tişt nehatibû qedandin. Li eniya şoreşger û demmokratîk a Tirkiyê jî komên çepgir, darbeyên giran xwaribûn. Qadroyên rêber û pêşeng ên gelek koman hatibûn girtin. Hinek hatibûn darvekirin. Li Tirkiyê jî berxwedaniya girtîgehan berdewam dikir. Mamak di destpêkê de hatibû xistin. Piştî ku Esat ewder anîbû rê, hatibû Amedê. Lê mixabin piştî berxwedaniya 82’an a mezin, ew bi xwe revî. Ango sernexist û li gorî dixwest jî Amed ne anî rê.

Partiya me li Kurdistanê pêvajoya paşve kişînê gelekî bi zanebûn û plansazî pêk anîbû. Rêbertiya Partiyê hêj bi destpêkirina girtinên Elezîzê ve, tevdîr girtin. Ev tevgera ku dijmin zû destpê kir, bû sedem ku partiya me jî di nava xwe de tevdîrên rêxistinî pêş bixe. Dijmin digot; "divê hêja mar biçûk e, serî were perçiqandin." Lê ew mar weke dihat zanîn nebiçûk bû. Nexasim serê wê jî ne ewqas biçûk bû, ku hêsan were perçiqandin. Belê di vê mjiarê de dijmin zêde xwe dixapand. Girtinên destpêkê, îxanetên navxweyî û girtinên qadro û girseyî tev cidî û darbe bûn. Lê serê Partiyê saxlem bû!

Her çendî ji ber hovîtiya li hundir û derve dihat pêkan, li welat belavbûnek rêxistinî, bi girseyan re tirs û çewsandin dabe avakirin, hêviya ku ji bona xebatên partiyê yên dervî welat dihat jiyîn, her tim zindî man. Li dadgehan di paraznameyan de her tim; Dihat gotin ku; "Têkoşîna me têk neçû. Dê Rêbertî û Partiya me ya ku vekişiyaye dervî welat, bi amadekariyên hêj mezintir têkoşînê ji nûve pêş bixe. Partiya me ti caran ji welat qut nebû…" Ya rastî hêvî û bendewariyên di vê mijarê de dihatin bilêvkirin.

Hinek nûçeyên di dema berxwedaniya 83'an de dihatin gotin hebûn:

Li hundirê welat ji bona Yekîneyên Propagandeya Çekdarî, sixinakên têra 20-30 kesî bike hatine amadekirin. Vegera welat pêk hatibû. Bendewarî û şîrove jî neqediyan. Hêj di salên destpêkê de dema nîqaşên têkoşîna çekdarî dihatin kirin, dema dihat gotin dê li kur pêş bikeve û were destpêkirin de, sêkuça Colemêrg, Wan û Şaxê dihat hizirîn. Digotin; "qada Yekmalê ji bona bicihbûn û baregehê guncav e."

Cihên ku dihatin behskirin sînorên Îran, Iraq û Tirkiyê bûn. Dê têkoşînê bandora xwe li her sê parçeyan jî bikira. Min ev qad ji hêla erdnîgarî ve nas nedikir. Lê dîsa ew nîqaşên gerim, heyecanek mezin didan min. Di pêvajoya şoreşa rûxandina Şah de jî heman nîqaş hebûn. Di nava me de parçebûn û cihêkarî tine bû. Dema hedef û xisletên şoreşa me di pêşnûmeya bernameyê de hatin bicihkirin, her çendî xweseriya rêxistinbûn û têkoşîna her çar parçeyan hatibe esasgirtin, wê di wateya pratîkî de mercên ku hene li ser esasê avakirina aliyên hevbeş têkoşîna hevbeş bihata ferzkirin.

Pirsên weke, " Hûn dixwazin bi dilxwazî biçin Rojhilatê Kurdistanê şer bikin?" dihatin kirin. Hêj di wê demê de Qarasungur behsa bi dilxwazî çûna wir û şerkirinê dikir. Çiqas tiştek ecêb bû, ew jî li wan deran, li çiyayê Qendîlê bi fîşekek xayîn şehîd ket. Wê demê têkoşînên Belucîyan, Azeriyan, Kurdan û Mucahîdên Gel hebûn. Her wiha bi rastî jî bandor dikir. Ango pêşketina li beşekî çêdibû, yekser beşên din jî hem eleqeder, hem bandor dikir. Ev jî xwezayî bû.

Piştî berxwedana Çileya 84'an televîzyon dan qoxuşan. Me bi pereyên xwe kirîbû. Di nava daxwazan de amûrên ragihandinê yên weke radyo, tv, rojname û hwd hebûn. Şeva 15'ê Tebaxê di nûçeyên tv de; "komek terorîstên ku jin jî di nava wan de heyîn, ser bi navçeyên me Eruh û Şemzînanê de girtin… sazî û dezgehên dewletê bi roketan û çekên otomatîk ve reşandin, paşê jî bi maşînên li wan siwar bûn ve dûr ketin…" derbas dibûn. Di wê kêliyê de weke ku tufana kêfxweşiyê rabû. Kesekî berdewamiya nûçeyan guhdar nedikir. Tilîlî û govend têkil hev bûn. Li qoxuşên kêlekê jî liv û tevgerek hebû. Diyar bû her kesî govend girtibû. Dengê fîtkan dihat. Xwedêyo, çiqas xweş e ku me ev roj jî dît û bihîstin!

Em jî di navbera xwe de di-axivin; “belê, hevalan gotibû. Gurub ji bona vê li welat amadekarî kiribûn. Dê têkoşîn hêj zêdetir pêş bikeve. Demek têkoşîna çekdarî destpê kiribû. Ger gerîla carekê destpê bike, temam e.” Em di navberê de li televîzyonê jî temaşe dikin. Kes nikare kesî bêdeng bike, em dixwazin fêm bikin. Di dîmenan de jin, zilam û zarokên ku li malê xwe di cihên serşokê de veşartine didin diyarkirin. ‘Erkdarên’ ku tirs û xofa xwe tînin ziman hene. Hinek ji wan dibêjin; “hinek jinên terorîst ên li kamyonan siwar bûn hebûn. Bi destekê çeka otomatîk direşand, bi destê din jî maşîn dajot. Min bi çavên xwe dît. Hinek ciwan jî bi xwe re birin.” Jixwe vê gotina dawî kêfxweşiyek cuda da me.

Bes carekê destpê bike û belav bibe, ciwan namînin, dê hemû tevlî bibin. Ji ber dijmin zextek zêde dike. Yan girtîgehe, yan êşkence ye, yan jî derketina çiyê ye. Diyar bû ku dê ya dawî hilbijartan.

Weke cejnekê ye. Êdî mirin jî were, hemû êşkenceyên cîhanê jî werin nexema min e. Dibe ku kêfxweşiya van rojan jî mirovan bikuje. Bila mirinên wisa werin û mirovan bikujin. Dîsa di kêliyên wisa kêfxweş de yên yekemîn hatin bîra me Mazlum, Xeyrî û Pîr ew bûn. Ma qey çi dibû, wan jî ev rojên pîroz bidîtan. Qet neba bila yek ji wan bijiya. Ev e, êdî Kurdistan jî dibû Vîetnam! Diviya hevalê Xeyrî ev qêrîn bibîhîstan. Belê, li kêleka her kêfxweşiyekê, dil şikestinek wisa jî hebû. Weke ku kêfxweşiyek bê wan heram bû, henaseyek bê wan îxanet bû. Suc bû û jiyan bê wan nedibû.

Gelo ev pêşketinên li derve çêbûne wê rê ji çi re vekin? Şerê çekdarî destpê kiribû. Jixwe dê dijmin dervede tevdîrên xwe yên leşkerî bigirta. Dê li wan qadan hêzên xwe yên leşkerî zêdetir bicih bike. Dê zext û êşkenceyên xwe yên li ser gundan zêde bike. Di pêvajoya şoreşa Vîetnamê de gundên stratejîk hatine avakirin. Dijmin dikare vê li Kurdistanê jî pêk bîne. Dikarin gundan û gel bombebaran bikin. Weke din jî çi tişteke xirab heye em jî tûnin bîra xwe. Lê dibe ku dijber jî bibe. Ji ber ger çewsandin û zext zêde bibin, dê tevlîbûn jî zêde û leztir bibe. Jixwe gel jî welatparêz e, dê çalakî jî gel ber bi xwe ve bikişîne. Li Vîetnamê jî yekemîn Yekîneyên Propagandayên Çekdarî tên birêxistinkirin. Li Gîne û Angola jî wisa dikin. Mînak li Gîne destpêkê li bajaran di nava derdorên çîna karker û kedkar de têkoşîn destpê dike. Dijmin zêde dijwar êrîş dike û komkujiyên girseyî pêk tîne. Bi vî rengî nikarin girsê biparêzin. Paşê taktîkê xwe diguherînin. Li çolteran destpêkê yekîneyên propaganda dikevin navê, ji gel re propagande dikin, paşê jî yekîneyên çekdarî dikevin nav û venêrîna xwe saz dikin. Bawerim dê ya me jî wisa be. Ya rastî şert û mercên Kurdistanê cuda ne, lê dîsa jî gel ev sê-çar sal in di bin zexta dijmin de ye. Lewma divê mîsoger tirs û xofa hatiye avakirin were şikandin û ji nû ve were birêxistinkirin. Dê çalakî jî van pêvajoyan bileztir bikin. Niha li her cihên Kurdistanê ev çalakî hatine bihîstin. Qaşo cunta her carê digot; "me xilas kir, paqij kir." Dê gel bidîta û hîn biba çawa xilas nebûye. Dê hêviya şoreşê ji nû ve zindî bibe.

Belê, vêca wê di hundir de bandorek çawa ava bikira? Berî her tiştî ji bona girtiyan moral, hêz û hêvî bû. Ne tenê ji bona girseya me, wê girtiyên ji her komê jî bandor bûna. Ya rastî dê

dîsa hinek derkevin û bêjin; “Macera ye, Donkîşotî ye.” Di pêvajoya destpêkê ya girtîgehê de ev peyv zêde dihatin bikaranîn. Herî zêde jî komên çepên Kurd ev pênase hêjayî me didît û bikar danîn. Diyar bû dê bi pêşketinek wisa girîng re, ev peyv zêdetir bikar bînin. Ji ber li gorî wan li dijî cunta çalakiya çekdarî dînîtî bû. Tirsa ku; “dê li ser gel komkujiyê bikin” bi rastî jî ne tirsek gumana fikirandina gel bû. Tirsek ji hêza dijmin bû. Dijmin dinepixandin û ew weke hêza qudreta xwe ya kirina her tiştî heye didît. Li şûna ku li dijî wan têbikoşin, di rojên wisa zehmet de, mantikê “bêhnvedanê” di nava jiyanê de pir zelal derdiket holê. Gotinên dijmin ên; “me xilas kir, emê xilas bikin” bandora xwe gelekî li ser hinekan kiribû. Vê jî bêbaweriya li hember şoreşê rave dikir.

Dijmin dikariya di hundir de her yek ji me girtiyan weke rehîne bigire û bixwaze tolê rake. Ev jî îhtîmalek bû. Şîrove û nirxandinên destpêkê bigiranî di şêweya; “gelo dijmin dikare di hundir de me bikuje? Gelo dibe ku îdaman bixe rojevê?” de bûn. Lê ev nirxandinên me jî zêde nerasteqînî bûn. Dîsa jî me got; “em xwe amade bikin. Dema em li bin dîwaran dan ber fîşekan diruşmeya me jî ‘Bîjî Berxwedaniya me ya Eruh-Şemzînan e!’ Hinekan jî digot; “gelo dema me bikujin dê çavên me bigirin?” Ango ji îdamê zêdetir, dixwestin bi fîşekan me bikujin. Hinekan jî nîqaş dikir, divê kursiyên darvekirinê çawa werin xistin.

Pêşbaziyek ji mirinan mirin ecibandinê destpê kiribû. Lê hemû jî nirxandinên ku kena xwe bi mirinê dikirin bûn. Hemû nêrîn; “Bila li welat, dervede têkoşîna çekdarî destpê bike, bila me bikujin” bûn. Her ku em dihizirîn mantikê heyî berovajî

dibû. Ji ber dijmin di demên berxwedanî û çalakiyên mezin di hundir de hebûn, zêdetir diket nava panîk, tirs û xofê. Ma qey di çalakiya Mazlum de ne wisa bû. Ma qey di heman çalakiya mezin a Ferhatan û Xeyriyan de jî heman tirs û xof nebû? Tenê dikariya êrîşî cihên lewaz bikin. Ew jî ji bona çav bitirsînin. Lê bi giranî êşkence û zextên din dihatin rawestandin. Çalakiya Eruh-Şemzînan darbeyek mezin ku dijmin ne li bendê bû. Wê demê dê zêdetir panîk, tirs û xof bijiya.

Belê em di vir de xapiyabûn. Em jî di navbera xwe de wisa nîqaş dikin; "kî gotiye dê dijmin wisa êrîşî hundir bike? Tê bîra we polîsên êşkence dikiran di lêpirsînan de, di wan demên darvekirinan de digotin, 'xeter e ku em yên PKK'yî darve bikin. Yên din tên darvekirin û xilas dibe. Lê tu yeke PKK'yî darve bikî dibe bela. Dê Kurd îsyanê rakin. Gef li me xwarine, ger hûn yek ji me bikujin, emê hezaran ji we bikujin.' Ya rastî ev di çapemeniyê de jî derketibû pêş. Lê ew rojname nedan me. Dê partî li hember yek darvekirinê cîhanê bişewitîne. Xweziya cesareta wan heba yên ku di êşkenceyan de kuştine darve bikiran. Dê berdêla encamên wê yên siyasî zêde giranbiha bûna. Dê raya giştî ya cîhanê jî bertek raber bikira."

"Belê, li hember yek kesî hezar kes." Êdî ev gotin weke diruşmeyan di devê me de bûn. Êdî em nirxandinên rasteqîn bi rêya nîqaşan ava dikin. Bertekên me yên destpêkê xapînok bûn, zêde ne domand. Bawerî pêş ket, bendewariyên zêdetir bi hêvî hatin jiyîn. Jixwe bê ku wext serve biçe, di dadgehan de jî diyar bû.

Piştî 15'ê Tebaxê rûniştina yekem a dadê ya koma Mêrdînê bû. Ew jî roja biryarê bû. Her kes bi hêvî bû. Dê helwesta dadê

û dijmin zelal derketa holê. Em ji yên li benda berdanê re jî dibêjin; “berdanê jibîr bikin.” Dibe ku dijmin li girtîgehê zor bikar ne anîbe, lê di dadgehan de dikariya cuda nêz bibe. Em ne şaş bûn. Cezayê herî giran jî vê komê girt. Di rastiyê de jî yê ku diviya zû werin berdan jî herî zêde di nava vê komê de bûn. Ji ber piraniya wan di asta sempatîzan, alîgir û welatparêz de bûn. Biryarên hatin dayîn jî ecêb bûn. Cezayê herî kêm 24 sal bûn. Ya herî giran jî darvekirin bû. Nîvê wan cezayê giran, nîvê wan jî cezayê îdamê û bêdawî (mûebbet) girtin. Her wiha

li diruşmeyan jî “Bîjî Berxwedaniya Eruh-Şemzînan” ser ve zêde bû. Dadgeh jî wê rojê li dijî wan cezayan bû şahidê coşek wisa.

Bîjî PKK! Bîjî APO!

Bijî Berxwedaniya me ya Eruh-Şemzînan!

Bimire Mêtîngerî!

Bi giranî jî yên ku cezayê îdam û muebbetê girtine ev diruşme diqêriyan. Wê rojê koma Mêrdînê pir bi hêrs bû. Diruşme qêrîn jî ‘suc’e. Yekser şandeya dadê daxwiyaniya sucên nû da. “yên ku diruşmeya biqêrin dê werin tespîtkirin.” Biryara meşandina lêpirsînê hat girtin. Êdî biryarên wisa asayî ne. Weke bûyerên ji rêzê bûn. Ji ber ji her tiştî re dozên nû, cezayên nû dayîn, karê herî bingehîn ê dadgeha sikiyonetîma Kolorduya 7. bû.

Bi giştî jî hinek girtinên nû û yên ji çolterê girtine hebûn. Bes yên ku danîn qoxuşa jinan piranî xwendevan, an jî welatparêzên ku ji çolteran anî bûn. Ango yên alîkarî kiribûn. Zêde agahiya me ji pêşketinên nû çênebû. Tiştên ku me dibihîstin jî, ji yên ku me çapemeniyê bihîstine cudatir nebûn.

Vê carê jî Besê ya ku li Rojhilata Navîn maye û jiyaye hat. Bi mehan li nav lêpirsîna Mêrdîn û Amedê de mabû. Heta dema derneket me digot; “di êşkenceyê de hatiye qetilkirin.” Emine İsfendiyaroğlu ya ku ji TKP’ ê bû digot; “ez vekirî bêjim, nêzîkbûna min a ji PKK’ê re, piştî helwesta wê keçê ya di êşkenceyê de hat guhertin. Em weke Partî PKK’ê cuda şîrove dikin. Weke kes jixwe ti nêrînek min a cuda nebû. Me digot; “rêxistinek şikbar e.” Me li derdora xwe jî propagandeyek wisa dikir. Min li cem polîsan berxwedaniya jinek PKK’yî dît. Piştî wê min ji tiştên ku gotine şerim kir. Bandor li min û me hemûyan jî kir.” Digot navê vê kesê; “Mevlûdeya bi nasnav Besê ye.” Cara yekê bû me navê Mevlûde, navek wisa dibîhîst.

Dema Mevlûde hat em her tiştî hîn bûn. Beriya niha nasnavê Cîhan û Besê bikaraniye, dema li Mêrdînê dibistana mamosteyan dixwîne, partiyê nas dike. Ew ji Sîwasê ye û eslê xwe jî Tirk e. Di pêvajoya paşvekişînê de, ew jî bi armanca dîtina perwerdeyê bi koman re diçe dervî welat. Ez bawer im me ji xwedê bixwesta, kesek wisa ku di her mijarê de agahî bide me ji me re nedidît.

Mevlûde kî bû, çi bû, li kur hatibû girtin û çima hatibû girtin? Em jî destpêkê van hîn bûn. Ew bi xwe biçûk dixwiya û porê wê rast û dirêj bû. Em ji ber porê wê ecêb diman. Di nava şert û mercên çiyê de çawa xwedî kiribû? Derbarê van de jî pirsên zêde bi mereq dihat kirin. Birhên wê reş û gir, eniya wê hemû por bû, navbera birh û por gelekî teng û kêm bû û ew jî hemû por bû. Ango eniya wê zêde teng bû. Rûyê wê hemû mûbû û simbêlên wê hebûn. Lê dîsa jî xwezabûnek wê ya çors hebû. Ji xwarin heta axaftina wê, hemû tevgerên wê cuda ne.

Pir rehet bi destê xwe ve bêvla xwe paqij dikir û piştî ku paqij jî dikir, tavêt derdor û destê xwe bi cilên xwe paqij dikir. Dikariya çayê, an jî ava di binê qedehan de maye çep û rast birijîne derdor. Li gel van nêzîkbûnên wê yên ecêb jî, zêde jîrbû. Mejiyê wê weke bîlgîsayarê kar dikir. Em jî hemû pêvajoyan yek bi yek didin gotin. Konferansa 1., Kongreya 2., perwerdeyên çêbûne, şerê Fîlîstîn û Îsraîlê yê 82'an, pevçûnên li Libnanê, perwerdeyên li malan û heta jiyanê, em tevan pirs dikin. Em ji Rêbertiyê destpê dikin, yek bi yek hevalên ku dinasin pirsiyar dikin û ew jî dibêje.

Em jî tiştên ku tên gotin dinirxînin. Li ser wan nîqaş dikin. Mijarên derbarê derve de me di paraznameyên xwe de nivîsandine bi van agahiyan jî, zelaltir dibin. Êdî em jî pir vekirî xebat û amadekariyên giştî yên partiyê zelal di paraznameyên xwe de dinivîsin.

Me ew pêvajo bi Mevlûdê dan nivîsandin. Bi taybet me xwest li ser di Kurdistanê de Rola Zor, Li ser Rêxistinbûn, Li ser Qadro, Li ser Îttîfaqan, nexasim jî li ser Eniya Berxwedana Hevgirtî ya Dijî Faşîzmê, çi dizane binivîse. Em jî baş pê didin gotin. Mevlûde dibe çavkaniya me ya materyalan. Ji ber vê xezîneya pê re, me her nêzîkbûnek wê yên cihê jî asayî didît. Ger dem bi dem bibin sedema lihevketin û pevçûnan jî, em xisletên wê yên tevkariyê dike didin pêş û bertekên hevalan dihedirînin. Lê Mevlûde jî di vê mijarê de kêm şer nake. Xisletên wê yên pir ecêb hene, li ber hevalan dide, berdide hev, xwe têkil her tiştî dike, erê na destwerdana her tiştî dike. Ev jî dibe sedem ku bertek rû bidin. Wê jî piştî dema rexneyên ji bona wê pêş ketine dinirxand, rewşa xwe ya beriya wê jî vedikir.

“Ez dibînim ku xisletên min li vir hêdî hêdî tên guhertin. Dema berê ev zêdetir bi min re dihatin jiyîn. Sedema ku min û hevalan li hev nedikir, heta bûn sedem ku min bişînin malê jî xisletên min ên di encamek wisa de bûn. Di vê radeyê de xirab bûn.”

Şêwaza jiyanê, yekbûna peywendiyên wê li her qadê jî girîng bûn. Li derve tevdîrên vê cuda bûn. Li hundir jî heta cihekê mirov dikare qebûl bike. Her çendî kesayet ji êrîşên dijmin zêdetir bi hinek xisletên xwe yên zehmetiyan ava dike ve mijûl bike, mirov neçar e ku heta kêliya dawî jî di nava têkoşînê de bigire. Tu nikarî jê re bêjî; “derkeve, biçe.” Ji ber dê tu yekser bişînî cem dijmin. Ger mirov bixwaze rêziknameyê jî bikar bîne, dîsa heman tişte! Tevdîrên weke tecrîd, peywendî rawestandin û cemidandin jî, heta cihekê kêr tên û bandor dikin. Her kes nikare van pêkanan jî rake. Ji ber mirov di cihek teng de ye. Ger mirov li van qadan şert û mercên axaftin, nîqaş, avakirina fikirê hevbeş û hevbeş biryar girtinê ava nekin, kesayet zû bi tenê dimîne. Dijmin jî bi tenê dihêle. Jixwe her kêliyê vê pêk tînin. Weke din jî mirov di jiyana civakî de bi tenê bihêle, dê wê demê kesayet pir zû ber bi xirabûnê ve biherike.

Em Mevlûdê bi pirsgirêkên wê yên berê ve nanirxînin. Bêguman, ew jî girîng in. Di naverastek her kes dixwazê de, ku her cure derfetên xebatên siyasî û leşkerî hene, ew rast nenirxandin û bi hevalan re rast nejiyîn suc bû. Bi israr digot; “min nexwest biçim malê.” Me jî di vê mijarê de tiştek zelal nedizaniya. Lê bi du milîsan re sînor derbas kiriye û piştî Amedê jî bi tena serê xwe li maşînekê siwar bûye, an jî trenê,

rasterast çûye Sîwasê. Beriya ku biçe gundê xwe, li mala xizmên xwe hatibû girtin. Dihat gotin ku bavê wê giliyê wê li cem dijmin kiriye. Ev îdîa jî ya wê bû. Bav jî keça xwe ya vegeriyayî malê nexwestibû.

Dikariya di van her du xalan de bihata dest girtin. A yekemîn bav, kesayetek qasî bikaribe keça xwe radestî polîs û dewletê bike, dijî civakê bû. Ev jî dihat wê wateyê ku dixwaze zaroka xwe ya eslî radestî êşkencekaran bike û di girtîgehê de bihêle. Bavek wisa bêrehim û ji dewletê ditirsiya. Di heman demê de bi salan bû ji malê derketibû, dihat zanîn ku dixwîne, lê derketibû çiyan û tevlî şoreşê bibû. Demek dirêj jî hesabê vê ji bav hatibû pirsîn. Di encamê de heman keçê dev ji wê jiyanê berdabû û hatibû. Feraseta paşverû û ketî ya namûsê û tirsnakî gihabûn hev. Ya rastî paşê zilam jî bi vê qehrê ve miribû. Lê aliyek wê ya zêde bi jan jî hebû. Tişta ku kirî nebaviktî bû û ne jî tiştek din bû…

Mevlûde ji perwerdeya dervî welat bandor bibû. Pêvajoya ku li nav şoreşê mayî nekêm bû. Di carekê de jî nedikariya bavêje. Ger Mevlûde nehatiba girtin jî, piştî vê qonaxê ji bona wê malbatê nedibû 'yar' û kêrî wan nedihat. Nedikariya bibe zarokek ku tiştin jê dihat hêvîkirin. Ji ber her qada diket bin bandora bûyera PKK'ê, nedikariya wisa hêsan devjê berde. Û wî ruhî bavêje.

Asta morala ku 15'ê Tebaxê ava kiribû gelekî girîng bû. Lê di hundir de her tişt bi vê asta moralê veguhertina hêzê, pêşketin rast şopandin û şîrovekirinê ve girêdayî bû. Ji ber aliyê bawerî, moral û hêviyê girîng bû. Lê peşketinên heyîn jî bi yek alî teng, ji dûr ve nirxandin jî nêrînek yek alî ava dikir.

‘Çırûska’ qoxuşa jinan

Ji bo hilberîna enerjiyê û pêşxistina afirîneriyê, fikir, xeyal kirin, şîrove û nîqaşê bi tena serê xwe têrê nedikir. Avakirina hinek tiştan, xwe gihandina wê û sazkirina guhertina wan, ya herî girîng bû. Me di navbera xwe de nîqaş kir û biryar girt ku em rojnameyekê derbixin. Me li ser nav nîqaş kir. Me hemûyan bi yek dengî bi zimanê Kurdî navê Çirûskê erê kir. Rengê amblemê dewlemend e. Çiya, pirtûk û çek li ser heye. Me du qaxedên dosya pêş û paş kir du beş. Her rûpel ji sê beşan pêk tê. Di girtîgehê de şêwaza biçûk nivîsandinê, weke xisletek nivîsandinê ya cuda hatibû pejirandin. Jêhatiyeke wisa ku bikaribe li ser qaxedên herî biçûk gelek tiştan binivîse pêş ketibû. Gonûl jî ev kar baş dikir. Piştî rojiya mirinê ya Çilê, hinek rexne pêş ketin. Hem yek bi yek rewşa kesan hat destgirtin, hem jî pêvajoya giştî hat nirxandin. Gonûl jî piştî wan rexneyan, zêdetir baldar nêz dibû û hişyar tevdigeriya. Her çiqas kêm jî be, pêşxistina peywendiyên bi hevalan re, peywendî û jiyana me ya hundirîn jî bandor dikir. Dema me Gonûl di nivîsandina rojnameyê de erkdar kir, êdî bawerî bi xwe jî daniya. Qet nebe helwestên xwe yên berê raber nedikir.

Em di rûpela rojnameyê ya destpêkê de diruşmeya bingehîn “Teslîmiyet Dibe Îxanetê, Berxwedanî jî Dibe Serkeftinê” dinivîsin. Di nivîsên serî, quncikên nûçe û şîroveyan de bi giranî pêşketinên ji eniya dijmin, rewşa nav-neteweyî, nûçeyên ku ji tv, rojname û radyo dibihîsin şîrove dikin û dinivîsinin, mijarên ku em ji girtiyên nû hatine û malbatan digirin, şîrove dikin û wisa dinivîsin. Di beşa perwerdeyê de jî bi giranî li ser mijarên weke partî, artêş, enî

çiye û çîn, şerê gel, sosyalîzm û emperyalîzmê esas digirin. Dîsa quncika şoreşên cîhanê heye. Ev jî ji bona welatên şoreşên xwe ser xistine, an jî hêj têdikoşin hatibû cudakirin. Xebatên partiya me yên dervî welat, pirtûkên ku derketine, axaftinên Rêbertiyê, erkên Yekîneyên Propagandeya Çekdarî tev dihatin pênasekirin. Di rûpela huner, wêje û çandê de jî helbest, danasînên pirtûkan û mijarên weke bîranînan cih digirt. Tenê wêneyek rojnameya me hebû, ew jî wêneyê Rêbertiyê yê bi rih bû ku di rojnameyê de derketibû. Ev wêneyê ku bi pênûsa reş hatibû resimandin, beşa rojnameya me ya herî watedar bû.

Me panzdeh rojan carekê derdixist. Veşartina wan nivîsan û heta nîvê şevê karkirin hem zehmet bû, hem jî zewqek zêde xweş bû. Gelek hevalên ku em bi hev re bûn, nedizaniyan çawa tê nivîsandin, parastin û amadekirin. Me zêde veşartî kar dikir. Lêgerînên li nav qoxuşan ji nişka ve û zêde çêdibûn. Carna heta me ew nivîs radikirin, em di navbera şev û rojê de diman. Rojname amûrek xebata perwerdeyê bû. Ji bona pêşxistina pêwendiyên di navbera me de jî rolek sereke dilîst. Bi taybet me jî îxanet û polîtîkayên dijmin ên kesayetan dixe dinirxand. Me ji dîrokê destpê dikir heta roja me îxanetên ku hatine jiyîn dinivîsand. Di dîrokê de Îdrîs-î Bîtlîsî, di roja me de jî Şahîn Donmez hebû. Me di nivîsan de dîrok û rojane danî cem hev.

Me yên ku Mevlûdê nivîsandine dişandin quxuşa 35'an. Di kovara Hawar de jî derdiket. Di girtîgehê de mijûlbûnek wisa, xweş bû. Her roja derbas dibû me rojname di asta blokan de dida xwendin. Berî niha yên îxanet kirine dixistin qoxuşa kêlekê. Me jî piştî pêvajoya Çilê şev û roj bi kulman li dîwar

dixist û ew aciz dikirin. Êdî gihişt astek wisa, me jî gengeşeya heyî tehemul nedikir. Lewma her roj me hinek saetan li dîwaran dixist. Ji bona gengeşe bandor li me neke, em jî diçûn qoxuşa 2. di asta em diwar hilweşînin de me bi kursiyan û firaxan li dîwaran dixist. Ji ber vê me her tim îdare jî mijûl dikir. Me digot; "an hûnê wan ji wir derbêxin, an jî emê wan dîn bikin." Di encamê de ew derxistin. Şûna wan di nava yên hatin de hevalên me, çepên Kurd û hinek ji komên çepgir ên din jî hebûn. Lê zêdetir hevalên me bûn.

Me di şibakê re bi tayê zirav not dişand û digirt. Dîwarên cihê hewagirtinê bilind bûn. Hema bi banê girtîgehê ve yek bû. Ji bona em agahî ji hev negirin, şibakeyên destpêkê yên li derdora dîwar lihêm kiribûn. Lewma şandin û girtina notan em zêde mijûl dikirin. Bes me hinek rêbazên din jî didît. Dema li cihê bêhnvedanê leşker nebûna, me not davêt, an jî dema korîdor dihatin şûştin, firsend heba me kunên mazgalan bikar danîn.

Baş bû ku me rojname dida, wan dixwendin. Piştî ku her qoxuşê bi dorê dixwend, ji ya din re dişand. Bi qasî dikariyan bigihînin, dişandin. Vê jî dihişt em hêj zêdetir li ser rojnameyê rawestin, baldar nêz bibin. Nivîsên dagirtî û bi nîtelîk binivîsin. Wan jî nivîs dişandin. Me nêrîn û rexneyên wan digirt.

Me rojname heta hejmara panzdehan, bi rêk û pêk derxist. Lê ji ber piştî hejmara panzdehan, li qoxuşê qiyamet derket, me nekarî em derbixin. Di pêvajoyên pey re me beşên resen ên van hejmaran derxist derve. Lê ti caran me pê nezanî, gihişt destê partiyê yan na.

‘Di sala 85’an de zagona îxanet û poşmaniyê!’

Her diçe li girtîgehan, hejmara girtiyan zêde dibe. Qelebalix dibe. Em jî van hem ji reqamên qoxuşên ku nû vedibin hîn dibin, hem jî heval di vê mijarê de hinek agahiyan dişînin ji me re. Îtîrafgerî û îxanet digihêje astek nû. Kesayetên weke Elî Ozansoy, Hîdayet Bozyîxît û Mistefa Çîmenan jî tevlî Şahîn û Yildirim wan dibin. Hîdayet li Elezîzê tê girtin. Hinekan derbasî Adana dikin, an jî li wir radest girtine. Vê carê jî li Amedê Elî Ozansoy pêşengiya îxanetê dike. Ew jî nûnertiya eniya gerîla dike! Mistefa Çîmen di pêvejoya lêpirsînê de radest dibe. Derbarê gelek tiştan de agahî dide. Hêj dijmin ew tam radest negirtiye. Li cihek derveyî îxanetgeran dima. Ewder jî nêzî cihê em li diman bû. Ji ber odeya di navberê de vala bû, me di şibakê re cihê hewagirtin û qoxuşa miqabilî xwe didît. Me peywendiyên xwe bi Çîmen re çêkirin. Me hewl dida em wî ji wê rewşê rizgar bikin. Rojên destpêkê di vê mijarê de hinek hêvî jî da me. Lê mixabin dijmin zû ew ji wir derxist û piştî demekê Mistefa Çîmen jî tevlî heman koma îxanetê bû.

Elî Ozansoy di TV û dadgehan de didan axaftin. Dijmin dixwest çalakiya 15’ê Tebaxê di bin siyê de bihêle. Dixwest bandora wê jî bi destên kesayetên wisa îxanet kirine bişkînin. Îxanetê hemû giyana wî dorpêç kiribû. Pirsgirêkên ku li çiyê hatine jiyîn bi senaryoyên cuda ve her serve zêde dikir û vedigot. Bernameyên taybet dihat amadekirin, îtrafkar di rûniştinên vekirî yên zindî de didan axaftin û her tim li ser tv bûn.

Di heman pêvajoyê de Sabrî Ok û komek heval li çolterê hatibûn girtin. Mewlûdê jî behsa rewşa qada Libnanê kiribû. Lê hevalê Sabrî wan ji qada gerîla, ji eniya şer a zemînê welat û ji nivê pêşketinên wir hatibûn. Behsa bandora 15'ê Tebaxê li ser gel ava kirî û tevlîbûnên ku çêbûne dikir. Li gorî wan gotî; gel pêl bi pêl derketiye çiyê. Keç û xortên ciwan dixwazin tevlî bibin. Lê mixabin ji ber hevalan hesaba bandora ku 15'ê Tebaxê ava bike nekirine, amadekarî jî ne hatine kirin. Lewma gelek kesên ku tevlî bûne vegerandine malê, tevlîbûna wan jî ji pişt re hiştine.

Îxaneta Elî Ozansoy wan di vê dema nû de darbeyek cidî bû. Bi sedan welatparêz hatine girtin û li gundan êşkence zêde bûne. Gel di bin çewsandinek giran de ye. Dijmin ji bona pêşketinên heyîn berovajî bike, her cure rêbazan bikar tîne. Lê dîsa jî partî di nava amadeariyên nû de ye. Hevalê Egîd ew destwerdana pêvajoyê dikin. Her wiha HRK (Hêzên Rizgariya Kurdistanê) hatiye damezirandin. Êdî heval bi cilên gerîla yên fermî û alê ve digerin. Aliyê me jî tije yên HRK'yî bûne. Zêde dijwar in. Sabrî ew jî niha li qoxuşek cuda ne. Me agahî girt ku hevalan gotine; "pêdiviya hevalên li wir hene. Ji ber wan nas dike, bila li cem wan bimîne. Emê dema pêş bigirin 35'an."

Herî zêde jî her kes bi agahiya HRK! kêfxweş dibe. Gavên yekem ên artêşbûnê, bingeha tovê destpêkirina artêşbûnê ye. Em jî dibêjin pêngavek jorîn a Yekîneyên Propagandeya Çekdarî ye. Em jî van pêngavên şerê gel zêde gerim nîqaş dikin. Her wiha em dinirxînin bê ka têkoşîna me di pêvajoya kîjan pêngavê de dijî. Lewma em xisletên wan deman ji aliyê teorîk ve jî, girêdanê wan bi hev re didin çêkirin û nîqaş dikin.

Lê dema em di rastiya şer de dinirxînin, em zêdegaviyê dikin û dinepixînin. Hest û daxwazên me pêş de dibezin û hinek tiştan zû çêdikin. Hema em stratejiya hevsengiyê jî derbas dikin, yekser derbasî stratejiya êrîşê dibin. Pêşketinên piştî gavên Dihê û Şemzînan, hêviyek mezin dan me. Em jî li ser raperînan nîqaş dikin. Dibêjin: "gelo wê li Kurdistanê raperînek çekdarî encamek çawa ava bike?" Bi qasî em dizanin li ser şoreşên Gîne, Angola, Vîetnam û Kuba nîqaş dikin. Nîqaşên weke, "raperîn bi xwînê tên rawestandin. Gerîla esas e. Dê serî heta dawî navê xwe li şerê gel bixe. Lê divê cih bi cih raperînên cur be cur jî hebin. Ger li cihekê pêk were, dê cihên din jî bandor bibin. Jixwe şerê gel xwedî xisletek ku, bê hevsengî tê rêvebirin e…" tên meşandin. Em dikin nakin, em nizanin em di kîjan pêngavê de dijîn. Nikarin di vê mijarê de tiştekê pênase bikin. Mevlûde dibêje; " em di pêngava Stratejiya parastinê de ne." Em jî li hember wê qiyametê radikin. "Evqas pêşketin hene, ma di vê demê de stratejiya parastinê dibe?" Hişê me yê xeyalan dagirtiye. Ya rastî her ku em nîqaş dikin, em zêdetir zelal dibin û dibînin ku çiqasî xwe di hinek mijaran de dixapînin. Ji ber hêj gelek qadên ku Yekîneyên Propaganeya Çekdarî neketinê hene. Divê gerîla baş pêş bikeve û berfireh bibe.

Djimin di planên xwe de gunertinek ku hem derve û hem hundir bigire nava xwe çêkir. Zagonek bi navê Zagona Poşmaniyê derxist. Taybetmendiyek wê ya cuda tine bû, armanca vê jî jîndakirina pêkanên xwe bû. Her wiha Zagona Poşmaniyê bi ser propagandeya şerê taybet ve, zêde kir. Ji gerîla re digotin; "werin teslîm bibin, hûn ceza nagirin, dê cezayên we werin daxistin." Ji yê hundir re jî digotin; "bêje ez

poşman im, emê cezayê te efû bikin û te derbixin. Dixwazî bila te yek kuştibe, dixwazî te kîjan cînayet kiribe bila be, bes bêje erê û were!" Li gel vê zagonê berfireh jî dikin. Kesên weke qaçax, eşkiya, çeteyên cînayetan, ên ji ber dozên xwînê li wan digerin, tev di nav de ne. Lê di esasê vê de li serê her tiştî PKK heye. Gelê Kurdistanê heye. Yên radest dibûn, piştî dîl diketin û îxanet dikirin, bi rojan li ser tv derdixistin bernameyên zindî, di rojnameyan de weke nûçeya serenav didan. Bi rêya wan jî bangî her kesî dikirin.

Dixwestin bi sozên weke kêmkirina cezayan, efû, maf û derfeta jiyana takekesî ya derve bide û emeliyatên estetîkê bide kirin, poşmanî û îxanetê balkêş bikin. Ji bona ev taktîkê dijmin jî baş were fêmkirin, me jî di hundir de nivîsên cur be cur nivîsandin. Nivîsên weke Zagona Poşmanî çiye? Hedefa wê çiye? Ev hemû di rojnameya dihat derxistin, Hawar'ê de, broşûrên cur be cur de dihat nirxandin.

Hemû bala me li ser vê êrîşa dijmin e. Berê tenê zor dida bikaranîn, zext û êşkence zêde dirêj dikir û kesayet neçarî poşmaniyê dikir. Niha jî bi zagonan, sozan û gefan ve dikir. Di cewherê de ti ferq tine ye, niha hêj zêdetir bi pergal dike.

Di nava heman salê de du jinên endamên Rizgarî yên ji Adana û Mersînê hatîn hebûn. Yek ji van jina bi navê Leyla Akbaş bû. Piştî demek kin du jinên din ên beriya niha ji ber endamtiya Rizgarî ya hem di pêvajoya Ala Rizgarî û hem bê ku bi navê 'Al' bû de, hatiye girtin û berdan jî anîn girtîgehê. Bi valîzên xwe ve hatine cezayên xwe temam bikin. Ev di wateyekê de radestbûn bû. Pêkanîna Zagona Poşmaniyê bû. Lê me hêj ev rastî nedizaniya. Doza wan a dadê didomiya. Ji derve

de jî bê ku werin girtin dihatin darezandin. Niha jî ji ber rewşek nû cardin hatibûn girtin. An jî hatibûn ku cezayên xwe temam bikin. Em jî wan weke 'şoreşgerên nerim' dinirxînin. Her wiha kesayetên ku me di 81'ê de nas dikirin. Ji ber bi hevrebûna wan rojên zehmet, bi xatirê wan rojan, em zêde bi wan re eleqeder dibin. Ti navberê naxin nav peywendiyên xwe jî. Pêşketinên giştî ji wan re dibêjin. Dîsa em ji wan re behsa nîqaş û nivîsandinên di navbera koman de dikin. Me peywendiya wan bi hevalên xort re çêkir. Derfet ji wan re çêkir ku bi hevalên xwe re girêdanekê ava bikin û not binivîsin. Leyla li hember zîndewariya me mat dimîne. Hewl dide bi giştî tevlî jiyanê bibe. Di her kêliyê de jî heyranbûna xwe bi lêv dike;

"Tevî evqas salên zor û dirêj wisa zindî mayîna we, rêk û pêkbûna we, avakirina nêvengek xebatên siyasî moral da min. Adana û Mersîn ne wisa bûn. Ez li wir dixeniqîm. Baş e ku ez ji wir hatime."

Em rojnemayê derdixin û xebatên perwerdeyê dimeşînin. Dîsa bi rêk û pêk werzîşê dikin. Jiyana me ya komînê bi rengdar derbas dibe. Kêliyên bîranînê hene. Em bi gelemperî hewl didin xwe bigihînin hevalan. Li dadgehan parastin tê kirin. An jî her kes di dozên PKK'ê yên cur be cur de hatine darezandin. Cezayên giran girtine. Ji ber rewşek cuda ya hatî avakirin heye. Lewma yê ku ji derve de tê yekser vê rastiyê dibîne. Dijmin PKK'ê muxatap digire. Di êrîşan de jî û hevdîtinan de jî hêza sereke hedef dike û muxatap digire, hêza PKK'ê ye. Ji ber bi dihan şehîdên xwe heye. Ya herî girîng jî li derve hêza yekem a pêşengê şerê çekdarî ye.

Ew jina endama Ala Rizgarî ya digot ku demekê li wargehên Rojhilata Navîn maye, binre binre jiyana gerîla xirab dida nasîn û fesadiyên her tişt berovajî dike yên weke; "jiyan xirab bû. Di têkîliyên jin û zilam de pîvan tine bûn. Her kes bi hev re dijiya. Jin dihatin bikaranîn. Kesekî/ê li ser şer nedihizirî", bi kesên ciwan û dihizirî bandorê li wan bike re digot. Li cem me jî behsa peywendiyên dostanî, têkîliyên îtîfakan û xebatên hevalan ên mezin dikir. Me ev ferq kir û heval jî hişyar kirin. Me got divê guh nedin şîroveyên kesên bi vî rengî.

Ya ku endama Rizgarî bû, ne weke li dema 81'ê bû. Zêdetir tefiyayî, tirsonek, di rewşek jina pergalê de ye. Dilreş, di halê xwe de û bê hêvî ye. Carê ji hevalê xwe re dinivîse. Lê hemûyan jî cuda cuda dinivîsîne. Ji ber vê me jî şik bir ser. Bi taybet Leyla demekê tim bi wan re nava pevçûnê de bû. Her tim bi jina ku bi hev re hatine re şer dikir, porê hev digirtin, dijûn ji hev re dikirin, heman weke wan jinên kolanan şer dikirin. Yên dawî hatin dixwestin dervî, dûrî van bisekinin. Her çaran jî guman ji hev dikirin. Ya ku bi Leyla re hatibû hinek din durist bû û bi me re di-axivî. Gelek caran digot, Leyla di lêpirsîna polîsan de bûye alavek lîstokê, gelek karên qirêj ve mijûl bûye, ji mafya bigirin, heta gelek komên çepgir, ketiye nava her kesî û derketiye. Lewma divê em baweriya xwe pê neyînin. Leyla jî ji ya din re digot; "dîne." Her duyên hatin jî her duyên berê hatîn dîn îlan kiribûn. Leyla ji bona her duyên dawî hatine vekirî digot; "radest bûne û wisa hatine." Ew tewanbar dikirin.

Weke lîstokek ecêb e û em jî li vê lîstokê temaşe dikin. Destpêkê zêde nehat fêmkirin, me got; “em lez nekin û hinekê fêm bikin.” Paşê me di helwestên wê de gelek tiştên ku wê bide dest peyda kirin. Bi taybet di kesayeta Leyla de her kêliyê rewşek cuda xwe dana der zêde bala me dikişand. Me hemû nivîsên wê kontrol kirin. Me piranî yên weke name û daxwazname, her tiştên ku bi destên îdareyê derdiketin derve tev kontrol dikir. Ev jî hewcedariyek dîsîplîn û sazûmaniya navxweyî bû. Ji ber carê di nameyên ji malbatan, an jî girtîgehên din re dihatin nivîsandin de, gelek xalên xeter, an jî nehewce dihat nivîsandin. Em ji mijarên ku dijmin bikaribe bikar bîne dûr desekinîn. Heval jî di vê mijarê de dihatin hişyarkirin. Carê kesayetên ku mercên heyîn û berxwedaniya li pey xwe xirikandî hebûn, rewşên bêbawerî û bêbiryariyê dinivîsandin. Lewma ev nivîs gelekî girîng bûn û me jî kontrol dikir. Heta hinek kes hebûn ji kesên li girtîgehên din dimînin û qet nas nakin re dinivîsandin hebûn. Dijmin jî kesên îtîraf kirine û îtîrafkarên veşartî ji bona van karan bikar danî. Destpêkê naskirin, paşê weke ku nas dike nivîsandin, paşê jî veguhertina nameyên evînî jî pêş diketin. Ên ev rewş dijiyan jî hebûn.

Ji girtîgehên weke Mamak û Metrîsê nûçeyên “li pişt deriyên hesin mehir pêk tên”, an jî îlanên eşqê, di rojnameyan de weke nûçeyên sernav dihatin dayîn. Di vir de armanca dana çavlêkirin û teşfîkirinê jî hebû. Ew jî kesên weke bêjin; “li şûna ku girtîgehê êş bijîm, ezê evînê bijîm” bûn. Jixwe di serî de jî baweriya wan bi şoreşê tine bû, lê heta wê rojê bi hinek aliyên mirovî ve xwe digirtin. Paşê dema bawer kirin ku jiyanek bi armanc tine ye, lêgerînên wan jî hatin guhertin. Şêlûbûna bi

kesayetan re hatinûçûn jî zêde bûn. Ne dikariyan ji derveyî jiyana heyî derbikevin û ne jî dikariyan tam têkil bibin. Li girêdanên malbatî digeriyan. Bêriya pîvanên wê yên kevneşop dikirin. Li şûna ku bi zanistî, hizirandinek zanebûn; bi mantik li ser jiyanê hukum bikin, bi ajoyên xwe li jiyanê dinêriyan. Vê jî dihişt ku kesayet di aliyek din de were hêrandin.

Leylayê jî xwe li ber bayê evîna di navbera girtîgehan de berdabû. 43 salî bû. Keçek wê ya 18 salî hebû. Destpêkê tenê ji keça xwe re dinivîsand. Behsa me jê re dikir. Berxwedaniya "keçên girtî" yên di temenê wê de dikir. Lê paşê nameyên ecêb jê re hatin. Gelo yeke nû nas kiribû, berê nas dikir, me ew nedizaniya. Lê dema xeyal û cîhana Leyla hat guhertin, me jî nameyên wê lêkolîn kirin. Mixabin Leyla bibû 'Krupskaya', nizanin kîjan kes jî bibû 'Lenin!' di xîtabên wan de heman ev dihatin bikaranîn. Yê miqabil digot, "Krupskayam." Heta cihekê me eleqeder nedikir. Ma dê me namûsa Leyla piştî temenê 43 salî û her cure jiyan jiyaye biparasta! Lê em di wê ferqê de bûn ku, nexweşiyek din dihat pêşxistin. Heman name ji Adana û Mersînê dihatin. Hinek din jî têkil vê tiştê dikirin.

Leyla êdî li nav ciha ye, serê wê di bin bataniyê de ye. Tenê di demjimêrên xwarinê de radibe, ji bona kêşana cixareyê derdikeve û her tim dinivîse. Her roj name dinivîsand. Her nameyek wê jî bi dehan rûpelî bû. Cîhana wê tenê ev bû. Piştî demekê naveroka nameyên wê hatin guhertin. Ne rasterast jî be li riyên derketina derve digeriya. Yê miqabil bi hostatî dinivîsand. Bes a li vî alî ji wî hostatir bû! Êdî Leyla bi sixtekariyek zêde ve hêdî hêdî her tiştê xwe difiroşt Mecnûn.

Bêhna wê teng e û ji nav cihan dernakeve. Me ji ber temenê wê jî ew di nobetên weke paqijiya rojane de nedinivîsand. Ew ‘xwîşka me Leyla bû.’ Her kesî xizmeta wê dikir. Qûnkê cixareyên xwe di qedehê de vedimirandin. Jinek ewqas qirêj û dev ji jiyanê berdabû. Kirêtiya giyana wê ya hundirîn tev dida der. Xeleka derdora çavên wê reş û şîn bûn. Rewşên weke koxik, bêhnijîn û belxem hemû rastiya giyana wê dida der. Awirên wê yên xayînan bûn. Weke rojên destpêkê bi ‘hezkirî’ li me nedinêriya. Dema me jî xwest em sedema vê bizanin, bi nakokiyê xwe yên ‘malbata Rizgariyan’ ve girê dida. Heta her ku diçû êdî ew Rizgarî jî nedidît. Carê hewl dida notên xwe, bi xwe bişîne. Me jî ev nêzîkbûnên wê asteng dikir. Ji ber not ji yek destê diçûn. Ev jî dibû sedem ku em bi Leyla re vekirî şer bikin.

Bi komên din re li ser hinek mijarên weke derxistina cilên yek tîp de hinek danûstandinên me yên nivîskî hebûn. Dihat xwestin ku yekîneyên çalakiyên hevbeş werin avakirin. Nivîs dihat ji van re jî. Ew nivîs û çend nivîsên din, ew anîbûn cem hev. Ev ‘yekîtî’ jî ne ji dil bû, an jî bi zorê dihat kirin. Weke parçeyek ji lîstokên wan bû. Bala me jî her kêlî dikişandin ser nêzîkbûnên xwe yên ji hev dixeyîdîn û lihev dihatin.

Çûnûhatinên Leyla yên di bin navê dadê û nexweşxaneyê de jî bala me kişandibû. Ji ber saetên çûnûhatinên dadê diyarbûn. Her wiha di wan demjimêran de dengê karyer û maşînên dadê tên. Em baş hînî wan dengan bûne. Nexweşxane jî bi heman şêweyî ye. Di saetên hatinê de heman deng derdixin. Em jî di vê mijarê de zêde hesas bûne. Ji ber di van hatinûçûnan de cil û bergên Leyla tên guhertin. Di rola herî

girtî de dermana li rûyê xwe dide. Xwe vekirî dixemilîne. Dema Leyla tê, bin çavên wê rastiyên wê dide dest. Em jî dibêjin; "Leyla doza te çawa derbas bû?" Her carê jî ji bersivdanê direve. Di rojên wisa de jî har dibe. Êdî dizane ku nêrînên her kesî yên li hember wê hatine guhertin. Lewma ditirse û êrîşkar nêz dibe. Ya rastî plan dike provakasyonekê ava bike û ji qoxuşê derbikeve. Em vê jî ji notên ku nivîsîne hîn bûn.

Êdî em jî notên ku di rojên dawî de ji bo hev tên nivîsandin desteser dikin û dixwînin. Me ev rewş ji hevalên qoxuşa kêleka xwe re jî got; "van zilaman hişyar bikin, bi-axivin. Têkîliyên Leyla bi îdareyê re hene, bi dijmin re di nava hevkariyê de ye. Hemû not û nivîsan ji dijmin re radigihîne. Bila bizanibin. Me notên wê desteser kirine. Bila ew jî bizanin. Emê paşê rewşa heyî berfirehtir ragihînin."

Leyla her tiştê pêvajoya borî de gotiye. Di cihên veşartî de bi rêveberiya girtîgehê re hevdîtin pêk anîye. Derbarê her tiştên me, nêzîkbûn, rewş û hwd ji dijmin re radigihîne. Jixwe tişteke Rizgariyan veşartî nemaye. Dijmin her tiştê wan dizane. Ger tiştek veşartî mabe jî, Leylayê di van hevdîtinên dawî de ew jî gotine. Lê belê, pirsgirêk neradestkirina Rizgarî ye. Pirsgirêk em in, PKK ye. Bi gelemperî agahiyên çi dibe, em dikarin çi bikin û di her mijarê de agahî dide dijmin. Ango bi taybet dibe jina pêkana Zagona Poşmaniyê. Ger Esad Oktay amadebûya, dê qîrek kirêt bida û dibe ku di haparlo de bang bikira. Ji ber jinek îtîrafkar derketibû. Lê derdê wî PKK bû. Keçek PKK'yî ya îtîrafkar derxistin bû. Lê ev jî di qirika dijmin de ma û pêk nehat.

Dijmin di pêvajoya êşkenceyan de xwest gelek kesan li dijî me bikar bîne. Xwest vê jî bi jinên fesad û sîxûr bike. Lê nekarî. Xwestin jineke ji mala Îzol'an bikar bînin. Tenê karîn hevjînê wê yê ji Bucakan bû, bikin sîxûr. Lê nekarîn wê jinê li gorî dixwazin bikar bînin. Ji ber jinê yek bi yek ji me re got, Esad çi jê xwestiye, pirsa kî kiriye û çi dixwaze. Her wiha got; "dilê min negirt ez li hember wê baldarî û dildariya we xirabiyê li we bikim." Niha jî taktîkek nû diceribînin, êşkenceyek rasterast tine ye, lê tîpên kesayetên wisa danîne cem me, jiyanek ji êşkenceyê xirabtir ava dikin.

Me beriya niha ji Leyla re gotibû; "ger di vê qoxuşê de ji nav jinan kesek îtîrafkar derbikeve emê, wê bikujin. Lêdanê bikin û ji nav xwe bavêjin." Ji ber vê ditirsiya. Jina ku bi wê re hatî, hatibû berdan. Teqez dijmin ew jî li gorî îfadeya ku Leyla daye, hatibû berdan. Ji ber ew jin ji me bandor dibû. Bi wê re hinek welatparêzî hebû. Leyla jî baş nas dikir. Lewma ger ew li vir bûya Leylayê nedikariya baş tevbigere. Di peywendiyên weke karê nivîsê de tiştên ku dijî berjewendiya girseya girtiyan didît, zû eşkere dikir. Mîsoger ji me re digot. Beriya biçe gotinek tam di cih de gotibû; "Leylayê Rizgarî û hinek din li ser destên xwe hejand. Bes dê bibe belaya serê PKK'ê jî. Ez wê baş nas dikim." Hevalên li Mersînê jî di nameyên xwe de derbarê vê mijarê de em hişyar kiribûn. Niha jî zelaltir ronî dibû. Tiştên ku dijmin nekarî bi êşkenceyan bike, wê bi destê jinek îtîrafkar bida kirin!

Me bangî endamên Rizgarî yên din kir û hişyar kirin. "em ji vê jinê şik dibin. Hûn jî rewşa wê dizanin. An li dijî wê helwest raber bikin, an jî emê we jî hevkarê sucê wê bibînin."

Me plana xwe berê çêkiribû. Notên ku diçin hevalên me digirin. Yên dihatin jî me digirt. Em jî beramber hev dixwînin û dinirxînin. Zekiyê Laz û Yilmaz nûnerên qoxuşên li kêlekê ne. Me jê re plana xwe got û me xwest ji 35'an re jî ragihîne. Hinekê nerim nêz bû û got; "lê nexin, tenê bavêjin." Me jî her çendî sembolîk jî be biryara lêdanê da. Dê weke çalakiyekê be. Ger dijmin bi vî rengî Zagona Poşmaniyê dide pêkan, dê bersiva me jî tam vekirî be. Emê van pêkanan ji raya giştî re jî ragihînin. Em dixwazin girtîgeh bibihîsin. Em dixwazin her kesê bi dizîve li nav poşmaniyê de ye, her kes wan binase.

Berbanga şeva ku me hişyarî kiriye, wê me Leyla û her duyên din li qoxuşa paş lêpirsîn bikiran. Şibake girtîbûn. Em pişt re pê hesiyan ku her duyên din ji ber hevkarên sucên li cem polîsan îtîrafên xwe nivîsîne û wisa hatine. Ji ber Leylayê jî îtîraf û xayîntî kiribû, me dê bi hevalên ku pêşde me bi hev re biryar girtî re lê bixista. Her kes berbangê zû rabibû û lez bi lez (volta) ji xwe re diçûn û dihatin. Çûnûhatinên qoxuşa din zêde bûn. Hinek li ber derî lê dinêrin. Deriyê qoxuşê bi hatina xwarinê re zû vebû. Deriyê korîdorê miftekiriye. Ez çavdêriya Leyla dikim. Min got; "wê ji min re bihêlin." Ezê tenê bi kulmên xwe dev û bêvla wê ketiyê bişkînim. Jixwe soza emeliyata estetîkê danê! Rûyê wê jî kirêt e. Bila hinek din jî li eynê binêre û rûyê xwe yê kirêt temaşe bike. Bila her cara li eynê xwe nêrî jî bêje; "keçên APO'yî wisa kirin." Min soz dabû xwe li ser rûyê wê şopa keçên APO'yî wisa bixwiyê.

Hêrsa min hemû ji ber jinek wisa ketî û xwe xistibû. Ji bona jiyana xwe ya erzan û rezîl, derbarê jiyana hemû girtiyan eleqeder dike, êşa evqas salan, êşkence jiya ne agahî dana

dijmin, îxanet hem cinsê xwe kirin, nedihat qebûlkirin. Diviya ew wisa rehet ji cem me neçe. Ew rûreşek bû. Wê li dijî berxwedaniya şehîdên me kirine, îxanet hilbijartibû û bêşerefî ferz dikir.

Leylayê bi tirs li dirdora xwe dinêriya. Dê biçe qoxuşa piştê cilên xwe li ber xwe bike û xwe ji bona taştê amade bike. Lê dihese ku tiştek ne asayî heye. Ji ber her duyên din tine ne. Heval zû bi ser wan de çûbûn û li qoxuşa piştê girtibûn. Dengê qîran û bazdanê dihat. Me li yên din nedixist. Têne bê bandor bihişta û sucên wan eşkere daniya holê. Hesabê tiştên ku kirine bihata pirsîn. Bes ger qîr bikin û helwestek cuda jî raber bikin, wê devê wan bihata girêdan û bi tundî bihatan hişyarkirin.

Çawa Leylayê ferq kir, ber bi derî ve çû, deriyê korîdorê da ber kulma û bi "hawar" alîkarî xwest. Ji ber ez hizirîm wê destpêkê biçe qoxuşa din, min lez nekir. Min nexwest şik bibe. Lê dema ber bi derî ve çû, min jî bazda. Ji piştê ve girt û kişand hundir. Pir bi hêz bû, li ber xwe dida. Diqêriya, min jî devê wê digirt. Gez li milê min dida. Diranê wê weke yên kuçikan di goştê min re derbas dibû. Min jî bi destê xwe yê din ew da ber kulman. Bere jî dibêjim; "madem te ewqas lez xwest, ha ji te re jina ketî! Jixwe wê tu paşê biçî emeliyat bibî. Jixwe bêvila te kirêt bû." Bênavber jî kulma li bêvla wê dixim.

Hemû heval li qoxuşa piştê ne. Dema deng bihîstin hatin wir. Tenê Fatma heye, ew jî dixwaze min bigire. Dibêje; "neke. Ez nû ji nav cihan rabûm. Çi dibe?" Ew jî xwe nebihîstî dike. Rast bû li nav cihan bû. Fatma xwe têkil karên wisa xeter nedikir. Ji ber xeternakî hebûn. Bi taybet dabû bihîstin ku tevlî nabe kes li Leylayê bixe. Zêde fêlbaz bû. Ez jî bi hêrs bûm;

“biçe ji vir, ev ketî direve, tu jî min digirî.” Ez di wê kêliyê de ji Leylayê zêdetir, ji wê aciz bûm. Jixwe me çar kesan berpirsyariya vê çalakiyê bi fermî digirt ser xwe. Armanca me bi her kesî dana bihîstin û bi vê mebestê raya gştî avakirin bû. Diviya her girtiyek li dijî Zagona Poşmaniyê derketa. Em jî dixwazin derfetên vê ava bikin. Dê hemû heval bêjin ku ti lêdan nedîtine. Lê wê me hemûyan bida diyarkirin ku Leyla Akbaş çawa bi kesayeta xwe ya ketî ve ji aliyê dijmin ve tê bikaranîn, tenê ji bona derkevê derve, çawa hinek din tewanbar kirine. Emê bi vî rengî Zagona Poşmaniyê eşekere bikin û pêkanên îdareyê jî şermezar bikin. Ji ber ev erkek mirovahiyê bû. Fesadî û îtîraf sucek mirovahiyê bû. Lewma şermezarkirin û li dijî vê helwest raberkirin, berî her tiştî peywirek mirovahiyê bû.

Ji ber Fatmayê encamên vê çalakiyê texmîn dikir, di wê kêliyê de ji Leylayê re got; “ez ne di nav de me ha!” Bi vî rengî peyama xwe jî dabûyê. Jixwe di jiyanê de jî li gorî Leyla jinek di halê xwe de bû, her tim me pê re nîqaş dikir û rexne dikir. Dema îtîrafkeriya Leylayê eşkere bû, Fatmayê yekser ji tirsan pirê di navbera me û wê de rakirin û avêtin.

Min ji Leylayê pirsî; “te çima îxanet kir? Tu ji kengê ve îtîrafan dikî?” Bersiva min bi qîr da; “ma ezê hesabê bidim we?” “Çend sal e dijmin mijûl dibe, heta niha jinek îtîrafkar dernexist. Te çima di nava şert û mercên wisa de, ji bona derkevî derve îtîraf kir. Êşkenceyek jî li te nehatiye kirin, ku heta em bêjin Leylayê nekarî li ber xwe bide. Zû bêje çima?” Bersiv neda min. Li erdê dirêj bibû. Her kesî tifî li rûyê wê dikir. Gelo mirov evqasî kirêt dibû, biçûk dibû û ji mirovbûna

xwe dûr diket? Lê mixabin, Leyla derketibû. Di wê kêliyê de zêde kirêt û ketî dixwiya. Me hinek dîrok jê re got, gelo çima di wan deman de çûye dadê û îdareyê. “Bêje te li wan deran, çi ji wan re got.” Dîsa tiştek negot û li ber xwe dida.

Aliye axivî; “Tif ji dayîkên weke te re. Her wiha te qet şerim nedikir, behsa keça xwe ji me re dikir. Te nameyên wê ji me re dixwend. Ew jî dizane ku dayîkek wê ya şoreşger heye. ‘Mîsoger ew niha dibêje ji ber şoreşgeriya te serbilind im.’ Wê niha jî bêje ‘dayîkek min a ketî heye.’ Sixtekar. Te ew keç jî xapand. Te îxanet li wê jî kir.”

“Kanî Krupskaya! Kanî Lenîn? Te ew zilam, an jî wî zilamî tu vexwendî îxanetê. Ezê te bikim qurbanê Krupskaya û Lenîn!”

“Te rolên jinên şoreşger ên herî kevnar dilîst. Lê di bin navê diçim dadê û nexweşxaneyê de derman (makyaj) li xwe dida û wisa diçûyî. Tu teqez jinek fahîşe yî…”

“Te hemû nivîs û notên ku hatin ji me re, ji dijmin re ragihandin. Te planên çalakiyên me dan dijmin. Di heman demê de te notên hevalên xwe dan dijmin. Jina milîtan a Rizgarî! Mixabin tu tam bênamûs û jinek xayînî…”

Bênavber li pey hev pirs jê tên kirin. Her kes sucek wê li rûyê wê dide. Zûbeydê xortoma kin a bi misluqê ve girêdayî aniye. Dê lê bixe dibêje; “em wê lêpirsîn derbas bikin.” Min nehişt û bi ser de qîr da. Lê dîsa jî ew nerawestiya û ferz dikir. Min got; “Na! Em destên xwe jî li wê mirova kirêt nadin. Em neçar hiştin. Li dijî wê şeqema herî baş, parastina onura xwe û xwedî li berxwedanê derketine. Xirabkirina lîstokên dijmin e. Lêdana wê helwestek me ya sembolîk bû. Ger em bixwazin em

dikarin bikujin. Lê nehêja ye. Jixwe wê xwe bi vî rengî kuştiye. Kesek ku ji mirovbûnê derketibe, çi wateya jiyîna wê heye?" Cardin vegeriyam ên din û domand; "we 81'ê dît, qiyamet radibû. Ev jin di 85'ê de hat. Di vê nêvenga bi xwîn û canê hevalên me hatiye avakirin de, yek lêdana dijmin nexwar û îxanet kir. We jî dizaniya lê hûn ditirsiyan. Ji ber hûn jî li ser esasê vexwendina vê zagonê hatibûn. Tevî ku me hûn hişyar kirin, hûn dîsa jî xwedî li vê xayînê derketin. Hûn vê sucê bi hev re dikin. Hûnê tev hesabê vê bidin." Bêdeng bûn û serê xwe tewandin ber xwe.

Saeta hejmarê hat. Min ji wan re got; "hûn li qoxuşê rûnin." Her duyan got; "na, em dixwazin tevlî hejmarê bibin. Rewşa wê cuda ye, ya me jî cuda ye." Me jî got; "temam, werin. Lê hûnê xwedî lê dernekevin."

Hejmar kêm derket. Serbaz pirsî; "yek kes tine, li kure?" Min got; "Leyla Akbaş li qoxuşa dine. Me ew ji qoxuşa xwe avêt. Biçin endama xwe bigirin." Serbaz mat ma. Bang li leşkerên din jî kir û çûn girtin. Bêvila wê werimî û bin çavên wê şîn û reş bûn. Min cara dawî li wî rûyê wê yê kirêt nêrî û bi dengek bilind got; "biçe, da ku ji bona te ameliyata estetîkê bikin." Serbaz jî awirên tûj li min nêrîn. Ji ber min ji wan re gotibû; "me li endama we xistiye, biçin bigirin, zora wî çûbû."

Serbaz bi lez daket. Tiştek negot. Tevî ku ew roj ji rojan yekşem bû, Cahît Aydoxan hat. Birêz Cahît Aydoxanê bi nav û deng ê dozgerê dadgeha leşkerî ya rêveberiya awarte (sikıyonetîm)! Demek din bûya nedihat. Me ewqas şehîd dan, ewqas êşkence hat kirin. Ev dozgerê faşîzan ê di eywanên dadgehan de tehemula axaftinan jî ne dikir, roja yekşemê hatibû îfada me bigire.

Destpêkê bangî du endamên Rizgarî ‘Al’ pêve ye, kirin. Piştî demek dirêj ew daxistin qata jêr. Leşkeran tiştên wan xwestin, me jî dan. Ketîne, her sêyan ev kar bi hev re kirin. Bila Rizgarî pesnên xwe bi xwîşkên xwe bidin. Me ewqas hişyar kirin. Tevî vê jî wan ew parastin. Gotin; “Leyla endama me ya herî baş e.”

Her kesî bi tiştekê bertekên xwe bilêv dikir. Lê me nedikariya xwe bigihînin wan zilamên ji Rizgarî. Min digot; “xweziya me tiştên ku bûne tev li nav çavên wan bixista. Haya wan ji wê xwîşka wan a ku diparastan çêbûya.”

Bi dorê bangî me jî kirin. Min, Gonûl, Mevlûdê û Cahîdê girt ser xwe. Me jî îfada xwe weke ku me destpêkê bi hev re destnîşan kiriye da û min ji wan re got; “hûn zagona poşmaniyê bi rêya jinek kesayeta wê ketiye pêk tînin. Hûn hewl didin kesan neçarî derewkirinê bikin û hinek din tewanbar bikin. Ew jin, ji bona ji girtîgehê derbikeve dikare her cure tiştên kirêt bike. Ne karê kesiye em çawa dijîn, kesî jî eleqeder nake. Em mirovên siyasî ne. Emê bi-axivin, nîqaş bikin, bixwînin û binivîsin. Hûn nikarin vê asteng bikin. We em bi îtîrafên Şahîn wan ceza kirin. Niha jî hûn dixwazin bi îtîrafên Leylayê wan ve hinek cezayên nû bidin. Ez van pêkanan protesto dikim.” Nîqaş dike û dibêje; “hûn li girtîgehê li mirovan dixin. Kanî hûn dijî lêdan û êşkenceya mirovan bûn?” Min awirên tûj li Cahît Aydoxan nêrî. Kujeran hesabê çend şeqamên me li Leyla xistibûn dipirsiyan.

Min jî got; “di vê mijarê de pir vekiriye ku kî êşkencê û zextê ava dike. Bi dehan hevalên me şehîd ketin. Bi dehan seqet man. Bi dehan nexweş man. Hûn nikarin van veşêrin.

Çima we ev hesasiyet ji bona wan diyar nekir? Hûn ji bona jinek piyon qanunên xwe jî davêjin aliyekê. We kengê roja yekşemê dadgeh ava kiriye? Ez ti îfadeyê nadim" û ji wir derketim. Piştî van daxwiyaniyan hemû heval yek bi yek çûn. Armanc jî xisleta çalakiyek bi vî rengî dana destnîşankirin bû. Jixwe hewce nedikir ku her kes bêje min li Leylayê xistiye. Jixwe tiştek wisa jî tine bû. Min girtibû ser xwe. Wê yên din jî Zagona Poşmaniyê protesto bikin. Di heman demê de dê hemûyan bidana diyarkirin ku Leyla mirovek bê kesayet û ketiye. Bûyera hatiye jiyîn nedîtine, bûyer li qoxuşa paş rû daye. Dadgeha yekşemê jî wisa derbas bû.

Ji aliyê doxtor ve raporek 12 rojan ji Leyla re hat dayîn. Armanc jî dixwestin rewşa wê giran bidin diyarkirin, da ku derbarê me de doz vekin. Bes pirsgirêk ne tenê bi vekirina dozê re ma, di heman demê de Leyla û her duyên din tam rola polîsan lîstin. Her girtiya nû dihat, didan cem wan. Ji ber yên dihatin jî, ji doza PKK'ê bûn. Kesayetên di asta xwendevan, gundî, yên xizmên wan girtîne, milîstî kirine de bûn. Beriya niha di pêvajoya binçavkirinê de li jêrê cuda dihatin girtin. Paşê jî yan digirtin danîn cem me, yan jî serbest diberdan. Leylayê wan li jêrê lêpirsîna kesên nû dihatin dikir. Yên ku di lêpirsîna polîsan de xwe nedane dest û îtîraf nekirine, ti agahî nedane, li vir neçarî îtîrafê dikirin. Peywendiya bi me re temamî asteng kiribûn. Temaşekirina di şibakeyê de jî, hatibû qedexekirin. Dema saeta hewagirtinê, ew li ber dîwar digirtin. Ne dihiştin serê xwe rakin û li jor binêrin. Ev jî di bin navê 'qedexeye' de pêk danîn. Em jî cuda didan naskirin. Hinekan ev ferq dikir. Em bi deng û Kurdî di-axivîn û me wisa hewl dida hinek tiştan ji wan re bêjin û bidin guhdarkirin. Me ji

hinekan re jî dîzîve not dişand. Tam weke lêpirsîna polîsan xwe ji yê nû hatin re şoreşger didin nasîn, da ku ew jî hinek tiştan bidin dest. Di yek du rojên destpêkê de îfadeyê bi wan didin nivîsandin. An jî ji dev hinek tiştên ku bihîstine yekser radigihînin dijmin. Lewma hinek ji van ji nû ve diketin ber lêpirsîna polîsan.

Dema di TV de agahiyên şehîdan didan, wan li çepka dida. Dîsa şevê derdiketin ser maseyan, xwe tazî dikirin û lotik davêtin. Dengên kirêt derdixistin û bi kenên dengê bilind ve şerê taybet didan meşandin. Ên nû hatine jî neçarî vê rewşê dikirin. Hinek şevan carê leşkerên 'ewlekariya derve' yên bloka miqabil, li ber şibakê kom dibûn, li wan temaşe dikirin. Bi zanebûn leşker tehrîk dikirin. Leşker jî li hember wê rewşê ji wan zêdetir dîn û har dibûn, nêzîkbûnên kirêt û xirab dikirin û deng derdixistin.

Hemû tiştên hem ji aliyê dadgehan û hem ji aliyê van ve dihatin kirin, tam şerê taybet bûn. Me di paraznameyên xwe yên li dadgehan de polîtîkayên dijmin ên di van mijaran de eşkere kiribûn. Lê dijmin jî di vê mijarê de bi biryar bû ku, berdêla vê bide dayîn û giran bi ser me de were. Bi rêya dadgehan hinek cezayên nû dixist rojevê, da ku kesên nekaribin van cezayan rakin, an jî zû bandor bibin tehdît dikirin û di bin zextê de dihiştin. Lê belê, tevî vê jî rûniştina dozê ya yekem erênî derbas bû. Jixwe bûyer jî min girtibû ser xwe. Tenê her sêyên din pêkanên hene protesto kiribûn û di wê astê de parastina xwe kirin. Bi giştî jî delîlek quralê xwe bispêrinê tine ye. Lê Leylayê wan behs kiribû, yek bi yek xisletên her kesî wisa pênase kiribûn, kî ji çi bandor dibe, divê ji kê re nêzîkbûnek çawa were kirin, bi hemû ziraviyan ve ji dijmin re destnîşan kiribûn. Dijmin jî her kes dinasiya.

Lewma dixwestin bi taloqkirina rûniştinên dadê ve mijûl bikin. Jixwe pir vekirî bû, dê ji bona şeqamekê her kes ceza nekin. Lê dîsa jî heval bandor bibûn. Hinek kesan jî li hevalbendên tirsên xwe digeriyan. Li şûna ku bertekên hene beramber dijmin xurt bikin, li hember me har kirin û bi ser me de barandin. Di heman rojan de qoxuşa xortan jî ji vê helwesta me bandor bibû û li kesek fesadiya wan li cem dijmin dikir dixin û ji nav xwe davêjin. Ev derbasî dadê jî nekirin. Lê nêzîkbûna me kirî ji aliyê dijmin ve nehat hezimkirin û êrîşî me kir. Dema ket ferqa lewaziyên di navbera me de tê jiyîn, zêdetir bi ser me de hat. Di encamê de ji ber lêdan û gefên kuştinê sê sal û nizanim çend meh ceza dan min. Ji ber gefan ceza nedan yên din. Paraznameya min jî kirin mijara dozê. Êdî tam du salan dozên min ên paraznameyan domand. Dozek weke rêze filmên parastina paraznameyan bû.

Dadgehên mêtînger nikarin me darezînin

Di koma Elezîzê de dosya dozê ji serdozgeriyê vegeriya bû û ji bona hinek ji me biryara endamtiya rêxistinê hatibû xirabkirin. Ji ber me weke endamên sempatîzan ango bi navê "kesên din (Saîr efrat)" digotin, ceza girtibû, pêvajoya girtina me jî ber çavan girtibûn û daxwaza berdanê kiribûn. Ango biryara dadgeha Kolorduya 7. girtibû hatibû xirabkirin. Biryara darvekirinê ya derbarê Hamilî de jî veguhertibûn (muebbetê) girtina bê dawî. Dema ev biryar hat ragihandin min got; "ez ti biryarên erênî yan jî dijber ên derbarê xwe de qebûl nakim. Ji bona min nederbasdarin." Ji ber me di paraznameyên xwe de gotibû; "ti dadgehên mêtînger nikarin me darezînin." Ji bona min ti biryarên ku dadgehan girtine derbasdar nebûn. Jixwe

dadgeh li dijî biryara xirabkirina derbarê min de derketibû. Bi gelemperî jî dadgehên xwecihî, li gorî biryarên dadgehên jorîn tevdigeriyan. Hema bêje di têkildarî hemû biryaran de helwestek wisa hebû. Lê di biryara derbarê min de nêzîkbûnek ferzkirinê hebû. Ji ber biryara doza din jî tam di vê demê de kirin rojevê. Şandeyên dadgehê tevlî hemû dozan dibûn. Dozgerê ku cihekê lêpirsîn dikir, li cihek din hakim bû, li cihek din jî tiştek din dikir. Lê hemû jî ev kar heman li gorî "pirtûkê lihev danîn" û dimeşandin.

Ger îhtîmala berdanê hebe, bi şaşî di erêkirina biryarê de ji bona min erênî biryar derbikeve, dibû ku tiştek wisa rû bide, dê yekser pir hêsan vê asteng bikin. Jixwe tevî ku hemûyan dengên xwe bikar ne anîbûn, biryarek li dijî min derketibû. Ya rastî hem sedema nakokiya di navbera dadgehan, hem nakokiya di navbera şandeyan de, ji ber zagon lihev nedihatin. Lewma dema zagon lihev nayên encamek li gorî girtî derdikeve holê. Ev jî nabe! Dema wisa jî dibû, dosya ji nû ve vedigerandin Enqereyê.

Doza me ya nû deng vedabû! Çapemeniya derve jî dide nîşan me çawa li Leyla Akbaş xistiye. Li girtîgehan alîgirên Rizgarî li mafên Leylayê digerin! Qaşo 'xwîşka' xwe parastibûn û di vê mijarê de ji hevalan rexnedan xwestibûn. Di vir de zêde lez kiribûn. Bes di vir de piştî ku di demek kin de îtîrafkariya wan eşkere bû, neçar man ku dengê xwe nekin. Tiştek ecêb bû, ji ber hevalan jî di wê rewşa destpêkê de rexne li me kirin. Me bi zorê notên xwe gihandin hevalan. Dîsa jî qane nebûn. Cardin gotin; "hewce nedikir, nehêja bû" û rexneyên xwe didomandin.

Lê belê, bi gelemperî ji dervî rêveberiyê û hinek hevalan piraniya hevalên li qoxuşê em pîroz kirin. Cara yekê bû li girtîgehê li dijî îtîrafkarekê çalakî pêk dihat û me jî vekirî girtibû ser xwe. Hinek kesên ku digotin; "ma ji nav jina îtîrafkar derdikevin" û mat diman jî hebûn. Di heman demê de ji ber jinê li jinê xistibû û li hember helwest girtibû, ev jî ecêb dihat dîtin. Kesek evqas dijminatiya cinsê xwe bike, îxaneta li cinsê xwe di astek herî kirêt de bijî, jixwe ti eleqeya xwe bi jinbûnê re tine ye. Di vir de ev dihat jibîrkirin. Pirsgirêk ne ew bû ku, "li jinek reben, lewaz û bêçare" hatibû xistin, an jî ne bertekek ji ber girtiyek bi navê siyasetek din bû. Na! Me bi dehan kesî re heman qoxuş parve kir. Me hemû nakokiyên xwe li kêlekê hiştin, ji bona em li dijî dijmin hevbeş tevbigerin çi hat xwestin me zêdetir jî kir. Me li hember kesên di xewnên xwe de digotin, "APO'yiyên kujer, maceraperest, netewperest" bi nêzîkbûnên xwe yên li dijî dijmin ve diyar kir ku, em ne wisa ne. Dîsa em bi wan re axivîn, me nîqaş kir û hewl da bi wan bidin fêmkirn. Ez bawerim Leylayê di tevahiya jiyana xwe de rêzdariyek û xizmetek wisa, ji kesên herî nêzî xwe jî nedîtibû. Lê me ev nêzîkbûn raber kir. Me dîsa li hember ên din jî heman nêzîkbûn raber kir. Lê belê, kesên wisa xayîn bûne û bi dijmin re hevkariyê dikin, li ser PKK'ê hesabên jiyanek kirêt dikin û di her mijarê de pîrektiya xwe pêşkêş dikin, weke jin parastin, ji ber xisletên feodalî zêdetir, nêzîkbûnek parazvantiya zilam bû. Ev jî suc bû. Li nav feodaliyê jî kesên ku dijî nirxên bingehîn nêz dibin, li gorî qural û nirxên tore, eşîret û malbatan tevnagerin, bi mirinê tên cezakirin.

Yên ku ji dûrve em dişopandin, rastiya hundirîn a vê bûyerê nedizaniyan, ên nedixwestin fêm bikin, gelek nirxandin kiribûn. Jixwe em ne li benda pesindan û pîrozkirinê jî bûn. Lê diviya êdî bihata zanîn bertekek wisa li dijî îtîrafkariyê, îxanet û îxaneta li dijî cinsê xwe jî erkek mirovahiyê bû.

Gelek pirsgirêkên navxweyî û bertekan jî em zêde mijûl kirin. Rewşek weke ku em ji her çar hêlan ve hatibûn dorpêçkirin bû. Vê carê jî min li dadgehan digot; "bûyerek lêdanê dikin hêcet û êrîş dikin, armanca êrîşa li dijî jina tê kirin, avakirina Leylayên nû ye." Lewma ez di vir de dibûm hedefa hemû êrîşan. Tenê armanca me xistina dozê bû. Di encamê de tenê mana min, dîsa jî herî zêde ez pê kêfxweş kirim. Berdêla çend îxanetkar derxistina holê giran bû. Lê planên wan jî di radeyek bilind de vala derketibûn.

Hemû doz li pey hev domandin. Dijmin înat girtibû. Dadgeh weke êşkenceyan bûn. Ne em didan axaftin û ne jî ti peyvek hiştibûn nekirin sedema dozek nû. Ji her peyva ku ji dev derdiket re ceza didan. Min ji hevalan re pêşniyar kir ku ez dadgehan protesto bikim. Hevalan qebûl nekir. Min bi hewldana ezê parastina xwe bi Kurdî bikim, xwest ku dozê bê bandor bihêlim. Wê jî negirt. Min jî herî dawî di 12'ê Îlûnê de axaftinek ku cuntaya faşîst protesto dike kir. Lewma carek din jî bangî min nekirin. Min agahiya ceza û hejmara dozan jî di nivîsên rojnameyan de hatine ragihandin de girt. Min carek din ew rûyê wan çêlikên faşîstan nedît.

Van hevalan erka apo'yî, parastina partiyê û nûnertiya berxwedaniya wê pêk anîbûn...

Piştî berxwedaniya Çileya 84'an, pêvajoya çar salan dihat nirxandin. Her çendî hêj di asta nîtelîkek destpêkê de jî be, nîqaş û nivîs derbarê vê de bûn. Ji ber hedef û encamên berxwedaniya 82'an girtîgeh derbas dikir. Ya rastî şerek yekser di navbera dijmin û PKK'ê de bû. Tevî hemû teknîka pêşketî ya di destê wan de, serkeftin ya PKK'ê bû. Gelek tiştên ku dihatin gotin "ME SERXISTIYE" zêde girîng bû. Ji ber cara yekê bû dijmin li girtîgehê wisa bi PKK'ê re di vê astê de, bikaranîna hemû derfetan ve pêşwazî dikir. Plana di kesayeta qadroyên pêşeng de xilaskirina PKK'ê berfireh bû. Dixwestin hêviya şoreşa gelê ku hêj di xewde ye di serî de, di gava yekem de bişkînin û birûxînin. Dixwestin bi tinekirina qadroyên pêşeng ve, Rêbertiya Partiyê, xebatên Partiyê yên dervî welat, ji eniya welat û girtîgehê ve bişikînin. Di vê wateyê de girtîgeh bi erkek dîrokî ve rû bi rû bû. Lewma Mazlum, Xeyri û Pîr ew di zanebûna vê de bûn.

Erka nûnertiya rast a APO'yî, girêdana bi Rêber APO ve, parastina Partiyê û berxwedaniya wê van hevalan bicih anîbû. Tam di pêvajoyeke dijmin digot; "me xilas kir, her kes teslîm girt, me artêşa Kemalîstên ciwan ava kir" de, ji aliyê girtîgehê ve rolek wisa lîstin, xisletek kesayetên pêşerojê dibînin rave dike. Ev pêngava şoreşgerî, bû ewleya têkoşîna me ya Rizgariya Netewî. Şêwaza Rêbertiya wê di nava şert û mercên qet nayê bawerkirin de şênber bû û zemînê avakirina çandek nû derdiket pêş. Ger wê dîrok were darezandin, dê wisa were darezandin. Cewhera berxwedaniya 82'an evqasî kûr û bi pêşerojê dagirtî bû. Evqasî mîsoger û zelal bû. Dihat fêmkirin, têgihiştin.

Her çendî ev ji her hêlê ve tam neyên fêmkirin jî, her yek dişibiyan şoreşekê. Ev çalakî, weke rêze şoreşên ji Komîna Parîsê heta ber bi 17'ê Cotmehê ve rave dibûn. Raberîna Bastîlle bû. Ango bi xisletên xwe yên serkeftin teqez û bilindkirina wê ve dihatin pênasekirin. Bandora wan a giyanwerî zêde bû. Dihat gotin jixwe ev hêjayî wan e. Lê mixabin êdî gelekî zehmet bû, yên weke Mazlum, ên weke Pîr, ên weke Xeyrî'yan werin dîtin. Vê jî giranî, mezinbûn û êşa windahiyên me rave dikir. Rast bû, ew dijiyan. Bi taybet jî 15'ê Tebaxê bersiva bêhempa bû. Jîndarkirina wan bû. Di hemû kongreyan, konferansan û hemû xebatên amadekariyê de ew, hêza îlhamê ya herî mezin bûn. Yekîniyên Propagandeya Çekdarî HRK û di pêvajoyên pey re berxwedaniya wan a deng vedayî hebû. Lê me dîsa jî li hember wan sucdarî dijiya. Wijdana me her tim perçiqî bû. Nêzîkbûna, "xweziya em li şûna wan bimiran" ji bona rast dana naskirin, rast jiyîn û şopdariya wan kirinê, nenêzîkbûnek rast bû.

Berxwedaniya Îlûnê, bi bandora van berxwedaniyên mezin ve derket holê. Dengvedan, xwe daweşandin, vejîn û îsyana yekem a girtiyan bû. Lê mixabin ev ji bona pêvajoyên pey vê re rast werin destgirtin weke pirek saxlem, baş nehat nirxandin. Ruhê wê yê pêşengiyê, asoyên wê yên berfireh û şêwaza wê ya encamgir serwer nebû. Êrîşên meha Çileyê di vê dema navbera bihurdar de ji bona derbaskirina lewazî û qelsiyan û ti firsend ji dest neberdanê bû. Avakirina riyên çûna pêştetir, bi şerek di însiyatîfa xwe de qadên bandora berxwedaniya mezin tengkirin, kişandina ber bi xetek din ve, vê carê jî bi rêbazên gelekî cuda fetisandin bû.

Derve de jî cunta, di nava planek ‘sivîlbûn û demokratîkbûnê’ de bû. Beşek vê planê ya herî girîng jî girtîgeh bûn. Dijmin polîtîkayên xwe yên girtîgehan, kir sentezek hemû polîtîkayên xwe yên bingehîn. Gelemperî pêkanên yekem ên cuntayê, li ser qadên ev polîtîka lê werin pêkan bû. Tevgera derve ya paqijkirin û girtinê, bi lez temam bû. Ango ti xeternakî nehatibû hiştin! ‘Navendek herî biçûk a muxalefeta’ bikaribe cuntayê pêşwazî bike û bersivê bide nemabû. Derve her tim bi pêkanên zorê ve di bin venêrînê de digrt. Lê li girtîgehan xilaskirin û tinekirin esas girt. Lewra hemû ceribandin li ser vê qadê bûn. Li Tirkiyê jî û li Kurdistanê jî heman rewş hebû. Ma li van qadan Kurdbûn, Kurdistanî dibe? Dê hemû bihatan qedandin. Heta wê polîtîkayên ji komarê heta niha hatine pêkan bihatan temamkirin, li wir tişta ku kêm maye û nehatiye kirin, bihata pêkanîn. Ev armanc jî zêde diyarker bû. Di maneyekê de Hîtler, Cihûtî qedandibû. Li gorî wan Cihûtî nijadek ku ketiye, qet kêrî tiştekê nayê, lewma hestiyek wan jî nehiştin. Ya rastî Cihûyan paşê biryar dan ku, Fîlîstîniyan biqedînin. Lê belê, eslê wan nehat xilaskirin. Lê bi rastî jî rêbaza hatî bikaranîn, ya xilaskirinê bû. Heta niha jî xisleta gel û netewî cuda û ecêb e. Tevî ku wan qirek dervî mirovahiyê jiya ye, heman rûreşiya dîrokî li ser gelên din diceribînin. Mijara hinekê jî wan ecêb dike, ev komplekse.

Girtîgeh ji bona dijmin laboratuwar bûn. Her gel, millet, kesayet, rêxistin, cins, her tişt û her kes zêdetir ji nêz ve dihat lêkolînkirin. Ji derûniya mirov heta fîzîka wî/ê, ji binesaziya rêxistinê heta şêwaza şer, di her mijarê de bi hinek ceribandinan encamên ku digirtin hebûn. Cuda cuda her made,

ev girtîgeh bibûn navendên xisleta li xwe mikurhatinê çiye, ne çiye û herî baş çawa derdikevin holê. Mirov her kêliyê bi dijmin re rû bi rû ye. Dijmin jî yeke ku dixwaze teknîk, zanist, rêbazên ceribandinê, bi kurtasî hemû quralên laboratuwarê li gorî xwe bimeşîne. Tu dixwazî civa be, dixwazî xwe bixe her rengî de, dixwazî hesin be, dixwazî pola be û dixwazî madeyek herî hişk be, qet ferq nake. Ev hêza te û binyata te ya cewherî ye.

Wê tu bi kî/ê re bibî yek û ji kî/ê cihê bibî, tev bi te ve girêdayî ye. Belê jixwe di vê qonaxê de, xweajoyên (îçgûdû) mirov ên dibêje "dijmine, dikare her tiştî bike, ezê jî serî bitewînim" mirov dibe îxanetê. Lê dîsa jî mirov dikare li dijî hemû rêbazên gerimbûnê, hewldana têkilhev kirinê, plana helandin û sitrandina kesayeta te û kirina şêwazek din de, xwe biteqîne, bi her atoma xwe ve rêbazên dijmin vala derbixe û ceribandinên wan xirab bike. Belê, vê jî di rêbazek herî mezin a bêhempa de berxwedanên 82'an pêk anîn.

Mazlum li hucreyê, li hucreyek tazî bû. Weke madeyek kiribûn nava tasekê bû. Bin, çep û rastê wî weke di nava agir de bû. Dijmin wer dizaniya ku naverastek mirinê jî bê derfet dihêle ava kiriye. Ji ber mirina me jî di destê wî de bû. Digot; "ancex ez dikarim mafê mirinê, mafê jiyanê, hemû mafan bidim, ger bidim jî dê di şêweya ez dixwazim de be."

Mazlum li naverastek wisa çarenûsa jiyan û mirinê bi hev re pir arjeng ji aliyê dijmin ve hatiye destnîşan kirin de, li nava dilê wê pergalê dabû. Ev ser xist. Bi çend darikên kîbrîtê ve agir pê xistibû! Ew mirina kirêt a bi parçeyek qirewatê li ser hatibû ferzkirin, xwe li situyê wî pêçabû. Ya ku ew kuştî tarîtî

bû; tirs, radestbûn û îxanet cinawirê wî bûn. Divê li nav cihê jiyanê bi xwe, di nava xwezaya xwe ya bedew û were ramûsan de hevdîtina bi kokên xwe re, bi ya xwe re yekbûnê de, sira hukumkirinê baş were zanîn. Ma ev nexisleta mezinbûn, baweriya berz, berpirsyariya wê ya kûr, şoreş û pêşeroj di kêliya heyî de jiyîn û dana jiyînê bû? Vê havênê ji serî ve baş girtibû. Bûyera APO'yî jî cewhera vê havênê bû. Cewhera ku bi Mazluman, Pîran, Xeyriyan û Ferhatan re rabûyî ser lingan, jîndarbûn û bêmirinî bû. Di kêliyek kes ne li bendê bû, hêza çalakiyek her kes hejandibû.

Şêwaz û amadekariya çalakiya her Çar Hevalan, biryardarî û dijwariya heta kêliya dawî gelekî girîng e. Ger dê xelekek din bi ser çalakiya Mazlum ve zêde bibe, teqez neçar bû çalakî di cih de, wextê de û serkeftî bûya. Şêweya çalakiyek wisa ye, bawerî û wêrekiyek berz hewce dikir. Di heman demê de tevî hemû dorpêçên mercên neyênî hostatiyek bidestxistina kêliyek serkeftinê saz dike hewce dikir! Ev hostatî jî Çar'an pêk anî. Dijmin ji agir tirsiya, dijmin ji qêrînên wan ên serkeftinê tirsiya, dijmin ji parçeyên goştên canên wan diketin û xwîna belav bûyî tirsiya. Dijmin carek din di kûraniya dilê xwe de, ji PKK'ê tirsiya.

Nexwe PKK jî ev bû! Heta wê kêliyê leşkerê ku êşkence dikir, dema bi copa xwe re dilîst, bê ku di ferqê de be, li kirêtiya bi xwe re dixist. Gotibû; "ew çi baweriyek wisa ecêb e! Qiçeqiç (cayir-cayir) dişewitîn, tevî vê diruşme diqêriyan. Ew çi bawerî ye… Ew çi bawerî ye!" "Belê, ev baweriya Çar'an bû. Baweriya PKK'ê bû. Ger leşkerekê ewqas jî bihîstibe, nedibû ku girtiyan jî nebihîstibe. Kî dizane çend caran wî agirî

dilê min şewitandiye. Çend caran dilê min bi xwîn kiriye? Çend caran heta şaneyên xwe tevê hejiyame? Çend caran li ber wê mezinbûnê min berê xwe daye secdê? Hîskirina wê mezinbûnê, bes bû ku mirov bide jiyîn. Ger hatiye jiyîn, ji ber vî agirê dil şewitandiye. Ew êş her tim hatiye hesîn. Nexwe jiyîn nedibû û jiyan jî nedibû.

Belê, Rojiya Mirinê çawa bû? Bê ku em aciz û têr bibin, me ji hev re vedigot. Ma me çi ne dibihîst! Nexasim dema mirov dijî, kêm jî be mirov dibe şahidê tiştên tên jiyîn, berxwedaniya di wan rojan de tê raberkirin, baştir tê fêmkirin. Berxwedaniyek wisa ye, di her hucrê de mirinê parçe dike. Berxwedaniya bi her hucrê re darbeyê li dijmin dixe. Îxanet heman weke bêhna devan kirêt bû. Bi qasî wê kesayetek rizî bû. Ma hûn dizanin şêst rojan li dijî wê berxwedan, kêlî bi kêlî şêst rojan bi wê re şerkirin çiye? Ne tip dikare bersivê bide vê, ne jî bi vegotinê dikariya were fêmkirin.

Li ser mercên ku ev çalakî di navde pêş ketine, xisletên wan, rêvebirên van çalakiyan, kesayetên şoreşger ên van hevalbendan tê rawestîn, hewl didin girêdana diyalektîk a van bûyeran were dahûrîn. Jiyana me ev bûn. Têgeha demê bi van çalakiyan ve sînordar dima. Hemû meh, sal, sed sal û pêşeroj, di dîroka van çalakiyên 82'an de veşartî tên girtin. Dibe ku têgehek weke pêşî û paşiya demê zêde ne guncav be, lê dema em li ser wan di-axivin, pêşî û paşî jî di wir de veşartî bûn.

Belê, rûyê vê yê din hêj cudatire! Ev bandorbûn bi her kesî re di heman radeyê de pêş nediket. Tevî ku bandorek hebû, ji kûranî nedihat hîskirin, sedemên sucdarî, bêzarî, bêçaretiya re, ew sira hêza çareseriya mezin a di wê çalakiyê de tam nedihat

fêmkirin. Ji ber şêwaza jiyan û encamên kesayetên demek dirêj dijmin di bin venêrînê de girtî, di bin êşkence, çewsandin, gef û sozan de sitirayî û xemilandî hebû. Bawerî, zanebûn û îrade di kesayetê de çiqas zelal be, ewqas jî di wê pîvanê de asta xirabûn, helandinê jî kêm dibe, an jî texrîbatên heyîn di radeya kêm de pêş dikevin. Di vî rûyê Madalyonê de xeta radestbûn û binkeftinê di asta cidî de bû. Kesayetên heyîn tenê bi rêbazê fîzîkî nehatibûn dorpêçkirin. Vê dorpêçê di asta bawerî û îradê de jî şikandinek, tewandin û hêrandinek ava kiribû. Yên li ber xwe dane, bi berxwedaniyê re yên hatine binxistin, yên bê berxwedanî radest bûne, yên bi zorê hatine xirikandin hebûn. Berxwedaniyên pêş ketîn hemû jî rakirin ser piyan, xirikandin, hejandin û bandor kirin. Ji ber şert û mercên heyîn ji bilî berxwedanê, ti rêyek din nedida. Girtin û dayîna henaseya kêliyekê jî bi berxwedanê dihat bidestxistin.

Lewma di Îlûnê de beşdarbûna girseyî girîng bû. Hêcetek henase girtinê bû. Di heman demê de mercên kamilbûyî yên li dijî dijmin derketinê jî hebûn. Lê mixabin hêj me henaseyek negirtî, êrîşên nû di meha Çileyê de pêş ketin, ev raperîna me zû şikand. Lê belê, vê carê asta şikandinê cuda bû. Pêşengiya berxwedanê, şikandina di nûnertiya vê pêşengiyê de pêş ketî, nehişt polîtîkayên dijmin vala derbikevin û şêwazên pêkana van polîtîkayan baş werin fêmkirin. Dijmin cewhera polîtîkayên xwe yên tinekirinê neguhertibû. Lê di rêbazê pêkanînê de, ji ber hinekê jî li ser van zemînê ku di nava me de şikandinên çêbûne ferz dike, pirsgirêkên me yên navxweyî û lewaziyên me baş tespît kirine, hêj hêsantir encam digirtin. Di armancên êrîşên meha Çileyê de, hem tinekirin, hem berovajîkirin, hem ji nû ve ferzkirina îxanet û radestbûnê hebû. Ango hedefek berfireh bû.

Lîstokên îxanetê yên tên ferzkirin û çalakiya suphî

Vê carê jî dijmin bi yek tîpî ve rêbazek kevin kir meriyetê. Di cewhera yek tîpî de, ti ferqa xwe ji pêkanên niyaza (dua) xwarinê û gotina 'Tirk im' nebû. Dê dijmin mîsoger hinek tişt bi hêcet bikar baniya. Lê sala 84'an, ne weke salên 81-82'an bû. Ezmûnên pêvajoyek hatî jiyîn hebûn. Ango li vê derê armanca bingehîn girîng bû. Hedefa şikandina nêvenga radestbûnê, ji nû ve xwe birêxistinkirin, ji nû ve avakirina derfet û mercên berxwedaniyê rave dikir. Ger ev pêvajo rast were derbaskirin û gavên rast werin pêkanîn, dê bi wê re pêvajoyên borîn jî rastir werin destgirtin û ruhê berxwedaniya 82'an zêdetir kûr bike, koka xwe dane û derbasî pêvajoyên pey re be.

Ev mijar bi xetên giştî ve dihatin nirxandin. Lê bêçaretiya li hember pirsgirêkên pêvajoya nû zehmetî didan avakirin. Nêzîkbûnek bi baldarî û hişyarî ji çavkaniya van pirsgirêkan re nedihat raberkirin. Êrîşên dijmin ên yekser rawestiyabûn. Lê di hundir de komên cur be cur, rêveberiyên alternatîf ên weke siyan (golge) tevdigerin, bi danasînên weke parlementoya burjuva li ser rêveberiyê çewsandinek hebû, vê jî karên heyîn dikir du serî. Tişta me dibihîst jî tiştên giştî bûn, bê nav werin dayîn û werin zelalkirin, bi hinek agahiyên kin ên bi rêya notan dihatin em pê dihesiyan. Hem em li dervî van pirsgirêkan dihatin girtin, hem jî ji bona em ji van bûyeran bandor nebin, zêde tiştek ji me re nedihat gotin. Herî zêde vekirî bûyera Fuat Çavgun hatibû destnîşankirin. Bes dîsa hevalan ji eniya xwe ve tevdîr girtibûn û wisa ji me re agahî şandibûn.

“Di demên dawiyê de hinek pirsgirêkên hatin jiyîn em mijûl kirin. Me nekarî zêde bi we re eleqeder bibin. Nivîsandinek nirxandinê beriya niha me şandî hebû. Fuat Çavgun û yên din ew nivîsandibûn. Me jî ti guman ne jiya û bi her kesî da xwendin. Di wê demê de têkildarî rêveberiyê jî hinek rexne hebûn. Em baldar nêzî wan jî bûn û me got emê li ser wan rawestin. Lê paşê me dît ku avaniya heyî li dijî rêveberiyê derdixe, hinek nerehetiyên bi avaniyê re hene, birêxistin dike. Bi taybet dest davêje hinek hevalên ku di pêvajoya borî de hinek kêmasî jiyane û ji aliyê rêxistinê ve ceza girtine. Piştî Rojiya Mirinê ya Çileyê demek dirêj pirsgirêkên wî yên tenduristiyê hebûn. Lewma ji pirsgirêkên heyîn dûr hat girtin. Weke din jî hêj xalên ku hatibûn qebûlkirin, nedihatin pêkanîn. Her tim îdarê astengî derdixistin. Lewma hinek tişt dereng ketin. Me jî nekarî em serweriya xwe ava bikin. Lê di vir de taloqkirinek bi zanebûn tine ye.

Fuat, herî dawî bi notekê îlan kir ku rêveberiya heyî fişkilandiye û ferz kiriye ku her kes vê notê bixwîne. Diyar kiriye ger em nedin xwedin, êdî mafê wî heye ku ew bi her kesî bide xwendin. Ev jî tehdît bû. Jixwe qederek derdor bandor jî kiriye. Bi taybet hevalên ku ji aliyê Hîlvan û Sîwerekê ne, bandor kiriye. Herêmgerî û hinek nêzîkbûnên feodal ên paşverû bikar aniye. Gotiye’ ez rêveberiyê difişkilînim. Nikare erka xwe pêk bîne, ji ber vê emê bikin.’ Me cardin jê re not şand. Me got em amade ne ku nîqaş bikin, pirsgirêkên heyîn bi hev re çareser bikin, ger di rêveberiyê de guhertinek hewce dike, em dikarin bikin, lê ev jî bi îradeyek hevbeş dibe. Me bangî wî kir. Lê wî dîsa ya xwe kir. Niha jî xwe weke rêxistinekê îlan kirine. Bi îmzeya partiyê danasîn û

daxwiyaniyan belav dikin. Ev rewş heta nava komên din jî belav bûye. Me xwest em vê rewşê nîqaş bikin. Hûn têkildarî vê rewşê de çi dibêjin? Nirxandin û pêşniyarên xwe binivîsin."

Nota ku hatî kêm zêde di vê çarçoveyê de bû. Em mat man. Min ev pêşketinên rû dayîn cidî dîtin. Her wiha berî vê derbarê hinek provakasyonên derve, di nava Partiyê de derketine holê jî agahî dabûn. Her çendî neberfireh jî be, me bûyera Semîr, Şener, Dawut û Silêman bihîstibû. Gotibûn têkîliya Şener bi êrîşa hewayî ya dijmin li Başûrê Kurdistanê di 83'an de kirî heye. Planên dijmin ew e ku Partiyê di hundirê Partiyê de bidest bixe, hem qadên me yên xebatê yên din desteser bike û hewl dide bi vî rengî hemû Partiyê bêbandor bike. Em li hember van agahiyan nû bûn, biyanî bûn, me cara yekê dibihîst. Her çendî hêza me nebe ku em bikaribin van îxanetên di nava Partiyê de derdikevin baş şîrove bikin, dîsa jî me dikariya em navekê lê bikin û di asta raman de bibin xwedî helwestek vekirî. Girêdana me ya li hember Partiyê û Rêbertiyê, dihişt ku em bêguman yekser li dijî van bûyeran helwest raber bikin.

Lewma bûyera Fuat jî hişt ku ez girêdana van bi provakasyona derve de pêş ketî re ava bikim. Girêdana Seher a bi Yildirim Merkît re, girêdana îxanetê mîsoger bi derve re hebû û di vê bûyerê de jî gumanên min zêde dikir. Min jî nêrîn û pêşniyarên xwe nivîsandin:

"Berî her tiştî dixwazim bêjim ku em zêde dûr û derveyî pêşketinan mane. Ger bê xwestin di vê mijarê de hinek derfet jî rû dane û ava bûne. Tevî ku em hemû ziraviyên bûyerê nizanin, ez di wê baweriyê de me ku girêdana vê bûyerê bi dijmin û

provakasyona li derve pêş ketî re heye. Ji ber dijmin malbatan jî bikar tîne. Yan jî dibe bi hinek riyên cuda re dest avêtibe wan. Heta niha kesekî di nava Partiyê de wisa yekser avaniyek rêxistinî û saziyek rêxistinê nekiriye hedef! Berî her tiştî di tiştên ku nivîsandî de neduriste. Armanca wî ne ew e ku, bi riya notê rexneyan li rêxistina girtîgehê bike. Ger bersiva wî dayî wisa bûna, dê diyar bûya. Ji ber di nota hatî ragihandin de jî hatiye diyarkirin ku, not erênî ye, ew hatiye guhdarkirin û nêzîkbûnek ji rexneyan re vekirî hatiye raberkirin. Hatiye gotin ku; "em bi hev re nîqaş bikin û çareser bikin." Lê ew dixwaze ji xwe re zemînek rewa ava bike. Dixwaze bêje; "min hemû rê ceribandin nebû, ez jî neçar mam, lewma min darbe li rêveberiyê kir." Ji ber nivîsa wî ya nirxandina berxwedaniya 84'an jî wisa ye. Ev nivîs jî bi zanebûn hatiye nivîsandin. Di naveroka wê de gelek mjarên ku divê werin nîqaşkirin hene. Hinek xalên ku şêlû hatine hiştin hene. Hinek tişt jî bi zanebûn derxistine pêş, ev jî weke senaryoya lîstokekê ye. Lê bi fêlbazî û di bin rengek siyasî de, hinek rastî jî danîne holê û nivîsandiye. Hinek xalên ku bala me kişandî hebûn. Lê ne cihê wê ye ku em yekser li ser nîqaş bikin. Ji ber agahiya me tam ji wan pêvajoyan nebû, me jî zêde tiştek negot. Lê niha baştir tê fêmkirin.

Di encamê de, helwestek vekirî ya dijî rêxistinê ye û darbe ye. Dema berê li girtîgehan îxanet cuda derket pêş û lîstok çêbûn. Êrîşek yekser hebû. Ev jî bi rengek cuda derdikeve holê. Pêşniyara min: Fuat Çavgun were cezakirin. Divê ji vir û şûn de çi sucên dijî partiyê werin kirin, bê ceza nemînin. Ger Şahîn bihata cezakirin, di pêvajoyên pey wê re radeya îxanetê jî evqas

berfireh nedibû. Texrîbat ava nedibûn.” Her wiha min diyar kir ku ger di vê mijarê de nivîs hebin, an jî agahiyek hebe ji me re ragihînin dê baştir be.

Paşê hinek not û nivîs ji me re hatin. Di heman demê de me piştî demekê, hinek not jî derxistin derve. Ji ber derfetên hevalan teng bûn. Li cem me, ji bona sererastkirina notan û derxistina wan derfet zêdetir bû. Em jî kêrî vî karî dihatin!

Hevalan pêşniyara min zêde radîkal dîtibûn. Tevî hemû daxwiyanî û daxwazên hevpeyvînê, Fuat ya xwe berdewam kiribû. Yên paşê cihê bûne û di qoxuşên cuda de dimînin hebûn. Ev jî asta helwesta ku dijiyan diyar dikir. Li girtîgehan ji cem hevalên xwe yên dozê derketin, weke mirov biçe cem dijmin bû. Min wisa şîrove û bi nav dikir.

Fuat piştî Rojiya Mirinê ya 14’ê Tîrmehê, şeht (felc) bibû. Dema min destpêkê bihîst zêde xemgîn bûm. Ger plana Meletî ya revê bi ser keta, me dikariya em birevin. Wê demê ev rewş jî pêş nediket. Rêzdariyek hebû, nexasim dema di encama êşkenceyê, rojiya mirinê, li nav pêkanên dijmin ên her cure de, birîndar ba, seqet biba, li hember wî hevalî hest gelekî giran dibûn. Di heman demê de ji ber ku Fuat birayê hevalê Xelîl Çavgun jî bû, rêzdariyek hebû. Di vir de beşek giyanwerî ya giran hebû. Lê piştî ku min ev bûyer bihîst, ew hezkirin û rêzdariya min dijiya hilweşiya. Silêman, ango Baqî Qarer jî birayê hevalê Heqî Qarer bû. Lê reviya. Îxanet kir. Lewma mirov ji ber van nêzîkbûnan zêdetir bi hêrs dibe.

Ger bi qasî misqalekê jî rêzdarî û girêdanek li hember wan mirovên bi rûmet û bilind heba, bi vî rengî tevnedigeriyan. Çiqas ecêb bû, Fuat jî îxanet li Xelîl kiribû. Di vê mijarê de

dijmin bi zanebûn hebûnên me yên herî bi nirx û xizmên wan li dijî Partiyê bikar danî. Nêrîna min a sereke ev bû. Her wiha Fuat şeht bibû, lewma wî kêmbûna xwe ya fîzîkî nepejirand. Li şûna ku tola wê ji dijmin bigire, êrîşî me û Partiyê kir.

Derûniya seqetbûnê gelekî xirab e. Kompleks, kaprîs û tolhildanê jî ava dike. Ez nikarim ji bandora wê rizgar bibim. Mirov çawa dikarin wisa werin guhertin? Îxanet, revoktî û cebanî (doneklîk) çibû? Ez cardin dubare dubare li ser van dihizirim. Ez rexneyên hevalan ên ku zêde "radîkal" nêz bûme jî qebûl nakim. Gotibûn; " di nava mercên girtîgehê de ceza nabe. Dê encamên xirab ava bike." Ger ev nêrîna ku ceza li girtîgehê nabe were parastin, ev jî dihat wê wateyê ku serî ji şert û mercan re tê tewandin. Min got, çi dibe bila bibe îxanet neyê qebûlkirin.

Piştî bûyera Leyla Akbaş girtiyên xort ên li qoxuşa kêlekê ji wir derxistin. Cardin peywendiya me ya bi hevalan re qut bû. Ji ber me pir zehmet peywendî ava dikirin. Notên me bi rojan û hefteyan diman. Me derfetê şandin, an jî girtinê nedidît. Ji ber Leyla îtîrafa xwe wisa berfireh nivîsandibû, hemû derfetên ku hebin, an jî dibe ku çêbin ji dijmin re gotibû. Ew gilokên jinan ên me ji blokan avêtin blokên din, ser banan re davêt tev eşkere kiribûn. Lewma ne dibû ku em heman rêbazan cardin bikar bînin. Ji ber carê li ser ban jî diman, diket qoxuşên din, an jî diket dest leşkeran. Lewma me notên girîng bi wan rêbazan nedişand.

Piştî demekê cardin îtîrafkar xistin nava qoxuşa kêlekê. Suphî Çevîrîcî piştî binçavkirinê, yekser anîbûn wê qoxuşê. Ji îtîrafkaran ên herî girs di qoxuşa 38'an de bûn. Di qoxuşa

duyem de îxanetkarên hinek din kêm girs têkil kiribûn. Îtîrafkarên weke Hayrettîn Toga û Mehmet Gîrgîn hebûn. Suphi'yan firsendek dîtin û peywendî pêş xistin. Dema yên din li cihê hewagirtinê bûn, em bi dengê bilind di-axivîn. Wan jî li qoxuşê guhdar dikir. Piştî ku rêbazên not girtin û dayînê hîn bûn, ji me re not şandin. Rewşa xwe nivîsandibûn.

Dema Suphî derbasî welat dibe, ji hevalan cuda dibe. Di mijara derbasbûna welat de hinek pirsgirêk tên jiyîn. Bi hêrs e, ew û hinek heval hevûdû tewanbar dikin. Bi vê rewşê ve ji hevalan vediqetê. Di vê qutbûnê de asta xwe, perwerdeya li welat dîtî, bendewariyên jê hene û her tiştî datîne aliyekê. Herî dawî jî nikare xwe bipaêze û tê girtin. Ya rastî giliyê (îxbar) wî dikin. Di lêpirsînê de jî hinek tiştan dibêje. Dijmin jî vê lewaziya wî bikar tîne, dixe nava îtîrafkaran. Lê Suphî îxanet nekiribû. Belê lewaziya wî hebû, suc kiribû, helwesta kesayeta PKK'yî raber nekiribû. Lê ew ne di rewşek îxanetê de bû. Lewma ji avakirina peywendiyek nû re amade bû. Wî peywendiyek xwestibû. Girtîgeh bihîstibûn. Kesek ku bandora berxwedaniya mezin derve de jiya bû û niha jî hatibû heman girtîgehê. Îxanet rêya herî ketî bû. Wê demê diviya ser xwe ve bihata û ji serî ve lîstokên dijmin xirab bike. Weke mînaka "mirov ji kîjan cihê zerarê vegerê, feyde ye" rastiyek derdikeve holê. Ji ber di wê qonaxê de şansê berxwedaniyek hêzdar hebû û Suphî jî ev şans girtibû.

Me jê xwest hemû xebatên dervî welat, nirxandinên Partiyê, pêşketinên di her mijarê de parçe parçe ji me re binivîse û ji me re ragihîne. Me heman nivîs yek ji ber derxist û şande 35'an jî. Ev hem di Hawarê de tên bikaranîn, hem jî dibin mijarên girîng ên nîqaş, agahî û perwerdeyan.

Nirxandinên Suphî pir kûr bûn. Ji Mevlûdê jî derbas dikir. Gelek pêşketinan berfirehtir dizane. Behsa pirsgirêkên îtîfakan heta sazkirina nûnertiyên me yên li qadan, dîsa têkildarî pirsgirêkên navxweyî, meyil û ferasetên dervî Partiyê dike. Me tecrîd û dûrbûna salan di kêliyekê de pir vekirî dadigirt. Tiştek balkêş bû. Pêşketin gelekî xweş bûn. Gelekî berfireh û ji texmînên me zêdetir bûn.

Suphî dixwest kêliyek beriya kêliyekê derkeve dadê. Ne dikariya guman û tirsên xwe veşêre. Dijmin dixwest bi zorê bibe qada çolterê. Digot dê bi helîkopteran bibin. "Tu qadan dinasî, lewma dê tu cihên heyîn şanî me bikî." Hinek kesên îtîraf kirine dibirin operasyonan. Yek du caran polîs hatin girtîgehê jî. Çawa me ev bihîst, me agahî da hevalan. Me jî di daxwaznameyên xwe de destnîşan kir ku mirovê nû hatine girtîgehê neçarî îtîrafê dikin, ji bona lêpirsîna wan polîsan tînin, dixwazin mirovan bi zorê bibin operasyonan. Me di van daxwaznameyan de ev eşkere kirin û ji dadê re diyar kirin. Ji ber vê jî li ser îdareyê zextek ava dikir. Em jî dixwazin van eşkere bikin.

Ger bikevin ferqa rewşa Suphî, dikariyan bibin û bi şêweyek din bikujin. Ji ber me pir dizîve not dişandin ji hev re, ev zû nedihat ferqkirin. Lê ji ber îtîrafkarên kevin rêbaz dizaniyan zû ferq kiribûn. Suphî jî vekirî gef li wan dixwe. " Tiştek tine ye, me xwest em biceribînin. Ji îdarê re nebêje. Ger tu bêjî ezê te bikujim." Hinek çavên xwe jê re digirin. Ji ber bi wan re tirs heye. Di heman demê de Suphî jî rewşa giyana wan a di navê de dijîn dizane. Dixwaze wan jî bandor bike. Lê em di rastiyê de dixwazin û plan dikin îtîrafkarên kevin ên li wir

bikujin. Ger bidin qoxuşa din dikare bi ser hinek îtîrafkarên din de biçe. Êdi qoxuşa duyan de şansê cezakirinê zêdetire. Suphî nikare rewşa ku di nav de ye rake. Dixwaze hinek tiştan bike. Dema derbarê vê de hinek pêşniyaran jî digire kêfxweş dibe. Ji ber vê jî be, wê hinek din ji bona mayîna li wir li ber xwe bide. Me ev agahî da 35'an jî. Wan jî guncav dît. Her wiha dema di vê navberê de derkeve dadê jî, dê parastina xwe bike. Dê wê demê jî ev şans ji destên wî derbikeve. Parastinek wisa jî çalakiyek bû. Xwe li gorî her du rewşan jî amade dikir. Dest bi nivîsandina paraznameya xwe kiribû. Hevalan got; "dikarî li ser esasê ku lêborîna xwe ji Partiyê bixwazî û rewşa xwe weke sucekê rave bikî, tu dikarî parastina xwe bikî." Wî jî gotibû; "temam."

Me ji hev re nivîsandina notan didomand. Ew vekirî bi malbatên xwe re jî hevdîtinê dikin. Agahiyên ji derve de tên, dîsa agahiyên ji îdareyê digire û rewşa îtîrafkaran tevê ji me re radigihîne. Di mijarên din de jî dinivîse. Jêhatiye. Her wiha pêdivî çi ne, wan jî dizane. Texmîn dike, lewma bê navber ji me re dinivîsand. Carekê dema di tuwaletê de nota me dixwîne, leşker bi ser de digirin, hewl dide notê tine bike, lê hêj hemû tine nekirî hinek parçe dikevin dest leşkeran. Di vir de derdiket holê ku wan mirovên ketî giliyê wî dikirin. Suphî bi kulman li dîwar dixist û wisa agahî da got; "me dibin."

Suphî wan dibin qoxuşek têkilhev a hevalên nû lê ne. Li wir paraznameya xwe dinivîse. Lê belê, hinek tiştên ku derve de derbarê wî de tên gotin dibihîse. Dîsa li girtîgehê, bi taybet helwestên hinek kesên ku tiştekê derbarê wî de nizanin dibîne û ji vê jî bandor dibe.

Weke din jî dijmin zanebûn dernaxê dadê. Paraznameyek pêncî-şêst rûpelan a dijmin darizîne, lewaziyên xwe û sucên xwe temamî bi naverokek siyasî rave kirî amade dike. Zû derkeve dadê û helwesta xwe ya li dijî dijmin îlan bike, dê rehet bibe. Lê dijmin jî vê ferq dike. Di nivîsên xwe de digot; "min nêzîkbûnek hêjayî Partiyê raber nekir. Lewazî û bertekên min hiştin ez şaşiyên cidî bikim. Lê ez ti caran radestî dijmin nebûm. Min îxanet nekir."

Bi vî rengî Suphî li tuwaleta qoxuşa ku lê ye xwe darve dike û şeqamekî li îxanetê dide. Xweziya bi jiyankirinê ve hêrs, kîna xwe bida jiyîn û wisa şeqama xwe li dijmin bixista. Dê bandora vê zêdetir bûya. Dikariya hêz û jêhatiyên xwe pir bihêz bikar baniya. Nivîsên wî man, êşên wî man û şerê wî ma şûnde. Şehîd hat îlankirin.

Min jî di rûniştina xwe ya dadê de got; " hevalê Suphî Çevîrîcî bi mehan di lêpirsîna polîsan de, di bin êşkenceyê de xwestin neçarî îtîrafê bikin. Bi mehan li girtîgehê bi hevkariya heman polîsên êşkencekar, îdarê û dadê, ev rewş tên ferzkirin. Hevalê Suphî li dijî îtîraf û îxanetê canê xwe da û protesto kir. Bi zanebûn hevalê Suphî dernexistin dadê. Ji ber hevalê Suphî Çevîrîcî dê rastiya rûyê îxaneta ku tê ferzkirin raxista ber çavan. Yekser dadgeh berpirsyarê vê bûyerê ye. Ez jî protesto dikim. Hevalê Suphî Çevîrîcî şehîdê me ye, emê bîranîna wî bidin jiyîn." Cara yekê bû şandeya dadgehê, bê ku min bavêje derve, li min guhdar dikir.

Dema tê gotin ‘her tişt ji bo şoreşê ye’ hevsengî baş neyên sazkirin, dê felaketê ava bike

Dê ji koma Elezîzê Metîn, Daîmî û çend kes din hatiban berdan. Dosya dozê jî her kêliyê diçû cem serdozger û dihat. Serokê dadgehê got; “ger ji sucek din negirtî be, an jî doza xwe tine be, divê were berdan….” Û belge şand ji îdareyê re. Lê dozek din hebû!

Dozek Metîn ya din hebû. Di berxwedaniya Îlûnê li cihên hevdîtinan de dema êrîşî wan dikin, gelek cam hatibûn şikandin. Dema ku em li dadgehê me pişta xwe da şandeyê em rûniştin û me protesto kir û dest bi rojiya mirinê kir, şand zêde bi hêrs bû. Serokê dadgehê hema ji hêrsa diqêriya. Di heman rojê de li girtîgehê hesabê vê pirsî bûn û êrîşî hevalan kiribûn. Di vê êrîşê de Metîn, Mistefa (Kurdo) û Abdullah Bucak giran birîndar dibin. Her wiha di wê rewşê de digirin lêpirsînê. Lê tevî vê jî tiştekê nabêjin. Vê carê jî wan dibin qoxuşa duyem a ji xwe re dibêjin qoxuşa Bucakî û Silêmaniyan. Ev jî rêbazek din a êşkenceyê bû. Piştre bi ferzkirinên xwe ji wan qoxuşan derketibûn. Belê, doza ku dihat behskirin jî, ev doz bû.

Ji ber dijmin hêcetek din ji bona girtinê nedît doza; “cam şikandinê û dijî leşker derketiye” vekir. Berdana wan jî ji ber vê hatibû rawestîn. Meto nêzî dema çûna xwe nameyek şandibû ji min re û gotibû; “hêj nediyare, lê dibe ku derbikeve.” Di nameyê de jî hestên xwe rave kiribûn. Gotibû bedewiya hevalbendiya me, ji bona wî gelekî girîng e. Dê bi têkoşînê, bîranînên vir ve girêdayî bimîne û tolê bigire. Hinekê jî pesnê min dabû.

Di beşek nameyê de behsa Hamilî jî kiribû. Diyar kiribû ku nêzîkbûnên min ên rehet û xwezayî xweşik in, lê Hamilî di vê mijarê de cuda dihizire û ez jî ne di ferqa vê rastiyê de me. Hewl dida van rastiyan bi min bide fêmkirin. Tiştek vekirî tine bû, wî jî nekariye binivîse, bes hinek hişyariyan dike; "evqas rehet û xwezayî nebe." An jî hinek tiştên mîna vê dibêje. Dema min cara destpêkê xwed, min tiştek fêm nekir. Ev çi bû? Divê ez baldar nêzî çi bibim? Salê carekê hevdîtinek me ya panzdeh xulekan heye. Nêzîkbûnên min ên li hember wî çibin, beramber Hamilî jî bi heman şêweyî ne. Gelo azweriyek min a zêde ku li hember Hamilî heye, ketibû çavan?

Ji aliyekê ve mafdar jî bû. Ji ber min kî didît, min ji wan re digot; "Hemo çawa ye? Reşo çawa ye? Silavan lê bikin, bêjinê min pir bêriya wî kiriye." Her kes fêrî van gotinan bibû û min Hamilî bi her kesî dabû hezkirin. Ji malbatê heta hemû hevalan, her kesê li cem min ji Hamilî hez dikir. Ji ber min bi salan di kesayeta wî de behsa hevalan kir. Min bêrîkirina xwe ya beramber qoxuşa 35'an di kesayeta wî de kûr kir. Germahî û nêzîkbûnek rêhevaltiya berxwedaniyê hebû. Ma çi di vir heye, hata ku hewce dike ez baldar nêz bibim? Gelo min cihêtî dikir, dibe ku wisa hatibe fêmkirin? Min not da Cahîdê; tu jî bixwîne, mijarek di hişê min de maye, min fêm nekiriye." Cahîdê xwend, paşê jî hinekê bela xwe li min da û got; "pir vekirî daye diyarkirin û Hamilî baldar nêzî te dibe, ango ji nêz ve eleqeder dibe, ji te hez dike. Tiştek ji vir neyê fêmkirin tine ye!" Yekser li çavê min xist. Ez jî aciz bûm û min got; "ev tê çi wateyê?" Paşê Cahîde cidî bû û got; "nizanim çiye, lê zêde vekiriye" û tam ne-axivî. Awir û bertekên min bandor lê kiribûn. Çi dibû, weke ku sucekê bike.

Ez naxwazim şîroveyek an jî nêrînek din bi ser fikirên xwe yên destpêkê ve bikim. Jixwe min nedizaniya ezê çi, çawa bihizirim û çawa şîrove bikim. Ev zêde dirêj nekir. Bertekên min ji yên her demî zêdetir dînîtî bûn. Weke gefan bûn. Ji min re weke gunehekê diyar dibû. Tam rewşek feryadê bû. Ger yeke din bibihîsta, an jî bidîta, dê bigota qey min agahiyek mirinê girtiye û ez di nava êşa wê de janê dijîm. Baş e hejmara me kêm e. Qada me firehe û her kes li cihekê ye. Jixwe em di wê bloka mezin de çar kes mane. Belê, bi rastî jî vê rewşê bi qasî agahiya mirinekê ez hejandibûm.

Min dev ji her tiştî berdaye, ji serî heta dawiyê nêzîkbûnên xwe yên berambrî Hamilî ber çavan re derbas dikir. Di ti nêzîkbûn û gotinên min de, baldariyek cuda ava bike tine bû. Belê, çawa pêş ketibû? Ma dibe ku ji ber nêzîkbûnên min ên rehet û xwezayî nêrînek wisa pêş ketibe? Bê hedariya min jî di vir de ye. Qet bi hişê min re derbas nabe ku, di nêzîkbûnên Hamilî de baldariyek cuda hebe. Nota Metîn ne zelal e. Min hişyariya wî ya "li ser nêzîkbûnên xwe baldar be" wisa şaş fêm kiribû. Bes min çawa beramber Metîn hestên xwezayî û biratiyê dijî, hema li beramber Hamilî jî wisa bûm. Ferq tinebû. Bi rastî jî tine bû, heta rêhevaltiyek herî xwerû, bê şermok û xwezayî bû. Rehetiya vê hevalbendiyê pir xweşik bû. Min xwezabûna vê hevalbendiyê bi ti tiştî nedida guhertin.

Tevî êşên salan û dûrbûna wê nêvenga hov ava kiriye, hezkirina hevalbendiyê, nêzî wê bûn, ew bi her kesî re jiyîn çiqas bedew bû. Nikarim vê bedewiyê bihizirim jî.

Hinek pêvajoyên ku min jiyayî hebûn. Min karê rahîbeyan nedikir. Na, jixwe rahîbe her tim ji min re ji rêzê û nerasteqînî diyar dibûn. Rahîbeyan weke ku, xisletên xwezayî yên mirovan, xwezaya jinê, jîndarbûna wê, bi hinek tiştan dinixumandin. Min di filman de didît. Li Ewrûpa dîtibûn. Weke cemedê bûn. Weke ku bi wan re zindîbûn û şaneyên jiyanê tine bûn. Na! Ne melekên qenciyê jî bûn. Tevî ku aliyên wan ên mirovahiyê hebûn, min ti caran ji wê hûmanîteriya bi wan re jî hez nekir. Lê min ji duayên wan ên li dêran, duayên wan ên bi hev re, îbadetên wan ên hevbeş, ji dilbûna wan, hez dikir. Tenê ji vî alî ve Xirîstiyaniyê bala min dikişand û ez jî ber bi xwe ve dibirim. Ez ji wan duayan bandor dibûm. Dibe ku ji ber çarmixkirina Hz. Îsa be, min ew êş didît û bi wan dihesiyam. Lê dîsa jî rahîbetiyê ez ji xwe dûr dixistim.

Her çendî di bingeha xwe de hezkirin nebe jî, ji ber zextên kevneşop û mercên heyîn, ji ber bandora lewazî, bêçaretî, şerên min ên ecemî, şoreşgeriya min a toy, bandora xeyalên min ên azadiyê jî bin, min bi zilam re jiyan kiribû. Kesekî bi qasî min berdêla serpêhatiya zewacek çend mehan nejiya bû. Ango beramber zilam, cinsê beramber dûrbûnek min tine, girtîbûnek jî tine ye. Ger min bizaniya hez bikim û derfetên vê heban, ez jî kesayetek ku ji hezkirinê hez dikime. Di vê manê de nêrîneke min a tund tine ye. Ez di wê baweriyê de me, her kesî, her hevalî/ê ji her kesî zêdetir hez dikim. Heta di vê mijarê de pîvanên min jî tine ne. Ez bi qasî mirovan, heta hemû hevalan dixim nava dilê xwe, cîhana hestên min ên hezkirinê heye. Kesên ku hez jê nakim û ji dil hîs nakim jî hebûn. Hest û bertekên min ên di derbarê vê mijarê de jî vekirî bûn. Ez zêde nizanim van jî veşêrim.

Wê demê çima hişyariyek bi yek hevokê wisa bandor li min kiribû? Hezkirin ne eyb û ne jî guneh bû. Wê demê çima ew hezkirin, an jî baldariya bi çend gotinên nediyar û ne zelal ve ji min re hatin gotin, weke şerimbûn û gunehekê li rûyê min ketibû? Di vir de rêhevaltî û biratiya bi salan dihat jiyîn û di bin hiş de cih girtî hebû. Çi ji vê re tê gotin, xwe li gorî vê amadekirin, an jî rewşa têkîliyek xwezayî tê gotin, her çi be, giştî jî be, nêzîkbûnek li hember Hamilî cih girtî û pêş ketî hebû. Hevalek min hêj ji guruba destpêkê ve nas kiribû. Di xebatên me yên perwerdeya destpêkê de bû. Piştre em bi hev re di xebata yekem a qadê de bûn. Di heman komîteyê de bûn. Em bi hev re hatin girtin. Di heman komê de hatin darezandin. Me bi hev re parastina xwe kir. Di van pêvajoyan tevan de kedek hebû, di wan salan de, gelek hevalên me yên heman dozê îxanet kiribûn. Şahîn, Elî Gûrbûz, Erol Dexîrmancî û paşê Metînê Ker îxanet kirin. Hwd. Me bi hev re ew îxanet dîtin. Lewma Hamilî ji bona min hem weke parçeyek ji yên derve maye, ji yên şehîd ketine û hem ji parçeyek ji yên di hundir de li ber xwe dane bû.

Dema em di derve de bûn, peywendiyên me pir bisînor bûn. Dikarim bêjim hevpeyvînên me ji yên hevalên din ku me bi hev re kar kiriye kêmtir bûn. Jixwe ew jî zêde ne di-axivî. Bi min re jî kêm di-axivî. Her tim mesafeyek di navbera me de hebû. Dema ez ji malê direvim, li qiraxên Munzurê li min digere, lê agahiya min ji vê nebû. Şeva ku bi Ayten re tê nîşankirin, ez jî tesaduf li Dêrsimê bûm. Ez çûm şeva wan. Wê şevê xemgîn bûye, agahiya min jî tine bû. Dema zewicî jî ez û Elî Gûrbûz bi hev re çûn mala wan. Li wir jî ‘şerim kiriye’, dîsa agahiya min jê tine ye. Rojekê li mala em bi komîn lê

diman, li ser taştê, li ser dîwanê rûniştibû, min awirên wî girtiye, di wir de jî zêde bêzar û êşiya ye, dîsa agahiya min tine ye. Her wiha gelek kêliyên Hamilî yên derbarê hezkirinê de hene, lê belê ez ne di ferqa yekê de me jî. Bala min nekişandiye.

Ez kesayetek wisa was was im ku, bêhedar û ji mantiq dûr im, li pey hestên xwe dikevim û kar dikim. Lewma ji hemû pêşketinên pey re bi xwe rê vedikim û ne di ferqa wan de me. Ev qas jî koranî nabe ku bijîm.

Yekser min ji qoxuşa 35'an Karasu re notek nivîsand. Min rexne li Hamilî kir. Diyar kir ku, em şoreşger in, şaş e ku ji ber birayê min e, hinek tiştan ji Metîn re dibêje, ez dixwazim tiştên ku gotine veke, tên çi wateyê. Di heman demê de min gotibû, ger hevaltiya me ya gerim û hinek aliyên min bûne çavkaniya van tiştan gelekî xemgîn im. Aciz dibim, ku çawa Hamilî hewl dide vê pirsgirêkê bi Metîn re çareser bike. Ger hinek tiştên çavkaniya xwe ji min digirin hebin, nêzîkbûnên min cuda fêm kiribe, dikare bi min re bi-axive.

Weke din em di girtîgehê de bûn û ewqas êş hatibûn jiyîn. Di nava evqas rewşên hatine jiyîn de, tiştek din jiyîn, tê wateya ku giraniya êşên hevbeş nayên dîtin, hesîn û hîskirin. Dibe ku aliyê zêde bandor dikir jî ev bû. Şerimkirin, acizbûn û nerehetiya hundirîn jî di vê mijarê de bû.

Bersiva notê hat. Karasu dibêje ku, nota min daye Hamilî, wî tiştek jê fêm nekiriye û nota ku Hamilî jî nivîsandiye pê re şandiye. Her wiha Karasu hişyariyek weke "serê xwe bi van tiştan ne êşînin û tengav nekin" dike. Hamilî jî destpê kiriye; "tu di vê cîhanê de dayîka min û xwîşka min î." Diyar kiriye ku

gelek xemgîn bûye. Diyar kiriye ku Metîn şaş ragihandiye. Kêfa min ji vê notê re hat. Ez ji xwe re dikeniyam. Di heman demê de jî aciz dibûm. Gelo min çima hêj tiştek di holê de neyî lez kiribû û not şandibû. Ji bona bê ku ji Metîn pirs bikim û lêbikolim min evqas şîrove kiribûn, ji xwe jî aciz dibûm. Paşê min got; "çi nabe. Bila ne bi hestek din be tiştek nabe. Kêmasiyên min ne girîng in. Paşê ger derfet çêbin, ezê jê re rave bikim."

Piştî van nivîsên notan rûniştina me ya dadgehê heye. Em çûn dadgehê. Min Hamilî di korîdora dervî girtîgehê de dît. Silav jî neda min. Rûyê wî daketî, pişta xwe da min û li min jî nanêre. Tevahiya rojê wisa nêzîk bû. Ez di rûniştina dadê de li paş xwe zivirîm û min ji hevalan pirsî; "çi heye? Ma tiştek bûye?"Gotin; tiştek tine ye." Ji hevalan re dibêje ez hinekî nerehetim û ev agahî heta rêza pêş şand. Min zêde pê bawer nekir.

Em çûn hevdîtina hundirîn a ku mehê çarekê 15 xulekan dihat kirin. Em hemû li eywanê ne. Hemû xizim li wir hevdîtinê dikin. Metîn hatiye berdan. Ez hêj bi Hamilî re weke kurê xalê xwe hevdîtinê dikim. Em rûniştin. Me demekê bêdeng û mehcup li hev nêrî. Berê ne wisa bûm. Min hemêz dikir, destê wî digirt û li pey hev pirs dikirin. Ji ber dem kin bû, diviya me her tişt di van kêliyan de nîqaş bikira. Em agahiyên nû, rewşa girtîgehan û her tiştî mereq dikin.

Min got; min wê rojê her tişt tevlîhev kir. Min nota Metîn şaş fêm kiriye. Gelekî xemgîn im. Lê malbata te ji yên me re hinek tişt gotine. Min ew bi zorê qane kirin. Gelo ev hevdîtinên me şaş tên fêmkirin. Ma qey hinekan tiştek gotiye? Gelo hinek

bi zanebûn vê tiştê dikin?" Piştî ku Hamilî demekê bêdeng ma got; "na, rast e." Min got; "çi rast e?" Got; "baldariya min a li hember te ji salên 75'an ve ye." Min jê re got; "nabe! Min her tim weke birayekî li te nêrî û hez kir." Min destê wî bi hişkahî girt nav destên xwe. Hamilî dîsa bêdeng bû û beriya dema hevdîtinê biqede, di zengila yekem de rabû çû. Xatir jî nexwest. Silêman bi serê xwe pirsî; "çi heye?" Ez li ser piya me. Leşker jî li wir in. Wan jî wate ne dida vê rewşê. Ji ber dema wexta hevdîtinê xilas dibû, em zorê derdixistin. Heta ji bona em wextê hevdîtinê çend xulek din zêde dirêj bikin, em li ser piyan di-axivîn. Me dengê zengilan jî nedibihîst. Min ji Silêman re got; "bi Hamilî re eleqeder bibe." Moralê min xirab, vegeriyam qoxuşa xwe.

Hamilî mirovek çawa bû? Di nota beriya niha de diyar kiribû ku ez xwîşk û dayîka wî bûm! Niha jî qaşo dibim çiya wî ya çend salan! Gelo min nedikariya her tiştî bi tenduristî bihizirim? Ez nizanim çiqas wext bi ser vê hevdîtina me re derbas bû. Karasu not şandibû. Di nota yekê de pêşketinên giştî hatibûn nivîsandin. Her wiha armanca giştînameya hatiye weşîn bi kurtasî pênase dike û biryara me ya cilên yek tîp derxistinê ku em dikarin di vê pêvajoyê de bikin rojevê de destnîşan dike. Kêfa min jî ji vê re hat. Êdî diviya me 'qofika tîpê yek rengî bavêta. Ji 85'an ve tê nîqaşkirin. Her komek siyasî pêşniyarek cuda dikir. Paşê pirsgirêkên navxweyî derketin, wan mijûlbûnek çêkir û hêj wisa ye. Li cem me jî ev du sal in doza Leyla Akbaş didome. Ew kirin hêcet û tam veguherandin şerek tolhildanê. Xwestin bi tevgerek cezayên zêde ve em gav şûnde bavêjin. An jî li gorî wan digot, bi dev û bêvla me re anîn!

Nota duyan cuda bû. Derbarê Hamilî de bû. Diyar dikir ku ya rastî Hamilî hevalek baş e, durist e, ez jî kesayeta wî ya berxwedêr nas dikim. Di nota xwe de her wiha wisa didomîne; “ pişt re serê xwe bi hinek tiştan êşand û xwe tengav kir. Demekê di qoxuşa 82’an de xwîşka Yildirim Cemîle Merkît (Seher) xwest dest bavêje Hamilî. Dozek wî ya notekê çêbû. Hamilî di wê mijarê de helwest raber kir. Rewş ji me re got. Me jî ev di navbera xwe çend kesan de nirxand. Ji bona dibe ku hinek din bikar bînin, me nexwest belav bibe. Jixwe di nava me de tîpên wisa jî hene. Ew jî zêde hesas e, di hişyariyek me ya herî biçûk de şaş fêm dike û dilê xwe digire. Te hinek tişt nivîsandine, ew jî bandor bûye. Hezkirin û baldariya me şoreşgeran jî heye. Divê mirov şaş fêm neke. Divê dema tu biryar bigirî, hesasiyeta wî jî berçav bigirî. Dîsa jî tu dizanî. Em nabêjin divê mîsoger wisa be. Tu di wê zanebûnê de yî ku bizanibî çi bikî…” Ango ji min tê hevîkirin! Çi ecêb e!

Nota sêyem jî Hamilî şandiye. Hinekê dirêj nivîsandiye. Jixwe rêbazek nivîsa wî ya ecêb heye. Ger ez fêlbazek nivîsê bûma, dê min ji nivîsa wî xisleta wî derxista holê. Lê bi rastî jî nivîsa wî jî, heman weke wî ecêb bû. Dûvikê her tîpa wî ya nivîsê hebû.

Ez li odeyekê û bi tenê me. Dema min evder nivîsand bi dengê bilind keniyam. Hêvîdar im kesên derdor dengê min nebihîstibin. Ji ber dê bêjin qey dîn bûme. Nivîsa bi dûvik! Marê bi dûvik! Stêrka bi dûvik! Hezkirina bi dûvik! Destê min negirt ez vê peyva dawî binivîsim. Lê hew min dît, min nivîsandiye. Ji ber hezkirin bedew e. Bê dûvik û xwerû ye.

Ez bibûm Sekoya Hamilî. Berê Sekoya diya xwe bûm, dema aciz dibû digot. Her wiha carê Meral jî digot. Ew jî ji Hamilî hîn bibû. Yekser wisa bang nedikir, lê di notên xwe de Seko bi nav dikir.

Ji 75'an destpê kiribû heta reva min, bertekên min ên di vê mijarê de, pêvajoya hatime nîşankirin tev vegotibû. Dibêje nota xwe ya destpêkê ji ber bertek û helwestên min tirsiya ye, lewma ji bona bide bawerkirin wisa nivîsandiye. Piştî ku min name xwend gelekî xemgîn bûm û giriyam. Ecêb, ez jê bandor dibûm. Ez ne ji bona xwe, ji bona wî tiştên ku nivîsandine û hestên wî digiriyam. Ez ji xwe aciz dibim ku min çima ew fêm nekiriye. An jî mat dimînim ku çawa ev hestên xwe bi ti şêwazî nedane hesandin. Herî zêde jî ev alî bandor li min dike. "Ger ez bûma, dê min bida hesandin." Ji ber van hestên wî weke kûranî û duristiya wî dinirxînim, Hamilî zêdetir hez dikim û li hember rêz digirim. Di heman demê de ji xwe dipirsim; "gelo hezkirin ev bû?"

Tam hefteyekê ez mijûl kirim. Ez nexweş ketim nav cihan. Min ewqas sal li girtîgehê êşên bi lenet jiyan, yek ji wan ez nekirim nav cihan û nexweş nexistim. Lê mixabin Hamilî ez nexweş xistim nav cihan!

Gelo gelekî hişk bûm, an jî zêde hestiyar bûm? Min bi salan tiştên ku hatine jiyîn, êşên wan qet jibîr nekir, hemû di dilê min de bûn. Wan em bi her tiştî ve li dijî dijmin hişk kiribûn. Ev rast bû. Kîn, hêrs û wan îsyanan dilê min kiribûn kevir. Lê ez beramber hevalên xwe jî ne wisa bûm. Herî zêde jî ew vê rastiyê dizanin û min nas dikin. Yê herî zêde jî min nas dike Hamilî ye. Ew hemû jî evîna min bûn. Eşqa rastî jî ev bû.

Tişta ew hîs dikin û eşq jî bû. Dibe ku dileke min ewqas mezin bikaribe her tiştî hîs bike tine bû, lê bi rastî jî tişta ku wan hîs dikir, ez jî di nava hemû şaneyên xwe de dihesiyam û min hîs dikir.

Ez jî rûniştim, min ji Karasu re notek dirêj nivîsand. Min di wê notê de jî gotibû, "hûn tev evîna min in. Her wiha min behsa rêzdariya Hamilî û hevalbendiya me, ku xwe dispêre çi kiribû. Ev gumanên min hebûn; dibe ku Hamilî di axaftin û nêzîkbûnên xwe de hest û bertekên xwe weke yên me her duyane dabe nîşandan. Ji xwe bi zilaman re ev tişt heye. Heta ji bona yên miqabilî xwe xeyalên wisa ava dikin, weke ku rastin vedibêjin. Dibe ku ji min re nedabe diyarkirin, min rê neda vê nêzîkbûnê, bes ger ji Metîn re gotiye û Karasu ew jî wisa navbeynkariyê dikin, bi min re nêrînek wisa ava kir. Ez jî dibêjim na, rastî çiye bila wisa were zanîn. Ev mijarek wisa bi xeyal û meyalan pêk nayê ye. Divê kesek derheqê min de bi navê hezkirinê jî be, tiştekî hêjayî min nebîne. Ez jî evqas hesas nêz dibim. Sedema min evqas dirêj nivîsandî jî ev bû.

Di vê navberê de nivîsên me yên bi qoxuşa 35'an re didomin. Nivîsên nêrîn û pêşniyarên her komê yên têkildarî danasînê hene. Bersivên ji nivîsên me re jî hene. Danasîn jî tiştên beriya niha re hatine kirin, tenê zagonek bi sazûman dike. Ji ber çewsandin û êşkenceyên girêdayî zagonan tên kirin hene. Êşkendeyên weke yên cilên yek tîp were berkirin, dîsîplîna hundirîn were sazkirin, nizanim dê parezeran re wisa hevdîtin were kirin, ev qedexe ye, ev bi destûr dibin, ango pêşnûmeyek qedexeyan dirêj, belgeya çewsandin û bê kesayetiyê ferz dike. Ev pêşnûme hemû girtîgehên Tirkiyê û Kurdistanê jî digire

nava xwe. Di vê manê de çalakiyên hevbeş ên hemwext tên hizirandin. Em jî van bi nameyên cur be cur û nivîsan veşartî derdixin derve û hewl didin bi rêya malbatan bigihînin cihên din. Ev jî demek dirêj digire. Ji ber her girtîgeh û her kom di navbera xwe de nîqaş dike û wisa biryar digire.

Bi notek nû re, notek cuda bi îmzeya M. Şener jî hat. Bi navê min nivîsandiye. Ew jî behsa hezkirin û baldariya Hamilî dike. Heta zêdegaviyan dike. Qaşo dixwaze min bide bawerkirin. Behsa pantorê delingê wê fereh û peruka min a zer ku dema ez ji Almanya vegeriyayîm, min li ber xwe kiribûn dikir. Ez mat mam. Bertekên min ji bertekên berê cudatir derdikevin holê. Gelo çima Hamilî behsa van ji her kesî re kiribû? Nakokî bi min re çêbûn. Hem tiştek bi min nedaye hesandin, hem jî behsa min ji her kesî re kiriye. Dilê min tengav bû. Wisa bi rêya navbeynkaran kar kirin, ecêb bû. Weke ku ez zarok bûm, hewl didan min qane bikin. An jî gelo min delaliya xwe dikir. Hineke din jî delaliya xwe ser ya min ve zêde dikirin!

Min ji xwe re got; "na, divê ez xwe bi xwe bihizirim."

Cardin li vir fedekarî derdiket pêş. Ev peyv jî ji 'fedakirinê' tê. Ango feda kirin! Min fedakirinek ku demek dirêj ez mijûl kirîm jiyabû. Dema min hewl da bi navê "her tişt ji bona şoreşê ye" hinek tiştan bikim, dê mijara çi bê fedakirin de baş xwe amadekirin û hevsengiya tê xwestin baş avakirin gelekî girîng e. Beriya her tiştî em di girtîgehê de bûn. Dê dijmin rewşa asta têkîliyek wisa zêde bikar baniya.

Di dema dawiyê de wêneyên cotên ku li hinek girtîgehan bi hev re zewicîne di rojnameyan de derdiketin. Em di vê mijarê

de gelek hişyar tevdigeriyan. Cahîde û Silêman di pêvajoya têkoşîna Sîwerekê de bi dergistî bibûn. Dijmin jî di lêpirsînan de bi vê hesiyabû. Ev jî dibû sedem ku di hevdîtina her duyan a bi malbatan re de pirsgirêk werin jiyîn. Ji ber paşnavê wan ne yek bû. Pêşniyar kirin "em wan li hev mehir bikin." Min jî qiyamet rakir. Tevî ku gotibûn me ji qoxuşa 35'an biryara erêkirinê girtiye, dîsa jî dijî derketim. "Dê dijmin roja din li hemû rojnameyan bêje li girtîgeha Amedê zewac pêk hatiye, kesên PKK'yî di girtîgehê de zewicîne. Nabe. Divê em lîstokên dijmin baş bişopînin. Jixwe li firsendek wisa digere." Min hewl da wan ji vê biryarê dûr bixim. Heta demekê jî Cahîde di bin bandora vê de bû. Ji ber çavkaniya xwe ji wê nedigirt. Rexneyan bandor lê kiribû. Herî zêde jî di navbera hevalên xort de ev pêşniyar ketibû rojevê. Heta Mêhdî Zana jî weke şahidê xwe hilbijartibûn. Ango şahidê xwe jî amade kiribûn.

Lewma ev mijar ji bona min gelekî girîng bû. Ne ku dijmin bibîhîse, gelekî xeter bû ku heval jî di navbera xwe de nîqaş bikin. Weke din jî Hamilî bandor bibû. Hem ez ji vê rewşa wî ya bandorbûnê aciz dibûm, min ecêb didît, hem jî min zêde hestewar dinirxand û xembar dibûm. Em di nava mercên girtîgehê de bûn. Darvekirin, girtina bê dawî, an jî birêbazek din mirin zêde ji me nedûr bûn. Di rewşek wisa de daxwazek, hezkirinek, an jî tiştek din a hevalekî bi tundî redkirin, ji aliyê wijdanî ve jî ez tengav dikirim. Jixwe min zêde jê hez dikir. Astek din li ser vê zêdekirin, dê çawa be? Min hewl da vê biryarê bidim. Dilê xwe bi yê miqabilî xwe şewitandin, ji hestên wî bandorbûn, hezkirina wî xwestin, tirs û gumanên windakirinê jiyîn, ma di encamê de ne serê xwe ji biryara yeke din re tewandin bû?

Hezkirin, tenê ji bona hinek kesên din xwestine pêş nakeve! Berî her tiştî hezkirin çi bû? Di wateya herî gelemperî de dibêjin hezkirin, ked e. Jixwe ev jî hebû. Dibe ku zêde xweser, takekesî, yan jî diyarker nebû, lê min ji bona Hamilî ked dabû. Lewma min ew ked hez dikir. Min ew ked jî ne bi şêweyek ferdperest, bi hesûdiyek mezin diparast. Dema Hamilî zewicî bû û dema Hamilî yê me teva jî bû, ev parastin, hezkirin û baldarî hebû. Wê demê tişta niha dihat xwestin çibû? Ez jî di vê mijarê de tengav dibûm. Dê parçeyek hezkirina bi min re ava biba. Hezkirinek bi wî re diherike û wî na êşîne. Ya rastî asta heyî jî ma ewqas bedew bû, xwezabûn, gerimbûn û hazza wê bes bû. Gelo hezkirina takekeskirî dibû? Ez nikarim tenê bibin ya kesekê! Ew kes jî nikare tenê bibe yê min! Ez Sekoya hemûyan bûm. Min bi kesayeta her kesî re Hamilî didît. An jî min bi Hamilî re her kes didît.

Ez jî bedewî û watedariya hezkirina bi me re di nota ji Hamilî re dinivîsim. “hezkirina min ji te re dûr e. Ne tiştek nû ye. Dê tiştek nû jî çênebe. Lê ez dîsa jî vekirî bêjim, min di vê mijarê de dilê xwe yê bûye kevir nerim kir. Ji ber te evqas dem dirêj ev hezkirin jiyaye û bê ku bi min bidî hesîn parastiye, bandor li min kir. Jixwe ez bawerim hezkirin jî ev e.” Bi zehmetiyek mezin ve min ji Karasu wan re jî diyar kir ku biryar girtiye, lê divê tenê bi hevalên dizanin re sînordar bimîne, divê teqez kes nezane û nêzîkbûnek baldar ji vê mijarê re were kirin. Min pêşniyar kir “dê ev têkîlî weke sozekê bimîne.”

Vê carê jî min û Hamilî ji hev re dinivîsand.

Xalên dibin yek û li hev dikevin ji hev cudakirin

Bi daketina cewhera pirsgirêkan û têgihiştina wan ve girêdayî ye

Me çikir û nekir li hember giştînameya giştî, çalakî nehatin destpêkirin. Tevî ku mijarek herî girîng a notên me yên dihat û diçûn bû, di dema destpêkê de ew hêcetên nezelal ji min re durist nedihatin. Her ku firsend çêdibû, min nêrînên xwe yên têkildarî vê mijarê digot. Lê piştî ku hîn bûm xebatên amadekariyên tûnelê hene, min tiştek negot. Hamilî di hevdîtinek me de got amadekariya çalakiyek revê ya mezin heye. Dê hejmarek zêde qadroyên me yên girîng derketan. Hejmar ser çilî re bû. Digot dê ji TÎKKO jî çend kes bi xwe re bibiran. Kêfa min ji vê re hat. Lê ew di qoxuşa 36'ê de bû. Digot ji bona bal nekişîne heval li qoxuşa 36'ê dimînin.

Em jî bi qasî digihêje destê me nivîs û notên nîqaşên têkildarî bûyera Fuat de dixwînin. Di van nivîsan de tê fêmkirin ku rêxistina girtîgehê pirsgirêkên cidî dijî, pirsgirêkên salane bi qadro û avaniyê re kom bûne xwe nû didin der, rexne û hev tewanbarkirin di asta herî jor de derdikeve holê û di çareseriyê de jî zehmetiyên girîng tên jiyîn. Hêj pirsgirêkek zelal nebûyî û neqediyayî, yeke din derdiket. Bûyera Fuat di bin navên "pêşniyaznameyên (onerge) çar serî, deh hezar, Komîsyon, Kabîna Siyan" de, pirsgirêk û ferzên hevûdû tengezar dikin ên rêveberî û qadro dihatin jiyîn. Ez kesayet, ast û binyata hemû hevalan nas nakim. Ez tenê bi helwestên wan ên dadgeh û berxwedaniyan de rola ku raber dikin ve dinasim. Di nivîsên tên şandin de heta demekê pirsgirêkên giştî dihatin

destnîşankirin. Paşê em bi encamên wan ve bi hinek tiştan hesiyan. Bes di naskirina sedem û çavkaniyan de têrê nedikir. Jixwe di nêzîkbûnên min de jî baweriyek li hember hevalan heye ku, dê ew van ferasetan çareser bikin. Li kêleka van dema mijarek di hişê min de bima, nakokî bûya û nehatiba fêmkirin min dipirsî, rexne dikir û pêşniyarên xwe radigihand. Lê di mijara min an jî em tevlîkirin û kêrhatî destgirtinê de ti peywendiyek tine bû. Di nêzîkbûnên weke dibe ku em xemgîn an jî bandor bibin û yan jî 'me eleqeder nake' dihizirîn de gelek tişt girtî, bisînor û kêm dihatin ragihandin. Lê em di vê mijarê de zêde kêrhatî bûn. Me her tiştê ku dibihîst ji wan re radigihand û her tim jî xeta xwe ya peywendiyê vekirî dihişt. Jixwe di wateyekê de li girtîgehê rewşa me ya girtîbûyî hatibû pejirandin. Lewma em piştre gelek pirsgirêkên girîng hîn dibûn.

Di navbera me de pirsgirêk, hesab xwestin û dayîn zêdetir teng û ji rêzê bûn. Nêzîkbûnên takekesî û ferdperest zû derdiketin holê. Hevûdû tewanbarkirin zêdetir di asta pirsgirêkên jiyana rojane de bûn. Helwestên wan ên li dijî dijmin jî, rewşa wan a tewanbariyê zelal bû. Cahîdê heta demekê zehmetiyek mezin ava kir. Ew jî bê bandor bû û jixwe piştî hewldana xwe kuştinê tevlî jiyana giştî bû.

Gonûl jî belayek çep û rast bû. Lê me destûr neda ber bi rewşek din ve biherike. Piştî ku derket me di raporek kin a nivîsandî û şand derve de gotibû; "divê di bin venêrîna partiyê de bimîne û heta demekê neyê erkdarkirin." Di vê derbarê de pêşniyara me hebû û me rewşa wê jî ji hinek aliyan ve diyar kiribû.

Ji ber bandora şêweya têkîliyên pêvajoya koman a teng, şêwazek me ya xebatê ku me dimeşand hebû. Lê her çendî ji destpêkirina pêvajoya destpêkê ya girtîgehê, heta dawî di navbera xwe de bi pevçûn û lihevketinek jî hebe, nêzîkbûnên kargeriya rêxistinî ya veşartî, teng û girtî jî hebû, em dîsa jî di biryarên girîng de bi hev re tevdigeriyan. Aliyên erênî yên li cem hev mayînê hebûn. Tiştên dihatin jiyîn û kirin tev vekirîbûn. Ti nêzîkbûnek kesî ya veşartî û dizîve tine bû. Lê belê, bi gelemperî qoxuş û blok cuda bûn û lewma pêvajo jî cuda hatibûn jiyîn. Ji ber vê şaşî, guneh, eyb û tewanên dihatin jiyîn zû dernediketin derve, ango nedihatin zanîn. Hemû nexweşiyên di asta qadro û avaniyê de heyîn herî zêde di van salan de rû dan û derketin holê. Em jî gelek pirsgirêkan bi vê ve girê didin û hewl didin hem fêm bikin û hem ronî bikin.

Bi gelemperî jî pirsgirêka tengezarî ava dikir, bûyera Fuat bû. Ya din jî Şener bû. Me kêm zêde bûyera Fuat fêm kiribû. Lê Şener çima dihat nîqaşkirin, çima dihat rexnekirin? Rola wî çi bû û kî bû? Kesayetek me rewşa wî baş ne dizanî bû. Di nivîsên derbarê bûyera Fuat de dihatin nivîsandin de navê gelek kesan derbas dibû. Navê Şener jî di nava wan de hebû. Dîsa di nivîsandinên komên din re jî navê Şener derbas dibe. Hevalan di nivîsa herî dawî de weke pêşketinekê nivîsandibûn; "dema Şener hevdîtinê bi Salîhe re dike, not tê girtin." Min di vê mijarê de rexneyên pir cidî kirin. Di nivîsan de di derbarê Şener de rexne, nirxandin û heta gumanên gelekî girîng hene. Dibe ku nirxandinên komên dervî me zêde cidî nehatiban girtin, lê di nivîsên din de jî hatibû destnîşankirin ku, bi taybet ji ber têkildarî nêzîkbûna wî ya di berxwedaniya Çileyê de, ceza girtiye, tevî vê jî di pêvajoya cezayê de weke rêveberiyekê

tevgeriya ye, bandora xwe li ser biryaran kiriye û ji qadroyên din zêdetir derketiye pêş. Malbatan jî behsa pêvajoya berxwedaniyê dikir. Min jî notek wisa nivîsand; "ev Salîha kor kî ye, an jî rola Şener çiye? Çawa notan didin girtin. Divê hesabê vê cidî were pirsîn, ez di wê baweriyê de me, bûyerên heyîn baş nayên zelalkirin." Û min nêrînên xwe berfireh diyar kirin.

Em di nota nû hatî de hinek tiştên din hîn bûn. Nivîsandibûn; "Salîha kor dayîka Şener e. Heta niha wê hinek peywendî meşandine. Lê belê, gelek gazincên malbatan hene. Ji ber ew jî hinekê ziman dirêj e. Alîkariya hinek malbatan tê kirin û heval pereyan dişînin girtîgehan. Malbat jî di navbera xwe de hevûdû napejirînin. Tê gotin ku pereyên partiyê tên xwarin. Em jî lêdikolin. Bes ya herî girîng not dayîna girtine. Dema dide dest dikeve û leşker jî dibîne. Şener hewl dide ji erdê rake, di wê kêliyê de hengameyek rû dide, leşkerên din jî dest werdidin û notê digirin. Bûyera notê jî wisa ye. Bûyera Şener a yek tîp jî wisa ye; "vî û Necmettîn Bûyûkkaya dibin cihê serşokê, êşkence dikin. Hûn dizanin Necmettîn şehîd dikeve. Êşkencê li Şener jî dikin. Hewl didin sondê û sirûda îstîklalê pê bidin xwendin. Ew jî dixwîne. Li gorî ew dibêje di wê kêliyê de hişê wî ne li serê wî bûye, hişê xwe winda kiriye, lewra dibe ku xwendibe. Ev jî hat nîqaşkirin û cidî hat dîtin. Weke helwesta qadroyek pêşeng ku diviya nejî û nejiyaba hat dîtin. Her wiha jixwe çi dibe bila be dê ti qural nehatiban qebûlkirin. Dê qebûlkirina yek quralî weke radestbûn û heta îxanetê were nirxandin. Her kes jî vê dizane. Di encamê de ev rewş jî weke bandora mercên lewazî û radestbûnê hat nirxandin. Ceza hat dayîn ku dû salan erk negire. Komên din bi zanebûn hinek tiştan dikin rojevê. Fûat ew jî bi heman şêwazî

dikin. Ya rastî Fuat rewşa heyî destpêkê bi Şener wan re nîqaş dike. Di vê mijarê de gelek hevalên din jî hene, di rexneyên derbarê rêveberiyê de dibin yek. Di pênasekirina pirsgirêkê de jî pişt re ev li dijî me dan bikaranîn. Ji ber tevî biryara hatî girtin ew weke qadroyek rêveberiyê tevlî xebatan bû, hesab ji me pirsîn. Di vê mijarê de nebesiyên me jî çêbûn."

Di derve de jî hewldana avakirina tevgera malbatan hebû. Salîha jî di nava vî karî de bû. Tevî hemû gotinan, gelek xeter bû ku, Salîha di hemû peywendiyên girîng de dihat bikaranîn. Me têkildarî vê pêşniyarên xwe şandin. Di heman demê de me nota hevalan a ji bona Eyaleta Mêrdînê jî şand. Hatibû nivîsandin ku; "bila ti notek girîng ji Salîhayê re neyê dayîn û baldar nêzî peywendiyan bibin. Tenê dikarin not û agahiyên ji rêzê werin dayîn. Ew jî ji ber bal nekişîne û bandorek neyênî li ser nebe." Weke din jî her çendî zêde fermî nebe jî, komîteyek hatibû avakirin. Di nava vê komîteyê de xwîşka Şener Fatma, birayê wî yê biçûk Îhsan, xwîşka Cahîdê, Leyla Zana û hinek malbatên din hebûn.

Her wiha di notê de; "di mijara biryara cilên yek tîp de bandora Şener hebûye, lê bi biryarek hevbeş ew cil li ber xwe kirine. Di wê pêvajoyê de wisa dan diyarkirin ku, Şener bi tena xwe biryar daye. Em jî zêde li ser nesekinîn. Heta dibêjin Şener gotiye di vê mijarê de neheqiyê lê dikin û gelekî bi bandor bûye. Ji ber beşek zêde ya avaniyê ew cil li ber xwe kirine. Qural pêk anîne. Me jî xwestiye em wê hêceta cilên yek tîp ji destê dijmin derbêxin. Me di navbera xwe de nîqaş kir û bihurdar li ber xwe kirin. Lê me biryar girtiye di demek herî nêz de, cardin ji nû ve bi şêwazek rêxistinkirî bi hev re ji ber xwe bikin û bavêjin. Pirsgirêk wisa ye." Nivîsandibû. Em jî wisa hinek din bi ziraviyên bûyerê hesiyan.

Me baştir fêm kir ku em çiqas dûrî pirsgirêkanin. Ger bawerî nebe, rewşek tevlîhev ku mirovan bixe nava gumanan heye. Lê ew bawerî dihêle ku em ji aliyê xwe ve zêdetir, herî kêm ferzkirinên di asta raman, rexne û pêşniyaran de kêm bimînin û neyênî bandor bike.

Min di vê navberê de pirsgirêkên Hamilî yên birêxistinê re jî bihîstin. Di pêşniyazanameya çar serî de ew, Şener, Yûcel, Erkan û hevalek din jî heye. Min her tim wer dizaniya ku endamê rêveberiyê ye. Hamilî cadin heman weke pêvajoya Elezîzê xwe ji derveyî karê rêveberiyê girtiye. Lê mixabin bendewarî û girîngiya herî mezin bûna mirovê erkên zehmet bû. Kesî nedikariya di nava evqas pirsgirêkan de bi şêweya pêşniyaznameyan, kabîneyên weke siyê (golgelik), nizanim komên cuda ve tiştekê bidest bixe. Bêhna min teng dibû. Ez jî ji xwe dipirsim, gelo çima qet negotin? Ne Karasû got, ne jî wî. Gelo ji bona ez pê bandor nebim, negotin? Dema em li Elezîzê nîqaşek me tund çêbû. Min carekê jê re got; "tu ji tiştên xeter direvî." Li cihek weke girtîgehê, li nav girseyek wisa zêde, li cihek her cure venêrîna dijmin lê heye û li qadek ku her cure lîstok lê tên ferzkirin de, girîngiya erka rêveberiyê gelek bû. Ma ne partîbûn, qadrobûn û berxwedêrî jî di van pêvajoyên zehmet de diyar dibû?

Gelo hêj xeyîdî bû? An jî zêde hesabê her tiştî dikir? Ez jî dihizirim ku her du jî bi Hamilî re hene. Li eywana ku em li benda rûniştina dadgehê bûn de, min yekser mijar vekir. Çawa min got, aciz bû, ceynikê wî li hev ketin û lez got; "kê ev gotin? Na, tiştek wisa tine ye." Piştre jî domand;

“Ji pêvajoya lêpirsînê ve min nexwestiye erk bigirim. Min di wê pêvajoyê de jî got. Hinek kêmasî û lewaziyên me rû dan. Em hatin girtin. Me nekarî erka xwe ya rêveberiyê baş pêk bînin. Her wiha me nekarî em berxwedaniyek bi hêz a dihat xwestin raber bikin, hinek axivîn. Min ji wê demê ve gotiye ezê erk negirim. Tenê rikek kevne. Nexwe tiştek din nîne. Eleqeya xwe jî bi vir re tine ye.”

Min got; “Tu rast naxivî Hamilî.” Ji ber vê gotina min jî zêde aciz bû. Cara yekê bû min wisa yekser rexneyek giran lê dikir. Digot; “kê ji te re çi gotiye? Tu dixwazî çi hîn bibî?” Hêrs bû û bi rêbazek li pêşiya nîqaşê bigire di-axivî. Ji rexneyan re nevekirî bû. Ya rastî qet nevekirî bû û çima ji vekirina pirsgirêkan ditirsiya? Mijara ku ez jî zêde pê hesas dibûm ev bû. Ji ber kêm jî be, min Hamilî nas dikir. Min nedixwest ew ti şaşiyê bike. Weke din jî tevî ku evqas qadro hebûn, gelek pirsgirêk jî hene û ez hêj zêde ziraviya bûyeran nizanim. Her wiha bûyera heyî ji aliyê têkîliya me ve jî dihizirim. Emê berî her tiştî ji hev re vekirî bin. Ya duyem; pirsgirêk girîng bûn û gumanên min hebûn. Cara yekê bû min parçebûna di navbera qadroyan de dibihîst.

Hamilî wer bawer dikir ku hinek hevalên din têkildarî wî bandorek neyênî li min dikin. Çi ecêb bû! Li holê pirsgirêkên rêxistinê hene, rêveberiyê dikariya ji min re jî bêje. Jixwe ji bona neragihandine pir aciz bûme. Min di notek nû ji Karasu re nivîsandî de rexneyên xwe kirin. Xwest ku rewşa Hamilî weke heyî bizanim. Divê pirsgirêk jî tenê di asta “têkîliya sozê” de neyên destgirtin, her tişt ji ber ew tiştekî naragihînin pêş dikeve. Min got; “ji bona min pirsgirêkên rêxistinî girîng in, berjewendiyên rêxistinî girîng in, ew min eleqeder dikin.” Min diyar kir ku qebûl nakim ji min tiştekî veşêrin.

Nîtelîka her tiştî hinek din dihat guhertin. Ji ber ji hev dûrbûna bi salan, cudabûn û hestewariya bûyerên hatine jiyîn dane avakirin, me jî giranî dida aliyên giyanwerî. Rêzdariya li hember berxwedaniya hevalan, baweriya bi partîbûna wan, ji dûr ve jî be dîtin, hîskirin, bihîstin û jiyîna wan, bi înat ji bona li dijî dijmin li ser piyan rawestin bes bû. Xwestek û bêrîkirina vê, şer, pevçûn û nakokiyên heyîn danîbûn aliyekê. Her çendî helwestek ne vekirî li dijî tiştên dihat dîtin û zanîn hebû, me dîsa jî zêde hesabê tiştên ku nedihat zanîn nedikir. Pişt re dema peywendî pêş ketin, me her tişt hinek di nava rastiya wan de zelal dît, hêdî hêdî em jî ketin nav, di hest û ramanên me de jî pevçûn hatin jiyîn. Aliyên dibin yek û di pevçûnê de ne, ji hev cudakirin, fêmkirina cewhera pirsgirêkan, bi têgihiştina wê ve girêdayî ye.

Gelo dijberiya partiyê çibû? Ev di girtîgehê de bi şêwazek çawa pêş diket? Ji ber axaftin, li xwe mikur hatin, fesadî tev diyar bûn. Mirov wate dida hemû nêzîkbûnên qels ên weke bi cureyekê ji têkoşînê bandor bûne. Lê ji ber zehmetiyên ku rû bi rû mane, bêbawer ketine, xwedî berteke, ji malbat û pergalê qut nebûye. Lewma cardin dixwaze vegere jiyana kevin, lewaziyên ku qet kevneşopî neşikandine jî, çavkaniya xwe ji nezanîna bîrdozî û polîtîka, nenaskirina dijmin tevê digire. Dema mirov hinekê bi mantiq dihizirî, dikariya wate bide. Lê mixabin hinek tişt jî hebûn, ew wisa hêsan û zû nedihatin fêmkirin.

Tenê bi nêzîkbûnek durist jî nirxandina bûyeran têrê nedikir ku, hinek tiştan rizgar bike! Mirov xwe bixe nava tengezariya hemû niyetên xirab jî, dîsa pirsgirêk çareser nedibû. Her yek ji me rewşa me çibe, çiqas asta me ya

fêmkirin, têgihiştin û derxistina zanebûnê hebe, çiqas hêz û jêhatiya me hebe, em ewqas di nava kar de cih digirin. Em ewqas dikarin bibin hêza çareseriyê û şerê me pêş diket.

Tam di vê hengamê de karê tûnelê jî, ji bona me dibû moral. Gelo hinek tişt zanebûn ji bona wê dihatin fedakirin? Bêguman reva çil kesî çalakiyek pir mezin bû. Lê her ku vî karî dirêj dikir, pirsgirêkên din jî dibûn belayek mezin.

Hevalan ji me xwest em di kirîna alçiyê de xwe biceribînin. Ji ber wê her tim hewce bike. Me jî ji bona vê plansaziyek çêkir. Cahîdê dibistana amadeyî ya pîşeya keçan qedandibû. Karên seramîkan dizaniya. Ji îdareyê re hat gotin ku hinek alavên weke alçî, boyax û hwd. hewce dikin. Emê hinek tiştan ji bona diyarî çêbikin û hinekan jî bişînin derve ji xwe re bifiroşin, da ku em debara xwe pê bikin. Piştî mijûlbûnek dirêj hat pejirandin. Ji bona bal nekişîne carê me ji bona gardiyanan jî çêdikir da ku em "dilê wan bidest bixin." Her wiha ji bona alçî têrê bike, nava nan jî dihat bikaranîn. Dema dihat boyaxkirin, nedihat zanîn. Alçiya dima jî, me ji bona deriyê tûnelê dida qoxuşa 35'an. Dema me jî tevkariyek biçûk dikir, em jî pê kêfxweş dibûn û kelecanê em digirtin.

Di heman pêvajoyê de li dijî gştînameyê pêkhatina çalakiyan di rojevê de bû. Çalakî hatibû destpêkirin. Lê mixabin plansaziya çalakiyê berî pêkanînê ketibû destê îdareyê. Li qoxuşeke endamên komên din lê zêde ne, dikeve dest. Me tevî vê jî çalakî dabû destpêkirin. Piştî du rojan îdareyê bi me re peyman danî. Cilên yek tîp hatin derxistin. Gotin; "bes ên bixwazin li ber xwe bikin hûnê xwe têkil nekin û zehtê jî li ser wan nekin."

Cilên yek tîp jî evqasî hêsan hatibûn derxistin! Şîroveyên me erênî bûn. Plansaziya çalakiyê ya ketî dest îdareyê berfireh bû. Me di navbera xwe de digot; “dijmin pêvajoya çalakiyek wisa nade berçav, ji ber dê hemû girtîgeh bigirta nav xwe. Lewma bêdeng ew cilên yek tîp rakirin.” Belê, di cara destpêkê ketî rojevê de, me pênc şehîd dabûn. Tevî pênc şehîdan li ber me kiribûn, niha jî bi rojiya birçîbûnê ya du rojan ve ew bi xwe radestî yek tîpan bûn! Ya rastî me ev şîrove dikirin, lê dîsa jî diviya me baş bizaniya dijmin li kur, çi û çima dike. Em vê ji hev re jî dibêjin. Ne rast bû em her tiştî bi windahiyên giran, an jî di encama kuştinan de hinek tiştan ava bikin û bidest bixin. Lê piştî meha Çileyê ev taktîkên miijûlkirinê û rewşa me ya “pişt tewiyayî” ne ji xêrê re bû. Her ku me nîqaş dikir şîroveya ku; dijmin di zanebûna pirsgirêkên navxweyî de ye, lewma çi çalakî pêk bihata dê yekîtiyek ava bikira. Lewma hewl didin me zêdetir nêvengên ku nakokiya kûr dikin de bigirin, vê guncavtir dibînin, pêş diketin.

Di vê navberê de parastina bi Kurdî ket rojevê. Bes hema bêje gelemperiya dozan bi encam bibû. Yên mayîn jî pêngava dawî bûn. Hinek parastinên dozê û yên pêvek hene. Li van deran jî parastina bi Kurdî hatibû destpêkirin. Mehdî Zana jî parastina xwe bi Kurdî dike. Lê encamek ecêb derket holê. Weke ku parastina bi Kurdî Mehdî Zana daye destpêkirin hat diyarkirin! Çapemeniyê jî sernivîsên rojnameyan wisa dabûn. Mehdî didan pêş.

Di daxwazên çalakiyan de xala serbestkirina zimanê Kurdî hebû. Ji ber gelemperiya malbatan bi Tirkî nedizaniyan. Jixwe di pêvajoya êşkenceyan de nedihat axaftin. Hevdîtina bê

axaftin jî pir zehmet bû. Heta demekê axaftina bi Kurdî serbest bû. Paşê tengezarî derxistin û asteng kirin.

Me dem bi dem statuya girtîbûna siyasî nîqaş dikir. Me destnîşan kir ku divê li gorî hevpeymanên Cenevrê nêzîkbûn were kirin, li gorî belgeyên nav-netewî di şêwazek guncav de nasnameyek siyasî were destnîşankirin û parastina van kir. Me ev xwestekên xwe bi şêwazek pêşniyar ji partiyê û derve re jî ragihand. Ev mijar zêde guncav nehat dîtin. Gotin; "xwestekên girtîgehan derbas dikin. Rewşa siyasî daxwazek berfirehe. Ev jî tê wateya lihevkirinek yekser a bi dewletê re. Jixwe ev jî negengaz e."

Di nota sala 85'an hatî şandin de wate û girîngiya berxwedaniya partiyê ya li girtîgehan, rola wê ya diyarker ku di nava têkoşîna me ya Rizgariya Netewî de çawa ye, balkêş hatibû destnîşan kirin. 15'ê Tebaxê jî ji bona vê berxwedana herî manîdar bû. Her wiha êdî diyar dibû ku têkoşîna çekdarî weke ewleya hemû pêşketinan derdikeve holê. Heta wê kêliyê me her tim bêzariya berxwedaniya 82'an û pêvajoyên bandor kirine, her çendî ne di asta fikir û baweriyê de jî be, weke pêvajoya radestî û têkçûna me jiyan kirî dihat nirxandin. Lewma nota hatî şandin moralek gelekî girîng bû. Lê dîsa jî diviya hesabê tiştên hatine jiyîn baş were dayîn. Ji ber ger rexnedanek xurt nehatiba dayîn, dê pir hesas li ser tewan, şaşî û lewaziyên heyîn bihatan girtin.

Ev îxanete, nexwe egît Şehîd ne diket

Me 28'ê Adara sala 1986'an di nûçeyên şevê yên TV de, şahadeta hevalê Egîd bihîst. Tam jî di hefteya sor de bû. Dîmenek hevalê Egîd li çiyayê Gabarê, li ser berfê, desmala wî li serê wî pêçayî, weke ku raza ye ji nêz ve zelal hatiye kişandin dan televîzyonê û gotin hatiye qetilkirin. Her kes bêdeng bû. Yên nas dikirin giriyan. Bi taybet hinek ji Batmanê nas dikirin û ji ber bi wî bandor binbûn û tevlî bibûn. Hemû jî hevalên ciwan bûn. Me bawer nekir. Gelekî zehmet bû. Çawa bû? Diviyabû me di Newrozê de qiyamet rakiriya. Ev çawa dibû? Gelo dibe îxanet be? Behsa pevçûnê dikin. Me jî got, 'ev îxaneta navxweyî ye, nexwe Egîd şehîd nediket'. Gumanên bi vî rengî digeriyan. Min nekarî wê şevê razim. Piştî ku her kes nîvê şevê raza, min betanî kişand ser çavên xwe û giriyam.

Piştî Qeresunguran, cara yekê bû li nav Gerîla wisa di asta jor de rêhevalek Fermandar şehîd diket. Me roja paştir bi hevalan re civînek bîranînê pêk anî. Me fermandarek hêja yê têkoşîna çekdarî winda kiribû. Ji ber me ji nêz ve nas nedikir, me nedikariya zêde tiştekê bêjîn. Lê paşê hevalên xort nivîsên cur be cur şandin. Ew jî nivîsên bîranîna hevalê Egîd bûn. Di wan nivîsan de der barê pêvajoyê, bi taybet baldarî û pratîka wî ya hunera leşkerî de berfirehî nirxandin hatibûn kirin. Em hînî pêvajoya HRK, 15'ê Tebaxê û pêvajoya pey wê re, piştî îxaneta 85'an rola hevalê Egîd a komkirina gerîla û hemû xisletên wî yên din bûn û têr nebe jî serwext bûn. Di kongreya 3. de li ser bîranîna hevalê Egîd artêşbûn hat avakirin. Moral û bandora sazîbûna ARGK'ê ava kir, mezintir bû.

Çalakiyên ku di sala 87'an de hatin lidarxistin, çapemeniyê û televîzyonan bi rojan di rojevê de girtin. Bernameyên taybet hatin amadekirin. Dewletê, tîmên taybet, Walîtiya Taybet, Baskên Artêşê yên Taybet û çetegerî tev bi hev re pêş dixist. Di serdegirtinên gundan de piştî kuştinên jin û zarokan û kuştinên bi rêbazên cur be cur propagandeya dijmin a dijberî me ya reşkirinê dimeşand berfireh dibû. Me ev weke êrîş û lîstokên MÎT û kontrgerilla nirxand û li dadgehan jî ev pêkanên li Kurdistanê protesto û eşkere kirin. MÎT û kontrgerîlla hewl dida gel, raya giştî bi vî şêwazî li dijî partiya me derbixe. Ev jî gelekî girîng bû.

Di armanca van êrîşên dijberiya şoreşê de helwesta bingehîn gerîla li ber çavê gel xistin, bandora çalakiyan şikandin û bi lez astengkirina wan bû. Gelo tevdîrên partiya me çibûn, daxwiyaniyên me yên ji eniya me bikaribe van vala derbixe hene an na? Bes di vê mijarê de ti agahî nagihêjin destên me. Lê em dihesin ku di vê mijarê de hinek kêmasî jî hene.

Di heman pêvajoyê de gelek sazî, dezgehên xwecihî û biyanî, şandeyên cur be cur li girtigehan geriyan. Dewlet dixwaze bide qanekirin ku li girtîgehan êşkence tine ye. Di vê navberê de helwestên me yên li dijî serdegirtinên gundan de pirsîn. Me jî di dadgehan de daxwiyanî da ku ‘kontrayan ev bûyer pêk anî ne’. Paşê hinek îxanetkarên li xwe mukir hatine gotibûn ‘PKK’ê pêk aniye’. Yên nû hatine jî dibêjin ‘çalakiyên me ne.’ Ango tevlîhevî û şêlûbûnek heye.

Tam di pêvajoyek wisa de daxwiyaniya Celalettîn a ‘fîşek kesî nas nake’ di çapemeniyê de derket. Zilamên dewletê bûn,

lewma peyvên ku kêrî wan dihatin di çapemeniyê de bikar danîn. Hinekan jî digot; "şer e, dê carê sivîl jî zerarê bibînin." Mehdî Zana digot; "şer e, ne bi dil jî be, carna hinek zerarê dibînin." Armanca dijmin a sereke ew bû, ji girtîgehan peyamên şermezarkirina van çalakiyan derbixe derve. Dixwest sûd ji bertekên destpêkê bigire û nakokiyan ava bike. Tişta dixwest diyar bike ev bû. Ango dixwest bide diyarkirin ku, "PKK'yiyên li girtîgehan, PKK'yiyên li derve, an jî gerîlayan na-ecibînin." Lewma me jî di paraznameyên xwe de bal kişand ser lîstokên dijmin û got; " dijmin dixwaze têkoşîna me ya Rizgariya Netewî reş bike. Dixwaze pergala kontrgerîla û cerdewaniyê pêş bixe. Bikaranîna partiya me ve cilên gerîla li ber xwe dike, gelek lîstokên cuda ên provakatîf dixe rojevê. Her wiha yên îxanet kirine bikar tînin." Bes dijmin piraniya axaftinên me ne da der. Perçe perçe kir, ji nav hilbijart û hinek kir serenavên rojnameyan û weke nûçe dan.

Xebatê bîne heta cihekê bila tam ber bi serkeftinê ve biçe û paşê berovajî li mirov vegere!

Hat gotin, "amadekariyên tûnelê bi dawî bûne." Ango di rojevê de rev heye. Dê ev rev bi tûnelê re çêbe. Hevalan agahî dane. Ez wê şevê qet nerazam. Di qoxuşa me de haya kesî pê tine ye. Şev weke kabusek rûreşî bi ser min de dihat. Dirêj dibû. Her ku dengek dihat, min digot; "temam e." Ji xwe re dibêjim, daxwaziya min bila ti kêmasî rû nedin! Paşê min ji xwe re xeyalê revê kir. Qadroyek hejmara xwe çil-pêncî artêşeke. Hemû jî hevalên kevin in. Dihizirîm ku dê ji bona partiyê weke xwîna teze baş bin. Çiqas xweş bû! Gelo li çolterê

jî amadekariyên hewce hatibûn kirin? Gelo di çiqas wextê de dikariyan ji bajêr derbikevin? Ger kêmasiyekê rû bidaya dê çi bûya? Lê eniya li girtîgehê têkûz bû. Tûnel heta malekê hatibû kolan. Dê di nava malê de derketan.

Di vê navberê de hewldana reva hevalê Mazlum hat bîra min. Bi saetan di nava bîdonek gelaşê de bê tevger mayîn, îradeyek bû. Ger ên hatibûn wî bigirin deh-panzdeh xulekan zû hatiban, dê ew rizgar bikiran. Ji ber tenê du leşker li wir hene. Dikariyan pir hêsan ew bê bandor bikiran. Ez jî reva xwe dihizirim. Ew jî pir ecêb bû. Gelo ti şev bi qasî wê şevê xweş hebû? Ez çiqas kêfxweş bûm. Weke ku min çalakiyek pir girîng bi ser xistiye di nava kelecanekê de bûm. Nêzîkbûna min a zêde ji xwe bawer, lê tevdîr negirtin û serkeftin domdar nekirin derket pêş. Ji ber ez êdî li derve bûm û min a herî zehmet qedandibû. Diviyabû êdî piştwê re afirînerî, kêliyê baş binirxînim, yek kêliyê jî ji mantiq dûr nekevim û bê wê tevneger im. Ya herî girîng jî ev bû. Xebatê bîne heta cihekê, tam bigihêje lingê serkeftinê, paşê berovajî vegere!

Dema mirov di vê mijarê de winda dike, bandora xwe zêde dike. Dibe ku bi qasî mirov qet destpê neke bandora wê jî tine be. Dibe ku mirov di karekê de nekêrhatî be, hêz û jêhatina mirov a kirinê tine be, aqilê te têrê neke, hewldan û wêrekiya mirov a destpêkirinê tine be, bes di rewşek wisa de nedestpêkirin û ne jî binkeftin zêde nabe pirsgirêk. Qet nebe mirov dikare vê rewşê rave bike. Lê karek aliyê wê baş bike, bila hêza te ya zêdetir û baştir kirinê hebe, xurtkirina derfetan jî heye, lê ji ber kêliyekê dibe qurbana hestên xwe, kêliyek ji xwe bawerbûna zêde, ji tevdîrê dûr hem dide windakirin, hem jî hemû keda heta wê kêliyê tine dike.

Ev bi xeteriyan lîstin bû, an jî feda kirin, ji fedabûnê hezkirin bû? Divê ez vê peyva "feda" baş bigirim. Ji ber divê pîvana bê sebirbûnê, pîvanên fedakirinê, pîvanên baweriyê, pîvanên hêrsê, bertek û her tiştî hebe. Ji ber ez ji hinek cihan û tiştan aciz bibûm û min wisa dest bi kar kiribû. Weke gotina pêşiyan dibêjin; "yê bi zerarê rabe, dê bi zerarê jî rûne!" Bes ev jî nehêcet bû. Ez derketibûm derve. Lê min nekarî xwe biparêzim. An jî min ew parastin têr dît. An jî bê ku ez qadê binasim tevgeriyam. Ger ez ber bi daristanê ve biçûma, ezê wê şevê heta sibehê zêde dûr biketam. Ji ber her tim mirov dikare xwe li çolter û çiyan biparêze. Çiya mirovan diparêze. Min gotibû; "min zehmetî derbas kir, êdî tiştek nabe." Her çendî hinek gumanên min hebin jî, bi rehetiya ku "êdî dijmin min nagire" tevgeriyam. Hest û xeyalên min ên di vê kêliyê de wisa xweşik, dîn û har bûn. Min ji xwe re xeyal dikir ku ez gihiştime hevalan û zindî behsa reva xwe ji wan re dikim. Weke filmekê bû. Min li Meletiyê tenê ji wê şevê hez kiribû. Ji hemû şevan tenê şeva 20'ê Tebaxa 80'yê xweş bû.

Li girtîgehan rewşek cuda û xeter nebû. Sibehê jiyan asayî destpê kir. An rev çênebûye, an jî ne hatine ferqkirin. Ez li bendê bûm. Dê bi ser qoxuşan de bigirin. Dê li her derê tûnelan bigerin. Di nava panîkê de ne. Li her derê hejmarê digirin. Dibe hinek din revî bin. Dibe ku ji me jî şik biribin. Ma çima nebin? Piştî demekê weke ceribandinekê me notek nivîsand û ji qoxuşa 35'an re şand. Me navnîşan xwest. Lezgîn li benda bersivê ne. Bersiva nota me dereng hat. Wer xuya dikir neçûbûn. Gelo çi bû? Ez nikarim ti şîroveyê jî bikim. Ez li benda şeva paştir mam. Heman kelecan didome. Carekê dengê hingedengekê hat. Hinekan baz dida. Ez jî ji xwe re dibêjim; "

temam, mîsoger vê şevê çûne.” Serê min li ber mazgalê demek dirêj rawestiyam. Bala Cahîdê wan jî kişand. Dizane hinek xebat hene, lê ji kesî re nehatibû gotin ku dê kîjan şevê biçin. Min jî bê hemdî xwe got; “teqez heval îşev çûne.” Wê jî kelecanek kûr jiya.

Paşê em hîn bûn, tûnel heta malê neçûye. Hê çend metre mane. Di heman demê de di kêliya heval derdikevin de beşa ku di bin cadê re derbas dibe hildiweşe. Tişta baş wê şevê qemyon tam li ser cihê ku rûxiye rawestiyaye. Heval demekê di nava tûnelê de nîqaş dikin. Hinek dibêjin em derbikevin. Lê cade vekiriye, cihê ku têre derbikevin jî tam miqabilî kolika leşkera ne. Ger li wir tevgerek herî biçûk jî were dîtin, dê bal bikişîne û nobedar destwerde. Di rewşek wisa de jî her kesî nedikariya derbikeve. Lewma cardin her kes paşde vedigere. Jixwe em hemû ziraviyan nizanin. Kî çi axiviye, tevgerek çawa guncavtir bû em nizanin. Ji ber haya wan zêdetir ji şert û merc hebûn. Lê ji bo neçûna wan hem xemgîn, hem aciz bûm. Karê tûnelê, mijarek êdî hesas bû, kêmasiyek herî biçûk dê biba sedema eşkerebûna wê. Ji ber gelek hevalan dizaniya. Rewşek îxanetê derketa, pir hêsan dikariya keda hemû hevalan vala derbixe. Ji ber evqas kêm û kurtiyan mirov bixwaze nexwaze van gumanan dijî.

Beriya vê hewldanê min û Hemîlî ji hev re nivîsandibû. Nivîsek xatir xwestinê bû. Min bendewariyên xwe, diyar kiribû ku baweriya min heye, dê di derve de hêzek mezin bide hevalan û têkoşînê, weke komek qadroyên astên wan girîng dê bikaribin valahiya salên borî dagirin. Min jê xwestibû ku rika xwe, aliyên xwe yên wî paşve dikişînin derbas bike û çalak

tevlî bibe. Min gotibû; “ez dixwazim te weke fermandarek bi hêz ê şerê me bibînim. Dixwazim weke ser fermandar bibînim û bibihîsim. Dibe ku em carek din qet hevûdû nebînin. Ji ber ev têkoşîne. Ne diyare ku dê çi bibe. Bes tu dizanî bi min re her tim hêviya “hevdîtinê” zêde ye! Ez wê peyvê zêde hez dikim û pê bawer im. Emê li çiyayên xwe hevûdû bibînin…”

Wî jî gelek gotinên xweş nivîsandibûn. Gotibû; “ezê bibim fermandar. Yeqîn bike, dema tu derketî hatî çiyan ezê te bi teqîna topan pêşwazî bikim.” Notên me yên dawiyê wisa bûn.

Mixabin nekarî biçe û biçin. Vê astengiya derketî em tev xemgîn kirin û bandor li me kir. Ji ber di girtîgehan de karên wisa gelekî hesas in. Dirêjkirin û ji demê re hiştin gelekî xeter bû. Dibe ku xayînekê bigota, an jî di lêgerînan de kêmasiyek derketa holê. Jixwe tûnel di bin cadê re derbas dibû. Ji ber vê ger cihê rûxiyayî baş neyê nixumandin, dibe ku eşkere jî bibe. Lê nêzîkbûnên hevalan ên em pê dihesiyan ne ev tenê bûn. Bêhna wan jî fireh bû. Digotin; “kêmek maye, emê cardin biceribînin.” Mixabin piştî demek kin kêmasiyekê rû da. Av ket tûnelê. Yan kanalîzasyon bi wir re derbas dibû, yan jî kanî derketibû. Vê jî bi awayekî xwezayî ji bona kolanê zehmetî ava dikir. Lê tevî vê jî hevalan kar dikir, digotin dê avê bi bîdonan derbixin û vala bikin. Ez dîsa jî nerehet bûm. Ji ber bûyerên wisa ji dûr ve şopandin gelekî xirab bû. Ger ez di navê de bûma, ezê wisa bandor nebûma.

Ji bona em notên di der barê pêşketinan de bişînin derve, ji me re dişînin. Em jî wan li gorî tê destnîşankirin dişînin. Beşek nivîsa pênsed rûpelî ya me qoxuşa jinan ji serî ve ‘heta pêvajoya 86’an nivîsandibû ket destên dijmin. Me di vê mijarê

de ti agahiyek zelal negirt. Ji ber nivîs zêde berfireh û bi hemû ziraviyan ve hatibû nivîsandin. Heta hevalan gotibû; “te weke romanekê nivîsandiye, mirov dikare dema pêş bike roman.” Ew jî ji komek hevalan re dixwînin. Paşê ji bona beşek din jê derbixin belav dikin. Di lêgerînên girtîgehê de hinek beşên wê winda dibin. Weke din jî dema derdixin derve, beşek zêde jî tê girtin. Leşkerê ku derdixe derve jî ji erkê tê girtin. Paşê me nezanî birin kuderê û çi pê hat.

Ew demek bû karê tûnelê nakokî û pevçûnên heyîn dabû rawestandin. An jî kêm kiribû. Ev nebe jî çavderiyên me wisa bûn. Ji ber karê sereke tûnel bû. Her wiha gelek hevalên ku pirsgirêkên wan heyîn û rexne ji bona wan hebûn, di nava koma ku biçûn de bûn. Heta der barê hinek hevalan de nîqaşên weke wan bibin, an jî nebin hebûn. Hinek pêşniyar hatibûn kirin. Nêzîkbûna kîjan heval dibe bila bibe ji dervî koma çalakiya revê girtin, biryarek pir girîng bû. Dibe ku wan nêzîkbûnan jî ji pirsgirêkên cidî re rê vekira. Em rewşa heyî tam nizanin. Lê her ku derfet çêdibû, min jî nêrînên xwe parve dikir. Karên wisa ji me û hevalên din ên di qoxuşên din re nedihat gotin. Jixwe hevalên ku biçin jî berê hatibûn destnîşankirin.

Di vê manê de nakokiyên min jî yên bi Hamilî re dem bi dem radiwestîn û carna jî sor dibûn. Kêm jî be min derfet dît ku ez bi rêya vê peywendiyê Hamilî jî nas bikim. Berê min di her mijarê de bawerî dida û her tiştên wî erênî didît. Ti nakokî û pevçûnên me yên li naverastan tine bûn. Di pêvajoya Elezîzê de derbarê hinek mijaran de nîqaş û pevçûnên me çêbûn. Li wir jî ji dervî rêveberiyê bû û xwe ji erk dûr dixist. Berpirsyarî nedigirt. Takekes û taybet nêz dibû. Niha li vir jî ev xislet

cardin di rojevê de bûn. Bi gelemperî jî pirsgirêkên cidî hebûn. Herî zêde jî di wê demê de pêdiviya bi hev re karkirinê hebû. Pêdivî bi wî hebû. Hem li dijî dijmin evqas li ber xwe bide, bi kesayeta xwe ya berxwedanvan were nasîn, bila rêzdariya wê hebe, lê hem jî di nava wê tevlîheviyê de tu jî kesek bi serê xwe bimîne be! Lewma diviya bû dema min hinek rexne dikir, herî zêde jî Hamilî rexne bikira. Wî jî ranedikir, dixeyîdî, aciz dibû û bertekên wî weke yên dîna bûn. Karasu ew wisa hîn kiriye, tevî her tiştî herî zêde girîngî daye nêrînên wî, zêde bi ser de naçe û dest nade. Hinek hevalên din jî di vê mijarê de rexne dikin. Lîberal nêzî gelek hevalan bûye û ev jî bûye sedem acizbûn pêş bikevin. Ji ber vê nêzîkbûnê rastî û şaşî têkilhev bûne.

Hem ji bona di pêşketina van pirsgirêkan de para rêxistinê hebû bandor bûm, hem jî ji ber nêzîkbûnên wî yên ji peywendiya di navbera me de aciz bûm. Her du rewşan jî hişt ku ez hinek xisletên Hamilî baştir binasim. Tişta ecêb min berî vê çawa nas nekiribû! Ji ber li gorî Hamilî ez kesayeta herî zehmet bikare xwe bigihîneyê bûm! Lê mixabin çawa bû nizanim, bes bi rêya vê peywendiyê xwe rehet gihandibû min. Ji ber li gorî gotina wî ez, gula nizanim kîjan cihê çiya û şikêran a herî zehmet bûm! Paşê ji wir girtibû cem xwe û danibû cihek wisa ku çi demê bixwaze bikaribe xwe bigihîneyê. Mantiq ev bû! Ji ber xisletên weke ferdperestî, xwe esas girtin û mafê xwe dîtinê, tam di vê qonaxê de derdiketin holê. Dema ev têkil hezkirinê bûn, dema ev ketin dewsa hevalbendiyê, li wir tufan radibe! Belê, tufanên min jî tam di van kêliyan de derdiketin holê. Ji ber şêwaza tufana min ast, cih, dem û hedefa wan gelekî girîng bû.

Hezkirin karek avakirinê ye. Divê veguhere hilberîna kedê û afirîneriya nirxan. Lewma divê teqez hest û baldarî tev di nava herikîna vê hezkirinê de zelal bibin. Divê pîvanên ku bikaribin rê ji pêşketinan re vekin, di jiyanê de seknek li gorî rastiyên heyîn guncav were avakirin. Her wiha hezkirin ne hestên werin veşartin û ser nixumandinbû. Helwest û nêzîkbûnên vediguherin çalakiya ne. Hevgihîna wan e. Hevûdû temamkirina wan e. Di têkîliyên min û Baqî de cihêtiya bîrdozî û rêxistinî hebû. Ev jî bingeha nakokiyên me bû. Min digot ger ev werin çareserkirin dibe ku em bi hev re bin. Lê min fêm kir ku tenê çareseriya ji vê hêlê ve jî nehezkirine. An jî yekser hezkirin ava nedikir. Heman bîrdozî û polîtîka parastin, bi wan re girêdanek ava kirin, bi sazûmaniya peywendiyek wekhev û azad re, ji aliyê jiyanê ve li cem hev be, were tamamkirin, hingê dikare hezkirinek hevalbendiyê ya bi hêz û hezkirinek bi hêz a cinsan derbikeve holê.

Peywendiyên mulkiyetê di xoy, derûniya kes, cîhana hest û ramanê de gelekî xirab û kirêt derdikeve der û diyar dibe. Dibe ku bingeha wê ya madî xwedî paşerojek kevn e. Mirov dikare raveyên girêdayî kokên dîrokî bibîne. Dikare bi bandora xisletên wê yên çînî ve binirxîne, lê ev rastî di peywendiya bihevrebûnê de hezkirinê dikuje û tine dike, pêş naxe. Her ferzkirin û nêzîkbûna di vê mijarê de, peyvek di asta gotinê de kesayetê dişkîne, bandora neyênî li ser vînê dike, hest û bertekan cuda dike. Her wiha di vir de kesayeta rasteqîn çiye wê derdixe holê. Di vê manê de nêzîkbûna ji jin û hezkirinê re, ceribandinek kesayet a pir girîng e. Ji ber pîvan herî lez û zelal li wir derdikeve holê.

Na. Di wê têkîliyê de hezkirin tine bû. Ji ber pêvajoyek dema lêgerînên şoreşgerî û lêgerînên azadbûnê bû. Li nav malbatê li hember lêgerînên min ên azadbûnê astengî hebûn. Dixwestin wê bi pêkana zewacekê re temam bikin. Ger heta wê astê pêk bihata, dê jiyanek girêdayî kevneşopiyan derketa holê. Ez jî wê naxwazim. Hevalan jî ji lêgerînên min re heman rêbaz weke çareserî dîtin û pêşniyar kirin; "em te bi hevalekê re bidin zewicandin û te ji çewsîneriya malbatê rizgar bikin!" Bertekên min li dijî vê jî pêş ketin. Ji ber qutbûna min a ji malê, di vê lêgerînê de gavek bû. Ez di vê baweriyê de bûm. Lê ez ne di wê hêzê de bûm ku, wê berdewam bikim. Demekê Baqî çareseriyek bû. Li gorî min Baqî şoreşgerek baş bû. Zewac, hezkirin an jî tiştek din nedihat hizirîn. Ya rastî dê pêşeroj çawa be, ew ne dihat hizirîn. Ji ber rev, bazdan û lêgerîn hebû! An jî heta kur, çiqas û dîtina çi bû? Ev bi plan û zanebûn nedihat hizirîn. Tevdîrek tine ye. Lê nêvenga ez lê me jî tam li gorî vê xwestek û ferzkirina xwedî xisletekê ye.

Weke kes bêhêz im. Di pêvajoya şoreşgeriya xwe ya zaroktiyê de me. Weke jin jî hêj lewaz im. Di bin bandora kevneşopiyê de me. İsrar û biryardariya min a lêgerînê û îdîa min a di şoreşgeriyê de, ji bona jinekê aliyê herî baş, moral û hêz e. Her wiha derfetan jî ava dike. Lewma her çendî di lêgerîna min a hezkirinê de lewaz be, bingehek heye. Her ku lêgerîn û asta azadbûnê pêş dikeve, ev bingeh jî têkûz dibe. Jixwe israr û înada di vê lêgerînê de, li dijî daxwazên yek alî û asta jiyana wê mirov ber bi isyanê ve dibe. Ango hemû bi hev ve girêdayî ne. Lêgerîna jiyanek şoreşgerî ya rast, ancex dema karî bi bîrdozî û polîtîkayek rast, sazûmaniya rêxistinî û şêwaza şerê wê ve yekbûnê saz bike, pêk were. Ji ber çavkaniya

hezkirinê jî ev ava dike. Ger zemînê vê tine be, ti hevrebûn nikare li wir derfetê jiyanê bibîne. Ger bi Baqî re jî şoreşgerî, çavkaniyek hêzdar û herikbariya domdar, an jî PKK bidîta û xwedî meşek milîtanî jî ba, di navbera me de hevrebûn, hezkirin û evîn pêk nedihat. Tenê dê biba zewacek kevneşop a ku hinekê taybetmendiyên wê cuda ne. Ev rastî derbas nedikir.

Hevalbendiya min a bi Hamilî re de hezkirin û evîn heye. Ez evîndarê berxwedêrî, şerkerî û tevî her tiştî biryara meşa wî ya di şoreşê de bûm. Min ew bi vî şerê wî ve hez kir. Ne nû bû. Ne têkîliyek ku bi nû, bi hevgihîn, bi hevdîtin, bi awirek, an jî bi çend gotinên hezkirî ve hatibû pêşxistin bû. Bingeha wê hebû û min jî ew bingeh hez dikir. Bi wê ve girêdayî bûm. Min hewl dida wî bi hesûdî biparêzim. Di vir de ev şêweya têkîliyê li ser bingehek rast dana rûniştandin gelekî girîng bû. Lê di vê mijarê de vajîbûnek hebû. Min hezkirin û nirx dayîna Hamilî weke hewcedariyek hevalbendiyê didît. Ji ber ew demek dirêj bû me bi hev re kar dikir, di heman şert û mercan de bi hev re bûn, lewma em gerimtir û nêzîktir bûn. Ev jî xwezayî bû. Lê ev jî ne dibû sedem ku em di peywendiyan de cihêtiyê ava bikin û wê jî ferz bikin. Dema mirov bersiv nedaba hezkirin an jî baldariya Hamilî, dihat wê wateyê ku ew hatiye redkirin. An jî dijberî wê tiştek kirin jî weke her tiştê wî qebûlkirinê dihat fêmkirin. Her wiha weke mirov a wî ye digirt dest.

Min li vir çi kir? Min xwe ji bona rêhevaltiyek li ser zemînek hezkirin, girêdan û baweriyê xemilandî û ceribandiye feda kir. Ez cardin vedigerim mijara ‘feda!’ Hevaltiya min a bi Hamilî re heta wê rojê di maneya giştî de li ser bingeha hêz dayînê bû. Ji her kesî zêdetir gerim nêzî min dibû. Ango di

nava vê peywendiyê de tiştên taybet tine bûn. Ango ji bona min wisa bû. Di vê manê de me ne nû hevûdû didît û nas dikir. Di heman demê de ne têkîliyek erzan, ferdperest, tenê girêdayî ajoyan, tenê di bin bandora mercên ku zindanê ava kiribûn de bû.

Lê belê, pîvanên Hamilî, yên hezkirin, xwediderketin, xwe gihandin, an jî naskirina jinê, ji pîvanên kevneşop nedûr bûn. Pîvanên zilamê feodal û hinek jî pîvanên şoreşgerî di nava hev de bûn. Bes ya destpêkê, ango pîvanên zilamê feodal serwer bûn. Di vê manê de baldariyek kevin, bi nasîna vîna yê miqabilî xwe ve, pêşketina hezkirin û baldariyek xwezayî jê xwestin, li ser esasên têkoşîna hedirî, rêzdar û hevaltî kirina rojevê zêdetir, nêzîkbûnek nerasterast, bi navbeynkaran, an jî ferzkirinê ve, têkîliyek dixwaze yekser pêk were dixwest. Weke şantajekê nêzî hezkirinê bû. Bes di hezkirinê de şantaj nedibû!

Di vê pêvajoyê de jî pirsgirêkên rêxistinî zêde bûn. Ev xwestek û baldariya xwe jî li ser zemînek lewaz û bêçare ava kiribû. Ger hêztir bûya, di vê rewşê de, bi vî rêbazî nedikir rojevê. Digot; "An dê pêk were, yan dê pêk were!" Nexwe rewşa Hamilî jî nebaş bû. Xeyîdî, aciz, xirab û di çareseriya pirsgirêkên rêxistinî de hişk bû. Lewma kesayetek di vê rewşê de nikare îlana evînek hêzdar û dikişîne xwe bike! Rêbaza hatina wî mirov ditirsand, bi mirov re guman ava dikir û tengav dikir. Di wê kêliyê de mirov digot; "bila niha ti tişt çênebe." Lê min dixwest li hember ê hêzdar baldar bim. Tevî ku lewaziyên wî hebûn, min ew ji ber berxwedêriya wî hez dikir. Ez di serî de hem hestiyar nêz dibûm, hem jê bandor bûm. Hem weke

gunehekê dibînim, hem jî hişkbûnek şert û mercên ava kirî heye. Di heman demê de gumana ku dibê dijmin bikar bîne heye.

Dîsa dibe ku bi hevalan re jî bandorek neyênî ava bike. Ji ber ez Sakîneya hemûya me. Ez jî di nava têkilheviyek wisa min tengav dike de biryar didim. Karasu ji aliyekê ve, Şener jî ji aliyekê ve min tengav dikin. Dibêjin; "eman, bila tiştek ji Hamilî neyê. Hamilî durist e." Di vir de bandora van tevan jî hebû. Lê yek ji wan jî, ji bona min nehêcet bûn. Ji ber di biryarê de ya diyarker ez bûm. Dikarim bêjim ku min cara yekê şaşiyek bi zanebûn kir. Ger min destpêkê hinek din helwestên xwe ferz bikiran, dê tiştên baştir pêk bihatan. Her çendî acizbûn, xeyîdandin û tengezariyê rû dabin jî, min dikariya her tiştî baş bihizirim û şansek min hebe çareseriyê di wê girêkê de nefetisînim. Min dikariya xwe hîn baştir qane bikim û wisa biryar bidim. Min dikariya ji demê re bihêlim. Dê vir de min bi Hamilî re baştir nîqaş bikira, hevûdû baştir fêm bikira û emê bi hev re bigihayan encamek biryara hevbeş. Ger ev erênî jî, neyênî jî ba, dê bandor li peywendiyên me yên din nekiriba. Dê li ser bingeha çareserkirina pirsgirêkên rêxistinî yên cidî, mercên nêzî hevrebûnek rast jî pêş biketa. Ji ber li naverastê hinek pirsgirêkên me yên esasî hebûn.

Di encamê de min jî xwe hêsan feda kir, min nêzîkbûnek wisa diyar kir ku hêsan xwe bigihînin min û hestên xwe hêsan danim holê. Divê hezkirin hêsan û bêpîvan neyê raberkirin, ji ber dê hêsan jî biqede. Hamilî di vir de wer dizaniya ku tevî hezkirina hevalbendiya deh salan, hêsan xwe gihandiye min. Destpêkê 'hezkirin' an jî 'hezkiriyê' giranbiha û mezin bike,

paşê jî daxe jêrê û di nava xwestekên ferdperest de tengav bike! Yanî her çendî hezkirin û baldariyek durist jî hebe, ti wateya xwe tine bû ku bi salan dirêj bike, di nepeniyê de bixeniqîne û zêde di nava rastiya veşartî ya kevneşopiyan de bimîne. Xwe gihandina tiştekê çi bû? Ev çawa dibû? Xwe gihandin, nebûna xwediyê wê ye. Ne binpêkirin û ji nirxê wê jî xistine. Xwe gihandin çalakiyeke. Her çalakî jî avakirine. Bûna çavkaniya çalakiyên nû ye. Ger xwe gihandina hezkirinê, çalakiyek jiyan û azweriyê ye, nexwe çi wateya van rewşên tengav heye? Tişta ku ew zêde xweser û zêde taybet dida nîşan, ne ku ji hemû şer û jiyanên din cuda bû. Ne 'taybet'bûnek di navbera du kesan de jî mabû. Berovajî vê tevî hemû 'taybet'iya wê, bi qasî bikare hemû jiyanê bigire nav xwe, bi qasî hemû şeran bilind bike, zêde giştî û berfireh bû.

Ger têkîliya hezkirinê, têkîliyek jiyanê ye, tê wateya hêza jiyanê, wê demê ev têkîlî nabe çavkaniya pirsgirêkan, an jî di çareseriyê de rola xirab nalîze! Hezkirin moral dide, hêz dide, afirîner dike, temam dike, hîs dike, lihevkirinê saz dike, vediguhere enerjiyek balkêş a pêkanînê. Lê mixabin, em her tim di şer û pevçûnê de bûn. Gotinek herî biçûk bandor dikir. Rewşek bi hedar, kamil û demdirêj bike zêdetir, helwestên bêhedar, bê îstîkrar, hestiyar û bi bertek derdiketin pêş. Em wisa nêzî hev dibûn. Di heman demê de rewşa me jî di asta gotinê de bû. Ango ti girêdanek me fermî ya bi hev re tine bû. Ji ber biryarek şaş ba, derfetên sererastkirina vê hebû. Diviyabû nêzîkbûnek wisa hişyar, rêzdar û nerim bihata kirin. 'Sond' girîng bû. Lê em şoreşger bûn, em ne di dorpêça kevneşopiyê de bûn. Ev ne zewaca ji derguşê (beşik kertme) bû. Ev ne mehra mele, yan jî mehra îmzeyekê bû. Jixwe di nava civakê

de jî ev dikariya werin guhertin. Weke din jî soza hezkirinê ji pêş ve bi zimanek teqez nayê dayîn. Hezkirin bi ‘sozan’ pêş nakeve. Hezkirin bi xwe soz e. Hezkirin bi xwe biryara herî bedew e. Ma çiqas rast e, mirov wê mîsoger bixe bin venêrîna hinek tiştan? Hezkirin di nava hinek nêzîkbûnan de fetisandin, ew kolekirine. Di kêliya min ev hîs kir de, pê hesîm ku min ji onura xwe ya şoreşgerî û jinbûna xwe hinek tişt winda kirine. Min wê kêliyê êşek kûr jiya. Min ev êş di rojnivîsa xwe ya wan rojan de jî nivîsandibû.

Şerê min ê di vê mijarê de bi xwe re dikim ne zehmet e. Di wê baweriyê de me ku min hinek tişt jî rast ferq kirine. Ne zehmete ku mirov bibîne em kêrî hinek tiştan nayên û em nizanin hinek tiştan bikin. Ji bona hezkirinê, pêdivî bi zanebûn û hostatiyê heye. Dema ji kûranî hesîn û fêmkirin tine be, nêzîkbûnek zane, zanyar û hesas nebe, hêmanên erênî yên hene jî tên hincirîn. Min jî ev pir vekirî kirin rojevê. Min nedikariya di bin navê parastina rêhevaltiyê de, ji aliyê xwe ve hezkirinê ser bixim. Ez neçar nebûm ku her tim ez fedekariyê bikim. Xwe xapandin û lewaziya herî bingehîn jî di vir de bû. Bes dema ez li ser van dihizirîm, min cardin lez dikir.

Min yek du caran ji Hamilî re got; “ em vê têkîliyê qut bikin.” Bersiv da min û got; “ ezê xwe bikujim.” Nêzîkbûnek tirsnak bû! Pirsgirêk ne xwe kuştin, an jî nekuştin bû. Ne dixwest nîqaş bike û pirsgirêka heyî fêm bike. Pêşî lê digirt. Ev jî dibû sedem ku ez rêya hêsan kîjan e, wê hilbijêrim. Min jî nêzîkbûnek wî qane bike, pê ve mijûl bibim û hewl bidim fêm bike, bihedar û kamil raber nedikir. Min her tişt zû ji xwe re dikir derd û kul. Min kêmasiyek wî ya herî ji rêzê û nebesiyek

di kesayeta wî de rû dida, dixist dewsa her tiştî. Dema min bandora ferasetên mulkiyeta feodal û burjuvaziya biçûk û berxwedêriya wî û hinek aliyên din ên erênî li nava hev didît, ez xembar dibûm.

Bes kesayet û rastiya wî yekpare bû. Her wiha tişta li nav rêxistinê jî dibû ji vê ne cuda bû û nedibû. Peywendiyên wî yên rêveberî, tevkar nebûyîn, her tim bi qadroyan re di nava pevçûnê de bûyîn, tev jî bi heman rastiya kesayetê ve girêdayî bûn. Lewma diviyabû ev şer rast bihata pêşxistin. Lê min a hêsan esas digirt. Min digot; "em vê têkîliyê yekser qut bikin" û ferz dikir. Ev jî neçareserî bû. Ji ber di avabûna vê têkîliyê de zemînê heyî lewaz bû, her kêmasiyeke me, her bêpîvanî, bandorên ji derve, hemû bes bûn ku ev têkîlî xirab bibe.

Mijdar- Kanun



Dayîk no! Ji kerema xwe re li benda mirina wê nemînin
Bila nemire
Dê nemire
Ji niha ve fitalên (bebek) xwe:
Bi navê
“Sakîneee
Sakîneee
Sakîneee…” bixemilînin.

Helbesta ku Hevalê Şehîd Hamza Yawuz di Sala 1983’an de li Girtîgeha Amedê, Ji Bona Hevala Sara Nivîsandiye.